# Ferhenga Destî

## kurdî bi kurdî

**Umîd Demîrhan**

çapa 2yem a berfireh

sewad

1428

# Ferhenga Destî

## kurdî bi kurdî

Umîd Demîrhan

çapa duyem a berfireh

sewad

1428

**sewad**

*Rêza Ferhengan:* 1

*Ferhanga Destî* © Umîd Demîrhan

*Sererastkirin û amadekirina çapê:*
Umîd Demîrhan

*Çapxane:*
Akademî  0212. 493 24 67

*Bergsazî*
Posta Basim 0212.289 88 80

*Çapa Yekem:*
Tîrmeh 2006

*Çapa Duyem:*
Rezber 2007

**sewad**

İshakpaşa Mah. Cem Sk. No: 6
Doğubeyazıt-Ağrı

Tel: 0535 400 95 21

omitcelali@bazid.net

## PÊŞGOTIN

Di wêjeya kurdî de amadekirina ferhengên kurdî bi kurdî qadeke nûjen e û dikarim bibêjim ku hîç berhemên bi vî awayî neketine destê min. Lêbelê di hinek kovar, pirtûk û xebatên din de carinan hin peyv kurdî bi kurdî hatine ravekirin. Di amadekirina vê ferhengê de her çiqas min ji van çavkaniyên berdest îstifade kiribe jî, piraniya raveyan ji aliyê min ve hatine çêkirin.

Naveroka vê ferhengê bi nêzîkî heşt hezar peyvî hatiye dagirtin û jê hezar û pêncsed peyv jî bi gotinên pêşiyan ve wateyên wan hatine xurtkirin.

Di vê xebatê de weke rêbaz lêkerên hevedudanî giş ji hev cihê hatine nivîsandin. Lê di rewşa navdêrî, tebatî û dançêker de bi hev ve hatine nivîsandin.

**Mînak:**

berze bûn winda bûn
berze kirin winda kirin

Her wiha me ji bo mefhûmên rêzimanî jî nîşaneya /(r)/yê bi kar aniye û ev nîşane daniye ber raveyê.

**Mînak:**

**kirde** *(r)* fail, kirox, kirar, di hevokê de xwediyê çalakiyê

Bi hêviya ku ev xebat ji çanda kurdî re xizmetekê bike...

Umîd Demîrhan
umiddemirhan@yahoo.com

13.07.2006, Stenbol

## JI BO ÇAPA DUYEM

Di demeke kurt de çapa yekem a vê xebatê qediya û vê yekê em kêfxweş kirin. Her wiha di vê navberê de ji heval û xwendevanan hin pend û pêşniyar jî gihane ber destê me. Jixwe me jî dil hebû ku di çapên dîtir de hin sererastkirinan pêk bînin.

Beriya ku qala taybetiyên vê çapê bikin, em dixwazin ku rastiyekê jî bi we re par ve bikim. Her çiqas amadekirina çapa yekem di heyameke dirêj de hatibû pêkanîn jî, xebateke heweskarî bû û di destê me de zêde çavkanî tunebûn. Lê vê carê heta ku em bixwazin di destê me de derfet çêbûn ku em jê îstifade bikin.Heke hûn bikaribin her du çapên ferhengê rû bi rûyî hev bikin, hûn dê bibînin ku:

**1.** Hejmara peyvên ferhengê gihiştiye 16 hezarî. Her wiha hejmara gotinên pêşiyan û biwêjan jî bi awayekî balkêş zêde bûye. Li aliyê din, endazeya ferhengê hatiye berfirehkirin û pêrista çavkaniyên ku me bi kar anîne jî dê sûdeke bêhevta bide têkildaran.

**2.** Rexne û riwayetên nû ên birêkûpêktir ber guhê me ketin û me ew jî dahûrandin. Ji ber ku me piraniya peyvan ji salixên jiyana rojane hildabû, carinan şaşiyên herêmîtiyê ketibûn navê. Lê vê carê me bi riya tora ragihandinê ya navneteweyî -înternetê- û çavkaniyên pêwist xebata xwe gihande asteke pêşketîtir û têkûztir.

Ev xebat xala dawîn a ferhengsaziyê temsîl nake û qusûrên wê dê her hebin. Lewre em wisa hêvîdar in ku hûn dê -ligel bexşandina xeletiyên me- pend û rexneyên xwe jî ji me re bi rê bikin.

**Umîd Demîrhan**
umiddemirhan@yahoo.com

# A

**a/A** tîpa yekemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke dirêj e, cîderka wê paşderkî ye, di belavbûna wê de dev vekirî ye û asta belavbûna wê nizm e
**a** ravekera nenas a mêzatiyê ye
**-a din** yeke dîtir
**-a xerab di te de bê** çi nexweşiya xerab hebe di laşê te de derkeve
**abal 1.** veger **2.** vegeryayî
**abal bûn** vegerîn
**aban** biyan
**abanî 1.** biyanî **2.** rehek û sewalên çolê
**abegîne** şûşe, cam
**abor 1.** tiştê ku pê debar tê kirin **2.** êwran **3.** îqtisad **4.** serinc
**aborandin/diaborîne/biaborîne 1.** debar kirin **2.** derfeta jiyanê amade kirin **3.** îsraf nekirin **4.** pê re derbas kirin
**aborî 1.** her tiştê têkildarî debara jîyanê **2.** îqtisadî **3.** bêîsrafî **4.** derbasî *"**aborî** bi razanê û zikmizdanê nabe, bi xebat û xwêdanê dibe"
**aborînas 1.** pisporê îqtisadê **2.** debarzan
**aborînasî 1.** pisporiya îqtisadê **2.** debarzanî
**abor kirin** debara jiyana xwe kirin
**abû** kesê ku tûşî tecawuzê hatiye, hiltirandî, sihirandî
**abûr 1.** şerm û eyb **2.** ar û namûs
**-abûra yekî birin 1.** kesek hetikandin **2.** dest dirêjî namûsê kirin
**abûtî** rewşa kesê ku tûşî tecawuzê hatiye, hiltirandîtî, sihirandîtî
**aciz 1.** tengezar **2.** canbêzar **3.** cangiran *"mêvan ji mêvên **aciz** e, xwediyê malê ji her duyan aciz e"
**aciz bûn 1.** tengezar bûn **2.** jê bêzar bûn **3.** cangiran bûn
**aciz kirin 1.** tengezar kirin **2.** canbêzarî kirin
**acizî 1.** nexweşî **2.** tengezarî **3.** canbêzarî

**acûr** kevirê kaxetît
**acûrfiroş** bazirganê kevirên kaxetît
**acûrfiroşî** bazirganiya kevirên kaxetît
**acûs** kirêt
**acûsî** kirêtî
**açixî 1.** gotin û kirina acizker **2.** tinazeyên ku xîreta mirovî dişkînin
**-açixî dan 1.** bi awayekî acizker axaftin **2.** xîreta yekî şikandin
**adan 1.** xwarinên ji şîr **2.** xiza û xurek **3.** xêr û ber
**adanî** bi xêr û ber
**adar** meha sêyemîn a salnameya zayînî ye *"**adar** e, mirovî dike dar e"
**adav 1.** îltihab **2.** amas
**ade [I]** paqijkirina çandiniyê ji giyayên bêkêr; kax, aşêf
**-ade kirin 1.** kax kirin **2.** dapîtin **3.** çiqil kirin
**-adekirî** zevî, çem an jî baxê ku ji giyayê ziyandar hatiye paqijkirin
**ade [II]** mêrga levenan
**Adem** bav û kalê mirovan ê yekemîn
**-Adem û Hewa** dê û bavên mirovahiyê yên yekem
**ademîzad** mirov
**ader 1.** esîlza **2.** torin
**aderî 1.** esîlzatî **2.** torinî
**adetkî 1.** li gor rayîşa civakê **2.** bi rêbaz *"def jî **adetkî** lê dikeve"
**adil** dadwer
**adil bûn** dadwer bûn
**adir** nexweşiya tayê
**adî 1.** giyandarên biçûk ên jehirdar ên wekî dûpişk û kevjalan **2.** dirinde
**adodik** hesinekî devzirav û devtûj ê ku bi destikekê darî ve ye ji bo deranîna kengir û serikên giyayên xwarinê tê bikaranîn; kartûsk
**adroyî** kesê ku bi nexweşiya tayê ketiye
**afandin/diafîne/biafîne 1.** aşofandin **2.** vepelişandin
**aferîde 1.** afirandî **2.** mexlûq **3.** çêbûyî
**aferîn!** bijî!
**afet 1.** bobelat **2.** karesat
**afir** di tewleyan de cihê ku xwerina sewalan tê de tê danîn *"**afir**ê gamêşan, bû warê qelsemêşan"
**afirandin/biafirîne/biafirîne 1.** xuliqandin **2.** çêkirin
**afirîn/diafire/biafire 1.** çêbûn **2.** pêk hatin
**afirandî 1.** mexlûq **2.** sazbûyî
**afirîner** kesê ku çêdike

û pêk tîne
**afret** jin, pîrek, kulfet
**aftawe 1.** tawe **2.** boçesêlîn **3.** misîn
**agah** ageh
**agahî** agehî
**ageh 1.** hay **2.** nûçe **3.** peyam
**-pê ve ageh bûn** pê ve arxeyîn bûn
**ageh bûn 1.** hişyar bûn **2.** hest kirin
**agehdar 1.** xeberdar **2.** haydar **3.** pêhesiyayî *"dil, **agehdar**ê dil e"
**agehdarî 1.** danezan, îlan **2.** daxuyanî **3.** mehlûmat **4.** salix
**agehdar kirin 1.** pê hesandin **2.** xeberdar kirin
**agehker** kesê ku mirovî haydar û hişyar dike
**agehî 1.** zanîna resen **2.** xeber **3.** danezana ku ji aliyê dezgehên agehdarkirinê ve tên belavkirin
**agir** germiyeke bi reng, hilm û dûkel e, pileya wî bilind e û ji bo şewitandin, tîn û germê tê bikaranîn *"**agir** bi çiyan dikeve, ter û hişk tevî hev dişewitin"
**-agir pê xistin 1.** sotandin **2.** şewitandin **3.** agir dadan
**-agir dadan/hilkirin** ar pê xistin
**agirber** çeka ku diteqe
**agirbest 1.** agirkujî **2.** destvekişandina ji cengê
**-agirbest ragihandin 1.** agirkujî daxuyandin **2.** çekberdan beyan kirin
**-agir xistiye pêşa xwe** li fesadî û belayê digere
**-agir bi erdê keve gurzek pûşê wî jî naşewite** her di ewlehiyê de ye
**agirdiz 1.** pîşo **2.** barûd
**aheng** lihevanîn
**ahengdar** lihevhatî
**ahengsazî** karê lihevanînê
**aheste** hêdî
**ahên/ahînî** êş û azar
**ahû 1.** xezal **2.** ask
**aj** zîl, çêre û bişkuyên ku nû vedidin
**ajal** sewal, heywan
**ajaldar** sexbêrê sewalan
**ajalî** heywanî
**ajalnasî** zanistên ku pisporiya wan sewal in
**ajar 1.** nifş **2.** nesl
**ajarnas 1.** nifşzan **2.** nesebzan
**ajarnasî** zanistên ku pisporiya wan şêweyên çêbûna giyaneweran e
**ajawe 1.** hêwirze **2.** tedhîş
**ajawegêr 1.** hêwirzekar **2.** tedhîşkar
**aj dan** zîl vedan

**ajero** zîlên çêreyê ên nû
**ajinîn/diajine/biajine** **1.** êşîn **2.** tajan lê ketin
**ajneber** avjen
**ajne kirin** avjenî kirin
**ajo 1.** sedemkarê tevgerê **2.** paldêr
**ajotin/diajo*(dajo)*/biajo*(bajo)*** **1.** meşandin **2.** bi rê ve birin *"hemû keran, bi darekî **majo**"
**ajokar 1.** kesê ku diajo **2.** pîşekarê ajotinê
**ajût** gazî, bang
**ajûtin/diajû/biajû 1.** gazî kirin **2.** hawarî xwestin
**aîd** tiştê ku di bin sexbêriya kesekî de ye
**akam 1.** encam **2.** netîce
**akincî 1.** niştecihê sabit **2.** êwirî **3.** hewiyayî *“**akinci**yê bêrez, şivanê bêpez, peyayê dibêje: ez, ji tiştekî re nabin”
**akincî bûn 1.** bi cih bûn **2.** êwirîn **3.** hewîn **4.** sitirîn
**al** sorgevez
**ala 1.** nîşaneya serxwebûna gelekî; perçem **2.** bilind
**alagir** perçemgir
**alagoşk** girêkên goştî yên ku ji ber zekemiyê di qirikê de çêdibin
**alakêş** kese ku perçemê li pêş dikêşe, perçemkêş
**alale** cureyekî gulên sor e
**alandin/dialîne/bialîne** **1.** pêçandin **2.** paçik kirin **3.** dorpêç kirin
**alandî 1.** dorpêçkirî **2.** pêçandî
**alastin/dialêse/bialêse** ziman tê gerandin
**alaş 1.** çiqil **2.** kêran
**alaş kirin** serê banekî bi kêranan ava kirin
**alav 1.** holepît **2.** amûr **3.** alif
**alay** xwepêşandana di dêlindêzekê de
**alayîş** xwepêşandan
**alaz 1.** armanc **2.** degme
**alem** cîhan
**alemdar** cîhangir
**alemî** cîhangiştî
**alênc** çêrandina sewalan a piştî esrê
**alêsek 1.** tasdalêstî **2.** silek
**alif 1.** xwarina sewalan **2.** bertîl
**alif kirin 1.** xwarina sewalan dayîn **2.** bertîl dayîn
**alim 1.** zana **2.** pisporê zanistên şerîetê
**aliqandin/dialiqîne/bialiqîne 1.** hilawestin **2.** daliqandin
**aliqîn/dialiqe/bialiqe** **1.** banîn **2.** bilîn **3.** daliqîn
**alizandin/dializîne/bia-**

**lizîne 1.** li hev alandin **2.** tevlihev û dijwar kirin
**alizîn/dialize/bialize 1.** li hev alîn **2.** tevlihev û dijwar bûn
**alî 1.** teref **2.** tax **3.** şax *"li **ali**yekî şîn e, li aliyê din dawet e"
**alîgir 1.** terefgir **2.** tagir **3.** palpişt
**alîkar** kesê ku destyariyê ji kesekî din re dike
**alîkarî** destyarî
**alîkarî kirin 1.** li pişt yekî sekinîn **2.** jê re destyarî kirin
**alîkêş 1.** takêş **2.** bêhevseng **3.** nehinkuf
**alîn/diale/biale 1.** lê pêçîn **2.** tê gerîn **3.** bijinîn **4.** li dora tiştekî gerîn
**alînok** zeviya nokan
**alîsor** hirmî
**almast** cureyekî kevirên cewahir e
**almastî** cureyekî rengê gulê yî vekirî ye
**aloş** melaq
**aloşî** melaqî
**aloz 1.** tevlihev **2.** teqoze
**alozî 1.** tevlihevî **3.** teqozetî
**alû 1.** xidîna diranan **2.** sekihîn
**alû bûn 1.** *(diran)* sekihîn **2.** *(diran)* xidîn
**alûçe** fêkiyeke ku dişibihe gêlasê lê jê mezintir e
**alûle [I]** kolana berteng
**alûle [II]** bêar
**alûs** kaw û kibar
**alûsî** kawî û kibarî
**amade 1.** berhevkirî **2.** berdest **3.** hazir, eywez
**amade bûn 1.** berhev bûn **2.** hazir bûn, eywez bûn
**amadekar** kesê ku berhev û hazir dike
**amadekarî 1.** berhevkarî **2.** hazirî, eywezî
**amade kirin 1.** berhev kirin **2.** hazir kirin, eywez kirin
**amaje** elamet
**amaje kirin 1.** qise kirin **2.** behs kirin **3.** qal kirin
**aman 1.** derdan **2.** feraq
**amandank** cihê feraqdanînê
**amane [I]** armanca jiyanê
**amane [II]** xwediyê armanceke diyar
**amanşo** feraqşo
**amanşoyî** karê feraqşûştinê
**amar 1.** pisporiya zanistî ya hejmartina daneyan **2.** serjimar **3.** hesabdarî
**amas** îltihab û kêm
**amîn** Xwedayo Tu qebûl bikî! *"axêna **amîn**an, namîne li ser zaliman"

**amoj 1.** perwerde **2.** şîret **3.** şêwr
**amojgeh** saziya ku perwerde, şîret û şêwr lê tê dayîn
**amojin** jinap
**amojkar** pisporê perwerde, şîret û şêwrê
**amojkarî** pisporiya perwerde, şîret û şêwrê
**amraz 1.** amûr **2.** alav
**-amraza tawanê** amûra gunehkirinê
**-amrazên ragihandinê** alavên salixdanê
**amûr 1.** halet **2.** melzeme
**amûrsaz** lûlesaz
**amyar** wasite
**-amyara servekirî** erebeya dorvekirî
**-amyarên raguhastinê** wasiteyên neqliyatê
**an** ev jî dibe û a din jî dibe
**-an azadî, an pakrewanî!** heke huriyet tunebe, mirin çêtir e!
**-an na** heke wisa nebe
**angaşt** merc û şert
**angaşt kirin** merc kirin
**ango 1.** bi gotineke din **2.** yanê
**anix** cureyekî pûngê ye
**-anixa kûsiyan** cureyekî cehterê ye
**anîn/diîne(tîne)/bîne** ji dûriyê ber bi nêzîkiyê ve kêşan
**-anîn ziman** der birin
**anîşk** enîşk
**anor 1.** xîret **2.** şeref
**-anora yekî şikandin 1.** xîreta yekî şikandin **2.** şerefa yekî herişandin
**ap 1.** mam, birayê bavê mirovî **2.** peyveke rêzdariyê ya ji bo mêrên mezin
**apar** bêjinga ku hûr lê dike
**apincî** potikê çêrmînî yê bipûrt
**apore 1.** matmayî **2.** behitî **3.** qutifî
**aqar 1.** qad **2.** pîvan
**aqil** di mirovan de seheka têgihiştinê; hiş ***"**heta ku **aqil**ê paşiyê hat, ê pêşiyê çû**"**
**aqilmend** hişmend
**aqilmendî** hişmendî ***"aqilmendî,** tim mezinî ye**"**
**aqit 1.** dims **2.** doşav
**ar [I]** encama şewatê; agir ***"ar,** di qurmên kevn de ye**"**
**ar [II] 1.** şerm û eyb **2.** heya û ifet
**araq** eraq, mey, şerab
**arag** teral, lexer
**aram 1.** bihuzûr **2.** tebitî **3.** bisebir
**arambexş** aramdêr
**aramdêr** tiştê ku rehetiyê pêk tîne

**aramgeh 1.** warê ku lê huzûr tê dîtin **2.** cihê tenahî û aramîyê yê ku bêhtir ji bo gor û goristanan tê bikaranîn
**aramî 1.** îstiqrar **2.** asayîş
**aramxane** saziya ku kal û pîrên bêxwedî diêwirîne û wan xwedî dike
**aran** deşta germ
**arandin/dairîne/biarîne 1.** êşandin **2.** azar lê kirin **3.** niçandin **4.** geş kirin
**ararot** xwarina zarokên viringî; epik
**araste kirin 1.** hildan pêşberê **2.** lê rast kirin
**arastek 1.** xeml **2.** parçeyê ku bedewiyê dide tiştan
**arastin/diarêse/biarêse 1.** xemilandin **3.** çîç kirin
**arastî 1.** xemilandî **2.** çîç
**arav** ava qirêj a piştî şûştinê
**aravtin/diarêvîne/biarêvîne 1.** guvaştin **2.** ziwa kirin
**arayişt** xeml, zînet
**arçen** cihê ku her du hestiyên erzenê digihîne hev
**ard** zadê hêrandî *"**ard**ê xwe bêjing kir, bêjinga xwe bi dar de kir**"**
**ardelîn** di aşan de kulfika ku ard tê re dirije
**ardik 1.** ardê ku ber bêjingê maye **2.** binemaya darên qutkirî **3.** kakilê ku ji giyayê hişk daweşiyaye
**ardû** şewate *"dijminê **ardû**yê xwe, dostê nanê xwe ye**"**
**ardxavik** xarineke ku ji run û ardî tê çêkirin û şekir lê tê reşandin
**arek 1.** binema, bermayî, jêmayî **2.** kakilê ku ji giyayê hişk daweşiyaye **3.** binemaya darên qutkirî
**arengî** soring
**arezû** daxwaza ji dil
**arêx** sing
**argind** cihê ku agir lê dişixule, kûrika êgir
**argiştî** şah, key
**argo 1.** gotina şermê **2.** gotina bêaran
**argûn** rengê êgir *"ar dizane, **argûn** dizane**"**
**argûşk** girêkên goştî yên ku ji ber çilmasê di qirikê de hêşîn dibin
**arihandin/diarihîne/biarihîne** êşandin
**arizî kirin** milkiyeteke cemawerî li kesên taybet raspartin
**arî** xweliya piştî şewatê
**arîk 1.** tiştê ku bingehekê ava dike **2.** ji hun-

dir ve banê xênî
**-arîkê dêv** esmanê devî
**arîle** mêrê jinanî
**arînk [I]** cureyekî girînê ye
**arînk [II]** ardê nokan
**arînok** nokên hûrkirî, şikestî an jî hêrandî
**arîşe 1.** pirsgirêk **2.** mesele
**arîşen** rewşa derûnî
**arjing** bêjing
**arkolk** amûra ku pê agir tê hildan
**armanc 1.** hedef **2.** meqsed, niyêt
**arode 1.** teral **2.** jina gerok
**arode bûn** teral bûn
**arodetî 1.** teralî **2.** şûmî
**arqilîn/diarqile/biarqile 1.** tehisîn, pê şimitîn **2.** weşweşîn
**arsim** çilmas, bahor
**artêş 1.** hêza parastina rewa ya gelekî **2.** girseya keyskirî
**artîşok** sewzeyek e
**arû** xiyar
**arûng** mişmiş
**arvan** ard, zadê hêrandî *"**arvan**ê salê, di salê de diçe"
**arzeba** bayê demsalê
**arxwe** bûjena ku tê de hêza pêketinê heye
**arxweyîn 1.** bûjena ku xwediyê hêza pêketinê ye **2.** kesê bêminet û bêtirs
**asan 1.** hêsa **2.** nezexm û xeşîm **3.** besît *"kesibî **asan** e, di şilî û şoyiyan de dest û piyên wan ziwa ne"
**asanî 1.** hêsatî **2.** nezexmî, nexeşîmî **3.** besîtî
**asaw 1.** amas **2.** kêm û îltihab
**asayîş 1.** aramî **2.** ewlehî **3.** sukûnet
**asê 1.** zexm **2.** hevraz **3.** cihê destpêneketî
**asê bûn 1.** xitimîn **2.** lê banîn **3.** pêrgî hatin
**-asê kirin 1.** sekinandin, rawestandin **2.** vêsihandin **3.** mecbûr kirin **4.** dadan *"deriyê xwe **asê bike,** cîranê xwe meke diz"
**-asê man** arqilîn, egle bûn *"hindikî bide ber dasê, da ku tu **nemînî asê"**
**asik 1.** mîde **2.** hûr
**asîman** valahiya ku li fêza erdê ye
**asîtan 1.** hewş, derîzan **2.** gom **3.** pêşgir
**ask** xezal, ahû
**asmîn** cureyekî gulan e
**aso** cihê ku wekî nîgaşî erd û esman digihêjine hev; ufuq, şefeq
**asogeh** şefeqa dawîn, fecra sadiq

**asraq** arîk
**ast 1.** merhele **2.** rade
**Astan [I]** gerestêrkek e
**astan [II]** herêm, dever
**astar 1.** betan **2.** binmitêl
**-astar ji rû bihatir bûn** mesref ji nirx zêdetir bûn
**asteng** berbend *"**asteng** bê derence nabin"
**asûde 1.** aramdar **2.** tebitî
**asûq** alava danûstanê
**aş [I]** xwarin, xurek
**aş [II]** amûreka hêranê ya ku bi hêza av, ba, agirî û bi zivirîna du berên girover ên li ser hev dixebite *"**aş** bi xeyalekî, aşvan bi xeyalekî"
**aş [III] 1.** tebitî **2.** sitirî **3.** êwirî **4.** teliyayî
**-aş bûn 1.** tebitîn **2.** sitirîn **3.** êwirîn **4.** telîn
**aşêf** verûtina çêreya bêkêr; kax
**aşêf kirin** kax kirin *"aqil tune kêf dike, pembo tune **aşêf dike**"
**aşik 1.** mîde, asik **2.** hûr
**aşiq 1.** evîndar **2.** dengbêj *"dew li **aşiq**an na-yê"
**aşiyan** cihê lîsvedana çivîkan; hêlîn
**aşîna** nas
**aşît** şepe, renî
**aşkart 1.** îsbat **2.** birhan
**aşkartin/diaşkêre/biaşkêre 1.** îsbat kirin **2.** delîl nîşan dan
**aş kirin 1.** tebitandin **2.** sitirandin **3.** hewandin **4.** êwirandin
**aşofandin/diaşofîne/biaşofîne 1.** westandin **2.** bizdandin
**aşop 1.** xeyal **2.** nîgaş
**-aşopa zanistî** xeyala ilmî, nîgaşa zanistî
**aşopî 1.** nîgaşî **2.** xeyalî
**aşpêj** xwarinpêj
**aştî** sulh, lihevhatin
**-aştiya civakî** aramiya di nava gel
**aştîperwer** aştîxwaz
**aştîxwaz** kesê ku li sulhê digere û bi aliyê din re li hev tê
**aşûjin** ta, bend
**aşvan 1.** xwediyê êş **2.** kesê ber êş *"**aşvan**ê aşê mîran, bi xulam e"
**aşxane** xwaringeh
**atûn 1.** kils **2.** kilsxane
**av** şileyeke bêtahm, bêreng, û bêbêhn e, li gorî amanê teşe digire û kurteya wê ya kîmyayî H2O *"**av,** bi bêjingê nayê civandin"
**-av di gunikên wî de wergeriyaye** avik li şekokên wî geriyaye û balix bûye
**-ava mend** avegenî
**-ava reş** nexweşiyeke ça-

van e
**-ava reş bi çavan de hatin** kor bûn, nedîtin
**-ava spî** nexweşiyek e
**-ava tezî** ava sar
**-av palavtin** bi pîneyekî tenik av paqij kirin
**ava 1.** sazbûyî **2.** lidar **3.** lipiyan *"dergehê ku jinan xera nekiriye, hîna jî **ava** ye"
**ava bûn 1.** saz bûn **2.** çêbûn *"**avabûn**a malan, di destê jinên çê de ye"
**avadan 1.** sazbûyî **2.** lidar, lipiyan **3.** çêbûyî
**avahî 1.** cihê sazbûyî **2.** înşaet **3.** bîna *"ava û **avahî** nav û nandayî"
**ava kirin 1.** saz kirin **2.** jenîn **3.** çêkirin
**avan 1.** eware **2.** bêkêr
**avanî [I] 1.** ewaretî **2.** bêkêrî
**avanî [II]** *(r)* aliyê sazbûnê yê lêkerê
**avasaz** endazyarê avahiyan; mîmar
**avasazî** endazyariya avahiyan; mîmarî
**avbijînk** alava ku ava xurt dibijîne der û dorê
**avda** pirç, mû, pûrt
**av dan 1.** av lê dan vexvarin **2.** bi avê têhnî şikandin
**avdel** kesê ku avê li ser zevî û bîstanan belav dike
**avderge** cihoka avê
**avdest** destnimêj
**-avdest girtin** destnimêj girtin
**avdestxane** destşok
**avdonk** ava goştê kelandî
**avder** avîvan
**avdew** çelqemast
**avêtin/diavêje/biavêje 1.** hilfirandin **2.** li ba kirin **3.** tê werkirin *"bênamûsî **avêtine** ber kûçikan, kûçikan jî qebûl nekir"
**-avêtina ber hev 1.** devjenî **2.** belapêşkarî
**-avêtina ser** êrîşa ji nişkê ve
**avgîz 1.** cûniyê avê **2.** çala avê
**avik** tovê nêrtiya mirov û ajalan; menî
**avilk** peqpeqikên biav ên ku ji ber karkirinê an jî rêveçûnê di dest û piyên mirovî de peyde dibin
**avis** sewala ku gon xwariye û têjik di zik de çêbûye *"bila rê be, bila dûr be; bila bihur be, bila kûr be; bila keç be, bila pîr be; bila **avis be,** bila bi derengî be"
**avis bûn** *(ajal)* heml girtin/ber girtin **2.** *(mirov)* canbêzarî bûn
**avis kirin 1.** *(ajal)* hami-

le kirin **2.** *(mirov)* canbêzarî kirin
**avî** avdar, biav *"baran, li cihê **avî** dibare"
**avîje** paqij, pakîze
**avîvan** **1.** kesê avê li ber mêvanan digerîne, avder **2.** navekî keçan e
**avjen** melevan
**avjenî** melevanî
**avjenî kirin** soberî kirin, melevanî kirin
**avkozkî** rîzîna rehekan ji ber avdana pir
**avkozkî bûn** *(rehek)* ji ber pir-avdanê rizîn
**avpalêv** alava palavtina avê
**avpîv** alava pîvandina asta avê
**avrêj** destşok
**avşile** dimis, doşav
**avzêm** kaniya demdemî
**avzêr** ava ku bi zêr ve tê rengdarkirin
**avzêr kirin** ji ava zêr re derbas kirin
**avzûng** xeleqa serê kemberê ya ku pê tê girêdan
**awa** celeb, cure *"ji dê û bavan, dikevin hezar **awa**"
**awan** fitnebaz, dekbaz
**awar** helew, şirînahî
**awarte** **1.** mustesna **2.** neasayî
**awartin/diawêre/biawêre** **1.** bi dûr xistin **2.** tuneyî hesibandin
**awat** **1.** umîd, hêvî **2.** xwestek
**awaz** deng, sewt
**awêne** **1.** neynik **2.** eşkere **3.** kifş
**awilandin/diawilîne/biawilîne** xapandin
**awilîn/diawile/biawile** xapîn
**awir** nêrîn *“ne nanê mazûvanan, **awir**ên wan tê xwarin”
**-awir tê vedan** di bin çavan ve lê nihêrtin
**ax [I]** baneşana keserê
**ax [II]** **1.** xwelî **2.** xak *"**ax** û avahî, nav û nandayî"
**axa** **1.** serekê êlekê **2.** torin
**axaftin/diaxive/biaxive** **1.** xeber dan **2.** peyivîn **3.** qise kirin **4.** qal kirin
**axatî** **1.** serokatiya êlekê **2.** torinî
**axirî** **1.** dawî **2.** encama karekî *"**axirî,** heta derê gorê ye"
**axivîn/diaxive/biaxive** **1.** *(birîn)* ji nû ve vejîn **2.** terqîn **3.** bijiqîn
**axîn** **1.** keserkişandin **2.** nalîn
**-axîn kişandin** **1.** nalîn **2.** zûrîn **3.** kesirîn
**axund** mela

**axze** alava bihîstok
**aya** gelo
**ayende** pêşeroj, dahatû
**ayet** gotinên Xwedê
**ayn** ayîk *"**ayin**ê bizina kol, ji ya bi qloç re namîne"
**ayisandin/diayisîne/biayisîne** **1.** pê ve kirin, zeliqandin **2.** pê xistin
**ayisîn/diayise/biayise** **1.** pê ketin **2.** pê ve bûn, zeliqîn
**ayîk** **1.** heyf **2.** mezlûmtî **3.** belezûrî
**ayîn** dêlindêza olî
**aza [I]** **1.** hur **2.** serxwe û xwebûyî **3.** mêrxas û egîd **4.** çeleng û dilawêr
**aza [II]** **1.** her endamekî cendêk **2.** endam, namzed *"**aza**yê bitirs, bila qet tunebe"
**azad** **1.** ne kole **2.** serbixwe **3.** hur **4.** bêqeyd û bêbend **5.** serdanpê bêpeywend
**azadî** **1.** serbixwetî **2.** huriyet
**azadîxwaz** **1.** kesê ku serxwebûne dişopîne **2.** kesê ku mafên xwezayî dixwaze
**azan** ezan
**-azan xwendin** bangî nimêjê kirin
**azar** **1.** renc û dilmayîn **2.** şermezarî *"mirovê derdomerdo**,** bi **azar**a derdan dizane"
**azeb** kesê ku nezewiciye *"**azeb**ê malê xwe be, paşê yê xelqê be"
**azgîn** azwer
**azî** **1.** nexweşî **2.** bêhalî
**azî kirin** **1.** nexweş bûn **2.** bêhal bûn **3.** aciz bûn
**azîne** **1.** rêbaz **2.** rêpîvan
**-azîneya axaftinê** rêbaza xeberdanê
**azmûn** îmtihan
**-azmûna jiyanî** îmtihana man û nemanê
**azmûn bûn** **1.** îmtihan bûn **2.** ceribîn **3.** di karekî de pijîn
**azmûn kirin** **1.** îmtihan kirin **2.** ceribandin **3.** sergihayî kirin
**azwer** çavçil
**azwerî** çavçilî

# B

**b/B** tîpa duyemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke lêvkî ye, awayê belavkirina wê girtî û nerm e
**ba [I]** nexweşiya qolinckî
**ba [II]** tevgera hewayê *"agir berda kayê, xwe da ber **ba**yê wê"
**-bayê weşt** cureyekî tevgera hewayê ye
**-ba li ber guhan ketin** pê hesîn lêbelê baş tê negihiştin
**-ba hatin** hewa tev gerîn
**-ba lê anîn 1.** firsend jê standin **2.** desteser kirin
**ba [III]** hind, cem, nik *"**ba** comerdekî, hespek û qespek yek in"
**ba [IV]** tir û fis
**-ba li ber ketin** tir an jî fis kirin
**babelîç** tiliya gustîlê
**babelîsk** bayê dijwar û hêzdar ê ku dizivire û ziyanê digihîne dorhêlê
**babet 1.** mijar **2.** mesele **3.** cure
**babfile 1.** kesê ku bi darê zorê misilman bûye **2.** misilmanê ji dê û bavekî kafir
**babidest** kesê ku îflas kiriye; malketî
**babidestî** rewşa îflaskirinê;malketîtî
**babir** berbendên ku tundiya bayî dişkînin
**babîsok** bayê ku lûlekî qulozî esmên dibe
**bac 1.** kamçûr **2.** diravê ku ji welatiyan tê wergirtin û ji bo pêşniyarên neteweyî tê mezaxtin; xerac **3.** xûgî
**-baca neyekser** xeraca veşartî
**-baca yekser** xeraca eşkere
**bacana reş** sewzeyek e û pijandî tê xwarin
**bacana sor** sewzeyek e û hem pijandî hem jî nepijî tê xwarin
**bacgeh** rêvebiriya bacê
**bacgir** karmendê bacgehê
**baçermok** sewaleke kor a şevê ye; çilîçilî
**baçik** cixare
**bad** ba
**badan/badide/bade 1.**

tewandin **2.** qurifandin **3.** qurçimandin
**badayî** tewandî
**bade 1.** cureyekî vexwarina kiholî ya ku ji tiriyan tê çêkirin û reng wê sor an jî spî ye; mey, şerab **3.** piyale
**badefiroş** meyfiroş
**badek [I]** çêreyek e
**badek [II]** alava şidandin û sistkirina mixên badayî *"**badek**a hesinî, xwe bi xwe pesinî"
**badek [III]** paçikeke kaxezên ku di nav bergekî de tên parastin
**badîn 1.** qedeh **2.** îskan
**badok** di tirimpêlê de destikê ku pê ajotin rasterê dibe
**bafe** baq, deste
**-bafe kirin 1.** baq kirin **2.** deste bi deste girêdan
**bafik** behane
**bafirok** pêlîstoka zarokan a ku bi ser bendekî ve dikin û berî hewa didin
**bafûn** bafûr
**bafûr** madenekê ku jê amanên malê û hwd tên çêkirin
**bager** bayê zexm û boş
**bagêje** bayê ku lûlekî quloz dibe, babelîsk
**bagird** bagêje
**bagurdan** bangurdan "banek û **bagurdanek**"
**bah** şehwet
**bahî** bişehwet
**bahol** derdana ku rêwî kel û melên xwe dikinê
**bahor** zekem, çilmas
**bahorî** zekemî, çilmasî
**bahoz [I]** firtonek
**bahoz [II]** kesê bêqerar
**bajar** şarê ku ji gundan û navçeyan mezintir e *" tu çûyî **bajarê** yekçavan, divê tu jî çavekî xwe bigirî"
**bajaravahî** bernamekirina binyadên bajaran
**bajarî** kesê ku li bajêr dijî *"**bajarî,** li erdê narî"
**bajarî bûn** di şarekî de li gor pîvanên wê jiyîn
**bajarok** bajarê biçûk
**bajarsazî** avasaziya binyadên bajêr
**bajen** baskê ku bi hejîna wî bayekî hênik pêk tê
**bajêle 1.** newan **2.** axozî
**-bajêle bûn 1.** newan bûn **2.** axozî bûn
**bakir** cureyekî civîkan e
**bakur** aliyê jorîn ê her tiştî
**bakure** gopal
**bal [I] 1.** zêhn **2.** dîqet **3.** têkilî
**-bala xwe dayîn** lê hûr bûn, baş lê nihêrtin
**-bal kişandin 1.** li serê rawestîn **2.** lê miqate bûn

**bal [II] 1.** çeng, per **2.** rex, alî
**bal [III]** bejn
**bala** bilind, berz
**balaban [I] 1.** nehs **2.** şûm
**balaban [II]** amûreke mûsîqayî ya ku bi pifkirinê tê lêxistin
**balaberz** bejnbilind
**balafir** navgîna hewayî a ku difire; teyare
**balafirgeh** qada firîn û niştina teyareyan
**balafirşikên** çeka ku dijî teyareyên cengê tê bikaranîn
**balandin/dibalîne/bibalîne** lê alandin
**balanî** gizgizîka tayî
**balax** têjika gamêşê
**balbas** zêrevanên zome an jî xîvetgehan
**baldar 1.** bidîqet **2.** bisemt **3.** bitevdîr
**baldirêj** bêhnfireh
**baldiz 1.** cazibedar **2.** xemrevîn
**baldizî 1.** cazibedarî **2.** xemrevînî
**bale 1.** kêmaqil **2.** bodele
**balexane** xanûmanên pirqatî yên pir bilind
**balgeh 1.** piştek **2.** berserî, balîf
**balinde** teyrên dirinde
**-balindeyên goştxur** firindeyên girs ên ku xwarina wan goşt e
**balix [I]** cihê ku kewarên mêşhingivan lê tên danîn
**balix [II] 1.** gihiştî **2.** berpirsiyarê ber qanûnê
**balî** barê girêdayî
**balîf** balgeh *"serê du meriyên çê, naçe ser **balîf**ekî"
**balkêş 1.** sosret **2.** cazibedar
**balkêşname** nameya ku pêhesandin û hişyarkirinê; îxtarname
**balkon 1.** eywanka ser banî **2.** şanişîn
**balor** merdane, loq
**balsivik 1.** kesê hay ji xwe heye **2.** kesî ku bîra wî xurt e **3.** hişyar
**balûle 1.** bi awayê lûlekî pêçayî **2.** hop
**balûr** herş û qelşên ku li ser lêş pêk tên
**balyoz** nûnêrê dûgelekî li nik yeke dîtir; sefîr
**balyozxane** nûnergeha dûgelekî ya li nik yeke dîtir; sefaret
**ban** serê xênî *"**ban**ê xênî, bi keviran tenê bilind nabe"
**banandin/dibanîne/bibanîne 1.** hîn kirin **2.** nav tê dan
**bandev 1.** firtoneka berfê **2.** kuleka bi ser ba-

nê avahiyan ve

**bandêr** makîneyeke ku wekî bangurdanan e pê xişirê rê û kolanan tê tepisandin

**bandor** tesîr, eser

-**bandor lê kirin** lê tesîr kirin, lê eser kirin

**bandorker** tesîrker

**bane [I]** sewala malê ya ku li têjika xwedî derdikeve û ne newan e

**bane [II] 1.** çêregeh **2.** zozan

**banedar** xwediyê çeregeh an jî zozanê

**baneşan** *(r)* peyvên ku peroşî, şaşwazî û xweziyan nîşan didin

**bang 1.** gazî **2.** ezan

-**banga meleyê biharê** zirîna keran

-**bang dan** ezan xwendin

-**bang lê kirin** gazî kirin

**bangawazî 1.** vexwendina bi deng **2.** hawarî

**bangeşe** kar û barê nasandina raman û hilberînekê

**bangêr** koma mezin *"barana nîsanê, çêtir e ji **bangêr**ek zêrê zerê li meydanê"

**bangîn 1.** sewtsewtok, qîrqîrok **2.** awazbilind

**bangurdan** kevirekî dûvdirêjkî û girover ê ku li ser axebanan digerînin da ku baş bitepise hev û ew ban dilop neke *"ji **bangurdên** girantir bi ser çûkê de tu tişt nayê"

**banî 1.** jor **2.** serê xênî **3.** rastahiya li serê kêrtekî *"av ji kaniyê û nan ji **bani**yê"

**banîje** qatê ser banê xênî

**banîn/dibane/bibane 1.** hîn bûn **2.** lê hatin **3.** lê mukur hatin

**bankutik [I]** mizgînî

**bankutik [II]** bangurdan

**banû 1.** xanim **2.** stî

**banz dan** baz dan

**banzdok** berava berteng a ku mirov dikare bi ser re baz de aliyê din

**baperik** perperok

**bapêç** bayê bi berf

**bapêş** zekem, bahor

**bapîr** kalik

**bapîv** amûra ku tevgera hewayê dipîve

**baq 1.** defşe **2.** deste **3.** çûm **4.** gurz *"bi xweziyan, dest nagihê-je **baq**ê keziyan"

**baqilk 1.** cureyekî çêreya ku tovên wê kelandî tên xwarin **2.** berên vê çêreyê

**bar 1.** piştgiranî **2.** peywir **3.** berpirsî

-**barê lokan** mesûliyeta giran

-**barê xwe jê dagirtin**

xwesteka xwe jê hildan
-**bar ji ser xwe avêtin** berpirsiyariya ku wergirtiye kuta kirin
-**bar kirin 1.** bi pişt kirin **2.** neqil kirin
**baran 1.** şilî **2.** bariş *"gur ji **baran**ê bitirsiya, dê ji xwe re kurk çêkira"
-**barana kûsiyan** barana ronîvro ya di sayiyê de
-**barana roviyan** barana xapînok a ku hey dibare û hey disekine
**barandin/dibarîne/bibarîne 1.** şilî rijandin **2.** tiştek bi ser de rijandin
**baranî** kinca ku di şiliyê de tê lixwekirin
**baravî** şiloziwa
-**baravî bûn** bi nîvî ziwa bûn
**barbir** wasite, amyar
**barbû** xêr û alîkarî
-**barbû dan hev** destyarî berhev kirin
**barçêrmk** cureyekî firindeyên şevê yên bêçav û bêhestî ne; baçermok
**bardan** derdanê mezin, telîsê fireh *"**bardan**ê biqul, pîneyî nagire"
**bare 1.** babet, mijar **2.** car, teql
**baregeh 1.** êwirgeh **2.** qerargeh **3.** wargeh
**barek [I]** cebirxane
**barek [II]** qatên valahiya seqayê
**bareng** karistana hilberîna keştiyan
**bareş** bayê rojhilatê
**barfisk** teşkên lingan
**barim barim** lîstikeke zarok û xortan e
**barimte** desteseriya ji ber berdêlekê ve
**barimte kirin** *(heta ku berdêla xwastî bê dayîn)* desteser kirin
**barist** di cendêk de hêza helandina xwarinan
**bariş** şilahiya ku ji esmên dibare
**barîdox 1.** temtêl **2.** werz **3.** rewş
**barîn/dibare/bibare [I] 1.** şilî rijîn **2.** bariş hatin **3.** bi ser de rijîn *"adar e, **bibare** nebare xedar e"
**barîn/dibare/bibare [II]** *(sewal)* qajîn
**barkêş 1.** kesê ku giraniyekê bi pişt dike, hemal **2.** sewala ku baran pişt dike
**barname** kaxeza ku naveroka wê di heqê bar û xwediyê wî de agahiyê dide; îrsaliye
**barû** avahiya tot û dirêj a ku ji bo payînê tê avakirin

-**barûya naqosê** di dêran de cihê ku zêngil tê de hildiawêsînin

**barûd** bûjeneke ku jê teqemenî tên çêkirin; pîşo

**barxane 1.** erzaq û pêdiviyên rêwiyan **2.** embar

-**barxaneya leşkerî** erzaq û pêdiviyên leşkerî yên ku endamên yekîneyê bi xwe re dibine derveyî leşkergehê

**basark** alava ku hewaya sar diweşîne

**basîret 1.** feraset **2.** aqil û sirafet

**bask 1.** endamê firindeyan ê ku pê perwaz digirin; per **2.** çepil, mil *"her teyr bi **bask**ên xwe difire"

-**bask şikestin** bêqudûm man

-**bask tune ku pê bifire** pir kêfxweş bûye û perê wî tune ku hilperike esmanan

**basko** çivîka rûçikandî

-**basko kirin 1.** kurtisandin **2.** rûçikandin

**bastêq** pestîlê ku ji tiriyan tê çêkirin

**bastûr** avahî

**baş 1.** çak **2.** qenc **3.** rind **4.** delal *"xebera xweş bi cîranan re, faydeya **baş** bi nasan re"

**başebaş 1.** bi rêk û pêk **2.** riprast

**başî 1.** çakî **2.** qencî **3.** rindî **4.** delalî

**başok** balindeyek e

**başûr 1.** aliyê jêrîn ê her tiştî **2.** di erdnîgariyê de berê derziya qiblenameyê

**batirsok** potikên ku bi bi ser dîwarê bostên ve dikin da ku sewal jê bitirsin û nekevinê; reşe

**batî** hêlik, gun

**bav 1.** mêrê diya mirovî **2.** giyanewerê ku ji avika wî giyanewerên din çêdibin *"mala bavê, mala **mêran** e"

-**bavê bêkesan** sexbêrê belengazan

-**bavê xwe nas nekirin 1.** şîrheramî kirin **2.** ji bo mesleheta xwe tixûb nas nekirin

**bavik** ecdad

**baviksalarî** erka ku tê de bav bi bandor e; pederşahî

**bavmarî** zirbav

**bavtî 1.** nêrtiya ji bo diya giyaneweran **2.** sexbêrî

-**bavtî kirin 1.** ji diyê re nêrtî kirin **2.** lê xwedî derketin

**bawerî 1.** îman **2.** ewlehî *"**baweri**ya kurdan, her

bi çiyê tê"

-**baweriya te bi Xwedê hebe** Yezdanê dilovan şahid be ku...

-**bawerî pê anîn** pê ve ewle bûn

**bawer kirin 1.** îman kirin **2.** pê ewle bûn *"agir kete mala derewînan, kesî jê **bawer nekir"**

**bawermend** kesê îmankirî, misilman

**bawesîr** nexweşiyeke çêrmî ye û bi sedema wê laş her dixwire

**baweşandin/dibaweşîne/bibaweşîne 1.** ber bi ba kirin **2.** bajen kirin

**baweşînk** bajen

**bawî** kesê ku qolinceke daîmî di laşê wî de heye

**bawîşk 1.** berxewarî **2.** nîşaneyên xewê, palûşk *"sal, mîna **bawîşk**an derbas dibin"

-**bawîşkê xwe anîn** rewşa xewê lê xuya bûn

**bax** qada dorgirtî ya ji darên fêkiyan pêkhatî *"çi diçe ji **bêx** diçe, ji baxvên çi diçe?"

**baxçe 1.** baxê biçûk **2.** hewşa cihekî

**baxçevan** kesê ku di hewşên malan an jî baxên biçûk de dixebite

**baxçevanî** karê hildan û danîna baxçeyan

**baxvan** kesê ku bi baxê fêkiyan re mijûl dibe

**baxvanî** karê hildan û danîna baxan

**baxweşk** di xaniyan de pergala ku hewaya hundir bi ya derve re diguherîne

**baz [I]** cureyekî balindeyan e *"qaz, bi refa xwe re **baz** e"

**baz [II]** masûlkeyên di navbera enîşk û sermilên mirovan de

**bazar 1.** danûstan, kirîn û firotan **2.** sûq *"bi merivê merivan re **bazar** nabe"

-**bazara xwe birîn** têkiliyên xwe ji hev qut kirin

-*(ketin)* **bazara macîrok û gumgumokê** mebesta alîkarî an jî dijberiya xwe nîşan dayîn

**bazargeh** sûqa kirîn û firotinê; erase

**bazar kirin 1.** xêr kirin **2.** li ser nirxekî li hev kirin *"hesp tune, alifê **bazar dike"**

**bazbend 1.** toqeya milê berpirsiyaran a ku peywira wan nîşan dide **2.** nivişta mil

**baz dan 1.** revîn **2.** qewz kirin **3.** gav kirin **4.** bezîn

**bazgeh 1.** bihura derbasbûn an jî têketinê ya mirov û giyandaran **2.** di bajaran de xalên ewlehiyê yên ku ketin û derketinê dipê

**bazin 1.** mildank **2.** xeleqa milan **3.** qeydik

-**bazinê stûyî** tara stûyî; katar

**bazirgan** kesê ku hem firoşkariyê hem jî kiriyariyê dike; tacir *"didu karwan in, sisê **bazirgan** in"

**bazirganî** karê kirîn û firotanê; ticaret

-**bazirganiya azad** ticareta bêbac a ku hinarde û hawirde bi awayekî tê de serbest digerin

-**bazirganiya beste** ticareta ku mercên giran li ser hinarde û hawirdeyê hene

**bed 1.** xerab **2.** nebaş

**bedbext** bêhuzûr

**bedbîn** kesê ku nîgaşa wî her tim neyînî û nebaş e

**beden [I]** laş

**beden [II]** sûr

-**Bedenên Amedê** sûra dîrokî ya li dora Amedê

**bedenparêzî** perwerdekirina laşan li gor rayîşeke werzîşî û xwarineke diyar

**bedestan** sûqa ku ser û dora wê girtî ye

**bedew 1.** rind, delal **2.** zerî *"**bedew**ê çav kil kir, dilê xortan kul kir"

**bedewî** rindî, delalî *"**bedew**iya mirovî, ilm û mehrifeta mirovî ye"

**bedgeh** kêrtik

**bedil** kincên xizmetkirî

**bedreng 1.** rengê gewrotankî **2.** rengê xerab

**bedrengî 1.** gewrotankîtî **2.** rengxerabî *"her **reng** rengek e, bedrengî jî rengek e"

**bedxwarin** xwarina dûrî rêbazên tenduristiyê

**bedxwaz 1.** xêrnexwaz **2.** niyêtxerab

**beg** axayê binemalê an jî hozê

**begtî** serokatiya binemal an jî hozê

**beh** *(di zimanê zarokan de)* xelasbûyî, qediyayî

-**beh bûn** *(di zimanê zarokan de)* xelas bûn, qedîn

-**beh kirin** *(di zimanê zarokan de)* xelas kirin, qedandin

**behane** hincet, mehne *"**behane**ya tirekan, ardê cehîn e"

**behicandin/dibehicîne/bibehicîne 1.** qehirandin **2.** ji qehran teqandin

**behicîn/dibehice/bibe-**

**hice 1.** qehirîn **2.** ji kerban teqîn *"çi wext giriya û çi wext **behicî?"**

**behî** *(da ku xelq bên ser xweşiyê li malbatê bikin û nizaya bihiştê ji miriyê wan re bikin)* danîna civatan ji aliyê xizmên kesê mirî ve; şînî

**behîn/dibehe/bibehe 1.** *(ceh û genim)* stewîn **2.** *(giyayê werza payîzê)* zer bûn *"giya li ser binê xwe hêşîn dibe û li ser binê xwe jî **dibehe"**

**behîv** cureyekî daran e û ji dendikên wê sûd tê wergirtin

**behr [I]** zerya, derya *"**behr,** bi devê san pîs nabe"

**behr [II]** par, beş *"dinya bi tiran bûya, dê hemû **behr**a keran bûya"

**Behram** gerestêrk e

**behre 1.** kelk û sûd **2.** berjewendî **3.** par

**behreme** alava qulkirinê; metqeb

**behremend 1.** xwedî-qabiliyet **2.** jîr **3.** sûdwer

**behremendî 1.** jîritî **2.** sûdwerî

**behs kirin 1.** jê xeberdan **2.** qal kirin

**bej** reşahiya erdê, cihê ku ne avî ye

**-hêzên bejahiyê** koma desteyên ku qada çalakiya wan reşahiya erdê ye

**bejavî 1.** ajalê ku hem di avê de hem jî li ser zevînê dijî **2.** navgîna ku hem di avê de hem jî li ser rûyê erdê tê ajotin

**bejî** tiştên ku têkildarî reşahiyê ne

**bejn 1.** qam **2.** bal **3.** hindam *"aqil ne li **bejn**ê ye, li serî ye"

**-bejn tît e, mal mescîd e** hem li ser û sîçeyê xwe dinihêre hem jî li rewşa mala xwe

**bejnaferî** bejna ku bi nazdarî dimeşe

**bejnbihust** qamkinik

**bekere** alava ku newayên mûsîqayî tomar û qeyd dike

**bel 1.** kifş **2.** lipêş **3.** diyar

**bela 1.** qeza **2.** qiraskê sêrî **3.** karesat *"di her tiştî belayek heye, lê di paşxistinê de gelek **bela** hene"

**-bela xwe kiriye ber dêrî** ketiye keleha qatilbatilê

**belalûk** fêkiyek e û dişibihe gêlasê lê jê hûriktir e

**belam 1.** lêbelê **2.** lê
**belapêşkar** kesê ku bela jê tê
**belapêşkarî 1.** belagerî **2.** rewşa belagerînê
**-belapêşkarî yekî bûn 1.** belaya xwe bi yekî gerandin 2. xwîna xwe kirin stûyê yekî
**belaş [I] 1.** fireh **2.** poşe
**-belaş bûn 1.** fireh bûn **2.** poşe bûn
**-belaş kirin 1.** fireh kirin **2.** poşe kirin
**belaş [II] 1.** herwe **2.** bêdirav
**-belaş bûn 1.** herwe bûn **2.** bêdirav bûn
**-belaş kirin 1.** herwe kirin **2.** bêdirav kirin
**belav** ji hev dûr
**belav bûn** li der û dorê weşîn, ji hev dûr ketin *"av rabû sikir û bend **belav bû"**
**belavker 1.** kesê ku karê tiştekî parvekirî tîne cih **2.** bazirganê ku peywira wî belavkirina bûjenan e
**belav kirin 1.** par ve kirin **2.** teqsîm kirin **"**bi kevçiyan da ber hev, bi hesikan ve **belav kir"**
**belavok** daxuyaniya nivîskî ya ku bi destan tê radestkirin
**belawela** tartarî, tarovaro *"hêştir **belawela** diçêrin, lê guhê wan li ser hev e**"**
**belawela bûn 1.** tarovaro bûn **2.** kambax bûn **3.** wêran bûn
**belawela kirin 1.** tarovaro kirin **2.** kambax kirin **3.** wêran kirin
**belbele** hêwirze û sûresata dengan
**belç** pelên daran *"ba neyê, **belç** nalivin**"**
**belçim** belç
**belçik** belçimên hûrik
**belbelîtank** perperok, kerkene
**bel bûn 1.** bi awayekî diyar tijî bûn **2.** vît bûn *"bila zikê melayî **bel be,** bila giya û pel be**"**
**beleban 1.** zinar **2.** şûm
**beled 1.** zana **2.** pispor *"**beled**ê malê ne biyan e, kesê ji gund e**"**
**beledî [I]** berq û birûsk
**beledî [II] 1.** zanatî **2.** pisporî
**belek 1.** deqdeqî, xalxalî **2.** rengrengî
**belekî** rengrengîtî *"**belekî**ya sewalan li derve ye, ya mirovan di hundir de ye**"**
**-belekiya biharê** destpêka zîlvedana hêşînahiyê
**belekon** şaneşîn
**belem** navgîneke avî ye

û dişibihe kelekan
**belemvan** xwedî an jî ajovanê belemê
**belengaz 1.** feqîr, xizan **2.** bêkes *"wexta ku ji malxweyê malê re gotin "kalê", dibe **belengaz**ê salê"
**belenî** soz û qerar
**belenîdar** sozdayî
**belezûrî bûn** dua û lavayî kirin
**belê** bersiva pejirandinê; erê
**belg 1.** perên kesik ên ku bi dar û giyan ve şîn tên; belç **2.** pel *"**belg**ê darê, darê dixemilîne"
**-belg dan** *(dar û giya)* perên kesik pê ve şîn bûn
**belgefîlm 1.** fîlmên mehlûmatî **2.** rêzefîlmên agehdarîkirinê
**belgename** destûrname
**belifandin/dibelifîne/bibelifîne** xapandin
**belik** *(di zimanê zarokan de)* mûzî, kîr
**belikandin/dibelikîne/bibelikîne 1.** benc kirin **2.** ji ser hiş birin
**beloq 1.** bel **2.** zoq **3.** bijiqî
**belor** derdanka ji camê
**belqitandin/dibelqitîne/bibelqitîne 1.** dehirandin **2.** cehimandin **3.** qewirandin
**belqitiyê!** nemayê!
**belqitiyo!** nemayo!
**belqitîn/dibelqite/bibelqite 1.** dehirîn **2.** cehimîn **3.** qewirîn
**belxem** tifa hişk a ku dişibihe xilîtê
**belweşîn** nexweşiya cuzamê
**ben** ta
**benav** cureyekî daran e
**benc 1.** cureyekî daran e **2.** bûjenê ku ji vê darê tê bidestxistin û sermestker e **3.** bûjena ku lêş bêhest dike
**benc kirin 1.** belikandin **2.** *(berî niştekirinê)* laş bi bencê tevizandin
**bend 1.** ta **2.** asteng **3.** beş **4.** rêje
**-benda hilbijartinê** rêjeya ku divê di hilbijartinê de bê bidest-xistin
**-bendê dû şûjinê** salixgerê xelqê
**-benda heyderî** xişrên bi ser kofiyê ve
**bendav** ava ku peşî lê hatiye girtin
**bende** kole, evd
**bendegan** pêgirtî
**bendeganî** pêgirtîtî
**bende man** li hêviyê sekinîn
**bender** di qeraxa deryayê de rawestgaha keştiyan
**bendewar 1.** hevîdar **2.**

dildar

**bendik** *(r)* xêzeka li nava du peyvan an kîteyan; (-)

**bendî 1.** girtî **2.** dîl **3.** girêdayî

-***(xwe)* li bendî tiştekî girtin** li pey tiştekî şop gerandin

**bendîname** fermana girtina kesekî; tewqîf

**bendîxane** zindan, hebisxane

**bendname** girêdan

**bengî 1.** aşiq **2.** mubtela **3.** sewdaser

**benî [I]** goştê hişkirî yê ku kakilê gûzan jî dikine navê

**benî [II]** kole

**benîşt** şîreya ku ji nebatan hildidin û tê cûtinê *"karkeran kar kir, xeraban **benîşt** cût"

**benîzava** zavayê ku di nav xezûrgelanê xwe de dijî

**benz** reng

-**benz avêtin** reng lê çûn

**beq** cureyekî ajalên avî ye *"**beq**ê çav da çêlekê, zikê wê teqiya"

-**beq xesandin** satore satore gerîn

**ber [I] 1.** pêş **2.** pêşî *"tirs, **ber**ê mirinê nagire"

-**berî zayînê** beriya mîlada Îsa eleyhiselam

-**berê xwe dan 1.** lê averê bûn **2.** nihêrîn

-**berê gotinê guhertin** mijara axaftinê guheztin

**ber [II]** kevir *"**ber,** ji bestan xilas nabin"

**ber [III]** hingil, guhan

**ber [IV]** adan

**ber [V]** salên temenê sewalan

-**duberî û sêberî** dusale û sêsale

**ber [VI]** miqdara firehiyê

-**duber û sêber** bi qasî du car û sê caran zêdetir fireh

**ber [VII] 1.** berik, ferşik **2.** lihêf *"lingê gerê, nayê bin **berê**"

**ber [VIII] 1.** gon **2.** meya, havên **3.** tov

-**ber girtin 1.** avis bûn **2.** mêwe girtin **3.** tov girtin

**berafî** nîqaşa der heqê gelemşeyekê de

**berafî kirin** *(ji bo çareserkirinê)* nîqaş kirin

**beraftin/diberêfe/biberêfe** şîrove kirin

**beragî** berên nûhildayî

**berahî** qeysa ji aliyê firehiyê ve *"avabûna gundan, ji **berahi**ya riyan ve kifş e"

**beramber 1.** tev **2.** dij **3.** deng **4.** di gel

-**beramberî vê 1.** tevî vê

**2.** diji vê **3.** dengî vê **4.** digel vê

**beran** hevserê mihê*"**ber**xên xelqê, ji merivan re nabin **beran**"

-**beranê bisko 1.** beranê tovê **2.** malê delaliyê **3.** torinê êlê *"**beranê bisko** bûya, dê li nav pezê bavê bûya"

-**beranê şeran** xurtê cengê

-**beran xwarin** *(ji bo mihê)* pel û fehl xwarin

**beranek** tiliya mezin

**beranberdan** dema serbestbûna têkiliya zayendî ji bo beranan

**berarî** bexş û alîkarî

-**berarî dan** bexşîş û alîkariya diravan dan hinekan

**berate 1.** goştê genî **2.** elamet **3.** nîşane

**berav 1.** roja cilşûştinê **2.** dema kelîşoyê

**ber avêtin 1.** berwext zayîn, hê di pêş de bi cenîneke nivîşkan an jî mirî ve zayîn **2.** berwext tev gerîn

**beravêtî 1.** sewala ku têjika wê ji ber çûye **2.** kesê ku berwext tev digere

-**çalakiya beravêtî** karê ku di dema xwe de neqewimiye

**beraz** xinzîr

**beraze** perwaneyên berêş

**berbajar** nava bajêr

**berban** şanişîn

**berbang** aso, berbeyan

-**berbanga sibehê** ronahiya berî şefeqê

**berbaz** di artêşê de payeya di bin serbaziyê re

**berbejn 1.** nivişta stûyan **2.** hemayîl

**berbend** karê ku kirina wî qedexe ye

**berbend bûn** derî li ber hatin girtin

**berbendî 1.** qedexe **2.** asteng *"diz xwemal e, **berbend** betal e"

**berbend kirin** qedexe kirin

**berber [I] 1.** dij **2.** reqîb

**berber [II]** kesê ku por û rihan dikurtisîne û tiraş dike

**berberî [I] 1.** neyartî **2.** dijminatî

**berberî [II]** pîşeyê kurtisandin û kurkirina por û rihan

**berbes** wizeya ku di xwarinan de heye

**berbiba 1.** cihê ku ba jê digire **2.** cihê ku xewle ye û teşqele jê tên *"guhera dawiyê, **berbiba** ye"

**berbiçav 1.** dîtî û bînayî **2.** eşkere û diyar

**berbisk** toqeya porê jinan
**berbî** berbûk *"bêder bi bê, bûk bi **berbi**yê"
**berbûk** jina ku bi bûkê re mijûl dibe, hevalbûk *"dawet ferikî, **berbûk** hetikî"
**Bercîs** gerestêkek e
**berçavk** alava şûşeyî ya ku datînin ber çavan
**berçavkfiroş** kesê ku berçavkan difiroşe
**berçek** kesên ku amadeyî perwerdeya leşkerî û çekhildanê ne; destbidar
**berçêlk** **1.** mêjî, hewsele **2.** bersînga çivîkan
**berçile** meha duwazdehan, berfanbar
**berdan [I]** **1.** terikandin **2.** jê vegerîn **3.** dagerîn **4.** dest jê vekêşan
**berdan [II]** **1.** rih û por dirêj kirin **2.** kinc bi ser de werkirin *"ji derdan, rih **berdan**"
**berdar** **1.** bibereket **2.** têgihiştî **3.** biadan
**berdayî** **1.** azadkirî **2.** jina ji mêrî veqetiyayî
**berdelan** erdê bikevir
**berdeq** lîstikeke zarokan a ku li ser piyekî radiwestin û milên xwe li hev dixin hetanî yek ji wan bikeve
**berdeqanî** alavake kevirhilfirandinê ya ku ji du bendikên dirêj û navendekê pêk tê, bi ba dikin û keviran pê diavêjin; kefkanî
**berdest** **1.** hazir, amade **2.** berhevkirî
**berdestî** kesê ku di xizmeta xelqê de kar dike
**berdevk [I]** kesê ku li ser navê welatekî ,alîyekî an jî sazîyekê diaxive û ramana wan der dibe
**berdevk [II]** pêşmala ku didine ber devê zarokan da ku cilên xwe nelewitînin
**berdewam** li ser kar
**berdewam kirin** **1.** domandin **2.** şopandin
**berdêl** **1.** biha, qîmet **2.** şûndiyarî
**-berdêl kirin** **1.** ber ve dayîn **2.** bi hev re guherîn
**berdil** **1.** ezîz **2.** evîndar **3.** gerdenî
**berdilk** **1.** pêşmal **2.** berdevk
**berdîwar** **1.** bêkes **2.** sêwî **3.** belengaz
**berdû** cîl û cegenê ku pê xesîlan çêdikin
**bere** **1.** cebhe **2.** rû **3.** enî
**bere bere** hêdî hêdî ber bi asteke dîtir ve
**berecot** pîvaneke qada erdê ye *(920 m2)*
**beredayî** **1.** bêxwedî **2.**

serbest **3.** bêkêr **4.** beytu
**berendam** **1.** kesê ku namzedê endamtiyê ye **2.** hêjayî hilbijartînê
**berendamî** hêjatiya hilbijartinê
**berespî** kevirê kilsê
**berevajî** **1.** çewtbûyî **2.** serobinobûyî **3.** hember **4.** zid, dij
**-berevajî vê yekê** li hemberî vê yekê
**berevajî kirin** **1.** serobino kirin **2.** têvel kirin
**berevan** **1.** parastvan **2.** parêzer
**berevanî** **1.** parastvanî **2.** parêzerî
**berevanî kirin** **1.** parastin **2.** lê xwedî derketin
**bereyîşk** mencenîq
**berê** **1.** di pêş de **2.** hê di zû de **3.** ji mêj ve *"çû Şamê û hat jî, dîsa kerê **berê** ye"
**berêvar** **1.** piştî esrê **2.** nêzîkî tarîbanê *"berfa **berêvar**ê, qirê tîne li debarê"
**berf** barija ku kulî kulî dibare *"**berf**a çiyayê bilind, pir dibe"
**berfanbar** meha 12'em a salnameya zayînî
**berfedîn** belekiyên berfê ên ku ber bi vehelînê ve diçin
**berfemot** helewa ku ji doşav û berfê tê çêkirin
**berfende** aşît, şepe, renî
**berfiravîn** xwarina sivik a beriya navrojê
**berfireh** **1.** çarmedor **2.** bi dorfirehî
**berfîn** **1.** cihê biberf **2.** kulîlka ku piştî vehelîna berfê hêşîn dibe
**berfşo** barana ku berf pê re dibare; şilope
**berg** **1.** cil, kiras **2.** rûpela sereke ya kovar û pirtûkê
**-berg kirin** **1.** kiras kirin **2.** *(pirtûk)* cild kirin
**bergeh** **1.** dîmen **2.** êwirgeh **3.** depê şanoyê, dik **4.** qad, meydan
**bergerîn** **1.** şîreta bi lavayî **2.** tembîha bi rica û tikayê
**bergew kirin** xitimandin
**bergind** berdêl
**-bergindî êlekê ye** bi qasî eşîrekê hêja ye
**bergirî** **1.** tevdîr **2.** berbend
**bergîdan** **1.** hilberîn **2.** bereket **3.** adan **4.** berdêl **5.** bîmekarî *"E-legaz birinc be û Erez jî rûn be, heke **bergîdan** tune be, dîsan dê pûç be"
**bergîn** pirtûka bicild
**bergîr** mehîna ku nû ji canîtiyê derketiye dê

were fehlan û avis bibe
**bergîz** kincên kurdî yên zilaman ên ku ji merezî tên ristin; şal û şapik
**bergsazî** karê amadekirina şeklê cildê pirtûk û kovaran
**berguhk** alava ku ji serikekî an jî diduyan pêk tê û axaftinan radigîne
**berhem 1.** eser **2.** adan **3.** xebat
**berhemdar 1.** biadan **2.** xebatkarê ji bo kedekê
**berhevkar 1.** civandî **2.** amadekarê komkirinê
**berhev kirin 1.** civandin **2.** kom kirin **3.** tomar kirin *"ava rijiyayî, nayê **berhev kirin"**
-**berhev kir ji deriyan û da xêra miriyan** ji parsê civande hev û ji bo quretiyê li xelqê belav kir
**berhevok 1.** tomar, belavok **2.** berhema ku hatiye komkirin
**berhewa 1.** bêwate **2.** bêkêr
**berhingar** dij
**berhingar bûn** pêrgî hatin
**berik [I]** kevirên biçûk; xîç, xişir
**berik [II]** fîşeng
-**berika nediyar** fîşenga ku kes nizane ji kuderê hatiye û lê ketiye
**berizîn/diberize/biberize 1.** har bûn **2.** *(seg)* pelişîn hev
**berî [I] 1.** besta bixîz **2.** rastahî *"dinya ji hinekan re **berî** ye, ji hinekan re jî av û herî ye**"**
**berî [II]** sade û hêsa
**berî [III]** bêguneh û bêtawan
**berîk** berîk
**berjeng 1.** delîl û îsbat **2.** berateya nexweşiyê
**berjengî** nîşaneya mirinê
**berjewendî** meslehet
-**berjewendiya** giştî mesleheta cemawerî
**berjewendîperest** kesê ku li mesleheta xwe tenê digere
**berjêr 1.** berbijêr **2.** sernişîv
**berjor** berbijor, hevraz
**berk [I]** hewza avê
**berk [II] 1.** sext, zexm **2.** şidiyayî **3.** qewîn
**berkanî** kefkaniyê kevirayêtinê
**berkaz 1.** pace, pencere **2.** perwaz
**berkeftî 1.** biqîmet **2.** muhterem **3.** berdil
**berkel** xwarina ku nêzîkê kelînê ye
**berkele** golikê ku teme-

nê wî nêzikî sê salan e
**berkeş** sinî
**berkeşok** siniya biçûk
**berkêr** sewalê ku dê bê serjêkirin
**berkêr kirin** ji bo serjêkirinê dermal kirin
**berkêşan 1.** çêkirin **2.** rokirin
**berkurk [I] 1.** qirik, gewrî **2.** berçêlk
**berkurk [II]** mirîşka ku dema kurika wê hatiye
**berlêv** qerax
-**berlêvên avê** qeraxên avê
-***(baçik)*** **berlêv kirin** *(bêyî ku ji devê xwe derxe)* cixare kêşan
**bermal** jina ber malê *"**bermal,** xwedana malê ye**"**
**bermalk** bêra berfê; berfik
**bermax** rûpelên baçikan
**bermayî 1.** jêmayî **2.** dawî
**bermîzk** mîza ku nîşaneya qelewbûna sewalan e
**bernac** kone, xasûk
**bername** mijara sazbûyî
**bernamesaz** kesê ku di sazî û dezgehan de mijaran amade dike
**bernav 1.** navê pêşîn ê mirovan *(navê sêqolî wekî: Azadê Lezgînê Celalî be, bernav: Azad e û paşnav jî Celalî ye)* **2.** navê din ê ku pê hatiye nasîn *(her wekî: ji kesekî qebrax re Karêl bê gotin û wisa bê nasîn)*
**beroj** berpala ku tavê dibîne
**beroste** pîşekarê nûgihiştî yê ku hîna nebûye hoste
**beroş** amana ku ji qûşxaneyê mezintir û ji sîtilê biçûktir e *"dîz ji **beroş**ê re dibêje: 'wê de here rû-teniyê!**' "**
**berpal 1.** dibûr **2.** beroj *"ba ji tehtê **berpal**ê çi dibe?**"**
**berpêş kirin** araste kirin, pêşandin
**berpirs** kesê ku bi peywirekê radibe; peywirdar, wezîfedar
**berpirsiyar** peywirdar/wezîfedar
**berpirsiyarî** peywirdarî, wezîfedarî
**berpisyar kirin** kar û guneh xistin stûyê yekî an jî hinekan
**berpişt** şala navê
**bersiv** vegerandina pirs**i**yara kesekî; cewab
-**bersiv dan** pirsiyara kesekî lê vegerandin; cewab dan
**bersojk** nexweşiyeke a-

şikê ye
**bersojkî bûn** ji mîdeyê azî kirin
**berstûk** aliyê kincê yê ku dora stûyî dipêçe; paştû, pastîn
**bersûc** kesê ku ji ber tawanekê tê rapirsîn
**berşîv** xwarina sivik a beriya şîva êvarê
**bertav** cihê ku tîrêjên rojê lê digire
**bertav kirin** li ber tîrêjên rojê raxistin
**bertek** bi awayekî neyînî tevgerîna li dijî bûyerekê
**berteng** **1.** kembera li ser kulêmekan **2.** kêmber
**bertîl** **1.** rişwet **2.** kirt/qirt **3.** kamçûr *"çav ji çavan şerm dike, **bertîl** keviran nerm dike"
**bertûrk** berçêlk
**berû [I]** masiyek e
**berû [II]** darek e
**bervang** **1.** pêşmal **2.** berstûk
**bervihêr** **1.** biferaset **2.** têgihiştî
**berwar** **1.** tiştê meyildar, xwar û vîç **2.** dibûr, beroj **3.** mêjû
-**berwar bûn** **1.** takêş bûn, di aliyekî de xwar bûn **2.** weşweşîn
-**berwar kirin** **1.** takêş kirin, di aliyekî de xwar kirin **2.** weşweşandin
**berx** têjika mihê *"**berxên** pir, ji mihên pir in"
**berxistin** **1.** eşkerekirin **2.** hînkirin
**berxistî** pêşniyar
**berxvan** kesê ku berxan diçêrîne
**ber xwe dan [I]** **1.** cîhad kirin **2.** tê koşîn
**berxwedan [II]** **1.** cîhad **2.** têkoşîn
**berxwedar** jîdirêj
**berxwedar bûn** jîdirêj bûn
**berxwedêr** **1.** mucahid **2.** têkoşer
**berz** bilind
**berzax** heyama ji mirinê hetanî roja qiyametê
**berz bûn** bilind bûn
**berze** winda
**berze bûn** winda bûn
**berzek** navbir
**berze kirin** winda kirin
**berzeq** cinsî, zayendî
**berzex** berzek
**berzile** berzik
**berzik** binzik
**berzî** bilindahî
**berzîn [I]** caniyê ku amadeyî perwerdekirina siwarbûnê ye
**berzîn [II]** kulavê ku di bin zîn û kurtên de davêjin ser pişta hesp û keran
**berzîne** kevirê rengren-

gî

**berz kirin** bilind kirin

**bes 1.** bi qasî têra xwe **2.** lêbêlê *"dinya bûye kes, tu kesî negotiye: **bes"**

**beser** çav

**besimîn/dibesime/bibesime 1.** bişirîn **2.** ken ber lêvan ketin

**besît 1.** hêsa **2.** di arûzê de qalibek

**best** îlham

**-best lê rabûn** îlham lê peyde bûn

**bestandin/dibestîne/bibestîne** girtin, dadan

**bestenî** şirîniya ku bi şîr, şekir û fêkiyan tê çêkirin û bi sarî tê xwarin

**bestin/dibeste/bibeste 1.** cebirîn **2.** zeliqîn

**bestir 1.** raxistina nava malê, ferş **2.** mitêl

**beş [I] 1.** çal **2.** kesê ku di eniya wî de belekiyek heye *"çileyê reş, debarê diqedîne li gayê **beş"**

**-beş kirin** di eniyê de nîşaneyek çêkirin

**beş [II] 1.** par **2.** behre **3.** qisim **4.** dabaş *"**beş** kete stûyê maldaran, avêtin serê hejaran"

**-beş kirin** par kirin

**beşavend** ahengdariya di dawiya ristên helbestekê de

**beşdar** kesê ku tevî kar an jî çalakiyekê dibe

**beşdarî** tevlêbûna kar an çalakiyekî

**beşdar bûn/beşdarî tê de kirin** tev lê bûn

**beşer 1.** feraset **2.** fehm û zanîn

**-*(jê)* beşer kirin** *(di heqê tiştekî de)* pispor bûn û jê zanîn

**beşerkor 1.** bêferaset **2.** aqilsivik

**beşervekirî 1.** rûken **2.** rûbirqonek **3.** biferaset

**beşişîn/dibeşişe/bibeşişe 1.** bişirîn **2.** bişirîn **3.** ken ber lêvan ketin

**beşt 1.** textikê stûr û dirêj **2.** kêranê avahiyan

**beşûş** devbiken

**bet [I]** ecemî, nûgihiştî

**bet [II]** cureyekî perindeyan ê ku dişibihe werdekan *"ar ê kewan e, risq ê **bet**an e"

**betal 1.** destvala **2.** bêkêr **3.** bêkar

**betal bûn 1.** îbtal bûn **2.** ji kar veqetîn **3.** rawestîn

**betalî 1.** bêkarî **2.** destvalatî **3.** bêkêrî *"**betalî,** xerabmalî"

**betal kirin 1.** netêw hesibandin **2.** kar rawestandin

**betan [I]** di her tiştî de aliyê ji hundir ve

**betan [II]** goştê nerme

**betilandin/dibetilîne/ bibetilîne 1.** westandin **2.** rawestandin
**betilî 1.** westiyayî **2.** rawestiyayî *"heta ku bûk xemilî, dawet **betilî"**
**betilîn/dibetile/bibetile 1.** westîn **2.** vêsîn
**betir** bêhtir, wêdetir
**betirpêr** sê roj beriya niha
**betirpêrar** sê sal berî niha
**betlane 1.** tehtîl **2.** raweste **3.** destûr
**betran** kesê ku nefsa xwe pir diecibîne
**betûm** bêqudûş
**betûmî** bêqudûşî
**bevil 1.** mirovê mînak **2.** hevrik
**bevşik** diranên qutkirinê
**bexişandin/dibexşîne/ bibexşîne 1.** efû kirin **2.** dayîn **3.** xelat kirin
**-dan bexişandin** dan efûkirin
**bexîl** çiriz, timakar
**bexşan 1.** efû **2.** bexşîş, şabaş
**bext 1.** talih **2.** siûd *"çavê kor tuneye, lê **bext**ê kor heye"
**-bext û miraz di çavan de man 1.** ji hevalan man **2.** negihiştin tu armancê
**bextewar 1.** bihuzûr **2.** aram
**bextewarî 1.** bihuzûrî **2.** aramdarî
**bextiyar** bextewar
**bextreş 1.** bêtalih **2.** bêsiûd
**bextvekirî** xwedî-siûd
**bey** pêşnîhada neqdî
**beyaban** cihê xewle; çol
**beyan** eşkeretî
**-beyan kirin** eşkere kirin
**beyanî [I]** eşkere *"bira biranî, bazar **beyanî"**
**beyanî [II] 1.** spêde **2.** sibeha zû
**-beyanîbaş!** sibehxweş!, rojbaş!
**beyan-name** nivîsa girîng a ku agehiyekê eşkere dike
**beyar** erdê ku ji çandinê re dest nade; pesar, çol *"bela xelqê ji çol û **beyar**an tê, a min belengazê Xwedê jî ji ber piyên min tê"
**-beyar kirin** zevîn neçandin
**beybûn** kulîlkek e
**beytar** bijîşkê sewalan
**beytarî** karê bijîşkiya sewalan
**beytik** cureyekî çivîkên biçûk e
**beytu 1.** bêxwedî **2.** beredayî
**bez [I] 1.** rev **2.** bazdan **3.** çengkirin *"**bez**a hes-pê,

namûsa siwêr e"
**bez [I]** donê ku bi goşt ve ye *"sibat hat û bihurt, nav û dilê gîskê **bez** girt"
**-bez bi stûyê pisîkê ve kirin** **1.** xurek spartin xurekxuran **2.** emanet teslîmî xayînan kirin
**-bez girêdan** **1.** qelew bûn **2.** komir bûn
**beza** **1.** revok **2.** pêsivik, laşsivik
**bezek** beza *"bizina kulek û şivanê **bezek**, tev digihêjin ber dêrî"
**bezandin/dibezîne/bibezîne** **1.** dan revê **2.** dan bazdan **3.** xar kirin
**bezîn/dibeze/bibeze** **1.** revîn **2.** baz dan *"hespê her kesî, li gorî bextê wî **dibeze**"
**-lê bezîn** **1.** lome lê kirin **2.** lê xistin
**-bezîn hev** **1.** bi hev re ketin devjeniyê **2.** li hev xistin, pevçûn
**bezmik** bihukek e
**bê [I]** tiştê ku piştî dema niha tê
**-dema bê** *(r)* dema ku ayendeyê dinimîne
**bê- [II]** pêşgireke neyîniyê ye *"gul **bê** strî nabin"
**bêayîk** **1.** bêheyf **2.** kesê ku heyfa wî tê hilanîn **3.** derwêşê xwedîkeramet
**bêbav** **1.** kesê ku mêrê diya wî nîn e **2.** qeleş **3.** bêeman
**bêbext** **1.** qeleş **2.** xayîn *"mêrê **bêbext** pire be jî, bi ser re derbas nebe"
**bêbextî** **1.** qeleşî **2.** xayîntî
**bêbextî kirin** **1.** qeleşî kirin **2.** xayîntî kirin
**bêbine** **1.** bêqedr **2.** kêmbiha **3.** bêkêr
**bêbingeh** **1.** bêtar **2.** bêesl **3.** bêbinî
**bêbinî** **1.** pir kûr **2.** bê-wate
**bêçiv** **1.** bêziqzaq **2.** bêfetl
**bêderman** **1.** bêilac **2.** bêçareserî *"Xwedê, tu derdekî **bêderman** nedaye"
**bêdev** **1.** bêdeng **2.** devmirî
**-bê dev û bê ziman** **1.** nezanê axaftinê **2.** feqîr û belengaz
**bêdê** **1.** dêmirî **2.** sêwî *"keça **bêdê,** weke çiyayê bêrê"
**bêdil** **1.** nexwestî **2.** bêriza **3.** bêîştah
**bêg** kesê ku xulamokê berjewendiyên xelqê ye
**bêgane** **1.** nenas **2.** xerîb **3.** biyanî *"dilê **bêgane**yan, her bixem e"
**bêgar** kesê ku bêpere û

bêhember dixebite
**bêgav 1.** neçar **2.** bêderfet **3.** mecbûr
**bêgavî 1.** bêçaretî **2.** bêderfetî **3.** mecbûrtî
**bêguman 1.** bêşik **2.** bêgav **3.** neçar *"bela, ji derê **bêguman** tê"
**bêgerd** bêguneh
**bêgêwil** bêkêf
**bêgêwil bûn** dil çirmisîn
**bêgêwil kirin** kêf lê revandin
**bêgêwilî** bêkêfî
**bêgiyan** mirî, bêcan
**bêhawe** kesê ku beletewş û keteber tev digere
**bêhemal** bêxwedî û bêsexbêr
**-bêhemal hiştin** bêxwedî hiştin, bêsexbêr hiştin
**bêhemdî** bêyî ku wisa bixwaze; bêqesd
**bêhempa 1.** bêemsal **2.** bêhogir **3.** bêhevta
**bêhiş 1.** bêaqil **2.** kerose
**-bêhiş ketin 1.** ji xwe ve çûn **2.** sefêk bûn
**bêhn 1.** hilm, neks, nefes **2.** heyberên ku bêfil pê dihese
**-bêhna xwe berdan** navber dayîn
**-bêhn jê hatin** bi bêfilê hate derxistin ku tiştekî bûdar heye *"kesê ku sîr nexwe**, bêhn jê nayê"**
**-bêhn jê teng bûn** jê kerixîn
**-bêhn kirin 1.** henase kişandin hundir **2.** *(tiştê bûdar)* bi kepûyî tê derxistin *"dinya gulek e, **bêhn bike** û bide hevalê xwe"
**-bêhn lê çikandin 1.** xeneq lê şidandin **2.** bêqudûm hiştin
**-bêhn lê çikîn 1.** nefes lê teng bûn **2.** aciz bûn
**-bêhn pê ketin 1.** jê hilm wergirtin **2.** fis kirin **3.** genijîn
**-bêhn vedan** westa xwe danîn
**bêhndar** tiştê ku bêfil jê derdixe ka hilma wê çawa ye; bûdar
**bêhnefişk 1.** hilkehilk, nefesên li ser hev **2.** gumek ji kêşa baçikê
**bêhnfireh 1.** bisebr **2.** dilfireh **3.** rûnerm
**bêhnok** *(r)* nîşaneya vêsihê
**bêhnteng 1.** bêsebr **2.** bêtebat
**bêhntengî 1.** bêsebrî **2.** bêtebatî
**bêhtir 1.** zêdetir **2.** wêdetir
**bêjandin/dibêjîne/bibêjîne** ji bêjingê re derbas kirin, seridandin
**bêje** peyv, kelîme
**bêjer** gotî, axafger

**bêjing** alava qulqulî ya ku zadê çê û qeselê wî ji hev vediqetîne
**-bêjing kirin** bi bêjingê zadê çê û qesel ji hev jibartin
**bêjî** bîj
**bêkar 1.** bêîş **2.** betal
**bêkes 1.** xizan **2.** bêgav *"dilê **bêkes**an, li ser hemû kesan dişewite"
**bêkêr 1.** bêxêr **2.** ji tu tiştî re destnedayî
**bêlête** govend
**bêmêjî 1.** bêhiş, bêaqil **2.** ehmeq
**bênamûs 1.** bêar **2.** xîret **3.** qehbik *"eyarê **bêna-mûs**an fireh e"
**bênamûsî 1.** bêarî **2.** bêxîretî **3.** qehbiktî
**-bênamûsî qebûl kirin 1.** tola xwe li erdê hiş-tin **2.** tolaziya jina xwe pejirandin
**bênavber** bi berdewamî
**bênder 1.** cihê ku zad lê tê kutan *"bazar xweş e li **bênder**ê, ne li zeviyê"
**bênefsî** çilektî, silektî *"kalê ji **bênefsi**yê û pîrê ji bêkesiyê hev û du pirsîne"
**bênimêj 1.** kesê ku nimêj nake **2.** herimî, gemar
**bênimêjî** dema ku jin heyvane avê dibînin
**bênimêj bûn 1.** *(jin)* ketin kirasan, heyz bûn **2.** herimîn
**bêpar 1.** mehrûm **2.** bê-nesîb
**-bêpar mayîn 1.** mehrûm man **2.** bênesîb man
**bêpayan 1.** bêhevta **2.** bibiha
**bêqudûm 1.** bêmecal **2.** westiyayî
**bêr** alava kolandinê *"jin û mêr, weke tevr û **bêr**"
**bêrawestan 1.** di qîjekê de **2.** bê navber
**bêrê 1.** nelirê **2.** bêusûl
**bêrêtî 1.** nelirêtî **2.** bê-usûlî
**bêrik [I] 1.** cêb **2.** cêba paşilê *"destê kefîlan, di **bêrik**a wan de ye"
**bêrik [II]** alava biçûk a ku xwelî pê tê hildan
**bêrî [I] 1.** bêguneh **2.** rûpak
**bêrî [II]** cihê ku pez lê tê dotin *"ha şêwra jinan, ha **bêri**ya bizinan"
**-dan bêriyê** pez di şîştira dotinê de ber bi bêrî-vanê ve ajotin
**bêrî [III]** xwesteka dîtinê
**-bêrî kirin** ji bo dîtinê bi xwestek bûn
**bêrîk** di kincan de cihê ku kîsikekî tê hiştin; cêb *"hevalê **bêrîk**a vala, tuneye"
**bêrîvan** jina ku pêz û

dewêr didoşe
**bêrvî** alava ku di lûleyê de herka avê têkûz dike
**bêsemt** bêîhtiyat
**bêserî 1.** pir fireh **2.** bêxwedî
**-bê serî û bê berate çûn** bê xwedî û bêyî ku tu şopekê li pey xwe bihêle çûn
**bêserûber** keteber û pir fireh
**bêsiûd** bêbext, bêtalih
**bêş 1.** kamçûr **2.** xûgî **3.** bac
**bêşik 1.** bêguman **2.** teqez
**bêtar** felaket, karesat, afet, bobelat
**bêtehr 1.** bêhawe **2.** bêpîvan
**bêteşe 1.** danerotî **2.** serobero
**bêtewş 1.** bêhevseng **2.** beletewş
**bêv** tora masîgiriyê ya ku ji çeperên darî hatiye çêkirin
**bêvan** kes an jî tiştê nediyar
**bêvil** endamê bêhnhilkirinê; poz, kepû
**-bi bêvilê girtin** hişyar kirin
**-bêvila xwe daliqandin** mirûzê xwe tirş kirin
**bêvîr 1.** nexweşê li ber mirinê **2.** jihêzketî
**bêwelat 1.** bêcih û bêwar **2.** bêêl **3.** biyanî *"mirovê **bêwelat,** mîna çûka bêper û bêbask e"
**bêxêr 1.** bêkêr **2.** serxur *"dostê bixêr, ji birayê **bêxêr** çêtir e"
**bêxwedî 1.** bêsexbêr **2.** bêhemal **3.** bêkes *"bêndera **bêxwedî,** ji mirovî re nabe bênder"
**bêyî** ***(tiştekî)*** *(ew tişt)* ne tê de
**bêyom** bêqudûş
**bêzar 1.** betilî **2.** tengezar
**-bêzar bûn 1.** betilîn **2.** tengezar bûn
**-bêzar kirin 1.** betilandin **2.** tengezar kirin
**bêzirav 1.** newêrek **2.** ziravqetî
**bêzû** cureyekî nexweşiyên hişaloziyê ye
**bi 1.** daçekek e **2.** pêşgireke ku tevahiyê dide wateyê
**-bi bandor** bi tesîr
**-bi boneya** bi munesabeta …, bi sedema …
**-bi dizî 1.** dizîka **2.** bêhay, bêxeber
**-bi dor** di şîştirê de
**-bi dorvegerî** di rêzê de, di şîştirê de
**-bi giştî** bi gelemperî
**-bi hev re 1.** tevayî **2.** ba hev *"berx û gurên tirkan, **bi hev re** diçêrin"

-**bi hêsanî** ne bi zorê
-**bi jimare** bi ededeke diyar
-**bi kinayî** bi kurtasî û ne dûvedirêjî
-**bi kotekî** bi darê zorê
-**bi min** li gorî min
-**bi nav û deng** navdar, meşhûr
-**bi piranî 1.** zêdetir **2.** bi gelemperî **3.** bêhtir
-**bi rastî** ne bi derew, di heqîqetê de
-**bi rêk û pek 1.** bi pergal **2.** têkûz
-**bi roj** wexta ku tav heye
-**bi ser de** pê re *"kera xwe bi kerekê da, cilika wê jî **bi ser de** da"
-**bi şev** êvarê
-**bi şev û roj** sibeh û êvarê
-**bi şêt û pêt** bi şivê û hêzê
-**bi şêweyeke berevajî** bi awayekî çewt
-**bi taybetî** xusûsî, ne bi gelemperî
-**bi tenê 1.** bi serê xwe **2.** hişk û hola
-**bi tevayî** bi giştî, hemû
-**bi tundî** bi zextî, bi pêkutî
-**bi vî awayî** bi vî cureyî, bi vî tehrî
-**bi vî rengî** bi vî şiklî, bi vî celebî
-**bi vî şêweyî** bi vî awayî, bî vî rengî
-**bi zanayî** bi awayekî têgihiştî û li ser hişê xwe
-**bi zorî** bi kotekî *"hesinê sar, **bi zorî tê** kutan"
**biaqil 1.** xwedîferaset **2.** jîr û jêhatî *"barê **biaqilan**, pişta kêmaqilan"
**bi ber bayê yekî ketin** pê xapîn
**bi bîr anîn** di zêhna xwe de gerandin *"ger mirov xeraban nebîne, başan **bi bîr nayine**"
**bi bîr birin 1.** îdrak kirin **2.** tê derxistin **3.** pê hesîn
**bi bîr xistin** hizra yekî ji bûyereke qewimî re amade kirin
**bi cih anîn 1.** pêk anîn **2.** kirin
**bi cih bûn 1.** tê de rûniştin **2.** tê de êwirîn
**bi cih kirin 1.** şûn kirin **2.** dewisandin **3.** rûniştandin **4.** êwirandin, sitirandin, hewandin
**biçrik** nanê di rûn de qijirandî
**biçûk 1.** nemezin **2.** hûrik **3.** zarok *"**biçûk** li cihê xwe, mezin li cihê xwe"
-**biçûk xistin 1.** rûmeta yekî şikandin **2.** bênirx kirin
-**biçûk dîtin 1.** biçûk

xistin **2.** bi pozbilindî lê nêrîn

**biçûkahî 1.** nizmî **2.** hûriktî **3.** zarokatî

**bi dawî bûn 1.** encam dan **2.** kuta bûn, qedîn, xilas bûn, red bûn

**bi dawî kirin 1.** jê encamek wergirtin **2.** kuta kirin, qedandin, xilas kirin, red kirin

**bi derengiyê xistin 1.** taloq kirin **2.** paş de avêtin **3.** paşê bi cih anîn **4.** egle kirin

**bidil 1.** jidil **2.** bi xwestinî **3.** bi rizaya xwediyî

**bi dûr ketin** jê veqetîn

**bi dûr xistin 1.** jê veqetandin **2.** şandin tarawgehê

**bi encam bûn 1.** pêk hatin **2.** bi dawî bûn

**bi girî vekirin 1.** giriyandin **2.** qehirandin

**bigor** alava ku pê tîna gêrebayê tê teselekirin

**biha 1.** qîmet, qedr **2.** nirx *"arê kewan re, risqê **biha** re"

**biha bûn 1.** biqîmet bûn, biqedr bûn **2.** binirx bûn

**bihaname** kaxeza ku bihayên kel û pelan li ser hatiye nivîsandin

**bihar** demsala vehelîna berfê û destpêka hêşînahiyê *"heta peyv neyê karê, yek naçe **bihar**ê"

**biharat** ardê giyayê tamxweş û bêhinxweş ê ku dikin nav xwarinan

**bihare** cureyekî genimê ku biharê tovê wî tê reşandin

**bi hev şa bûn 1.** hev xwestin **2.** hev kirin

**bihêl** kaxeza ku destûrê dide kar an jî çalakiyekî wek şano, tirad û hwd

**bihêz 1.** xurt, biquwet **2.** desthilatdar

**bihîstin/dibihîze/bibihîze 1.** bi guh seh kirin **2.** guhdarî kirin **3.** haydar bûn **4.** pê hesîn *"gava mitrib **nebihîzin,** êdî defê diqetînin"

**bihîstok** alava ku pê tê bihîstin û guhdarîkirin

**bihîstyar 1.** guhdar **2.** peywirdarê çi bê guhê wî **3.** hesas

**bihost** bihust *"**bihost**eke tevna çêkirî, ji barekî rîs çêtir e"

**bihuk** hemû cureyên kêz û mêşan; heşere *"dayê **bihuk** e, jinê ruhik e"

**bihujandin/dibihujîne/bibihujîne** helandin

**bihujîn/dibihuje/bibihuje** helîn

**bihur 1.** di cihên teng de şûna ku berteng e **2.** av-

tenga ku derfeta derbasbûnê dide *"çem bê **bihur** nabin"

**bihurtin/dibihure/bibihure** derbas bûn

**bihust** maweya di navbera kefedesteke vekirî; bost, bihost *"dema ku bextewarî nebe dost, fayde nake gera **bihust** bi bihust"

**-bihust bi bihust pîvan** baş endaze girtin

**bihuşt** cenet *"**bihuşt,** li rûyê erdê ye"

**bihuştîn** cenetmekan

**bij 1.** hêza xwarinê; bîz, îştah, mehde **2.** qilde, qirqal

**bijandin/dibijine/bibijine 1.** dil avêtin, mehdeyê xwe kişandin tiştekî **2.** tê gerandin **3.** çilkandin, lê reşandin

**bijang** perikên çavan

**bijarte** hilbijartî, sahibrewac

**bijartin/dibijêre/bibijêre 1.** hilbijartin **2.** tercîh kirin *"jinan **mebijêre,** esl xêr e"

**bijinandin/dibijinîne/bibijinîne 1.** tê gerandin **2.** îştah kişandin *"bi eşqa mêwijan, dil **dibijinîne** gûwijan"

**bijiqandin/dibijiqîne/bibijiqîne 1.** beloq kirin **2.** perçifandin

**bijiqîn/dibijiqe/bibijiqe 1.** beloq bûn **2.** perçifîn

**bijî!** aferîn!

**-bijî azadî!** bila azadî her hebe!

**bijîn/dibije/bibije 1.** qildeyê wî hildan, mehdeyê wî kişandin **2.** tê gerîn, lê alîn **3.** çilkîn

**bijîreş** simbil

**bijîşk** tebîb, hekîm

**bi kar anîn 1.** xebitandin, şixulandin **2.** kelk jê wergirtin

**bi kar hatin** bi kêrî tiştekî hatin

**bikarhêner 1.** kesê ku dixebitîne **2.** kesê ku sûdê jê werdigire

**bi kêr hatin 1.** sûdwer bûn **2.** layîq bûn

**bikêrhatî [I] 1.** sûdwer **2.** layîq

**bikêrhatî [II] 1.** pêwist **2.** destdayî

**bikir [I]** kesê ku dan û standinekê dike

**bikir [II]** kesê ku kar an jî çalakiyekê dike

**bikirk** binê bîr, kanî, çal, aman û hwd

**bikuj** kujer, qatil, mêrkuj

**bila** peyveke ku carinan xwestekekê û carinan jî karekî bilanî rave dike

**-bila be** xem nake, tiştek

nake

**-bila bibêjin xençera Xaço heye** ji bo quretiyê tiştek bi xwe re gerandin

**-bila were** heke dikare hatina wî çêtir e

**-bila çavê min te nebîne** cardin dernekeve pêşberî min

**bilan** îhtimal

**bilandin/dibilîne/bibilîne** **1.** miremir kirin **2.** taloq kirin **3.** egle kirin

**bilanî** îhtimalî

**bilbil** cureyekî çivîkên awazxweş e *"**bilbil** bi dengê xwe, mêrxas bi cengên xwe"

**bilcim** kesê ku tevî her karî dibe

**bildbildo** **1.** gingino **2.** lalo, tato

**bildebild kirin** **1.** ginegin kirin, di bêfila xwe de axaftin **2.** wekî lal û tatan axaftin

**bi lêv kirin** **1.** ji dêv avêtin **2.** der birin **3.** şehitandin

**bilik** *(di zimanê zarokan de)* mûzî, kîr

**bilind** **1.** berz, ber bi jor ve dirêj **2.** quloz

**bilindahî** **1.** berzî, dirêjahiya ber bi jor ve **2.** quloz

**bilind bûn** **1.** berz bûn **2.** hevraz bûn **3.** quloz bûn

**bilind kirin** **1.** quloz kirin **2.** berz kirin **3.** hevraz kirin **4.** bi ser xistin *"kurê çê, navê bavê xirab **bilind dike**"

**bilî** xeyrî

**bilîn/dibile/bibile** **1.** pê re mijûl bûn **2.** pê ve egle bûn

**bilqîn/dibilqe/bibilqe** *(av)* fişkîn û fûrîn

**bilqînî** dengê fişkîniya tiştên avî

**bilûl** qalibê rokirinê *"dêla sê, sê salan têxin **bilûl**ê, sala ku derxin her xwar e"

**bilûr** alava dengjeniyê ya ku bi pifkirinê tê lêxistin *"**bilûr**a li ber gê ye, çiraya li ber kûreyê ye"

**bin** **1.** tar **2.** qûntar **3.** cihê jerîn ê her tiştî

**binate** **1.** şop **2.** binyad, xîm **3.** bineçe

**binaşe** binate

**bi navê lîstin** **1.** pişta reqîbekî li erdê xistin **2.** zoran kirin

**bi nav kirin [I]** **1.** pênasek lê danîn **2.** wate lê bar kirin

**binav kirin [II]** noqî kûrahiya avê kirin

**binbar** peywirdar

**bincan** dîwarê ku li ber ava herikbar tê jenîn

**bincî** nivîna stûr a ku li

serê tê razan
**binçavî 1.** tewqîf **2.** rawestan
**binçav kirin 1.** tewqîf kirin **2.** rawestandin
**binçeng** qefa binê her du milan
-**pûrta binçengê** pirça ku di bin çepilan de hêşîn dibe
**bindeq 1.** cureyekî darên biber e **2.** berên vê darê
**bindest** kesê ku azadî û aramiya wî bi mercan ve girêdayî ye; ketî
**bindestî** rewşa kêmazadiyê ya ji ber mercen derveyî; ketîtî
**binecih** xwecih, rûniştî
-**bi binecihî kirîn û firotan** bi hemû milkiyetê ve kirîn û firotan
**bineçe** binate
**binefş** cureyekî gulan e
**binefşî** rengê di navîna sor û hêşîn de
**binesazî** tardanîn, xîmavêtin
**binetar 1.** esasê her tiştî **2.** di nivîsekê de bendên xwendinê
**binfisî kirin 1.** hêkên xwe genî kirin **2.** nebaşiyên xwe veşartin
-**bingeh** tar, xîm/hîm
-**bingeha aborî** hîmê îqtisadî
-**bingeh danîn** tar danîn, xîm avêtin
**bingehîn** esasî
**binik 1.** binê îskanê **2.** bincixare
**binî** bin
-**binî dan tavê** karê xwe giş qedandin
**binîje** di avahiyan de taqê li herî biniyî
**binkask** kasika ku digel piyanê tê danîn
**binkirask** kinca tenik a ku di bin cilên derveyî de tê lixwekirin
**binpê kirin 1.** pêpest kirin **2.** îxlal kirin
**bintîn 1.** mal û milk **2.** sexbêrî
***(bi)*** **bin xistin 1.** berjêr kirin **2.** mexlûb kirin, sernuxûn kirin
**binyad** tar, bingeh *"jina malê, **binyad**an dizane"
**biok [I]** kirêt
**biok [II]** heşerat, bihuk
**bi pêş ve çûn** perisîn û meşîn
**bir 1.** beş **2.** qisim **3.** par **4.** kerî **5.** tîke
**bira** kesê ji dê an jî bavê mirovî *"tenê **bira,** di hawara birê de tê"
-**birayên hûrekî 1.** ji heman dê û bavî **2.** dizên tûrekî
**birale** şitil
**biramak** kesên ji eynî da-

yikê lê ne ji heman bavî

**birandin/dibirîne/bibirîne 1.** binevat kirin **2.** îmha kirin **3.** tune kirin

**biraşîr** kesê ku di dema zarotiya wî de wî jî şîrê diya wî mêtiye; şîrbirak

**biraşte** alava ku li serê goşt tê pijandin

**biraştin/dibirêje/bibirêje** goşt pijandin *"êgir girte mala yekî, yê din got: 'tu bi Xwedê venemirîne, da ku *(ez)* kewên xwe li serê **bibirêjim'** "

**biratî 1.** hevpişkiya di dê an jî bavî de **2.** rewşa kesên ji heman olê *"**biratî** bi baran, hesab bi misqalan"

**biraza** lawê birayê mirovî

**birazava** kesê ku di daweta zavê de xwedîtiya wî dike

**birazî** keça birayê mirovî *"ap bi **biraziyan** re dike, xal bi xwarziyan re dike"

**birc 1.** avahiyê bilind û asê yê ku ji bo zêrevanîyê tê bikaranîn **2.** kêlû

**birçêk** lîstika cirîdê

**birçî 1.** kesê ku pêdiviya wî bi xwarinê heye; nêzdeçûyî **2.** netêr **3.** zikvala *"çavên **birçî,** tu carî têr nabin"

**-ji birçînan zik miz dan** tiştek nedîtin ku bê xwarin

**birçî bûn 1.** zikvala bûn **2.** ji nêz de çûn, birsî bûn *"kûçik **birçî dibe,** gûyê xwediyê xwe dixwe"

**birçîtî 1.** nêzdeçûn **2.** netêrî, zikvalatî

**birek** alaveke hesinîn a ku pê dirankên wê yên tûj dar, lek û hwd tên qutkirin

**bireser** *(r)* karê ku kirde dike

**bireş 1.** xizan, feqîr **2.** belengaz

**bi rê ketin 1.** sefer kirin **2.** meşîn *"heke biçûk li gor mezinan **bi rê nekevin,** dê lingên wan timî li keviran bikevin"

**bi rê kirin 1.** bi rê xistin **2.** şandin

**bi rê ve birin 1.** îdare kirin **2.** kar gerandin

**bi rê ve çûn 1.** meşîn **2.** bizîn

**bi rê xistin 1.** meşandin **2.** şandin

**birêxistin bûn** bipergal bûn

**birêxistin kirin** bipergal kirin

**birêxistî** bipergal

**birêz 1.** giranqedr **2.** birûmet

**birgeh 1.** cihê birînê **2.** cihê vebirînê **3.** di peyvê de cihê rawestanê *wek: ba-jar, cen-ga-wer ...* **4.** cihê hevgirtina gehan

**birhan** delîl û îsbat

**birin/dibe/bibe** neqil kirin

**birik** bayekî bêhnkirêt ê ku piştî zadxwarinê ji devê mirovî derdikeve, qirpik

**birinc** cureyekî zadê ku li cihên avî hêşîn dibe *"erd **birinc** be jî, av rûn be jî, heke xwedî tunebe zû diqede"

**biriskandin/dibiriskîne/bibiriskîne** teyisandin, çirûsandin

**biriskîn/dibiriske/bibiriske** teyisîn, çirûsîn

**birîn/dibire/bibire [I] 1.** qut kirin **2.** jê kirin *"hezar carî bipîve, carekê **bibire"**

**birîn/dibire/bibire [II] 1.** binevat bûn **2.** qiriyan **3.** kuta bûn

**birîn [III] 1.** di lêş de cihê zedegirtî **2.** cihê ku kêm û îltihab girtiye *"**birîn**a dijûnê, ji birîna şûrê neyêr kambaxtir e"

**-birîna xwe bi destê xwe kewandin** derdê xwe bi dermanê xwe çareser kirin

**-birîna kûr** derd û keserên xemgîniyê

**-birîn azirandin** kul û keder tev rakirin

**birîndar 1.** derbexur, zedegirtî **2.** kesê ku rûmeta wî herişiye *"**birîndar,** bi birîna xwe dizane"

**birîndar bûn 1.** derbe xwarin **2.** zede girtin **3.** herişîn

**biriqandin/dibiriqîne /bibiriqîne 1.** teyisandin **2.** çirûsandin **3.** mesqel kirin

**biriqîn/dibiriqe/bibiriqe 1.** teyisîn **2.** çirûsîn **3.** mesqel bûn *“bejn **biriqî,** dil xeriqî”

**birk** hewza avê

**birmût** bêhndank

**bi ro de berdan 1.** tevî avê bi rê kirin **2.** bêsexber hiştin *"qenciyê bike û **bi ro de berde"**

**bi ro de çûn 1.** bêhemal bûn **2.** bi kêr nehatin **3.** ber herka avê xwe ranegirtin *"bi destê nemerdan meçe, bila av te **bi ro de bibe"**

**birû** mûyên wekî kevaneyekê li fêz çavan şîn di-

bin, bijang *"li ser çavan, **birû** hene"

**-birû şeh kirin û çav der kirin 1.** hembêz kirin û ji piştê zêl vexistin **2.** wekî alîkarî xuya bûn û xedarî kirin

**birûsk** berqvedana esmên a ku carinan xisarê jî bi xwe re tîne

**-birûsk vedan** berqa bi xisar vedan

**biryar** qerar

**-biryar wergirtin/standin** qerar dan

**biryardar** biqerar

**biryardarî 1.** qerardarî **2.** cidîtî

**biryarname** qerarname

**biserûber 1.** bipergal **2.** birêxistinkirî

**bisk** porê ku di hinda guhan de dadiliqe ser rûyî

**bist 1.** sêla qeliyê **2.** şîş **3.** qevd

**bistik 1.** qevdik **2.** çembil

**bistî** tayên ter û nazik ên ku dikevine navbera belg û çiqê darê an jî serik û rehçikê rehekê

**bişirîn/dibişire/bibişire 1.** ken ber lêvan ketin **2.** besimîn

**bişkaftin/dibişkêve /bibişkêve** bişkivandin

**bişkivandin/dibişkivîne/bibişkivîne 1.** dirûn vereşandin **2.** bûn sedema vebûna kulîlkan

**bişkivîn/dibişkive/bibişkive 1.** dirûn vereşîn **2.** kulîk vebûn

**bişkoj/bişkok** di kincan de tiştê ku pêsîr, bêrîk û hwd tên girêdan; polik

**bişkuv 1.** qalikê kulîlkan ê ku beriya vebûnê li ser e **2.** qalikdana çêrmî ya ji ber kêmxwarinê

**bişkuv dan** *(dar û giya)* kulîlkên di qalikan de jê re çêbûn

**bitim** fistiqa biyanî

**bitir 1.** qert **2.** qamir

**bitir bûn** har bûn

**bitov** bikakil, bidendik

**biv 1.** *(di zimanê zarokan de)* çiz **2.** xetere

**bivê nevê** çawa hebe

**bivir** alaveke hesinîn a devtûj û bidestik e, ji bo birîna daran jê fayde tê wergirtin

**-bivir li kêvir xistin** çewt tev gerîn

**biwar 1.** tûş **2.** îstiqamet

**biwartin/dibiwêre/bibiwêre** bihartin

**biwefa** kesê ku li ser sozê xwe disekine *"kî **biwefa** ye, ew bira ye"

**biwêj** gotina navdar

**bixêrî** kuleka ku dû tê re derdikeve; rojing

**biyanî 1.** bêgane **2.** xe-

rîb *"**biyanî,** bidê goştê ranî; dê bi ser te de bê poşmanî"

**biyom 1.** biqudûş **2.** bixêr

**bizav** hereket, çalakî

**-bizava diravî** di sûqê de hereketê danûstandinên pereyan

**-bizava rizgarîxwaziyê** tevgera kesên ku bi mebesta serbixwetiyê çalakiyan dikin

**bizdandin/dibizdîne/bibizdîne 1.** tirsandin **2.** hetikandin **3.** dabarandin **4.** sist kirin

**bizdîn/dibizde/bibizde 1.** tirsîn **2.** hetikîn **3.** sist bûn

**bizdonek 1.** newêrek **2.** bêbiryar **3.** revoke *"**bizdonek** her roj dimire, mêrxas carekê "

**bizin** sewaleke malê ya ku ji bo şîr, goşt û mûyê wê tê xwedîkirin *"heke **bizin**ê têr xwar, qiloçên xwe li kendalan dide"

**bizir [I]** tov *"**bizir**î ba-vêje bi çengan, bêndêrê hilîne bi dengan"

**bizir [II]** rûnê ku ji çêreya çeqçeqê tê bidestxistin

**bizivîn/dibizive/bibizive 1.** livîn **2.** pirpitîn **3.** qirqilîn

**bizîn/dibize/bibize** hereket kirin

**bizmar** mix *"du textik û **bizmar**ek"

**bizmar kirin** mix kirin

**bizmik** devgema biçûk a ku davêjin devê sexeleyan da ku nemêjin

**bizot** agirê pir bi şewat

**bizûz** cureyekî heşeratan e û heke têkevin tiştekî bi domana demê re dirizînin *"kul dibine **bizûz** û li canê meriyan ba dikevin"

**bî 1.** jina bêmêr **2.** mêrê bêjin *"sibat jina **bî** ye, sibehê dikene û êvarê digirî"

**bîbik** reşika çêv

**bîber** îsot

**bîdar 1.** hişyar **2.** haydar

**bîhok** mêweyek e

**bîj** zarokê zinayê; bêjî

**bîjek** di mêrgên levenan de cihokên avê

**bîjî 1.** dasî **2.** mûyê dêla ker û hespan

**bîme** temînat

**bîme kirin** bi berdêleke diyar ji bujenekê re ewlehî peyde kirin

**bîmexane 1.** saziya ku ji temînatan berpirsiyar **2.** avahiya vê saziyê

**bîn** bêhn

**-bîna şîr ji dêv hatin** hîna viringî bûn

**bîna 1.** kesê ku dibîne **2.**

avahî
**bînahî 1.** ronahiya çêv **2.** şiyana dîtinê *"kurê mirovî, **bînahi**ya çavê mirovî ye"
**bînahînasî** zanistên ku pisporiya wan têkildarî çavan û dîtinê ye
**bîner 1.** temaşevan **2.** bîna
**bîq** cureyekî çêreya ku ajalan pir kok dike
**-ma bîq dane vî pezî?** vî pezî kîjan çêre xwariye ku evqas qelew bûne?
**bîr [I]** saringên avê yên di binê erdê de *"ava **bîr**ê, bi bîrê xwe tehl e"
**bîr [II] 1.** hafize **2.** hiş **3.** zêhn *"emele pîrê, nayê **bîr**ê"
**bîrale** şitilên daran
**bîranîn** di zêhna xwe de jîndargirtina bûyerên qewimî
**bîrbir 1.** biaqil û balix **2.** gihiştî **3.** reşîd
**bîrdarî** yadîgar
**bîrdoz** feraseta ramyarî
**bîrdozî** tekildarî feraseta ramyarî
**bîrewer 1.** rewşenbîr **2.** hişmend
**bîrewerî 1.** rewşenbîrî **2.** hişmendî
**bîrkarî** hemû zanistên ku bi kêrî jimartinê tên
**bîrkarînasî** zanistên ku pisporiya wan têkildarî hesabkirina endaze, kêş û pîvana tiştan e
**bîrkor** kesê ku bala wî vala ye; bîroke
**bîrmendî 1.** hişyarî **2.** zanatî
**bîroke** bîrkor
**bîrov** nexweşiyeke çermî ye
**bîrovî** kesê ku bi nexweşiya bîrovê ketiye
**bîrxistok** nameya hişyarkirinê
**bîs 1.** raz **2.** sir
**bîsk 1.** lehze **2.** demeke kurt
**-bîska din** xulekek berê
**bîst** jimareya 20'î
**-bîstek 1.** lehzeyek **2.** çirkek
**bîstan** kerdiya ku sewze lê tên çandin
**bîstem*(în)*** di rêza bîstan de
**bîso 1.** qumaşê şewitî **2.** ariya pîneyên şewitî *"agir pê keve, bêhna **bîso** jê nayê"
**bîsokî** xwarina ku bêhna dûyî di çêja wê de pêk hatiye
**bîsokî bûn** *(xwarina kelandî)* bêhna dûyî ji çêja wê hatin
**bîşe** daristana darên leflefok
**bîşeng** cureyekî daran e

**bîşî [I]** daristan
**bîşî [II]** biçrikên şirîn ên bi qasî libên sêvan
**bîyanî 1.** xerîb, bêgane **2.** giyayê çolê **3.** ajala dirinde, hov *"avê vexwe ji kaniyan, jinê bîne ji **biyani**yan"
**bîz [I] 1.** di giyaneweran de seheka ku tiştên sirûştî dipejirîne; qilqal, qilde **2.** xweparêzî
**-bîzê xwe jê kirin 1.** jê hez nekirin û qildeyê xwe lê xera kirin **2.** xwe jê girtin
**bîz [II]** şîşikên hûnanê
**bîzoke 1.** kesê ku her xwarinê naecibîne **2.** kesê ku kirinên xelqê naşêkirîne **3.** qure
**bîzoketî** quretî
**BK** kurteya /berî koçê/, beriya hicreta Cn. Pêxember ji Mekeyê ber bi Medîneyê
**bobelat** keresat, felaket
**-Xwedê bobelatê neyîne serê tu kesî** ez tûşî karesatekê hatim û tika dikim neyê serê tu kesî
**boç** boçik *"ji dînan re ne **boç** heye ne qorç heye"
**boçesêlîn** taweya bi boçik; miqilk
**boçik 1.** dêl, terî, dûv **2.** binik *"**boçik**a kûçikan, rast nabe"
**boçûn** raman, fikr, hizr
**boke** cesaret, wêrekî
**bokeberan** beranê şerkar
**bone 1.** munasebet **2.** sedem
**boqije** cureyekî çivîkan e
**boqil** geh, teşk
**bor [I]** bihur *"kerê ku di **bor**ekê de bikeve, careke din di wir re naçe"
**bor [II]** rengê sor
**boraq 1.** qurban **2.** nezr
**boran** cureyekî ba û barana ku lêkendên giran ber radibin
**borandin/diborîne/biborîne 1.** derbas kirin **2.** rabihurtin
**borebor** oreor
**borebor kirin** oreor kirin
**borî [I] 1.** derbasbûyî **2.** çûyî **3.** rabihurtî
**borî [II]** lûle
**borîn/dibore/bibore 1.** derbas bûn **2.** çûn *"kûçik diewtin, karwan **diborin**"
**bosî 1.** buxur **2.** xwarina şewitî
**bosîdank** buxurdank
**bosîn/dibose/bibose [I]** maç kirin
**bosîn/dibose/bibose [II]** bîsokî bûn
**bosle** qiblename
**bost** bihust
**boş 1.** zêde **2.** gur **3.** pir
**boşahî 1.** zêdeyî **2.** gum-

rahî **3.** pirî
**boşelan** **1.** ava lap boş **2.** rêl
**bot** **1.** kun, qul **2.** derz, qelş, cerx
**boyax** tiştê ku pê tê rengandin; gûn
**boyax kirin** rengandin
**boyaxker** pîşekarê rengandinê
**boz** rengê spî
**buhist** maweya bi qasî kefedesteke vekirî *"avê ku da ser serî, çi **buhistek** çi du buhist"
**buruntî** belgeya ku xwedîtiya kesekî ya li ser milkekî nîşan dide
**buruntî kirin** milkek li ser navê xwe dan qeyd kirin
**bux** hilm
**buxar** hilm û gilma ku li ser tiştên keliyayî dikeve
**buxçik** destmala ku kel û melî dikine navê
**buxur** çêreyên bûdar ên ku tên şewitandin da ku bêhneke xweş bidin doraliyê
**buxurdank** derdanka ku buxurê dikinê
**bû [I]** dawet, şahî
**bû [II]** bêhn
**bûcî** têjikên dêlikê; tûle
**bûçû** govenda dawetê
**bûdar** tiştê ku bêhn jê tê
**bûjen** daring, kereste
**bûk [I]** qûçê ku wekî tixûbê navbera du zeviyan de bi keviran tê jenîn
**bûk [II]** keça ku mêr dike, hevsera zavê *"**bûk** bi dilê zavê ye, çi pilepila melê ye"
**-bûka baranê** keskesor, heftreng
**-bûka berfê** heykelê ku ji berfê tê çêkirin
**-bûka ter û can** keça ku hîna mêr kiriye
**bûkanî** kinca ku bûk di roja dîlanê de li xwe dike
**bûkik** goştikê ku bi ser lêş ve hêşîn dibe
**bûkil** bûka nazenîn *"**bûkil**ê, ez şûkilê te me"
**bûm** kund
**bûn/dibe/bibe** **1.** hatin holê **2.** qewimîn **3.** rûdan *"**bibe** malavakirî, mebe malxerakirî"
**-bûn def** **1.** werimîn **2.** têr xwarin
**-bûn marê nîvkuştî** miraz di çavan de man
**-bûn stêrka bin ewran** ber çavan ketin û winda bûn
**-bûn ta û derzî** pir lawaz ketin
**-bûn tajiyê kuçeyan** riswa bûn û cihê paldanê nedîtin
**bûncî** kûçikê biçûçik

**bûnewer 1.** afirandî **2.** jîndar
**bûnewerî** giyanewerî
**bûra/bûrî** birayê jina zavê
**bûrîn/dibûre/bibûre** *(dewar)* orîn
**bûse [I]** şilekiya sermayê ya ku bi şev dikeve erdê; qiravî
**bûse [II]** kemîn, tele
**bûse [III]** ramûsan, paç
**bûyer 1.** rûdan **2.** tiştê qewimî *"her **bûyer**ek, ji mirovan re şîretek e"
**bûyîn/dibe/bibe** bûn *"**bûyî** mîr, Xwedê meke ji bîr"
**BZ** kurteya /berî zayînê/, berî mîlada Îsa eleyhiselamî

# C

**c/C** tîpa sêyemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke pêşezmandevî ye û di belavbûna wê de ziman li ser diranan dişide
**cabil** xercê ku pê dîwaran lê dikin
**cacik** benîşt
**cacim/carcim 1.** xalîçeya neqişandî **2.** çarşeva nivînan
**cacir** xwarina ku bi hingiv û gûzê tê çêkirin
**cade** di nava bajaran de riya erebeyan a fireh
**cadû** karekî destsivikiyê yî ku tiştinan di lisfê tiştên din de xuya dike; sîhir
**cadûbaz** kesê ku bi destsivikiyeke taybet tiştinan di dilqê tiştekî din de xuya dike; sîhirbaz
**cadûbazî** sîhirbazî
**cadû kirin** sîhir kirin
**cahil 1.** nezan, nebeled **2.** nûgihiştî
**cahiltî 1.** nezantî, nebeledî **2.** nûgihiştîtî
**cahiliye** rewşa nezaniyê ya beriya misilmanbûnê
**cahnî** kuriya mehînê; canî
**cahş 1.** têjika kerê **2.** xayîn
**cam** şûşe
**-cama nesaya** şûşeya girtikgirtikî û stûr a ku mirov çi di pişt de hebe nabîne
**-cama zelal** şûşeya tenik
**camax** zerekiya ku dikeve diranan
**-camax girtin** diran zer bûn
**came** kinc, cil
**camêr 1.** mirovê kaw **2.** destbelaş
**camêrtî 1.** kawtî **2.** destbelaşî
**camêrkî 1.** wekî kawan **2.** wekî destbelaşan
**camî** perestgeha misilmanan
**camûs** gamêş
**can [I] 1.** ruh, giyan **2.** jiyan ***"**mal vedigere, lê **can** venagere**"**
**-can avêtin 1.** bi dil û can xwe avêtin karekî an jî tiştekî **2.** pir hez kirin
**can [II]** ciwan
**canan** xweştivî, yarik

**canazar** teral
**canazarî** teralî
**canbaz 1.** lîstikvanê karên bixeter **2.** bazirganê ajalan
**canbazî 1.** lîstikvaniya karên bixeter **2.** bazirganiya ajalan
**canberî** ajaleke zeryayî ye
**canbexş 1.** Xwedayê efûkar **2.** cangorî
**canbêzar 1.** bêhnteng **2.** kesê ku dinya li ber çavan reş bûye
**canbêzar bûn 1.** bêhnteng bûn **2.** dinya li ber çavan reş bûn
**can dan 1.** mirin **2.** pir dil bijandin
**candar** ruhber
**candarî** jîndarî, ruhberî
**canega** ciwanega
**canecan 1.** jidil, samîmî **2.** kelecan
**canemerg** kesê ku di xortaniya xwe de miriye
**canfeda** cangorî
**canfes** qumaşê ku ji hewirmişê xwerû hatiye çêkirin
**cangiran** canazar, teral
**cangoçk** kesê ku zengilê dêrê dixe û filehan gazî dêrê dike
**cangorî 1.** şehîd, pakrewan **2.** kesê gu jiyana xwe ji bo riyeke pîroz dike gorî; fedayî
**canhêştir** sewaleke çolê ya stûdirêj e; stûdirêj
**canik** yar *"kî li hêviya **canik**ê maye, bê jin maye"
**canî 1.** têjika mehînê; cahnî **2.** tor û negihiştî
**canpola** kesê ku mîna polayê qayîm e
**canzerî** kesê ku ji ber nexweşî, tirs an jî lawaziyê rengê wî zer xuya dike
**car** sefer, qol, teql
**car caran/carinan** ne her timî, ne her wisa
**-cara xwe caranî kirin** dora xwe bi ser tu kesî ve bernedan
**-car hate ser carê bi qaydekî din gotin** heke heman tişt biqewime bertekeke tundtir nîşan dan
**cardin** sefereke din, qoleke din *"emrê çûyî, **cardin** nayê"
**caris** çêr, sixêf
**cariye 1.** xizmetkara jin
**2.** jina ku di cengê de dîl ketiye û wekî bendeyekê hatiye firotin
**carok** gêzî, siqayîl
**carû** bûjena ku pê dîwar tên seyandin; seya
**carûd** bêrik
**catir** çêreyek bêhndar a ku di xwarin û vexwarinan de tê bikaranîn

**caw 1.** pîne **2.** qumaş, pirtî *"**caw** dibe kitan, dew dibe derman"
**-caw cawê we ye û cawbir cawbirê we ye** kar û eleqeya me bi we tune ye û her tişt li ba we diqede
**cawbir** meqes
**cawker** raçandiyê qumêş
**cawî** diş
**cawîdan** ebedî, bêpayan
**cax [I]** şîşikên hûnanê
**cax [II] 1.** hewza di hundir de **2.** cerxa ku wekî refan di dîwêr de tê hiştin
**cax [III]** şîşên li dora pêlekan û paceyan
**cax [IV]** xwarineke ku ji çexşûr û hêkan tê çêkirin
**cazû** jina dekbaz a kone
**ceban [I] 1.** goristan **2.** gor
**ceban [II] 1.** abal **2.** newêrek
**cebar** cerahê keştek û endamên ku ji cih derketine
**cebilxane** cihê ku muhimata leşkerî lê tê veşartin û parastin
**cebirandin/dicebirî-ne/bicebirîne 1.** *(keştek)* tedawî kirin an jî *(endamê ku ji cih derketiye)* li şûna wî ya berê vegerandin **2.** *(têkiliyên xerabûyî)* bi rêk û pêk kirin **3.** *(kar)* têkûz kirin
**cebirîn/dicebire/bicebire 1.** *(keştek)* pak bûn an jî *(endamê ku ji cih derketiye)* di dewsa xwe de rûniştin **2.** *(têkiliyên xerabûyî)* bi rêk û pêk bûn **3.** *(kar)* têkûz bûn
**cedel 1.** nîqaş **2.** devjenî
**cedew** birîna serpîlên ajalan
**cefa 1.** derd **2.** westan **3.** zehmetî **4.** renc
**cegen** cureyekî giyayê nermik ê ku pê raxistinên malê, selik û hwd çêdibin; cîl
**ceh** zadê ku piranî ji bo xwedîkirina ajalan tê çandin *"**ceh,** qet nebûye genim"
**cehdasî** zadê ku hebên wî dişibihin cêh lê ji wan biçûktir in
**cehimandin/dicehimîne/bicehimîne 1.** qewirandin **2.** kuştin **3.** mirar kirin
**cehimîn/dicehime/bicehime 1.** qewirîn **2.** mirin **3.** mirar bûn *"se **bicehime,** mêvan bêşiv tên malê"
**cehişandin/dicehişîne/bicehişîne 1.** ji ser hiş birin, nehişî kirin **2.** bi

xwarin, vexwarin an jî bêhneke jehrînî kuştin

**cehişîn/dicehişe/bicehişe** **1.** ji ser hişê xwe çûn, nehişî bûn **2.** xwarinê jê girtin **3.** ji ber bêhneke jehrînî ji xwe ve çûn **4.** bi sedema jehrê mirin

**cehînî** xwarinên ku ji ardê cêh hatine çêkirin *"behaneya tirekan, nanê **cehînî** ye"

**cehter** catir

**cehzeran** **1.** dema zerbûna cehê zeviyan **2.** meha pûşperê

**cejn** **1.** eyd **2.** rojên şahiyê yên gelêrî *"**cejn**a salê, bi salê re dibihure"

**-cejna we pîroz be!** eyda we bimbarek bibe

**cejnane** eydanî

**celad** **1.** stûbir **2.** mêrkuj

**celaqî** doşava pir tîr

**celeb** **1.** cure **2.** keriyê pêz ê ku diçe ber kêrê **3.** hevsarê dewaran

**celebdar** bazirganê pêz

**celew** gema serê sewalên siwarbûnê

**cem** **1.** ba, hind **2.** tayê barekî **3.** selika mezin

**ceme** caw

**cemawer** ehalî

**cemawerî** milkiyeta gel

**cemed** her tiştê ku ji ber sermayê hişk dibe; qeşa *"xanî, li ser **cemed**ê ava nabe"

**cemedanî** pûşî, egal, şaşik

**cemexew** kincên dema razanê; pîceme

**cemidî** **1.** ji ber sermayê qerisî **2.** sar *"ava **cemidî,** ji kaniyan qut nabe"

**cemidandin/dicemidîne/bicemidîne** **1.** bi sermayê qerisandin **2.** sar kirin

**cemidîn/dicemide/bicemide** **1.** ji ber sermayê qerisîn **2.** sar bûn *"berf ketiye ku ling **bicemidin**"

**cemser** **1.** gopika sêrî **2.** bakur û başûrê tewereya ku di navenda dinyayê re derbas dibe; pol, qutb

**cenab** **1.** hêja **2.** berkeftî **3.** delal

**cenan** rezvan

**cenbelî** titûna ku kêşa wê sext e

**cendek** **1.** cesed **2.** laş

**cendere [I]** amûra ku pê karên hûnandî tên biriqandin

**cendere [II]** amûra guvaştinê

**cenet** rawestgaha dawîn a bawermendan; bihuşt *"bi peyvekê mirov diçe **cenet**ê, bi yekê mirov

diçe cehenemê"
**ceng** **1.** şer, herb **2.** cîhad
**cengawer** **1.** şerkar, şervan **2.** herbî **3.** mucahid
**cengebazî** **1.** şer û oxilme **2.** şerê bi deng û feng
**cengecol** **1.** cergebez **2.** dîlana têvel
**cengîn/dicenge/bicenge** **1.** şer kirin **2.** tûşî hev bûn **3.** cîhad kirin
**cengname** çîrokên li ser pêkhatin û bidawîbûna cengan
**cengwestan** **1.** agirbest **2.** heta demeke diyarkirî rawestandina şer
**ceqin** *(bi meşê)* riya rojekê
**cer** mixê badayî
**cerbader** amûra ku pê mixên badayî tên şidandin û sistkirin
**cercer** **1.** gêre **2.** kam
**cerde** **1.** êrîş **2.** talan û desteserî
**cerdevan** **1.** êrîşkar **2.** talankar
**cerg** kezeb
**cerge** xeleqa endazeya wê 360 derece ye
**cergebez [I]** kezeba ku tevî don dibirêjin
**cergebez [II]** **1.** dîlana têvel **2.** govenda ji jin û mêran pêkhatî
**ceribandin/diceribîne/biceribîne** **1.** îmtihan kirin **2.** ezmûn kirin *"**ceribandin** ji neceribandinê çêtir e"
**ceribîn/diceribe/biceribe** **1.** îmtihan bûn **2.** ezmûn bûn *"dewê **ceribî,** di firekê de jî tê vexwarin"
**cer kirin** mixên badayî tê de çikandin
**ces** seyaya ji kilsê
**cesed** laş, term
**cew [I]** hebrîng
**cew [II]** rê û rêça avê; co
**cewahir** kevirên binirx û giranbiha *"axa mala mirovî, ji **cewahir**ê xelqê çêtir e"
**cewdik** meşkeke piçûk a ji bo avê ye
**cewêlek** xortê nûgihayî yê ku simbêlên wî derneketine
**cewî** benîştê dara çamê
**cewr/cewrik** têjikên se û guran; tûle *"ji dêlên tirol, **cewr**ên gurxenêq nakevin"
**ceza** ji ber tawanekî ve darizandin; seza
**-cezayê giran** sezaya qedexeyeke bixeter
**-cezayê sermedî** sezaya bendîkirina heta mirinê
**-cezayê sivik** sezaya tawaneke ne bixeter
**ceza kirin** ji ber tawanê

ve berpirsiyariyek lê barkirin

**cezwe** derdana ku qehwe tê de tê kelandin; çoçik

**cêmik** cêwî

**cênik** **1.** bisk **2.** valahiya ku li fêza hestiyê di bin biskan de ye

**cêr** **1.** kûzê avê **2.** her cure kûzê ji kaxetîtê *"**cêr**ê nû, ava wî sar e"

**cêrg** cureyekî govendan e

**cêrge** gerdeniyeke ku zêr û mûriyan pê de dikin û piranî jin davêjin stû û qeydikên destên xwe

**cêrifk** gêziya bi destik

**cêwî** **1.** du zarokên ku bi hevalcihî tên dinyayê **2.** du tiştên bi hev re

**cêwtik** kîsê çermîn

**ciger** kezeb

**cigerxwîn** pir xemgîn

**cigur** rojeke geşt û seyranê ye

**cih** **1.** dews, şûn, war **2.** mekan

**-di cih de** guncan *“ qenciya ku ne **di cih de** be, vala ye”

**-cihê daxê ye** pir mixabin

**-cihê şanaziyê** sedema kêfxweşiyê

**cihê** **1.** cuda **2.** veqetî **3.** ciyawaz

**cihê bûn** veqetîn

**cihê kirin** veqetandin

**cihêreng** **1.** bi serê xwe **2.** ciyawaz

**cihêrengî** **1.** cudatî **2.** rengînî **3.** ciyawazî

**cihêtî** **1.** cudatî **2.** ciyawazî

**cihêz** kel û melê ku malbavan û xezûrgelanê bûkê didinê û paşê siwar dikin *"bextê dê, **cihêz**ê qîzê ye"

**cihok** cew *"heta **cihok** rast nebe, av nayê berdan"

**cihû** zaroken Îshaq eleyhiselam ên ku Tewrata Mûsa eleyhiselam ji wan re hatiye hinartin *"ji malê **cihû**yan bixwin, li mala filehan razên"

**cil [I]** **1.** kinc **2.** libas **3.** lixwekirin

**cil [II]** berzîna ku di bin zîn an jî baran de davêjin ser pişta sewalên barkêş *"ga, bi **cil**an nayê naskirin"

**cil [III]** **1.** berik **2.** xalîçe *"filan kes **cil**a şil e *(pêgiran û teral e)*"

**cildank** cihê ku kinc lê tên danîn, istêre

**cildirû** alava dirûtinê

**cilik** **1.** raxistinên nava malê **2.** berzînên bin zîn û baran **3.** kincên peritî û qirêj *"sar e cilik sitar e, germ e **cilik** şerm e"

**-cilika wî xwar bûye** **1.**

karê wî ne baş e, rewşa wî ne baş e **2.** ketiye tengasiyê
**cilq** **1.** xerabûyî **2.** vîrçoqî
**cilşok** cihê ku kinc lê tên şûştin
**cin** mêçêtir, hin giyanewerên ku mirov nabînin
**cinaq** hestiyê sersînga firindeyan
**cinawir** **1.** dêw, ûc **2.** hov, kovî
**cincilî** ava safî
**cindê** **1.** rindê **2.** ezîze
**cindî** **1.** rind **2.** kaw
**cineh** şiva serçomax, çoyê sergulpik
**cinê kirin** pembû berhev kirin
**cinên** baxçeyê biçûk
**ciniqandin/diciniqîne/biciniqîne** tirsandin
**ciniqîn/dicinique/biciniqe** tirsîn
**cinûs** lanet
**cinûsî** lanetî
**cir** **1.** sohbet **2.** xwî û xislet
**cird** mişkê girs
**cire** pevçûn
**cirik** kurmê ku hewirmişî çêdike
**cirî** xwarin, kel û melê kesê ku bi şevederî li cihekî dimîne; erzaq
**cirîd** lîstikeke bi hespan e
**cirk** merhem
**cirm** ji tawanbariyê para ku dikeve stûyê mirovî
**cirnexweş** xeysetpîs
**cis** kils
**cisane** kilsxane
**cism** heyberên şênber
**-cismên esmanî** heyberên wekî roj, stêrk, heyv û hwd
**civak** koma mirovan
**-civaka çîndar** civaka xwedî-tebeqe
**civakî** têkildarî koma mirovan
**civaknas** pisporê ku komekên mîrovahiyê tehlîl dike
**civaknasî** beşa pisporiyê ya ku komekên mirovahiyê tehlîl dike
**civan** dem û cihê beşkirî yê hevdîtinekê
**civandin/dicivîne/bicivîne** **1.** berhev kirin **2.** tomar kirin **3.** kom kirin **4.** anîn ser hev ***"**kewê çê, kewan li xwe **dicivîne"**
**-civandina hêzên leşkerî** ji bo armancên ewlehiyê neqlkirina beşeke artêşê li cihê ku pirsgirêk lê hene
**civat** **1.** cemiyet **2.** komele ***"civat** li mala pîrê ye û pîrê li mala xelqê ye**"**
**civatgeh** **1.** jûra rûniş-

tinê **2.** di malperê de pergala ku destûra hevpeyvîna zindî û nivîskî dide
**civatname** name an jî berhevoka ku şîret û boçûnên civînê tê de hatine tomarkirin
**civîn/dicive/bicive** **1.** bi ser hev de hatin **2.** tomar bûn **3.** kom bûn **4.** berhev bûn
**civîn** kombûna ji bo mijarekî
**-civîna awarte** kombûna ji bo karekî neasayî
**-civîna çapemeniyê** kombûna ku ji nûçegihanên raya giştî re vekirî ye
**ciwan** **1.** xort **2.** nû **3.** bedew **4.** ter û taze
**ciwanik** banû, xanim,
**ciwanega** gayê ciwan ê nugihayî; canega
**ciwanî** **1.** xortanî **2.** bedewî **3.** terîtî *"nezan î, mêl bistîne bi **ciwanî**"
**ciwên** **1.** dijûn **2.** xeber **3.** sixêf **4.** buxtan **5.** devavêtin **6.** gotinên kirêt
**cixare** baçik
**-cixare kişandin** baçik kêşan
**cixirandin/dicixirîne/bicixirîne** **1.** nav tê dan **2.** tehrîk kirin **3.** niçandin
**cixirîn/dicixire/bicixire** **1.** bi ber bayê tiştekî ketin **2.** xapîn
**ciyawaz** **1.** cihê, cuda **2.** veqetî
**ciyawazî** **1.** cihêtî, cudatî **2.** rengînî
**-ciyawaziya regezî** qurebûna neteweyekî li ser yeke dîtir
**cizdank** peldank
**cî** cih *"dînan mal dî, **cî** nedî"
**cîderk** *(r)* **1.** şûna ku deng jê derdikevin **2.** çavkanî
**cîgir** **1.** wekîl **2.** cînişîn
**cîhad** şerê di riya Xwedê de
**-cîhad kirin** di riya Xwedê de şer kirin
**cîhan** **1.** dinya **2.** alem *"azadî bi qasî firehiya **cîhan**ê ye"
**cîhangiştî** alemî, gerdûnî
**cîhanî** **1.** dinyayî **2.** ji vê alema kordûnde
**cîhaz** amûrên ku bi gêrebayê dixebitin
**cîher** navnîşana ku tiştê şandî dê herê
**cîl** cureyekî çêreya nermik û dirêj e; jê xesîl, selik û çît tên çêkirin
**cînavk** *(r)* peyvên ku li dewsa navdêran tên bikaranîn

**cîran** **1.** kesê ku mala wî nêzîkî mala yekî din e **2.** kesê ku karê wî nêzîkî karê yekî din e *"**cîran**ê xerab bihêle, diranê êşyayî bikşîne"
**cîrantî** **1.** temtêla kesên ku malên wan li kêleka hev in **2.** temtêla kesên ku kargehên wan li kêleka hev in
**cîwar** **1.** herêm **2.** dever **3.** mekan **4.** mintiqe
**CNK** kurteya Civata Niştimanî ya Kurdistanê ya ku niha navenda wê li Hewlêrê ye
**co/cok** cew
**cobar [I]** **1.** çem **2.** newal, xendeq
**cobar [II]** şiva ku pê hoyî gayê cot dikin
**col [I]** **1.** keriyê pez, dewar û hwd **2.** koma keriyên ku kesek tenê diçe ber **3.** tevlihev û rengrengî
**-col û cobal** naxira dewêr
**col [II]** zincîr
**-col kirin** zincîr kirin
**col [III]** kombûn, lêbanîn
**-colî serê yekî bûn** komî hinda yekî bûn, li yekî banîn
**colane** rûnişteka ku bi bendan bi jorê ve girêdidin û xwe tê de dihejînin
**colandin/dicolîne/bicolîne** *(xwe di colaneyê de)* hejandin
**coleke** cihû
**comerd** **1.** destbelaş **2.** dayende **3.** destfireh *"deriyê cinetê, **comerd** vedikin"
**comerdî** **1.** destbelaşî **2.** dayendetî **3.** destfirehî *"**comerdî** bi dayînê dibe"
**conega** ciwanega
**coq [I]** **1.** nîr, nîrik **2.** xeleqên bi ser hev ve; zincîr
**coq [II]** kînor/kunêr
**coqcoq** elok
**coş** **1.** heyecan **2.** peroşî **3.** kelecan
**coşandin/dicoşîne/bicoşîne** **1.** demên bi heyecan jiyandin **2.** anîn kelecanê
**coşîn/dicoşe/bicoşe** demên bi heyecan jiyîn
**coşî** **1.** heyecan **2.** peroşî **3.** kelecanî
**cot [I]** **1.** zo **2.** du lib *"**cot**eke birayan, meçîne nêçîra guran"
**cot [II]** **1.** amûra ku erdê ji çandiniyê re eywez dike **2.** karê çandiniyê *"**cot,** bi gayê pîr nabe"
**cot bûn** **1.** zo bi zo bûn **2.** *(erd)* ji çandiniyê re amade bûn **3.** zewicîn
**cotkar** çandiyar *"gotin:

'**cotkar**o tu çi diçîni?'; got: 'heke hêşîn be tu dê bibîni' "

**cot kirin** **1.** zozoyî kirin **2.** erd tev rakirin, çandin **3.** zewicandin

**cotyar** cotkar *"berf li zozana tê rim rim, li deştê şîn tê genim, **cotyar** dibe hakim"

**coxîn** bêder

**cuda** cihê, ciyawaz *"bira bira ye, bazar **cuda** ye"

**cudahî** cihêtî, ciyawazî

**cudaxwaz** kesê ku doza cihêbûnê dike

**cuher** xurcika ka û cêh a ku bi serê sewalê de tê daliqandin

**culux** elok

**cunûtin** erdê şil

**cur bi cur** rengrengî, celeblecebî

**cure** **1.** tehr, awa **2.** reng, celeb **3.** şêwe

**curnik/curnî** çalik û kortikên li ser keviran

**cûbrik** bihoka çirçirok

**cûcik** têjika çivîkan

**cuzam** nexweşiyeke çermî ye

**cûm [I]** **1.** bi qasî cûtina carekî benîşt **2.** benîşt

**cûm [II]** cihê ku lê tevn tê raçandin

**cûmik [I]** bi qasî cûtinekî benîşt

**cûmik [II]** dezgehê tevna ku tejên dirêj tê de tên raçandin

**cûmî cela bûn** binevat bûn

**cûmker** kesê ku tevnan radiçîne *"goşkar pêxwas in, **cûmker** bêkiras in"

**cûmkerî** karê raçandina tevnan

**cûn [I]** **1.** cûniyê ser keviran, kortika kêvir **2.** kortala dankutanê

**cûn [II]** **1.** tov **2.** avik

**cûn [III]** parçe, tîke

**cûn [IV]** **1.** gewr, rengê hêşînkew **2.** kever *"rêç rêça kera **cûn** e, sûc sûcê bûkên nû ne"

**cûn [V]** gûn, reng

**cûn [VI]** cûyîn, cûtin

**cûnî** curnik

**cûrnik** çalên li ser keviran ên av tê de dicive

**cûtin/dicû/bicû** cûyîn

**cûyîn/dicû/bicû** **1.** di nava diranan de hêran **2.** di dêv de gerandin **3.** pêpest kirin û ked xwarin **4.** sox kirin

# Ç

**ç/Ç** tîpa çaremîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke pêşezmandevî ye û di belavbûna wê de ziman li ser diranan dişide

**çaçûl** mirovê bêkêr î nebaş

**çadir** xîvet

**çadirgeh** komek çadirên ku li warekî hatine vedan

**çak** **1.** xweşik **2.** baş **3.** çê

**çakbîn** **1.** xweşbîn **2.** bêhnfireh

**çakrewiştî** xwîpaqijî

**çakil** **1.** çengel **2.** du çengelên ku bi ser darekî ve dikin da ku pê du satilên avê mil bikin

**çaksaz** kesê ku rêbazên kevn nûjen û bipergal dike

**çaksazî** hişmendiya tezekirin û têkûzkirina rêbaz û ramanên dembihurî

**-çaksaziya çandiniyê** têkûzkirina kar û barên ziraetê bi rêbazeke nûjen

**çal [I]** **1.** kortal **2.** dewx, cerx **3.** kort *"biçûk kêvir bavêje **çal**ê, mezin nikare derxîne"

**-çal kirin** **1.** binax kirin **2.** gor kirin **3.** bi axê nixamtin **4.** veşartin *“mar dibêje: min bikuje bi dijminatî, **çal ke** bi dostî”

**çal [II]** enîbeş, nehtikbeş

**çalak [I]** **1.** pêsivik **2.** destsivik **3.** bi awayekî giyanewer hîna jî dijî

**çalak [II]** **1.** di wê heyamê de ew malper dişixule **2.** di wê heyamê de ew hesabê wî tê bikaranîn

**çalakger** peywirdarê xebatekê

**çalakî** bizava bibandor

**çalepîka** çarlepkî

**çam** bûyerên dilsoj

**çand** hemû heyiyên gelekî; ferheng

**çandî** têkildarî heyiyên gelekî; ferhengî

**çandin/diçîne/biçîne** tov li erdê raçandin û çikandin

**çandinî** ziraet

**çandiyar** ziraetkar, cotkar

**çap [I]** karê weşanê

**çap [II]** hêza şiyanê
**çap [III]** bi qasî ku çavek dibîne
**-di çapa dêv de lêxistin** di ser û çavan de kulmeke muhkem danîn
**çap [IV]** gav
**çap bûn** ji weşanê re amade bûn
**çapemenî** cîhana her cureyên weşanê
**çaper** alava ku nivîsan li hev zêde dike
**çapez** çaydank, qorî
**çapger** kesê ku weşanekê di çapxaneyê de li hev zêde dike
**çap kirin** **1.** nivîs weşandin **2.** pirtûk li hev zêde kirin
**çaplûs** melaq, laloş
**çaplûsî** melaqî, laloşî
**çapûk** selika kincan
**çapxane** kargeha ku weşanan li hev zêde dike
**çaq** geh, teşk, çîp *"şûrê kê tûj be, bila li **çaq**a min bikeve"
**çaqrût** **1.** çîprût **2.** şeqrût
**çar [I]** **1.** hejmara beriya pêncan piştî sisiyan **2.** jimareya 4'an
**çar [II]** serwerên Ûrisata berê
**çar [III]** **1.** hel **2.** rêbaza dermankirina arîşe û pirsgirêkan
**-çar bûn** **1.** peyde bûn, pêk hatin **2.** bi dest ketin
**-çar kirin** **1.** bi dest xistin **2.** pêk anîn
**çarbazî** çargavî
**çarçef** pîneyekê çarkujî yê ku bi ser text û nivînan tê raxistin
**çarçek** **1.** çekgirêdayî **2.** silehşor
**çarçive** şeklê çargoşekî
**çarçive kirin** di şeklekî çargoşekî de dewisandin
**çarçîk** cihê av û heriyê
**çardar** tabûta miriyan
**çardeh** **1.** hejmara beriya pazdehan û piştî sêzdehan **2.** jimareya 14'an
**çardehem*(în)*** di rêza çardehan de
**çarder** çarçiveya dêrî
**çarem*(-în)*** di rêza çaran de
**çarenûs** **1.** qeder **2.** aqibet
**-mafê çarenûsê** heqê rêbijartinê
**çareserî** **1.** hel **2.** derman
**çareser bûn** **1.** hel bûn **2.** derman bûn
**çareser kirin** **1.** hel kirin **2.** derman kirin
**çarêk** çaryek
**çargavî** xara sewalên çarpê ya hera lezgîn
**çargoşe** şeklê ku li ser

çar çiman ava bûye; çarkujî
**çarix** cureyekî solên berê ye *"**çarix**an ji san re çêkin, dê çarixên xwe bixwin**"**
**çarîn** helbesta ku ji çar ristan pêk hatiye
**çarkujî** çargoşe
**çarlepkî** birêveçûna zarokan a li ser dest û çongan
**çarmedor** her çar teref
**çarmêrkî** rûniştina li ser ling û qûnê
**çarmix** şeklê wekî zêdekê/(+)'ê
**çar neçar** bivê nevê
**çarnikar** çarmedor, her çar teref
**çarpare** tiştê ku ji çar parçeyan pêk hatiye
**çarpê** çarsim
**çarpêkî** bi her çar piyan
**çarpîne** derewker
**çarsim** sewalên ku çar lingên wan hene
**çarsim axa** kerê nêr
**çarsî** **1.** asîtan **2.** bazar **3.** cihê ku girêdanên civakî lê tên pê
**çarşem** roja piştî sêşem û beriya pêncşemê
**çarşev** çarçef
**çartaq** hêwana bilind
**çartek** bi temamî, bi giştî
**çartil** alava ku pê giha tê civandin
**çarwe** amûreke mûsîqî ya ku bi serê tiliyan ve tê kirin û wisa tê lêxistin
**çaryek** ji çar paran jê parek
**çasir** **1.** parsek **2.** xwestok **3.** gerok
**çat** pîne
**çatan** *(da ku zêdetir kayê lê bar bikin)* pîneyê zexm ê ku davêjin ser selika erebeyê
**çaterê** **1.** averê **2.** fetlonek
**çatkêş** parçeyeke hesînê ku pê lûleya tivingan tê paqijkirin
**çatole** **1.** xîvetok **2.** konik
**çav** endamê dîtinê yê giyaneweran e *"bila bextê mirovî hebe, bila **çav**ekî wî jî tunebe**"**
**-çav berdan** **1.** dil bijandin **2.** daxwaz kirin
**-çav ji sêrî pengizîn** ji ber şaşwaziyê çav lê zoq bûn
**-çav lê bûn** **1.** raçav kirin **2.** payîn **3.** li bêndê man
**-çav lê bûn bizota êgir** **1.** bêhn lê teng bûn **2.** pir nexweş bûn
**-çav lê gerandin** teselî kirin
**-çav lê rijîn** kor bûn
**-çav pê ketin** dîtin

**-çav qurçandin** jê re çav kirin
**-çav şêlî kirin** *(çav)* gewr û nebîna bûn
**-çavê xwe jê re çîro-vîro kirin** gef û gur lê xwarin
**çavbeloq** çavzoq
**çavbirçî** **1.** têrnexur **2.** laylac
**çavdêrî** **1.** raçavî **2.** payîn
**çavdêrxane** cihê ku ji bo raçaviyê hatiye sazkirin
**çavêş** êşa çavan
**çavêşî** kesê ku çavên wî diêşin
**çavfireh** **1.** destbelaş **2.** camêr
**çavgirêdan** **1.** çavgirtonek **2.** xapandin, çav lê tarî kirin
**çavgirêdayî** kesê ku nezan nezan noqî nav karan dibe
**çavgirtonek** cureyekî lîstikên zarokan e
**çavik** **1.** sorikên ji ber nexweşiyekê **2.** bûjenên ku dewsa berçavkan datînin ser reşika çavan
**çavî [I]** **1.** qul **2.** qisim **3.** di maseyan de cihê ku tiştek lê tê danîn *"kanî, di **çavi**yê de şêlû ye"
**çavî [II]** di raçandinê fetlên hûnanê
**çavînî bûn** nezer lê gir-tin
**çavînî kirin** nezer lê xistin
**çavkanî** jêderk, makder, menşe
**çavkorevîşkî** kesê ku çavê wî biçûk û girover in
**çavlider** **1.** kesê ku berê xwe dide jinên xelqê an jî dikeve bin mineta xelqê **2.** kesê ku li ben-da alîkariya biyaniyan e
**çavmiç** çavgirtî
**çavnebar** dexes
**çavnebarî** dexesî
**çavnêr** zêrevan
**çavnêrî** çavdêrî, zêrevanî
**çavniq** kesê ku qenciyan zû ji bîr bike
**çavreşî** dexesî, çavnebarî *"nan, pîvaz û nexweşî, **çavreşî** ne"
**çavsax** kesê bîna yê ku ji koran re rênîşandê-riyê dike
**çavsivik** **1.** biçûkdîtî **2.** qure
**çavsor** **1.** kesê ku tasa çavên wî tijî xwîn bûye **2.** sitemkar, zordest
**çavşirtik** **1.** kesê ku bi çavêşê ketiye **2.** kesê ku pê nabe ser û çavên xwe bişo
**çavşortav** çavşirtik
**çavşûjin** çavên asyayî

**çavşîn** çavsût, çavkesber *"keçel dimire porsor dibe, kor dimire **çavşîn** dibe"
**çavteng** bexîl, timakar
**çavtirsandîtî** newêrektiya bêhemd
**çavtirsiyayî** **1.** newêrek **2.** teral **3.** xweranegirtî
**çavxezal** çavbedew
**çaw** **1.** dara ter **2.** şiv **3.** çirpî **4.** bendekiya ku gurzê giyayê çinandî pê tê girêdan
**çawa** çi tehrî, çito
**çawanî** awayê pêkhatina heyberan
**çax** **1.** dem, zeman **2.** heyam **3.** gav *"gur û hirç bûn destbirak, dinya bû **çax**ê mehdiyê zemên"
-**çaxê seholîn** sedsalên ku li her derê serma û seqem serdest bûye
-**di çax û benda hev de bûn** di heman temen û bejnê de bûn
**çay** giyayekî belgên wî tê hişk-kirin, heta ku rengê wî werdigere sorahiyê di ava kelandî de tê rawestandin û paşê di piyanan de tevî şêkir tê vexwarin
-**çaya berçovî** çaya kêfê
**çayger** kesê ku çayê belav dike, çaybelavkirî
**çayxane** cihê ku lê çaya pijandî tê firotin
**çazan** kesê ku rewşan bi hikmetê dadihûrîne; hekîm
**çazanî** hekîmtî
**çek [I]** kinc, cil
**çek [II]** sileh *"**çek** ne ya hemû kesî ye, lê nefs ya hemû kesî ye"
-**çeka lûledirêj** sileha ku menzîla wê dûr dikşîne; çapdirêj
**çekên komkujiya girseyî** silehên giran ên ku qirkirina giştî pêk tînin û binçirka giyaneweran diqelînin
-**çek danîn** şer rawestandin
**çekbend** kinca bêmil; qutik
**çekçekûle** barçêrmk
**çekdar** silehdar
**çekebazarî** bazarkirina bi cedel û gengeşî
**çelak** çakil
**çelake** darikê dirêj û devçeqel ê ku pê gûz û hwd tê çinîn
**çelandin/diçelîne/biçelîne** jê spîldax derbas kirin
**çelçelok** **1.** pirbêj **2.** zimandirêj
**çele** **1.** çil rojên her werzê **2.** çil rojên zivistanê yên pêşîn û paşîn

**çeleçel kirin** **1.** galegal kirin **2.** zimandirêjî kirin
**çelek** xwarbûna wekî serê çoganê
**çeleme** cînaq
**-çeleme girtin** lîstina bi cînaqan
**çeleng** **1.** bi îhtişam **2.** bedew **3.** wêrek
**çelexane** **1.** çil rojên jina welidî **2.** rewşa selexanetiyê
**çelitandin/diçelitîne/biçelitîne** **1.** ji qêlik derxistin **2.** herişandin
**çelitîn/diçelite/biçelite** **1.** ji qalikê xwe bişkuvîn **2.** herişîn
**çelixt** werm
**çel kirin** **1.** axaftin **2.** vegotin
**çelp** dengê awayê vexwarinê yî kûçikan
**çelpandin/diçelpîne/biçelpîne** **1.** bi serê zimên wekî kûçikan vexwarin **2.** herimandin
**çelpeçelp** dengê domdar ê ku ji awayê vexwarinê yî segan tê
**çelpeçelp kirin** **1.** çelpandin **2.** bi gotinên beletewş axivîn
**çelqandin/diçelqîne/biçelqîne** **1.** hejandin **2.** av tê werdan **3.** kiyan
**çelqîn/diçelqe/biçelqe** *(tiştê avî)* li hev ketin û hejîn
**çelte** **1.** gal**e**gal, gotegot **2.** gotinên bêbingeh; îftira **3.** galteyên soxkirinê
**çelûz** pirsok
**çelziman** **1.** devbelaş **2.** devçepel
**çem [I]** **1.** rûbar **2.** newala ku av tê re dikişe *"**çem,** ji kaniyan çêdibe**"**
**çem [II]** **1.** mij û moran **2.** ewrawî û bidûman *"gur di **çem**ê de har dibin**"**
**çemandin/diçemîne/biçemîne** **1.** tewandin **2.** qurifandin
**çember** xeleq
**çembil** **1.** qulp **2.** bistik *"**ê** ku dîzikê çêke, dê çêmbil jî pê bixe**"**
**çemçûr** kêça belçikan
**çemçûs** çikûs, bexîl
**çemedank** derdana ku mirov kel û melê xwe dixê û davêje milê xwe
**çemîhanî** baxçeyê darên tûyê
**çemîn/diçeme/biçeme** **1.** tewîn **2.** qurifîn
**çemk** **1.** feraset **2.** zihniyet
**çemole** **1.** şûm **2.** nehewayî **3.** belakirî
**çempal** barê biçûk ê ku datînin ser barî; serbar

**çenberî** erebeya siwarbûnê
**çençûz** çiriz
**çend** çiqas *"**çend** çiya hene, ên kurdan e"
**çendanî** tekildarî hejmar û miqdarê
**çendemîn** **1.** çendem **2.** a çendan **3.** kîjan
**çenebaz** **1.** çelziman **2.** devçepel **3.** devbelaş
**çeneçen** **1.** zimandirêjî **2.** çeleçel
**çeng** **1.** kulm, kefa dêst **2.** qulac *"teyr bi **çeng**an difire, mêr bi mêran dixwire"
**-çeng dan hev** **1.** bi hev re meşîn **2.** destyariya hev kirin
**çenge** **1.** erzên **2.** goşe, çim
**çep** **1.** dijbera aliyê rastê **2.** çep
**çepel** **1.** qirêj, gemar **2.** reş û tarî **3.** kirêt, mujikî *"gayê **çepel** tim golik e, merivê çepel tim lawik e"
**çeper** kozik, mewzî
**çeperast** **1.** rû bi rûyî hev, hevrû **2.** hemberî hev
**çepik** lêdana destekî li destê din
**-çepik lê dan** **1.** kefên her du destan li hev xistin **2.** pesna karekî dan
**çepil** endamê ji enîşkê heta sermilê
**-di çepilê yekî de girtin û avêtin derve** qewirandin
**çepîn** kesê ku destê xwe yî çepê baş bi kar tîne
**çepken** **1.** nefeq **2.** qula ji her du aliyan ve vekirî
**çeqçeq** çêreyek e
**çeqçeqok** darê berêş *"aş çûye, ew li pey **çeqçeqok**ê ketiye"
**çeq** ling, qiç
**çeqel** dudevî
**çeqene** cureyekî daran e
**çeqrût** lingrût, qiçrût
**çeqûber** alavên ku ne bi serê xwe lêbelê bi hêza mirovan dixebitin
**çerçî** firoşkarê gerok *"çi bi **çerçî** re be, wî difiroşe"
**çerixandin/diçerixîne/biçerixîne** **1.** zivirandin **2.** jê averê kirin
**çerixîn/diçerixe/biçerixe** **1.** zivirîn **2.** jê averê bûn
**çerm** çêrm
**çermik** çêrmik
**çermesor** çêrmsor
**çerx** **1.** kevirê alavtûjkirinê **2.** alava ku devê pênûsa darînî tûj dike *"**çerx**a felekê, geh li jêr e geh li jor"
**çerxe** **1.** taye **2.** toterîk

**çerxeme 1.** zembîl, selik **2.** çapûk
**çerxetûn** tawe, miqilk
**çerxê/çerxo** mirovên ku mal bi mal digerin, navmalangerî *"**çerxê** berê bêsol bû û îdareya me di dêst de tunebû, îcar di piyan de sol jî hene"
**çesp** bûjena zeliqandinê
**çespan 1.** çeleng, zîrek **2.** kêrhatî
**çespandin/diçespîne/biçespîne [I]** bi çespê du tişt bi hev ve zeliqandin
**çespandin/diçespîne/biçespîne [II] 1.** îsbat kirin **2.** eşkere kirin
**çespîn/diçespe/biçespe [I]** du tişt bi çespê bi hev ve zeliqîn
**çespîn/diçespe/biçespe [II] 1.** dan îsbatkirin **2.** dan pejirandin
**çet 1.** zor, dij **2.** astengî
**çete** zordest
**çetel** amana pêxwarinê a ku bi devê wê ve çend tilî hene
**çetewil 1.** cerde **2.** rêgir
**çetin 1.** zor **2.** dijwar
**çetin bûn 1.** zor bûn **2.** dijwar bûn
**çetinî 1.** zorî **2.** dijwarî
**çetir [I] 1.** sîwan**,** sîtavk **3.** paraşût
**çetir [II] 1.** dîkê mirîşkê **2.** elokê nêr
**çetirbaz** paraşûtvan
**çevandin/diçevîne/biçevîne** *(wekî çenberê)* tewandin
**çewal** telîsê mezin
**çewir** bez, don
**çewlik** mezre
**çews** pêkutî
**çewsandin/diçewsîne/biçewsîne 1.** daqultandin **2.** pêpest kirin
**çewsîner** zordest, zalim
**çewt** xelet
**çewtî** xeletî
**çewênder** silqa ku jê şekir tê bidestxistin
**çexer 1.** pê **2.** şûnpê
**çê 1.** qenc **2.** baş *"gayê **çê** bi baran, mêrê çê bi xeberan"
**çêbuwar** tiştê ku ne eslî ye, qulebî
**çêbûn/çêdibe/çêbibe 1.** afirîn **2.** pak bûn **3.** qewimîn, rûdan
**çêj** tahm, lezet
**-çêj jê wergirtin** bi kêfa xwe jê xwarin, vexwarin û kelk wergirtin
**çêjdar** bitahm, bilezet
**çêjandin/diçêjîne/biçêjîne 1.** tahm kirin **2.** jê xwarin û vexwarin
**çêker 1.** tehmirkar **2.** paker **3.** afirîner
**çêkirin/çêdike/çêke 1.** afirandin **2.** pak kirin **3.**

temhîr kirin **4.** anîn holê *"ka tunebû, kadîn **çêdikir**"
**çêl** kevir, zinar, sel
**çêlaxî 1.** dibûr **2.** hevrazê ku naverasta wê kort e
**çêlek** dewara mê ya ku di-zê û tê dotin; mange *"bêndera ku **çêlek** li ser bigere, ew çi bênder e"
**çêlik** têjik *"kund **çêlik**a xwe dixwe û paşê bi ser de digirî"
**-çêlik anîn** têjik anîn
**çêlî** nifş, nesl
**çêlkew** têjikên kewan
**çêl kirin 1.** behs kirin **2.** qal kirin **3.** jê xeber dan
**çêlûs** pirsok, kesê dermanê her kulê dipirse
**çênî 1.** xwarina çivîkan **2.** qûtê mirîşkan
**çêr** dijûn, sixêf
**-çêr lê kirin** jê re xeberên nebaş û dijûn gotin
**çêrandin/diçêrîne/biçêrîne 1.** sewal birin çêreyê, likijandin **2.** dekbaz û fêlbaz bûn
**çêrbaz** sixêfkar, dijûnkar
**çêre 1.** giyayê ter **2.** hêşînahî *"**çêre** çiqasî nerm bibe jî, di bin kêvir de nasekine"
**çêrek** çêrbaz
**çêregeh** cihê ku lê giya heye; mera
**çêrîn/diçêre/biçêre 1.** çêre xwarin, likijîn **2.** binê feraqên xelqê alastin *"berxê ku têr şîr nexwar, bi kavirtî jî têr **naçêre**"
**çêrm 1.** postê li ser termî **2.** derveyê cendêk *"ji mêran nav dimîne, ji gayan **çerm** dimîne"
**çêrmik** postê ziravik û tenik
**çêrmesor** emrîkiyê xwerû
**çêrt** zîrç, rîç
**çêtir 1.** qenctir **2.** baştir *"jin heye, ji sed mêrî **çêtir** e"
**çêtî kirin 1.** parçeparçeyî kirin **2.** qutqutî kirin
**çêyî** qencî, başî
**çi** peyveke ku der heqê tiştan de pirsiyariyê dike
**-çi got** mijara gotina wî çawa bû?
**çiç** *(di zimanê zarokan de)* memik
**çiçik 1.** berê mirovan **2.** endamê şîrî yê giyaneweran; hingil, girêş
**çift** refes û lotika sewalan
**-çift avêtin** *(sewal)* bi lingê paşîn pehîn avêtin
**çiftexas** qumaşekî spî ye; patisqe
**çik 1.** şipê **2.** li ser xwe
**-çik çik!** kîteyeke ku ji zarokan re tê gotin da ku jipiyan bisekinin

**-çik rabûn ser piyan** rasterast rabûn ser xwe
**çikeçik** bi dirêjahî
**-çikeçik di erdê de kutan** bêyî ku xwar bibe bi awayekî rasterast di xweliyê de çikilandin
**çikandin/diçikîne/biçikîne** **1.** dar û stûn bi dirêjayî bi cih kirin **2.** hilm û nefes birîn
**çikilandin/diçikilîne/biçikilîne** tê de bi dirêjayî dewisandin
**çikilîn/diçikile/biçikile** tê de bi dirêjayî bi cih bûn
**çikindir** silq
**çikîn/diçike/biçike** **1.** dar û stûn bi dirêjayî bi cih bûn **2.** hilm û nefes teng bûn **3.** miçiqîn *"kaniya ku av jê kişiya, **naçike"**
**çikot** çikûs
**çiksayî** esmanê hêşîn î bêewr
**çikûs** **1.** destgirtî **2.** timakar, çiriz
**çikûsî** **1.** destgirtîtî **2.** timakarî, çirizî ***"çikûsî,** bi merivan gû jî dide xwarin**"**
**çil** **1.** hejmara piştî 39'an **2.** jimareya 40'î
**çilag** pirtî
**çilagî** pirtîfiroşî
**çile** **1.** çil roj **2.** çele
**çilem*(-în)*** di rêza çilî de
**çilek** **1.** silek **2.** çavbirçî **3.** kesê ku baha wî zêde ye *"bizina kulek, timî **çilek** e**"**
**çilfis** dizek
**çilfisandin/diçilfisîne/biçilfisîne** dizîn
**çilik** çele
**çilizîn/diçilize/biçilize** pars kirin, gedandin, li rewciyê gerîn
**çilîçilî** **1.** baçermok **2.** korê şevê, şevekorî
**çilk** dilop *"barana nîsanê, **çilk** bi kîsan e, dew li ber derê her kesan e**"**
**çilkandin/diçilkîne/biçilkîne** **1.** dilopandin **2.** bijinandin
**çilkîn/diçilke/biçilke** **1.** dilopîn **2.** bijinîn
**çilm** xilît
**çilmas** zekem, bahor
**çilmasî** zekemî, bahorî
**-bi çilmasê ketin** zekemî bûn, bahorî bûn
**çilmêre** zirze
**çilmêre kirin** zirze kirin
**çilmisandin/diçilmisîne/biçilmisîne** **1.** peritandin **2.** zibilandin **3.** reng jê birin **4.** bi avnedanê *(giya)* hişk kirin
**çilmisî** **1.** benzavêtî **2.** zibilî, rengjêçûyî
**çilmisîn/diçilmise/bi-**

**çilmise 1.** zibilîn **2.** reng jê çûyîn
**çilmo** pozxilît
**çilo [I]** pelê daran ê hişk û zerbûyî
**çilo [II] 1.** çawa **2.** çito *"kor **çilo** li Xwedê dinêre, Xwedê jî wilo lê dinêre"
**çim 1.** qorzî, goşe **2.** kêlek **3.** guç
**çima** çi re, çawa, çito
**çimandin/diçimîne/biçimîne 1.** tewandin **2.** zêl jê vexistin, parçayek jê qut kirin
**çingîn/diçinge/biçinge** *(çingo û şûşe)* şingîn
**çingo** madenê ku jimareya wî ya atomî 30, giraniya wî ya atomî 65.37 e û kurteya wî ya latînî *Zn* ye; tûtya
**çingoyî** madenê ku bi çingoyê hatiye tahmdan
**çingul** kaçlok
**çinîn/diçine/biçine [I]** *(fêkî, sewze û zad)* qut kirin, dirûn
**çinîn/diçine/biçine [II] 1.** raçandin **2.** moçik lê neqş kirin
**çipîsk** fîtik
**-çipîsk lê xistin** bi qasî berdana tiliyên mezin û navincî li yekî/tiştekî xistin
**çiq** guliyên darê, çiqil
**çiq kirin** dapîtin
**çiqas** pirsa ku bersiva wê bi miqdarekê tê dayîn *"cehşik **çiqas**î mezin be, dîsa jî ker e"
**çiqil** guliyê darê
**çiqil kirin** çiq kirin
**çiqinî** qebizbûyî
**-çiqinî bûn** qebiz bûn
**çir 1.** hişk û ne ter **2.** xav
**çira 1.** şemal **2.** fener, panos *"**çira** ji koran re, def ji keran re bêfayde ye"
**çirandin/diçirîn/biçirîne 1.** dirandin **2.** derewên berhewa kirin
**çirav** dilop, çilk
**çirge** giyayê zexm ê golegenî û erdên hezge
**çirik** fîşenga neteqiyayî
**çirikandin/diçirikîne/biçirikîne 1.** pembû çandin **2.** diran li hev guvaştin û jê deng derxistin
**çirikîn/diçirike/biçirike** dengê çirkeçirkê jê hatin
**çirikvan** pembûjen
**çirîn/diçire/biçire 1.** dirîn **2.** bişkuvîn
**çirk 1.** meneke demjimartinê ya ji deqîqeyê hindiktir e; saniye **2.** careke zivirandinê; fetl
**çirkeçirk** dengê ku ji

parçeyên hesinî û rakişandî dertê

**çirkejimêr** di katjimêrê de nîşaneya saniyeyê

**çirpî** şiva ziravk

**çirtequlî** lîstika cirîdê

**-di nav de çirtequlî kirin** bi kêfa xwe û bêminet di nav de lîstin

**çirt** zîrç

**çirtemîz** kelmîzok

**çirtik** **1.** lotik **2.** refes

**çirtik avêtin/dan** **1.** lotik avêtin **2.** refes kirin **3.** hiltîzîn *"hespê ku tu li rex guhdirêjî girêdî, an dê **bide çirtikan,** an dê bibe gezoke"

**çirtoke** **1.** sewala lotikavêj **2.** hiltîzok

**çirtovirto** tiştê bêqîmet; sixtopixto

**çirûsîn/dirûse/biçirûse** **1.** biriqîn **2.** şemal dan *"gîsinê xebatkaran**, diçirûse"**

**çirûsk** **1.** berq **2.** şewq û şemal **3.** pêt **4.** alaf

**çirxat kirin** aş betilandin

**çist/çust** çeleng û zîrek

**çişt** unsurên ku bûjenan pêk tînin

**çito** çawa, çilo, çima, çi re

**çiv** **1.** ziqzaq **2.** fetl **3.** xêzxêzî

**çivanek** çivange

**çivange** goşeya ku kevan dibe

**çiv dan** **1.** baz dan **2.** bezîn **3.** jê revîn

**çivêl** kesê ku her dem yarî û henekan dike, carinan ji tixûban jî derdikeve

**çivîk** **1.** firindeyên biçûk **2.** cureyekî firindeyên biçûk e *"**çivîk**eke girtî, ji qazek çolê çêtir e"

**çivînî** **1.** biziqzaq **2.** fetlfetlî **3.** xilimxwarî

**çiya** kêrtê bilind *"**çiya** çiqas bilind be jî, dê rê pê keve"

**çiyakêş** kesê ku hildikişe kêrtên bilind

**çiyanişîn** kesê ku li herêmên çiyayî dijî

**çiyayî** tiştê/kesê ku li çiyan heye/li çiyan dijî

**çizîn/diçize/biçize** *(di dema pijandinê de)* jê dengê şewatê hatin *“**çizîn**a nanê genimî, ji kezebê tê”

**çizirîn/diçizire/biçizire** **1.** ji ber çûyîn **2.** qul bûn **3.** gizirîn

**çîç** **1.** arastî û xemilandî **2.** *(di zimanê zarokan de)* rind û bedew

**çîç bûn** **1.** xemilîn **2.** *(di zimanê zarokan de)* rind û bedew bûn

**çîçek** xemla dar û çêreyê; kulîlk

**çîçekdank** kulîlkdank

**çîçelan 1.** tiştê ku temtêla wî xweşik dixuye **2.** cihê dîmenxweş

**çîçeve kirin/çîç kirin 1.** xemilandin **2.** *(di zimanê zarokan de)* rind û bedew kirin

**çîçik** *(di zimanê zarokan de)* pêlîstok

**-çîçik û vîçik 1.** pêlîstokên zarokan **2.** xemlên bêbine û hûrde

**çîçî 1.** ifet **2.** namûs

**çîk [I] 1.** çirûsk **2.** pêt **3.** alafa pêşîn

**çîk [II]** ango, wate

**çîl** rengê vekirî

**çîlan** devhuçika fireh û dirêj

**çîlspî** rengê spî yê lap vekirî

**çîleçep 1.** berevajî **2.** xaromaro

**çîm [I]** erdê ku çêreya wê gurbiz e

**çîm [II]** ling

**çîman** erdê ku çêreya wê gurbiz e

**çîmanzar** erdê ku her dera wî bi çêreyeke gurbiz rapêçandî ye

**çîn [I] 1.** moçik **2.** neqş

**çîn [II]** hêza şiyanê; tewax, tewan

**çîn [III]** sinif, tebeqe

**çîn [IV] 1.** xeleq **2.** badok, kurîşk

**çînandin/diçinîne/biçînîne 1.** hûr kirin *(tev tiştekî)* **2.** *(bi ser de)* pişirandin

**çînandî 1.** hûrkirî **2.** pişirandî **3.** amade

**-nanê çînandî 1.** nanê ku hûrî tevî xwarinekê kirine **2.** xwarina hazir

**çînayetî** tebeqî

**çînik** tûncika jinan

**çînîn/diçînîne/biçînîn 1.** neqişandin **2.** moçik lê kirin

**çîp** ji çongê berjêrtir aliyê pêşiyê yî ling

**-çîp lê duta vebûn** geh lê sist bûn û pelişîn erdê

**çîplot 1.** çîprût **2.** şeqrût

**çîprût** lingtazî

**çîqal 1.** qels, lawaz, jar, zeîf **2.** eware, yax

**çîrçîrî** parçeparçeyî, zîvalzîvalî

**çîrçîrî kirin** parçeparçeyî kirin, zîvalzîvalî kirin

**çîrevîr** vir û derew

**-çîrevîr kirin** vir û derew kirin

**çîrik** qaxê fêkiyan

**çîrok** hikayeyên dirêj ên bi efsûn û xeyalî

**-çîrokên jinebiyan** gazincên bêrûmet û vala

**çîrokbêj** kesê ku hikayeyên dirêj ên bi efsûn û xeyalî vedibêje

**çîroknivîs 1.** karê nivîsîna hikayeyên dirêj ên bi

efsûn û xeyalî **2.** berhevkarê çîrokan

**çît [I]** **1.** cureyekî qumêş e **2.** destmalên ku bi qaliban hatine rengandin

**çît [I]** dîkê ku saleke temenê xwe temam nekiriye

**çîtik** **1.** qurhekêşî, peşkavêjî **2.** şilimziwa

**çîtik kişandin** **1.** qurhe kişandin, peşk avêtin **2.** şilimziwa avêtin

**çîv** **1.** destikê destarî **2.** di erebeya gan de darikê ku di ber tayeyê de diçikînin da ku ji surnî nefilite *"**çîv**ê stûr e, tixûb dûr e; çîvê zirav e tixûb av e"

**çîveçîv** dengê domdarê çivîkan; vîçevîç

**çîz** mêşa hespan; moz

**çîzeçîz** **1.** dengê zîz, çîzînî **2.** mizemiz

**çîzînî** vizînî, vingînî

**çîzok** mizmizok

**ço** şiv *"mebe **ço**yê di destê dînan"

**çoçik** derdana ku qehwe tê de kelandin, cezwe

**çogan** **1.** şiv **2.** çirpî **3.** gopal

**çokar** xizmetkar

**çol** **1.** beyar **2.** berî *"mêr **çol** e, jin gol e"

**çolbir** riya kurt

**çolik** destço

**çolistan** **1.** sehra **2.** berî, ne deşt

**çomax** **1.** tiştê serpopil **2.** şiva sertompiz

**çong** herewera di navenda ling de; jinû *"heke te da nava avê, ha li **çong**ê ha li navê"

**-çong lê şikestin** **1.** *(pir)* betilîn **2.** *(ji tirsan)* tev negerîn **3.** bêtaqet man

**-çong lê sist bûn** **1.** *(wekî berê)* jêhatî nebûn **2.** *(ji tirsan hêz lê)* şikestin û daxwarin

**çopçepîsk** margîse

**çopî** **1.** xesb **2.** talan

**çopandin/diçopîne/biçopîne** **1.** bi zorê jê standin **2.** talan kirin

**çopîk** **1.** ehmeq **2.** gêj

**çoqil** ling

**çoqildirêj** lingdirêj

**çors** **1.** şevekorî **2.** serobero, keteber

**çortan** toraqa hişk-kirî

**çoş kirin** ker ajotin *"kera ku barê te ne lê be, ne **çoş kê** ne doş kê"

**çov** **1.** şiv **2.** gopal

**çu** tu

**çune** **1.** tune **2.** sifr, *(0)*

**çurtanok** hestiyê serçongê

**çûçanêk** *(di zimanê zarokan de)* biçûçik

**çûç kirin/çûçî kirin** *(di zimanê zarokan de)*

rûniştin

**çûk** çivîkên biçûk *"her **çûk,** bi zimanê xwe dixwîne"

**çûle** xelqkenandî

**çûm** **1.** baqek giyayê hişk ê girêdayî **2.** defşe, baq

**çûn** çûyîn

**-çûn ava** *(roj, heyv, stêrk)* qulibîn

**-çûn ber tira cahşikan** **1.** bêpar û bêpeşk mayîn **2.** bi kêrî tu karî nehatin û ji neçariyê gavanî kirin

**-çûn ser dilovaniya xwe** çûn ber rehma Xwedê

**çûr [I]** zerînî

**çûr [II]** terş û talan, çop

**çûr bûn** **1.** tûşî talanbûnê hatin **2.** dêrz bûn

**çûr kirin** **1.** talan kirin **2.** dêrz kirin

**çûv** bizava revînê

**-çûva roviyan** bazdana bi lezgînî

**çûv dan/çûv kirin** gavek li vir û yek li dera han xistin

**çûyîn/diçe/biçe*(here)*** **1.** nehatin **2.** ji vir ber bi cihekî din ve meşîn *"bi lavelavê, mirov ji ber jina xwe **naçe** der"

# D

**d/D** tîpa pêncemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku li gorî cîderka wê diranî ye, li gorî belavbûna wê girtî û nerm e

**da- [I]** pêşgireke ku bi lêkerê ve dizilîqe û wateya berbijêriyê didê

**da [II]** dayik

**dab** tele, dafik

**dabarandin/dadibarîne /dabarîne** **1.** bi ser de rijandin **2.** dan guleyan

**dabarîn/dadibare/dabare** hetikîn

**dabaş** **1.** mijar **2.** behs, babet

**daberizîn/dadiberize/ daberize** **1.** êrîş kirin **2.** belapêşkarî yekî bûn

**dabestin/dadibeste/dabeste** **1.** girêdan **2.** kuta kirin **3.** bi encam kirin

**dabeş** **1.** parçe, par **2.** qisim **3.** kerî

**-dabeş kirin** **1.** parçe kirin **2.** parve kirin **3.** kerî kirin

**dabêlandin/dadibêlîne /dabêlîne** **1.** daqurtandin **2.** vegemirandin *"kesê çavbirçî, kerê bibar **dadibêlîne**"

**dabir** *(r)* nîşaneya bêhnokê ya ku li jora peyva resen tê danîn

**dabiristin/dadibirisîne /dabirisîne** **1.** rêz bi rêz bûn **2.** sef girêdan **3.** ketin şîştirekê

**dabîn kirin** **1.** bîme kirin **2.** ewle kirin

**daçek** *(r)* peyvên bêwate ên mînanî /li, bi, ji.../ ên ku di hevokê de bi peywirekê radibin

**daçikandin/dadiçikîne /daçikîne** **1.** di erdê de bi dirêjahî bi cih kirin **2.** çikilandin **3.** hincikandin

**dad** **1.** dayik **2.** edalet

**dadan/dadide/dade [I]** **1.** girtin **2.** zirze kirin *"deriyê xêran, nayê **dadan**"

**dadan/dadide/dade [II]** *(agir)* pê xistin

**dadgeh** mehkeme

**-dadgeha lihevanînê**

mehkemeya sulhê
-**dadgeha sezayî** mehkemeya cezayî
**dadger** hakim
**dadik** jinika ku ber diya wan ve çavdêrî an jî sexbêrîya zarokan dike
**dadî** huqûqî
**dadmend** dadwer
**dadparêz** huqûqparêz
**dadwer** adil
**dadwerî** adilbûnî
**dadyane** adilane
**dafik** xefik, tele *"roviyê zexel, bi her du lingan dikeve **dafik**ê"
**dager** **1.** dahatina ber bi jêrê **2.** veger
**dagerandin/dadigerîne /dagerîne** **1.** berjêr kirin **2.** anîn xwarê **3.** lê vegerandin
**dagerîn/dadigere/dagere** **1.** peya bûn **2.** hatin xwarê **3.** lê vegerîn
**dagirker** îşxalker, vegirtî
**dagir kirin** îşxal kirin, vegirtin
**dagirtin/dadigire/dagire [I]** **1.** tijî kirin **2.** îstila kirin
**dagirtin/dadigire/dagire [II]** ji malperekî peldankek daxistin
**dahan** dayîn *"dermanê xwestinê, **dahan** e"
**dahatin/datê/dayê** **1.** peya bûn **2.** hatin xwarê **3.** dagerîn
**dahatû** **1.** pêşeroj, musteqbel **2.** pere û berê ku ji ked an jî dezgehê mirovî tê
**dahelandin/dadihêle/dahêle** pê ve aliqandin
**dahelîn/dadihele/dahele** pê ve aliqîn
**dahênan/dadihêne/dahêne** **1.** kişf kirin **2.** îcad kirin **3.** afirandin
**dahêner** **1.** kaşif **2.** mûcîd **3.** aferîner
**dahiştin/dadihêje/dahêje** **1.** li serê rawestîn **2.** li serê pir kûr ramîn
**dahol** def
**daholjen** deflêxistî
**dahûrandin/dadihûrîne /dahûrîne** **1.** tehlîl kirin **2.** çareser kirin **3.** jê re rayeyek dîtin
**daketin/dadikeve/dakeve** **1.** peya bûn **2.** hatin xwarê **3.** berjêr bûn **4.** *(sewalê nêr)* nayîn, gayîn
**dakirin/dadike/dake** **1.** avêtin **2.** pekandin **3.** nixumandin **4.** berjêr kirin *"jin, mêran **dadikin** û radikin"
**da ku** ji bo ku, seba ku *"bilind menêre, **da ku** tu nizm nekevî"
**dalak** kesê ku zarokan sunet dike

**dalan** kulek, lingor
**dalehî** rexne an jî gazindên nazik
**dalehî kirin** bi nazikî gazind an jî rexne kirin
**daliqandin/dadiliqîn/daliqîne** hilawestin
**dalît** qurmê darê yî qutkirî
**daman** ji navikê berjêrtir pêşên dêreyekî; tûman
**damezrandin/dadimezrîne/damezrîne** **1.** înşa kirin, ava kirin **2.** saz kirin **3.** çêkirin
**damezrîner** **1.** sazker **2.** çêker **3.** daner **4.** dahêner
**damilandin/dadimilîne/damilîne** *(çav)* girtin
**damilîn/dadimile/damile** *(çav)* hatin girtin
**damûsk** porê katara stûyê hespan
**dan/dide/bide [I]** **1.** vegerandin **2.** radest kirin
**-dan ber hev** **1.** qiyas kirin **2.** rû bi rûyî hev kirin **3.** hevrû kirin *"biaqilan **dan ber hev** û ser hev, dînan lawên xwe zewicandin"
**-dan û standin** **1.** têkilî, eleqedarî **2.** kirîn û firotan **3.** hildan û danîn **4.** bexişandin û jê birîn *"**dan û sitandin** di destê Xwedê de ye"
**-dan zanîn/dide zanîn /bide zanîn** **1.** danasîn **2.** pê hesandin **3.** haydar kirin, agahdar kirin
**dan [II]** **1.** genime kutayî **2.** hebên gênim *"kaya kevn, **dan** jê nakevin"
**-danê kutayî** genimê di cûnî de bi mîrkutan kutayî
**dan [III]** **1.** demên rojê **2.** beşên zemên *"adarê, berfê xwe da guliyê darê, nema **danê** êvarê"
**danasîn** danezan, îlan
**dane** agahiya zanistî ya çespandî
**danezan** teblîx, danasî
**-danezana mafên mirovan** danasiya mafên însanan a gerdûnî
**danêr** sazkirî, damezrîner
**dang** ji şeş paran parek
**dange** cihê ku sewal lê tên giyakirin; dirûngeh
**danisqe** mirovê awarte
**danişîn [I]** li dadgehê amadebûna pêşberî dozger
**danişîn/dadinişe/danişe [II]** rûniştin
**daniştin/dadinişe/danişe** rûniştin
**danîn/datîne/dayne** **1.** peyde kirin **2.** saz kirin **3.** bi cih kirin
**danû** genimê kutayî û

kelandî
**danxav** kutilkên xav
**dapalandin/dadipalîne /dapalîne** **1.** raparzandin **2.** dawerivandin
**dapalîn/dadipele/dapele** **1.** raparzîn **2.** dawerivîn
**daperîn/dadipere/dapere** bi tundî lê vegerandin
**dapêjtin/dadipêje/dapêje** **1.** çiq kirin **2.** spî kirin **3.** darotin **4.** rûçikandin
**dapîr** diya dê û bavên mirovan; pîrik
**dapîtin/dadipêje/dapêje** dapêjtin
**daqoq** **1.** mîrkut **2.** mîrkutê dêrî
**daqurtandin/dadiqurtîne/daqurtîne** di gewriyê de berjêr kirin; qurt kirin
**daqûl** xwar
**-daqûlî tiştekî bûn** xwarî ser tiştekî bûn
**dar** **1.** cureyekî hêşînahiya li ser rûyê erdê ye û mêweyan dide **2.** darik *"heta ku se hêstî nekojê, **dar** li sêrî nakeve"
**dara** hesabdariya heyiyên dûgelê; maliye
**daraş** balindeyek e
**darayî** têkildarî heyiyên dûgelê; malî
**daraz** qerar, biryar
**darbest** **1.** tabûta miriyan **2.** çardara ku pê nexweş tên neqilkirin
**darbir** cureyekî sewalên darkoj e
**darçîn** cureyekî darên ku hem berên wê ên hişkkirî hem jî ew bi xwe tê kelandin û ava wê tê vexwarin
**dar de kirin /bi dar ve kirin** **1.** îdam kirin **2.** hilawestin, daliqandin
**darêj*(-e)*** qalibkirî, rokirî
**darêjk** teşe
**darêjtin/dadirêje/darêje** **1.** jê zêde kirin, ji ber girtin **2.** li hev zêde kirin
**darêjxane** karistana ku tê de bûjen di qaliban de tên ro dikin
**daring** madeyê xav, bûjen
**darik** parçeyeke darê biçûk
**-darikê miradan** mirovê ku ji tu kesî re nabe alîkar
**-darikê heft argûnan** kesê ku li her derê fesadiyê digere
**daristan** komeka daran
**darizandin/dadirizîne/darizîne** mehkeme kirin
**darîn** bûjena ji darê çêbûyî
**darkutik** cureyekî çivî-

kên ku bi nikilê xwe daran qul dike
**darpişt** **1.** sêpiya tevnê **2.** piştmêr
**daroxa** karmendê bacberhevkirinê
**dartiraş** kesê ku ji daran pace, derî û pêdiviyên malan ên din çêdike; necar, xerat
**dartiraşî** pîşeyê necariyê; xeratî
**das** amureke çandiniyê ye û pê zad tê çinîn ***"das**ek, nikare bi dehlekê**"**
**dasî** **1.** hestiyên masiyan **2.** striyên di simbilan de
**daskêş** kesê ku bi dasê diçine
**dastan** çîrokên lehengiyê
**daş/daşik** caş/caşik
**daşir** destşok
**davek** qawûş
**daw** **1.** pêş **2.** boç, dêl ***"**danû xistin **daw**a wî, kîrê wî rabû; xistin rêza meriyan, qûna wî rabû**"**
**-dawa xwe xistin devê xwe** pêşamadehiya revê kirin
**-daw û delingên xwe hilçinîn** bi cidîtî xwe amadeyî karekî kirin
**dawerivandin/dadiwerivîne/dawerivîne** **1.** raparzandin **2.** baravî kirin **3.** guvaştin heta ku ziwa kirin
**dawerivîn/dadiwerive/dawerive** **1.** raparzîn **2.** baravî bûn **3.** *(ji ber guvaştinê)* ziwa bûn
**dawestîn/dadiweste/daweste** li ser piyan sekinîn
**daweşandin/dadiweşîne/daweşîne** **1.** dawerandin **2.** li ba kirin, ber bi ba kirin
**daweşîn/dadiweşe/daweşe** **1.** dawerivîn **2.** ber bi ba bûn
**dawet** dîlan ***"dawet**a mîran, agirê feqîran**"**
**-ma daweta diya te ye?** em di xemgîniyê de ne lê ev çi kêf e ku li te girtiye?
**dawî** **1.** axirî **2.** paşî **3.** encam ***"**berfa hûr e**, dawî** dûr e**"**
**-dawî lê anîn** **1.** bi encam kirin **2.** kuta kirin, qedandin
**-dawî bi gû hatin** di axiriya temenê xwe de karekî nerewa kirin
**dawîn** tiştê li herî paşiyê
**dawk** diravê ku li serê merc digirin
**dawpaqij** jina binamûs
**dax [I]** pêvedana bi hesinekî sincirî
**dax [II]** keder, keser
**-dax kirin** **1.** bi êgir an jî

hêsinê sincirî çêrm şewitandin **2.** xemgîn kirin *"li dû bêhna kebabê çû, rastî **daxkirin**a lingê kerê hat"

-**daxê daye stuyan** çiqas zilm heye li sêrî qewimiye û lewre serî hildaye

**daxbar** bikeder, biazar

**daxistin/dadixîne/daxîne [I] 1.** peya kirin **2.** berjêr kirin **3.** anîn xwarê **4.** jê xistin

**daxistin/dadixîne/daxîne [II]** *(ji malperekî agahiyek)* vekirin û anîn xwarê

**daxuyandin/dadixuyîne/daxuyîne 1.** dan zanîn **2.** eşkere kirin

**daxuyanî** danezan, teblîx

-**daxuyaniya zelal** danezana servekirî û eşkere

**daxwarin/dadixwe/daxwe 1.** xwe jê dan aliyekî **2.** ser tewandin **3.** avêtin dil û hinavan û eşkere nekirin *"kîso, awira masiyî **danaxwe**"

**daxwaz 1.** xwestek **2.** teleb **3.** arzû

**daxwazname** rûpela ku xwestekek lê tê nivîsandin û ji saziyeke fermî re tê pêşkêşkirin, erzehal

**dayende 1.** kesê dayî **2.** camêr

**dayik 1.** jina ku zarokê tîne dinyayê **2.** mak, lel *"**dayik**ê heft kur xwedî kirine, lê heft kuran dayikek ji birçînan kuştine"

**dayiksalarî** erka ku tê de dayik namzeda biryardanê ye; maderşahî

**dayî** cureyekî gulan e

**dayîn/dide/bide [I] 1.** lê sipartin **2.** radest kirin, teslîm kirin

**dayîn [II]** îkram û bexş

-**dayîna Xwedê** îkram û bexşa Yezdanê Dilovan

**dayox** dayende *"para **dayox**an kanî ye, para xwaroxan genî ye"

**daz** cureyekî aletên ku pê têl tên qutkirin

**de** peyveke teşwîqkirinê ye

-**de were neteqe** îcar were nemire û nehele

**debabe** çeka giran a topavêj

**deban** di şûr de cihê hesin

**debar** pêdiviyên ku jiyan pê tê berdawamkirin

-**debara xwe kirin** pêdiviyên jiyanê bi dest xistin/amade kirin

**debax** postkirin

**debaxane** cihê postkirina sewalan; selexane

**debe** koda ji tenekeyî

**debeng 1.** ehmeq **2.** gêj

**debîş** tiştên zeliqokî
**debûş** zemq, zernîx
**def** alava mûsîqî ya ku her du aliyên çêrmîn in û çembera wê jî darîn e û bi dendikan tê lêxistin; dahol *"**def**a ber keran û çiraya ber koran, nabe qencî"
**-defa hewarê lê dan** gaziyeke bi dengî kirin
**defik** dahola biçûk
**defter** lênûsk
**-deftera xêr û gunehan vebûn** di roja qiyametê de hesabên başî û nebaşiyê jê hatin pirsîn
**defterdar** karmendê ku qeyd û sicilan digire
**-defterdarê kerxaneyê** serekê pêzevengan
**defşe** **1.** baq, deste **2.** çûm
**degel [I]** cesaret, wêrekî
**degel [II]** qerfî, mîzahî
**degme** **1.** car caran **2.** kêm caran
**degmen** **1.** bi zehmetî **2.** pir kêm
**deh** **1.** hejmara beriya yazdehan û piştî nehan **2.** jimareya 10'an "çêlekeke bişîr, ji **deh** mihên bêşîr çêtir e"
**dehandin/didehîne/bidehîne** *(xwarin)* li xwe helandin
**dehbe** jakaw, hov, kovî
**dehfandin/didehfîne/bidehfîne** **1.** wêde kirin **2.** leqandin, livandin
**dehf dan** dehfandin
**dehî** **1.** qurban, boraq
**dehl** **1.** devistan **2.** baxçeyê fêkiyan *"filan kes hirçê **dehl**ê ye"
**-dehl û dêş** daristana ku bivir neketiyê
**dehlîz** dalan, kulek
**dehta** dehqat
**dehtayî** hejmartina dehedehî *(wekî 10-20-30-40...)*
**dehş/dehşik** cehş/cehşik *"**dehşik**eke mirovî jî hebe, koça mirovî li aranê namîne"
**dejnik** cureyekî çêreyê ye û nepijandî tê xwarin
**dek** fend û fêl
**-dek û dolab** hîle û xurde
**dekbaz** fêlbaz, hîlebaz
**delal** **1.** ezîz **2.** hezkirî **3.** bedew *"jina nedelal, çavê mirovî diêşîne, jina **delal** dilê mirov diêşîne"
**delalî** **1.** şûm, nehs **2.** berkeftî, hêja *"kes **delali**ya kesî, bi delalî xwedî nake"
**delandin/didelîne/bidelîne** **1.** li bendê hiştin **2.** kamsojkî kirin
**delav [I]** cihê guhêztina avê *"gol dibin delav,

**delav** dibin gol"
**delav [II]** **1.** kurn **2.** hewz
**delik** parçeyek pîneyê tenik û dermankirî yê ku didine ser birînê û pê dipêçin
**delikandin/didelikîne/bidelikîne** bi delikê birîn pêçan
**deling** devê lingê şal û derpiyan ê ku digihêje gûzekan
**delîl** **1.** îsbat, birhan **2.** wêran, dêran *"**delîl**a baranê ba ye, delîla mirinê ta ye"
**delîn/didele/bidele** **1.** çav li rê bûn **2.** kamsojkî bûn
**-çav lê delîn** çav li rê bûn
**delîve** **1.** firsend **2.** îmkan, derfet **3.** cihê derbasbûnê
**dem** **1.** zeman **2.** wext **3.** çax **4.** heyam *"**dem**a ku seg bezî gur, gur mir"
**-dem û destgeh** **1.** sazî **2.** kargeh
**-dem û destgehê bazirganiyê** kargeha ticaretê
**deman [I]** zeman
**deman [II]** kirê
**demançe** şeşar, cureyekî çekên lûlekin e
**demandar** kirêkirî
**deman kirin** kirê kirin
**dembihêrk** sohbet
**demdemî** **1.** çaxçaxî **2.** carinan û ne bi berdewamî **3.** ne di cih de
**demildest** hema niha; derhal
**demîn** carinan, degme
**demjimêr** katjimêr, saet
**demle** felc
**-demleya zarokan** felca ku di temenê biçûk de digihêje zarokan
**demsal** mewsim, werz
**dendik [I]** kakil
**dendik [II]** her du darikên serpopil ên ku pê def tê lêxistin
**dendûreşk** dirik
**deng [I]** **1.** bayê ku ji pişika mirovî derdikeve û di devî de teşe digire **2.** awaza ku di tevgerên xwezayê de tê bihîstin *"**deng**ê ewran, mizgîna baranê ye"
**-deng û behs** **1.** xeber **2.** nûçe
**-deng dan** **1.** navdar bûn **2.** lê vegerandin **3.** axivîn **4.** pejirandin
**-dengî hev kirin** bangî hev kirin
**-deng kirin** **1.** axivîn, peyivîn **2.** bang kirin
**-deng lê kirin** **1.** bang lê kirin **2.** gazî kirin
**-deng vedan** **1.** olan dan **2.** deng vegerîn *"av dikeve cihê teng û **deng**

**vedide"**
**deng [II]** ramana kesê ku hildibijêre; ray
**-deng dan** *(di hilbijartinê de)* raya xwe dan
**deng [III]** hevaheng, yeksan
**-dengî hev bûn** yeksanî hev bûn
**-dengî hev kirin** yeksanî hev kirin
**dengaz** bêdeng, kêmaxêv
**dengbêj** kesê ku stranan dibêje; stranbêj
**dengdar** *(r)* tîpa ku pêdiviya wê bi dengekî vekirî î domdar heye
**dengdêr** *(r)* tîpa serbixwe ya ku vekirî û domdar e
**dengik** gewrî, qirik
**dengî** îlan
**dengî kirin** îlan kirin
**dengîr** navdar
**dengnasî** zanistên ku pisporiya wan bizavên dengan e
**dengnuxêm** alava dengbir a ku bi ser çekan ve dikin da ku dengê gulebердanê neyê bihîstin
**dengweş** alava ku dengê axivgeran li derve diweşîne û bilindtir dike
**denk** **1.** gurzê girêdayî **2.** barê girêdayî
**dep** darê rast î meht
**depreş** textikê reş î ku nivîs li serê tên nîşandan
**deq [I]** xal, şane
**deq [II]** **1.** metnê nivîsê **2.** derince, pîle **3.** kapên lingan, qeydik
**-deq kirin** **1.** lê xal çêkirin **2.** ji bo balkişandinê xêz kirin **3.** sox kirin
**deqaq** alava hesînî ya ku bi gêrebayî tê germkirin û pê qerçûmekên kincan têne sererastkirin; wutû
**deqel** xweliya hişk
**deqlûs** qulopanî, teqle
**der [I]** **1.** derve **2.** bere *"jin çav li **der** e, mêr xwelî li ser e**"**
**-derê ku** biwêjeke peyitandinê ye ***"derê ku** filan kes jî bûye gurê devbixwîn**"**
**der [II]** **1.** cih û war **3.** mekan **4.** şûn û dews
**-der û dor** hawîrdor, doralî
**derabe** pergala girtinê ya deriyên firoşgehan
**deramet** **1.** dexl, derhat **2.** debara darayî **3.** sewze, hêşînayî
**-derameta neteweyî** dirav û dexla ku ji dûgelê re tê
**derandin/diderîne/biderîne** derxistin derve
**deranîn/dertîne/derîne** ji hundir birin derve

**derav [I]** kelîşo
**derav [II]** **1.** newal û cihokên avê **2.** dertenga avê ya ku zirav e û bihur tê re asan e
**derav [III]** veser, pêvek
**-derav kirin** bi hev ve kirin
**deraxlêve** rojên pêşîn ên biharê
**derazînk** bilindeka li ber deriyan; pêderî
**derb** **1.** lêxistina xedar **2.** zede *"**derb**an ji derblêketiyan bipirse"
**-derb lê ketin** zede girtin
**der bar** der heq
**derbas bûn** bihurîn
**derbas kirin** bihurandin
**derben** cihê ku kinc tê de têne daliqandin; hilço
**derbend [I]** bender, rawestgaha keştiyan
**derbend [II]** tengav, xelîc, girav
**derbest [I]** tiştê ku derê wî hatiye girtin û bestin; dergirtî, nixamtî
**-derbest kirin** devê amanê girtin
**derbest [II]** **1.** cidî **2.** yekser **3.** xeleq
**derbider** kesê ku ji welat, mal û warê xwe dûr ketiye; aware, mişext
**derbider bûn** ji mal û warê xwe dûr kevtin
**derbiderî** awaretî
**derbider kirin** bi darê zorê kesek ji mal û warê wî bi dûr xistin
**der birin** **1.** bi lêv kirin **2.** îfade kirin **3.** şehitandin
**-mafê derbirinê** heqê axaftinê
**der bûn** *(birîn)* bijiqîn û axivîn
**dercaw** destmala destan
**derçik** **1.** pêderî **2.** hewş, hevşî
**derçûn** **1.** ji hundir hatin **2.** eşkere bûn
**derd** **1.** êş û azar **2.** keder û xem *"dil li ser dil e, jê re nîn e tu **derd** û kul e"
**derdanik** parzûn
**derdehinav** êşa hinavî
**derdekopan** nexweşiya ku ji ber birîneke bi hesinê zengarî de çêbûye; êşekovan
**derdese** harî
**derdeseyî bûn** har bûn
**derdeser** êşa serî
**-derdeserî bûn** **1.** *(serî)* di êş û belayan de bûn **2.** bi kul û derdan nalîn
**-derdeserî kirin** **1.** *(serî)* bi êş û belayan aciz kirin **2.** *(rewşa yekî)* serobino kirin
**derdest kirin** tewqîf kirin

**derdestname** fermana girtina yekî
**derdmend** xemgîn, keserkûr
**derdomerdo** kesê ku ji ber xemgîniyê keribiye
**derdor** hawîrdor, doralî
**derdoyî** derdomerdo *"**derdoyî** pirbêj dibin, evîndar dengbêj dibin"
**derebeg** kesê ku li derveyî zagonan dibe xwedî-milk û zordariyê li hejaran dike
**dereberjêr** sereberjêr *"**dereberjêr** û hevraz, ji zimên re tunene"
**deredemî** **1.** bêwext, berwext **2.** çaxbihurî **3.** paşverû
**dereke** **1.** biyanî **2.** nepen
**deremal** **1.** şeveder **2.** havî **3.** axozî
**dereng** **1.** ne zû **2.** paşdemayî, şundemayî *"agirê kuçikan timî germ e, **dereng** sar dibe"
**dereve bûn** *(di axaftinê de)* bêhemdî xwe bi ser ve bûn
**dereve kirin** *(bi riya axaftinê)* mebesta yekî aşkera kirin
**derew** **1.** vir **2.** îftira *"**derew,** sêwî ye"
**-derew kirin** **1.** vir kirin **2.** kuşekuş kirin
**derewandin/dideriwîne/bideriwîne** **1.** gotin betal kirin **2.** rastiya gotinekê pûç derxistin
**derewîn/derewker** virek, kuşo *"**derewîn,** carekê dixwe firavîn"
**derf** eyarê sewala gurandî
**derfet** **1.** îmkan **2.** firsend **3.** delîve
**dergeh** **1.** deriye ketinê **2.** deriyê mezin *"diz li mal e, girtina **dergeh**î betal e"
**-dergeh û dîwan** meclisa mîrî
**dergevan** **1.** kesê ku dêrî dipê **2.** berdestiyê li pêş dêrî
**dergistî** destgirtî
**dergîl** deriyê darîn
**dergûş** hêlekan, landik *"bi dayikên xwedî-**dergûş** re herin, zû vegerin"
**derhatin/dertê/derbê** *(derê)* derketin derve *"kî li du riyan dinêre, şaş **dertê**"
**derhêner** birêvebir
**derhûd** berpirsiyarê ji dêla yekî ve; kefîl
**derhûde** berpirsiyariya ji dêla yekî ve; kefalet
**derhûdname** giroveya ku kefaletê nîşan dide; kefaletname
**derince** **1.** pêlik, pîle **2.** pêlekan

**derindêz 1.** dêlindêz **2.** merasima filehan a 14'ê sibatê
**derizandin/diderizîne/biderizîne 1.** şikandin **2.** qelaştin **3.** cerx kirin
**derizî** qelişî
**derizîn/diderize/biderize 1.** şikîn **2.** qelişîn
**derî 1.** cihê ketina li avahiyekî **2.** dewsa ketina her tiştî *"golikê beş, ma li devê **deri**yê reş"
**-derî dadan** dergeh girtin/zirze kirin
**-derî kutan** *(da ku bê vekirin)* li dêrî xistin *"heta ku tu **deri**yan nekutî, derî li ber te venabin"
**derîçe 1.** dergehên biçûk **2.** kunên biçûk
**-derîçeyên dil** dergehên biçûk ên dil
**derîn** dergehê derketinê
**derîzan** pêşiya dêrî; pêderî
**derkenar 1.** nîşeya li kêlekê; haşiye **2.** têbiniya ku di pêvekê de ye
**derketin [I]** cihê çûyîna ji hundir ber bi derve
**derketin/derdikeve/derkeve [II]** ji hundir ber bi derveyî çûyîn
**-derketin holê** aşkera bûn
**der kirin [I] 1.** derxistin **2.** qewirandin, cehimandin
**der kirin [II] 1.** *(da ku kêma birînê bikişe)* qul kirin **2.** *(da ku mebest diyar bibin)* serê karekî/axaftinekê vekirin
**dermale** sewala ku ji bo serjêkirin û firotanê tê kok-kirin
**dermale kirin** *(sewal)* ji bo qelewbûnê xwedî kirin
**derman 1.** îlac, dewa **2.** çare **3.** raye *"bam dibe kitan, dew dibe **derman**"
**-derman vexwarin** îlac vexwarin
**dermanfiroş** îlacfiroş
**dermanxane** cihê ku îlac lê têne firotin
**dernixûn** serobinokirina aman û paçikan
**derpê 1.** kinca şevê **2.** kinca hundirîn û tenik a ku di bin şalan de û dema razanê tê lixwekirin *"bê **derpê**, lê stûyê xwe li ber zaliman xwar meke"
**-*(di)* derpiyê xwe de kirin** ji tirsan di bin xwe de rîtin
**derpêş kirin 1.** anîn ber çavan **2.** angaştin
**dersal** salên berê
**derşo** feraşo
**derûn** nepeniyên di nava

mirovî de, hêz û hizra navxweyî; ruhiyat, manewiyat
**derûnî** ruhnasî, têkildarî ruhiyat û manewiyatê
**derûn-nas** pisporê zanistên derûnî
**derûn-nasî** pisporiya zanistên derûnî
**derve** **1.** ne li hundir **2.** xaric *"ji **derve** ve mele ye, ji dil ve file ye"
**-derve kirin** **1.** şêlandin **2.** jê dizin
**derveyî** **1.** têkildarî tiştê ne li hundir **2.** xaricî
**derwêş** **1.** dîwane **2.** sofî *"**derwêş** dizane, çi di hebana derwêş de heye"
**derwêşxane** dêş
**derxûn** devnuxêma qûşxaneyê
**derya** zerya, behr *"**derya,** bi dilopan naqede"
**deryavan** zeryavan, keştîvan
**-Deryaya Sor** Zeryaya Sor a di navbera Erebistan û Misirê de
**derz** **1.** qelîştek, qelş **2.** cerx
**derzî [I]** alava dirûtinê *"bi **derzi**yê, bîr nayê kolan"
**derzî [II]** dermanê avkî yê ku bi şiringeyê tê zerk-kirin; fetrûm
**-derzî lê xistin** bi şiringeyê dermanê avkî berdan bin çêrmî
**derzîdank** **1.** cihê ku derziya dirûtinê tê de tê çikandin **2.** paçika derziyê
**derzîreq** mixên ku wekî derziyan e û pê kaxezan bi hev ve dikin
**desirman** **1.** berdestî **2.** qerwaş
**desirmanî kirin** **1.** berdestîtî kirin **2.** ketin olam û bintînên xelqê
**dest** **1.** endamê ku bi ser mil ve ye û pênc tilî pê ve ne **2.** lep, penc *"bi **dêst** bike, bi dêv bixwe"
**-dest bi stûyê hev re birin** hev hembêz kirin û bi hev şa bûn
**-dest dan** **1.** temas kirin **2.** bi kêrî tiştekî hatin
**-dest jê berdan** jê vegerîn
**-dest pê kirin** teşebus kirin
**-dest tê kirin** mudaxele kirin, tev lê bûn
**-dest werdan** dest tê kirin
**destar** du beraşên biçûkên ku bi dest têne gerandin û pê zad tê hêran; aşê destî
**destav** **1.** mîza xalî **2.** gû
**-çûn ser destavê** çûn destşokê

**destavêtin** **1.** serveçûn **2.** zêdegavî
**destavxane** destşok
**destbelaş/destbelav** comerd
**destbelaşî/destbelavî** comerdî
**destbend** kelemçe
**destbirak** **1.** razdar **2.** kirîv
**destbûrî** bêqedr, bêkêr, qedrsivik
**destdirêjî** mudaxele, tecawuz
**deste** **1.** baq **2.** lijne **3.** yekîne
**destek** destyarî, alîkarî
**destenerm** hevîrê ku bi rûn hatiye strandin û didine ser cihê werimî an jî eşiyayî
**desteng** xizan
**destexwişk** **1.** xwişka axiretê, razdara jin **2.** jina ku ji kirîvgelan e
**destgeh** cihê ku bûjenên danûstanê lê tên hilberîn an jî ji bo firotanê lê tên raxistin
**destgirtî** dergistî, nîşanî
**destgoc** destqop, destkop
**desthilatî** **1.** îqtidar **2.** hukumdarî **3.** serwerî **4.** hêzdarî
**desthilatdar** **1.** hukumdar **2.** serwer **3.** hêzdar
**destik** **1.** qevd, bist **2.** çembil, qulp *"**destik**ê bivirî ne ji darê be, dar qut nabe"
**destî** destik *"**desti**yê kêrekê û gûyê li ser bêrekê wekî hev in"
**destkarî** karê ku bi destan digere; destpelingî
**destkeftî** tiştê qezencbûyî û bidestketî
**destkêş kirin** *(hespê hefsarkirî û gemkirî)* li pey xwe kaş kirin
**destkin** xizan, feqîr
**destmal** **1.** mendîl **2.** pêşgir *"serê ku neêşe, **destmal**ê lê girêmede"
**destmaye** sermaye
**destmêz** heqdest
**destmiç** bexîl û çiriz
**destnimêj** paqijiya ji bo nimêjê *"pîr bi**destnimêj** be, sal dirêj e"
**-destnimêj girtin** ji bo nimêjê paqijî kirin
**-destnimêj şikandin** ji rewşa paqijiya ji bo nimêje derketin
**destnivîs** nivîsa ku bi destan hatiye amadekirin, destxet
**destnîgar** kesê ku resman xêz dike; resam
**destpeling** karê ku bi keda destan hatiye hilberîn
**-bi destpelingî** bi keda destê tazî

**destnîşan kirin** **1.** îspat kirin, aşkartin **2.** çespandin
**destpêk** serê pêşîn ê her kar û çalakiyê
**destşok** daşir, kîzên, qedemgeh, avrêjk
**destêker** mudaxeleker
**destûr** **1.** îzin **2.** musaede
**-destûr dan** **1.** îzin dan **2.** musaede kirin
**destûrname** îcazetname, bawername
**destvala** di dêst de tiştek tuneyî
**destverû kirin** *(giya û çandiniya nivîşkan)* bi dest çinîn
**destxet** destnivîs
**destxweşî lê kirin** jê re: "quwet be" gotin
**destxwişk** **1.** razdara jin **2.** hevala samîmî
**destxwîn** kujer
**destyarî** **1.** destekarî **2.** alîkarî
**destyaw** deyn, qerz
**-destyawa alîkariyê** qerza yarmetiyê
**deşenî** kesê ku tûşî zilm û pêkutiyê hatiye
**deşt** **1.** rastahî, best **2.** aran *"banê me yek ban e, aliyek **deşt** e, ê din zozan e"
**deştî** **1.** kesê ku li rastahiyan dijî **2.** kesê ku li bajaran dijî û dernakeve zozanan
**dev** endamê xwarin, vexwarin û peyivînê
**-dev avêtin** **1.** tê gerîn **2.** lê alîn **3.** lê banîn
**-dev jê berdan** têkil nebûn, dest jê vekişandin
**-dev şepilandin** ji devê xwe avêtin, ji devê xwe şehitandin
**devarav** kesê devgilêz û devkef
**devbelaş** pirbêj, devçepel, piraxêv
**dever** **1.** herêm **2.** mintiqe **3.** cîwar *"gotin: 'li wê **dever**ê çi hebû?'; got: 'li wir jî hêştir û gur tev nediçêriyan'"
**deverî** **1.** herêmî **2.** di qadeke teng de
**deverû** xwarbûna li ser dev û çavan; sernişîv
**-deverûyî erdê bûn** bi ser dev û rûyê xwe pelişîn erdê
**devgak** devgem û bizmika ku di gêreyê de dikine devê dewaran da ku ji zêd nexwin
**devgem** di hevsarê gemê de hesinê ku dikeve devê hespê
**devgenî** kesê ku bêhna genî ji devê wî tê
**devgilêz** kesê ku kef û gilêz bi devê wî dikeve;

deav, devşil
**devistan** cihê ku darên diriyê lê hene; devî
**devik** tiştê ku pê devê firaqan tê girtin
**devî** devistan
**devjenî** **1.** bezînhev **2.** belapêşkarî
**devî** cihê ku darên diriyê lê hene, devistan *"**devî** hebe dê bibe dar, xwelî li serê kesê bêwar"
**devîdevî** pir li nêzikê, hema bigire li hindê ye
**-devîdevî lê kirin** hema hema li hindê bûn
**devkî** bi zimên û ne bi nivîskî; şefewî
**devjûjî** devlopik
**devlalûte** **1.** kesê ku lal û tat e **2.** zimanfisek
**devliken** kesê ku daîmî ken li rûyê wî xuya dibe; rûgeş
**devling** devê lingê şêl *"dil, hay ji **devling**ê nabe"
**devlopik** kesê ku devê wî bîçûk û ber bi pêş e
**devmirî** **1.** bêdeng û kêmaxêv **2.** acizê axaftinê û xweparastinê
**devnerm** zimanşirîn, zarsivik
**devok** axaftinên herêman; zarava
**devsist** kesê ku nikare raz û bîsan veşêre
**dew** **1.** mastê kiyandî **2.** çelqemast *"adar e, **dew** lidar e"
**-dewê xwe di parzûnê yekî de berdan** hewl dan ku ew kes jî bibe hevparê karê wî
**dewa** derman
**dewar** sewalên malê yên wekî ga û gamêşan; tarîş
**dewdew** cureyekî çivîkên kedîkirî ye û axaftina însên dubare dike; tûtî
**dewik** torteya/dûrda rûnê qijirandî
**dewisandin/didewisîne /bidewisîne** **1.** mişe kirin, tepisandin **2.** bi cih kirin, tê de danîn
**dewisîn/didewise/bidewise** **1.** tepisîn **2.** bi cih bûn
**dewixandin/didewixîne /bidewixîne** ji ser hiş birin, ji xwe ve birin
**dewkil/kiledew** **1.**meşka dêw **2.** sirsûm
**dewlemend** **1.** sermiyandar, xwedî-rastmal **2.** bi şêt û pêt *"dibêjin: '**dewlemend**o pîroz be, feqîro te ji ku anî?"
**dewlemendî** sermiyandarî, rastmaldarî *"heçî nizane quweta xwe, ew dûr e ji **dewlemendi**ya xwe"
**dewlet** **1.** dûgel **2.** sermi-

yanî *"**dewlet,** di bin gurzên giyayî de ne"

-**dewleta nehênî** **1.** dewleta ku pergala wê ne tenik e **2.** dewlemendiya ji xele-xurdeyê

**dewr** **1.** çax, heyam **2.** careke kirina tiştekî; ger **3.** raguhastin **4.** wane *"heke **dewr** bi te re neyê, tu bi dewrê re here"

-**dewra xwe rewan kirin** waneya xwe dubare kirin û baş tê gihiştin

-**dewrî yekî kirin** karek raspartin yekî

**dewr kirin** **1.** raguhastin, neql kirin **2.** xitim kirin

**dewran** çerxa zemên *"**dewran** bi dor e, geh li jêr e geh li jor e"

**dewraze** hespê girs

**dewre** **1.** xelet **2.** çewt

**dews** **1.** şop **2.** cih **3.** war **4.** şûn *"**dews**a şûran rehet dibe, dewsa gotinan rehet nabe"

-**dews û doz** war û mebest

-**bi ser dews û doza yekî ve nebûn** ji şop û armanca yekî bêxeber bûn

**dewx** sergêjî

**dexel** sexte

**dexelî** sextekarî

**dexes** çavnebar, çavreş

**dexesî** çavnebarî

**dexisîn/didexise/bidexise** çavreşî lê kirin, çavnebarî kirin

**dexl** zad, hubûbat

**deydik** kilekursî, texterewan, qirneqos

**deyn** tiştê ku heta maweyeke diyar hatiye dayîn qerz *"nanê mêran, li ser mêran **deyn** e"

-**deyn dan** qerz dan

-**deyn standin/kirin** ji kesekî destyawek wergirtin *"axa **deyn dike,** xulam xerc dike"

-**deynê xwe fît kirin** heqê kesî li ser xwe nehiştin

**deyndar** ji yekî re qerzdar *"jinê gotiye: 'bila mêrê min siwar be, bila ne **deyndar** be'"

**deyndêr** qerzdayî

**deyz** debara zivistanê ya sewalan

**dezgeh** sazî, destgeh

-**dezgehê agirkujiyê** di dûgelê de saziya ku peywira wê damirandina agirên ziyandar e

**dezî** bendê ziravik

**dê [I]** qertafa dema bê

**dê [II]** **1.** dayik **2.** mak **3.** lel/lelik **4.** dad/dadik *"hezar bavê çê, esil şîrê diyê ***(dê)***"

**dêhn** **1.** bal **2.** serinc

**-dêhna xwe dan** **1.** bala xwe dan **2.** lê hûr bûn
**dêl [I]** **1.** berdêl **2.** qîmet
**dêl [II]** **1.** boçik **2.** dûv
**-dêl hejandin** **1.** *(dêlik)* hatin telew **2.** *(jinê)* gazî mêran kirin
**dêl [II]** sega mê, dêlese *"**dêl** bi ba ye, kûçik li pey heta Bexda ye"
**dêleba** heyama têkiliya zayendî ya dêl û segan
**dêlegur** gura mê; makegur
**dêlemar** margîse
**dêlese** dêlik
**dêlik** sega mê; dêlese *"axayî ji xulêm re got, xulêm ji segî re got, segî jî ji **dêlik**a xwe re got"
**deliktî** qûnektî û bêrûmetî
**dêlindêz** pêşandana fermî; alayîş
**dêlî [I]** gûşiyê tiriyê
**dêlî [II]** cureyekî daran e
**dêm [I]** erdê bêav an jî erdê ku riya avê pê nakeve
**dêm [II]** sûretê rû
**dêman** niştecih, xwecihî, rûniştvan
**dêmarî** jinbav
**dêr** kenişt, kenîse
**dêran** **1.** wêran **2.** belengaz û reben
**dêre** fîstan
**dêris kirin** dêrz kirin
**dêrîn** **1.** kaw **2.** mîrza **3.** esîlza **4.** torin
**dêrz kirin** **1.** îsraf kirin **2.** wêran kirin
**dêş** **1.** êwirgeha belengazan **2.** her tiştê fireh **3.** mûsîqaya newayên olî
**dêw** ûc, teba
**dêwendam** di bejna ûcan de, wekî tewayan
**dêze** esmer
**dêzê** jina esmer
**dêzo** mêrê esmer
**di** daçekek e û wateya têdebûnê pêk tîne
**-di gavê de** di cih de, tafilê
**-di gel** **1.** tev de **2.** tê de **3.** pê re
**-di afirê keran de razan û xewnê pêxemberan dîtin** kambaxiya halê xwe ji bîr kirin û doza rûmetên herî berz kirin
**dibe ku** îhtimalek heye ku wisa be
**dibetî** îhtimal, bilanî
**dibistan** **1.** mekteb, xwendegeh **2.** amojgeh *“dê, **dibistan**a zarokan e”
**-dibistana seratayî** dibistana asta yekemîn a 6-12 saliyan
**-dibistana navincî** dibistana asta duyemîn a 12-15 saliyan
**-dibistana amadehî** di-

bistana asta sêyemîn a 15-18/19 saliyan

**didu** du *"daweta **didu**yan, cengecola hemûyan"

**difin** **1.** poz, bêfil, kepû **2.** nik, nikil

**difr/difre** **1.** xîret **2.** quretî, pozbilindî

**dihin dan** qedr dan, giramî dan, rêz girtin

**dij** **1.** hember **2.** zid **3.** hevrik

**-li dijî sersariyê** li hemberî bêberpirsiyariyê

**dijber** muxalif, zid

**dijmin** **1.** neyar **2.** reqîb **3.** hevrik *"**dijmin**ê bavê, nabe dostê lawê"

**dijminahî** **1.** neyartî **2.** reqabet **3.** hevrikî

**dijraber** zid, bereks

**dijûn** gotina nebaş, çêr, sixêf

**dijwar** **1.** xeşîm **2.** çetin **3.** zor *"dijminê **dijwar,** ji doste xayîn çêtir e"

**dijwarî** **1.** xeşîmî **2.** çetinahî **3.** zorî

**dik** **1.** cihê bûyerê, sehne **2.** meydan

**dil** qelb *"**dil,** miqabilê dil e"

**-ji dil û can** **1.** ji hinavan **2.** samîmî

**-çargopal-avêtina dilî** lûtkeya bicoşbûnê

**-dil dan** jê hez kirin

**-dil hebûn** **1.** bi niyêt bûn **2.** talibê tiştekî bûn *"**dil** heye, lê taqet tuneye"

**-dil hênik bûn** **1.** dilgeş bûn **2.** dilfireh bûn

**-dil kirin** **1.** xwestin **2.** niyêt kirin

**-dil mayîn** **1.** hêvî jê şikestin **2.** jê êşîn

**dilawêr** cesûr, wêrek

**dilbaz** cazibedar

**dilber** **1.** canan, yar **2.** bedew **3.** jina ku layiqî hezkirinê ye

**dilbikul** **1.** xemgîn **2.** dilbirîn

**dildar** **1.** aşiq **2.** sewdaser

**dilêr** **1.** cesûr, wêrek **2.** jêhatî, jîr

**dilfireh** **1.** bisebr **2.** aram

**dilgerm** jidil, samîmî

**dilgeş** **1.** rûken **2.** bicoş

**dilgiranî** **1.** dilşikestin **2.** hêvîşikestin

**dilhişk** dilkevir

**dilikî** **1.** evîndar, hezkirî, hebandî **2.** aşiq **3.** sewdaser

**dilîn** hîs, hest

**diljan** dilêş

**diljar** **1.** dilmayî **2.** ji aliyê derûnî ve kesê lawaz

**diljarî** rewşa lawaziya derûnî

**dilketî** **1.** aşiq **2.** evîndar

**dilkutan** bi ser hev tepîna dilî
**dilmê** **1.** xav, nazik **2.** hêka ku baş nehatiye pijandin
**dilnerm** ziravbihîstyar
**dilniya** dilrehet
**dilniya bûn** dilrehet bûn
**dilniya kirin** dilrehet kirin
**dilnizm** nepozbilind û nequre
**dilodîn** **1.** têrtijî **2.** bêbiryar
**dilokî** stranên evîndariyê
**dilop** **1.** niquteke aviyê **2.** çilk ***"**av, **dilop** dilop dibe gol**"**
**-dilop kirin** **1.** niqutîn **2.** rijîn
**dilovan** bişefqet û merhemet
**dilpak** qenc û birûmet
**dilq** **1.** ser û sîçe **2.** xuyabûna di şeklekî ci-hêde; lisif
**-ketina dilqê yekî din** xuyabûna di lisfê yekî din de
**dilrast** **1.** sadiq **2.** muxlis
**dilrehet** kesê kubêxem û bêkeser e
**dilrehetî** dilaramî
**dilsar** **1.** bizdonek **2.** betilî **3.** nexwestî
**dilsaz** qelbavakirî
**dilsoz** kesê ku li ser sozê xwe dimîne; sadiq
**dilşa** rûgeş, dilgeş
**dilşikên** qelbşikên
**dilteng** **1.** bêsebr, netebitî **2.** bêtehemul
**diltenik** **1.** ziravbihîstyar **2.** qîjgiriyok
**diltepîn** qelbjenî, dilkutan
**diltezîn** **1.** derdnak **2.** biazar, biêş
**dilwestîn** mirina ji ber sekinîna qelbî
**dilxwaz** **1.** xwestî, heweskar **2.** mereqdar
**dilxelîn** cirnexweşî
**dilxerab** gumanbar, şikbar
**dilxerabî** şikbariya dilî
**dilxereng** şewata dilî
**dilxweş** razî, pejirandî
**-dilxweş bûn** pê re kêfa xwe anîn/kêfxweş bûn
**dilxweşî** bi xwestinî
**dimatî** **1.** rûniştî **2.** niştecih, dêman
**dimis** doşav
**dimşînk** şewba çivîkan, qira mirîşkan
**din** ne ev ne jî ew, dîtir
**-roja din** roja dîtir
**dindil** nazik, nazdar
**dindilandin/didindilîne/bidindilîne** nazdar kirin
**dindilandî** **1.** baş sexbêrkirî **2.** pir nazenîn

**ding** **1.** dîwarê mezin û qayîm **2.** dengê ku dema lêxistinê ji tiştê hundirvala tê
**dengeding** dengê domdar ê ku dema lêxistinê ji tiştê hundirvala tê
**dinya** **1.** cîhan **2.** alem *"gotine: 'te **dinya** çawa dît?' gotiye: 'li gorî dilê xwe' "
**dinyanedîtî** **1.** nedîtek **2.** serobero **3.** laylac
**dir** **1.** segê gurêx; gurxenêq **2.** gir *"cewrikên seyê **dir,** timî dir in"
**diran** hestiyên cûtinê yên di devan de *"cîranê nebaş bihêle, **diran**ê êşiyayî bikêşe"
**-diranên kursî** diranên paşiyê yên cûtinê
**-diran qirqiçandin** lê gef xwarin, tehdîd kirin
**-diran di enîşkê de bûn** pir qeleş û xedar bûn
**dirandin/didirîne/bidirîne** **1.** çirandin **2.** qelaştin
**diranqîç** diranbeş
**diransaz** bijîşkê ku pisporiya wî dev û diran in
**dirav** pereyê kaxez û madenî *"aqil, bi **dirav**an nayê piştê"
**diravname** **1.** derameta dûgelê **2.** berhevoka rojane, heftane an jî mehane ya ku diravên mezaxtî û hatî tê de tên tomarkirin
**dirc** qalikên deryayî
**direfş** **1.** nîşane **2.** nîşaneya yekîneyeke leşkerî
**dirêj** **1.** zêde **2.** bilind, berz **3.** vît, çik
**dirêjahî** **1.** zêdehî **2.** bilindahî, berzî *"aqil ne li seriyan e, ne jî li **dirêjahi**ya çongan e"
**-dirêjahiya salê** seranserî salê giştî
**dirêj bûn** **1.** berz bûn, bilind bûn **2.** bejn avêtin
**dirêjî pê dan** domandin, berdewam kirin
**dirêj kirin** **1.** bilind kirin, berz kirin **2.** bi ser ve zêde kirin
**dirêş** alaveke devtûj a solbendan e û destiyê wê darîn e *"bi kulmê meçe ser **dirêş**ê"
**dirh** nîşane, mohr
**dirik [I]** **1.** dareke pîjpîjî ye û berên wê tên xwarin **2.** pîj, strî *"mirov di bin siya **dirikê** de ranakeve, di bin siya spingdarê de radikeve"
**dirik [II] û virik** galegala vala û bêkêr
**dirikandin/didirikîne/bidirikîne** rast dêrandin, piştrast kirin
**dirinc** tewayê efsûnî; şey-

tanqûnî
**dirinde** hov, kovî, jakaw
**dirixandin/didirixîne/ bidirixîne** bexişandin
**dirî [I]** strî
**dirî [II]** cureyekî darên bistrî ye
**dirîn/didire/bidire** **1.** çirîn **2.** qelişîn *"beq nequre, dê **bidire**"
**dirîreşk** mêweyek e
**dirm** bijok, berbelav
-**nexweşiya dirmdar** nexweşiya ku belav dibe
**diroz** dua
**dirozge** dua
**diroz kirin** dua kirin
**dirûd** **1.** silavên pîroz **2.** silavên pêxember û çakan **3.** silav
**dirûş** binê piyî
**dirûşm** peyv û hevokên ku di xwepêşandanekê de tên berzkirin
**dirûn*(dirûtin)*/didirû/ bidirû** **1.** *(kinc)* kêl kirin **2.** *(giya û zad)* çinîn
**dirûnge** qada ku pez lê tê giyakirin
**dirûv [I]** **1.** rû û sîma **2.** bere **3.** dîmen **4.** rûçik, sikûm **5.** teşe
**dirûv [II]** **1.** nîşane **2.** nîşaneya ku li sewalan didin da ku pê bên naskirin
-**dirûv pê ketin** şibihîn
**dist** qûşxane
**diş** xwişkên bûk û zavê
**divêle** bendikên çêrmîn
**diwaroj** pêşeroj, ayende
**di xwe re dîtin** **1.** canazarî nekirin **2.** xwe ragirtin **3.** pê karîn
**diyanet** kar û barên têkildarî ola mirovî
**diyar** **1.** kifş û eşkere **2.** eyan û beyan li holê
-**diyarî çavan bûn** **1.** bi ber çavan ketin **2.** eşkere bûn **3.** xuya bûn
**diyarde** **1.** kifşbûyî **2.** eşkerebûyî **3.** li xuyanê
**diyarî** **1.** xelat **2.** bexşîş
-**diyarî kirin** **1.** bexişandin **2.** xelat kirin
**diyarker** eşkerekirî
**diyar kirin** **1.** xuya kirin **2.** dan zanîn
**diz** heramî, çilfis *"**diz**ê malê ji malê be, ga di kulekê re derdikeve"
-**bûn dizê Xwedê** bi rewşa xwe qayîl nebûn û pozbilindî kirin
**dizek** heramxur, çilfis *"dizekî ji **dizek**an dizî, erd û ezman lêrizî"
**dizgîn** **1.** gem **2.** serê gemê yî ku bi destan tê girtin
-**dizgîna xwe qetandin** **1.** ji hefsêr filitîn **2.** serfiraz bûn
-**dizgîn kirin** **1.** serî gem kirin **2.** zeft kirin

**-dizgîn kişandin** peyatî çûn û hespê gemkirî li pey xwe kaş kirin
**dizî** heramîtî, çilfisî *"tu carî destê **dizi**yê nasitire"
**dizîn/didize/bidize** bêyî haya xwediyanji malê wan hildan; çilfisandin *"ber kerê re derbas dibe û cehşike jê **didize**"
**dizîka** bêhay, bêxeber
**divê/divêt** pêwist
**divetî** pewîstî, hewcetî
**dîbace** pêşgotin
**dîber kirin** **1.** rave kirin **2.** şîrove kirin
**dîdar** **1.** hevdîtin **2.** sohbet
**dîdarî** dîtbarî
**dîdem** dîmen
**dîdevan** çavdêr
**dîdevanî** çavdêrî
**dîdexane** çavdêrxane
**dîk** nêrê mirîşkê; keleşêr *"**dîk** jî namûsa xwe dizane"
**dîkilok** stêrka tifingê
**dîl** **1.** hêsîr **2.** bengî
**-dîl girtin** **1.** hêsîr kirin **2.** bengî kirin
**dîlan** **1.** dawet **2.** şahî *"derdê feqîrî nan e, derdê axayî kêf û **dîlan** e"
**dîlbazî kirin** bi zarê xweş xwe dan hezkirin
**dîlok** kilama govendê
**dîmen** **1.** dirûv **2.** menzere
**dîmendêr** amûra ku wêne û dîmenan bi riya pêlên gêrebayî û peykê radihîne temaşevanan
**dîmenguhêz** amûra ku dîmenan bi zindî radigihîne
**dîmenkirêt** kesê ku tu meymenet di rûyê wî de tuneye
**dîn [I]** **1.** ol **2.** ola îslamê *"ji bo xatirê xatiran, mirov diçe ser **dîn**ê kafiran"
**dîn [II]** **1.** cinî **2.** bêhiş *"aşê **dîn**an, bê av digere"
**-dîn û har** bêaqil û hişaloz *"siwar siwar e, li siya xwe guhdar e, li nava sêrî mexe **dîn û har** e"
**-dîn bûn** **1.** cin pê ketin **2.** hişaloz bûn
**-dîn kirin** **1.** bêhiş kirin **2.** behicandin
**dînar** **1.** diravê zêrînî yê dewra dewlata îslamî **2.** diravê hin dewletên ereban ên nûjen *"li malê tune **dînar**ek, navê keçikê Hezare"
**dînik** **1.** aqilsivik **2.** kêmaqil *"bihur, bi **dînik**an sax nabe"
**dînok** dînik *"**dînok** di şîn û şahiyan de kifş dibin"

**dînsist** kesê ku di erkên dînî de sistiyê dike
**dînxane** nexweşxaneya dînan; şêtxane
**dîq kirin** **1.** nihêrtin **2.** ser dan
**dîqet** baldarî
**dîqet kirin** bi baldarî li serê rawestîn
**dîrok** dûrok, tarîx
**-dîroka hevbeş** tarîxa muşterek a çend aliyên têkildar
**dîroknas** tarîxzan
**dîsa** cardin *"hîv çiqasî bedew be, **dîsa** jî qusûreke wê heye"
**dîsk** du darikên bi destikê bangurdanî ve ne û dikevin her du çalikên seriyan
**dîtbar** tiştê ku bi çavan tê dîtin
**dîtbarî** tiştê ku bi çavan tê temaşekirin
**-hunerên dîtbarî** hunerên ku xîtabî temaşekirinê dikin
**dîtin [I]** fikr û raman
**-bi ditina min** bi nêrîna min
**dîtin/dibîne/bibîne [II]** **1.** nihêrîn **2.** temaşe kirin **3.** pêrgî hatin *"**dît** ez im, nedît diz im"
**dîtinî** ramana sêwirandî
**dîtir** **1.** a din **2.** wêdetir
**dîwan** **1.** meclisa mêvanan **2.** berhema helbestvên **3.** birek mirov **4.** cureyekî rûniştekên ku çend kes li serê dikarin rûnin *"bê şêx û pîr, meçe **dîwan**a mîr**,** da ku nekevî temtêla feqîr"
**dîwane** **1.** derwêşê aşiq **2.** gêj
**dîwanxane** koçika mêvanan
**dîwar** sûr *"ba, li **dîwar**ê derve dixe"
**-dîwarê parastinê** di malperê de pergala ewlehiyê
**-dîwarê ewlehiyê** di herêmên aloz de berbendên ewlekariyê
**-dîwar lê kirin** sûr jenîn
**dîz/duz [I]** keleh
**dîz/dîzik [II]** amana ji gil *"gûzek gûzek, dibe **dîz**ek"
**-dîzika devgirtî** **1.** kesê ku bi razên xwe ve dijî **2.** kesê ku ramana xwe ya rasteqîn vedişêre
**dobe [I]** **1.** hingivê zelal ê ku ji şaneyan cuda dibe **2.** dilopeke şirîniya zer a ku ji hêjîran tê xwarê
**dobe [II]** kelek
**dobelan** kariyek e
**doç** boç
**doçka** cureyekî guleyên ku ji topan biçûktir e
**dojeder** **1.** pizrik **2.**

birîn

**dojeh** cehenem *"heta ku tu **dojeh**ê nebînî, bihişt bi te xweş nabe"

**dol** **1.** deşt **2.** best, rastahî **3.** newal

**dolan** **1.** dehlîz **2.** hewşa bihurtinê

**dolav** toterîka ku satila bîra avê dadixe û hevraz dike

**doliv** **1.** îdare, rêvebirî **2.** karîgerî

**dolivger** rêvebir

**dolivgerî** rêvebirtî

**dolmend** zengîn

**dolmendî** zengîntî

**doman** pêvajo, demajo

**domandin/didomîne/bidomîne** **1.** berdewam kirin **2.** jiyandin *"dinya siya darê ye, ji kesî re **nadomîne**"

**domdar** daîmî

**domîn/didome/bidome** **1.** berdewam bûn **2.** kêşan

**don** **1.** bez û zon **2.** zêt **3.** bizir *"**don** nekî çirayê, çira ronahiyê nade"

**-donê yekî cardin di serê wî dan** hewl dan ku pîşeya yekî cardin hînî wî bikin

**doq/doqik** şiv, ço

**dor** **1.** hawîr **2.** şîştir **3.** rêz *"Xanika Xido, yek nebû, **dor**a dido"

**-dor hatin** çax hatin

**-dor lê girtin** **1.** rapêçan **2.** derdest kirin

**doraleyn** hawîrdor

**dorav** **1.** *(ji ber bandora kêşeya roj û heyvê)* rabûn û daketina seviyeya ava deryayan **2.** med û cezr

**dorgirtî** tiştê ku dora wî hatiye rapêçan

**dorhêl** **1.** hawîr **2.** çarçive

**dormandor** bi berfirehî

**dornas** **1.** hawîrnas **2.** pispor *"dorê bide **dornas**an"

**dorpêç kirin** **1.** rapêçan **2.** pişt jê standin **3.** xeneq lê şidandin

**dost** **1.** hogir **2.** razdar *"dijminê dijminê mirovî, **dost**ê mirovî ye"

**dostanî** **1.** hogirtî **2.** razdarî *"**dostani**ya dostê xwe berde, lê dostaniya dostê bavê xwe bermede"

**doş kirin** ker û hesp dan sekinandin

**doşanî** sewalên dotinê

**doşav** dimis

**doşavmij** tiliya şehadetê

**dot** keç, qîz

**dotmam** keça apê mirovî,

**dotmîr** **1.** keça mîr **2.** keybanû *"bi qîzanî **dot**-

**mîr** bû, bi jinanî pîr bû"
**dotin/didoşe/bidoşe** ji guhanan şîr hildan *"şîr **dote** seradê, bêjing da binî"
**dotir** **1.** a din **2.** a piştî wê
**-dotira rojê** **1.** roja din **2.** roja piştî wê
**dox [I]** bela û musîbet
**dox [II]** rewşa xayîziyê
**dox [III]** destiyê alavan
**dox çûn** xayîz bûn
**doxîn** pêgirêdana şal û derpêyî
**-doxîn ketin stûyan** tolaziya wî ya veşartî eşkere bûn û pey re riswa bûn
**doxînsist** **1.** tolazê bişehwet **2.** mubtelayê şehwetê
**doz** **1.** daxwaz **2.** têkoşîn **3.** armanc
**dozdar** kesê ku daxwazekê an jî gazindekê pêşkêşî aliyên têkildar dike
**dozger** di dadgehê de kesê ku li tawanê dikole
**dozîn** paldêr, ajo
**du** **1.** hejmara pişti yekan û beriya sisiyan **2.** jimareya 2'yan *"**du** hesp, li ser afirekî nabin"
**dua** niyaza xêr û qenciyê
**dua kirin** niyaza xêr û qenciyê kirin *"neyar, ji neyaran re **dua nakin"**
**dubare kirin** ducar kirin
**dubendî** **1.** îxtilaf, tezad **2.** nakokî
**ducan** hamile, duhalî
**-ducanî bûn** hamile bûn, duhalî bûn
**duçerxe** alavake raguhastinê ya dutayeyî ye
**dudev** devçeqel *"kulfet şûrê **dudev** e li pişta mêr"
**dudil** bêbiryar, bêqerar
**dugîsin kirin** gotin dubare kirin
**duh** roja borî, beriya îro
**duhêl** **1.** bendê çermîn **2.** dualî
**dujang** elameta nexweşiyê, qitîtk
**dukak** zad, dexl
**dukar** riwayet, salix
**dulger** hesingêr
**dulgerî** hesingêrî
**dumbe** **1.** qelew **2.** kok **3.** ziktêrdek
**dunde** **1.** nifş **2.** zuriyet
**dunex** tayê ku ji du bendan hatiye rêstin
**dunikilî** cureyekî çivîkên serpopil e
**dupat** ducar
**dupate** tiştê ku du caran hatiye kirin; tekrar
**dupat kirin** dubare kirin
**durist** **1.** di rasteriyê de **2.** neçewt **3.** biserinc *"dûr here, lê **durist** here"
**-durist kirin** **1.** çêkirin **2.** pêk anîn

**durû** **1.** munafiq **2.** riyakar
**durûtî** **1.** munafiqtî **2.** riyakarî
**duryan** cihê averêbûnê
**dusaxe** girtîxane
**dusibe** piştî du rojan
**duşaxe** cureyekî nexweşiyan e
**duşem** roja sêyemîn a hefteyê
**duşîze** **1.** bakire, xama **2.** destpêneketî
**duta** duqat
**duta kirin** duqat kirin
**dutayî kirin** dunexî rîs rêstin
**duxaskan** jina ku zarok aniye û di kincan de ye
**duxaskanî** rewşa jina ku welidiye
**duyem*(-în)*** di rêza diduyan de
**dû [I]** **1.** pişt **2.** piştî wî/wê **3.** pey
**-li dû heyfê ketin** doza tolhildanê şopandin
**-li dû xwe kaş kirin** bi kotekî li pey xwe birin
**-dû re dû re** pir şunde, paşê dereng
**dû [II]** **1.** mij û moran **2.** dûxan ***"**kulek xwar e, **dû** rast e**"**
**dûajo** **1.** şivanê ku alikariya serşivên dike **2.** di karekî de kesê alîkar
**dûbrang** teyrê nêçîrê
**dûdik** fîq
**dûdo** **1.** kevirê girover ê ku her lîstikvan hoçikê xwe davêjê **2.** hedef
**dûkel** **1.** bixar **2.** hilm û gilm
**dûkelkêş** bixêrî, rojing
**dûm [I]** berdewamî û dûmahî ***"dûm**a her tiştî heye, lê ya zilmê tuneye**"**
**-dûma dirêj** kar û barên temendirêj
**dûm [II]** boç û terî
**dûmahî** dewam
**dûman** dûxana ku bi ser êgir dikeve ***"**gur li **dûman**ê digere**"**
**dûmir** **1.** ko **2.** kordûnde
**dûng** dûvê pezê ku ne dêlse ye ***"**kitikên zemên, **dûng**ên qelew dixwin**"**
**dûpişk** cureyekî sewalên jehrdar e ***"**destê xwe mexe her kunê, di hinan de mar hene û di hinan de **dûpişk"**
**dûr** **1.** ne li nêzîkê **2.** veqetî ***"dûr**o, bi nûro**"**
**-dûrî aqilan bûn** derî mantiqan bûn
**-dûrî canê we** Xwedê neke ku li we biqewime
**-dûrî huzûra haziran** haşa ji huzûra cenabê we
**dûrahî** **1.** nenezîkahî **2.** veqetîn

**dûrd** arava ku dadirive binê tiştê avî; torte

**dûrebîn** **1.** xwedîferaset **2.** alava ku dûriyê nezîk nîşan dide *"avên qûnan, niha jî xwe dane ber **dûrebîn**an"

**dûredest** **1.** neberbelav **2.** ne li ber destan

**dûrendîşî** feraset

**dûrî** durahî

**dûş** **1.** sewiye, ast **2.** rêz, şîştir **3.** îstiqamet

**dûv** boçik, dêl

**dûvedirêj** **1.** sewala ku boçika wê dirêj e **2.** tiştê ku di demeke dereng û nenêzîk de diqede

**dûvelang** **1.** alava ku ji heyvê weşanê dişîne dinyayê, peyk **2.** olamdarê berjewendiyên xelqê

**dûvelangtî** olamdariya berjewendiyên xelqê

**dûvhej** **1.** dêlhej **2.** qûnek

**dûvhejî** **1.** dêlhejî **2.** qûnektî

**dûvhejî kirin** **1.** dêlhejî kirin **2.** qûnektî kirin

**dûvmesas** bilbil

**dûvre** **1.** piştre **2.** paşê

**dûvstêrk** stêrka biboçik

**dûxan** mija ku ji êgir quloz dibe

# E

**e/E** tîpa şeşemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke dirêj e, cîderka wê pêşderkî ye, di belavbûna wê de dev vekirî ye û asta belavbûna wê nizm e
**e** erê
**ebeboz** **1.** mêrxasok **2.** şeşerût **3.** pêxas, çeqrût
**ebebozî** **1.** mêrxasokî **2.** şeşerûtî **3.** pêxasî, çeqrûtî
**ebedî** **1.** bêpayan **2.** heta hetayê **3.** sermedî *"ebed û **ebedî,** her tişt vedigere li xwedî"
**ebesor** **1.** bijarte **2.** ader
**ebesorî** **1.** bijartetî **2.** aderî
**ebrû** **1.** birû **2.** birûyên kevankî
**ebter** **1.** kêm û netemam **2.** bêtov û bêker **3.** sergêj û dîn
**ebterxane** nexweşxaneya kêmaqilan
**ecacok** firtonek, bahoz *"para xeydokan, çû ber **ecacok**an"
**ecel** **1.** dema mirinê **2.** mirin *"**ecel** ku bê**,** nade mecal"
**ecem** tirkê azerî
**ecemî** **1.** zimanê tirkên azerî **2.** tor, cahil
**ecemîtî** torî, cahilî
**ecêb** **1.** xerib, seyr **2.** nedîtî û nebînayî
**-ecêb man** **1.** mat man **2.** şaşwaz bûn
**ecêblosik** kesê ku wisa guheriye ku nayê nasîn
**ecibandin/diecibîne/biecibîne** **1.**pê re kêfxweş bûn **2.** jê razî bûn *"ê ku dotmama xwe **neecibîne,** dê kordûnde bimîne"
**ecîn** kutilkên xav
**eç** *(di zimanê zarokan de)* lêxistin
**eç kirin** *(di zimanê zarokan de)* lê xistin
**edeb** ar, şerm
**edebiyat** navê giştî yê hemî tiştên devkî û nivîskî ên hunermendî, zanistî û pîşeyî ye; wêje, tore
**-edebiyata bedew** navê giştî yê hemî hunerên

devkî û nivîskî yên ku helbest, roman, şano, çîrok û hwd dikevine ber; wêjeya bedew
**-edebiyata pîşeyî** navê giştî yê nivîsarên zanistî *(bijîşkî, endazyarî…)* û yên mesleki/pîşeyî ye; wêjeya pîşeyî
**edene** eware û yax
**edilandin/dicedilîne/biedilîne** **1.** bi cih kirin **2.** dewisandin **3.** civandin *"berê **biedilîne,** paşê bixemilîne"
**edilîn/diedile/biedile** **1.** bi cih bûn **2.** dewisîn **3.** civîn û çêbûn
**eded** hejmar
**edese** alava ku tiştên biçûk mezin dide xuyan
**eê** *(di zimanê zarokan de)* gû
**eê kirin** *(di zimanê zarokan de)* rîtin
**efare** bermaya mêwe û zadan
**efsene** serhevde û beredayî
**efsûn** sîhir, cadû
**efsûnbaz** cadûbaz
**efûng** afnik
**efûngî** afnikî
**efûngî bûn** afnikî bûn
**egal** şaşik
**eger** **1.** sedem **2.** heke
**egîd** wêrek, cesûr
**egîdî** wêrekî, cesûrtî
**egle** **1.** derengî **2.** biliyan
**egle bûn** **1.** bi derengiyê ketin **2.** pê bilîn
**egle kirin** **1.** bi derengiyê xistin **2.** pê bilandin
**ehlibeyt** malbata cenabê Pêxember eleyhiselam
**ehlikitab** **1.** endamên olên îlahî **2.** file û cihû
**ehmeq** **1.** bodele **2.** gêjik **3.** xêvik
**ehmeqî** **1.** bodeletî **2.** sergêjî **3.** xêviktî *"mêrxasiya zêde, **ehmeqî** ye"
**ejdeha** **1.** ziya **2.** marê çîrokî yê ku ji dev û çavên wî holepîtên êgir davêjin
**ejnû** çong
**ek** eê
**elaf** bazirganê ku zadî dikire û difiroşe
**elamet** **1.** berate **2.** nîşane **3.** şop
**-elameta xêrê** nîşaneya başiyê
**elb** **1.** satil **2.** kod *"bi **elba** mezin, mede xelqê"
**elbik** elba biçûk
**elende** elind
**elenî** eşkere û bêminet
**eleqe** têkilî
**eleqedar** têkildar
**eletewş** **1.** beletewş **2.** gotin, kirin û biryara bêawa û bêarmanc
**elimandin/dielimîne/bielimîne** **1.** hîn kirin,

fêr kirin **2.** amojandin **3.** perwerde kirin
**elimîn/dielime/bielime** **1.** hîn bûn, fêr bûn **2.** amojîn **3.** perwerde bûn *"devê ku **elimiye** viran,vala nasekine"
**elind** spêde
**elîl** nesax, nexweş
**elmas** kevirekî giranbiha ye
**elok/elelok** sewaleke bibask a malê ye
**em** *(r)* cinavkeke pirjimariyê ye
**emad** **1.** daxwaz **2.** vîn
**emadî** li gorî daxwaz û viyanê
**embar** **1.** binanî **2.** mexzena kel û melan
**embaz** mînak, nimûne
**emîlok** lawazbûna ji ber îshala demdirêj
**emîlokî** kesê ku ji ber nexweşiya hundirêşê pir lawaz bûye
**emr [I]** temen**,** jî *"**emr**ê ku çû, mede dû"
**emr [II]** **1.** ferman **2.** rêzik
**enber** bêhneke xweşik e
**enbar** **1.** binaniya malan **2.** mexzen *"**enbar**a cotkaran, di serê gîsinê wan de ye"
**encam** **1.** netîce, akam **2.** dawî, aqibet
**-encam dan** **1.** netîce jê wergirtin **2.** bi dawî bûn
**encamname** daxuyaniya dawiyê
**end** qeys
**endam** namzed
**-endamê saziyê** namzedê mueseseyê
**endaze** **1.** zanistên qeys û pîvanê; hendese **2.** qeys û pîvan **3.** usûl
**endazyar** pisporê zanistên pîvan û qeysê; muhendis
**endelmendelketî** hizhizî, hophopo
**engizandin/diengizîne/biengizîne** **1.** tehrîk kirin **2.** teşwîq kirin
**engizîn/diengize/biengize** **1.** danexwarin **2.** niçîn
**enirandin/dienirîne/bienirîne** bi hêrs kirin
**enirîn/dienire/bienire** bihêrs bûn
**enî** rû, bere
**enîroj** kesê ku eniya wî rewneqdar e
**enîşk** herewera ku di navenda mil de ye
**entere** roja ku sermaya zivistanê dest pê dike *"**entere**, dikuje ga û ker e, xudan hê jî bêxeber e"
**e-peyam** peyam û nameyên bi riya tora ragihandinê ya navneteweyî

**ep/epik** xwarina zarokan
**ep kirin** *(di zimanê zarokan de)* xwarin û vexwarin
**eqd [I]** dîwarê ku ji xweliyê hatiye lêkirin
**eqd [II]** peyman û lihevkirin
**-eqda zewacê** lihevkirin û îlankirina mehra rewa
**eqîm** stewr
**eraf/erah** **1.** pispor **2.** arxeyîn û bêminet **3.** bi xwe ve ewle
**eraq** şerab, mey
**erbane** defik
**erd** **1.** rûyê zêvînê **2.** dews **3.** şûn **4.** aqar *"baran dibare, **erd** xwe dipesinîne"
**erdhej** hejek, zelzele
**erdnas** pisporê ku li erdê dikole û lêkolînên xwe bi awayekî zanistî dike
**erdnasî** pisporiya zanistî ya ku mijara wê tevgera erdê ye
**erebe** seyare, çarçerxe
**erebane** nasirge
**erê** belê *"**erê** erê ye, na jî naye, lê erê-na bela ye"
**erik** na lo/na lê!
**erjeng** tirsnak, sehmdar
**erk** **1.** vatinî, peywir **2.** wezîfe
**-erkên dîrokî** peywirên tarîxî
**erkbeşî** **1.** karbeşî **2.** peywirbeşî
**erşanî** pîkol
**erşan kirin** *(sewal)* erd pîkol kirin
**erşêt** heşteka parê
**erwend** **1.**jîr, zana, aqil **2.** ciwan, xweşik
**erxewan** rengê keskê tarî
**erzan** **1.** kêmbiha **2.** kêmqedr *"**erzan** kirî, heban dirî"
**erzan bûn** **1.** kêmbiha bûn **2.** kêmqedr bûn
**erzanî** kêmbihatî
**erzan kirin** **1.** *(biha)* daxistin **2.** *(qedr)* xistin
**erzaq** pediviyên xwarinê
**erzêl** malika ku ji çiqilên daran tê çêkirin û li ser çar singan ava dibe
**erzên** hestiye binê dêv
**esas** bingeh *"avahî nabe bê **esas,** mirov bi rojî û nimêjê nabe xilas"
**esîl** ader, esîlza *"ji **esîl**î bipirse, ji bêeslî bitirse"
**eskênc** jan, şkênc
**esl** **1.** bingeh **2.** jêderk **3.** nifş *"**esl,** winda nabe"
**esman** barekê li ser erdê yê bê ser û ber
**-esmanê devî** arîkê dêv
**esmanger** pisporê ku ji bo karên zanistî bi firokeyan li esmanan digere
**esmangerî** karê ku es-

manger pê radibe
**esmer** qemer
**esrar** poranga xaşxaşkan a sermestker
**esrarkêş** bengiyê poranga xaşxaşkan a sermestker
**eşîr** qebîle, hoz
**eşîrtî** pergala hozdariyê
**eşkere** **1.** xuya, diyar **2.** kifş, berbiçav *"agirê bidû, **eşkere** ye"
**eşkere bûn** **1.** xuya bûn, diyar bûn **2.** kişf bûn, berbiçav bûn
**eşkere kirin** **1.** xuya kirin, diyar kirin **2.** kişf kirin, berbiçav kirin
**eşkeretî** **1.** serbestî **2.** berbiçavî
**eşkêl** **1.** tehr, awa **2.** çepera ku çav dibîne
**-eşkêla erdê** dirêjahiya ku ji navenda kadê heta cihekî li rûyê erdê
**eşq** **1.** evîn **2.** sewdaserî *"**eşq**a dizan, bi şevereşê geş dibe"
**eşûra** di salnameya hicrî de dehê meha muheremê
**et** xwişka mezin
**etar** hûrdefiroş
**etehiyat** di nimêjê de duaya ku di rûniştinan de tê xwendin *"**etehiyato,** çawa lê hato"
**etirîn/dietire/bietire** **1.** bêrî kirin, bende man **2.** meraq kirin *"sêwî sitirî, melek **etirî**"
**etê** awayê bangkirinê yî xwişka mezin
**etore** hop
**etûne** kilsxane
**ev** *(r)* cînavka şanîdanê ya ji bo kesê nêzîk
**-ev çend** bi vê hejmarê
**-ev qas** bi vê mêjerê
**evandin/dievîne/bievîne** hez kirin
**evd** **1.** bende **2.** xulam *"bila li Xwedê xweş here, bila li **evd**an xweş neçe"
**evdal** derwêş, gerok
**evdoşekalo** hespê pîrê yî girs
**evistin/dieve/bieve** **1.** evîndar bûn **2.** jê hez kirin
**evîn** **1.** eşq **2.** hezkirin **3.** sewdaserî
**evîndar** **1.** aşiq **2.** hezkirî, dilikî **3.** sewdaser
**evîndarî** **1.** aşiqtî **2.** hezkirîtî, dilikîbûn **3.** sewdaserî
**evor** heywanê nêçîrê
**evra** pîroz
**evrandin/dievrîne/bievrîne** **1.** pîrozmend bûn **2.** şêkirandin
**evrandî** pîrozmend
**evrar** pîrozmendî
**evrar bûn** pîroz bûn

**evrar kirin** pîroz kirin
**evrayî** pîrozî
**evsing** dafika ku bi keviran tê jenîn da ku kevok têkevinê
**extebot** heştpê
**ew** *(r)* cînavka şanîdanê ya ji bo kesê li dûrê *"**ew** riya ku te berê xwe dayê, ez jê hatime"
**eware** bêkêr û yax
**eware bûn** bêkêr û yax bûn
**ewidîn/diewide/biewide** **1.** hîn bûn **2.** meşq kirin **3.** perwerde bûn *"filan kes gur e û **ewidiye** *(elimiye)*"
**ewiqandin/diewiqîne /biewiqîne** **1.** bilandin **2.** banandin **3.** xapandin
**ewiqîn/diewiqe/biewiqe** **1.** bilîn **2.** banîn **3.** xapîn
**ewk** filan û bêvan
**ewlad** zarok *"**ewlad**ê ku şora bavê xwe neke, di sîwanekê de werdibe"
**ewle** **1.** bêxetere **2.** asa
-***(pê)*** **ewle bûn** pê ve emîn bûn
**ewlehî** **1.** ewlekarî, emniyet **2.** îtîmad **3.** asayîş
**ewlekarî** **1.** emniyet **2.** temînatdarî **3.** asayîş
**ewlemend** xwediyê emanet û siyanetê
**ewr** mija ku li esmên berî baranan komî ser hev dibe û jê baran dibare
**ewrawî** esmanê bi mij û moran
**ewret** di îslamê de endamên ku dîtina wan ji aliyê biyaniyan ve heram e
**ewtandin/diewtîne/biewtîne** **1.** *(kûçik )* bang dan reyandin **2.** zimanê yekî dirêj kirin
**ewtîn/diewte/bîewte** **1.** *(kûçik )* bang dan, reyîn **2.** *(mirov)* bi di-jûnkarî pizepiz kirin *"çiqasî keviran bavêjî sê *(segî)*, dê ewqasî **biewte**"
**exik** belxem
**ex kirin** belxem ji devî avêtin derve
**exlaq** **1.** sinc **2.** xwî û xislet **3.** serinc **4.** taybetmendî *"çiya diguhere, lê **exlaq** naguhere"
**exlewik** tawe
**exte** hespê xesandî
**extirme** xenîmet
**ey!** baneşaneke gazîkirinê ye
**eyalet** koma parêzgehan
**eyan** **1.** kifş **2.** eşkere *"dar bi berê xwe ve **eyan** e, mêr bi navê xwe"
-***(lê)*** **eyan bûn** **1.** jê re xu-

ya bûn **2.** hatin xewnê

**eyar** **1.** postê gurandî **2.** derdanka çêrmîn a ku tiştan dikinê *"ji hirçekî, du **eyar** dernayên"

**eyarşîr** postê ku şilahiyê dikinê

**eyd** **1.** demên şahiya dînî û civakî **2.** şahî *"**eyd** tê, xêr û ber pê re"

**eydanî** **1.** kincên eydê yên xizmetkirî **2.** şirînahiya ku di eydan de tê belavkirin

**eylo** balindeyek e

**eynî** mîna heman tiştî; wekî *"kalo çû seferê, hat **eynî** ew kerê berê"

**eywan** di malan de jûra navendî; hêwan

**ez** *(r)* cînavka kesê yekemîn a yekjimar *"mêrê ehmeq dibêje: **'ez'**"

**ezan** bangawaziya ji bo nimêjê *"**ezan** e, riya malê nizane"

**ezan dan** *(bi gaziya nimêjê)* bang kirin *"dîkê çê, hê di hêkê de **ezan dide**"

**ezbenî** ezxulam

**ezezî** ezperestî

**ezimandin/diezimîne/biezimîne** **1.** mêvan kirin **2.** jê re mazûvanî kirin

**eziyet** **1.** azar **2.** şkenc **3.** seza

**ezîz** **1.** berdil **2.** berkeftî **3.** delalik *"bûka xalê, **ezîz**a malê"

**ezîze** **1.** delalika malê **2.** rahibeya dêrê

**ezman** esman *"erdekî hişk, **ezman**ekî bilind"

**ezmûn** **1.** îmtihan **2.** tecrube

**ezmûngeh** cihê ku tecrube lê tên pêk anîn; taqîgeh

**ezperest** kesê ku tim di heyra xwe de ye; xweperest

**ezwaz** kibrît, niftik

# Ê

**ê/Ê** tîpa heftemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke dirêj e, cîderka wê pêşderkî ye, di belavbûna wê de dev nîvgirtî ye û asta belavbûna wê navincî ye
**ê [I]** erê
**-ê [II]** tewanga nêrtiyê ye *"rizq**ê** gur be, xema şivên bêhûde ye"
**-ê [III]** nîşaneya cînavka ku di dawiya lêkerê de tê bikaranîn *wekî: ez diçim**ê** , min day**ê***
**-ê [IV]** ravekerê nenas ê nêrzatiyê *"ez hê he me, **ê** te me"
**ê din** ne ev/ew
**êdî** ji vir şun de, ji vê qasê wêdetir
**êgin** **1.** jêhatî **2.** xwedanferaset
**êgin bûn** **1.** jêhatî bûn **2.** xwedanferaset bûn
**êk** **1.** hev **2.** yek
**ê ku** **1.** kesê ku **2.** tiştê ku *"gur e **ê ku** lê dixe, qijik e a ku dixwe"
**êk û du** hev û du
**êl** eşîr, hoz, qebîle *"**êl**a bê serwerî, wekî bedena bê serî"
**êlbat** cureyekî çivîkan e
**êldar** kesê ku xwediyê qebîleyekê ye, hozdar
**êlinc** hestiyên milî
**êlincî** rewşa tevilheviya asikê ya berî vereşanê
**-êlincî hat yekî** dike ku vereşe, qilqalê wî tev rabû
**êm** alif
**-ên** vetetandeka binavkirî ya ji bo pirjimariyê
**êngar** şevereşa hera tîr
**êrçal** şûm, nehs
**êrçalîtî** şûmî, nehsî
**êreqan** nexweşiya zerikê
**êreqe** cotê ku sewalan davêjinê û wisa cot dikin
**êrîş** **1.** bi riya ragihandinê daberizîn yekî an jî aliyekî; destdirêjî **2.** ji bo dagirkirin an jî rizgarkirinê bi ser yekî/aliyekî de girtin *"**êrîş**a gur, pêz ditirsîne"
**-êrîşên hovane** hucûm an jî berhucûmên wehşî
**êrîşkar** kes ê ku destdirê-

jiyê dike
**êrîş kirin** destdirêjî kirin
**êrîş meşandin** hucûm li dar xistin
**êsta** a niha, îcar
**êstir** hêstir
**êş** **1.** azar û şkênc **2.** keder û renc **3.** zecr û ezab *"**êş**a tiliyê, ya hemû laşî ye"
**-êşa giran** ta
**-êşa reş** şêrpence
**-êş û ûş** derd û kul
**-êşa zirav** cureyekî êşên kuxikê ye; jana zirav
**êşandin/diêşîne/biêşîne** **1.** azar lê kirin **2.** rencîde kirin *"bar min naêşîne, binbar min **diêşîne**"
**êşbir** dermanê êşkuj
**êşiyayî** **1.** azardîtî **2.** qehirî **3.** rencîdebûyî *"diranê **êşiyayî,** dê rojekê were kişandin"
**êşîn/diêşe/biêşe** **1.** jê azar dîtin **2.** zecirîn **3.** qehirîn *"xwelî li wî seriyî ku heft serî jê **neêşin**"
**êşnasî** teşxîs, diyarkirina cureyê nexweşiyê
**êstper** kulîlkek e
**êtir [I]** **1.** ji bilî vê **2.** êdî **3.** di dawiyê de
**êtir [II]** **1.** sebr **2.** aramî **3.** tebatî
**êtir kirin** **1.** sebr kirin **2.** tebitîn
**êtixî** eyba mezin, belaya bêpere *"**êtixi**yên kirî, tên pêşiyê"
**êtûn** cihê ku hesin tê de tê bihujandin; kûreya hesingeran, hêtûn
**êvar** danê şevê *"adarê, berf giha guliyê darê, nema danê **êvar**ê"
**-êvarbaş** şevbaş
**êve** xem nake
**-êve ku hat** xem nake ku bê
**êvelî** olintî, taytore
**êvişandin/diêvişîne/biêvişîne** **1.** bexişandin **2.** canazarî kirin *"xelq dewê xwe ê tirş ji meriyan **naêvişîne**"
**êvişandî** bexişandî*"derba **êvişandî,** ne ya xwediyan e"
**êvitîn/diêvite/biêvite** *(ji ber lêdan, kulbûn û birîndarbûnekê)* perçifîn
**êvnî** **1.** laşê bihêz û bijûn **2.** mirovê lêkdayî
**êvnîk** pihêt
**êvnûte** êvnî
**êwiran** avakirina baregehê li cihekî bikêrhatî
**êwirandin/diêwirîne/biêwirîne** **1.** sitirandin **2.** hewandin
**êwirîn/diêwire/biêwire** **1.** sitirîn **2.** hewîn
**êwran** debara malê; abor

**êxre** dirûna devê telîs û têran
**êz 1.** zîl, bişku **2.** ajeroya daran
**êzimk** falinca zarokan
**êzing 1.** darê şewateyê yên hişk **2.** kesê serhişk *"**êzing,** nabe text"
**êzingdank** cihê ku darên şewateyê datîninê
**êzingvan** kesê ku darên şewateyê dibire an jî difiroşe

# F

**f/F** tîpa heştemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku li gorî cîderka wê diranlêvkî ye, li gorî belavbûna wê fîzek û hişk e
**facir** kesê ku bêminet û bêtirs gunehan dike
**fafik** tat, lal
**fafon** daringekî mînanî hêsin e û jê aman tên çêkirin û kurteya wî ya latînî *Al* e; bafûn
**faîz** riba
**faîzxur** ribaxur
**fal** remil
**falavêj** remilbêj
**falname** remildank
**fanorî** kirasê şevê
**fanos** panos
**fantên** lîstika bi kaxizên qimarê
**farqûsk** kefkanî/berkanî
**farzik** çavbirçî
**fasiq** **1.** gunehkar **2.** facir
**fasiqtî** **1.** gunehkarî **2.** facirtî
**faş** **1.** fahiş **2.** bêar
**faşûn** darekê meht û giran ê ku piştî cot li ser rûyê zeviyê digerînin
**faşûn kirin** li ser rûyê zeviyê faşûn gerandin
**fatereşk** gurçik
**fatfatik** kevoka kûvî
**fatihe** sûreya yekemîn a Qurana Pîroz
**-fatihe xwendin** **1.** dua kirin **2.** di nimêjê de sûreya yekemîn a Qurana Pîroz xwendin
**fatik** cureyekî margîseyan e
**fatûj** çakûçê kevirbiran
**fatûj kirin** kevir şeh kirin û birîn
**fayde** sûd û kelk
**faydedar** sûdwer û behredar
**fayke** kinca hûnandî ya ku dewsa qutik tê lixwekirin
**fecr** berbang
**-fecra sadiq** berbanga rasteqîn a ku piştî wê nimêja sibehê tê kirin
**feçer** kesê ku serê bêvila wî bilind e
**feçer kirin** zor lê kirin
**feda** qurban, gorî
**fedakar** cangorî

**feda kirin** gorî kirin
**fediyok** fedîkar
**fedî** şerm
**fedîkar** şermoke
**fedî kirin** **1.** şerm kirin **2.** mehcûb bûn *"çav ji çavan **fedî dikin"**
**fehetkar** fedîkar
**fehl [I]** sewalê nêr ê ji bo tovî *"kurî li **fehl**an, xwarzî li xalan"
**-hatin fehlan** *(sewala mê)* wextê gonxwarina wê hatin
**fehl [II]** fal
**fehm** têgihiştin
**fehm kirin** tê gihiştin *"heke mirov ji yekî **fehm neke,** ji sedî jî fehm nake"
**felat** serfirazî
**felaqe** lêdana binê piyan
**-felaqe kirin** li binê piyan xistin
**felek** çerxa cîhanê
**-feleka xayîn** gera çerxa cîhanê ya dijî xwestina yekî
**feleqe** sezaya bi lêdanê
**feliqandin/difeliqîne/bifeliqîne** tîke kirin, parçe kirin
**felişandin/difelişîne/bifelişîne** **1.** li erdê xistin **2.** pêxem lê xistin **3.** belav kirin
**felişîn/difelişe/bifelişe** **1.** li erdê ketin **2.** pêxem lê ketin **3.** belav bûn
**felît** **1.** zîrek **2.** ciwan
**felîte** jina qûnek
**felîtetî** qûnektî
**felq** tîke, parçe
**felqedest** bi qasî kefa destekî
**felsefe** retkok
**-felsefeya heyatê** retkoka jiyanê
**felş bûn** mechûb bûn
**fena** mîna, eynî wê, weke, notla
**fend** **1.** huner **2.** konetî **3.** fesal *"kevirê êş çiqasî giran be jî, aşvan bi **fend**a xwe wî radike"
**fendbaz** **1.** dekbaz **2.** xasûk
**fener** çiraya destan
**feq** dafik, tele
**-feq danîn** tele/dafik danîn
**feqizandin/difeqizîne/bifeqizîne** fizirandin
**feqîh** kesê ku di dîn de pisporiyê digere
**feqîr** **1.** xizan **2.** bêtawan **3.** bêkes *"**feqîr** bi feqîran re bizewicin, dê parsek ji wan çê bibin"
**fer [I]** **1.** hejmarên yek, sê, pênc û hwd
**fer [II]** kit
**-ferek sol** kiteke solê
**fer [III]** teyisok, çirûsk,
**fera** aman

**feramûş bûn** **1.** xera bûn **2.** betal bûn **3.** bêhemal bûn
**feramûş kirin** **1.** xera kirin **2.** îflas kirin **3.** îhmal kirin
**feraq** aman *"**feraq** tune pê here avê, deyn dike dide xêra dê û bavê"
**feraqşo** amanşo
**feraset** **1.** çemk **2.** fêhm û hizr **3.** zihniyet
**feraşo** **1.** kesê ku feraqan dişo **2.** alava amanşûştinê
**ferd** **1.** kes **2.** takekes
**ferde** telîs
**ferdî** takekesî
**ferec** **1.** felat **2.** nîşaneya berbangê *"desthilanîn, **ferec**a xêrê ye"
**ferenc** kulav
**ferfûr** amanên ji acûrê; kaxetîtik, porselen
**ferheng** **1.** çand **2.** dab û nêrît **3.** berhevoka peyvên zimanekî; peyvname
**ferhengok** peyvnameya biçûk
**fericîn/diferice/biferice** temaşe kirin
**ferikîn/diferike/biferike** **1.** ji hev belav bûn **2.** tarovaro bûn
**ferisandin/diferisîne/biferisîne** tehlîl kirin, dahûrîn
**ferişte** milyaket, melek
**ferman** **1.** emr **2.** tehlîmat **3.** rêzek *"**ferman**a hêştirê hat, rovî bazda"
**-fermana mîrî** emrê resmî
**fermanber** **1.** karmend **2.** peywirdar
**fermandar** **1.** emîr **2.** mîrê ku xwediyê hêzeke leşkerî ye **3.** di artêşê de rayedarê ku berpirsê desteyeke leşkerî ye
**fermî** resmî
**fermo** kerem bikin!
**ferman rakirin** emrê qetlyiamê dan
**fersend/firsend** derfet, îmkan
**ferş/ferşik** raxisteka nava malê *"bila li erşan be, ne li bin **ferş**an be"
**ferûc** varik
**ferwerdar** **1.** hukumdar **2.** mîr
**ferx** dîkê varikê
**ferxe** jina geveze
**ferxes** **1.** tirxes **2.** nîvxesandî
**ferxik** têjik
**feryad** dengê ku hawariyê dixwaze
**feryad kirin** *(ji bo hawariyê)* qîjîn
**ferz** **1.** fermana Xwedê **2.** karê îcbarî
**ferzan** zana

**ferzanî** zanatî
**ferz bûn** **1.** ji aliyê Xwedê de ferman hatin **2.** karekî îcbarî diyar bûn
**ferzende** **1.** alim **2.** zana
**ferzîn** di lîstika setrencê de kevirê ku wezîriyê dinimîne
**ferz kirin** **1.** *(Xwedê)* ferman kirin **2.** îcbar kirin
**fesad** kesê ku navbera xelqê xera dike; ewan
**fesadî** karê xerakirina aştiya xelqê; ewanî
**fesal** **1.** pîvan **2.** qeys **3.** rêbaz
**feşk** **1.** pêxem **2.** feramûşî
**feşkilandin/difeşkilîne /bifeşkilîne** **1.** belav kirin **2.** tarovaro kirin **3.** pûç derxistin
**feşkilîn/difeşkile/bifeşkile** **1.** belav bûn **2.** tarovaro bûn **3.** pûç derketin
**fetilandin/difetilîne/bifetilîne** **1.** zivirandin **2.** vegerandin
**fetilîn/difetile/bifetile** **1.** zivirîn **2.** vegerîn *"av **nafetile,** ba di cihekî da nasekine"
**fetisandin/difetisîne/ bifetisîne** **1.** xeniqandin **2.** şeniqandin
**fetisîn/difetise/bifetise** **1.** xeniqîn **2.** şeniqîn *"malê xesîsan, **difetise"**
**fetrûm** derziya ku berî nexweşiyan ji bo berevaniyê tê lêxistîn
**fetrûm kirin** dermanê avkî bi şiringeyê berdan binê çêrmî
**fetwa** ramana fiqhî
**-fetwa derxistin** di heqê babetekê de ramaneke şerîetê diyar kirin
**fewitandin/difewitîne/ bifewitîne** **1.** ji dest derxistin **2.** pê negihiştin tu tiştî
**fewitîn/difewite/bifewite** **1.** bertelef bûn **2.** ji dest çûyîn
**feylezof** retkokzan
**feza** seqa
**fezayî** seqayî
**fê** cureyekî nexweşiyê ye
**fêd** erdê bixîz ê ku piştî vekişîna avê dertê holê
**fêdar** kesê ku bi nexweşiya fêyê ketiye
**fêkî** mêwe
**fêl** dek û hîle
**-fêl û tele** dek û dolab
**-fêlên firewn û şîretên Mûsa tevî hev kirin** helalî û heramî berdan ser hev
**fêlbaz** dekbaz û hîlebaz
**fêm** **1.** feraset **2.** zêhn **3.** hizr û raman
**fêm kirin** **1.** tê gihiştin **2.** pê hesîn *"dîwaro ji

te re dibêjim, bûkê tu **fêm bike"**
**fêmkor** **1.** bêferaset **2.** serkevir
**fêr** zanîn
**fêr bûn** hîn bûn
**fêre** îbret
**-fêre girtin** jê îbret wergirtin
**fêr kirin** hîn kirin
**fêrgeh** **1.** pol **2.** dibistan
**fêris** hêja, egîd
**fêrist** pêrist
**fêtokî** **1.** fediyok **2.** şermoke ***"fêtokî l**i mêran, kenokî li jinan nayê**"**
**fêz** aliyê jorîn ***"**agir berda kome, xwe da **fêza** zomê**"**
**fihêl** paqijî
**fihêl kirin** paqij kirin
**fikar** **1.** derd û keder **2.** tirs û xof **3.** tatêl û mitale
**fikirîn/difikire/bifikire** **1.** ramîn **2.** hizir kirin
**filan** kes an jî tiştê nediyar
**-filan û bêvan** **1.** ew kes û yê dîtir **2.** ev tişt û yê dîtir ***"filan** kes mangeya biga ye *(qûnek e)***"**
**filç** pozpelişî
**file/fileh** **1.** peyrewê cenabê Îsa eleyhiselam **2.** kesê ku di angaşta peyre wiya cenebê Îsa eleyhiselam de ye ***"fileh**ekî bi rûyekî, ji bawermendokê bi du rûyan çêtir e**"**
**filitandin/difilitîne/bifilitîne** **1.** rizgar kirin **2.** serfiraz kirin **3.** jê pekandin
**filitîn/difilite/bifilite** **1.** rizgar bûn **2.** serfiraz bûn **3.** jê pekîn ***"**bûka malê xweş xebitî, ker girêda û cehş **filitî"**
**filq** xêvik
**filûs** zayendî
**filûz** maden
**fincik** **1.** qefz **2.** lotik, hindirik **3.** bizav
**fincik avêtin** lotik avêtin
**find** mûm, şem
**findank** mûmdank, şemdank
**finfinok** derewa bêbinî
**finik** hêstira viringî
**fiqih** **1.** fehm **2.** şerîet
**fir [I]** qurteke vexwarinê
**-fir kirin** vexwarin
**fir [II]** kêşeke baçikê
**-fir lê xistin** *(baçik)* kêşan
**fir [III]** hilbaskîn ***"fir**a mirîşkê, hetanî ber kadînê ye**"**
**fira** tiştê ku zû difire
**firandin/difirîne/bifirîne** **1.** tê werkirin **2.** bi bilindî avêtin **3.** pekandin, pengizandin
**firaq** aman
**firaqşo** amanşo
**firavîn** navroj ***"firavîn**

bi fayde ye, lê dawî bi lome ye"

**firawan** **1.** fireh **2.** dorfireh

**firçe** porçe

**firdik** xwarina ku ji nanê diçînine nav dêw tê çêkirin

**firdikandin/difirdikîne /bifirdikîne 1.** nan çandin nav dêw **2.** hûr kirin, çînîn

**firefir** dengê domdar ê ku ji awayê vexwarinê yî dengî tê

**firefir kirin** bi awayekî dengî vexwarin

**fireh** **1.** biber, ne kêmber **2.** boş, pir, zehf *"mirî melûn nebe, di gorê de cî **fireh** e"

**fireh bûn** **1.** belaş bûn **2.** peraş bûn **3.** zêde bûn **4.** kêmber nebûn *"heke dil **fireh be,** rê jê re gelek in"

**firehî** **1.** nekêmberî **2.** boşî **3.** pirî **4.** zêdehî

**fireh kirin** *(ji aliyê berahiyê ve)* lê zêde kirin

**firênek** nemûş, gulor

**-firênek li sêrî gerandin** nemûş lê alandin, gulor li sêrî kirin

**firêqet** serfiraz û bêminet

**firêqet bûn** serfiraz û bêminet bûn

**firêqetî** serfirazî û bêminetî

**firêqet kirin** serfiraz û bêminet kirin

**firêz** çêreya ku ji nava zevî û bîstanan tê kaxkirin

**firfat 1.** gincirgincirî, zîvalzîvalî **3.** kevn û kol, kevnekotik

**firfaz** lotik, hindirik

**firfire** perwane

**firfirok** firildax

**firgeh** di balafirgehê de erdê ku balafir lê datîne

**firj** fişkîniya sewalan

**firijîn/difirije/bifirije** *(sewal)* fişkîn

**firildax** teqemeniya ku difire û li hewa diteqe

**firinde** sewala bibask; perinde

**-firindeyê efsûnî** teyrê çîrokan

**firisandin/difirisîne/bifirisîne** **1.** xitimandin **2.** tepisandin

**firîk [I]** simbila ber stewînê *"agir bi rihê yekî ketibû, yekî jî digot: 'ez dê **firîk**ên xwe li ber biqelînim"

**-firîkî firîn** **1.** wekî firîka stewî pekîn **2.** çûn hatenehatê

**firîk [II]** giyanewerê jînşê

**firîn/difire/bifire** **1.** perwazî esmên bûn **2.**

hilfirîn **3.** pekîn, pengizîn *"her teyr, bi baskên xwe **difire"**
**firîngeh** firgeh
**firîsk** cureyekî kulîlkên biharê ye
**firîw** xap
**firîwandin/difiriwîne/bifiriwîne** xapandin
**firk [I]** binavber
**-firk kirin** **1.** bi navber danîn **2.** livlivî kirin
**firk [II]** livlivî, kitkitî
**firk [III]** zayîna mehînê
**firk [IV]** **1.** qolinc **2.** tivanc
**-firk ketin qeydika dêst** bayê tivancê ketin bazinê dêst
**-firk lê ketin** qolincî bûn
**firk [V]** qirç
**-firk şikandin** qirç şikandin
**firkandin/difirkîne/bifirkîne** **1.** mist dan **2.** pişirandin
**firkefirk** dengê pîneyê ku li ba dibe
**-firkefirka alayê** hejîna perçemê ya li ber bayî
**firloq** heştirme
**firmêsk** rondik, hêstir
**firmêskrêj** teqemeniyên rondikrêj
**firingî** bacana sor; pamîdor
**firne** alava ku tê de nan û xwarin tên pijandin
**firnik** **1.** firneya biçûk **2.** kulfikên bêvilê
**firo** şîrê mihan ê payîzê
**firofehş** **1.** beletewş **2.** çîleçepî **3.** xelexwar
**firoke** navgîneke raguhastinê ya hewayî ye
**firoşgeh** dukana danûstanê
**firoşkar** kesê ku danûstanê dike
**firotin/difroşe/bifiroşe** **1.** bi bêrdelekî dayîn **2.** xayintî kirin *"êqil derxin **firotin**ê, her kes dê aqilê xwe bikire**"**
**firqask** **1.** lotik **2.** qefz
**firqas kirin** **1.** lotik avêtin **2.** qefz dan
**firsend** derfet *"heke **firsend** têkeve destê kêmfirsendan, dê însanan jî nal bikin**"**
**-firsend payîn** li keysa xwe nihêrîn
**firş** sebr
**firşik** ziravê sewalan ê ku jê havênê penîrî jî tê çêkirin
**firşteng** bêsebr
**firyar** kesê ku balafiran diajo
**fis** **1.** baberçûna bêdeng û bêhnkirêt **2.** têkiliya zayendî ya di navbeyna firindeyan de *"bi **fis**an çarşev boyax nabe**"**

**fisegur [I]** cureyekî kariyên çolê/beriyê ye
**fisegur [II]** zîvalzîvalî, kirtimkirtimî
**fisek** baberketî
**fisgenî** **1.** bêhnkirêt **2.** bêrûmet
**fisgenîtî kirin** karên xwe yên kirêt veşartin
**fisikîn/difisike/bifisike** **1.** *(dara ku tê tewandin)* şikestin **2.** *(pê)* şiqitîn
**fisirîn/difisire/bifisire** fizirîn
**fis kirin** **1.** ba ber ketin **2.** *(firinde)* gayîn
**fismirî** xesîs, xasûk
**fisqe** pîvazên biçûk
**fistiqîn/difistiqe/bifistiqe** **1.** bi xeletî gerîn **2.** tehisîn, pê şiqitîn
**fistoqî** **1.** axozî **2.** çolêketî **3.** li malê newanbûyî **4.** segê navmalagerî
**fisû** ajaleke bêhnkirêt e
**fişar** **1.** zext, pêkutî **2.** zordestî **3.** gotina beletewş
**fişarde** pertaf
**fişkefişk** **1.** bêhnefişkên li ser hev **2.** girî û xilîtkişandina tevlihev
**fiş kirin** *(bêfil)* paqij kirin
**fitar** di meha remezanê de dema xwarinê
**-fitara xwe vekirin** **1.** şîva rojiyê xwarin **2.** rojî betal kirin
**fite** **1.** fetwa **2.** firsend
**-fite dîtin** firsend bi dest xistin
**-fite jê standin** firsend jê standin
**fitîl** **1.** pilte **2.** dermanê ku ji qûnê ve tê hildan
**fitîlî** di hûnanê de devhuçik û sernavika ku bi awayekî rakişandî tê daxistin
**-fitîliya faykeyekî daxistin** tara devhuçik û sernavika fakeyî bi awayekî rakişandî hûnan
**fitir** sedeqeya meha remezanê
**-fitirê yekî xweş kirin** kesek baş kutan
**fitnekar** **1.** navtêdayî, niçandî **3.** ewan, fesad
**fizar** dengê kesê ku hawariyekê dixwaze
**fizirîn/difizire/bifizire** **1.** jê revîn **2.** baz dan **3.** peywir hiştin
**fîkandin/difikîne/bifikîne** **1.** li fîqê xistin **2.** fîtefît kirin **3.** vît kirin
**fîl** li ser rûyê erdê sewala hera mezin a şîrdar a ku difinê wê xortimkî ye
**fîncan** piyaleya qehweyê; pingan
**fîndê** jina ku bi xemla xwe ve fortên xwe davêje

**fînik** tûle, cewr
**fînok** jin an jî mêrê pûç
**fîntoz** fîndê
**fîq 1.** bilûr **2.** şimşal **3.** pîpik
**-li fîqê xistin** li tûtikê xistin
**fîqefîq** dengê fîq û pîpikê
**fîqefîq kirin** tûtetût kirin
**fîqerojk** karî, kuvark
**fîre** virik
**-fîre dan** virikî bûn
**fîrefîr 1.** kirmekirma hespan **2.** fîqefîq
**fîrefîr kirin 1.** *(hesp)* bi kirmekirm xwarin **2.** fîqefîq kirin
**fîskanî 1.** biçûçik **2.** hûrde
**fîş [I]** avika ku dibe sedema nifşên nû
**-fîşa pêxemberan** nesla paqij û bêguman a qasidên Xwedê
**fîş [II]** şilahiya ku bi pest ji hundir derdikeve derve
**fîşek** fîşeng
**fîşeng** berika çekê
**-fîşeng dan ber dêv** berik avêtin ber lûleya çekê û amadeyî teqandinê kirin
**fîşengbend** rextê fîşengan
**fît 1.** guhê bel **2.** çik
**fît bûn [I] 1.** *(guh)* bel bûn **2.** çik rabûn ser xwe
**fît bûn [II] 1.** bi qasî hev bûn **2.** kuta bûn
**fît kirin [I] 1.** *(guh)* bel kirin **2.** çik rakirin li ser piyan
**fît kirin [II] 1.** deynê xwe dan **2.** *(di qimarê de)* ji hevrikê xwe birin û tiştek di tûrê wî de nehiştin
**fîtê** jina bêrûmet a qunek
**fîtik 1.** fîqik, tûtik **2.** lêdana bi du tiliyan; çipîsk
**fîtik lê xistin 1.** li fîqê xistin **2.** *(bi du tiliyan)* çipîsk lê xistin
**-fîtik lêketin û şikîn** pir tenik û nazik bûn
**fîz 1.** fors **2.** quretî
**-fîz avêtin** xwe kiz kirin
**fîza** qure
**fîzatî** quretî
**fîzar** kûzenûz
**-fîzar kirin** kûzenûz kirin
**forq** qûnek
**forqtî** qûnektî
**fors** quretî û pozbilindî
**-forsa şêran** quretî û kêfa serokan
**fors kirin 1.** bêminet tev gerîn **2.** kêf kirin
**fort 1.** fors, quretî **2.** pozbilindî
**-fortê xwe avêtin 1.** fors kirin, xwe qure kirin **2.** pozbilindî kirin

**fote** çarşev

**fuhûş** **1.** qûnektî **2.** zina

**fûrandin/difûrîne/bifûrîne** **1.** *(zêde kelandin heta ku)* bi ser re dan avêtin **2.** *(zêde pêkutî bi ser de birin heta ku)* enirandin û bihêrs kirin

**fûrîn/difûre/bifûre** **1.** *(zêde kelîn heta ku)* bi ser re avêtin **2.** *(zêde pêkutî bi ser de birin heta ku)* enirîn û bihêrs bûn

# G

**g/G** tîpa nehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê ezmandevî û qirikî ye, awayê belavbûna wê girtî û nerm e

**ga** **1.** dewarê nêr **2.** mirovê gakî *"**ga** li mêrgan kok dibe, mela li malên miriyan"

**gabinêzk** êşeke stûyan a ku nahêle serî bileqe

**-gabinêzk girtin** tûşî êşa gabinêzkê hatin

**gaçêrîn** çivîkek e

**ga dan** **1.** ga berdan ser, ji bo ku çêlek avis bimîne berga kirin **2.** qûnektî kirin an jî bi yeke din dan kirin

**gadar** çêregeha dewêr

**gadare** kêra kalanî

**gadêr** kesê ku gayên cotî diçêrîne

**gadoş** amana acûrî

**gagolekî çûn** li ser çar lepan meşîn

**gaj** giloka tayî

**gakêl** **1.** cotyar, cotkar **2.** gayê cotî

**gakovî** nêrê askê; gayê çolê

**gal** deng, awaz

**galegal** **1.** sohbet **2.** hevpeyvîn

**galegal kirin** **1.** sohbet kirin **2.** ji yekî re behs kirin **3.** bi hev re peyivîn

**galgalîsk** gewrî

**galim** **1.** meşa ber bi yekî ve **2.** devjenî

**galiske** erebeya ku hesp dikêşin

**galte** henek, tirane

**galtefis** selexane, teral

**galtevan** henekbaz

**galûk** çoyê ku ji bendê çêrmîn î şidiyayî dihûnin û pê sewalan diajon

**galûk kirin** bi galûkê ajotin

**galûm** gurzê cengên berê; tombiz

**gam** kam

**gamêş** dewareke kedîkirî ye "mêş û **gamêş**, xwedî tînin li pêş"

**gamil** sermil

**gamisk** gayê kovî yê ku di qirguliya wî de misk heye

**gamirok** cureyekî nexweşiyan e û zarokên nûbûyî pê dikevin
**gan [I]** **1.** giyan/can **2.** jîn
**gan [II]** guhan, çiçik
**gan [III]** gayîn
**gandêr** qûnek
**gandêrî** qûnektî
**gandîl** berên girs ên ajalên dotinê; guhandîl
**ganek** **1.** sewala mê a ku heweskara nêrê xwe ye **2.** jina mêrxwaz *(xirxwaz)*
**gangil** cureyekî çêreya ku nepijî tê xwarin
**gangilok** porgustik
**ganî** **1.** giyanewer, candar, ruhber **2.** jîndar
**garan** **1.** keriyê dewêr **2.** mexela naxira dewêr ***"**ne gayê min li **garan**ê ye, ne jî galegala nanê gavên dikim**"**
**garing** feraqa ku di dema kamkirinê de didine bin gayên gêleyê da ku rêx û mîza wan di ser zêd de nerije
**garis** cureyekî zêd e û wekî gênim tê bikaranîn ***"**çûçik, li ser **garis**ên feqîran datîne**"**
**garîte** darekî dirêj û stûr ê ku didine ser avahîyan û darên zirav jî didine ser wî; kêran
**garnigan** çêreyeke şîrdar e û dibe sedama îshalê û hundirçûnê; ûzelik
**garta** navgîneke barkêşiyê ye û dişimite
**garye** çenberî, erebe
**gasin** qada nava gundekî
**gasingeh** qada fireh
**gav [I]** navbera du lingên vekirî
**-gav avêtin** **1.** navbera du lingan vekirin û meşîn **2.** dest pê kirin
**-bi ser re gav kirin** bi ser re baz dan aliyê din
**gav [II]** **1.** dem **2.** heyam ***"gav**a ku xêr dibare, gûyê sêwiyan tê**"**
**-gava din** **1.** xulekek berê **2.** kêliyeke berî niha
**gavan** kesê ku dewêr diçêrîne ***"gavan** ber bi mal e, jina gavên şixulkar e**"**
**gavber** **1.** hevrik **2.** reqîb
**gawir** **1.** kafir **2.** bêînsaf
**gawirî** **1.** kafirtî **2.** bêînsafî
**gawuk** bihukek e
**gaxend** sersala filehan
**gayîn/digaye*(digê)*/bigaye*(bigê)*** **1.** *(sewal)* pê re têkiliya zayendî danîn **2.** *(mirov)* nayîn, tecawuz kirin ***"**ne **gaye,** ne jî zaye**"**
**gayz** gaz
**gaz [I]** lûtke
**gaz [II]** dibûr

**gaz [III]** alava mixkêşanê
**gaz [IV]** endazeya ku maweya wê ji sersîngê heta serê tiliyan e *(68 cm)* *"her kes bi **gaz**a xwe cawê dipîve"
**-gaz û caw di destê yekî de bûn** biryar û ferman di dêst de bûn
**gaz [V]** daringekî curecureyî yê ku di nav bayî de heye
**gazbir** meqesdar, cawbir
**gazel** belgedar ên zer ên ku payîzê diweşin
**gazgaz** vijevij, vizeviz, guregur
**gazinc/gazind** **1.** dilman **2.** lome **3.** gilî û şikayet *"dera ku te hêvî jê heye, te **gazind** jî jê heye"
**-gazincên xwe kirin** **1.** giliyên xwe kirin **2.** aciziya xwe nîşan dan *"**gazincên xwe** ji jina xwe re **bike**, giliyên xwe li cem diya xwe veke"
**gazindok** şikayetkar
**gazî** **1.** bang **2.** dengî *"**gazi**ya dû siwaran, nagihêje xwediyê xwe"
**gazî kirin** **1.** vexwendin **2.** bang lê kirin *"**gazîkirin** adet e, nehatin dewlet e"
**gazîname** bangname
**gazîvan** **1.** bangdayî **2.** vexwendî
**gazîz** kurmê hêjîrê
**gazûz** bizûz
**gebirge** dahola mezin
**gebol** xwarineke ku ji ard û savarî tê çêkirin *"devê wan, li **gebol**a wan"
**geda** **1.** parsek **2.** xizan
**gedandin/digedîne/bigedîne** destê xwe li ber xelqê vekirin; pars kirin
**gede** kurik, lawik
**gef** tehdîd
**-gef û gur** tehdîd û diransîqandin
**-gefa kuştinê** tehdîda bi qetlkirinê
**-gef lê xwarin** tehdîd kirin
**-gefa me ji hev dibihure** em hev dinasin û ev tişt di navbera me de nabin pirsgirêk
**gefandin/digefîne/bigefîne** gef lê xwarin
**gefok** **1.** tehdîdkar **2.** gurêx
**geh [I]** ji aliyê piştê ve goşt û masûlkeyên ku ji çongê hetanî gêzikan e; teşk
**geh ... geh [II]** carinan û ne di her demê de *"dem bi dor e, **geh** li jêr e, **geh** li jor e"
**gejmirandin/digejmirîne/bigejmirîne** hêran
**gel** birek mirovên ku xwediyên ziman, we-

lat, rewişt û tîtaleke hevpar in; netewe
**-gelê kurd** neteweya kurd
**gela** belg
**gelac 1.** belapêşkar **2.** fitnebaz
**gelacî 1.** devjenî **2.** fitnebazî
**gelale [I]** goştê zêde ê ku di gewriyê hêşîn dibe; aloq
**gelale [II] 1.** moçik **2.** numûne **3.** karê sêwirandî, reşnivîs **4.** mijar
**Gelarêzan** Birca Dûpişkî
**gelawêj 1.** meha 8'emîn a salnameya zayînî **2.** gerestêrka Zuhelê
**gele 1.** kome **2.** zumre
**gelek 1.** pir **2.** zêde **3.** zehf *"**gelek**an, mede bi hindikan"
**gelemper** civak, komel
**gelemperî** giştî, komelî
**-kar û barên gelemperî** xizmetên giştî
**gelemşe 1.** pirsgirêk **2.** îxtilaf **3.** mesele **4.** arîşe
**gelendar 1.** stûna mezin **2.** kêran
**gelêrî 1.** stran, huner, cil û bergên ku di kelepora gelekî de hene **2.** têkildarî civakê **3.** malê her kesî
**gelêş** cureyekî xweliyê ye
**gelhe** hejmara kesan; nufûs
**gelhanasî** beşa pisporiyê a hejmarnasiya seriyan
**-gelheya çandinî** hejmara rêjeya kar û barên ziraetê
**-gelheya destbidaran** hejmara çekdaran
**gelifandin/digelifîne/bigelifîne 1.** hûr kirin û wekî ardî hêran **2.** pişirandin
**gelî [I] 1.** deşt **2.** bihurgeh **3.** navbera du çiyan
**gelî! [II]** *(r)* baneşana ji bo komekê
**-gelî bawermendan!** ey ew kesên ku bawerî anîne!
**gelnas** dilsoj û xebatkarê ji bo berjewendiyên gel û welatê xwe
**gelo** aya, pirsa ecêbmanê
**gelş 1.** arîşe, kêşe **2.** îxtilaf **3.** cudatiya ramanan *"afirê gameşan, bû warê **gelş**a mêşan"
**gelû** navenda çemberê
**gelwaz** bendê ku dendikên gêzan, hêjîr û hwd li ser têne raxistin; gewlaz
**gem** hevsarê bi dizgîn û devgem *"ker bi **gem** û hefsaran, mêr bi soz û biryaran"
**-gem li dêv xistin** ji axaftinê re destûr nedan

**gemar** qirêj
**gemarî** bi qilêr
**gemarî bûn** **1.** qirêj bûn **2.** herimîn
**gemarî kirin** **1.** qirêj kirin **2.** herimandin *"kaniya ku te av jê vexwar, **gemarî meke"**
**gemaro** dorpêç, rapêçan
**gembol** segê nêr
**gemirandin/digemirîne/bigemirîne** **1.** rû û rûçikên tiştekî guherandin **2.** dirûv guherandin **3.** daqurtandin
**gemirîn/digemire/bigemire** **1.** li gemariyekê gerîn **2.** pişivîn
**gemî** keştî
**gemor** tiştê ku dirûve tehlbûnê lê dikeve; tehlovançkî
**gemş [I]** kulm, gulmist, kefedest
**gemş [II]** werzişa zoranîkirinê
**gemşandin/digemşîne/bigemşîne** zoranî dan kirin, bi navê dan lîstin
**gemşîn/digemşe/bigemşe** zoranî kirin/bi navê lîstin
**gemşo** werzişkarê zoranîkirinê
**gen** cureyekî heşeratên ku ji qijniyan mezintir in
**genav** ava mend û genî; avegenî
**gencîne** xezîne, defîne
**gend [I]** aj, zîl, ajero
**gend [II]** bêhna kirêt *"xwarin **gend** û gû, şûştin reng û rû"**
**gend [III]** pûç
**gend [IV]** sûd û kelk
**-gend kirin** sûd û kelk wergirtin
**gendel [I]** mirovê bêkêr
**gendel [II]** kesê ku pere û dahatiya dezgeh an jî kargeha welêt ji bo xwe didize
**gendelî** di karesatên giştî de diziya malê cemawerî
**genefis** **1.** ferasetkor **2.** bêkêr **3.** dek û dolab
**genek [I]** gûnî *"henek, dibin **genek"**
**genek [II]** gen
**gengaz** pêkan, mumkin
**gengeşî** **1.** nîqaş, gelacî **2.** devjenî
**genijîn/digenije/bigenije** efûngî bûn
**genim** zadê ku jê nan û xwarinên sereke tên pehtin *"**genim** digere û digere, paşê tê di qulika êş de tê xwarê"**
**genimî** esmer, qemer
**genî** **1.** xerabûyî **2.** efûngî, afnikî
**genî bûn** **1.** xera bûn **2.** efûngî bûn *"av, di golan de **genî dibe"**
**genî kirin** **1.** xera kirin

**2.** afnikî kirin *"ne xwar ne jî da hevalan, **genî kir** avêt newalan"
**genûs** çikûs, timakar
**gep 1.** dêma rû, alûşk **2.** parî, qot
**geprûg** gewrî
**ger [I] 1.** geşt, seyran **2.** dor
**-gera rastmalê** dolivgeriya sermayeyê
**-gera yekî dan** bera wî dan; qewirandin
**ger [II]** erdê rast
**ger [III]** heke
**geran** mîrkutê hesinî
**gerandin/digerîne/bigerîne 1.** bi rê ve birin **2.** zivirandin **3.** îdare kirin **4.** birin seyranê *"**gerandin** derman e, rizq li ser piyan e"
**gerav** gerînek
**gerd 1.** xwelî **2.** toz û xubar
**gerden** der û dora gewrî û stûqulkê heta sersîngê
**gerdengaz** bejndirêj
**gerdenî** xemla stûyan a ku heta sersîngan dadikeve; şirdan
**gerdelûle** babelîsk
**gerdenxwar** stûxwar
**gerdiş [I] 1.** ger û seyran **2.** çerx, zivir, fetl
**gerdiş [II]** amûr
**gerdûm** erebeya gayan
**gerdûn 1.** alem **2.** cîhan
**gerdûnî 1.** alemî **2.** cîhanî
**gerelavij** strangotina bi dorvegerî
**geremol 1.** sûresat **2.** hêwirze **3.** tevilhevî
**gerestêrk** stêrka ku di hevsenga tavê de gera xwe didomîne; rojgeran
**gerew** rehîn, barimte *"**gerew,** li garanê ye"
**-di gerewa yekî de çûn** ji dêla yekî ve xwe dan kuştin
**gerew dan** ji ber yekî ve kefaletek dan
**gerew kirin** rehîn girtin, barimte kirin
**gerger** erdê bikevir
**gergere** gêre
**gerguhêz** *(r)* lêkerê ku bireserê werdigire; têper
**gerhan** gerîn *"**gerhan** derman e û rizq li ser piyan e"
**gerik 1.** tovê gul û giyayî yê hûrik ê mînanî tozê **2.** toza ku havînan li ser belgên daran dinîşe **3.** gera avê ya biçûk
**gerisandan/digerisîne/bigerisîne 1.** pêpest kirin **2.** destverû kirin **3.** pelçiqandin **4.** çewsandin
**geriyayî** gerok *"kalê zemanan, dipirse ji xortê **geriyayî**"
**gerîde** gerok, geştiyar

**gerîh** behîva negihiştî; behîvterk

**gerîn/digere/bigere** **1.** seyahet kirin, geşt kirin, çûn seyranê **2.** *(kar)* bi rê ve çûn *"aş **digere** bi avê, law dike karê bavê"

**gerînek** kuna di bin avê a ku av bi zivirînê tê re derbasî cihekî din dibe

**gerînende** **1.** mudîr **2.** berpirsyar

**gerînge** **1.** rojgeran **2.** pergala ku gera tiştan têkûz dike

**germ** **1.** nesar **2.** tîndêr **3.** keliyayî **4.** sincirî *"her kes xwe li agirê **germ** digire"

**-germ û sermaya felekê dîtin** pêrgî bûyerên tehl û şirîn hatin û tê de pispor bûn

**germahî** tînahî

**germav** **1.** kaniya ku ava kel jê diherike **2.** serşok

**germavî** kesê ku çûye germavê

**germ bûn** **1.** tîndar bûn, sincirîn **2.** kelîn *"hesinê sar, bi hilmê **germ nabe**"

**germesûk** qumaşê erzan; gincir

**germiçang** gerînge

**germijandin/digermijîne/bigermijîne** germixandin

**germijank** alava gêrebayî ya ku tiştê avî dikelîne

**germijîn/digermije/bigermije** germixîn

**germijok** germixî

**germik** pîneyekî gerimkirî yê ku datînin ser laşê kesê westiyayî da ku giyanê wî nerm bibe

**germixandin/digermixîne/bigermixîne** di germê de sekinandin û çêja wê xera kirin

**germixîn/digermixe/bigermixe** di germê de man û çêj lê xera bûn

**germiyan** warê ku zivistanan lê tê êwirîn û sitirîn

**germî** xwarineke ku ji savarî tê çêkirin

**germjimêr** alava ku tîna heyî dipîve; tînjimer

**germ kirin** **1.** sincirandin **2.** kelandin

**gername** rojnivîska heyamên gera geştiyarekî; geştname

**gernas** **1.** egîd, qehreman **2.** wêrek

**gerok** pîşekarê geşt û seyranê

**gers** cureyekî çêreyê ye

**gerûşe** karesat/bobelat

**gerewêrk** gerestêrk

**geş** **1.** boş **2.** jîndar **3.** herikbar

**geş bûn** **1.** jîndar bûn **2.** herikbar bûn
**geşbîn** kesê ku xwediyê ramaneke erênî ye
**geş kirin** **1.** agir gur kirin **2.** dilxweş kirin
**geşedan** pêşveçûn, pêşketin
**-geşedanên aborî** pêşveçûnên di warê îqtisadê de
**geşe pê dan** pêş ve birin
**geşt [I]** ger, seyran
**-çûna geştê** derketin seyrangehekê
**geşt [II]** pars, rewcîgerî
**-derketina geştê** gerîna li pars û pûrsê
**geştiyar** gerok, seyah, seyranî
**geştname** gername, seyran-name
**gevaztin/digevêze/bigevêze** gevizandin
**gevel** porê tevlihevbûyî
**gevel bûn** gijik bûn
**gevez** rengê gulê; sor
**geveze** **1.** alava ku pergala xebata wê teqoze bûye **2.** devê ku hînî axaftina çepel bûye
**geveze bûn** **1.** *(alav)* pergala xebatê teqoze bûn **2.** *(dev)* hînî axaftina çepel bûn
**geveze kirin** **1.** pergala xebata alavekê teqoze kirin **2.** ji devçepeliya kesekî re destûr dan
**gevizandin/digevizîne/bigevizîne** li erdê birin û anîn; vegevizandin
**gevizîn/digevize/bigevize** xwe li erdê birin û anîn; vegevizîn
**gevizk** cihê bi toz û xîz ê ku ker û hesp xwe lê digevizînin; tozgevizk
**gevzol** gevel
**gewc** gêj
**gewende** **1.** tulî **2.** mitrib
**gewher** **1.** cewher, kevirên giranbiha **2.** puxte
**gewixandin/digewixîne/bigewixîne** **1.** ser jê kirin **2.** fetisandin
**gewixîn/digewixe/bigewixe** **1.** ser jê bûn **2.** fetisîn
**gewr** rengê spî yî tarî
**gewre [I]** **1.** mezin **2.** gir, girs **3.** birêz
**gewre [II]** di hûnanê de çaviyeke rast û yeke çep
**-gewre çêkirin** çeperast hûnan
**gewrecûnkî** gewrotankî
**gewrik** nexweşiyeke çêrmî ye
**gewrî** qirik, xeneq *"**gewriya** ku biqul e, bê rizq namîne**"**
**-gewrî lê miçiqandin** **1.** tirs lê firandin **2.** ajal lê dan firotan û bê spîtayî hiştin

**gerotankî** rengê gewr ê çilmisî
**gewşîn** taybetî
**gewzîn** di heyberan de bedewiya gewherî û dîtbarî
**-gewzîna hunerî** di karekî hunerî de pîvana bedewiya gewherî û dîtbarî
**gez [I]** cureyekî daran e
**gez [II]** gest, şidandina diran a bi ser tiştekî de
**gezandin/digezîne/bigezîne** *(xwarina tehl û tûj)* ziman û gewrî sotin
**gezek** çêreya gezende ya pîjpijî
**gezende** tiştê ku aliyê xwe ê tûj bi tiştekî din vedide
**gezgezok** çêreya kefgezkê
**gez kirin** **1.** diran lê şidandin **2.** xwarin
**gezme** tîra kevanê
**gezo** cureyekî şirîniya ku dinişe ser belgên daran; selwa
**gezoke** **1.** zimandirêj **2.** devçepel *"bi ber re diçî **gezoke** ne, di pişt re diçî pîzoke ne"
**geztin/digeze/bigeze** gez kirin
**gêç [I]** di hin alavên pîvandinê de derziya ku rêjeyê nîşan dide
**gêç [II]** heriya kilsê
**-gêç kirin** bi heriya kilsê seyandin
**gêj** **1.** hişaloz **2.** bêhişê ku wekî sermestan tevdigere *"filan kes mirîşka **gêj** e *(bêkêr e)*"
**gêj bûn** **1.** hişaloz bûn **2.** hiş ji serî çûn
**gêjde** hişaloz
**gêjelok** lîstikeke zarokan a ku di dora xwe de dizivirin hetanî gêj dibin
**gêjelokî** zarokê ku gêjelok lîstiye û lewre gêj bûye
**gêjgerînek** **1.** gerînek **2.** tiştê ku pir têvel û têkilhev e
**gêjgerînk** **1.** ziviroka bayî; bablîsok **2.** tiştê ku pir têvel û têkilhev e
**gêj kirin** **1.** hişaloz kirin **2.** hiş ji serî firandin
**gêjo** gêjde
**gêjnok** anix
**gêl [I]** gil
**gêl [II]** ehmeq, bodele
**gêl [III]** sewdaserê bêkêr
**gêlaz** mêwyeke e
**gêle** **1.** cihêkirina dan û kayê bi gerandina sewalên ku bi hev ve girêdayî ne li ser zadê çinandî; kam **2.** pestîl
**gêlegêl** bûyer, qewimîn
**-tûşî gêlegêlên giran ha-**

**tin** ji karesatan bi awayekî serkeftî bihurîn

**gêle kirin** **1.** bi kamê genim ji qeselî jibartin **2.** çê ji neçêyî veqetandin **3.** pêpest kirin **4.** li dora hev zivirandin

**gêlme** têkelkirina gelek cureyên xwarinan

**-gêlmeya gavanî** **1.** xwarina ku gavan ji xwediyên naxirê belav dike **2.** tiştên curecureyî

**gêran** balix, kamil

**gêran bûn** kamil bûn

**gêranî** balixtî, kamilî

**gêrav** çêkirina tiştekî li gorî nimûneyeke heyî

**gêrav kirin** tiştek li gorî mînakeke berdest çêkirin

**gêr bûn** **1.** gindirîn, total bûn **2.** wergerîn

**gêre** gêle *"**gêre,** bi golikan nabe"

**gêreba** bayê vegerok ê ku ji herka avê çêdibe; cêreyan

**gêrik** mûstang, morî *"dijminê te **gêrik** be jî, hesabê wî bike"

**gêr bûn** **1.** feşk lê ketin, pêxem lê ketin **2.** çewt wergerîn

**gêr kirin** **1.** wergerandin **2.** gindirandin, total kirin

**gêro bûn** **1.** egle bûn **2.** bilîn

**gêro kirin** **1.** egle kirin **2.** bilandin *"biharan xwe şil mekin, payîzan xwe **gêro mekin"**

**gêrûse** destar

**gêsû** guliyê porî

**gêşref** komik

**gêwil** hizir û viyana mirovî ji bo kirin an jî nekirina karekî

**gêwildar** kesê ku dilê wî bi kirina karekî heye; bigêwil

**gêwilsar** dilsar

**gêwilsar bûn** ji karekî dilsar bûn

**gêwilsarî** dilsarî

**gêwilsar kirin** ji karekî dilsar kirin

**gêwil şikandin** dilsar kirin

**gêwilşikên** kesê/tiştê ku mirovî dilsar dike

**gêwlê** jina ku karî li gorî dilê dike

**gêwlo** mirovê ku her gav û du gav ne li ser temtêlekê ye

**gêz** **1.** cureyekî daran e **2.** fêkiyên vê darê

**gêzek** her du hestiyên ku di kêlekên kapên însanan de ne û yên ajalan jî di paşiyê de ne

**gêzer** gizêr

**gêzgêrik** gêzî

**gêzirandin/digêzirîne /bigêzirîne** **1.** bilandin **2.** xapandin
**gêzî** alava maliştinê; siqayîl
**gêzîvan** **1.** siqayîlfiroş **2.** paqijker
**gibîse** meha ku 29 rojan dikêşe; kebîse
**gid** kîteyeke ji bo gazikirina karikan û bizinan *(gidê: mê/gidî: nêr)*
**gidaran** berazê nêr
**gidik** *(di zimanê zarokan de)* karik
**gidî** tew lo lo!
**gidîş** parta giyayê/zadê dirûtî
**gift** soz û gotin
**-giftî yekî tev gerîn** li gorî sozê ku yekî daye hereket kirin
**gihan*(gihîn)*/digihe/bigihe** **1.** lê asê bûn **2.** devîdevî lê kirin **3.** stewîn, kemilîn
**gihandin/digihîne/bigihîne** **1.** lê asê kirin **2.** stewandin, kemilandin *"hespê çê, zengûyan **nagihîne** xwe"
**gihanek** *(r)* girêka peyv û hevokan
**gihar** tenîsk
**gihar bûn** tenîsk bûn
**gihayî** stewî, berkemal
**gihiştin/digihêje/bigihêje** **[I]** **1.** kemilîn **2.** bi dest xistin **3.** stewîn
**gihiştin/digihêje/bigihêje [II]** **1.** lê asê bûn **2.** devîdevî lê kirin **3.** hatin asteke diyar **4.** kemilîn *"ez hêdî diçim bela **digihêje** min, zû diçim ez digihêjim belayê"
**gij** şidet, tundî
**-di gijekê de çûn û hatin** di nefesekê de çûn û hatin
**gijevij** dengê ku ji çûn û hatina tiştan tê
**gij bûn** ji êrîşê re amade bûn
**gijgijîn/digijgije/bigijgije** **1.** xwe kiz kirin **2.** xwe ji êrîşê re amade kirin **3.** xwe veperimandin
**gijik** **1.** porê vîzvîzî **2.** porê gevel
**-gijika hev kişandin** pev çûn û porên hev verûtin
**gijîn/digije/bigije** **1.** gijgijîn **2.** *(sewalê nêr)* baz dan ser *(a mê)* **3.** pelişîn hev û li hev xistin
**gij kirin** xwe ji êrîşê re amede kirin
**gijlok** zîpikên hûr
**gijnîj** cureyekî çêreya pîjpîjî ye
**-gijnîj girtin** qirş û qal pê ve aliqîn
**gijo** **1.** kesê ji erîşê re amade **2.** baneşana ku

pê sewalan didin gadan
**gijogijo kirin** **1.** bangî gadanê kirin **2.** pêşkêş kirin **3.** berdan hev
**gil** herî
**-gil û gemar** herî û qirêjî
**gilahe** xenîmet, extirme
**gilar** goştê ku di bin erzenê de dadiliqe
**gilare** bistikê darê; qurm
**gilav** ava gemar
**gilç** singê sertûj ê ku di ji ber hin sedeman erdê de tê çikandin; xilç
**gilde** gilok, gaj
**gildegild kirin** bildebild kirin
**gildêma** cureyekî çêreya ku dendikên wê hişkirî tên xwarin û jê rûn tê bidestxistin
**gildî** pîne û potikên wekî balûleyê li hev pêçayî
**gildî kirin** werpêçan
**gildîn** gemara li der û dorê; zibil, gilêş
**gildgildo** bildbildo
**gildo** **1.** kesê ku ji axaftina wî nayê gihiştin; bildo, tato **2.** zimanfisek
**gilê** **1.** girêdana bend û têlan a bi hev ve; girêk **2.** werma ji ber lêketina tiştekî sext
**gilê bûn** **1.** bi hev ve bûn **2.** tê de kêrtikek çêbûn, werimîn
**gilê kirin** bi hev ve bestin
**-xwe gilê kirin** xwe givaştin hev
**gilêne** spîtka çêv
**gilêş** **1.** bermayiyên qirêj û kêrnehatî **2.** zibil
**gilêşdank** derdanka zibilê
**gilêz** ava zeliqok a ku li dêv dirije; şorik
**-gilêz bi dêv ketin** **1.** dev jev bûn û jê ava zeliqok rijîn **2.** pir azwer bûn
**gilgil [I]** heriya hasilkirî ya ku acûrpêj pê kaxetîtan çêdikin
**gilgil [II]** **1.** garis **2.** danê spî *"mirîşk di xewna xwe de **gilgil**î dibîne"
**gilik** di endamê zayendî yê mêzayan de riya avikê ya ku digihêje malzarokê û li bin lûleya mîzkêş e; nîçik, çilik, *"qûnekê gotiye: 'aqile min dibire, lê aqilê **gilik**a min nabire' "
**gilî** **1.** gotin **2.** şikayet, gazind *"**gilî** hate zaran, dê têkeve nav malan"
**gilîdar** gazindok
**gilî kirin** **1.** gazindê xwe jê kirin **2.** jê şikayet kirin
**gilm** guliyên darê
**gilmik** guliyên darê yên biçûk
**gilok** tayê ziyî/hilçinandî;

gaj, gilde
**gilol** girover
**gilolî** giroverî
**gilor [I]** berê dara qajê
**gilor [II] 1.** nemûş **2.** fêlbazî
**-gilor kirin 1.** nemûş kirin **2.** fêlbazî kirin
**gilor [III]** girover
**-gilor kirin** gindirandin
**giloxe** cûcika ku teze ji hêkê derketiye
**giloxe bûn** *(cûcik)* ji hêkê derketin û girs bûn
**gilp** gulp
**gilûmût** girover
**gilûmûtkî** giroverkî
**gilviçandin/digilviçîne /bigilviçîne 1.** pirçiqandin **2.** pan kirin
**gilviçîn/digilviçe/bigilviçe [I]** dil jê mayîn
**gilviçîn/digilviçe/bigilviçe [II] 1.** di bin lingan de virçiqîn **2.** pelixîn
**gilyaz** gêlaz
**gincir** pîne û potikên peritî; zîval
**gincirgincirî** *(pîne)* qelşqelşî û zîvalzîvalî
**gincirgincirî bûn** *(pîne)* qelşqelşî û zîvalzîvalî bûn
**gincirgincirî kirin** *(pîne)* qelşqelşî û zîvalzîvalî kirin
**gindirandin/digindirîne/bigindirîne 1.** total kirin **2.** wergerandin
**gindirîn/digindire/bigindire 1.** total bûn **2.** wergerîn
**gindor 1.** cureyekî sewzeyan e; qire **2.** girover **3.** bankutik
**ginegin** dengê kesê ku ji bêfilê diaxive
**ginegin kirin** ji bêfilê axaftin
**ginginok** kesê ku ji bêfilê diaxive
**gir [I] 1.** kêrt **2.** bilindahî
**gir [II] 1.** bermaya ber bêjingê **2.** arek
**gir [III] 1.** girs **2.** mezin **3.** geltegan
**gir [IV] 1.** rik, hêrs **2.** bela **3.** awat û azwerî **4.** întiqam
**-gir [V]** paşgireke navdêrsaz û rengdêrsaz e
**gir [VI] 1.** xwirê gurîbûnê **2.** rikhatin ***"**divê mirov **gir**ê xwe bi destên xwe dixwirîne**"**
**giramî 1.** îhtiram, qedrdanî, rûdanî **2.** rêzdarî
**giramî girtin 1.** rêz girtin **2.** îhtiram kirin
**giran 1.** nesivik **2.** hêdî **3.** zexm **4.** bibiha **5.** cidî ***"**aqilê **giran,** mûyî kêr dike**"**
**giranbiha 1.** qedrmezin **2.** biqîmet ***"**ji azadiyê bêhtir tiştekî **giranbiha**

nîn e"

**giran bûn** **1.** ji rewşa sivikiyê derketin **2.** hêdî hêdî xebitîn

**giranî** **1.** nesiviktî **2.** hêdîkahî **3.** zexmî **4.** bibihatî **5.** cidîtî *"**giranî** pîvana zêran e, sivikî bobelata ber deran e"

**giran kirin** **1.** ji rewşa sivikiyê derxistin **2.** kar ewiqandin

**girar** xwarineke ku ji birinc û savarî tê çêkirin *"**girar** bi xwê, xwê bi tahm"

**girav** parçeyek bejahiya ku doraliya wê bi avê ve hatiye rapêçandin

**giravî** giramî

**girbêj** bêjinga ku kunên wê fireh in; serad

**girde** girav

**girdek** tîpên mezin ên *wekî A,B,C...*

**girdik** masûlke

**girdirûn** taye, çerxe

**giregir** **1.** payedar **2.** rayedar **3.** çîna bijarte

**girêba** **1.** nexweşiyeke bakî û jandar a ku dikeve masûlke û gehên mirovî **2.** kînora ku di rehçikên xwînê de derdikevin

**girêbend** **1.** cihê girê ya ku bendik lê hatiye şidandin **2.** peyman

**-girêbenda zewacê** peymana nikahê

**girêbest** şala navê; şûtik

**girêcan** bêaramiya giyanî

**girêçik** movik

**girêdan** **1.** bi hev ve kirin, bestin **2.** gilê kirin *"hesp li ser afirê keran nayê **girêdan**"

**girêdayî** **1.** biservekirî **2.** gilêkirî, beste

**girêhişk** hişkegilê

**girêk** cihê ku bi hev ve hatiye bestin; gilê *"**girêk**a ku bi destan vebe, hewceyî diranan nake"

**-girêk ketin qirikê** **1.** kelogirî bûn **2.** nan di gewriyê de nedehîn

**girêpêç** babelîsk

**girêz** gilêz

**girfan** berîk, cêb

**girfik** **1.** felqedestek hevirê ku jê nanek tê çêkirin **2.** her du nermegoştên hêtan

**girgirik** **1.** ereboka zarokan **2.** ereboka destan a ku giraniyên hetanî 100 kîloyî lê bar dikin **3.** alaveke maliştinê ya bi qasî destekî ye û pê gildîna hûrik tê paqijkirin

**girgîn** **1.** gurêx **2.** hêrshatî **3.** bêhnteng

**girhan** xwe bi xwe xitimîna qul û qelîştekan

**girij** kesê mirûztirş û

rûpirçî

**girijîn/digirije/bigirije 1.** *(seg)* bezîn hev **2.** *(mirov)* gef lê xwarin

**girik 1.** şêlî, nezelal **2.** kêrtê ku pir ne bilind e

**girisîn/digirise/bigirise** mezin bûn

**giriyandin/digirîne/bigirîne 1.** bi girî ve kirin **2.** behicandin *"dostê ku te **bigirîne** baş e, ne yê ku te bikenîne"

**girî 1.** rijandina hêstiran **2.** nûzenûz *"bi **girî,** ji gorê ranabin mirî"

**-girî pere nekirin** xemgîniyê têra vegerandina tiştê çûyî nekirin

**girîdeng 1.** lorîn **2.** dengê giriyê **3.** zêmar

**girîn/digirî/bigirî 1.** hêstir rijandin **2.** bi ser de keser kişandin û lewre rondik barandin *"çûn dewsa miriyan, her kes li miriyê xwe **giriya"**

**girîng** tiştê ku hebûna wî pêwist û watedar e

**girîngî** pêwistî û watedarî

**girîngî dan 1.** bi her du destan girtin **2.** pêwist hesibandin **3.** qedr dan

**girkan** çiyayê ku lûtkeya wî heriyeke agirîn direşîne derve

**-girkanê hilçûyî** çiyayê ku lûtkeya wî ya agirîn zindî ye û her gav xeternak e

**-girkanê mirî** çiyayê ku lûtkeya wî ya agirîn teqiyaye û êdî ne xeternak e

**girj** tivancî

**girj bûn** tivancî bûn

**-girjbûna masûlkeyan** tivancîbûna pazûyan

**girmijîn/digirmije/bigirmije** *(ewr û esman)* deng vedan *"ewrê reş **digirmije"**

**girmik 1.** kulm, lep **2.** zêdehiya serê dûvê pêz a ku bi qasî kulmekî ye

**girnawkî bûn 1.** dema gonxwarina pisîkê hatin **2.** çav li qûndetiyê kirin

**girnijandin/digirnijîne/bigirnijîne 1.** kenandin **2.** duqat kirin

**girnijîn/digirnije/bigirnije 1.** kenîn **2.** duqat bûn

**girnoz** girtikgirtikî, kêrtik-kêrkitî

**girole** navgîna barkêşiyê

**giroşk** dervank, tepedor

**girov 1.** berate, nîşane, elamet **2.** belgeya ku rastiya rewşekê an jî tawana bersûcekî derdixe holê

**girove** belge

**-giroveya ajovaniyê** belgeya erebe-ajotinê

**-giroveya bazirganiyê** destûrnameya ticaretê
**girover** gilomûtkî, çenberkî, xeleqkî
**girs** **1.** gir **2.** mezin
**girse** civateke pirjimar; kom
**girseyî** têkildarî civateke pirjimar; komasî
**girsik** hirmiya çolê
**girş** stûn
**girte** zabitname
**girtek** **1.** parçeyek kaxeza ku firoşkar wekî giroveyekê dide kiriyarî, tê de biha, nav û cureyê bûjenan tê nivîsandin **2.** giroveya ku dezgeh an jî saziya têkildar di dema wergirtina diyariyan de dide xêrxwazan; meqbûz
**girtenivîs** kesê ku zabitnameyê digire
**girtin/digire/bigire** **1.** hildan **2.** wergirtin **3.** bi dest xistin **4.** zeft kirin *"her kes, xwe li ronahiyê **digire**"
**-girtina berê rojê** rewşa ku heyv an cismekî asûmanî yê din têkeve navbera dinya û rojê, roj ji dinyayê xuya nebe û dinya tarî bibe
**-girtina berê heyvê** rewşa ku dinya têkeve navbera heyv û rojê, heyv rojê nebîne û di tariyê de bimîne
**-girtin ser xwe** pejirandin
**girtî** **1.** mehkûm **2.** bengî **3.** dîl **4.** venekirî *“destê dayî, ser **ê girtî** re ye”
**girtîgeh** **1.** hepisxane **2.** bendîxane
**girtole** kesê bi dest û pê
**girûz** girnoz
**girûz kirin** **1.** meht kirin **2.** darotin **3.** şimşat kirin
**gişk/gişt** **1.** hemû, her kes/her tişt **2.** bi temamî *“dîn pir in, **gişt** ne li cem hev in“
**giştgiyan** beden, laş
**giştî** gelemper, tevahî
**-serokê giştî** rêvebirê gelemper
**giştîname** namedor, belavok
**gitî** cîhan
**givande** **1.** cihê bilind; kendal **2.** hêl
**givandin/digivîne/bigivîne** havên kirin, meyandin
**givar** kesê ku xwîna mirovî lê dikele
**givêrandin/digivêrîne/bigivêrîne** dehandin
**givêrîn/digivêre/bigivêre** dehîn, *(tiştê xwarî)* helîn
**givir** pisîka kovî
**givî** şîrê havênkirî

**givîşk [I]** tivanc
**-givîşkî bûn** tivanc û qolinc di lêş de peyde bûn
**givîşk [II]** bizava ku mirov ji egera xewê an jî westanê xwe radikêşe
**-givîşk dan** palûşkên xewê pê ketin
**givrik** mirovê hêzdar û xurt
**givrik bûn** gihiştin û mezin bûn
**giya** **1.** çêre, hêşinahî **2.** çêreya çinandî ya ku wekî alif tê bikaranîn *"nokê, **giya** rabû li ser kokê"
**giyan** **1.** can **2.** ruh, gan
**-Giyanê Pîroz** cenabê Cibraîl eleyhiselam
**-giyanê xwe dan** **1.** bi ser heqiya xwe de çûn; mirin **2.** cangorî bûn
**giyanewer** **1.** zindî, jîndar **2.** candar
**giyanewernas** pisporê ruhberan
**giyanewernasî** zanistên têkildarî jiyana giyandaran
**giyanî** zindîtî, ruhanî
**giyaxur** **1.** sewalên ku diçêrin **2.** kesên ku -weke rêman- goştî naxwin
**giz** **1.** hizir **2.** viyan
**gizdar** balkêş
**gizêr** cureyekî hêşînahiyê ye û hem bi terî hem jî pijandî tê xwarin
**gizgizîk** giloka biçûk
**gizgizîn/digizgize/bigizgize** **1.** tevizîn **2.** ricifîn, lerizîn
**gizilgo** giloka ku ta û bendê wê li hev aliyaye
**gizing** elind
**gizîr** xizmetkar, berdestî
**gizre** ardê ku gir hatiye hêran
**gizvanok** gustik
**gizû** rûne xerabûyî
**gîhev** îkramiye
**-gîheva cejnê** bexşîşa eydê
**gîr [I]** **1.** tund **2.** asê **3.** girtî **4.** rawestayî
**gîr [II]** qebiz
**gîrav** ava ku bi bûjeneke din ve têkel bûye *(wek: av û xwê)*
**gîr bûn** **1.** qebiz bûn **2.** rawestan **3.** asê bûn
**gîre** qebizbûyî
**gîrhe** peqpeqokên ku ser ava kelyayî dikevin; kef
**gîro** vemayî, paşdemayî
**gîro bûn** **1.** taloq bûn **2.** egle bûn
**gîro kirin** **1.** taloq kirin **2.** egle kirin
**gîsik** karikê dusalî *"**gîsik**a gurî diçe serê kaniyê û ji eslê avê vedixwe"
**gîsin** di cot de nikilê tûj ê ku erdê vediqelêşe *"cotê bê **gîsin,** nikil zû lê

dişkê"

**gît** **1.** rojên zivistanê yên pir sar **2.** karesat

**gîtik** hestiyê çîpê

**gîx** xêza ku di şeklê bazinekî de hatiye kêşan

**gîzan** hesinê tûj ê ku pê tiraş dibin

**gîzre** dar a ku ne hişk e ne jî ter e

**go** gog

**gobaz** gogbaz

**goc** **1.** kesê di dest û piyên xwe de seqet e **2.** kesê ku dest û piyên xwe bi awayekî kêrhatî bi kar nayine û kêmlebat e

**gocî** **1.** seqetiya dest û piyan **2.** kêmlebatiya dest û piyan

**goçavik** berçavk

**goçel** gopal

**goçke** tîş û qertîş

**gog** hola lîstinê *"**gog** çiqas gilover be jî, dê li cihekî rast bisekine"

**-gog hatin ber çoyî** ketin ber firsendê

**gogbaz** kesê ku bi holê dilîze

**gogelîsk** lîstîna hola pê

**gogerîn** kêzikeke ku ji gil û gemarê gogên biçûk çêdike

**gojîmestî kirin** *(têjika nûzayî)* hînî mêtinê kirin, seredan kirin

**gol** **1.** lîç **2.** her ava ku nakişe *"av di **gol**ê de bimîne, dê genî bibe"

**gole** sewalê ku li pêş keriyî diçe

**golik** têjika çêlekê *"**golik** tuneye ku bimije, xwesû tuneye ku bikuje"

**-golika bipirç kirin zikê yekî** kuleke bêderman kirin dil û hinavê wî

**golikvan** kesê ku golikan diçêrîne *"dema ku heye, mêvan î; wexta tune, **golikvan** î"

**golim** kulêmek

**gom** êwirgeha sergirtî ya ku bi şevê pez tê de mexel tê *"**gom**a mirovî, ji qesra xelqê çêtir e"

**gon** berhildan û pelxwarin *"bizin dizîka **gon** dixwe, lê eşkere dizê"

**gonce** qurmê dar û giyayê hişkbûyî

**goncal** kortal, çal

**gongil [I]** cureyekî goniyan e *"**gongil** çiqas hol be, dê li cihekî rast bisekine"

**gongil [II]** **1.** qat bi qat **2.** gustikên porî

**gonî** gûnî *"**goni,** tu carî di bin berfê de namîne"

**gopal** **1.** ço **2.** şiva ku destika wê heye **3.** şiva serkevan *"darê bi strî, nabe **gopal**"

**gopîtik** lûtke, zîrwe

**gor** **1.** qebr, mezel, meqbere **2.** kortal *"kes, nakeve **gor**a kesî"

**goran** **mêrg û çîman**

**gorangeh** mêrga ku bi kêrî bêhnvedan û seyranan tê

**seyrangeh**

**goranî** **1.** kilam, stran **2.** zaravayeke kurdî ye

**gore** lixwekirina piyan

**gorevan** **1.** kesê ku goreyan çêdike **2.** kesê ku qebrên miriyan dikole

**goristan** cihê ku qebr lê tên kolan û mîrî lê tên çalkirin *"mirov diçe serdana **goristan**ê, da ku gora wî jî tê de hebe"

**gorî** **1.** qurban **2.** fedakar

**-ez gorî** ez qurban, ez xulam

**gorîçe** kêlika gorê

**gorn** **1.** mala ku havînê tê bikaranîn; sermiyan **2.** hevşiyê sewalan

**gornebaş** pîşekarê diziya goristanan

**gosan** cureyekî mêşan e û dişibihe mêşhingivan

**gosartme** **1.** rezîl **2.** elewat **3.** rêşkenî

**goşe** **1.** guçê ku qiraça wî 45 derince ye **2.** çim **3.** fetl, zivir

**goşebend** qiraca ku endazeya wê 45 derece ye

**goşepîv** alava ku pê qeysa guçan tê pîvan

**goşkar** solbend

**goşt** tebeqeya ku li ser hestiyan hêşîn dibe *"ber **goşt**ê çûyî nakeve, ber ser û piyan dikeve"

**-goştê nerme** goştê bêhestî

**-goştê hêrayî** goştê hûr hûrkirî

**-goştê heram** **1.** qelewbûna bêteşe **2.** goştê ser mûziya mêran a beriya sinetkirinê

**goştfiroş** pîşekarê firotina goştî; qesab

**goştî** goştê hişkirî

**goştpere** cenîn

**goştxur** sewalên ku debara jiyana wan tenê goşt e û nikarin biçêrin

**gotar** **1.** meqaleya wêjeyî **2.** nutuq

**gotebêj** **1.** hevpeyvîn **2.** nîqaş

**gotegot** **1.** qîl û qal **2.** deng û behs **3.** qirtevirt *"**bi gotegot,** mirov naçe cot"

**gotin [I]** **1.** soz **2.** biryar **3.** peyman *"mêr ew e ku bibe xwediyê **gotin**a xwe"

**gotin/dibêje/bibêje [II]** **1.** axaftin, peyivîn, xeber dan **2.** salix dan **3.** şehitandin *"**gotin:** 'bavê

te siwaran kuşt an peyaran'; got: 'wekî kuştin, ha siwaran, ha peyaran' **"**
**gotindar** **1.** axivger **2.** xeberdayî **3.** salixdayî
**gov** **1.** gol **2.** gom
**govan** kesê ku bûyer bi çavê xwe dîtiye; şahid, guwah, gove
**-govanê dîtî û bînayî** şahidê ku bi çavê serê xwe buyerek şopandiye
**govanî** şahidtî, guwahî
**govan-name** girove û nivîsarên li ser bûyeran
**gove** govan
**govetî** govanî
**govend** dîlan, zemawend ***"govend,** bê deng nabe**"**
**-govend gerandin** dîlan girtin
**govendger** sergovendî, kesê ku dîlanê digerîne
**goyende** **1.** kesê ku vedibêje **2.** salixdayî ***"goyende** têr xwar, dê dest bi salixan bike**"**
**goyger** pîşekarê goglîstinê; gogbaz
**goyinger** nobedar, pandî
**goyîn [I]** rêza nobetê, dora payînê
**goyîn [II]** balindeyeke ji malbata pepûkan e
**guçl** **1.** komeke fêkiyên bi çiqilekî ve **2.** gûşî ***"**bav rezek da lawî, lawî **guçlek** tirî neda bavê**"**
**guh** endamê bihîstinê ***"**hêştir çiqasî ji hev dûr herin jî, **guh**ê wan tim li ser hev e**"**
**-guh birin** **1.** hetikandin **2.** veçirçirandin
**-guh dan** **1.** jê bihîstin **2.** bala xwe dayîn
**-li ber guh ketin** **1.** pê hesîn **2.** haj pê hebûn
**-guh lê dêrandin** **1.** *(guh)* bel kirin **2.** payîn
**guhar** xemla ku jin bi guhên xwe ve dadiliqînin ***"**Xwedê, **guhar**an dide yên biguh**"**
**guhan** endamê şîrî yê sewalan
**-guhanê xwe kirin** nêzîkî zayînê şîr ketin guhanan
**guhbel** **1.** guhrep **2.** sîxur, casûs
**-guh bel kirin** ji xerabiyê re bihîstin
**guhçik** nermegoştê guhî yê ku guharê davêjinê
**guhdar** kesê ku dibihîze
**guhdarî** têgihiştina salixan ***"guhdari**ya derewan xweş e, lê bawerkirina wan ne xweş e**"**
**-lê guhdarî kirin** **1.** jê bihîstin **2.** gotin jê seh kirin **3.** bal xwe danê ***"**berê **guhdarî bike,** paşê xeber de**"**
**guhdêr** **1.** hişyar **2.** bal-

dar **3.** bisemt

**guhdirêj** ker, çarsim axa *"ji bo ziyandayîna xwediyê xwe, **guhdirêj,** mirinê jî dide ber çavên xwe"

**guhertin/diguherîne/biguherîne 1.** guhêztin **2.** şûna yekî yeke din danîn

**guher 1.** warê ku pez lê mexel tê **2.** meydana komkirina sewalan *"bizina belek, şivanê kulek, êvarê bi hev re tên **guher**a teng"

**-li guherê man 1.** li qadê bêxwedî man **2.** bi kêrî tiştekî nehatin

**guherbar** tiştê ku dirûvê xwe diguhêzîne nifşeke din

**guherîn [I] 1.** guhêzîn **2.** qelibîn

**guherîn*(guhertin)*/diguhere/biguhere [II] 1.** teşeyeke nû girtin **2.** dirûvekî din girtin

**guherînkar** sedemkarê qelibînê

**guherto** awayekî cihê ê heman dirûvî, dirûvekî ciyawaz ê heman tiştî

**guhêrgeh** dezgeh an jî firoşgeha guherîna diravan; seraf

**guhêzbar** tiştê ku neql û sewqiyata wê zû û hêsan tê kirin

**guhêztin/diguhêze/biguhêze 1.** guhertin **2.** wergerandin **3.** neql kirin **4.** ferehte kirin *"gayê reş, çêrmê xwe **naguhêze"**

**guhgiran** kesê ku baş nabihîze

**guhmertal** guhmezin

**guhnedar 1.** serhişkê bêxem **2.** bêxemê sersar

**guhnelî** di giyandaran de daxwaza têkiliya zayendî

**guhrep** guhbel

**gul 1.** cureyekî kulîlkan e **2.** navê kulîlkekê ye *"biçûkê salê, **gul**a malê"

**gulan** meha pêncemîn a salnameya zayînî ye *"**gulan** e, dew li cem hemûyan e"

**gulav** ava gulê ya ku ji bo bêhndana wê tê bikaranîn

**gulçîsk** gurçik

**guldank** derdanka ku gulan tê de datînin

**guldeste** berhevoka kar û xebatên wêjeyî

**gule** fîşeng

**gulebaran kirin 1.** fîşeng lê reşandin **2.** agir ser piştê pê xistin

**gulebûk** cureyekî kulîlkan e

**gulegenim** simbil
**gulendam** bejnzirav
**gulik** **1.** şirik **2.** porik **3.** kulîlk
**gulimîn/digulime/bigulime** **1.** elametên jîndariyê nîşan dayîn **2.** hilimîn
**gulî** **1.** çiqilê darê **2.** porê hûnandî *"**gulî** dirêj e, hiş qirêj e"
**gulîfk** bisk
**gulîvandik** telaşê tayî
**gulîzerînî** jina ku porê wê yî çûr gûlîkî hatiye vegirtin *"gurî dimire, dibe **gulîzerînî**"
**gulkelem** cureyekî sewzeyan e û pijandî tê xwarin
**gulp** **1.** bilq **2.** ji nişkê ve **3.** qurteke vexwarinê
**gulpik** **1.** gupik **2.** hemû seriyên ku dişibihin serê derzîreqê
**gulşen** gulzar
**gulte** **1.** stûn **2.** bêra kelekvanan **3.** darê ku serê wî wekî tîpa T'yê ye, topal didine bin milên xwe û pê bi rê ve diçin
**-gulte kirin** *(da ku xwe ber giraniyê ragire)* stûn danîn bin garîteyî
**gulzar** baxçeyê gulan
**guman [I]** **1.** ewlehî **2.** hêvî *"**guman**a xwe, ji Xwedê mebire"
**guman [II]** şik, şubhe
**gum** qurteke vexwarinê
**gumanbar bûn** di bin şikê de bûn
**guman kirin** tê de ketin şikê
**gumgumok** cureyekî sewalên bejî ye û dişibihe margîseyê
**gumlat** **1.** cîsim **2.** tiştê hişk
**gumrik** **1.** bihura peretî **2.** saziya ku hawirde û hinardeyên welêt dişopîne û mîhengê didê
**gumş** **1.** parî **2.** hop
**gun** hêlik *"heke **gun**ên meta min hebûna, min dê jê re bigota: apo"
**gunc** lûleya avê a binerdî
**guncan** **1.** munasib **2.** pêkan **3.** lêhatî
**gund** cih û warê ku ji çend malan pêk tê *(ji taxê mezintir û bajarokî biçûktir e)* *"melayê nexwendî, digere li nav **gund**î"
**gundî** şênî û dêmanên ku di wargehên kêmjimar de dijîn *"**gundî** li hev nexin, romî têr naxwin"
**gundwar** derebajar, cihê ku ne bajar e
**gundwarî** derebajarî
**guneh** sûc, tawan
**-guneh daweşandin** **1.**

tewbe bazar kirin **2.** gunehê xwe kirin
**-guneh pê hatin** **1.** dil pê şewitîn **2.** dil ber derneketin, heyf pê hatin
**gunehkar** tawanbar
**gunekî** kesê ku bi hêlikreşê ketiye
**guneng** belengaz
**gungilî** **1.** gustikgustikî **2.** badayî **3.** gurbiz
**gupik** **1.** panî **2.** lûtke
**gur [I]** cureyekî heywanên dirinde ye û dişibihe kûçikan *"çêlikên **gur**an, ji mirovî re nabin bira"
**-gurê manco** gurê efsûnî yê çîrokan
**gur [II]** **1.** zindî, jîndar **2.** herikbar
**-gur bûn** **1.** holepît jê rabûn **2.** zêde bûn
**-gur kirin** **1.** alafa êgir pirtir kirin **2.** zêde kirin
**gurandin/digure/bigure** **1.** post kirin, çerm jê vexistin **2.** qutqutî kirin, pir lê xistin
**gurc** şidiyayî
**gurc bûn** şidîn
**gurc kirin** şidandin
**gurçik** du endamên ku di pişta mirovan de ne *"mirov dilî nede, **gurçik**ê naxwe"
**guregur** **1.** dengê bayê xurt **2.** dengê erebeyan *"bayê **gurgurî,** weke jina virvirî"
**gurêx** **1.** dir, gurxenêq **2.** segê ji gurên kedîkirî
**gurg** navenda tevnê ya ku raçandinê digerîne
**gurî [I]** keçel, serût *"**gurî** dimirin, porsor dibin"
**gurî [II]** **1.** cureyekî nexweşiya çêrm a ku endamê gurî her dixwire û qalik dide **2.** kesê ku bi vê nexweşiyê ketiye *"kesî qala **guri**yî nedikir, rabû di devê kaniyê de gû kir"
**-gurî bûn** bi nexweşiya xwiranê ketin
**gurîkî** **1.** weke guriyan **2.** bi çepelî
**gur kirin** **1.** alaf pê dan **2.** agir geş kirin
**gurkî** **1.** weke guran **2.** bi êrîşeke hovane *"bixwe **gurkî,** rabe mêrkî"
**gurmij** hucûm, êrîş
**gurmijîn/digurmije/bigurmije** hucûm kirin, êriş birin ser
**gurmist** kulm, mist
**gurz** **1.** baqeke mezin a giyayê dirûtî û xuromkirî **2.** çekeke cengî ya ku dişibihe şiveke serçomax a mezin lêbelê hesinî û pîjpîjî ye
**-gurz kirin** **1.** *(giya)* weke baqeke mezin bi keys kirin **2.** *(bar)* par bi par bi-

lind kirin
**gustik** di por de rewşa qatqatîbûnê
**gustîl** xemla ku dikine tiliyan
**guşpan** guzvan
**gut bûn** **1.** *(di av û heriyê de)* çikilîn **2.** *(bi kûrî û hûrî di ramanê de)* hênijîn
**guv** *(di zimanê zarokan de)* **1.** erebe **2.** makîne
**guva guva** hêdî hêdî
**guvaştek** alava ku mêweyan diguvişîne û jê ava wan derdixe
**guvaştin/diguvişîne/biguvişîne** **1.** pihêt girêdan **2.** vepincirandin **3.** şidandin
**guveguv** dengê erebe û makîneyan
**guwah** dîtiyê buyerê yan jî bihîstiyê gotarê; govan
**guwahî** karê ku dîtiyê buyerê yan jî bihîstiyê gotarê dike;govanî
**guzar** geşt û seyran
**guzargeh** bihur
**guzik** gûşiyê berên dara qajê
**guzim** **1.** pihêt **2.** muhkem û şidiyayî
**guzvan** alaveke kincdirûyan e; guşpan
**gû** gemara însên *"**gû** jî, ji gênim e"
**gûdele** **1.** kesê elewat û bêkêr **2.** kesê qilêr
**gûgerîn** cureyekî kêzikên ku ji gemarê gogan çêdike û digerîne
**gû kirin** gemar kirin, rîtin
**gûlik** cureyekî çêreyê ye û pijandî tê xwarin
**gûmez** serbanê girover ê ku nîvçemberkî ye; qube
**gûmik** ji aliyê hundir ve serê tiliyan
**gûn** **1.** reng **2.** boyax
**gûnî** çêreyeke bistrî ya û dikine ardefa êgir; gonî
**gûse** dasî
**gûsî** **1.** xurnûk **2.** cureyekî giyayê bistrî ye
**gûstêr** kevirê esmanî
**gûstêrk** cureyekî bihukan e û şevê pê dikevin
**gûşî** çiqilekî tijî yê tiriyan; enqûd
**gûz** gêz *"bextê mêran **gûz**a pûç e û pireya şikestî ye"
**gûzan** hesinê tûj ê ku pê pirça çêrmî tê kurkirin
**gûzek** cot hestiyên ku di her kêlekên piyên mirovan de ne; gêzik

# H

**h/H** tîpa dehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê ezmandevî û qirikî ye, awayê belavbûna wê nîvdengdêr e
**ha! [I]** çi ye
**ha [II]** kîteyeke ku di wateya /wergire/yê de tê bikaranîn *(ha ji te re)*
**ha** … **ha** … **[III]** ew jî dibe û a din jî dibe *"**ha** di hûr de, **ha** di tûr de"
**hacet** **1.** alav, halet **2.** pêdivî *"barê **hacet**an, kes nikare rast bike"
**haf** **1.** huzûr, pêşber **2.** qad, meydan
**-di hafa Xwedê de** di huzûre Xwedê de
**hal** rewş, temtêl *"heke bêyî mala me, tu dê bibînî **hal**ê me"
**-halê kûçikan** rewşa dijwar
**-ji halê xwe razî bûn** qîma xwe bi rewşa heyî anîn
**-hal û wext xweş bûn** maldar bûn
**halan** **1.** awaz **2.** newaya bilind *"**halan**a dilan, ji halana bayî xurtir e"
**-halan dan** **1.** awaz berz kirin **2.** bi newayeke bilind qîjîn
**halet** amûr, alav
**-haletên avasaziyê** alavên înşaetan
**halxweş** **1.** dewlemend **2.** têrxwarî
**han [I]** **1.** teşwîq **2.** niç, navtêdan
**-han dan** **1.** teşwîq kirin **2.** nav tê dan, niçandin
**han [II]** kîteyeke ku wateya cînavkên şanîdanê xurt dike *wek: ew/ev wê/vê mala **han***
**handêr** **1.** teşwîqkar **2.** navtedayî, niçandî
**hanê** ha, han
**hangaj** kotanê ku sewalan davêjinê û pê erdê cot dikin
**hanzûka** pir bi lezgînî
**har [I]** zordest
**har [II]** kesê ku bi nexweşiya hişalozî û hoviyê ketiye, derdeseyî
**-har bûn** **1.** hov bûn, wehşî bûn **2.** dîn bûn **3.**

ji rê derketin *"jina bêkes **har dibe,** mêrê bêkes jar dibe"

**-har kirin** **1.** hov kirin **2.** axozî kirin **3.** newan kirin **4.** dîn kirin û ji rê derxistin

**hasilat** **1.** derhat **2.** hilberîna ku tê berhevkirin

**haş** **1.** sakin, aşt **2.** tebitî

**-haş bûn** **1.** aşt bûn, sakin bûn **2.** tebitîn

**-haş kirin** **1.** aşt kirin **2.** tebitandin **3.** asayî kirin

**haşa** derî hafê

**-haşa ji huzûrê** derî hafa camêran

**haşiye/haşî** nivîsên li kêleka rûpelê

**hatin/tê/bê [I]** **1.** bûn **2.** rûdan **3.** qewimîn *"**hat** ji newalê, bû xwediyê malê"

**-hatin holê** **1.** qewimîn **2.** rûdan **3.** çêbûn

**hatin [II]** dexl û debar

**hator** mîrkutê ku kils pê tê kutan

**havên** meya, firşik, hevîrtirş *"bê **havên,** şîr to nagire"

**-havên bûn** meyîn

**-havên kirin** meyandin

**havil [I]** **1.** sûd, kelk **2.** meslehet, berjewendî

**havil [II]** bandor, tesîr

**havil [III]** **1.** biryar **2.** pêwendî

**havildar** pêwendîdar

**havî** **1.** sersar û axozî, derbider û aware **2.** dînik **3.** peza ku ji keriyê xwe vediqete û digihêje keriyekî din

**havî bûn** derbider bûn

**havî kirin** derbider kirin

**havîn** werza germê, tavistan *"her çi jar e, li **havînê** jî sar e"

**havîngeh** malên ku havînan tên bikaranîn; sermiyan

**havlêk** gêzî, siqayîl

**havrî** bermaya xwarin û vexwerinê

**hawar** **1.** îmdad **2.** bangawaziya ku pê destyarî ji cihekî tê xwestin

**hawar hatin** ji bo kesê di tengavîyê de destyarî hatin

**hawar gihandin** rewşa aliyê di tengaviyê de ragihandin aliyê destyar

**hawar kirin 1.** *(bi dengî, nivîskî an ji bi riya ragihandinê)* destyariya lezgîn daxwaz kirin **2.** qîjîn û gazî kirin

**hawir** doralî

**hawirde** bûjenên ku ji derve hatine standin; îdxalat

**hawirdor** dorhêl

**hawirparêz** dorhêlparêz

**hawîd** palanê ku davêjin ser pişta hêştiran
**hawran** puşiya bêmil a ku di ser kincan de tê werkirin
**haxam** keşeyê cihûyan
**hay 1.** xeber **2.** salix **3.** melûmat **4.** agehî *"zikê têr, **hay** ji yê birçî tuneye"
**-hay jê hebûn 1.** haj pê hebûn **2.** pê hesîn **3.** pê nasîn **4.** tê gihiştin *"ber bi mino, **hay jê tuno"**
**haydar 1.** pêhesiyayî **2.** xeberdar **3.** têgihiştî
**haydan** bergirî
**haydar bûn 1.** pê hesîn **2.** jê xeberdar bûn **3.** tê gihiştin
**haydar kirin 1.** pê hesandin **2.** jê xebardar kirin **3.** sergihayî kirin
**haylime** teqereq
**hazir 1.** amade **2.** eywez *"behsa gur dikin, gur jî **hazir** e"
**heb 1.** lib **2.** kit
**-heb ji hebê neqetandin** bênavber yeko yeko li pey hev rêz kirin
**heba 1.** beytu **2.** dêrzbûyî
**heba bûn** dêrz bûn
**heba kirin** dêrz kirin
**heban** derdanka ku xwarina şivên tê de tê danîn; eyarê şivaniyê
**-hebana xwe vajî kirin/daweşandin 1.** bi qasî zanîna xwe axaftin **2.** bi qasî hêza xwe tev gerîn
**hebirman** hinarê hişkirî
**hebişandin/dihebişîne/bihebişîne 1.** vegemirandin **2.** bi çavçilî daqurtandin
**hebosan** cureyekî çêreya ku jê eraqê jî çêdikin
**hebreş** mendika toraqê
**hebûn/heye/hebe 1.** xwedî bûn **2.** berdest bûn **3.** giyanewer bûn *"çiya, bi ser hev re **hene"**
**hebûn-nasî** retkoka ku sedema hebûnê wekî armanc dibîne
**hec** di rojên wê yên diyar de serdana Mala Xwedê *"**hec,** bi silavan qebûl nabe"
**hecel** derhata aborî
**hechecik/hecîreşk** cureyekî çivîkên ku dişibihe leqleqan; dûmeqesk
**heciqandin/diheciqîne/biheciqîne** pelixandin
**heciqîn/dihecîqe/bihecîqe** pelixîn
**hecivandin/dihecivîne/bihecivîne** tevizandin
**hecivîn/dihecive/bihecive** tevizîn
**heciz** gerew, barimte
**heciz kirin** gerew girtin,

barimte kirin
**hecî** kesê ku di rojên tawafê de çûye serdana Mala Xwedê
**-hecî poşman** **1.** kesê ku hanzûka ji sozê xwe vedigere **2.** kesê ku hanzûka ji tewbeya xwe vedigere
**heç** **1.** şop **2.** tûş
**-dan ser heça xêrê** di riya qenciyê de meşîn
**-di heça nebaşan de têk çûn** tûşî nepakan hatin û ziyaneke xedar dîtin
**heçî** darekî devçeqel ê ku wekî Y'yekê ye û bi serê werisan ve dikin *"**heçiyê** feqîran, qelişî ye"
**-heçî lê qelişîn** tûşî bêyomiyekê hatin û feşk li karê sewirandî ketin
**heçî ku** ***(her çi ku)*** **1.** her kî hebe **2.** her çi hebe *"**heçî ku** li hespê hevalan siwar e, herî peya ye"
**heçik** heçî
**heçko** ma qey
**hed** tixûb, sînor
**-hedê xwe zanîn** hay ji sînorê tevgera xwe hebûn
**hedar** **1.** biryar **2.** tebat **3.** aştî
**hedirîn/dihedire/bihedire** **1.** biryar wergirtin **2.** tebitîn **3.** aşt bûn
**hedîs** hemû gotin, kirin û çespandinên ku bê derew ji Cn. Pêxember eleyhiselam hatine ragihandin
**-hedîs riwayet kirin** *(ji Cn. Pêxember eleyhiselam)* salixên rasteqîn ragihandin
**hedîse** bûyer, rûdan
**hedûr** bilîn, haşî
**-hedûra xwe anîn** pê bilîn û haş bûn
**hedûrî** aramî û aştî
**-hedûrî pê anîn** bêhna xwe pê fireh kirin
**hefidandin/dihefidîne/bihefidîne** nixamtin û veşartin
**hefidîn/dihefide/bihefide** nixumîn û heyibîn
**hefik** qurtik, gewrî
**hefsar** **1.** bendê serê heywanan ê bê devgem **2.** rêvebiriya kar û baran *"bûk li ser hespê ye, **hefsar** li destê wê ye, hê jî kes nizane qismetê kê ye"
**hefsûdan** cureyekî çêreya ku dikine nava toraqê; mendik
**heft** **1.** hejmara piştî şeşan û beriya heştan **2.** jimareya 7'an *"**heft** çîrokên hirçê hene, her heft jî ser hermiyê ne"
**-heft bavan jê dûr bûn** qet têkiliyeke eqrebatiyê

pê re nebûn
**heftane** destheqa keda heft rojan
**Heftbira** komstêra ku bi heft stêrên xwe ve wek çoçikê ye; Termê Merxê
**hefte/heftî** her heft rojên demê
**heftek** ji heft paran parek
**heftem*(-în)*** di rêza heftan de
**hefteyî** her heft rojan carekê
**heftê** **1.** deh heb heft **2.** jimareya 70'î
**heftok** lîstikeka ku bi beran tê lîstin
**heftreng** keskesor
**heftûzk** kînor
**heftyar** keftar *"**heftyar,** bi axiftina xweş ji kunê derdikeve"
**heger** heke, ger
**hej [I]** **1.** çiqilekî darê **2.** giyayekî stûr û peraş î wekî çiqilekî darê
**-hejek di stûyî de dan** çiqilekî serperaş di stûyî de werkirin
**-bi hejan agir vemirandin** bi çiqilekî serperaş agir damirandin
**hej [II]** **1.** leq **2.** liv **3.** lerz û ricaf *"rovî nediçû qulê, **hej** dida teriya xwe"
**hejale** **1.** eware **2.** lawaz **3.** pejmûrde **4.** yax
**hejandin/dihejîne/bihejîne** **1.** bi ba kirin **2.** lerizandin **3.** leqandin **4.** ji cih livandin
**hejar** **1.** feqîr, xizan **2.** bêkes, belengaz
**hejarî** **1.** feqîrtî **2.** bêkesî
**hejde** **1.** hejmara beriya nozdehan û piştî hefdehan **2.** jimareya 18'î *"**hejde**hê adarê, milyaket hatin xwarê, gazî kirin biharê"
**hejesor** sincîd
**hejhejok** **1.** sist, xav **2.** livlivok, leqleqok
**hejik** çiqilên ziravik ên badayî
**hejijîn/dihejije/bihejije** **1.** weşweşîn, milmilîn **2.** qirqilîn
**hejîn/diheje/biheje** **1.** bi ba bûn **2.** leqîn **3.** lerizîn **4.** livîn *"çiya, bi **hejîn**ê hilnaweşe"
**hejîr** cureyekî fêkiyan e
**hejmar** reqem, jimare
**hejmartin/dihejmêre/bihejmêre** **1.** jimartin **2.** bireqem kirin
**hekandin/dihekîne/bihekîne** **1.** kolan **2.** lê gerîn
**heke** eger, ger, ku *"**heke** deşt e, heke zozan e, rêberê pêz şivan e"
**helal** tiştê ku Xwedê kirina wî azad kiriye *"kes-

ba **helal,** ji karkeran re ava zelal e"
**helal bûn** ji aliyê Xwedê de azad bûn *"heram, ji çu kesî re **helal nabe"**
**helaltî** rewşa helalbûnê *"bingeha hevaltiyê, bawerî û **helaltî** ye”
**helal kirin** ji aliyê Xwedê de azad kirin
**helale** guleke sor e
**helan** cureyekî kevirên ku zû tê darotin
**helandin/dihelîne/bihelîne** **1.** bi tîna germê herikbar kirin **2.** rehn kirin **3.** binevat kirin
**helar** pîta êgir
**helaw** **1.** xwarineke ku ji ard, rûn û şêkir tê çêkirin **2.** şirînayî *"**helaw,** ji şîrêzê çênabe"
**helbest** xebata wêjeyî ya ku ristên wê kin in û li bin hev tên rêzkirin; şiêr
**helbestvan** nivîskarê helbestan; şair
**helboqe** xelboqe
**hele [I]** **1.** xeletî **2.** çewtî
**hele [II]** nêçîra bi komekî
**helebez** **1.** bi lezgînî, bi leza bê **2.** karê ku li ser piyan û bê tidarek hatiye amadekirin
**helecan** tepîna dilî
**helekok** cureyekî çêreya çolê ye *"diyariya şivên, **helekok** e"
**heleşe** kesê xemsar ê ku her çi bikeve destan xirab dike
**helisandin/dihelisîne/bihelisîne** **1.** virçiqandin û tepisandin hev **2.** *(dirûvê resen)* guherandin û wergerandin tiştekî din
**helisîn/dihelise/bihelise** **1.** virçiqîn û tepisîn hev **2.** *(dirûvê resen)* xera bûn
**helî** **1.** nîvî **2.** nivîşkan **3.** ne gewherî
**helîn/dihele/bihele** **1.** bi tîna germê herikbar bûn **2.** rehn bûn **3.** *(resenî)* winda bûn *"berf **dihele,** erd dimîne"
**helîse** tiştê ku hatiye guherandin û wergeriyaye hêvîrê wî tiştî
**-helîseya kartolan** kartolên ku piştî kelandinê kirine pestîl
**helkehelk/hilkehilk** **1.** bi zorî hildan û dayîna henaseyê **2.** bi rev û bez
**helmet** **1.** hucûm, êrîş **2.** çalakî
**helperest** **1.** ezperest **2.** berjewendîperest
**helwest** **1.** temtêl **2.** rewş **3.** rayîş **4.** bertek
**-helwesta hevpar** di tevgerê de yekitî

**-helwest girtin** bertek nîşan dan

**hem [I]** pêşgireke ku wateya tevahiyê dide peyvê, *mînak*: ***hem****velatî*

**hem [II]** dualiyê dide hevokê, *mînak: hem şaş e hem jî faş e*

**hema 1.** di wê heyamê de, tafilê **2.** ewqas jî têrê dike **3.** xem nake *"bipêje, **hema** hê jî birêje"

**hemam** serşoka gelemper *"**hemam,** bi tir û fisan germ nabe"

**heman 1.** eynî **2.** wekî ya din

**-di heman katê de** di eynî saetê de

**hemandin/dihemîne/bihemîne 1.** çît kirin **2.** ji bo ku qedexetiya tiştekî diyar bibe li dorê qûç û diyarde danîn

**hemayîl** nivişta ku davêjin stûyî

**hember [I] 1.** dij **2.** aliyê din, muqabil

**-li hemberî min** muqabilî min, pêşpalî min

**hember [II]** hevraz

**hember [III]** bergind, bergîdan

**hembêz** paşil, paxil

**hembêz kirin** paşil kirin

**hemd** pa û pesna ji bo Xwedê

**hemdem 1.** hevdem, hevçax **2.** heval

**hemdemîtî 1.** hevdemtî, hevçaxîtî **2.** hevtementî

**hemete 1.** muhafeze **2.** berevanî

**-ji bo hemeteyê** ji bo her îhtimal û bilaniyê

**hemete kirin 1.** muhafeze kirin **2.** berevanî kirin *" xwe ji moriya kulek **hemete bike"**

**hemî** hemû *"hemî çêlek tên dotin, **hemî** gotin nayên gotin"

**hemû 1.** gişt **2.** bêkêmasî *"**hemû** mêr, nabin şêr"

**hemwate** di heman mehneyê de; hevmehne

**hemwelatî** di heman welatî de kesayetên civakê; hevwelatî, memleketî

**hemzik 1.** ji heman zikî *(xwişk û bira)* **2.** cureyekî xwarina kurdî ye

**hemzir** kerê biçûk ê xurt

**henarîn/dihenêre/bihenêre** hinartin

**henase 1.** nefes, neks, **2.** bêhn

**henc** *(r)* nîşaneya bendikêya ku di navbera du peyvan an hevokan de tê danîn, (-)

**hence 1.** cihê qetînê yî zirav **2.** cihê tenik ê ku şikestina wî nêzîk e

**-li ser henceyekê ye 1.**

ber mirinê ye **2.** ber hilweşîn û rûxînê ye **3.** hema dike ku bikeve **4.** di xetereyê de ye

**hendef 1.** cihê ku pêşveçûn tê de xetere ye û pir kûr e; hence **2.** kendalê kûr ê bi xetere

**henderan 1.** qurbetî **2.** bêganetî **3.** penaberî

**hendese** zanista endazyariyê; mîmarî

**hene** ecîneke ku tiliyên bûkê pê tên rengkirin

**henek 1.** tirane **2.** tinaze **3.** laqirdî *"**henek**ê wî henekê hirçan e"

**henekbaz 1.** laqirdok, **2.** tiranekar

**henek kirin 1.** galte pê kirin **2.** laqirdî pê kirin

**-henek pê kirin** pê tirane kirin, laqirdî pê kirin

**heng [I]** mêşa hingiv, mêşhingiv

**heng [II]** di artêşê de desteyeke pir giran e

**hengame 1.** sûresat **2.** heys û beys

**hengkuj** cureyekî gulan e

**hengur** şevereş

**hepik** alaveke tevn-raçandinê ye; kergît

**heq 1.** maf **2.** biha **3.** deman *"cêr nû ye, kes nabêje **heq**ê wî çi ye"

**-Heq Teala** Xwedê Teala

**heqaret** neheqî

**-heqaret lê kirin** neheqî lê kirin û biçûk xistin

**heqdest 1.** mehane **2.** destmiz

**heqîbe 1.** xurcik **2.** kîs **3.** heban

**her 1.** gişt **2.** bi berdewamî

**-her car** tim, hemasa

**-her çawa** bi çi awayî hebe

**-her çend** her çiqas

**-he çiqas** çi miqdar hebe

**-her dem 1.** her çax **2.** her wisa

**-her gav û du gav** tim û hemasa, bi minasebet û bê minasebet

**-her ji çi be** sedem çi be

**-her kes** mirov giş *"**her kes,** gurê roja xwe ye"

**-her tim** her dem, her çax *"kêm kêm bixwe, **her tim** bixwe"

**-her tişt** bêkêmasî heyber gişt

**-her û her** heta hetayê

**-her wekî din/hwd** hemû tiştên ku dişibihin vê rewşê wekî wê tên hesibandin

**hera 1.** pirtir **2.** dîtir **3.** bêtir

**-hera bedew** *(mêza)* bedewtirîn

**heram 1.** qedexeyên Xwedê Teala **2.** qirej û mirdar *"jina bi mêr, mêr di

ser re **heram e"**

**heram bûn** **1.** *(ji aliyê Xwedê de)* qedexe bûn **2.** qirêj û mirdar bûn *"Behra Wanê, bi devê tajiyekî **heram nabe"**

**heramî** **1.** qedexebûyî **2.** diz, çilfis *"çil **heramî,** nikarin rûtekî bişêlînin"

**heran** çol û berî

**heraret** **1.** tîn **2.** sênc **3.** germahî

**heraş** keça xama

**herbilandin/diherbilîne /biherbilîne** *(bend)* li hev alandin

**herbilîn/diherbile/biherbile** *(bend)* li hev alîn

**herc û merc** keft û left

**hereşe** tehdîd, gef û gur

**hereşe lê kirin** **1.** tehdîd kirin **2.** gef û gur lê xwarin **3.** diran jê re sîqandin

**hereşo** **1.** teqereq **2.** qîjevîj

**herewer** movika ku du hestiyan digihîne hev

**herewez** **1.** paletiya nanoziko **2.** karê hevpar

**herewezî** hevparî

**herewezî kirin** bi hevparî tev gerîn

**herewezkar** kesê ku bi awayekî hevpar hin karan digerîne

**herez** aşît, şepe

**herêm** dever, mintiqe

**herêmkî** li gor mintiqeyekê; deverî

**herf** tîp *"heger ders be, **herf**ek bes e"

**hergavî** bi awayekî domdar; daîmî

**herheyî** heta hetayê; sermedî

**heridandin/diheridîne /biheridîne** dil şikandin

**herifandin/diherifîne/ biherifîne** heriftin

**heriftin/diherêfe/biherêfe** **1.** rûxandin **2.** hilweşandin

**herifîn/diherife/biherife** **1.** peritîn **2.** pişirîn **3.** xera bûn

**herikbar** rewan, carî

**-çîrokeke herikbar** çîrokeke lihevhatî a bênavbir

**herikîn/diherihe/biherike** **1.** *(av)* kişîn û çûyîn **2.** bêastengî teşe girtin *"av, ber bi avaniyê ve **diherike"**

**herimandin/diherimîne/biherimine** **1.** berhewa kirin, berba kirin **2.** felişandin **3.** qedexe kirin **4.** dêrz kirin **5.** berevajî kirin

**herişandin/diherişîne/ biherişîne** **1.** çêrmê ser spîldax kirin **2.** qalikê

ser jê birin **3.** *(rûmet)* şikandin û birîndar kirin

**herişîn/diherişe/biherişe** **1.** çêrmê ser selixîn **2.** qalikê ser zede girtin **3.** *(rûmet)* şikîn û bêqedr bûn

**herî [I]** xweliya ku bi avê nerm bûye *"jina neqenc, **heri**yeke sar e"

**-herî di dêst de bûn zêr** her çi kirin jê qezenceke pir zêde bi dest xistin

**herî [II]** **1.** pirtir **2.** dîtir **3.** bêtir

**-herî mezin** *(nêrza)* mezintirîn

**herîkêl** *(piştî avdanê)* kêlana zeviyên birincî di nav heriyê de

**herîkêl kirin** *(birinc)* di nav heriyê de çandin

**herîrêtik** **1.** hezge **2.** heriya herikbar

**herk** **1.** kişîna avê **2.** gerîna gêrebayî

**hero** **1.** her roj **2.** her dem *"bûka metê, **hero** li dawetê"

**hersim** tiriha negihiştî; besîre, şilûr *"bav **hersim**ê dixwe, diranê lawî diseqînin"

**herûm** sewala ku asê dibe û diengire

**herwe** **1.** belaş **2.** bêdirav

**hes** **1.** hîs, hest **2.** sehek

**hesab** **1.** hejmarnasî **2.** di kar û baran de bikaranîna reqeman **3.** tedbîr *"heçî neke **hesab**an, dibîne ecêban"

**hesab kirin** **1.** tedbîra xwe kirin **2.** jimartin *"hespê xwe nal bike, paşê riya xwe **hesab bike**"

**hesan** kevirê tûjkirina alavên qutkirinê; xar

**hesan kirin** **1.** xar kirin **2.** tûj kirin

**hesibandin/dihesibîne/bihesibîne** **1.** hejmartin **2.** nav lê kirin **3.** texmîn kirin *"êvarê, hîv xwe roj **dihesibîne**"

**hesin** madenê ku jimara wî ya atomî 26, giraniya atoma wî 55.847, siftiya wî 7.8, kurteya wî ya latînî *Fe* ye û di 1510 dereceyî de jî dihele *"**hesin**ê kêrê ji hev û du be, ji hev û du naxwe"

**hesincaw** alavên ji hêsinî

**hesinkar** kesê ku hesinan li gorî endazeyekê ro dike

**hesinkêş** lajwerdê ku hesin û polayê kaşî xwe dike

**hesk/hesik** kefçiyê mezin ê ku xwarin pê tê tevdan û valakirin; kefçe *"dîzikê got: 'ez rind im'; **hesk**ê got: 'di te de dige-

rim' "

**-heska nav malan** kesê gerok û navmalagerî

**hesp** lêsiwariya ku ji kerê mezintir e û nêrê mehînê ye *"dostê kevn, **hesp**ê zînkirî ye"

**-hespê sêwak** hespê revo

**-hesp pê re bezandin** pê re ketin pêşbirkê û hevrikiyê

**hesret** **1.** keser **2.** xweziya dûr; bêrî

**-hesret kişandin** ji zû de li benda tiştekî man û lewma axîn kişandin **2.** pir bêriyê kirin

**hest** **1.** hêza pêderxistina tiştên nedîtî yên ku bi sehekan tên zanîn wekî serma, çêj; hîs **2.** hêza pêderxistina tiştên razber ên *wekî evîn, kîn û hwd*

**-hestên yekî birîndar kirin** dil şikandin, gêwil şikandin, êşandin

**-hest pê kirin** **1.** hîs kirin **2.** tê derxistin

**hestan** stranên koçik û dîwanan

**heste** alava ku pê agir tê pêxistin; fendek

**hestem** kevirheste

**hestiyar** **1.** hîstenik, bihîstyar **2.** dilşewitî

**hestî** parçeyên sext ên ku di lêş de ne û giyaneweran li piyan digirin *"ji ber segan, namîne **hestî**yên kewan"

**-hestiyê hinarike** hestiyên ku di her du aliyên rû de ne

**-hestiyên qorikê hatin jimartin** bûn kelaxê rût

**hestîhêr** **1.** hestîkoj **2.** bi hêrs û rik

**hestîn/diheste/biheste** **1.** tê derxistin **2.** hîs kirin

**hestîvk** bêrika ku nanê firinê pê tê derxistin

**hesû** heşû

**hesûd** **1.** dexes **2.** çavnebar **3.** kumreş

**heş** dermanekî alazkî hêşîn ê ku êşên dêv û diranan dibire

**heşandin/diheşîne/biheşîne** **1.** dagirtin **2.** tijî kirin

**heşaş** **1.** beşûş, devbiken **2.** rûgeş

**heşifandin/diheşifîn/biheşifîne** *(dema nivîsandinê)* midad belav kirin

**heşr** **1.** roja mehşerê **2.** sûresata giran

**-heşr û neşr** **1.** roja hesabdana qiyametê **2.** pir zêde, mişt tijî

**heşt** **1.** hejmara piştî heftan û beriya nehan

**2.** jimareya 8'an
**heştek** ji heşt paran parek
**heştem*(-în)*** di rêza heştan de
**heştê** **1.** deh heb heşt **2.** jimareya 80'yî
**heştirme** sewaleke lingdirêj, bibask û girs a ku di erdnîgariyên germ de dijî, baskên wê bi kêrî firînê nayên lê pir beza ye
**heştpê** ajaleke zeryayî ye; extebot
**heşû** pembûyê ku di navîna rû û betên de tê bicihkirin
**heta** bi qasî maweyeke dîyarkirî û carinan jî nediyarkirî *"**heta** ku co rast nebe, av tê re nakişe"
-**heta îro** ji mêj ve ta niha
-**heta hetayê** **1.** her û her **2.** bêdawî
**hetar** pîşekarê kevirbiriyê
**hetav** zerekiya tavê
**heter** îsrar û pêkutî
**heter kirin** îsrar kirin
**hetik** rezalet
-**hetika yekî birin** bêzar kirin
**hetikandin/dihetikîne/bihitikîne** **1.** rezîl kirin **2.** bizdandin **3.** tengezar kirin
**hetikîn/dihetike/bihetike** **1.** rezîl bûn **2.** bizdîn **3.** tengezar bûn
**hetîk** îftira
**hetîketî** **1.** rezîltî **2.** perîşanî
**hetrek** **1.** derba zexm **2.** lêdana bi tundî
**hev** **1.** wateya tevahiyê dide peyvê **2.** wekî pêşgir, navgir û paşgir tê bikaranîn û wateya tevahiyê dide peyva nû *mînak: hevraz, serhevde, rastênhev*
**heval** **1.** razdar **2.** hogir, dost *"mêr ew e ku di rojên teng de li **heval**ê xwe dipirse"
**hevalbend** **1.** mutefîq **2.** tagir **3.** alîgir *"li bajêr peldankê te hebe, li gundan mirovê te hebe û li riyan **hevalbend**ê te hebe xemgîn mebe"
**hevalbendî** **1.** îtifaq **2.** tagirî **3.** alîgirî *"**hevalbendî,** nameşe bi bêbextî"
**hevalcih** zarok an jî têjikê ku bi hevalekî ve hatiye dinyayê; cêwî
**hevaltî** **1.** hevpişkî **2.** hogirtî
**hevanî** ewanî
**hevbajar** hemşehrî
**hevbend** li kêleka hev
**hevbend kirin** dan rû

hev

**hevbeş** şirîkê di heman qadê de

**hevbiha** bi heman biha û nirxî

**hevcar** kotanê cotkirinê

**hevcure** bi heman rengî

**hevçerx** hemzeman û hevtemen; hevdem

**hevde** **1.** hejmara piştî şazdehan berî hejdehan **2.** jimareya 18'an

**hevdehem*(-în)*** di rêza hevdehan de

**hevdeng** bi heman awaz û newayê

**hevdil** **1.** razdar **2.** di heman ramanê de

**hev dîtin** **1.** hev nasîn **2.** pergî hev hatin

**hevedudanî** *(r)* peyva ji du hêmanan pêkhatî

**hevenav** *(r)* navdêra gelemper

**hevêrke** çember, daîre

**-hevêrkeya cemsera bakurî** çembera ku ji bo veqetandina kîşweran wekî tixûb tê pejirandin

**hevês** **1.** kefa dêst **2.** binê pê

**hevîr** **1.** ardê bi avê strandî; ecîn **2.** pestîl **3.** helîseya her tiştê vîrçoqî *"kesî, **hevîr**ê xwe bi kalî nexwariye"

**hevîrdiran** merhema diranşûştinê

**hevîrtirş** havênê hevîrî *"berf, **hevîrtirş**ê erdê ye"

**hevkar [I]** **1.** şirîk **2.** hevpîşe

**hevkar [II]** **1.** noker **2.** sîxur **3.** alîkarê neyêr

**hevkarî** **1.** karbeşî **2.** şirîkatî

**hevkêşe** **1.** hevseng **2.** terazû

**-hevkêşeyên navnetewe yî** hevsengên gerdûnî yên di navbera gelan de

**hevling** zilamên ku jinên wan xwişkên hev in

**hevnasîn** nasîna du aliyan a bi hev û du

**hevnav** **1.** bi heman navî **2.** tişt an kesekî din

**-hevnavê min** kesê ku navê wî wekî navê min e

**hevok** *(r)* komeka peyvên watedar; cumle

**hevoksazî** *(r)* bi awayekî rast rêzkirina peyvên watedar û peywirdar

**hevor** nêriyê karxezalê

**hevpar** **1.** şirîk **2.** hevkar

**hevparî** **1.** karbeşî **2.** teqsîm

**hevpeyman** **1.** mutefîq **2.** sozdayî

**hevpeyvîn** **1.** sohbet **2.** guftûgoya ku nûçegihanek bi kesekî têkildar re dike

**hevpîşe** di heman sinaet

û meslekî de hevalên hev

**hevran** dan, genim û cehê ji bo xwarinê

**-mişkan hevranê yekî qul kirin** keda yekî tûşî karesatekê hatin

**hevraz 1.** sereberjêr **2.** dibûr

**-hevraz bûn** quloz bûn û bilind bûn

**-hevraz kirin** quloz û bilind kirin

**hevrê 1.** hevalê heman rê û dirbê **2.** hevalê heman raman û bîrdoziyê

**hevrik** reqîb

**hevring** meqesa ku pê pez û berx tên birîn

**hevrist** dareke bêber a ku belgên wê mînanî pîjan e û her dem kesk e; qaj ***"hevrist** ne dar e, nêrgiz ne bihar e, keç ne şûnwar e**"**

**hevsar** hefsar, doxrişme

**hevser 1.** jina mirovî **2.** kita zoyekê

**hevsî** cîran

**hevşî 1.** sûra dora malê **2.** sûra ku li dora guhera pêz tê jenîn

**hevşîre** keça ku di zaroktiya yekî de ji heman çiçikî şîr mêtiye

**hevta 1.** takêş **2.** yekta, hinkuf

**hevûrî** karê dusalî

**hew [I] 1.** qet nabe **2.** ji vir şundetir tu carî na

**-ez hew dixwim** ez ji vir şundetir tu carî naxwim

**hew [II]** derd, kul

**-hew dan** *(birîn)* der bûn

**hewa 1.** bûjena kîmyayî a ku giyanewer pê dijîn **2.** tevgera kar û barên seqayî **3.** hilm û gilm; nefes

**hewadar 1.** cihê ku ba jê digire û lê bêhn naçike **2.** servekirî, pêşvekirî

**hewal 1.** nûçe **2.** bûyer, rûdan ***"**kesê ne li malekê, nizane hewalekê**"**

**hewandin/dihewîne/bihewîne 1.** êwirandin **2.** sitirandin **3.** xwedî kirin ***"dil,** dilan dihewîne**"**

**hewar** hawar ***"**ne dixwim savarê, ne diçim **hewar**ê**"**

**hewarî 1.** hawarî **2.** hevalbendên Cn. Îsa eleyhiselam

**-çûn hewariya yekî** bezîn destyariya yekî

**hewce 1.** pewist **2.** lazim **3.** pêdivî **4.** muhtac ***"**çiya jî **hewce**yî çiyan in**"**

**-ne hewce ye** lazim nake

**hewcedar** muhtac

**hewdel** şorbeya êrd

**hewes [I] 1.** laqirdî, henek **2.** tinaze

**hewes [II] 1.** azwerî **2.**

awat *"dolab hebs e, teşî reqs e, neqş **hewes** e"
**heweskar** dilxwaz
**hewêrde** çivîkek e
**hewisandin/dihewisîne /bihesîne** **1.** lê temrîn dan kirin **2.** amojandin
**hewî** *(ji yekê heta çaran)* jinên ku bi heman mêrî re zewicîne
**hewîn [I]** xwezî
**-hewîn hatin** **1.** pê re kêfxweş bûn **2.** jê bêzar nebûn
**hewîn/dihewe/bihewe [II]** **1.** sitirîn, êwirîn **2.** aşt bûn **3.** sebr kirin, tebitîn
**hewisîn/dihewise/bihewise** **1.** kêfa xwe pê re anîn **2.** dil bijandin tiştekî *"mezin reqisî, biçûk **hewisî**"
**hewl** **1.** xebat **2.** teşebus
**hewl dan** **1.** xebitîn **2.** mercên heyî bi kar anîn
**hewn** aqil, hiş
**hewngir** **1.** hişyar **2.** aqilmend
**hewnas** serkêlindîkêş
**hewq [I]** pîleya pêlekanê
**hewq [II]** baxçeyê ku tê de sewze tên çandin
**hewran** kinca bêmil a ku di ser de tê werkirin
**hewreban** di avahiyan de pêlekana hundirîn
**hewş** **1.** sûra li pêş an jî dora malan **2.** hêwana malê *"heta ku dîk mîr be û tajî kizîr be, tu mêvanan li derê **hewş**ê nabînî"
**-hewş di hev de bûn** bûn cîranên nêzîk
**hewşan [I]** cureyekî çêreyê ye û jê gêzî tên çêkirin
**hewşan [II]** havînan dema razanê ya li pêşiya malên ku li dorê sûreke jenandî heye
**hewşeng** **1.** qad **2.** qada tiratê
**hewtik** baxçe
**hewtim** sedeqe, xêr
**hewtî** **1.** tebat **2.** tewan
**-hewtiya yekî birin** **1.** bi ser re dan avêtin **2.** hêza tewana yekî qedandin
**hewz** çala jenandî ya ku avê berdidinê û piranî li ber kaniyan çêdikin
**hey [I]** daîmî
**-hey û hey** **1.** timî û daîmî **2.** hê jî
**hey [II]** geh, carinan
**-hey li jorê ye û hey li jêrê** carinan li fêzê ye û carinan jî li xwarê ye
**hey [III]** di wê navberê de
**-hey min dît ku winda bûye** paşê pê hesiyam ku berze bûye
**hey [IV]** baneşaneke

gazîkirinê ye, î
**-hey lawo tu biqurçimî** î kuro tu bimirî
**heya [I]** heta
**-heya niha** heta vê qasê
**heya [II]** hesta şermkirinê; ifet
**heyam** **1.** dem **2.** çax, wext *"**heyam** heye li deverinan, heval çêtir e ji biran"
**heyas** serê tiliyên piyan
**heyase** kembera navê a xemilandî
**heyat** **1.** jiyan **2.** sûra li dora malê *"sibatê, guran xwe avête **heyat**ê"
**heyber** tiştê ku hebûna wî teqez e lê dibe ku bê zanîn an jî neyê zanîn
**heyberî** berbiçavî
**heye ku** dibe ku
**heyet** **1.** lijne **2.** deste
**heyf** **1.** mixabinî **2.** tol û întiqam **3.** evez *"**heyf**a serê ku çû"
**-heyfa min bi te tê** li te têm rehmê û gunehê min bi te tê *"heyva ronî! **heyfa min bi te tê** ku şeva reş li pey te ye"
**-heyf e** cihê mixabinê ye /daxê ye
**-heyf hilanîn** **1.** tol hildan **2.** evez jê standin
**heyibandin/diheyibîne/ /biheyibîne** **1.** tuneyî kirin **2.** binevat kirin **3.** dizîka şandin cihekî nediyar
**heyibîn/diheyibe/biheyibe** **1.** tuneyî bûn **2.** binevat bûn **3.** dizîka çûn cihekî nediyar
**heyirandin/diheyirîne/ biheyirîne** şaşwaz kirin, mehtel hiştin
**heyirîn/diheyire/biheyire** şaşwaz bûn
**heylê** *(mêza)* heywax!
**heylo** *(nêrza)* heywax!
**heyran** delal
**-na heyran** na delalê min /na qurban
**heytandin/diheytîne/ biheytîne** **1.** *(da ku bike an neke)* lê qîrîn **2.** lome lê kirin
**heytehol** **1.** hêwirze **2.** sûresat **3.** şulixî
**heytehol kirin** şulixî kirin, heylime kirin
**heyv** cismê esmanî yê ku bi şev ronahiyê dide erdê; hîv *"wexta ku feqîr diçine diziyê, **heyv** ji êvar de derdikeve"
**heyveron** **1.** ronahiya heyvê **2.** heyva çardeşevî *"heyfa ciwaniyê ye ku pîrî li pey e, heyfa **heyveron**ê ye ku şevereş li pey e"
**heywan** ji bilî mirovan ruhberên şênber ên ku di xwezayê de dijîn; se-

wal, ajal *"heke ku tu dixwazî kurê xwe bikî mêr, bike şivan; lê zû bîne mal, hê ku nebûye **heywan"**

**heywax!** baneşaneke keserê ye

**heyz** gîraniya jinan ya ku elameta wê dîtina xwîna malzarokê a mehane ye

**-heyz bûn** *(jin)* ketin kirasan, ketin kincan

**hez** **1.** evîn **2.** hebîn

**-hez kirin** **1.** hebîn **2.** evîndar bûn *"**hezkirin** çiqasî kin be, jibîrkirin ewqas dirêj dibe**"**

**-jê hez kirin** **1.** hebîn **2.** ji tiştekî/kesekî re dilinî bûn *"diz, ji tariyê **hez dikin"**

**hezandin/dihezîne/bihezîne** **1.** hejandin **2.** leqandin **3.** çelqandin **4.** ber bi ba kirin *"**hezandin** xweş e, lê bi du seriyan**"**

**hezar** **1.** deh heb sed **2.** jimara 1000'î *"**hezar** dost kêm in, dijminek pir e**"**

**-hezar sond û selewat xwarin** pir caran bi peyvên pîroz gotina xwe pesend kirin

**-ji hezarî yek** kêm caran û ne her tim/degme caran

**hezaz** ji binî ve herikîna axê; hezek

**hezek** cihê bi herî û gil

**hezge** hezek *"ker ker e, di **hezge**yekê de dikeve heriyê, heft salan di wir re naçe**"**

**hezrîng** hesinê daxkirinê

**hê** **1.** hîn, hîna **2.** heta niha jî *"berxê çê, **hê** li ber kozê kifş e**"**

**hêç [I]** qe, hîç

**hêç [II]** har û dîn

**hêçan** **1.** ceribandin, ezmûnkirin **2.** meqaleya wêjeyî

**hêçandin/dihêçîne/bihêçîne** **1.** ceribandin **2.** ezmûn kirin

**hêdî** **1.** ne zû **2.** sivik sivik *"ava **hêdî hêdî,** me ecêb jê dî**"**

**hêdîka** **1.** ne zûka û bi pêgiranî **2.** dizîka

**hêja** **1.** birûmet, birêz **2.** layîq *"mirî ne **hêja**yî şînê ye ku mirov jê re şînê bike**"**

**hêjatir** **1.** birêztir **2.** layîqtir *"gilî heye, ji hezar giliyî **hêjatir** e**"**

**hêjî** hêja

**hêjîr** hejîr *"adetên bav û bapîran, kerik xweştir in ji **hêjîr**an**"**

**hêk** **1.** adana firindeyan a ku di nav qalikekî req de ji spîtkekî û zerdikekî

pêk tê **2.** tovê hin ajalan e û jê têjik çêdibin *"roj tê, **hêk** ji hêka mirovî xurtir dertên"

**-hêkên hesinî kirin** ji sermayê qerisîn

**-*(bûn)* hêka kûsiyan** bêsexbêr mezin bûn *"hêka genî di pûngalê de dimîne û **hêka kûsiyan** li meydanê"

**hêker** pîşekarê hûnanê

**hêkerûn** qeyxane

**hêkî** hêker

**hêl 1.** alî, ta **2.** tax **3.** tûş

**hêlan/dihêle/bihêle** hiştin

**hêlanek** rûnişteka hilawestî ya ku tê kilandin; kilekursî

**hêle 1.** neçîra kew û çivîkan a bê çek **2.** nêçîra bi komekî

**hêlekan** kilekursî

**hêlik [I]** hêlekan, hêleçan

**hêlik [II]** gun *"dema ku hirç pîr dibe, kudikên wî bi **hêlik**ên wî dilîzin"

**hêlincîn/dihêlince/bihêlince** qilpikê lê girtin, hîqikê pê girtin

**hêlî** neynik, eynik, awêne

**hêlîlar** xêzikên nîgaşî yên ku çembera cîhanê bi dirêjahî dibirin

**hêlîpan 1.** rastênhev **2.** xêzikên nîgaşî yên ku çembera cîhanê bi berahî dibirin

**hêlîn 1.** malika çivîk, teyr û tilûran a ji pûş û pelaşî **2.** lan *"**hêlîn**a teyrê kor jî, Xwedê çêdike"

**hêma 1.** elamet **2.** nîşane

**hêman 1.** binke, bingeh **2.** unsur

**-hêmanên bingehîn** unsurên esasî

**hêmayî 1.** elametkî **2.** nîşankî

**hêmin 1.** asûde **2.** mulayim **3.** awirşikestî

**hêmî [I]** kelik û potikên kevnare

**hêmî [II]** bi rutûbet û têhn; şil,

**hêncirandin/dihêncirîne/bihêncirîne 1.** hingaftin û çîrçîrî kirin **2.** vecûtin û vehêrandin

**hênijîn/dihênije/bihênije 1.** telexewî bûn **2.** ber bi xewê ve çûn **3.** pokinîn **4.** ponijîn

**hênik 1.** ne sar ne jî germ **2.** şîrogermî **3.** mûtedîl

**hênikahî 1.** şîrogermîtî **2.** îtîdala hewayê

**hênik bûn 1.** sarogermî bûn **2.** *(hewa)* mûtedîl bûn

**hênik kirin 1.** bi bajen an jî basarkê tîna hewaya heyî şikandin **2.** *(bi pîneyekî şil)* tîna laşê germ daxistin **3.** bi êgir qer-

ma sermayê şikandin
**hêran/dihêre/bihêre** **1.** kotin **2.** pişirandin **3.** cûtin **4.** hûr kirin *"kûçik kûçik e, dema ku hestiyan **dihêre,** hesabê qûna xwe jî dike"
**hêratî** destmala ku jin di ser mêzerê de didine ser eniyên xwe
**hêre** jûra ku aîdî jinan e û mêrên biyanî nakevinê
**hêrik [I]** erdê bi kevir
**hêrik [II]** sewala ku hirî yan jî muyê wê rast û zivir e
**hêris** zana û keşeyê cihûyan; haxam
**hêrs** **1.** rik **2.** en*(g)*ir **3.** gir *"**hêrs** tê çav lê reş dibe, hêrs diçe rû lê reş dibe"
**-bi hêrs** **1.** bi rik **2.** bi engir **3.** bi gir
**-bi hêrs bûn** **1.** rik hatin **2.** en*(g)*irîn **3.** gir hatin
**hêrsok** **1.** rikhatî **2.** en*(g)*irî **3.** girik
**hêsa** **1.** vehisî, rawestyayî **2.** ne zor, asan
**hêsa bûn** **1.** rawestîn **2.** asan bûn
**hêsan** **1.** asan, ne zor **2.** tiştê ku zûka bi dest dikeve
**hêsanî** asanî, ne bi zorê
**-bi hêsanî** bi awayekî zû û asan
**hêsî [I]** belekiyên berfêyên ku ji ber bayî civiyane hev
**hêsî [II]** erdê ku mêrg û zeviyên wî dêm in
**hêstir [I]** ava ku di dema girîn û çavşewitînê de ji çêv datê xwarê; rondik *"ji çavên kor, **hêstir**ên sor nayên"
**hêstir [II]** sewala ku ji têkiliya navbera hesp û keran de çêdibin û mêhîniyên wan nazên *"hêştir radibin hev, **hêstir** û ker di bin lingên wan de têk diçin"
**hêşî [I]** berfa ku ji ber bayî di çalan de kom bûye
**hêşî [II]** sîwana ku di kêlekên konan de tê hiştin
**hêşîn** rengê ava zeryayê û hewaya çiksayî
**hêşînahî** **1.** çêre **2.** sewze *"rewşa biharê, **hêşînahî** ye"
**hêşîn bûn** *(çêre û dar)* aj dan û bejn avêtin *"çi ku havînî **hêşîn dibe,** ew zivistanî jî lazim dibe"
**hêşîn kirin** *(çêre û dar)* çandin
**hêşînkew** rengê têvel ê ji spî, kesk û şîn
**hêştir** cureyekî ajalên

sehrawî ya barkêş e; wekî pêz goştê wê tê xwarin, tê dotin û birîn

**hêt** beşa lingî ya ku ji moka çongê heta kulîmekê ye

**hêtûn** kilsxane

**hêvişandin/dihêvişîne /bihêvişîne** **1.** parastin **2.** hemete kirin **3.** cangiranî kirin *"her kes derpiyê xwe **bihêvişîne,** dê birîna li pişta xwe bibîne"

**hêvişandî** **1.** parastî **2.** hemetebûyî *"malê **hêvişandî,** ne xurê xwediyî ye"

**hêvî** umîd, bendeman *"tiştê bi nîvî, jê meke **hêvî"**

**-hêvî jê hatin birîn** dest jê hatin şûştin *"**hêvî, ji** Xwedê **nayê birîn"**

**-li hêviyê man/sekinîn** **1.** li bendê man **2.** di raçavi-
çavi-
yê de man **3.** çav lê çûn

**hêvîdar** umîdwar, bendewar

**hêvîs kirin** *(gore, lepik, xalîçe û hwd ên qulbûyî)* tehmîr kirin

**hêvojkarî** **1.** perwerdehî **2.** amojkarî

**hêvotin/dihêvoje/bihêvoje** **1.** perwerde kirin **2.** tembîh kirin **3.** şîret kirin

**hêwl** sehm

**hêwer** tiyê bûkê

**hêwlnak** tiştê ku mirovî ditirsîne û vediciniqîne

**hêwirandin/dihêwirîne /bihêwirîne** êwirandin

**hêwirîn/dihêwire/bihêwire** êwirîn

**hêwî [I]** hewî *"**hêwî** malê dikin, jintî malê dibin"

**-hêwî hate ser** mêrê wê jineke din jî li xwe mehr kir

**hêwî [II]** hêmî û rutûbet

**hêz** **1.** quwet, taqet **2.** qudûm **3.** desthilatdarî

**-bihêz** **1.** xurt **2.** jîr **3.** desthilat

**-bi hêz bûn** **1.** di xwe de qudûm dîtin **2.** xurt bûn **3.** desthilat bûn

**-bi hêz kirin** **1.** xurt kirin **2.** hatin hawarê **3.** destyarî jê re kirin

**-hêzên ewlekeriyê** beşa asayîşê a artêşê

**-hêzên avî** beşa asayîşa zeryayî

**-hêzên bejayî** beşa asayîşa erdê

**-hêzên hewayî** beşa asayîşa hewayî

**-hêzên seqayî** beşa asayîşa fezayî

**hêzar** **1.** qumaşê ku jinên misilmanan li ser kincan de li xwe werdikin **2.**

çarşev

**hibr** aviya rengîn a ku pê tê nivîsîn; murekeb, midad

**hiçhar** îsota sor a tozkî

**hikmet** bîs û razên pêkhatina kar û tevgeran

-**hikmeta îlahî** razên ku Xwedê di tiştên pêkhatî de bi cih kiriye

**hil-** *(r)* pêşgireke lêkerçêker e û wateya berbijoriyê didê

**hilanîn/hiltîne/hilîne** **1.** bi dest xistin **2.** bilind kirin **3.** veşartin *"Silto bû kebanî, golika werisî **hilanî"**

**hilav** ader û eslpak

**hilavêtin/hildiavêje/hilavêje** **1.** lotik avêtin **2.** bi ser re baz dan

**hilawestin/hildiawêse /hilawêse** daliqandin

**hilberandin/hildiberîne /hilberîne** **1.** îmal kirin **2.** çêkirin

**hilberîner** **1.** îmalker **2.** çêker

**hilberîn** îmal

-**navgînên hilberînê** amûrên îmalkirinê

**hilbestîn/hildibeste/ hilbeste** girêdan, bestin

**hilbijartin/hildibijêre/ hilbijêre** **1.** bijartin **2.** *(ji nav re yek an hinek)* ecibandin **3.** *(deng)* bi kar anîn

**hilbijêr** **1.** bijartî **2.** dengdayî **3.** ecibandî

**hilbûn/hildibe/hilbe** **1.** ji şûnê rabûn **2.** qetîn **3.** *(agir)* pê ketin **4.** berz bûn

**hilciniqandin/hildiciniqîne/hilciniqîne** **1.** veciniqandin **2.** zil kirin **3.** silikandin

**hilciniqîn/hildiciniqe/ hilciniqe** **1.** veciniqîn **2.** zil bûn **3.** silikîn

**hilçinandin/hildiçinîne /hilçinîne** *(tiştê ziwa)* av kişandin xwe

**hilçinîn/hildiçine/hilçine** **1.** mêtin û vexwarin **2.** *(çaviya filitî)* kaşî rêzê kirin **3.** bijartin

**hilçûn/hildiçe/hilçe** **1.** ber bi jorê çûn **2.** di kêrtê de qelibîn xwarê

-**hilçûna derûnî** aloziya nefsî ya ku ji ber bertekekê pêk tê

**hildan/hildide/hilde** **1.** bi dest xistin **2.** *(ji erdê û jêrê)* bilind kirin

**hilêvirî** amana bê dervank

**hilêvirîn/hildiêvire/ hilêvire** devê tiştê devgirtî vekirin

**hilfirîn/hildifire/hilfire** **1.** hilperîn **2.** silikîn **3.**

ji xewê veceniqîn **4.** ji cihê xwe pekîn

**hilgerîn/hildigere/hilgere** **1.** *(ber bi jor)* bilind bûn **2.** berê xwe dan jorê **3.** çûn zozanê

**hilgirtin/hildigire/hilgire** **1.** wergirtin, hildan **2.** bilind kirin **3.** mil kirin, pişt kirin **4.** *(birîn)* werimîn û kêm girtin *"mirov barê xwe **hilnegire,** kes barê mirovî hilnagire"

**hilhatin/hiltê/hilê*(hilbê)*** **1.** *(cismên esmanî)* hatin xuyanê **2.** heytandin *"bihar hat, zivistan **hilat"**

**hilhilî** hizhizî, hophopo

**hilhilok** cureyekî fêkiyên çolê ye û dişibihe gêlasan

**hilikî** sewala ku pêşwext hatiye dinyayê *"**hilikî** çand û viringî ket"

**-hilikî zayîn** *(sewal)* zû gon xwarin û zû zayîn

**hilisîn/dihilise/bihilise** **1.** *(bêyî hemdê xwe)* di aliyekî de tehisîn **2.** *(pê)* şemitîn

**hilketin/hildikeve/hilkeve** **1.** rabûn **2.** raperîn **3.** *(ber bi jor)* bilind bûn **4.** pê re mijûl bûn

**hilkêşan/hildikêşe/hilkêşe** **1.** *(ber bi jor)* bilind kirin **2.** quloz kirin

**hilkêş û dakêş** rabûn û daketina lemperên zeryayê; med û cezr

**hilkirin/hildike/hilke** **1.** qurifandin **2.** jê kirin **3.** pê xistin *"êgir bi darên hûr **hilke"**

**hilkişandin/ hildikişîne /hilkişîne** hilkêşan

**hilkişin/hildikişe/hilkişe** **1.** *(ber bi jor)* bilind bûn **2.** quloz bûn

**hilkutan/hildikute/hilkute** **1.** vegevizîn **2.** bi zextî mêtin

**hilimîn/dihilime/bihilime** **1.** henase hilkişandin û dakişandin **2.** gulimîn

**hilm** **1.** bixar **2.** dûkel **3.** nefes **4.** gilm *"hesinê germ, bi **hilm**ê germ nebûye"

**hilmaştin/hildimaşe/hilmaşe** **1.** vemaliştin **2.** bi keys kirin *"serê xwe şûştiye û eniya xwe **hilmaştiye,** diçe nav dijmin tu dibêjî qey aştî ye"

**hilme** **1.** hucûm, êrîş **2.** devjeniya tund

**-hilmeyî yekî kirin** **1.** hilbaskî yekî bûn, êrîş birin ser **2.** pê re ketin devjeniyeke tund

**hilmeşîn/hildimeşe/hilmeşe** hilkişîn
**hilmijîn/hildimije/hilmije** **1.** nefes hildan û dan **2.** mêtin **3.** hilçinîn
**hilo** **1.** de rabê! **2.** de bazdê û xwe bigihînê!
**hilpekandin/hildipekîne/hilpekîne** **1.** pengizandin **2.** hilfirandin
**hilpekîn/hildipeke/hilpeke** **1.** hilfirîn **2.** pengizîn
**hilperişîn/hildiperişe/hilperişe** bêhnijîn
**hilpesirîn/hildipesire/hilpesire** **1.** li hember yekî sekinîn **2.** *(hevîr)* dema pehtina wî hatin **3.** *(xurek)* dema xwarina wî hatin
**hilqehilq** îskeîska di dema girîn an jî vereşanê de
**-hilqehilq kirin** *(di girîn an jî vereşanê de)* îskeîsk kirin
**hilqefşandin/hildiqefşî-/hilqefşîne** **1.** *(da ku rind bitepise hev)* hejandin **2.** *(da ku giranî bê fehmkirin)* hejandin
**hilqûm** qirik
**-hilqûma mirinê** dema sekeratê
**hilsengandin/hildisengîne/hilsengîne** **1.** nirxandin **2.** tehlîl kirin, ferisandin
**hilteqilandin/hilditeqilîne/hilteqilîne** **1.** leqandin, hejandin **2.** hilqefşandin
**hilteqilîn/hilditeqile/hilteqile** **1.** leqîn, hejîn **2.** hilqefşîn
**hiltirandin/hilditirîne/hiltirîne** **1.** tûş bûn, gayîn, sihirandin **2.** tecawuz kirin
**hiltirîn/hilditire/hiltire** **1.** hatin sihirandin **2.** aşofîn
**hilû [I]** alûçe
**-hilûreşk** alûçeyên reş
**-hilûzerk** alûçeyên zer
**hilû [II]** **1.** meht û bêgirnoz **2.** şimşat
**-hilû kirin** **1.** girnoz jê darotin **2.** şimşat kirin
**hilweşandin/hildiweşîne/hilweşîne** **1.** xera kirin **2.** kavil kirin **3.** bêhavil hiştin **5.** rûxandin
**hilweşîn/hildiweşe/hilweşe** **1.** rûxîn **2.** rijîn **3.** kavil bûn **4.** bêkêr bûn *"dîwarê rast, **hilnaweşe**"
**himbiz** li ba hev û pir, ji hev ne firk
**-daristana himbiz** daristana ku darên wê li kêlekên hev û pir in
**himbizî** rexhevî û pirî

**hin** **1.** piçek û ne gişt **2.** parçeyek **3.** jê beşek *"jinê bîne ji mala mezin, li pey bide hezar û **hin**"

**hinar** cureyekî fêkiyan e

**hinarde** bûjenên bazirganî yên ku dişînin welatekî din; îxracat

**hinare** **1.** peyama nivîskî yan jî devkî **2.** şandek

**hinarik** her du hestiyên ku li kêlekên rûyî ne

**hinartin/dihinêre/bihinêre** **1.** şandin **2.** bi rê kirin

**hinartî** şandî, qasid

**hinav** **1.** endamên di hundirên giyaneweran de **2.** hundirê cendêk *"ê ku ne ji **hinav**an, nayê pêş çavan"

**-bijîşkiya hinavê** bijîşkiya endamên hundirîn

**-hinav kutan** bi ser hev henase dan û hildan

**hinavkutî** tengenefesî

**hincet** **1.** behane, mehne **2.** mazeret

**hincirandin/dihincirîne/bihincirîne** **1.** gincirgincirî kirin **2.** hetikandin **3.** aşofandin

**hincirîn/dihincire/bihincire** **1.** gincirgincirî bûn **2.** hetikîn **3.** aşofîn

**hind** **1.** kêlek, rex, tenişt **2.** cem, li ba

**hindam** qam, bejn û bal

**hindav** **1.** îstiqamet **2.** dûş

**hindik** **1.** nezêde **2.** kêm *"ji piran pir diçe, ji hindikan **hindik**"

**hindikahî** **1.** kêmayî **2.** kêmar

**hinek** **1.** çendek **2.** peşkek **3.** pirtikek *"**hinek** dikin, hinek dixwin"

**-hinekan pifî guhan kirin** ji bilî niçandin û navtêdana xelqê serwext nebûn

**hing** dem, heyam *"kengî bibare, wê **hing**ê zivistan e"

**hingaftin/dihingêve/bihingêve [I]** **1.** zecirandin **2.** lê dan *"dema **hingavtin**a kerê tê, nanê cotyarî dixwe"

**hingaftin/dihingêve/bihingêve [II]** **1.** di cihê nîşankirî de lê xistin **2.** gihandin îstiqameta rast

**hingijtin/dihingêje/bihingêje** bi awayekî çavtarî xwe avêtin nava tiştekî

**hingil** çiçik

**hingiv** adana şirîn a ku mêşa hingivî ji puxteyên kulîlkan hildiberîne û di kewareyan de dimeyîne *“peyva nebaş, bi sê pat **hingiv**î nayê xwarin”

**hingî** **1.** ewçend **2.** ji wê

demê virdetir

**hingorî** maweya zemanî ya ji tarîbanê hetanî dema razanê

**hingûlîsk** gustîl

**hingûr** mexreb

**hinkuf** **1.** hevser **2.** hevtayê yeksanî tayê din

**hiqûq** mafên zagônî

**-hiqûqa navneteweyî** zagonên ku têkiliyên di navbera gelan de têkûz dikin

**-hiqûqa giştî** zagonên kar û barên cemawerî

**hiqûqnas** pisporê zanistên zagonî

**hirç** cureyekî ajalên çolê yî çarpê ye û dirinde ye *"guran xwariye, lê **hirç** mane"

**hirî** pûrta pêz û hêştiran

**hirmî** cureyekî fêkiyan e

**hiş! [I]** baneşaneke hişyarkirinê ye

**-hiş bûn** **1.** deng nekirin **2.** dengê xwe birîn

**-hiş be!** dengê xwe meke

**hiş [II]** **1.** aqil, serafet **2.** hafize, bîr *"kesê **hiş** li sêrî, namîne li pişt dêrî"

**-hiş çûn** **1.** aqil tev li hev kirin **2.** ketin sergêjiyê

**hişk** **1.** zexm **2.** ziwa **3.** sext **4.** qayîm **5.** çilmisî *"agirê xweş, agirê darê **hişk** e"

**-hişk û hola** **1.** çilmisî û ziwabûyî **2.** tiptenê

**hişkahî** **1.** zexmtî **2.** ziwahî **3.** sextî, tundî **4.** qayîmtî **5.** çilmisîbûn

**hişkav** cihê ji bej û avê pêk tê

**hişkavî** bejavî

**hişkawiz** çinîna pêşwext

**hişk bûn** **1.** ziwa bûn **2.** zexm bûn **3.** sext bûn, tund bûn **4.** qayîm bûn **5.** çilmisîn **6.** mirin

**hişkebawerî** **1.** baweriya ku tewandina wê ne hêsan e **2.** baweriya ku guherîna wê ne pêkan e

**hişkegilê** girêka ku bi hêsanî venabe; girêhişk

**hişkekuxik** kuxika sext a ku wekî xeneqûtkê dikeve gewriyê

**hişkesalî** sala ku zivistana wê pir sar e û bihara wê jî bêbaran derbas dibe

**hişkî** **1.** hişkahî **2.** reşesermaya bê ba û barij

**hişk kirin** **1.** ziwa kirin **2.** zexm û berk kirin **3.** karê xwendinê terikandin **4.** qayîm kirin û şidandin **5.** çilmisandin **6.** kuştin

**hişmendî** **1.** biaqilî **2.** xwedîferasetî

**hişsivik** **1.** saf, sefêk **2.** dînik

**hiştin/dihêle/bihêle** **1.** terikandin **2.** destûr dan
**hişyar** **1.** jîr **2.** jêhatî **3.** kesê ku ne xewar e
**hişyarî** **1.** îxtar, îqaz **2.** danezan **3.** jîrî û jêhatîtî **4.** xewarnebûn *"heye teqdîra Barî, feyde nake **hişyarî"**
**-hişyariya dawî** agehdar-kirina ji bo cara paşîn
**hişyar kirin** **1.** îxtar kirin, îqaz kirin **2.** ji xewê rakirin **3.** pê hesandin **4.** pê dan zanîn
**hizr** **1.** fikr û raman **2.** qinaet
**-hizr kirin** **1.** ramîn **2.** texmîn kirin
**hîcab** awayê lixwekirina jina misilman a li hundir û derve
**hîç** qet/qe
**hîçparêz** kesê ku têkoşîna hemberî dijwariya jiyanê bêwate dibîne
**hîçparêzî** retkoka ku mirovî û kesayeta wî dispêre lawaziya li hemberî têkoşînê
**hîle [I]** bîz, mehde
**-hîleyê xwe jê kirin** qirqalê wî hilnedan
**hîle [II]** fend û fût
**-hîle û xurde li dorê nebûn** dûrî dek û dolavan bûn
**hîlebaz** dekbaz
**hîlor** dara ziqûmê
**hîm** **1.** xîm **2.** esas **3.** bingeh **4.** tar
**-hîm danîn** **1.** xîm avêtin **2.** tar jênîn
**hîmat** tiştê ava û pêkhatî
**-hatin hîmatê** hatin pê, pêk hatin
**hîn** hê, hîna *"**hîn** ga tune, êfir çêdike"
**hîn bûn** **1.** elimîn **2.** fêr bûn
**hînbûyî** **1.** elimî **2.** fêrbûyî *"**hînbûyî,** ji harbûyiyan zortir in"
**hîndarî** perwerdeya bi riya ezmûnan; temrîn
**hîndekar** **1.** mamosteyê ku di zanîngehê de perwerdekariyê dike **2.** amojkar **3.** rawêjer, hêvojkar *"hînbûyiyan hîn meke, **hîndeker**an ji bîr meke"
**hîndekarî** **1.** pîşeyê perwerdekariya di zanîngehan de **2.** amojkarî **3.** hêvojkarî
**hîn kirin** **1.** perwerde kirin **2.** elimandin **3.** hêvotin **4.** fêr kirin **5.** amojandin *"min xelq **hîn kire** govendê, êdî kesî bi destê min negirt"
**hîqik** îskeîska kesê ku parî di ber de maye
**hîqînî** **1.** dengê îskeîskê **2.** hîrînî

**-hîqînî pê ketin** **1.** hîsk hatinê **2.** xwe zeft nekirin û bi dengî kenîn
**hîrîn/dihîre/bihîre** *(hesp)* şîhîn
**hîro** cureyekî kulîkan e
**hîs [I]** pêşzanîna heyberên razber; hest
**-hîs kirin** hê di pêş de tê derxistin
**hîs [II]** tenî
**-hîsê lê xistin** bêhna dû û şewatê li xwarina pijandî xistin; bîsokî bûn
**hîsk** îsk, hîqik
**hîş** erdê ku xweliya wî rengê sorahiyê lê dixe
**hît [I]** semax
**hît [II]** kevirê ku bi destekî avêtina wî pêkan e
**hît [III]** cureyekî bizinan e
**hîv** cisma esmanî a ku bi şevê xuya dibe û ronahiyê dide cîhanê; heyv *"**hîv** bibe duşevî, her kes dê wê bibîne"
**hîvik** hîva nû ya ku li esmên wekî tîpa C'yê tê xuyan; hîlal, lêvedas/hişkedar, nûma
**hîvî** hêvî
**hîz** **1.** eyarê rûn **2.** bêar û bêexlaq
**ho ho!** baneşana ku pê ga tên ajotin û sekinandin
**ho ho kirin** ga ajotin an jî dan sekinandin *"**ho ho bike** ku bila ga bisekine"
**hoçik** kevirê meht ê ku bi qasî destekî ye, tehtik
**-hoçik lîstin** bi keviran li dûdo xistin
**hodar** **1.** aj, şax, zîl **2.** ajeroya çêre û daran
**hogeç** beranê çarsalî
**hogir** **1.** dost **2.** heval **3.** razdar
**hok [I]** girêka ku zû û hêsan tê vekirin *"mar çiqasî **hok**an bide xwe, divê rast here qulê"
**hok [II]** **1.** gemara sewalan **2.** zîrça kewan **3.** xozana peynkirî
**hoker** *(r)* peyvên ku rewş û mercên pêkhatina lêkeran nîşan didin; amil
**hol [I]** **1.** meydan, qad **2.** hêwan
**-hol hola te ye** firsend firsenda te ye
**hol [II]** topa ji kulav an jî ji potikan çêkirî, gog
**holedest** cureyekî lîstina gogê ye û her tofek ji şeş kesan pêk tê
**holepîtk** pêtên agirê gur
**holetel** cureyekî lîstina gogê ye û îro wekî goga amerîkayê tê naskirin
**holik** malika textîn *"heke gur ji bagerê bitirsiya, dê ji xwe re **holik**ek çêkira"

**holî** şiva holetelê
**honî** darên ku li gorî pîvanekê tên birîn
**horehor** dengê girînê yî berz
**horehor kirin** bi dengekî berz girîn
**horg** dîwan, meclis
**horî** ferişteyên bihuştê
**hoste** pisporê pîşeyekî *"her tişt di destê **hosteyê** xwe de baş e"
**hov** **1.** kovî **2.** mirov an jî desteya dûrî sincê mirovatiyê; wehşî
**hovberî** hovîtî
**hovîtî** **1.** kovîtî **2.** wehşîtî
**hovane** **1.** koviyane **2.** wehşetnak
**hoy** sedem
**hoyix** kincên ku tijî pûş û pelaş dikin û ji bo tirsandina çivîkan di dîwarê bîstên de diçikînin
**hoykar** sedemkar
**hoykarî** sedemkarî
**hoz** **1.** qebîle, eşîr **2.** lijne, deste
**hozan [I]** **1.** helbest, riste **2.** stranbêj
**hozan [II]** **1.** xwezan, arif **2.** nesebzan, nifşzan
**hozanvan** helbestvan
**hucûm** **1.** êrîş **2.** serdegirtin, helmet
**hucûm kirin** **1.** êrîş birin ser **2.** hilmeyî kirin
**huçik** devmilên kincan
**hudhudk** cureyekî çivîkan e
**hukim** biryar, qerar
**hukimdar** **1.** serwer **2.** desthilat
**hukumet** **1.** dewlet, dûgel **2.** rêvebiriya kar û barên cemawerî
**hundir** **1.** ne li derve, derûn **2.** hinav *"jin dîwarê **hundir** e, mêr dîwarê derve ye"
**-hundir çûn** virikî bûn
**hundirandin/dihundirîne/bihundirîne** **1.** hewandin **2.** di xwe de girtin û avêtin hinavan
**hundirîn** **1.** tiştê ku ne aîdî derve ye, derûnî **2.** daxilî
**huner** **1.** miharet **2.** qabiliyet **3.** pîşe *"**huner,** xwediyan ezîz dike"
**-hunerên şêwekarî** miharetên bedewiyê
**hunerdost** dilxwazê kar û xebatên hunerî
**hunerî** **1.** miharetî **2.** pîşeyî
**hur** **1.** azad **2.** kesê ku çavên wî şaş in
**hur bûn** **1.** azad bûn **2.** çav lê şaş bûn
**hur kirin** azad kirin
**hureme** **1.** kirêt û bêbine **2.** bêqedr û nezan **3.** kesê ku li gor rayîşa civakê tev nagere **4.** şaşo

**hurim** tirxes
**hurmet** **1.** giramî, rêzgirtin **2.** jina binamûs
**hûfik** kuna ku di nava xilxileyên keviran de ye û li zozanan weke cemedankan tê bikaranîn
**-hûf kirin** **1.** pif kirin **2.** bi carekî de daqurtandin
**hûn** *(r)* cînavka kesane a ji bo kesên duyemîn ên pirjimar
**hûnandin/dihûnîne/bihûnîne** **1.** dan raçandin **2.** dan dirûvandin **3.** dan rokirin
**hûnîn/dihûne/bihûne** **1.** bend li hev anîn û raçandin **2.** nivîs û bûyer dirûvandin **3.** ro kirin
**hûr [I]** mîde, asik *"**hûr,** ne têra kayê ye"
**-mal di tûr de û serî di hûr de** bêwarê ku xem û tatêla wî têrbûna zikê wî ye
**-hûr berdan** zik mezin kirin
**hûr [II]** **1.** biçûk **2.** lixwenehatî **3.** kêmnirx *"**hûr** bifikire, dûr bifikire, kûr bifikire, şûr bifikire"
**-hûr û mûr** kel û mel
**-diravê hûr** **1.** diravên ku nirxê wan kêmtir e **2.** diravên madenî
**-lê hûr bûn** **1.** bal dan **2.** lê kolîn **3.** mutale kirin
**-hûr nêrîn** bi awayekî baş lê kolan
**hûrbijêr** **1.** ziravbihîstyar **2.** bisemt
**hûrde** tiştên hûrik
**hûrdek** tîpa ku hûr tê nivîsandin *wek: a, b, c...*
**hûrfilitî** ziktêrdek, zikberçûyî
**hûrgilî** **1.** dorfireh **2.** agehiya berfireh
**hûrik** **1.** biçûçik **2.** xirdik, qamkinik **3.** yax, eware *"**hûrik** hûrik, dagire tûrik"
**hûring** pênûsa ji pûrta firindeyan
**hûr kirin [I]** **1.** qutqutî kirin **2.** parçe kirin **3.** pişirandin *"heke dilê şivên kete bişkulê, wê **hûr dike û** bi şîr dixwe"
**hûr kirin [II]** **1.** diravên gir bi yên hûr re guherandin **2.** diravek bi diravê dûgeleke din re guherandin
**hûrtirş** silek û xurekxurê ku çi li ber keve dixwe
**hût** **1.** cinawirê efsûnî **2.** masiyekî pir mezin e *"ji xelqê re **hût** e, ji xwe re kût e, hevalê ticarê rût e"
**hwd** *her wekî din*

# I

**i/I** tîpa yazdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke kurt e, cîderka wê navderkî ye, di belavbûna wê de dev nîvgirtî ye û asta belavbûna wê bilind e
**iban** *(di zimanê zarokan de)* qurban
**Iblîs** şeytan ***"**ker **Iblîs** be, dermanê wî weris e**"**
**iblîsî** şeytanî
**îcar** vê carê, vê teqlê
**ilet** **1.** sedem **2.** nexweşî **3.** înk
**-ji iletî yekî re tiştek kirin** ji bo silkirina yekî tev gerîn
**-ketin iletê** **1.** ketin hevrikiyê **2.** engirîn
**ilm** **1.** zanist **2.** agahî ***"**nezanî, dijî **ilm**ê ye**"**
**ilmî** **1.** zanistî **2.** xebata lêkolînî
**ilqênîn/diilqêne/biilqîne** hîqik pê girtin
**Incîl** pirtûka pîroz a ku ji Cn. Îsa eleyhiselam re hatiye hinartin
**ingir** înk
**ingirandin/diingirîne/biingirîne** **1.** bihêrs kirin **2.** xeyidandin
**ingirîn/diingire/biingire** **1.** asê bûn û înat kirin **2.** bihêrs bûn **3.** su hatin
**int** nalîn
**intdar** nalenalkirî
**inteint** nalenal
**inteint kirin** **1.** nalenal kirin **2.** kerixîn **3.** zor pê ketin
**intîn/diinte/biinte** **1.** ji yekî pekandin **2.** nalenal kirin **3.** zor pê ketin
**ireir** inteint
**ireir kirin** inteint kirin
**irq** reh û bingeha neteweyekî; regez, nifş
**irs** reha ku ji nifşên pêşiyê hatiye hildan
**irsî** tiştên ku ji nifşên berê hatine wergirtin
**isad** rêbir, eşqiya
**isadî** rêbirî, eşqiyatî
**isandin/diisîne/biisîne** **1.** sêwirandin **2.** ji ber girtin
**isîn/diise/biise** **1.** sêwirîn **2.** şibihîn
**isqinc** behîvok, argûşk

**isqincî** kesê ku argûşk di gweriya wî de hatiye

**-istan** paşgirek e ku wateya cih û bergehê dide peyvê

**istêre** cihê ku nivînên razanê lê tên jenîn

**iwaraş** babîsok

# Î

**î/Î** tîpa duwazdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke dirêj e, cîderka wê pêşderkî ye, di belavbûna wê de dev nîvgirtî ye û asta belavbûna wê bilind e
**î- [I]** pêşgireke pêkanîna peyvên ku têkildarî deman e; *mînak: îro, îsal...*
**-î [II]** paşgireke pêkanîna navdêran e; *mînak: serî, kerî...*
**î! [III]** baneşeneke gazîkirinê ye; hey, ê
**-î hevalo Xwedê te ji bîr neke!** hey hevalo ev qenciya te ji aliyê Xwedê ve bê xelatkirin!
**îbadet** perestiş
**-îbadet kirin** perestin
**îbret** pend
**îbûdî** rişwet, bertîl, qirt
**îca/îcar** vê carê, vê teqlê
**îcad 1.** hilberîna tiştekî nedîtî **2.** pêkanîna karekî nû
**-îcad kirin** *(tiştekî nedîtî)* hilberandin û pêk anîn
**îcaze 1.** destûr **2.** bawername **3.** buruntî
**îcazetname** di medreseyan de bawernameya ku alimek dide feqîhê xwe
**îç** înkarkirina tiştê kirî
**-îç kirin** *(tiştê kirî)* înkar kirin
**îd** eyd, cejn **"-ji tunedîtiyan re- danhêrk, îd e"**
**îdam** sezakirina tawanbarekî bi darvekirin û xeniqandinê
**-îdam kirin** bi darvekirinê seza kirin
**îdare** dolivgeriya kar û barên jiyanê
**îdare kirin 1.** li gorî pêdiviyên jiyanê hereket kirin **2.** zêde mesref nekirin **3.** deng ji îhmal û kêmasiyan re dernexistin
**îdî** êdî
**îdxalat** hawirde
**îfade 1.** derbirin **2.** bersivdana rapirsînekê
**-îfade kirin 1.** daxwazek anîn zimên **2.** *(ji saziya têkildar re)* bersiva rapirsîneke fermî dan
**-îfadeya yekî girtin 1.** *(wekî saziya fermî)* ji

kesê têkildar bersiva rapirsînê wergirtin **2.** li yekî xistin
**îfet** **1.** namûs **2.** heysiyet **3.** anor
**îflas** têkçûna di karekî de
**-îflas kirin** di karê xwe de bi ser neketin
**îftar** fitar
**îhmal** *(bi qasî pêdiviyê)* mijûlnebûna bi tiştekî re, beradan
**-îhmal kirin** **1.** bera tiştekî dan **2.** beytu berdan **3.** bêhemal hiştin
**îhtiram** rêz û giramiya ku ji kes an jî tiştekî birûmet re tê girtin
**îhtiyac** hewcetî
**îkram** **1.** comerdiya ku ji yekî re tê kirin **2.** bexşîş û diyarî
**-*(tiştek)* îkramî yekî kirin** *(tiştek)* lê dan xwarin
**îlac** bûjena ku ji bo bergiriya nexweşiyekê hatiye amadekirin; derman
**îlan** **1.** dengî **2.** daxuyanî
**îlan kirin** **1.** bi dengî ragihandin **2.** ji raya giştî re dan xuyandin
**îlawe** zêdehiya pêwist an jî nepêwist; pêvek
**îlave kirin** **1.** pê ve kirin **2.** lê zêde kirin **3.** boçik pê ve girêdan
**îlon** meha nehem a zayînî
**île** girava biçûçik
**îltihab** di lêş de cihê ku kêm û aviyeke zer tê de kom bûye
**-îltihab girtin** kêm û aviyeke zerotankî di lêş de peyde bûn
**îm** **1.** ev **2.** pêşgireke ku tê pêşiya peyvên têkildarî demê û /m/ya wê dikeve *mînak: îcar, îro, îsal, îtir...*
**îmal** di karistanan de rêzehilberîna bujenan
**-îmal kirin** **1.** hilberandin **2.** çêkirin
**îmam** **1.** serwerê ji Ehlibeytê **2.** zanayê zanistên şerîetê
**îmamet** **1.** di nav endamên Ehlibeytê de serweriya kar û barên rêvebiriyê **2.** zanatiya zanistên şerîetê dinimîne
**îman** baweriya bi dînekî ku ji aliyê Xwedê de hatiye hinartin ***"**sikûta zimên, silametiya **îman**ê ye**"**
**-îmana xwe avêtin** li dadgehê bi derewî sond xwarin
**-îman kirin** bawer kirin
**îmdad** ji daxwazkirî re şandina hewariyê
**îmha** tunekirina giştî
**îmkan** **1.** derfet **2.** mefer
**îmsak** **1.** ji kesê rojîgir re

dema destpêka rojiyê **2.** berbang
**îmtihan** di qadeke zanînê de ceribandina têgihiştina kesekî
**îmze** şanenava ku ji ber navekî ve tê çîlovîlokirin
**-îmze kirin** şanenav kirin
**în** roja cumeyê
**înad** înk
**-ketin înadê** înk girtin, engirîn
**înan/tîne/bîne** anîn
**încane/încare** kûzika ku gul û kulîlk tê de tên çikandin
**încas** hilûreş
**înç** şik
**-înç kirin 1.** şik birin **2.** tê derxistin, sergihayî bûn **3.** pê hesîn
**înçkirî 1.** şikbirî **2.** serwext **3.** beled
**înk 1.** kîn **2.** en*(g)*r
**-ketin înkê 1.** kîndar bûn **2.** engirîn
**-înk û bilah kirin** bi tu awayî ji gotina xwe averê nebûn û ji bo vê yekê sond xwarin
**înkar** nepejirandin
**-înkar û tune kirin** nepejirandin û binevat kirin *"kenê kûçikan jî bi **înkar û tunekirin**ê tê"
**înqilab** sewre, şoreş
**însan** mirov, merî *"**însan** dinyayê danaqurtîne, lê dinya însên dadiqurtîne"
**înşaet** avahiya ku nû tê çêkirin
**-xîmê înşaetê avêtin** dest bi avasaziyê kirin
**întiqam** tol, heyf, evez
**înziwa** destvekişandina ji kar û barên jiyanê
**îqaz** hişyarkirina ji xetereyekê
**îqbal** bext, siûd *"heke **îqbal** hate sêrî, her kes dibêje: 'aferî!' "
**îqlîm 1.** av û hewa, kîşwer **2.** herêma erdnîgarî
**îqtibas** agehiya ku ji dereke din hatiye wergirtin
**îqtisad** kar û barên têkildarî rêvebirina jiyanê
**îro 1.** roja ku em tê de ne **2.** a niha *"**îro** li ber derê me ye, sibehê li ber derê we ye"
**-îro ro** di vê demê de
**-ji îro pê ve** ji niha şunde
**îsal** sala niha, vê salê
**-îsal misal** salawext
**îsbat 1.** birhan **2.** peyt, delîl
**îsbat kirin 1.** peyitandin **2.** birhan nîşan dan
**îsewî** fileh
**îsil 1.** çaviya di bin stêreyê nivînan de **2.** di dîwaran de çaviya ku kel û melên hûrde dikinê

**îshal** virikîbûn
**îsk** hîqik
**îskan** lîwana vexwarinê
**îskeîsk** **1.** dengê girîna bi hilkehilk **2.** dengdana mirovê ku noqî ava sar bûye
**îskeîsk kirin** **1.** *(ji ber girînê)* hilkehilk kirin **2.** *(mirovê ku noqî ava sar bûye)* pifepif kirin
**îslam** dînê dawîn ê ku ji Cn. Muhemed eleyhiselamî re hatiye hinartin
**îsot** cureyekî sewzeyên tûj e
**îsraf** dêrz
**îstgeh** **1.** rawestgeh **2.** sazî û destgeha weşanên dengî
**îstikan** îskan
**îstiqamet** **1.** tûş/dûş **2.** di erdnîgariyê de aliyên resen *(bakur, başûr...)* û pêkhatî *(bakurê rojhilat, rojhilata navîn...)*
**îstiqrar** **1.** aramî û huzûr **2.** ewlehî û asayî
**îstixbarat** **1.** salixgeriya sîxurî **2.** agehiya nepen
**îş** kar û xebat ***"îş**ê meran xuyan nabe, car heye tûyan dixwin, car heye gûyan dixwin**"**
**-îşê nemayî anîn sêrî** **1.** pir eziyet lê dan kişandin **2.** êtixiyek anîn ber dêrî
**îşaret** nîşaneya tiştê nimandî; hêma, diyarde
**îşev** ev şev/vê şevê
**îşk** şid
**îşkar** **1.** xebatkar **2.** jêhatî
**îşkav** sindoq
**îşk dan** bar şidandin
**îşkence** rêbaza azarkirina bi lêdanê
**-îşkence kirin** bi lêdanê azirandin
**îşpêbûyî** jîr û xebatkar
**îşxal** vegirtina welatekî bi awayekî ku derî zagonên navneteweyî ye
**îtifaq** *(li ser kirin an jî nekirina karekî)* di navbera çend aliyan de biryarên ku tên wergirtin
**-îtifaqa sêalî** peymana ku di navbera du aliyên têkildar û aliyekî çavdêr de tê şanenavkirin
**-îtifaq kirin** li hev kirin
**îtir** **1.** êdî **2.** ji bilî
**îxracat** hinarde
**îw!** baneşeneke ecêbman û şermkirinê ye; wî!/pî!
**îzgeh** îstgeh
**îzin** destûra ku ji bo kirin an jî nekirina karekî tê dayîn
**-îzin dan** destûr dan
**-îzin xwestin** destûr û musaede xwestin

# J

**j/J** tîpa sêzdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke pêşezmandevî ye, di belavbûna wê de ziman li ser diranan dişide, fîzek û nerm e
**jahr** jehr
**jaj** cureyekî çêreya ku di çêjdana penîrî de tê bikaranîn
**jajerûn** cureyekî xwarina ku ji jajî û rûn tê çêkirin
**jajî** toraq û penîrê ku jajî kirine tev
**jakaw** **1.** wehşî **2.** hov **3.** kovî
**jale** **1.** kulîlka ziqûmê **2.** xunav
**jan** **1.** êş **2.** tajan ***"jan**a hemû tiliyan yek e**"**
**-jana zirav** cureyekî nexweşiyê ye û hêdî hêdî bi kuxika xwînî dikuje
**-jan dan** **1.** êşîn **2.** tajan dan
**-jan girtin** **1.** êşê lê girtin **2.** tajan pê ketin
**janbir** dermanê êşbir
**jandar** **1.** biêş **2.** tajandayî
**janîn/dijane/bijane** ajinîn
**jano** **1.** nexweş **2.** seqet
**jar** **1.** sefîl **2.** bêkes **3.** lawaz
**jarav** bijûn
**jarav bûn** **1.** bijûn bûn **2.** paqij bûn
**jarav kirin** **1.** bijûn kirin **2.** aman ji aravê derxistin û aveke paqij bi ser de kirin
**jar bûn** **1.** sefîl bûn **2.** bêkes bûn **3.** lawaz bûn
**jarîn/dijare/bijare** **1.** nalîn **2.** zûrîn **3.** girîn
**jar kirin** hejar kirin
**jarxane** jûra pêşalîkariya tenduristî
**jehr** **1.** bûjena ku sedemkarê nexweşiyê ye **2.** bûjena ku sedemkarê mirinê ye ***"jehr**a maran, ji maran naçe**"**
**jehrav** av û jehra ku têkilî hev bûye
**jehrdar** jehrîn
**jehremar** jehra maran
**jehrîn** **1.** bûjena ku jehr tê geriyaye **2.** bûjena ku

tê de jehr heye

**jehr kirin 1.** jehr lê dan xwarin **2.** jehr tevî xwarina û vexwarina yekî kirin **3.** lê herimandin **4.** di ber de kirin ziqûm

**jek** xilindor

**jem 1.** danê xwarinê **2.** dem, zeman

**jenan** pîşekarê ku bi lehîmê hesinên şikestî dicebirîne

**jenandin/dijenîne/bijenîne 1.** *(dîwar)* dan lê kirin **2.** dan şeh kirin **3.** *(hilm)* dan hildan û berdan **4.** çirûsandin **5.** dan zingezing kirin **6.** dan lehîmkirin **7.** *(alavên mûsîqayî)* dan lêxistin

**jeng** bûjeneke qehweyî ya ku ji ber şilbûnê li ser rûyê hesinan peyda dibe; zeng

**jengar** zengar, zengirtî

**jeng girtin** li ser hêsin tebeqeyeke zengê çêbûn

**jenîn/dijene/bijene 1.** *(dîwar)* lê kirin **2.** şeh kirin **3.** *(hilm)* hildan û berdan **4.** çirûsîn **5.** zingezing kirin **6.** lehîm kirin **7.** *(alavên mûsîqayî)* lê xistin **8.** *(hestî)* ajinîn

**jê** ji wî/ji wê

**-jê pê ve** ji niha şundetir

**jêbir** alava ku nivîsê winda dike

**jê birin 1.** xêzên nivîsandî winda kirin **2.** di qimarê de qurût kirin

**jê birîn 1.** ji heqdesta wî birîn **2.** tûşî karesatekê hatin

**-Xwedê jê biriye** Xwedê bobelatek aniye serê wî

**jêder 1.** cihê ku mijar jê hatiye hilçinandin; makder, çavkanî **2.** avzêm

**jêderk 1.** çavkaniya avê **2.** makdera agahiyan

**jê gerîn 1.** dest jê vekişandin **2.** serbest berdan

**jêgir** îqtibas

**jê girtin 1.** ji destê wî hildan **2.** îqtibas kirin

**jê hatin 1.** pêk anîn **2.** bi dest xistin *"bila **jê bihata,** bila pêşî serê min bişkanda"

**jêhatinî** qabiliyet

**jêhatî 1.** jîr **2.** egîd *"kebaniya **jêhatî,** bila nîvê qeliyê jî bixwe"

**jê kirin 1.** qut kirin **2.** birîn **3.** hilkirin *"li kerê mirî digere ku nalan **jê bike"**

**jêla** ji aliyê jêrîn ve

**jêma 1.** berma **2.** mîrate

**jêmayî 1.** bermayî **2.** serata

**jêr 1.** bin, bintar **2.** qûntar **3.** *(di erdnîgariyê de)* aliyê başûr

**-li jêr** **1.** li bin, li bintarê **2.** li qûntarê **3.** li başûrî
**jêrîn** cihê li bin, aliyê li bintarê
**jêrla** jêla
**jêrnivîs** nivîsa ku li bin tê xuyakirin; têbinî
**jêrxanî** **1.** binanî **2.** binesazî
**jêza** **1.** maka nifşê **2.** makder
**ji** daçeke e û wateya maweyeke diyar dide peyvê
**-ji ber** di ber xwe de
**-ji ber ku** bi sedema ku
**-ji berê de** hê zû de
**-ji ber xwe** xwe bi xwe
**-ji ber xwe de gotin** derewa bêpere kirin
**-ji ber yekî ve** li şûna yekî *"ciranê çê **ji ber** Xwedê **ve** digihêje hawariyê"
**-ji bilî** ji xeyrî *"barê ketiyan kes ranake, **ji bilî** Xwedê"
**-ji dest hev revandin** ji aliyê her kesî ve hatin xwestin
**-ji dêl ve** **1.** dewsa ku **2.** beramberî
**-ji mêj ve** **1.** di berê de **2.** hê di zû de
**-ji nişkê ve** bêyî sedemeke diyar û di wê gavê de
**-ji nû ve** bi careke din
**-ji rikanî yekî** ji bo hêrsa yekî bîne
**-ji rêzê** asayî
**-ji sedî** **1.** ji hejmara sedî pareke diyar **2.** rêjeya sedekê; *(%)*
**-ji xeynî/xeyrî** tiştê navborî ne tê de
**ji ber çûn** **1.** *(bi zarokeke mirî)* berwext welidîn **2.** *(bi têjikeke mirî)* berwext zayîn
**ji ber kirin** di ber xwe de xwendin û gotin
**ji bestan gotin** di ber xwe de gotegot kirin
**ji bîr kirin** **1.** ji balê avêtin **2.** dest jê vekişandin *"her çiqas bibî mîr, xwe **meke ji bîr**"
**jih [I]** têla saza musîqayî
**jih [II]** **1.** rûdiyê zirav **2.** bendê ku ji rûdiya zirav tê bidestxistin
**jiha** ziya, ejdeha
**ji hev zayîn** li hev zêde bûn
**jij** *(di zimanê zarokan de)* goşt
**jikarketî** karnişîn
**jimar** **1.** hejmarên ji yekî heta nehan **2.** reqem
**jimare** **1.** reqem **2.** hejmar
**-jimareya cot** reqemên *wek: 2, 4, 6, 8, 10...*
**-jimareya sereke** reqemên ji *1'ê hetanî 9'an*
**-jimareya şkestî** reqema ku tê de piştî reqema

tam yeke şkestî jî heye *wek: 1.3, 3.05, 54. 33...*

**-jimareya tam** hemû reqemên ku li pey reqema sereke reqemeke şikestî nayê

**-jimareya tek** reqemên *wek 1, 3, 5, 7, 9...*

**jimarnasî** zanistên pisporiya wan têkildarî hesaban û jimartinê ye

**jin 1.** mirova mê **2.** hevsera mirovî *"axa **jin** û mêrî ne ji hev be, tev nagere"

**jinane 1.** wekî mirova mê **2.** her tiştê têkildarî jinê

**jinap** jina mamê mirovî; amojin

**jinbav** hewiya diya yekî

**jinbira** jina birayê mirovî

**jinebî 1.** jina ku mêrê wê miriye **2.** jina berdayî *"**jinebî** dibêjin: ‘ez dizanim’ ; qîz dibêjin: ‘tu dizanî’ "

**jinik** jin

**jinkok** jina bêkêr a ku tenê navê wê jin e *"hin **jin** in û hin jinkok in"

**jintî [I]** pîrektî

**jintî [I]** jina birayê mêrê bûkê *"**jintî** bi hev re baş bin, bira dê neşaş bin"

**jinxal** jina xalê mirovî; xalojin

**jixwe** hema wisa

**jixweber [I]** sirûştî, xwezayî

**jixweber [II]** *(ji bo karekî bihurî)* nepêwist

**-tu jixweberê hatî** pêdivî bi hatina te tunebû

**jiyan** rewşa ruhberiyê a ku bi mirinê diqede; heyat

**-jiyana rojane** jîna/heyata her rojê

**jiyar 1.** heyata rojane **2.** awayê domandina heyatê **3.** şaristanî

**jiyarî** şareza

**jiyîn/dijî/bijî 1.** nemirin û heyata xwe berdewam kirin **2.** ber xwe dan

**jî [I]** daçekek e û wateyê xurt dike *mînak: ez **jî** hatim*

**jî [II]** umir, temen

**jî [III]** qews, kevan

**jîjo** jûjî

**jîkele 1.** nipnû **2.** ter û taze

**jîn** jiyan, heyat *"jin kaniya **jîn**ê ye"

**jîndar 1.** candar, giyanewer **2.** nemirî

**jînenîgarî** serpêhatiya kesekî ya di jiyanê de

**jîngeh** cihê ku jiyana giyaneweran lê didome *“viran, ji tu kesî re **jîngeh** ava nekiriye”

**jîngehnasî** zanistên ku pisporiya wan tendu-

ristiya der û dorê ye

**jînşê** **1.** kesê ku dikare bijî **2.** kesê ku dikare xwe ragire û nemire **3.** berxwedêr

**jîr** **1.** biaqil **2.** hişmend **3.** jêhatî **4.** zîrek

**jîrane** wekî/sezayî jîran

**jîrî** **1.** biaqilî **2.** hişmendî **3.** jêhatîtî **4.** zîrektî

**jîrek** jîr

**jîrektî** jîrî

**jîvan** heyz

**jîy** di lêş de rehên stûr

**jor** **1.** fêz **2.** bilind ***"**çûçik çûçik e, gava avê vedixwe, **jor**î xwe li Xwedê dinêre**"**

**-li jorê** li fêzê

**jorîn** li fêzê

**jovan** poşman

**jovan bûn** poşman bûn

**jovanî** poşmanî

**jûjî** cureyekî sewalên pîjpîjî ye ***"jûjî** lepê xwe li çêlikên xwe dide û dibêje: 'periyên wan çi nermik in' **"**

**jûn** tenduristî

**jûnî** **1.** çong **2.** hestiyê serçongê

**jûr** ode

# K

**k/K** tîpa çardehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê ezmandevî û qirikî ye, awayê belavbûna wê girtî û hişk e

**ka [I] 1.** cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya: *li ku ye?* **2.** de nîşanî min bide ***"**dibêjin: 'hêştirê çima stûyê te xwar e? dibêje: '**ka** çiyê min li kar e!' **"**

**ka [II]** alifa sewalan a ku ji giya û qeselên bi cercereyê pişirandî çêdibe ***"**ava di bin **kay**ê**,** deng jê nayê**"**

**-ka teslîmî bê kirin** emanet radestî xayînekî kirin

**kab** kap, gûzek

**kabok** hestiyê serçongê

**kabox** erdê biadan ê ku avê baş hildiçine xwe

**kabra** mêr

**kaç** her hebeke şêkir

**kaçanî** amanên ku xwarinan vala dikinê

**kaçik** kefçik/kevçî

**kaçlok** qûşxaneya biçûk a bi çembil û devik

**kaço** teralê bêkêr

**kad [I]** merc, reqabet

**kad [II] 1.** gilûmût, girover **2.** çembera ku ser û binê wê hinekî tepisiye hundir; kûre

**-kada esmên** valahiya ezmên û hemû tiştên tê de

**kade** cureyekî nanê ku bi rûn û şêkir tê pehtin

**kadiz [I]** kesê ku diziya kayê dike

**Kadiz [II]** stêra ku di şevên sayî û şevereş de li esmên weke riyeke spî xuya dike; Kakêşan

**kadîn** cihê ku ka lê tê berhevkirin

**kafir 1.** kesê ku ne misilman e **2.** li gorî her olê kesê ku ne ji ola yekî be

**kafiristan** welatê kafiran

**-ma kafiristanî ye?** ma ewqas bêwijdanî jî dibe?

**kafirtî** olederî

**kahîn** remilavêj ê ku qestîka pêşagehiyan dide

**kaho** cureyekî çêreya ku nepijî tê xwarin û belçên wê peraş in; xes

**kahûr** kêra kalanî
**kaj [I]** gilok
**kaj [II]** kirasê maran; têvil
**kaj [III]** sergo, mezbele
**kajger** **1.** likij **2.** hestîkoj
**kajûle** cureyekî çêreyê ye
**kak** kek, birayê mezin
**Kakêşan** Kadiz
**kakil 1.** dendik **2.** gewher *(gûz, bindeq û hwd)* *"temûzê, **kakil** ket gûzê"
**kakût** skêlet, kelax
**kakvîrik** kuvark, karî
**kal [I]** *(sewze)* xav
**kal [II]** kesê temendirêj *"**kal**o memire bihar tê, pîrê memire pincar tê"
**kal [III]** sorê tarî, al
**kalan** cihê ku alavên qutkirinê tê de tên parastin
**kal bûn** pîr bûn
**kalek** kundir/gindor
**kalekal** dengê domdar ê ku pez derdixe
**kalekal kirin** *(pez)* bang dan, zimezim kirin
**kalemêr** mêrê ku temenê wî ji pênciyî derbastir bûye
**kalepîr** kalemêr
**kaler** bûjena bazirganiyê
**kalik** **1.** bavê bavî an jî bavê dayikê **2.** ecdad *"ewê ku **kalik**ê xwe nas neke, Xwedayê xwe jî nas nake"
**kalîn/dikale/bikale** **1.** *(pez)* bang dan **2.** nalîn
**kalîtî** temenborîtî, pîrtî
**kam [I]** **1.** daxwaz **2.** fehlxwestina sewalan
**-kama... birîn** **1.** destekê çûnê **2.** pelek avêtin ...
**kam [II]** gêre
**-kam gerandin** gêre kirin
**kam [III]** rutûbet û kufika afnikiyê
**-kam girtin** afnikî bûn
**kam [IV]** esmanê dêv
**-kama dêv** arîkê dêv
**kam [V]** aramî û bextewarî
**kambax** **1.** xopan **2.** kavilbûyî
**kambaxî** **1.** xopanî **2.** wêranî
**kambaxtir** **1.** xopantir **2.** xeratir
**kamil** **1.** gêran **2.** gihayî
**kamil bûn** **1.** gêran bûn **2.** gihan
**kamilî** **1.** gêranî **2.** gihayîtî
**kamir** leven
**kamirî** mêrga levenî
**kamox** kesê ku bi xwe tirihê diguvişe û jê meyê çêdike
**kamran** **1.** bextewar û dilaram **2.** dilşa
**kamranî** **1.** bextewarî û dilaramî **2.** dilşatî
**kamsojkî** dilbijandî
**kamsojkî bûn** dil bijan-

din, dil kirkirîn
**kamsojkî kirin** dil kirkirandin, çilekî kirin
**kamûk** kamox
**kamûşkî bûn** kamsojkî bûn
**kamûşkî kirin** kamsojkî kirin
**kan** **1.** gencîne **2.** cihê ku maden û xwê jê tê derxistin
**kanc** bêar
**kancî** bêarî
**kandew** çêleka zayî ya ku cardin avis nebûye û hê tê dotin
**kanê** ka li kuderê ye?
**kanik** postê ku li ser çêv e û pê dadimile
**kanî** jêderka avê *"merî, li ber **kani**yê tî namîne"
**kanîn/dikane/bikane** karîn
**kanûn** **1.** meha berfanbarê **2.** kûreya êgir
**kanza** maden
**kanzanasî** zanistên ku pisporiya wan maden in
**kap** **1.** hestiyê çîpê **2.** bendê stûyê sewalan *"dewar bi **kap**an, mirov bi sozan tên girêdan"
**-kap avêtin** **1. bi hev re** bi hestiyê çîpê lîstin **2.** ketin hevrikiyê
**-kap kirin** *(sewal)* bi bendekî an jî bi zincîrekî girêdan
**kapan** tengerê, şiverê
**kapik** bendê kurt
**kapok** tasa sêrî
**kapol [I]** tasa sêrî; kapok
**kapol [II]** kaya pir hûrik
**kapox** paleyê ku gurzên gihê çaw dike
**kar [I]** **1.** xebat, îş, şixul **2.** qezenc **3.** mijûlî *"berxê nêr ji bo **kêr** *(karî)*"
**-kar û bar** **1.** xebat û şixul **2.** xizmet û mijûlî *"siwarbûna kerê, ne tu **kar û bar** e"
**-karê li ser lingan** xebata sivik
**kar [II]** têjika bizinê, karik *"**kar,** sermedî di bin selikê de namîne"
**kara** **1.** fail, kirar, kirde **2.** endamê dilsoz ê artêşa bêpergal
**-karayên azadiyê** endamên dilsoz ên artêşa bêpergal a rizgariyê
**karatî** artêşa bêpergal a ku ji endamên dilsoz pêk tê
**karak** madenê hêsin
**karbeşî** parvekirina xebatekî
**karbidest** **1.** peywirdar **2.** karsaz
**karbûran** ardû
**karciv** şirket
**karçîn** hirmê
**kardank** malzarok
**karekar** dengê segê ku

hatiye lêdan; kûstekûst
**karekew** nêçîra kewan a bi komekî
**karesat** bobelat, felaket
**karêc** şeneyeke ku tiliyên wê pir in; melêb
**karêj** movika ku erzênê digihîne kapolê/kapokê
**karêl** qebrax
**karêltî** qebraxî
**karêz [I]** **1.** kanî **2.** cihoka binerdî
**karêz [II]** cihê hênik; zozan
**kargeh** cihê xebatê
**karger** rêvebir
**kargerî** **1.** rêvebirî **2.** îdare
**kar gerandin** **1.** bi rê ve birin **2.** îdare kirin
**karguzar** kargerê pispor û jêhatî
**karguzarî** şarezatiya gerandina karan
**karik** têjika bizinê; kidik
**karistan** kargeha rêzehilberindana bûjenan
**karîger** **1.** bibandor, bitesîr **2.** rêvebir
**karîgerî** **1.** bandor, tesîr **2.** rêvebirî
**karîn/dikare/bikare** **1.** şiyan **2.** pêk anîn **3.** bi dest ve anîn ***"nikare,** bê par e"
**-*(pê)* karîn** **1.** sernixûn kirin **2.** hêz jê birin
**karîte** garîte ***"karîte,** li ser dîwaran radiwestin"
**karker** **1.** xebatkar **2.** pale
**karkenar** karnişîn
**karkerî** **1.** îşkarî **2.** paletî
**karkêş** **1.** jîr **2.** jêhatî **3.** zîrek
**kar kirin** **1.** xebitîn **2.** qezenc kirin
**karmax** bêjinga ku gir lê dike; serad
**karmend** **1.** memûr **2.** wezîfedar
**karnişîn** kesê ku piştî çendîn salên xizmetê ji karî tê veqetandin û mehmizek lê tê girêdan
**karnişîn bûn** salên xizmetê qedandin û mehmiza karnişîniyê wergirtin
**karniyar** di dezgeh û karcivan de pisporê wizeya mirovîn ê ku karkeran hildigire karî
**karniyarî** pisporiya wizeya mirovîn
**karpêk** berhem
**karsaz** **1.** kesê ku karkeran dide xebatê **2.** kesê ku jêhatî ye û karan pêk tîne
**kart** 25 quriş
**-kartek nedan yekî** qet tu dirav nedan kesî
**kartî** xwarina kevn
**kartî bûn** *(xwarin)* kevn

bûn

**kartî kirin** *(xwarin)* kevn kirin

**kartîk** xarê ku xerat bi kar tînin

**kartol** cureyekî sewzeyên bînerdî ye û pijandî tê xwarin

**kartû** kartî

**karwan** **1.** koma bazirganên gerok **2.** komeke rêwiyan *"bi ewtîniya çend kûçikan, ji rê namîne **karwan"**

**Karwankuj** stêra ku di destpêka meha gelawêjê de tê dîtin û 5-6 mehan xuya dibe

**karxane** karistan

**karzan** kesê ku dizane dê çi îşî bike; şareza

**kas** **1.** piyan **2.** kasik

**kase** **1.** sandiqa darînî ya ku sewzeya dikinê **2.** çavî **3.** selika erebeyan

**kasik** **1.** kaseya biçûk **2.** feraqa ji gil û heriyê; kaxetîtik

**-kasika çêv** şûna çêv

**kasox** dasa biçûk

**kastekast** **1.** dengê nalenala kûçik û guran **2.** çeleçel

**kastekast kirin** **1.** *(seg û gur)* nalenal kirin, zûrîn **2.** çeleçel kirin

**kaş [I]** giyayê ku bi xwe hişk bûye

**kaş [II]** **1.** alava ku dişimite, kaşe **2.** piyên vê alavê

**kaş [III]** hevrazê ku mêş tê de dijwar e, berpal

**kaş [IV]** kişandin

**-kaşî ber piyê xwe kirin** gazî hinda xwe kirin

**-kaş û berkaş kirin** hev birin û anîn

**kaşane** avahiyên dewlemendan ên fireh û xweşik; koçik

**kaşe** navgîna ku bi şimitandina li ser berf û qeşayê tê ajotin

**kaşik** qada ku mirov li ser berf û qeşaya wê werzîşa şimitandinê dike; tîl

**kaşing** şala navê

**kaşî** cureyekî kevirê acûrî ye û di avasaziyê de tê bikaranîn

**kaşxane** koçk

**kaş kirin** **1.** bi erdê re kişandin **2.** leqandin **3.** ji cihekî ber bi cihekî din ve livandin *"Xwedê mirovî şaş meke, lê şaş kir bila fehş meke û heke fehş kir jî bila bi erdê re **kaş meke"**

**kaşo** darê gogê

**kat [I]** erdê ku xêr û bera wî hindik e

**kat [II]** zeman, dem, çax

**kat [III]** zîlên simbilan ên

pêşîn
**-kat dan** zîl dan
**katar** bazinê stûyî, tara stûyî
**kate** cureyekî nanê ku bi rûn û şêkir tê pehtin; kade
**katjimêr** alava demjimêr; saet
**kav** dema berhevkirina bindeqan
**kavarî** **1.** xişirge **2.** cihê bikevir **3.** serkevir *"gava dê bibe dêmarî, bav dibe filehê **kavarî**"
**kavil** **1.** xerabe, kelefe **2.** xopan, wêran
**kavir** peza dusalî
**kaw** **1.** kubar **2.** qure
**kaw bûn** **1.** kubar bûn **2.** qure bûn
**kawdan** **1.** şert û merc **2.** qalik
**kawêj** kayîna hin sewalên ku goştê wan tê xwarin
**-sewalên kawêjker** ajalên ku pariyên xwe piştî çêrînê û di demên rawestanê de dicûn
**kawik** kesê ku lap ne dînik e û demên wî ên biaqiliyê jî hene
**kawî** **1.** kubarî **2.** quretî
**kax [I]** vejibartina giyayên nenas ên ku di nav bîstanan de şîn dibin; aşêf
**-kax kirin** aşêf kirin, ade kirin
**kax [II]** amanên ku ji heriya pijandî tên çêkirin, acûr
**kaxetît** tîtik û amanên ji acûrê
**kaxez** bûjena ku ji dar û pemboyî tê çêkirin û li serê tê nivîsandin
**kaxik** guldanka ji kaxetîtê
**kaxiz** kaxez
**kaxîl** cureyekî çêreyê ye
**kayîn/dikaye/bikaye** *(sewala çarpê a ku goştê wê tê xwarin)* parî cûtin, vekayîn
**kebanî** **1.** jina malê **2.** jina aşpêj *"heke Xwedê li hev anî, Eyşê dikim **kebanî**"
**kebar** **1.** berbang **2.** tekbîr
**keç [I]** zaroka qîzînî *"**keç,** bi hefsar nabin"
**keç [II]** xwar, nerast
**keçanî** **1.** rewşa mêtiya zarokê **2.** mînanî zaroka qîzînî
**keçap** qîzap
**keçel** serût, bêpor, qafrût, zelût *"her **keçel,** bi pereyê xwe helawê dixwe"
**-keçelê qaqê** kesê ku serê wî wekî hêkê bê por e
**keçelî** bêporî, serûtî, qafrûtî *"**keçelî** xweş e, lê gava ku di bin kum de be"

**keçelok** qafgurî, zelût
**keçêç** cihê ku mirîşk lê dimelisin
**keçhêlî** **1.** keça jina mirovî ya ji mêrekî din **2.** keça mêrê jinê ya ji jineke din
**keçik** **1.** keç **2.** zaroka delalik *"**keçik,** teşiya dê radike, lawik jî tîra bavê"
**keçinî** bekaret, duşîzetî
**keçî** xwarî, nerastî
**keç kirin** *(çeka agirber)* armanc negirtin, xwar çûn
**keçxapînok** kesê ku li pey jinan digere û wan dixapîne, mêbaz
**ked** **1.** berhemê renca mirovî **2.** maf *"li kuderê komek, wê derê **ked**ek"
**kedanî** sewalên bibask ên malê
**keder** kul û xem
**kedew** ketew
**kedewî** ajalê ku bi çilmasa ajalan ketiye
**kedik** eyarê berx û karan
**kedî** sewala malê
**kedî bûn** hînî malê bûn *"gur **kedî nabe**, kedî bibe jî xwedî nabe, bêar bifedî nabe"
**kedî kirin** hînî malê kirin
**kedkar** **1.** xwediyê mafê xwe **2.** xwediyê karê xwe
**kedxur** kesê ku mafê xebata yekî bi neheqî dixwe
**kedûn** kûzê avê yî biçûk; quto
**kef [I]** hundirê dêst
**kef [II]** zîpik û peqpeqokên ku li ser tiştên avî dikevin *"kela hêrsê, **kef**a sabûnê ye"
**-kef dan** zîpikên nepoxkî û peqpeqok li serê xuya bûn
**kefandin/dikefîne/bikefîne** **1.** kêl kirin **2.** dirûtin
**kefaret** berdêla ku ber nekirina karekî ve tê dayîn
**-kefareta gunehan be** bila bibe sedeqeya ber gunehan ve
**kefen** qumaşê bêdirûnê ku li miriyan tê pêçan û paşê tên çalkirin
**-kefen kirin devê xwe** bê minet û bi wêrekî ajotin ser mirinê
**kefgir** amana ku kefa ser tiştê avî hildide
**kefî** **1.** pûşiyeke ku di zivistanan de li stûyî tê alandin **2.** egal
**kefîl** derhûd
**-bûn kefîlê yekî** berpirsiyariya karê kesekî hildan ser xwe
**kefîltî** derhûdî
**kef kirin** zîpik û peqpe-

qok li serê xistin

**keftar 1.** cureyekî sewalên çolê ye û dişibihe guran **2.** kal

**keft û left 1.** bizaveke mezin a ji bo peydekirina pariyê jiyanê; têkoşîn **2.** devjenî

**kefxoy** keyayê gund û taxên filehan

**kehreb 1.** gêreba, cêreyan **2.** miqnatis

**kehrebar 1.** gêrebayî, cêreyanî **2.** miqnatisî

**kej** çûr, zerînî

**kejal** keça çûr a zerînî

**kejave** çardara ku pê birîndar û nexweşan neqlî nexweşxaneyan dikin

**kejê** keça çûr a delalik

**kejok** nexweşiya hêtêşê

**kek** birayê mezin

**kel [I]** dewara dusalî

**kel [II] 1.** germ, tîn **2.** rik, hêrs *"**kel**a hêrsê, kefa sabûnê ye"

**kel [III]** sewala biqiloç

**kelabçe** destvank, kelemçe

**kelabe** darik an jî dirankên hilawestina kincan; hilço

**Kelamê Qedîm 1.** Quran **2.** wehy

**kelandin/dikelîne/dikelîne [I] 1.** germ kirin **2.** pijandin, pehtin

**kelandin/dikelîne/dikelîne [II] 1.** xwirandin **2.** gurî bûn

**kelaş [I]** cureyekî solên berê ye; çarix

**kelaş [II]** term, laş

**kelat** cihê asê

**-kelat û felat ji hev nas nekirin** cihê zorî serfiraziyê ji hev veneqetandin

**kelbetan** alava ku agir pê tê hildan

**keleba** keleşêr

**keledoş** cureyekî xwarinê ye û li her herêmê bi awayekî tê çêkirin

**kelef** telaşê rîs

**kelefe** bermaya tiştê kavilbûyî; enqaz

**kelegirî** ber girînê, hema hema dike ku bigirî

**kelegirî bûn** ber asta girînê bûn

**kelegirî kirin** anîn ber asta girînê

**keleh** parêzgehên leşkerî yên berê; duz *"jin **keleh** e, mêr jî tê de girtî ye"

**kelejin** jina ku mêranî tev digere

**kelek** navgîna ku di çem û rûbaran de lê siwar dibin *"divê mirov **kelek**a xwe di avê re derbas bike"

**kelekel** germa havînê ya tîr

**kelekor** **1.** kêmlebat **2.** nefehma û xêvik
**kelem [I]** cureyekî sewzeyan e, pijandî û nepijî tê xwarin
**kelem [II]** **1.** pîj **2.** berbend *"cîranê nebaş, **kelem**ê ber çavan e"
**-kelemê ber çavê neyaran** lehengê ku dijmin jê dibehicin
**kelemêr** egîd
**kelenimêj** kesê ku carinan nimêj dike û pirî caran jî nake
**kelepîçe kirin** *(sewalê serjêkirî)* gurandin û parçeparçeyî kirin
**kelepor** **1.** mîrate **2.** heyiya gelekî
**-kelepora neteweyî** mîrateya gelekî ya ku ji nifşên berê derbasî nifşên nû dibe
**kelerim** cureyekî sewzeyên ku pijandî tê xwarin
**kelestûn** keskesor
**keleş** **1.** delal, cazibedar **2.** mêrxas
**-keleşê deryayî** kesê ku derî zagonên heyî di deryayan de talana keştiyan dike
**keleşêr** keleba, dîk
**kelexwarî** xelexwarî
**kelexwarî bûn** xelexwarî bûn
**kelezûrî** **1.** xurekê ku baş nepijiyaye **2.** karê ku ne bi rêk û pêk e *"girara piran, **kelezûrî** ye"
**kelê** xwarina bêxwê an jî kêmxwê
**kelh** **1.** rind **2.** bi îhtişameke nedîtî û nebînayî
**kel hatin** germ bûn
**kelhoşk** bihura çiyayî
**kelijandin/dikelijîne/bikelijîne** bi hev ve lehîm kirin
**kelijîn/dikelije/bikelije** bi hev ve zeliqîn
**kelistin/dikelize/bikelize** **1.** dizîka payîn **2.** teletel temaşe kirin **3.** li hember tiştekî ecibandî mit man
**kelixîn/dikelixe/bikelixe** pîr û diranketî bûn
**kelî** kelê
**kelîn/dikele/bikele** **1.** germ bûn **2.** pijîn *"serên du beranan, di beroşekê de **nakelin**"
**kelîşo** **1.** cilşo **2.** karê cilşûştinê
**kelk** **1.** fayde **2.** meslehet
**-kelk jê wergirtin** sûd jê wergirtin
**kelkot** **1.** kelik û palaz **2.** xelexwarî
**kelkût bûn** kutan xwarin
**kelkût kirin** ser û guh di rû de anîn, gelekî lê dan
**kelmêş** pêşû

**kelogirî** kelegirî
**kelojtin/dikeloje/bikeloje** dendik şikandin û kakil jê derxistin
**kelojk** **1.** kakila ku ji dendika şikandî hatiye derxistin **2.** rişwet
**-li kelojkan gerîn** li qezencên herwe û bêzehmet gerîn
**kelpezî** **1.** cureyekî margîseyên ku li gorî her deverê rengê xwe diguherîne; kerpeze **2.** durû
**keltox** kalemêrê hizhizî û hopohopo
**kelû [I]** çivange
**kelû [II]** her meheke falnameyê; birc
**kelwaz** sermaya xurt
**kelxaçî** kelezûrî
**kelx** keltox
**kelxot** diranketî
**kem** guhên biçûk an jî tuneyî; kur
**kember** qûşa navê
**kemç** careke lêxistina şêr û hirçan
**kemç bûn** tûşî tundiyekê hatin û nîvî jê qut bûn
**kemçe** amraza ku erdê dikole
**kemç kirin** bi tundî lê xistin û jê beşek qut kirin
**kemend** bendê ku hilboqek bi serê wî ve ye
**kemişîn/dikemişe/bikemişe** **1.** vepelîn ber **2.** xwe quraftin ser û daqurtand
**kemitandin/dikemitîne/bikemitîne** **1.** *(da ku pirç zû jê daweşe)* di ava keliyayî de rawestandin **2.** qefilandin
**kemitîn/dikemite/bikemite** **1.** *(da ku pirç zû jê daweşe)* di ava keliyayî de rawestîn **2.** qefilîn
**kemîn** tele, dafik
**-kemîn danîn** tele danîn, dafik danîn
**kemlan û giran** weqûr û awirşikestî
**kemole** satila devgirtî ya pir mezin
**kemxe** qumaşê hevrîşimî
**ken** **1.** besimîn, bişirîn **2.** geşî *"**ken**ê bêaran, tê ji qulên dîwaran"
**kenandin/dikenîne/bikenîne** **1.** besimandin **2.** rûgeş kirin **3.** dilxweş kirin
**kenar** kêlek
**kenarî** cureyekî çivîkan e
**kend** çal, xendeq, kortal
**-kend û kosp** çal û astengî
**kendal** newala kûr; hendef
**kendav** xelîc, avteng
**kendik** **1.** golika hilikî **2.** golika ku nebûye moz

**kenefe** avahiyê kewişî
**kengî/kengê** çi wextî, çi çaxî *"**kengî** bibare, hingî zivistan e"
**kenhar** kesê kenandî
**kenişt** dêra filehan
**keniz** berdestiya jin
**kenîn/dikene/bikene** **1.** besimîn, bişirîn **2.** rûgeş bûn **3.** hîrehîr kirin *"bi hevalê xwe **mekene,** dê bê serê te jî"
**kenîşte** perestgeha cihûyan
**kenkene** zengîn û hêzdar
**kenloşkî kirin** bi dizîka qûnektî kirin
**kenok** rûgeş
**kenokî** **1.** rûgeşî **2.** kenok *"ne jina **kenokî,** ne mêrê fêtokî"
**kenze** fayke
**kepaze** rezîl û riswa
**kepaze bûn** rezîl û riswa bûn
**kepaze kirin** rezîl û riswa kirin
**kepen** kulavê şivanan
**kepenek [I]** cureyekî çêreyê ye
**kepenek [II]** cureyekî nexweşiya pişikreşê ye
**kepenekî** kesê ku bi nexweşiya pişikreşê ketiye
**kepez** **1.** dibûr, berpal **2.** kêrtê bilind
**kepir** çartaq, holik
**kepîr [I]** tiştê windabûyî
**kepîr [II]** çêreyek e
**kepîr [III]** ji ber camaxê zerbûna diranan
**-kepîr girtin** *(diran)* camaxî bûn
**kepû** bevil, poz
**kepûr** xweliya giran
**ker [I]** **1.** cureyekî ajalên barkêş ê ku ji hespê biçûktir e **2.** ehmeq *"bar naçe ber kerê, **ker** diçe ber bêr"
**ker [II]** kesê ku nabihîze
**-ker û lal bûn** bêdeng guhdarî kirin, dengê xwe nekirin
**ker [III]** parçe, hinek
**kerafî/keratî** **1.** tirtûl, ziqûm **2.** merez
**keramet** îkrama ku Xwedê li hin bendeyên xwe kiriye
**kerane [I]** wekî keran
**kerane [I]** mîrkutê hesinî
**kerate** alava ku sol pê asantir dikevine piyan
**keravî** cureyekî sewalên ku li cemseran dijîn
**kerax** paleyê sewzeyan
**keraxe** garana keran
**keraxî** paletiya sewzeyan
**kerb** **1.** kul û xem **2.** bêrî *“ez namirim bi vê derbê, ez dê bimirim bi vê **kerb**ê”
**-kerba xwe ji yekî derxistin** hêrsa xwe bi tiştekî din ve aşt kirin

**ker bûn [I]** nebihîstin
**ker bûn [II]** parçe bûn
**kerbeş** cureyekî striyan e, pîjên keran *"qedrê gulê çi dizane, **kerbeş** dibêje: 'kerê reş' "
**kerçove 1.** aqilsivik, kêmaqil **2.** peledîn, tiredîn **3.** kerose
**kerdenek** hestîvk
**kerdî 1.** çala ku li der û dora daran vedidin da ku av tê de bisekine **2.** li gorî cureyan beşên bîstanan
**-kerdiyeke bîstanî avêtin** di çalekê de cureyekî sewzeyan çandin
**kerehû** cureyekî bê ye
**kereker [I]** mînanî keran bêteşe
**kereker [II]** bi dizîka û bêdeng
**kerem 1.** destbelaşî **2.** comerdî
**-ji kerema xwe** heke zehmet nebe
**kerem kirin 1.** bexşek li yekî kirin **2.** îkrama yekî qebûl kirin
**-kerem ke** fermo
**kereng** cureyekî çêreyê ye û nepijî tê xwarin *"gotin: '**kereng**o warê te li ku ye? got: 'ba dizane' "
**kereste [I]** onî, dep
**kereste [II] 1.** malzeme, naverok **2.** bûjen
**-keresteyê xav** bûjenên ku nehatine bikaranîn û jê hilberînên curecureyî tên çêkirin
**kerexne** kelbetanê ku pê kûziyên êgir tên hildan
**kerg** destgeh
**kergez** cureyekî teyrên berateyan e
**kergît** alaveke tevn-raçandinê ye; hepik
**kerguh** kîvroşk, kêvrîşk
**keribîn/dikeribe/bikeribe 1.** behicîn **2.** kesirîn
**keriftin/dikerife/bikerife** ziqûm xwarin, kureder xwarin, kul xwarin
**kerik [I]** mêweyên negihiştî, behîvk
**kerik [II]** di guh de kuna ku di navbera guh û perdeya wî de ye
**-di kerika guh de qîrîn** *(di dema bangkirinê de)* devê xwe dirêjî qulika guhî kirin û wisa peyivîn
**kerik [III]** kerê biçûk
**kerixandin/dikerixîne/bikerixîne 1.** jê vegerandin **2.** jê dan nefretkirin **3.** jê bêzar kirin
**kerixîn/dikerixe/bikerixe 1.** jê vegerîn **2.** jê nefret kirin **3.** tengezar bûn
**kerî [I]** simbilên bipûrt ên

bi serê cîl û cegên ve

**kerî [II]** xilek pez ê ji 100 hebî heta 200'î *"heft **kerî** pez, li bin siya darekê mexel tên"

**kerî [III]** **1.** parçe **2.** bir **3.** tîke *"nanê ku bibe **kerî,** hev nagire"

**-kerî kirin** **1.** parçe kirin **2.** tîketîkeyî kirin **3.** birbirî kirin

**kerî [IV]** rewşa nebihîstina guhan

**-xwe li keriyê danîn** xwe nebelediyê û nebihîstinê danîn

**ker kirin [I]** tîke kirin

**ker kirin [II]** dengê xwe nekirin

**kerkedan** sewaleke kovî ya girs e û bi serê difnê wî ve qiloçek heye

**kerkere** **1.** nezan **2.** tênegihiştî **3.** kerose

**kerkovî** cureyekî sewalên kovî yên ku dişi**i**bihine keran û rengê wan ji xêzên reş û spî pêk tê

**kerme** rêxa hişkirî ya ji bo şewatê

**kermêş** cureyekî mêşên girs e û pêvedana wê bi şewat e; moza keran

**kerose** ehmeq, kerkere

**kerpeze** kelpezî

**kerpîç/kerpûç** heriya ku di qalibên çargoşe de tê rokirin û di lêkirina dîwaran de li şûna keviran tê bikaranîn

**kerseng** **1.** komikên xweliyê ên wekî keviran dixuyin lê zû belav dibin **2.** xwîn û tiştên avî yên din ên ku bûne pixtî

**kersil** silepor

**kertek** pir, zehf

**kertik** kewre

**kerx** **1.** westiyayî **2.** bêhêz **3.** jihêzketî

**kerxane** **1.** goma keran **2.** xaneya zinayê; qehbikxane

**kerxerê** şiverê

**kerxur** **1.** cureyekî teyrên berateyan e **2.** mirovê pir xurekxur

**kes** **1.** mirovê nediyar, şexs **2.** ferd *"filan **kes,** kerê barkêşiyê ye"

**kesadî** **1.** kêmasî **2.** xela

**kesandin/dikesîne/bikesîne** *(r)* kesayetî li cînavkê bar kirin

**kesane** ferdî

**kesaxtin/dikesixîne/bikesixîne** **1.** rûçikandin **2.** çiqil kirin **3.** verûtin

**kesayetî** şexsiyet

**kesb** **1.** ked **2.** qezenca ji xebatekê

**kesber** keskê sût

**kesberî** sûtî

**kesbik** moriya nezerê

**keser** **1.** keder, xem **2.** êş,

derd **3.** bêrî

-**keser kişandin** **1.** êşîn **2.** hezinîn, derdomerdo bûn **3.** bêrî kirin

**kesirandin/dikesirîne/bikesirîne** **1.** êşandin **2.** derd lê rakirin **3.** westandin û pir tî kirin

**kesirîn/dikesire/bikesire** **1.** xemgîn bûn **2.** derdoyî bûn **3.** tî bûn

**kesixîn/dikesixe/bikesixe** **1.** qeşirîn, herişîn **2.** rûçikîn

**kesîb** xizan

**kesk** rengê çêreya ter a neçilmisî

**keskahî** **1.** sewzî, hêşinahî **2.** nesl

-**Keskahiya Pêxember** Ehlubeyta Cn. Pêxember eleyhiselam

**keskesor** *(piştî taviyên baranê)* nîvçembera rengîn a ku li esmên xuya dibe; heftreng, kevana Dawid

-**bi ser keskesorê re qefz kirin** derî aqilan tev gerîn

**keslan** teral, lexer

**kestek** kerpîç

**keş** fîşenga ku di valahiyê de tê teqandin û nagihêje nîşanê

**keşîş** popê filehan *"**keşîş,** hero kadeyan naxwe**"**

**keşîşxane** dibistana ku keşîşan perwerde dike

**keşk** cureyekî şorbeyê ye

**keşklok** **1.** kade **2.** nanê hişk-kirî

**keşkul** şeleke kermeyî

**keştî** navgîneke zeryayî ya rêwîtî û barkêşiyê ye

-**keştiya asimanî** cureyekî navgînên firoke yên ku ji cîhanê rêwiyan dibin ser hîvê an jî gerestêrkên din

-**keştiya perdedar** cureyekî navgînên raguhastinê yên ku bi alîkariya perdeyên berbiba di avê de diçin

**keştîvan** ajovan û xebatkarên keştiyê; deryavan

**ketew** çilmasa ajalan

**ketin/dikeve/bikeve [I]** **1.** wergerîn **2.** hilweşîn **3.** bihurîn **4.** daketin *"ker ker e, **nakeve** nav ava kûr**"**

**ketin/dikeve/bikeve [II]** *(sewalên wekî seg û guran)* velezîn, veketin

-**lê ketin** **1.** îsabet kirin **2.** tê gerîn

-**ketin keleha qatil-batilê** **1.** xwîna xwe kirin stûyê xelqê **2.** ji gotina xwe danegerîn

-**ketin kirasan** *(jin)* heyz bûn, ketin kincan

-**ketin zikê diya xwe**

pêrgî aramiyeke bêpayan hatin

**ketî 1.** keftî, bêkes **2.** bêxwedî ***"ketî,** bi xebatê radibin**"**

**ketxweda** kesê ku di qesrên maldaran de hesabê xerc û mesrefê digire

**keval** weneyê bi dest çêkirî û çarçivekirî

**kevalber** kevirên ku berê li şûna kaxezê li serê dihate nivîsandin

**kevan 1.** alava tîravêtinê, qews **2.** xwar **3.** tewiyayî

**kevan bûn 1.** xwar bûn **2.** tewîn

**kevane** çivange

**kevanek** *(r)* di xalbendiyê de nîşaneya ku dişibihe heyvikê, ()

**kevanjene 1.** tîravêj **2.** kesê ku dibe bela û dikeve pêsîra xelqê

**kevan kirin 1.** xwar kirin **2.** tewandin

**kevçik 1.** amana ku xurek pê tê xwarin **2.** hestiyê sersîngê yî navendî ***"**dawet tune, li **kevçikan** digere**"**

**-di kevçika dil de lêxistin 1.** *(da ku neks lê biçike)* di sersîngê de lê xistin **2.** bi derbeke xedar lêxistin

**kevçî** kevçik

**kevel 1.** postê pêz û hwd; eyar **2.** lewhe

**kevel kirin** post kirin, gurandin

**kever [I]** çiyayê ji kevir û zinaran pêkhatî

**kever [II]** bizina belekbelekî/deqdeqî

**kevil** postê mihan

**kevir 1.** ber **2.** zinar **3.** lat ***"kevir,** bi kêvir dibe dîwar**"**

**-kevirê kehrebar** cureyekî kevirên miqnatisî ye û jê mûriyên gerdenî û tizbiyan tên çêkirin

**-kevir bi ser yekî de gêr kirin** lome û gazinc lê kirin

**-kevir kirin 1.** rê bi keviran çêkirin **2.** bi keviran bera yekî dan, ricim kirin

**-kevir li ser kêvir neman** tu tişt di dêst de neman

**-kevir li ser kêvir nehiştin 1.** her tişt rûxandin û tepeser kirin **2.** qir û pir kirin

**kevirheste** cureyekî kevirên ku di ber beraşê hesteyan de tê bicihkirin û bi zivirandinê çîk vedide

**kevî 1.** kêlekên çem û zeryayê **2.** tixûb, sînor, sîtar

**kevîşen** qeraxa zeryayê ya tenîsk a ku melevanî tê de ne dijwar e
**kevkanî** berdeqanî
**kevjal** cureyekî heşeratên jehrîn e
**-kevjalê zeryayî** cureyekî sewalên behrê ye û tê xwarin
**kevlan** tûrik û derdana ku tîran dikinê; tîrdank
**kevloşk** qerçûmek
**kevkîkî tê werkirin** tiştek ber bi tiştekî din ve avêtin; virvirkî avêtin
**kevn** **1.** neteze **2.** qedîm **3.** jibîrbûyî **4.** peritî **5.** rizyayî *"axa, tep davêjin serê û defterên **kevn** vedikin"
**kevnare** **1.** heyber û bûjenên dîrokî **2.** têkildarî berê
**kevnebizot** agirê ku ji zû de hatiye pêxistin *"agir di **kevnebizot**an de dimîne"
**kevnedost** hogirê ji mêj ve û razdarê berê
**kevnekotik** **1.** têkberên kevn û peritî **2.** cil û palazên riziyayî
**kevnemayî** **1.** heyberên dîrokî yên ku hîna li piyan e an jî tên naskirin **2.** agehiyên dîrokî yên ku hîna jî di nava çanda jîndar de ne
**kevneperest** **1.** paşverû **2.** muhafezekar
**kevneşop** dab û nerît, adet û urf
**kevneşopî** gelêrî
**kevok** cureyekî çivîkan e û berê ji bo şandina nameyan dihatine bikaranîn
**kevot [I]** cureyekî çivîkan e û dişibihe kevokan
**kevot [II]** dareke bêber e û jê amanên curecureyî tên çêkirin
**kevz** çêreyeke ku li qeraxên çem û zeryayan hêşîn dibe
**kevzî** sewz, kesk
**kew** kevok
**-kewa pehtî** nêçira ku bêzehmet bi dest dikeve
**kewal** sewal, terş *(pez û bizin)*
**kewandin/dikewîne/bikewîne** **1.** dax kirin **2.** biraştin **3.** *(di kirîn û firotanê de)* xapandin **4.** *(derman)* birîn pak kirin
**kewanî** jina malê, kebanî *"**kewanî** bûn sisê, kodik çûn ber sê"
**kewar [I]** **1.** embar **2.** çala zêd a di hundir de *"çi bixî **kewar**ê, ew tê xwarê"
**kewar [II]** cihê ku mêşa hingiv lê hingiv datîne
**kewaşe [I]** rûxiyayî

**kewaşe [II]** pûş û pelaş
**-kewaşe kirin** *(serê banekî)* bi pûş û pelaşî serê banî ava kirin
**kewçêr** meha dehemîn a salnameya zayînî
**kewden 1.** ehmeq **2.** gêj
**kewderî** dîkê çolê
**kewgir** nêçîrvanê kewan
**kewişîn/dikewişe/bikewişe** *(avahî)* rûxîn û hilweşîn
**kewîn/dikewe/bikewe 1.** dax bûn **2.** birijîn **3.** *(birîn)* pak bûn
**kewre** hesinê girtikgirtikî yê ku alavên qutkirinê pê tên tûjkirin; kertik
**kewre kirin** tûj kirin
**kewşen [I]** hevrazê ku tav lê naxe
**kewşen [II]** çêreyek e
**kewtekewt** dengê domdar ê reyîna segan
**kewtîn/dikewte/bikewte 1.** *(seg)* reyîn, ewtîn **2.** *(mirov)* pizepiz kirin, beletewş axaftin
**kewtkewto** çelçelok
**key** mîr, şah *"axa, bi deh gundên xwe ve wisa bawer dike ku Xosrewê **Key** e"
**keya** rêvebire gundekî/taxekî; muxtar *"li dû zivistanekê du bihar, di gundekî de du **keya** nabin"
**keyanî** muxtartî
**keyitî** mîrîtî, şahitî
**keybanû** mîrxê, mîrxanim
**keyperest** pêgirtî û hevalbendê pergala keyitiyê; şahperest
**keys 1.** firsend **2.** derfet **3.** pergal
**-keys xweş qefaltin** riya revê jê standin
**keys kirin 1.** tertîb kirin **2.** têkûz kirin
**keyskirî 1.** bitertîb **2.** têkûz û bipergal
**keyso/keysperest 1.** firsendger **2.** berjewendîperest
**Keywan** gerestêrkek e
**kezaxtin/dikezêxe/bikezêxe** kesaxtin
**kezeb 1.** ciger **2.** zarokên mirovî *"arê **kezeb**ê, ji arê tenûrê germtir e"
**kezixandin/dikezixîne/bikezixîne** kesaxtin
**kezî [I]** guliyên por
**kezî [II]** edaleyên cendêk
**kezî [III] 1.** xama **2.** keça bermêr *"filan keso tu dibêjî qey qîza **kezî** ye"
**kezîn** çavî
**kezîkur** jina ku porê xwe qaçî kiriye û porê wê êdî nayê hûnan
**kezîzer** jina gulîzer
**kezwan** cureyekî daran e û jê benîşt tê bidestxistin *"çêlik û dotin, **kez-**

**wan** û kelandin li hev nayên**"**
**kê** **1.** çi kes, kî **2.** pirsa ku bersîva wê kirde ye ***"**gava Xwedê ji yekî re li hev tîne, nabêje: 'tu kurê **kê** yî**?' "**
**kêç** cureyekî bihokên biçûk e, di qirejiyê de û bi xwînê dijî
**kêf** zewq û sefa
**-kêf jê re hatin** **1.** zewq jê wergirtin **2.** tahmijîn **3.** hez kirin
**kêfşing** kevjal
**kêfxweş** **1.** kesê ku temtêla wî baş e **2.** kesê ku ji tiştekî razî ye **3.** şa û şanaz
**kêfxweş bûn** **1.** jê razî bûn **2.** şa bûn **3.** halxweş bûn
**kêfxweş kirin** **1.** jê razî kirin **2.** şa kirin **3.** halxweş kirin
**kêfxweşî** **1.** razîtî **2.** şadî **3.** halxweşî
**kêl [I]** dirûnên girs, şêl
**-kêl kirin** bi dirûnên girs dirûtin, şêl kirin
**-kêlkêlî kirin** şêlşêlî kirin, bi dirûneke demdemî dirûtin
**kêl [II]** kevirên ku mezelên miriyan pê tên nasîn
**kêl [III]** gav, kat
**kêlan/dikêle/bikêle [I]** erd kolan
**kêlan/dikêle/bikêle [II]** zevî cot kirin
**kêlangeh** erdê ku ji cotkirinê re hatiye veqetandin
**kêlek** **1.** hind, tehêl, **2.** hêl, alî ***"kêlek**a xwe ya birêx, li rêhevalan mede**"**
**-kêleka xwe dan kêleka bokeberanan** tevî mêrxasan rabûn û rûniştin
**kêlik [I]** demeke pir hindik; xulek
**kêlik [II]** kevirê serê mezelê miriyan; kêl
**kêlindî** alava çandiniyê ya ku pê giya û zad tê çinîn
**kêlî** **1.** bîsk, xulek **2.** karê ku ewqas ne pêwist e û di asta duyemîn de tê **3.** bone **4.** dirûna girs, şêl
**kêlûk** jina nemisilman an jî ji neteweyeke din
**kêlûn** kilîla mezin a darînî an jî hesinî ya ku ku pê dergehên mezin tên dadan
**kêm [I]** ava birîn û pizrikê; cerahat
**-kêm û amas** cerahat û îltihab
**kêm [II]** **1.** hindik **2.** biçêx **3.** nekemilî ***"**aqilê **kêm,** riya xwar ber bi hevalê xwe dixe**"**

**-kêm û zêde** **1.** hindik û pir **2.** virde û wêde **3.** di vê navberê de

**kêmanî** **1.** kêmasî **2.** xeletî **3.** qusûr *"**kêmaniya** kesekî, ji kesekî din re nabe bar"

**kêmar** **1.** hejmara hindik **2.** neteweya ku di nav neteweye ke din de hejmara wan ne zêde ye

**kêmasî** **1.** karê ku li gorî pêdiviyê nehatiye qedandin **2.** qusûr û nivîşkanî *"her xweşikek, **kêmasi**yeke wê heye"

**kêmber** endazeya ku ne fireh e; berteng

**kêm bûn** **1.** nekemilîn **2.** hindik bûn **3.** daketin *"gotin: 'kero, dehşikek ji te re çêbû'; got : 'alifê min **kêm bû** û barê min jî zêde bû' "

**kêmek** di hesabdariyê de nîşaneya ji hejmarekê daxistina yeke dîtir, (-)

**kêmendam** kesê ku endamekî wî nivîşkan e

**kêmendazî** tevgerîna ne li gorî pêwistiyê

**kêmendazî kirin** *(peywir li gorî pêwistiyê)* bi cih neanîn

**kêmî** **1.** hindikayî **2.** biçêxî **3.** kêmasî

**kêm kirin** **1.** hindik kirin **2.** daxistin **3.** jê birîn

**kêmlebat** kesê nivîşkan

**kêmlebatî** rewşa nivîşkaniyê; seqetî

**kêmnetewe** gelê kêmar

**kêmxwînî** cureyekî nexweşiyên ku têkildarî xwînê ye

**kêr [I]** fêde, sûd

**kêr [II]** alava qutkirinê *"**kêr,** kalanê xwe nabire"

**kêrakî** roja yekşemê

**kêran** darê stûr ê ku davêjin ser banekî fireh û ên biçûk jî li ser wî datînin; garîte

**kêrik** **1.** kêra berikê **2.** kêra kalanî *"hesinê bê esas, ne dibe **kêrik** ne jî das"

**kêr kirin** **1.** bi alava qutkirinê birîn **2.** hesta yekî herişandin **3.** bi kêrê lê xistin

**kêrnehatî** **1.** bêkêr **2.** bêfayde **3.** jinkok/mêrkok *"jina **kêrnehatî,** avê dirijîne û dibêje: 'xêr e' "

**kêrtik [I]** kewre

**-kêrtik kirin** bi kewreyê tûj kirin

**kêrtik [II]** girtik, girnoz

**-kêrtik-kêrtikî kirin** **1.** girtikgirtikî kirin **2.** qelîştekên biçûk tê de çêkirin

**kêş [I]** kêşan *"diran biêşe, derman **kêş** e"

-**kêş û vekêş 1.** birin û anîn, kaş û berkaş **2.** bilindbûn û daketina ava deryayan; med û cezr
**kêş [II] û mêş 1.** heşerat **2.** bihok **3.** kêzik
**kêş [III] 1.** pîvan **2.** di pîvanê de wekhevî
**kêş [IV] 1.** keyskirî **2.** tiştê baş jenandî
**kêş [V]** erdê ku bi ava lîçan tê avdan
**kêş [VI]** kesê ku bûjenên sermestiyê dikêşe
**kêş [VII]** doz
**kêşan/dikêşe/bikêşe 1.** neqil kirin **2.** pîvandin **3.** dûyê baçikê hilkişandin gewriya xwe
**kêşbar** mal û milkê ku raguhastina wan pêkan e
**kêşe 1.** arîşe, gelemşe, mesele **2.** hevseng
-**kêşeya neteweyî** meseleya miletekî
-**kêşeyên navneteweyî** hevsengên di navbera koma gelan de
**kêşim** bejn û bal
**kêşwer** cazibedar, baldiz
**kêvjal** kevjal
**kêvrîşk/kêvroşk** sewaleke giyaxur a ku lingên wê yên pêşîn kin in û bi beza xwe ve navdar e, kerguh *"adarê **kêvrîşk** sibehan xwîn dimîze, nîvro xwe davêje ber siya darê"
**kêz** cureyekî bihukan e
**kêzgilolk** kêzika gûgerîn
**kêzik** kêza biçûk
**kêzim** kêzim
**kêzîn [I]** kîzên
**kêzîn [II] 1.** borî, lûle **2.** cihoka binaxeya gemarê **3.** gizirîna tiştê avî
**kêzîn kirin 1.** *(tiştê avî)* ji ber çûn **2.** gizirandin
**kêzm 1.** darê ku wekî piştekê tê bicihkirin **2.** sing, şêt
**kiç** *(di zimanê zarokan de)* şikestî
**kiç bûn** *(di zimanê zarokan de)* şikestin
**kiç kirin** *(di zimanê zarokan de)* şikandin
**kifş 1.** diyar **2.** vekirî **3.** berbiçav **4.** xuya *"destên helawxuran, timî **kifş** in"
**kifş bûn 1.** diyar bûn **2.** xuya bûn
**kifş kirin 1.** diyar kirin **2.** xuya kirin
**kihêl** hespê çê *"**kihêl,** di bin mêrxasan de dibezin"
**kil [I]** dermanekî reş î ku li çavan didin da ku bedewiyê bide û êşan bibire
-**kil kirin** çav bi kilî reş kirin *"kesê ku ket dawetê, dê xwe **kil bike**"
-**kil ji çavan dizîn** di ki-

rêtiyê de pispor bûn
**kil [II]** her careke çelqandina meşkê
**-li kilê xistin 1.** meşka dêw kiyan **2.** di hêlekanê de hejandin
**kilam** stran, goranî *"heft **kilam**ên hirçê hene, hemî jî li ser hirmiyan e"
**-kilamên serhewa** stranên rûniştî yên dirêj
**-kilam avêtin ser yekî** di stranê de qala yekî kirin
**kilambêj** stranbêj *"heke **kilambêj** destê xwe danî ber guhê xwe, dizane dê çi bibêje"
**kilandin/dikilîne/bikilîne 1.** *(bi meşk an jî sirsûmê)* dew kiyan **2.** wekî kiyanê hejandin
**kilaw** pûşiya serê jinan; mêzer
**kilb** mixê dirêj û stûr; mûrç
**kilçan** çiraya destan
**kilçêv** pênûsa kilkirinê
**kildan** derdana ku kil tê de tê parastin
**kilekil** dengê domdar ê ku ji kiyana meşk an jî sursûmê tê
**kilêb** alava kaxkirinê
**kilisandin/dikilisîne/bikilisîne** bi hev ve zeliqandin
**kilimkotî 1.** kesê ku ser û sîçeyê wî baş naxuye **2.** tiştê ku xuyana wî li mirovî xweş nayê
**kilîl 1.** mifteh **2.** zirze *"**kilîl**a malê, bi deriyê gomê nayê"
**kilîl kirin 1.** dadan **2.** zirze kirin *"derê xwe rind **kilîl ke,** cîranê xwe diz dermexe"
**kilîkilî** darkutik
**kilîn/dikile/bikile 1.** *(mast)* hatin kiyan **2.** wekî kiyanê hejîn
**kilor** kade
**kilox** qafê sêrî, tepa sêrî
**kils** xweliyeke ji kevirê spî yê nerm tê çêkirin û xanî pê tên boyaxkirin/ seyandin *"derba evdan, esasê **kils**ê ye û xera nabe"
**kij** seqa
**kijûr** arîk
**kimê** parçeyê ku pê devê derdankên şûşeyî tê girtin
**kimil 1.** kaw û kibar **2.** qure
**-kimil kimil meşîn** qure qure bi rê ve çûn
**kin 1.** kurt, nedirêj **2.** qol *"kirasê hesûdan, hemasa **kin** e"
**kinahî 1.** kurtî, nedirêjahî **2.** qolî
**-bi kinahî** bi kurtasî
**kinare** alaveke mûsîqayî ye, ûd

**kin bûn** **1.** kurt bûn **2.** vekişîn **3.** qol bûn
**kinc** çek, libas, cil ***"kinc**a ku ket ber pîneyan û serê ku ket ber şîretan, bi kêrî tiştekî nayên**"**
**-kinc li xwe kirin** çek/cil li xwe kirin
**kind** **1.** zilet, ketîtî **2.** bêrûmetî
**-kinda tirs û birsê** bêrûmetiya newêrektî û zikbirçîtiyê
**kindik** rindik û çîçik
**kindir** bendê stûr ê pemboyî yê ku piranî pê devê telîsan tê dirûtin
**kinêr** birîna ku tê de kêm civiyaye hev; kînor
**kinêzet** **1.** şirdan **2.** silsile, xeleq
**king** hêt
**kinik** **1.** bejnkurt, xirdik **2.** qolik
**kin kirin** **1.** kurt kirin **2.** vekişandin **3.** qol kirin
**kinoş** bexîl, çikûs
**kinoşe** gêzî, siqayîl
**kinûş** rengê benefşî yê lap vekirî
**kir [I]** guhê kin, kur
**kir [II]** îş û çalakî
**-kira xwe kiranî kirin** **1.** tenê bi gotina xwe kirin **2.** dora xwe nedan tu kesî **3.** mafê xwe bi ser kesî ve bernedan ***"**bi dinê bişêwire, **kira xwe** jî **kiranî bike"**
**kir [III]** îşkar ***"**kiran **kir** û nekiran ji xwe re bir**"**
**kiranî** kirarî
**-kiranî kirin** hesab kirin
**kirar** *(r)* di hevokê de xwediyê çalakiyê; fail, kirox, kirde
**kirarî** **1.** hesab **2.** xwedîtî **3.** kirdetî
**kiras** kinca tenik a ku di bin de tê lixwekirin ***"**bej na heyranê, her **kiras** lê tê**"**
**-tim di kirasekî de man** **1.** her xizan û bi awayekî bêhêz man **2.** nan dîtin û bêav man
**-kirasê bêpêsîr li yekî kirin** tiştê nemayî anîn sêrî û kepaze kirin
**kirdan [I]** darikê ku gilfika hêvîr pê tê mehtkirin û vekirin; kerdenek, hestîvk
**kirdan [II]** egîd û jêhatî
**kirdar** karguzarê fermanên xwediyan
**kirdarî** karguzariya fermanan
**kirde** kirar
**kirdetî** sexbêriya karekê pêkhatî
**kirekir** dengê domdar ê ji hêrana tiştê hişk tê
**kirekir kirin** ji ber hêrana tiştekî mînanî şêkir û hwd deng derxistin

**kirê** heqê ku berdêla tiştekî kirêkirî ye; deman
**-kirê kirin** tiştek heta maweye kifşkirî bi berdêlekê dan kesekî din; deman kirin
**kirêt** **1.** qirêj **2.** gemar **3.** sik, lewitî
**kirin/dike/bike** **1.** pê kanîn **2.** bi cih anîn **3.** danîn *"tiştê ku destan **kir,** kesan nekir"
**kiriyar** bikirê daîmî
**kiriyarî** kirîna daîmî
**kirîger** bikir, muşterî
**kirîn/dikire/bikîre** **1.** standin **2.** bi berdêlekê tiştek wergirtin
**-kirîn û firotan** standin û dayîn
**kirîv** kesê ku zarok di pêşa wî de tê sinetkirin
**kirîvî** kesên ku bi sinetkirina zarokan a di pêşên hev de bûne dostên hev *"mirîşk û rovî, danaynin **kirîvî"**
**kirkirk** xaşxaşk
**kirkirik** xurtxurtûk
**kirkirîn/dikirkire/bikirkire** *(dil)* bijîn û daxwaz kirin
**kirkirok** boriya ku xwarin tê re derbasî aşikê dibe
**kirman** duz, keleh
**kirnoş** secde
**kirp [I]** levenê ter ê ku jê ka tê bidestxistin
**kirp [II]** *(r)* giraniya dengê ku ji devan belav dibe
**kirpandin/dikirpîne/bikirpîne** *(r)* **1.** li serê rawestîn **2.** giranî dan ser **3.** kirekir kirin
**kirtemûk** cureyekî çêreyê ye û nepijî tê xwarin
**kirt** **1.** dengê kotinê **2.** bertîl, qirt **3.** parçe
**-kirt û pehn** serobero, keteber
**kirtekirt** dengê domdar ê kotina tiştekî hişk an jî nîvhişk
**kirtekirt kirin** ji ber kotina tiştekî hişk an jî nîvhişk deng derxistin
**kirtik** parçe
**kirtik-kirtikî** parçeparçeyî, parparî, zîvalzîvalî
**kirtopk** kartol
**kirû** rûdan, bûyer
**kirûr** hejmara nîvmîlyonê
**kiryar [I]** xwediyê çalakiyê; fail, kirox
**kiryar [II]** pêkanîn
**kisp** kusp
**kispik** kuspik
**kiş** **1.** beradana sewalên bibask **2.** banga navtêdana kûçikan
**kişandin/dikşîne/bikşîne** **1.** kaş kirin **2.** pîvandin
**kişik** lîstika mîran/lîstika sedrencê
**kişîn/dikişe/bikişe** **1.**

herikîn **2.** vekişîn **3**. *(sewalên marîjok)* meşîn *"av **dikişe,** lê aş li cihê xwe dimîne"

**kiş kirin 1.** nav tê dan **2.** teşwîq kirin

**kişkişandin/dikişkîne/bikişkişîne** xwe wekî maran bi erdê erd re kişandin

**kişkişî hev kirin 1.** kesek/segek berdan kesekî/segekî din **2.** nav tê dan

**kişt û kal** çandinî, ziraet

**kit 1.** lib, heb **2.** fer

**-deh kitî salan 1.** deh salan li ser hev **2.** tam deh salan

**kitan 1.** cureyekî qumêş e **2.** kincên ji vî qumaşî

**kitêb** pirtûk

**kitik** pisîk

**kit kirin** gez kirin

**kitkitî** tartarî

**kitkitî bûn** yek li vir û yek li dera han bûn; tartarî bûn

**kitkitî kirin** yek danîn li vir û yek li dera han; tartarî kirin

**kiwê** ko

**kix** *(di zimanê zarokan de)* qirêj û gemarî

**kix bûn** *(di zimanê zarokan de)* qirêj û gemarî bûn

**kix kirin** *(di zimanê zarokan de)* qirêj û gemarî kirin

**kiyan/dikê/bikê 1.** mast di meşkê de kilandin **2.** çelqandin *"ê ku dêw **dikê,** qunê jî ba dike"

**kiz [I]** bêhna kizirînê *"bîna **kiz,** tê ji mala diz"

**kiz [II]** mirovê ku baş li ser û sîçeyê xwe dinêre

**kiz [III]** zû û hêsa

**-kiz girîn 1.** bi hêsanî girîn **2.** zûzûka girîn

**kizgiriyok 1.** kesê ku bi hêsanî digirî **2.** kesê ku zûzûka digirî

**kizik** kezî, kirtkirtîk

**kizin [I]** xortê ku hîna simbêlên wî dernehatine

**kizin [II]** erdê ku ne berdar e *"mêrê serjinik, berxê mîjo, şûva bi **kizin** tu tişt jê dernayê"

**kizirandin/dikizirîne/bikizirîne** pûrta ser çêrmî bi êgir şewitandin *"agir girtibû mala yekî, yekî jî ser û pê ber **dikizirandin"**

**kizirîn/dikizire/bikizine 1.** pûrta ser çêrmî bi êgir şewitîn **2.** ji dil û hinavan şewitîn

**kizîr 1.** wezîr **2.** şêwirmendê mîr **3.** navberkar *"ez mîr tu mîr, kî dê bibe **kizîr"**

**kizwet 1.** qiyafet **2.** ser û

sîçe
**kî** çi kes *"mêr tev mêr be, jin tev jin be, **kî** dê muhtacê kê be?"
**kîjan** ji wan çi kes/tişt *"divê mirov zanibe ku serê mirovî li ser **kîjan** kevirî ye"
**kîn** hest û daxwaza tolhildanê
**-kîn girtin** hest û daxwaza tolhildanê hewandin
**kîndar** xwestiyê tolhildanê
**kîp** **1.** qayîm **2.** şidiyayî
**-kîp kirin** **1.** şidiyayî girêdan **2.** guvaştin **3.** têkûz kirin
**kîper** dorana zirav
**kîr** endamê mêraniyê û nêrtiyê; mûzî, qemo, xir *"betal ma û **kîr**ê bavê xwe da ber dasan"
**kîs** **1.** derdanê biçûk; tûrik **2.** derdana diravan; peldank *"ew mirov nezan e, ê ku aqilê wî ji **kîs**ê xelqê be"
**kîsik** tûrikê biçûk
**kîso** kûsî *"**kîso** jî hêkên xwe dixe bin axê û dibêje: 'heke Xwedê viyabe dê derxe' "
**kîşwer** **1.** werza hewayî ya deverekê; îqlîm **2.** welat, herêm
**kîte** *(r)* dengê ku bi carekî de ji devan belav dibe
**-kîte bi kîte** bi hûrgilî, bi berfirehî
**kîtandin/dikîtîne/bikîtîne** *(r)* parçe bi parçe peyv bi lêv kirin
**Kîwan** gerestêrkek e
**kîzên** **1.** destşok **2.** hemama serşûştinê
**Ko [I]** gerestêrkek e
**ko [II]** alavên qutkirinê yên ku devê wan nabire û divê bên tûj kirin
**-ko bûn** *(alava qutkirinê)* tujiya xwe winda kirin
**-ko kirin** *(alava qutkirinê)* tujî jê birin
**ko [III]** di germê de şîştirgirtin û sefgirêdana pezê spî, kiwê
**-ketin koyê** *(pez)* ji ber germê serê xwe kirin bin zikên hev û rawestîn
**koc** kilîla ku bi ser ve davêjin ser deriyan
**koç** **1.** hicret, barkirin **2.** penaberî *"zozanvanî rabûn **koç**ê, aranvaniyan da bin boçê"
**koçber** **1.** muhacir, barkirî **2.** penaber
**koçberî** **1.** hicret, barkirin **2.** rewşa penaberiyê
**koçek** **1.** semajen, reqase **2.** zanayê êzidiyan
**koçer** **1.** muhacir **2.** kesê ku ne şêniyê tu cihî ye *"ava çeman xwişexwiş e, **koçer** nabêjin: 'dewê

min tirş e"

**koçerî 1.** rewşa neakincîbûnê; muhacirtî **2.** lîstikeke govendê ye *"**koçerî**, jê dûr e rencberî"

**koçêre** koderî

**koçik** hêwana pêşwazîkirina mêvanan

**koçk** qesr û sera

**koç kirin** *(ji cihekî ber bi cihekî din ve)* bar kirin

**kod 1.** derdana ku pê zad tê pîvan **2.** elb *"**kod**a tijî, bi a vala mede"

**koderî 1.** demana çêreya erdekî **2.** cureyekî pirtiyê ku jin jê kirasan didirûn; çît

**kodik** elbik *"kebanî bûn sisê, **kodik** çûn ber sê"

**kodqelên** sedemê bêyomî û teşqeleyan; serxur

**kofî** cureyekî pûşiya serê jinan a gelêrî ye *"jinê got: mêrik min ji te re zarokek anî, **kofî** û kitan danî"

**koga** firoşgeha mezin

**koh 1.** çiya, gir **2.** kir

**kok [I] 1.** reh û rîçal **2.** tar û hîm *"her giya li ser **kok**a xwe şîn tê"

**-koka zer** zehferana Hindistanê

**kok [II]** qelew

**-kok bûn** qelew bûn, bi goşt bûn *"bet çiqasî **kok dibe,** ewqas cih lê teng dibe"

**-kok kirin** qelew kirin, dermal kirin

**kokim** kal û pîra hizhizî

**kokiresî** bah, şehwet

**kokos** cureyekî alava titûnkêşiyê ya ku qelûna wê xortimkî ye; nargîle

**kol [I] 1.** kêrt **2.** girê biçûk ê ku ji erdê zêde ne bilind e

**kol [II]** bêqiloç *"bizina **kol** hînî danûyan bibe, îflah jê nabe"

**kol [III]** deyûs

**kolan 1.** cade, paxan **2.** kuçe, ziqaq *"**kolan,** tu carî nakevin bi ser banan"

**kole 1.** bende, evd **2**. xulamokê berjewendiyên xelqê

**koledar 1.** erka ku bendetiyê li ser gelan ferz dike **2.** xwediyê bendeyan

**koletî 1.** bendetî **2.** olamkarî

**kolê** deyûs

**kolik 1.** malika biçûk **2.** xaniyê kavilbûyî

**-kolik lîstin** malikanî -ya ku lîstikeke zarokan e-lîstin

**kolîn/dikole/bikole 1.** erd qelaştin **2.** kûr kirin *"mezbût **bikole** esas, ji bo ku dil neke wasewas"

**-lê kolîn 1.** lê gerîn **2.** bi

kûrbînî lê nêrîn
**kolîtik** qelaxa kermeyan
**koloz** kumê ji hiriyê
**kom** civat *"agir berda **kom**ê, xwe da fêza zomê"
**komar** pergala ku ramana gelemper tê de serdest e, cumhûriyet
**kombers** alava ku agehiyan bi awayekî dîtbar, bihîstwer û nivîskî kom dike û radigihîne; xêvjimêr
**kom bûn** **1.** civîn **2.** col bûn
**kome** **1.** girse **2.** zumre
**komel** **1.** civat **2.** cimaet
**komelayetî** civakî
**komele** tevgera komeke mirovan a ji bo armanceke zagonî an jî derzagonî
**komik** civata piçûk
**komir** **1.** segê ku baş hatiye xwedîkirin **2.** zordar û sitemkarê têrxwarî
**komir bûn** **1.** seg *(ji ber xwedîkirineke baş)* qelew xuya bûn **2.** bi hil û heramiyê têr bûn
**komir kirin** **1.** seg baş xwedî kirin û qelew kirin **2.** bi hil û heramiyê têr kirin
**komkarî** karê ku ji aliyê piraniyekê ve tê pêkanîn
**komkeştî** di hêzên deryayî yên artêşê de komasiya keştiyên leşkerî
**kom kirin** **1.** civandin **2.** berhev kirin
**komkujî** qetliyam, qir
**kompere** diravên ku ji bo mebestekê hatine civandin
**komstêr** stêrên ku nêzîkî hev in û bi şiklekî xweser komekê çêdikin
**kon** malika ku ji mû û qumaşê sext tê çêkirin, bi stûn, sing û werisan li piyan tê girtin; reşmal, xêvet *"gundê bê rez, **kon**ê bê pez, mirovê bibêje ez û ez hemî ne tu tişt in"
**-kon vegirtin** reşmal ava kirin
**kone** **1.** hişyar **2.** dekbaz
**konik** tevnika pîrhevokê
**kop** goc, qop
**kopal** gurzê giyayî
**kopare** palanê hêştiran
**kopel** lûtke
**kopî** gocî, qopî
**kop bûn** goc bûn
**kop kirin** goc kirin
**kor** kesê ku çavên wî nabînin; nebîna *"ji çavê **kor, r**onahî nayê xwestin"
**kor bûn** nebîna bûn
**korderzî** derzîreq
**kordûnde** **1.** wareş, bêzarok **2.** kesê ku zarokên

wî yên kurînî tunene
**korebîn** kesê ku dîtina wî ne erênî ye; bedbîn
**koreçemk** **1.** kesê ku feraseta wî aloz û genî ye; ferasetkor **2.** genefis
**koremar** marê kor *"filan kes **koremar** e"
**koremişk** mişkê kor
**korerê** kuçeya ku pêşiya wê girtî ye
**korik [I]** ronahiya boş
**korik [II]** di simbilê de liba xerabî ya ku bûye rijî
**koritî** rewşa nedîtina çavan
**korîgan** cureyekî ketan e û kulîlksor e
**kor kirin** **1.** nebîna kirin **2.** çav derxistin **3.** ko kirin
**kort** çal
**-kort bûn** kûr bûn
**-kort kirin** kûr kirin
**kortal** **1.** kendal **2.** çala kûr **3.** hendef *"kor bi destê kor bigire, dê tev têkevin **kortal**ê"
**kortik** çalika biçûk
**-kortika qûnê** qelîşteka qûnê
**kosp** asteng
**koşîn/dikoşe/bikoşe** ketin hevrikiyê
**kotek** lêdan
**kotekî** bi darê zorê
**kotel** avahiyê ku ji bo bîranîna bûyerekî li cihê bûyerê tê avakirin
**koter** xemla stûyan
**kotewarî** tenezul, daqûlî
**kotin/dikoje/bikoje** bi diranan gest kirin û xwarin *"dar bi **kotin**ê, însan bi gotinê"
**kotir** kevok
**kotkoto** kesê ku gotegota wî êdî her kesî aciz dike
**kov** **1.** xwarbûna ber bi hundir ve **2.** hotik
**koval** helezonî, levaliyayî
**kovan** **1.** xem û keder **2.** derd û keser **3.** bêrî
**kovar** weşana li gorî demeke diyarkirî
**kovik** alava rêtinê ya ku pê tiştê avî li derdaneke devbiçûk tê neqilkirin *"aqil, bi **kovik**ê nekirine seriyan"
**-kovika qûne** qelîşteka ku li nava her du hêtan e
**kovî** **1.** hov **2.** wehşî
**kox** **1.** xaniyê xerabûyî **2.** kenefe **3.** punga mirîşkan; koxik
**koxik** cihê ku mirîşk, werdek û hwd lê tên êwirandin
**koy** çiya
**koyistan** erdê çiyayî
**koz** êwirgeha berx û karan *"berxê xelqê, di **koz**a mirovî de mezin nabe"
**kozere** kaya girs; qesel

**kozik** çeper, sîber, qelaçe
**-kozik danîn** kemîn û tele danîn
**ku [I]** gihanekek e
**ku [II]** **1.** heke **2.** eger
**ku [III]** kîder *"ker bi **ku** de here jî cardin ker e"
**kubar** kaw û nazik
**kubarî** kawî û naziktî
**kuç** **1.** kuncik **2.** kevir
**kuçe** riyên di nav bera avahiyan de; ziqaq *"dawiya derewan, **kuçe** ye"
**kuçik** sê kevirên ku datînin bin sîtilên ser êgir, xaçirgan *"agirê **kuçik**an, timî germ e"
**kuçke** riya ku dawiya wê girtî ye *"dawiya derewan, **kuçke** ye"
**kudandin/dikudîne/bikudîne** **1.** vekişîn **2.** domandin *"dijminatî bi kuştinê, rê bi **kudandin**ê"
**kudik** **1.** têjika hirçê **2.** têjika hêştirê *"dema ku hirç pîr bû, **kudik** bi gunikên wî dilîzin"
**kufik** afnik
**kufikî** afnikî
**kuj** goşe, guç, çim
**kujer** kuştox, qatil
**kujme** miqdar
**kukurd** kurkût/kerkût
**kul** **1.** birîn **2.** keser **3.** derd *"çavê bi**kul,** ji yê kor çêtir e"
**-kulê bixwe!** ziqûm û jehrê bixwe!
**kulab** **1.** çakil **2.** pençe
**kulang** sermil
**kulav** **1.** raxistina ku ji livayê hatiye çêkirin **2.** baraniya şivanan a ku ji hiriyê ye
**kulb** têrnexur
**kulbe** kilêb
**kule** perdeyeke tenik a ji bo xweparastina ji pêş û mêşan; tulbend
**kulek [I]** pêseqet, lingor, pêgoc *"baz bi bazan, qaz bi qazan, mirîşka kor bi dîkê **kulek re**"
**kulek [II]** **1.** paceyên bi ser banê avahiyê ve **2.** kunên bi ser banan ve *"diz û malxwe bibin yek, ga ji **kulek**ê re jî dertê"
**kuleke** kulek, lingor
**kuleng** derdanka darînî ya ku tiştên avî dikinê
**kulêmek** her du hestiyên ku lingan bi gewdeyî ve girêdidin
**kulfet** zar û zêçên mirovî *"**kulfet,** şûrê dudev in li pişta bavan"
**kulfik** **1.** di tenûran de kuna dûkêşk **2.** kunên bêfilan **3.** kunên di goman de wekî kulekan dihêlin *"beza pisîkê heta ber **kulfik**ê ye"

**kulibîn/dikulibe/bikulibe** **1.** ji ser hiş çûn **2.** har bûn **3.** zû birçî bûn *"mitrib **kulibî,** def qetiya"

**kulik** nexweşiya ajalan a ku dibijine mirovan û ajalên din jî

**kulindir** kundirê ku hundirê wî tijî goştê hêrandî dikin û wisa dipijînin

**kulî [I]** hespê pîrê

**kulî [II]** libên berfê *"ha **kulî** xwar, ha qulî xwar"

**kulîçe** **1.** kadeyên hûrik **2.** bîşî

**kulîlk** bişkuya serê çêre û çiqilê darê ya ku rengrengî vedide *"demek a **kulîkan** e, yek a sosinan e"

**kulîn/dikule/bikule [I]** **1.** gocegoc meşîn **2.** lingîrî bi rê ve çûn

**kulîn [II]** **1.** jûra erzaq û nivînên malê **2.** di reşmalê de beşa ku ji bo erzaqê malê hatiye veqetandin *"barana havînê, şil nekir binê **kulîn**ê"

**kulkulîn/dikulkule/bikulkule** bi zor û zehmetî xwe bi erdê re kişandin û wisa meşîn

**kulm** **1.** kefedest, felqedest **2.** çeng, gulmist *"bi **kulm**an meçin dirêşê"

**kulovank** gopika sêrî

**kum** pûşiya serê mêran *"derziya xwe, di ber **kum**ê serê xwe re kir"

**-kum avêtin** pev çûn

**-kum dirandin** rik hatin, bihêrs bûn

**-kum ketin çavan** **1.** di rewşeke nebaş de bûn **2.** fors lê şikestin

**-kumê yekî li serê yekî din bûn** di kar û tevgerê de şibihîn hev

**kumik** serê kuvarkan

**kumişandin/dikumişîne/bikumişîne** **1.** hilweşandin **2.** daqurtandin

**kumişîn/dikumişe/bikumişe** **1.** hilweşîn **2.** helîn

**kumzirx** puşiya seran a ku ji tundiya derbeyên derveyî diparêze

**kun** **1.** qulik **2.** qûn

**kuncik** quncik *"jina xelqê ramûsanek e li **kuncik**ekî, hespê xelqê meydanek e li pêşbirkekî"

**kuncî** cureyekî zadê ku jê rûn tê bidestxistin û bi ser kadeyan de tê reşandin

**kund** cureyekî teyrên şevê ye; bûm *"gotine: '**kund**o mirî pir in an zindî?' gotiye: 'zindiyek tenê zêde ye, ew jî di bin

emrê jinê de ye' **"**
**kundêle** têjika berazî
**kundir [I]** cureyekî sewzeyan e û pijandî tê xwarin *"**kundir**ê mîranî, çêtir e ji şekirê şîranî**"**
**kundir [II]** mirovê bêkêr
**kunêr** kînor
**kunker** alava ku pê tiştan qul dikin
**kur [I]** law, zarokê nêrîn *"mêl ne ji **kur**ê qenc re dayne, ne jî ji **yê xerab re"**
**kur [II]** sewala ku guhên wê biçûk in
**kur [III]** li zozanan erdê nermehur *(bê kevir)*
**kurap** lawê apî; kurmam
**kurbeşk** cureyekî sewalên çolê ye
**kurd** gelê ku ji Tofanê virdetir li Navçêmkê û doraliyên wê dijî
**kurdayetî** kurdbûn
**kurdewerî** têkildarî neteweya kurd
**kurdî** zimanê gelê kurd
**kurdînas** pisporê ziman û wêjeya kurdî
**kurdnas** pisporê çand û dîroka gelê kurd
**kureke** kesê ku ji bilî xwarin û rîtinê bi kêrî tiştekî nayê
**kurik** lawik
**kurisandin/dikurisîne/bikurisîne** **1.** kotin û hêrandin **2.** peritandin û pizirandin **3.** komir kirin
**kurisî** hêrandî û pizirî
**kurisîn/dikurise/bikurise** **1.** dan kotin û hêrandin **2.** peritîn û pizirîn **3.** komir bûn
**kurî** **1.** cehşik **2.** caniya viringî *"aqilê **kurî,** caniya dêlî**"**
**kurk** keçêça hêkşêlandin û cûcikderxistina ajalên bibask ên malê û firindeyên çolê
**-ketin kurkê** **1.** *(ajalên bibask û firindeyên çolê)* li ser hêkan melisîn û cûcik derxistin **2.** *(mirov)* di cihekî de rûniştin û derneketin derve **3.** pir egle bûn
**kur kirin** **1.** kurtisandin, qusandin **2.** tiraş kirin *"kê karê pir kiriye, keziya xwe **kur kiriye"**
**kurm** cureyekî bihukên biçûk e; dikeve birînan, fêkî û sewzeyan û wan xera dike
**-*(dil)* kurmê tiştekî kişandin** xwestin û dil kirkirîn
**-kurm tê de gerîn** **1.** netebitîn **2.** bi tatêla tiştekî de hilketin û daketin
**kurmam** kurap, pismam
**kurmanc** **1.** milekî gelê kurd e **2.** kesê ji vî milî

**kurmancî** **1.** zaravayê herî berbelav ê zimanê kurdî **2.** têkildarî dab û nêrîtên kurmancan
**-kurmanciya reşbelek** axaftina ku her kes tê digihêje
**kurmet** lawê meta mirovî
**kurmî** tiştê ku kurm ketinê
**kurmî bûn** ji ber ketina kurman xerab bûn
**kurn** **1.** hewzê avê **2.** afirê ku ji textikan çêdikin û bireke pêz dikare tê de ka û cehî bixwe
**kursî** rûniştekeka ku li ser çar pepikan disekine
**kurt** kin û nedirêj *"emrê xayinan **kurt** e, dilê wan pirtepirt e"
**-kurt û kurmancî** bêyî ku axaftin dirêj bibe
**kurtayî/kurtasî** kutahî
**-bi kurtasî/kurtayî** bi kinahî
**kurtan** palanê ker û hêştirê *"ker, bê **kurtan** naçe êş"
**kurtane** heriya ku pê dîwar tên seyandin
**kurtane kirin** dîwar bi heriyê seyandin
**kurt bûn** kin bûn
**kurte** **1.** muxteser **2.** kineber
**kurtebirî** gotina kin û kurt; bi kinayî
**kurtepist** paşbêjî
**kurtêl** bermayiya xwarinê
**kurxal** lawê xalê mirovî
**kurxaltî** lawê xaltiya mirovî
**kuskî** derdanka darînî û mezin a ku şerab tê de tê meyandin
**kuskusandin/dikuskusîne/bikuskusîne** çavên xwe korevîçkî vekirin û girtin
**kusp** kesê kin û qelew
**kuspe** **1.** qalikên silqan **2.** her cure xwarina xurt a ku pê sewalan dermal dikin
**kuspik** xirdikê kok
**kuspo** kusp
**kuşim** qerf û tinazeyên soxkirinê
**-li kesekî kuşim kirin** ji bo soxkirinê bi yekî tinaze kirin
**kuşte** kilsa zeliqok a ku pê dîwar tên seyandin
**kuştin/dikuje/bikuje** **1.** mirar kirin **2.** qetl kirin **3.** ji holê rakirin *"ji kuştiyê di ber xelqê re bibêjin ku wî ez **kuştime"**
**kuştî** **1.** kesê ku hatiye kuştin; meqtûl, mirarbûyî **2.** kesê ku kuştiye; qatil, kujer
**kuştox** qatil, kujer
**kuta** **1.** dawî **2.** encam

**kutahî** **1.** dawiya dawiyê **2.** aqibet
**kuta bûn** **1.** qedîn **2.** xelas bûn
**kuta kirin** **1.** qedandin **2.** xelas kirin
**kutan/dikute/bikute [I]** **1.** lê xistin **2.** çikilandin, çikandin **3.** sihirandin, gayîn *"dilê tirsok, timî **dikute**"
**kutan [II]** lêdan
**kutek** **1.** mîrkut **2.** spartek, stûn
**kutilk** xwarineke û ji goştê hêrandî tê çêkirin
**kuvarik** cureyekî çêreya ku wekî sîwanan hêşîn dibe û pijandî tê xwarin; kumik, karî
**kuwar** **1.** cihê ku mêşa hingivî tê de hingivî dihêle **2.** enbara zêd, çala gênim *"qûtê **kuwa-r**ê, heta biharê"
**kuxik** **1.** zekema gewriyê **2.** kuxtekuxta ji kezeb û pişikê
**kuxîn/dikuxe/bikuxe** **1.** bi zekema gewriyê ketin **2.** kuxtekuxt kirin
**kuxtekuxt** kuxîna bi ser hev
**kûç** sewala kol *(a bê qiloç)*
**kûçik** seg *"**kûçik,** bi kurman namire"
**kûp** cêr
**-kûpê aqilan** şêwirmendê zana
**-kûpê şerabê** kesê ku herdem sermest e
**kûpik** şerbikê biçembil; cêrik
**kûr [I]** di lêş de valahiya bêhestî ya ku doran tê de ne; navzik
**-erik kûra zikê wî çendel e!** peh peh zikê wî wekî terikekî ye!
**kûr [II]** binê wê dûr û ne tenîsk *"çiyayên bilind bê rê nabin, newalên **kûr** bê av nabin"
**kûrahî** bindûrî, netenîskî
**kûr bûn** *(binî)* dûr bûn, netenîsk bûn
**kûre** semaxa hesinkaran; hêtûn
**kûrevan** kesê ku ber kûreyê dixebite
**kûrebîn** dûrebîn
**kûrekûr kirin** *(bi deng)* kiz girîn
**kûrik [I]** pûrta ku li ser rîs û kincên hûnandî dikeve
**kûrik [II]** kûreya êgir a biçûk
**kûrîn/dikûre/bikûre** **1.** zûrîn **2.** kiz girîn
**kûr kirin** **1.** baş kolandin **2.** kort kirin û li binî asê kirin
**kûsik** şûşe
**kûsî** heywaneke ku hem di bejiyê de hem jî di avê

de dijî û bi qalik e *"dibêjin: '**kûsî** tu çima pîs î? dibêje: 'Xwedê li eniya min nivîsî"
**-kûsiyê dêm** kûsiyê ku dûrî avan dijî
**-kûsiyê avî** kûsiyê ku di avan de dijî
**kût** nanê ku baş nepijiyaye û didine kûçikan
**-kût xwarin** bertîl xwarin
**kûtî [I]** kûçik, tûle
**kûtî [II]** kesê ku bi nexweşiya cuzamê ketiye
**kûtî bûn** bi nexweşiya cuzamê ketin *"hebûn strûyê mêran e, tunebûn **kûtîbûn** e"
**kûto [I]** zarokê kurînî yê viringî
**kûto [II]** tûle
**kûz** **1.** cêrê avê **2.** cêrê ku berê gencîne tê de vedişartin *"ha kevir li kûzî ket, ha **kûz** li kêvir ket"
**kûze** cureyekî heywanên bêhnkirêt e
**kwîrinc** livajen
**kwîrincî** livajenî
**kwîstan** zozan

# L

**l/L** tîpa pazdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê diranî ye û awayê belavbûna wê herikî û rexkî ye
**la** **1.** alî, hêl **2.** kêlek
**labikandin/dilabikîne/bilabikîne** **1.** tev li hev kirin **2.** lewitandin
**labikîn/dilabike/bilabike** **1.** lewitîn **2.** tev li hev bûn
**lac** law, kur
**lacik** lawik, kurik
**laçik** pûşiya serê jinan *"li bejnê nêrî, bi zêran kirî, **laçik** rakir kerika gurî ye"
**-laçika jinan dan serê xwe** ji mêraniyê ketin û bênamûsî qebûl kirin
**laçin** cureyekî solan e
**ladan/ladide/lade** ji rê derketin
**laf** gotin
**lafazan** kesê ku dizane gotina wî digihê kîderê
**laflafok** çêreya badayî
**lahorî** cureyekî şûrên Hindistanê ye
**lajwerd** bûjena ku bi şêweyên curecureyî ji madenan hatiye bidestxistin
**lak** **1.** kûtê kûçikan **2.** hoçik **3.** bekereya ku davêjin ser kombersê
**lakîn** derdana ku ji bo xwarin û vexwarina kûçikan tê veqetandin; savêr
**lal** **1.** bêzar û bêziman **2.** tat *"azadî hat dinê, zimanê **lal** hat vekirinê"
**lal bûn** **1.** tat bûn **2.** aniqîn
**lalengî** cureyekî porteqalan e û qalikê wan zûtir jê dibe
**lalijîn/dilalije/bilalije** lalote bûn, ziman negerîn
**lalik** **1.** tatik **2.** sinî *"**lalik**a şikestî, çêtir e ji a xwestî"
**laloşî** aloşî, melaqî
**laloşî kirin** aloşî kirin, melaqî kirin
**lalote** **1.** aniqî **2.** zimangiran

**lam** erzên
**lame** valahiya di navbeyna hestiyê hinarikê û erzenê de; gep
**lan** hêlîna kovî û dirindeyan *"hirç **lan**a xwe ji bîr nake, çivîk jî hêlîna xwe"
**landik** hêlekan, hêleçan
**lanet** qewirandina bi nifiran
**lanetî** kesê ku bi nifiran hatiye qewirandin
**lanet kirin** **1.** jê re beddua kirin **2.** ji hafê avêtin
**lap** **1.** tam **2.** pir
**-lap kûr** gelekî kûr
**laper** rûyekî kaxezê
**lapûşk** **1.** pençe **2.** kulab
**laq** goştê jar
**lar [I] 1.** bê dê **2.** êwirgehe ga û gamêşan; tewle
**lar [I]** xwar
**lar bûn** xwar bûn
**lareş** cureyekî nexweşiyan e
**lar kirin** xwar kirin
**lasar 1.** baldar **2.** înadkar
**lasayî** qulebî, sexte
**lasayî kirin** teqlîd kirin, sextekarî kirin
**laser** sêlav, lehî, lêkend
**lask** saq, bist
**laş** beden, term *"**laş** laşê mêşê, deng dengê gamêşê"
**laşe** **1.** kelax **2.** goştê mirdar *"**laşe** li ku derê, qijik li wê derê"
**laşgiran** **1.** canazar, xwerenedîtî **2.** pêgiran
**lat** **1.** zinarên meht; teht **2.** parçe **3.** coya mezin
**-lat ajotin** **1.** sohbet kirin, galegal kirin **2.** bi axaftinê dem bihurandin
**latik** **1.** kevirê biçûk **2.** kerdî
**lava** **1.** dua **2.** tika, rica
**lavakar** **1.** duakar **2.** kesê ku tika û ricayê dike
**-lavakarê nefsa te me** ji nefsa te re dua dikim
**lava kirin** tika kirin, rica kirin
**lavayî** lava
**lavij** **1.** newayên dînî; beyt **2.** stran
**law** kur *"bav çi seg be, dê **law** jî ew seg be"
**lawan** jiyana di nav têkberên bedew de
**lawaz** **1.** hejar **2.** zeîf
**lawazî** **1.** hejarî **2.** zeîftî
**lawik** kurik
**lawir** rawir
**lawlaw** laflaf
**lay/layen** **1.** tûş/dûş **2.** alî **3.** teref, ta
**layengîr** **1.** terefgir **2.** tagir **3.** alîgir
**layîq** **1.** munasib **2.** bikêrhatî
**layîq bûn** **1.** munasib bûn **2.** bi kêr hatin
**laylac** **1.** çavçil û silek

**2.** tezepêkhatî
**laylacî 1.** silektî **2.** teze-dîtîtî
**lazim 1.** pêwist **2.** bikêr-hatî
**lazim bûn 1.** pêwist bûn **2.** bi kêr hatin
**lazimî** hewcetî, pêdivî
**lazût** cureyekî zadê ku jê rûn tê bidestxistin û wekî gênim jî tê bika-ranîn; garis
**lebat 1.** tevger **2.** bizav, hereket *"sibat **lebat,** kewanî li nava malê ma mat"
**lebatî** *(r)* hevoka ku kirarê wê karî bi xwe dike
**lebikandin/dilebikîne /bilebikîne 1.** kirin zo-rê, li qaqa reş asê kirin **2.** feşilandin
**lebikîn/dilebike/bilebi-ke 1.** ketin zorê, li qaqa reş asê bûn **2.** feşilîn
**lebitandin/dilebitîne/ bilebitîne 1.** bezandin **2.** leqandin, livandin
**lebitîn/dilebite/bilebite 1.** livîn **2.** leqîn **3.** bezîn *"barê kerê çiqas giran be, guhên wê **dilebitin**"
**lebûdî** livajen
**lec 1.** devjenî **2.** nîqaş
**leflefok** çêreya badayî
**legan** tasa tehtevêlkî ya mezin
**legleg** cureyekî balin-deyên kovî û lingdirêj a ku bi biharê tên erdên germ, xwarina wan beq, mişk û mar e
**leheng 1.** egîd **2.** qehre-man
**lehik** pêvek, îlawe
**lehikandin/dilehikîne/ bilehikîne** pê ve kirin, lê îlawe kirin
**lehikîn/dilehike/bilehi-ke** pê ve zeliqîn
**lehî** sêlav, laser, lêkend *"ava **lehi**yan, da ser ge-liyan"
**lehîm** bûjena ku hêsin bi hev ve dizeliqîne
**lehîm kirin** hesin bi hev ve kirin
**lehn** lan, hêlîna hirçê
**lek** bûjenên ku ji eslê nef-tê çêbûyî
**lekan** sola berfê
**lekaş** sola bênalçe û paşî-vekirî
**lekitandin/dilekitîne/ bilekitîne** likijandin
**lekitîn/dilekite/bilekite** likijîn
**lele** qeyda ku davêjin stû-yên tawanbarên bixeter û hêsîran
**lele kirin** qeyd avêtin stûyî
**lem [I]** bistikên petêxan ên li ser rûyê erdê *"din-ya dem e, gavinan petêx e gavinan **lem** e"

**lem [II]** lehiyên rûbêr
**lem [III]** lep
**lemç** milç
**lemçelemç** milçemilç
**lemçelemç kirin** milçemilç kirin
**lemelem** lemper bi lemper
**lemelem kirin** gotin di devê xwe birin û anîn; mizemiz kirin
**lemisîn/dilemise/bilemise** **1.** bizdîn **2.** *(çerm)* vekişîn **3.** qutifîn
**lem kirin** serê tiştekî zot kirin/tûj birîn
**lemlate** **1.** lûs **2.** girse
**lemper [I]** sinî, berkeşok
**lemper [II]** **1.** lehiyên zeryayê **2.** çelq û herka ava boş
**lenc** xwar û badayî
**lencîn/dilence/bilence** bi lexerî û giranî meşîn
**leng** pêgoc, kulek, lingor
**lenger [I]** hesinê keştiyan ê ku pê erdê lengergehê ve tê girêdan
**-lenger berdan** *(keştîvan)* gihiştin qeraxê û rawestan
**lenger [II]** siniya fireh
**lenger [III]** firokeya fezayî
**lengergeh** li qeraxa deryayekê rawestgeha ku keştî lê diêwirin
**lep** **1.** penc **2.** dest *"her şêrek, bi **lep**ê xwe ye"
**leplep** dengê domdar ê ku ji ketina bêemad tê
**-lelepa dêv** derketina peyvan bi awayekî beletewş
**-lepelepa mêweyan** ketina bêemad a mêweyên terixî
**lepelep kirin** bê emad ketin erdê û raweşîn
**lepik** lixwekirina destan
**lep kirin** penc kirin
**leq** **1.** hej **2.** ziq
**leqandin/dileqîne/bileqîne** **1.** livandin **2.** lebitandin **3.** hejandin **4.** ziqinandin *"mirov nakeve govendê, heke ketê jî divê xwe **bileqîne**"
**leqayî bûn** rastî hatin, pergî hatin
**leqîn/dileqe/bileqe** **1.** livîn **2.** lebitîn
**leqleqok** tiştê ku di cihê xwe de dileqe û natebite
**lerizandin/dilerizîne/bilerizîne** **1.** hejandin, leqandin **2.** ricifandin
**lerizîn/dilerize/bilerize** **1.** hejîn **2.** ricifîn *"an bike û melerize, an jî meke û melerize"
**lerz** **1.** hej, leq **2.** ricaf
**lerzek** **1.** hezek, cihe bi herî û gil **2.** ricaf

**lerzeta** cureyekî nexweşiyan e
**lerzok** **1.** hejok **2.** leqleqok
**leş** cendek
**-leş kelaştin** rewşa cendekekî teselî kirin
**leşkelêşî** di bijîşkiyê de pisporiya temtêla cendekan
**leşker** **1.** esker **2.** şervan **3.** pêşmerge *“**leşker**ê Romê ye, nan li ser çongê ye”
**leşkergeh** artêşgeh
**leşkerî** **1.** eskerî **2.** şervanî **3.** pêşmergetî
**let** parçe
**letandin/diletîne/biletîne** **1.** heytandin **2.** jêre ‘hiş be’ gotin **3.** deng lê birîn û nizm kirin
**let bûn** parçe bûn
**leteme** **1.** eyba mezin **2.** teşqeleya herwe **3.** belaya bêpere
**-letemeya rûyê dê û bavan** şerm û soxiya ku ji kirinên zarokan rastî dê û bavan tê
**let kirin** parçe kirin
**letok** aştbûyî û biaqil
**leva** qisim, par, beş
**leva kirin** par ve kirin
**leven** qamûş, qamir
**lev piçikîn** li hev alîn, wekî gocan bûn
**lewaş** **1.** nazik **2.** diltenik
**lewçe** **1.** devçepel **2.** bêrûmet
**lewhe** çarçive
**lewitandin/dilewitîne/bilewitîne** **1.** labikandin **2.** qirêj kirin
**lewitî** **1.** berbad **2.** qirêj *“**lewitî** dora xwe jî dilewitîne, şehitî bîsa xwe jî dişehitîne”
**lewitîn/dilewite/bilewite** **1.** labikîn **2.** qirêj bûn
**lewleb** toterîka ku pê bendê satilê dadiliqînin nava bîrê
**lewma** **1.** lewre, loma **2.** ji ber vê egerê
**lexer** teral, xêr*(-r)*
**lexer** teralî, xêr*(-r-)*îtî
**leylan** serab, revrevk
**leymûn** cureyekî mêweyên tirş e
**lez [I]** hereket
**lez [II]** biecele *“digerî li dewleta **lez**, xwedî ke rez û pez”
**-bi lez û bez** bi ecele û rev *“bûk anî **bi lez û bez**o, li ser de rez û pezo, şivika malê hê jî ezo”
**lezandin/dilezîne/bilezîne** **1.** ecele kirin **2.** bezandin, revandin
**lezet** çêj, tahm
**lez girtin** **1.** zû kirin **2.** bi ecele tev gerîn
**lezgîn** kesê ku karê xwe

bi zûyî dike
**lezgînî** bizûyî, biecele
**lê [I]** berevajî hevoka navborî; lêbelê, belam
**lê [II]** baneşana ji bo mêzayan/jinan
**lê anîn** **1.** peyde kirin, pêk anîn **2.** wergerandin
**lê banîn** **1.** pê de ketin **2.** kumişîn ser **3.** pê beled bûn
**lê belê** feqet, lê, belam
**lêbezîn** lêdan
**lêbok** melaq, aloş
**lêbokî** melaqî, aloşî
**lê borîn** **1.** jê bihurîn **2.** efû kirin, bexişandin
**lêç** **1.** dererêtî **2.** xulpî
**lêçan** kesê ku ji rastiyê veqetiyaye
**lêçûn** xerc û mesref
**-lêçûnên malbatê** xerc û mesrefên malê
**-lêçûnên leşkerî** xerc û mesrefên leşkeriyê
**lê dan** **1.** lê bezîn **2.** lê xistin **3.** rencandin, zecirandin
**lêder** kesê ku li amûreke mûsîqayî dide
**lê gemar dan** **1.** dorpêç kirin **2.** gemaro kirin
**lê gerîn** **1.** lê kolîn **2.** pey ketin **3.** mutale kirin
**lê guncîn** **1.** bi kêr hatin **2.** munasib bûn
**lê hatin** **1.** bi kêr hatin **2.** layîq bûn **3.** jê sûdwer bûn *“**lê hat** bazirgan e, lê nehat xwediyê warê wêran e**”**
**lê hûr bûn** **1.** ponijîn **2.** li ser pokinîn
**lêk anîn** **1.** li hev anîn **2.** du xeydok li hev anîn
**lêkdan [I]** pevçûn
**lêkdan [II]** bihevdana du hejmaran
**-xişteya lêkdanê** alava ku rênîşandêra pevdana jimareyan e
**lêkend** sêlav, lehî
**lêker** *(r)* karê ku di hevokê de tê kirin
**lê ketin** **1.** lê asê bûn **2.** tê gerîn **3.** îsabet kirin
**lê kirin** **1.** kinc lê kirin **2.** dîwar jênîn **3.** nav lê danîn **4.** hêrandin *“aşekî bihêle ku tu arvanê xwe **lê bikî**”
**lê kolîn** **1.** lê gerîn **2.** mutale kirin **3.** lê hûr bûn
**lêk ve kirin** senifandin
**lêlav** berfa bibaran; şilope
**lêm** xweliya narîn a ku piştî lêkendê li qeraxên çeman dimîne
**lêmişt** **1.** lehî **2.** qirş û qeselê ku bi lehiyê re tê
**lê nihêrîn** **1.** mêze kirin **2.** dîtin
**lê niştin** siwar bûn
**lênûsk** defter
**lêp** hîle, dek, fend û fût
**lê pêçan** **1.** lê alîn **2.** lê

alandin

**lê pirsîn [I]** **1.** pirsiyar kirin **2.** jê pirsîn

**lê pirsîn [II]** **1.** hal û wext pirsîn, kêfxweşî dan **2.** raya wî wergirtin, pê şêwirîn

**lêpok** rezîl û riswa

**lêqewimî** kesê ku tûşî bûyerekê hatiye; mexdûr, mezlûm

**lê rabûn** bi êş an jî nexweşiyekê ketin

**lê re hatin** **1.** hîn bûn û bernedan **2.** elimîn û ji xwe re kirin serinc

**lê siwar bûn** **1.** lê niştin **2.** derketin ser, bazdan ser **3.** gayîn

**lê sor bûn** **1.** lê hûr bûn **2.** îsrar kirin

**lê sor kirin** **1.** teşwîq kirin **2.** nav tê dan **3.** niçandin **4.** fîtandin

**lêv** **1.** goştê li dora dêv **2.** kêlek *"gotina ku bikeve nava du **lêv**an, dikeve nava du gundan"

-**lêva xwe gez kirin** pir ecêb man, heyirîn

-**lêv daxistin** mirûzê xwe tirş kirin

**lêvelêv** hetanî dêv tijî

**lêvlêvî** cureyekî nokan e û qelandî tê xwarin

**lêvdûdik** kesê lêvstûr

**lêvşotirk** kesê ku lêva wî a jêrîn zêde dirêj e

**lê vegerandin** **1.** radest kirin **2.** bersivandin **3.** lê asê bûn

**lê xebitîn** **1.** pê re mijûl bûn **2.** *(da ku bê qedandin)* hewl dan

**lê xêr ve anîn** şikir kirin

**lê xistin** **1.** lê dan **2.** kutan *"ker ji **lêxistin**ê re, hesp ji bezê re"

**lêzim** eqreba, xizim

**li** *(r)* daçekek e cih û warekî dinimîne

-**li cem** li ba, li hinda *"**li cem** bêaran, her bihar e"

-**li dar e** a niha tê pêkanîn

-**li gel** di gel, ji bilî vê

-**li gel vê yekê** beramberî vê yekê

-**li gor** **1.** li hember **2.** li cem *"**li gor**î makê, golik pak e"

-**li paş** li pişt *"bigire û here, **li paş** xwe menêre"

-**li pey** bi dûv *"ba pê ket, kûçik **li pey** ket"

-**li pêş** **1.** li ber, ne li paş **2.** li hember, li dij *"dost **li pêş** mirovî dipeyive, dijmin li paş mirovî"

**lib** heb

-**lib û lib** yek bi yek, heb û heb

**li bendê man/sekinîn** li hêviyê û di raçaviyê de man/sekinîn *"her kes **li**

**benda dora xwe disekine"**
**li ba bûn** **1.** berbiba bûn **2.** hejîn **3.** daweşîn *"kaya kevn, **li ba nabe"**
**li ba kirin** **1.** dan ber bayî **2.** hejandin **3.** daweşandin
**li ber gerîn** lavayî lê kirin, tika jê kirin
**li ber xwe ketin** **1.** mehcûb bûn **2.** şerm kirin
**li dar xistin** **1.** saz kirin **2.** çêkirin
**libê!** kerem ke!/fermo!
**li hev civîn** **1.** kom bûn **2.** hatin ser hev
**li hev hatin** **1.** peyman danîn **2.** sulh kirin
**li hev kirin** îtifaq kirin
**li hev rast hatin** pergî hev hatin/leqayî hev hatin
**li hev rûniştin** **1.** danişîn **2.** mutale kirin
**lihevxistin** **1.** tevdan **2.** bezînhev
**li hêviyê mayîn/sekinîn** **1.** li bendê man/sekinîn **2.** raçav kirin, çav li rê bûn
**lihêf** nivîna ji hirî û pemboyî ya ku dema razanê davêjin ser xwe
**lijne** **1**. koma lêkolîneran **2.** desteye rêvebiran
**likijandin/dilikijîne/bilikijîne** **1.** çêrandin **2.** elimandin **3.** karên kirêt lê dan kirin
**likijîn/dilikije/bilikije** **1.** çêrîn **2.** *(li ser sergoyan)* gerîn
**likij** hestîkoj
**limbîs** xortima fîlê ya ku bi kêrî berhevkirina çêreyê û vexwarina avê tê
**ling** endamê ku ji binê pê dest pê dike hetanî serê kulêmekan tê *"barê serê bêaqil, **ling** dikişînin"
**lingçepel** lingberevajî *" aqilê sivik **lingçepel** e"
**liq** **1.** şax **2.** malbend **3.** di artêşê de koma ku ji çar heng û hin yekîneyên pêwist pêk tê
**lisf** **1.** ser û sîçe **2.** xuyabûna bi temtêla kesekî din de; dilq
**liva** hiriya berxan
**livajen** kesê ku ji hiriya berxan kulavan çêdike
**livandin/dilivîne/bilivîne** **1.** leqandin **2.** bezandin **3**. hejandin
**livîn/dilive/bilive** **1.** leqîn **2.** hejîn **3.** hereket kirin *"ba neyê, pel **nalivin"**
**livlivok** hejhejok
**lixab** gem
**lixab kirin** gem kirin
**lixêz** zernîq, zemq
**liyan** werzişa tîlê

**lîhaz** hesinekî dirêj û sertûj ê ku ji bo rakirina keviran tê bikaranîn *(aliyekî dixin bin kevirê asê û hêza xwe didine ser aliyê din hetanî ku ew bê wergerandin)*; lom, qerase
**lîl** **1.** heriya ku ji xweliya nazik çêdibe **2.** pijik
**lîlandin/dilîlîne/bilîlîne** bi tilîliyan bang kirin
**lîlik [I]** reşika çêv
**lîlik [II]** cureyekî darên çolê ye
**lîloz** beybûn
**lîme** tîke
**lîme kirin** tîke kirin
**lîmelîmeyî kirin** parçe-parçeyî kirin
**lîmon** leymûn
**lînc** pêkutî
**lînc kirin** avêtin bin lingan û perçiqandin
**lîrandin/dilîrîne/bilîrîne** bi tilîliyan qîjîn
**lîre** gilêyên sor ên ku ji ber pêvedana bihukan di çermê mirovî de çêdibin
**lîs** **1.** mels **2.** hêlin **3.** lan *"**lîs** karê mirîşkan, bîs karê mêran e"
**lîsîn/dilîse/bilîse** **1.** melisîn **2.** nişîn
**lîstik** **1.** bazî **2.** cergebez **3.** govend *"kesê ku têkeve **lîstik**ê, dê milan jî hilde"
**lîstin/dilîze/bilîze** **1.** bazî kirin **2.** reqisîn *"bi zikê birçî **nayê lîstin"**
**lîstî** **1.** bazîker **2.** reqas *"bi xwe **lîstî,** bi xwe de mîstî"
**lîstok** **1.** pêlîstok **2.** tîtik û vîtikên zarokan
**lîtav** **1.** herîrêtik **2.** hezge
**lîtik** xilîtk
**lîwa** alaya leşkerî
**lîwan** **1.** gem **2.** îskan
**lo!** baneşana ji bo nêrzayan/mêran
**lod** **1.** kom, tomar **2.** gutle, lûs
**lod kirin** **1.** kom kirin **2.** bi ser hev de anîn **3.** keys kirin, dan ser hev
**lok** hêştira barkêşanê ya hêrik/mûkurt *"barê bûkan, barê **lok**an"
**loke** pembo
**lom** **1.** mizreq, rim **2.** hesinekî rimkî yê ku pê kevirên giran ji erdê derdixin
**lome** **1.** sitamî **2.** gazinc * **"lome,** an li dû ne an li rû ne"
**-lomeya pîvazê li sîrê genî kirin** gotin ji ehlê wê re venekirin
**lome kirin** **1.** gazind kirin **2.** şermezar kirin
**lop** **1.** kincên stûr **2.** parî, qot

**lopik** kutilkên ku hin xwarinên din jî dikine navê
**loq** **1.** şel, tîke **2.** merdane, gurdan
**loqandin/diloqîne/biloqîne** **1.** bezandin **2.** *(hesp)* loqloqo kirin
**loqîn/diloqe/biloqe** **1.** bezîn **2.** loqloqo bûn
**loqloqo** bezeke hespan a ku siwaran aciz dike
**lorandin/dilorîne/bilorîne** **1.** zêmar ristin **2.** bi şewat stran
**lorik** hêlekana zarokên viringî *"bûk di sorikê de, dergûş di **lorik**ê de"
**lorî** newaya nivandina zarokan
**lostik** cihê bi av û herî
**loş** nanê lewaş
**lotê** jina qunek
**lotik** **1.** hindirik, çirtikavêtin **2.** vîz
**-lotik avêtin** **1.** hindirik dan **2.** xwe hilavêtin **3.** hîz dan **4.** vîz dan *"diya zavê **lotik davê**, diya bûkê kûkekûk e"
**lotikxane** cihê xwehilavêtin û cergebezê; reqsxane
**lotke** navgîneke raguhastinê a biçûk e û li ser avan diçe
**lotkevan** **1.** ajokarê lotkeyê **2.** masîvanê bi lotkeyê
**lotim** îkramiye
**lowî** cureyekî sewzeyan e û pijandî tê xwarin
**-lowiyên ter** lowiyên ku nehatine hişk-kirin
**lûç** **1.** herş **2.** spîkirî
**lûç bûn** **1.** herişîn **2.** spî bûn
**lûç kirin** **1.** herişandin **2.** qeşartin
**lûdo** newaya şivanan a ku pê keriyên xwe diajon
**lûl** fetrûm
**-lûl kirin** fetrûm kirin
**lûlaq** geh, teşk
**lûle** **1.** quletîn **2.** xortim, borî **3.** di çekan de boriya fîşengê
**lûleper** kulîlkek e
**lûleyî** di endazeya boriyan de
**lûlekî** wekî boriyan
**lûlik** boriya amanan a ku tê re tiştê avî dirijînin
**lûr** lîl, pijik
**lûs [I]** lîs
**lûs [II]** parta biçûk
**lûs [III]** şimşat
**lûslûsî** partpartî
**lûslûsî kirin** partên biçûk jenîn
**lûsik** **1.** keçêç **2.** parta biçûk, qûçek giya
**lûtke** nikilê herî jorîn ê bilindahiyekê; zîrwe
**lûtî** mêrê qûnek
**lûtîtî** qûnektiya mêran

# M

**m/M** tîpa şazdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê lêvkî ye û awayê belavbûna wê girtî û difinî ye

**ma** **1.** qey **2.** tu dibêjî hema wisan e *"**ma** ji mirinê wêdetir tiştek heye?"

**-ma bavê te ji bavê xelqê mezintir e?** tu çima qîma xwe bi vî tiştê heyî nayînî û zêdebariyê daxwaz dikî?

**-ma tu di guhê gê de bûyî?** çima heta niha tu li ku bûyî?

**macera** serpêhatî

**macûn** **1.** helîse **2.** merhem **3.** dermanê merhemkî

**maç [I]** di cot de destika ku digirin û pê xeta cot eyer dikin

**maç [II]** gihandina lêvan bi lêv an dêmên yeka din; ramûsan

**-maça jînê** *(ji bo bi ser xwe de bê)* pifkirina devê kesê bêhnçikiyayî an jî fetisî

**-maça mirinê** qîlçikandina xwînmijan di canê yekî de

**maçî kirin** ramûsan, paç kirin *"destê şêx **maçî mekin**, ew şêx ne Qutbê Razî ye, tac û teylesana serê wî, gişk xebata destê sar û tazî ye"

**mad** mehde

**made** tiştê ku di gerdûnê de cihekî digire û baristeya wî heye; darin, bûjen

**madek** gamêşa mê

**maden** bûjenên kîmyayî

**madenî** heyberên ji bûjenên kîmyayî

**mader** dayik

**maderşahî** dayiksalarî

**maf** fermana mîrî ya derheqa kirin û nekirina karan de; heq

**mafdar** xwedî-heq

**-mafên mirovan** heqên însanan

**-mafê çarenûse** heqê hilbijartina rêbazekê

**-mafê rewa** heqê meşrû

**-mafên takekesî** heqên şexsî/ferdî

**mafnas** kesê ku heq û huqûqê dizane
**mafxur** neheqê ku destdirêjiya heqê xelqê dike
**mafxurî** rewşa destdirêjiya heqê xelqê
**mahir** **1.** jêhatî **2.** pispor
**mahî** hestiyê spî
**mahlû** malû
**maht** di lîstikê de dor
**-maht kirin** lîstik jê birin
**mahû** **1.** beraza mê **2.** jina bêxîret
**mak** dayik, dê *"li gor **makê** golik pak e"
**-maka derewan** kaniya viran
**-makedibistan** dibistana heta 6 saliyan
**-makezagon** qanûna esasî ya welatekî
**makêş** alava parzûnandinê ya mezin
**makîne** alavên ku mirovan ji bo hêsankirina jiyanê çêkirine û bi hêza gêreba, gaz, agir, nift, tav û destan dixebitin
**makûk** mekok
**mal [I]** **1.** holik **2.** xanî **3.** xanûman *"dil meke jina bi mêr, diçe **mal**ê û dike ji bîr"
**-mal li mîratan geriyaye** xwedî miriye û xelqê jî mîrateya wî xwariye
**-Mala Xwedê** **1.** Kebeya Şerîf **2.** mizgeft *"**Mala Xwedê** ava be, qirik bi kevokê qayîl nabe"
**-malî ava!** mala te xana Xwedê! *"kê gotiyê: 'dizo: **malî ava**' "
**mal [II]** **1.** serwet **2.** milkiyet **3.** sermiyanî **4.** rastmal *"dibêje: 'koro bide **mal**ê min!' ew jî dibêje: 'neyê mala min!' "
**mal [III]** **1.** di malperekî de rûpela sereke **2.** rûpela aîdî bikarhênerekî
**malbat** ezbat, aîle
**malbavan** malbat *"**malbavan**ê bûkê gavan e, qelenê bûkê giran e"
**maldar** zengîn, sermiyandar *"**maldar,** ji malê xwe ditirsin"
**-maldar bûn** dewlemend bûn *"mirov deyndar nebe, **maldar** nabe"
**male** alava seyandina dîwaran a bi gêç, herî û hwd
**malekêş** seyakar
**malêle** lomê ku pê giranî tên leqandin
**malêz [I]** lîstika çavgirtonekê
**malêz [II]** qirêja gilêzkî
**-malêz girtin** qirêja gilêzkî pê ketin
**malhazirî** xwarina ku wê gavê li malê hazir e
**malik** **1.** holik **2.** beyta helbestê

**malikiyet** xwedîtî
**malinc** male
**maliq** tiştê ku wekî gerestêrkekê di hewa de bê destek sekinî ye
**malistin/dimalêze/bimalêze** dalêstin
**maliştin/dimale*(dimalêje)*/bimale *(bimalêje)*** **1.** paqij kirin **2.** gêzî kirin *"bi kevîrê sivik, her kes xwe **dimalêje**"
**malkambax** malik bi devê kulê de çûyî
**malker/malkir** kesê ku ji bo başkirina rewşa xwe ya aborî dikoşe
**malketî** muflis, babidest
**malko** malkambax
**malmezin** xanedan
**malmîrat** **1.** malko, malkambax **2.** malketî
**malname** kaxeza ku cure û hejmara bûjenên bazirganiyê lê tên nivîsandin
**malnişîn** karnişîn
**malofî** sewala ku hînî mirovan dibe û êdî bêtirs di nava malê de digere
**malper** cihê ku *(ji bo ragihandina zanyarî, nûçe û danûstandinan)* di tora ragihandinê ya navneteweyî *(înternetê)* de qeyd bûye
**malû** darê meht ê ku li ser erdê cotkirî digerînin
**malxezûran** xezûrgelan
**malxwe** **1.** xwediyê malê **2.** rêvebirê kar û barên malê *"mala bê **malxwe** kes nizane ku mezin kî ye"
**malxwetî** sexbêrî û rêvebiriya malê *"**malxwetî** kete destê kurî, rizqê salekê di carekê de birî"
**malxur** **1.** malxwe **2.** mîratxur *"heke hat **malxur**ê malê ye, heke nehat qeda li salê ye"
**malzarok** di zikê nifşê mê de cihê ku zarok tê de çêdibe; pizdan
**mam** **1.** birayê bavê mirovî; ap **2.** ji bo mirovên mezin peyveke giramîdanê ye *"**mam**o ne li mal e, mala mamo bi galegal e"
**maman** pispora ku jina ducanî diwelidîne
**mambiz** karxezal
**mamik [I]** elameta ku di nav rez, zevî û bîstanan diçikilînin da ku giyandar jê bitirsin û ziyanan nekin
**mamik [II]** tiştonek, têderxistinok *(wekî: kofiya xezalê, totî newalê-=zîpik)*
**mamir** mirîşka yek salî ya ku hêj hêk ne kirine
**mamiz** xezal

**mamoste** **1.** seyda, fêrker, muelim **2.** di karekî de pispor; ustad *"diya baş, ji hezar **mamoste**yî çêtir e"

**mamostetî** karê hînkirin û wanedanê

**man/dimîne/bimîne** **1.** sekinîn **2.** rawestîn

**mand** pêşeroj, dahatû

**mandel** derew, şaş, nerêk

**mandel kirin** **1.** gotin an jî kiryareke nerêk pûç kirin **2.** înkar kirin

**mandî** westiyayî *"destê **mandî** li ser zikê têr e"

**mandî bûn** westîn

**-mandî nebin** *(ji bo kesên ku li ser karekî ne)* ji we re quwet be!

**mandî kirin** westandin

**manek** hespê ader

**manend** **1.** mîna, notla **2.** hinkuf

**mang** **1.** heyv **2.** meh

**-mang girtin** rojiya meha remezanê girtin

**manga** çêlek *"**manga**ya me mir, dewê me biriya"

**mangêr** alava ku bi ser zeviyên cotkirî dixin û pê kersengan rast dikin

**mangêr kirin** mangêr bi ser zeviyê gerandin

**maqûl** **1.** tiştê ku dikeve aqilan **2.** torinê êlekê *"**maqûl**ê kûçikan, tajî ye"

**mar** cureyekî sewalên xişok, bêpê û jehrdar e *"ecelê **mar**î tê, di nava riyê de diçe"

**-marê pêzik** **1.** marê pir jehrdar **2.** xedar û xayîn

**-mar û mûr** lawir û bihuk/heşerat

**maravî** marê avê

**marez** raxistek

**margestî** kesê ku marî pê vedaye *"**margestî**, ji werisî jî ditirse"

**margîse** cureyekî sewalên ku li gor erdê ku lê ye reng diguhere û dişibihe gumgumokê

**margîsk** sewaleke ji malbata gumgumo-kan e, çêrmê wê meht û birqonek e

**maristan** cihê ku mar lê pir in; lana maran

**marîjok** sewalên bêling ên ku xwe bi erdê re dikişînin

**marîs** oleder

**marlûlk** kurmikên heriyê

**marmark** cureyekî kurmên doranan e

**marmasî** cureyekî masiyên ku dişibihine maran

**marmêlk** margîse

**marmij** **1.** kesê ku jehra marî dimije **2.** bêwijdan **3**. kedxur

**mas** alava ku pê hespan tîmar dikin

**mase** textikekî biling e û tiştên malê datînin serê
**masî** sewaleke avê ye û cureyên wê pir in *“**masî,** di behrê de dibe hût”
**masîgir** masîvan
**masîvan** kesê ku bi torê masiyan digire
**mast** şîrê kelandî yê havênkirî *“dewê ceribandî, ji **mast**ê neceribandî çêtir e”
**mastêrik** kovik
**masûr** darikê ku tayekî lê dizîn û ji firêta tevnê re derbas dikin
**masûl** pilte
**masûlke** edaleyên lêş; bazû; kezî
**maşel** dafika masiyan
**maşelan** cureyekî bayên hênik e
**maşik** nîskên kesk
**maşîn/dimaşe/bimaşe** kevn bûn û peritîn
**maşot** kurmê belçikan
**mat** şaşwaz, mehtel
**mat bûn** şaşwaz bûn
**matem** şîn
**mat kirin** şaşwaz kirin
**mawe** dem, muhlet
**max [I]** merşên malê
**max [II]** navbera du darên ku avêtine ser banê xênî
**max [III]** gutle
**maxane** malxerab
**maxda** kirêt
**maxda bûn** kirêt bûn
**maxolan** kesê ku bi nexweşiya maxolaniyê ketiye
**maxolanî 1.** cureyekî nexweşiya derûnî ye **2.** xemgîniya kûr û dirêj
**mawe 1.** heyam **2.** mesafe
**mayende** tiştê ku mayina wê zêde ye; daîmî
**mayepûç** kesê îflaskirî
**mayepûçî** rewşa îflasê; malwêranî
**mayî 1.** baqiye, serata **2.** ji besiyê zêdetir *“pelên **mayî,** ji yên bihurtî çêtir in”
**mayîn/dimîne/bimîne 1.** sekinîn, rawestîn **2.** li holê sekinîn *“ga dimire çêrm dimîne, mêr dimire nav **dimîne”**
**mayînde** mayende, daîmî
**may tê kirin 1.** mudaxele kirin **2.** dest tê kirin
**-maytêkirina navxweyî** destdirêjiya dijî karê xelqê yî hundirîn
**maytêker 1.** tevlêbûyî **2.** destêkirî
**maz** beranê pêncsalî
**mazî/mazû** cureyekî daran e
**mazîçin** kesê ku darên mazî diçine
**mazûvan 1.** malxwe **2.** mêvandar **3.** mazîçin *“**mazûvanî,** ne karê axa ne”

**me [I]** cînavka /em/ê ya tewandî
**-me pûş kuta** ked û emelê me vala çû
**me- [II]** pêşgira neyîniyê ya ku tê ber lêkerê
**meaş** mehmiz, mehanî
**mebest** **1.** niyêt, qesd **2.** armanc
**mecal** **1.** qudûm **2.** hêza şiyanê **3.** derfet *“heke ecel hat, **mecal**ê nade”
**mecaz** wateya ku rasterast nehatiye nimandin
**mecazî** watedariya nerasterast
**mecbûr** bêgav
**mecbûrtî** bêgavî
**mechûl** nediyar
**meclis** dîwana rêvebiriyê
**medeniyet** şaristanî
**medenî** şareza
**medenîtî** şarezayî
**medrese** **1.** dibistan **2.** xwendegeha feqîhan
**mefa [I]** **1.** belaş **2.** bê dirav û bê heq *“li ku **mefa** ye, li wir bav û bira ye”
**mefa [II]** fayde, behre
**-mefa jê girtin** jê behreyek wergirtin
**mefadar** behregirtî
**mefer** hêvî, omit
**meferdar** hêvîdar, omitwar
**mefsik** **1.** kevgir **2.** hesik
**meh** **1.** mang **2.** her 30 rojên salê *“ji **meh**an û salan, mirov carekî tenê dibe mêvanê xalan”
**-meha raborî** her 30 rojên rabihurtî
**mehandin/dimehîne/bimehîne** **1.** tune kirin, ji holê rakirin **2.** binevat kirin
**mehane** **1.** mehanî **2.** weşana 30 rojî carekê
**mehanî** destheqa 30 rojên xebatê
**meharet** pisporî û pîşekarî
**mehder** **1.** meydan **2.** şefaet **3.** hêwan
**mehes** alava ku pê hespan tîmar dikin, mas
**mehfûr** cureyekî kaxetîta bedew e
**mehfûrî** amanên ji kaxetîta bedew
**mehîn** hespa mê
**mehîr** girara dêw
**mehkeme** saziya darizandin û sezadanê; dadgeh *“**mehkeme**yê, ji kesî re mal nekiriye”
**mehmiz** destheqa mehekî; mehane
**mehne** **1.** wate **2.** behane *“**mehne**ya nedayînê: ‘weris, li gêris e’ ”
**mehnewî** **1.** razber **2.** giyanî, derûnî
**mehol** mêkut
**mehr** nikah

**-mehr kirin** **1.** nikah kirin **2.** li xwe helal kirin
**mehrîfet** **1.** pîşe û pisporî **2.** zanîn û feraset *"**mehrîfet**a keran, zirîna wan e"
**meht** **1.** rast **2.** tehtevêlkî **3.** pehn
**-meht kirin** **1.** rast kirin **2.** pehn kirin *"her kes dewsa lingê xwe **meht dike**"
**mejî** mêjî
**mekat** xûgiya çêregehê
**mekok** di raçandinê de derbaskirina tayî ji firêta tevnê
**mekteb** dibistan, xwendegeh *"mal, **mekteb** e"
**mektûb** name
**mela** **1.** mele, îmam **2.** alimê diyanetê; seyda *"bi ilmê **mela**yî bike, lê bi emelê meleyî meke"
**-mela şito** melayê sexte yê ku dixwaze bi kum û tizbiya xwe xelqê bixapîne; zirmela, sofiyê sextekar
**melatî** **1.** îmamtî **2.** alimtiya diyanetê; seydatî
**melaje** goştikê ku di gewriyê de hêşîn dibe
**melaq** **1.** riyakar **2.** kesê ku ji hinekan re laloşiyê dike
**melavî** **1.** biryardarî **2.** xîret **3.** hewl
**melavî kirin** **1.** biryardar bûn **2.** xîret kirin **3.** hewl dan
**melbend [I]** menteşe, qulabe
**melbend [II]** herêm
**melbend [III]** **1.** bingeh **2.** komele
**mele [I]** kêzikek e
**mele [II]** mela
**melegan** pir girs, şelegan
**meleganî** mezinahiya bêteşe, şeleganî
**meleke** şiyan, qabiliyet
**meleme** bêndera kutayî
**melevan** sober, avjen
**melevanî** soberî, avjenî
**melevanî kirin** soberî kirin, avjenî kirin
**melik** mîr *"xwediyê sebrê, **melik**ê Misrê"
**meliktî** mîrîtî
**meliqandin/dimeliqîne /bimeliqîne** **1.** *(bi awayekî destkarî)* mêwe stewandin **2.** daliqandî hiştin
**meliqîn/dimeliqe/bimeliqe** **1.** *(mêwe)* di çiqilan ve daliqî man û terixîn **2.** daliqî man
**melisandin/dimelisîne /bimelisîne** **1.** lîs kirin **2.** keçêç dan girtin
**melisîn/dimelise/bimelise** **1.** lîs kirin **2.** keçêç girtin *"kêvroşk çiqasî **bimelise,** dê gavek zê-

de lê bikeve”
**melkeb** selika mezin a girover
**melkemot** Ezraîl eleyhiselam, melekê mirinê
**melkes** gêzî, siqayîl
**melok** gurz
**melû** gurzên çandiniyê
**melûl** **1.** xemgîn **2.** derdoyî
**memik** ber, guhan, hingil
**memikdank** kinca ku çiçikan dikinê; berdank
**memleket** **1.** bajar **2.** welat
**men** pîv
**menberahî** pîvaneya berahiyê
**mend** **1.** kaşbûn, **2.** bêqudûmî û bêhêzî
**-mend** paşgireke ku di dawiya navdêrê ve dizeliqe û wateya xwedîtiyê didê
**mendebûr** **1.** teral, lexer **2.** qirêj
**mendirêjahî** pîvaneya dirêjahiyê
**mengiranî** pîvaneya giraniyê
**mengî** mane, armanca jiyanî
**menî** **1.** avika mêran a ku jinê ducanî dike **2.** avika ajalên nêr a ku ajalên mê avis dike
**menkûrahî** pîvaneya kûrahiyê
**menzel** jûr
**menzîl** **1.** mawe **2.** mesafeya kêşa çekê
**meqam** **1.** nivîsgeha serekan **2.** ziyaretgeha aliman **3.** rê û rêbazên vegotina stranan
**meqes** **1.** cawbir **2.** hebring
**meqsed** **1.** mebest **2.** niyêt, meram
**mer** **1.** bêra rast **2.** pêmer
**meram** mebest, armanc
**meran** kulîlka asmînê
**meraq** hesta hînbûnê
**meraqdar** heweskarê hînbûnê
**merasim** dêlindêz
**merbend** hesinê ku li lingekî hespê dixin û bi singekî ve girêdidin
**merc** **1.** şert **2.** werz **3.** rayîş
**-merc girtin** reqabet kirin, ketin pêşbaziyê
**-merc sepandin** şertê xwe dan qebûlkirin
**-merc û peyman** şert û ehd
**mercname** **1.** şertname **2.** rayîşname
**merd** **1.** comerd, destbelaş **2.** mêrxas
**merdan** mêkut
**merdane [I]** **1.** bi destbelaşî **2.** bi mêrxasî
**merdane [II]** loq, bangurdan
**mered** pace

**merek** kadîn
**merez** kul û nexweşî
**merfet** derfet
**merg** giyan
**mergonek** bangurdan
**merheba!** bi xêr hatî!
**merhebatî** xêrhatinî
**-merhebatî ji hev birîn** têkilî ji hev qut kirin
**merhele** **1.** ast **2.** rade
**merhem** dermanê helîsekî/macûnkî
**merhemet** hesta diltenikiyê *“**merhemet**a ne li cih, merezê tîne”
**-merhemet kirin** lê şewitîn, guneh pê hatin
**-merhemet ket ber dilan** hate însafê
**merisandin/dimerisîne/bimerisîne** **1.** daqurtandin **2.** lê xistin **3.** bêhêz hiştin
**meritandin/dimeritîne/bimeritîne** **1.** herişandin **2.** birîndar kirin, spîldaxkî jê derbas kirin
**meritîn/dimerite/bimerite** **1.** herişîn **2.** birîndar bûn *“destê bin kêvir, bikêşî dê **bimerite** nekêşî dê biherişe”
**meriv** mirov *“**meriv,** bi çiravan diçe delavan”
**merivatî** mirovatî *“**merivatî** bi baran, hesab bi misqalan”
**merixandin/dimerixîne/bimerixîne** mexel kirin
**merixîn/dimerixe/bimerixe** mexel hatin
**merî** mirov *“**merî,** bi zenga ber diranan têr nabe”
**merîk** bişkoj, qumçe
**merkane** derdanka şûşeyî ya bi devik
**merkez** navend
**mer kirin** **1.** pêmer kirin **2.** bi bêran rêç kirin
**mermer** cureyekî kevirên avasaziyê ye
**mermî** fîşeng, gule
**mersef** sinî
**merş/merşik** **1.** raxistina nava malê **2.** bêrkun, ferşik *“gava zarok ket meha şeşan, quna wî dayne ser **merş**an”
**mertal** **1.** alava ku ji derba şûran pê berevanî tê kirin **2.** alava ku pê berevanî tê kirin
**merx [I]** cureyekî darên ku zivistanan belçikên wan danaweşin
**merx [II]** newalên rûbaran
**merz** cihokên ku li dora zeviyan tên kolandin *(da ku lêkend nekevê)*
**merzel** gor *“hemû **merzel**ên kêlsipî ne ziyaret in, hemû kesên şaşiksipî ne serdar in”

**mesele** **1.** arîşe, gelş **2.** mijar, babet
**meselok** kurteçîrokên watedar û qerfî
**mesîlk** **1.** newala bêav **2.** rûbarok, newalok
**mesqel** bûjena biriqandinê
**-mesqel kirin** **1.** biriqandin **2.** çirûsandin
**mesaxtin/dimesêxe/bimesêxe** mezaxtin
**mesh** gerandina destê şil li ser endamê pêçayî
**mesh kirin** destê şil li ser endamê pêçayî gerandin
**mesîl** **1.** çemê biçûk **2.** newalên sêlavan **3.** dibûr *“avê vexwe ji kanîesîlan, ne ji **mesîl**an”
**mest** **1.** serxweş **2.** heyirî **3.** cureyekî solên bênalçe ye
**mest bûn** **1.** serxweş bûn **2.** heyirîn
**mest kirin** **1.** serxweş kirin **2.** heyirandin
**meş** **1.** bez **2.** rêveçûn *“guhên erdê, **meş**a mûriyê jî dibihîzin**”**
**meşale** çira
**meşfen** kevirê mirîşotiyê
**meşhûr** navdar
**meşk** eyarê ku tê de mastî dikilînin û dikên
**meşkale** xurcika çermîn
**meşkar** kesê ku çalakiya meşê pêk tîne
**meşq** pêşamadehî
**-meşqa cengê** ji şerekî re amadehiyên pêşîn
**-meşq dan** hînî karekî kirin
**meşrû** di çarçiveya helaliyê û qanûnan de; rewa
**met** **1.** xwişka bavê mirovî **2.** ji bo pîrejinan peyveke rêzdariyê ye *“em çûn mala **met**ê, metê jî çû civatê**”**
**metbex** jûra aşpêjiyê
**methelok** gotinên navdar ên kurt û watedar
**metirsî** fikar, tirs
**meterîs** kozika cengê
**metran** popê filehan
**mewîj** tiriyên hişk-kirî ***“mewîj**a hebanan, ne dixwe ne dide cîranan**”**
**mewqî** meqam
**mewranî** daxwaza xwarinê ya li ba jinên ducanî
**-mewranî ketin ber** *(jina ducanî)* dil bijinandin xwarinekê
**mewzî** senger
**mexel** cihê ku sewal lê westa xwe datînin
**-mexel hatin** *(sewalên çarpê yên ku goştê wan tê xwarin)* veketin, velezîn *“bizin bizin e, berê cihê xwe pêkol dike û paşê **mexel tê”**
**-mexel kirin** sewal velezandin

**mexlûq** hemû heyberên ku ji aliyê Xwedê ve hatine afirandin
**mexreb** serê êvarê
**-nimêja mexrebê** nimêja tarîbanê
**mey** şerab, eraq
**meya [I]** hêstira mê
**meya [II]** havên, firşik
**meyan** puxte, gewher
**meyandin/dimeyîne/bimeyîne** **1**. havên kirin **2.** dawerivandin
**meyav** ava sekinî ya ku naherike
**meydan** **1.** hol **2.** hêwan **3.** mezada sewalan *“ji tivingê re nîşan, ji hespê re **meydan**”
**-meydan nedîtin** firsenda xwestî bi dest nexistin
**meyger** kesê ku di meyxaneyê de meyê digerîne; saqî
**meyîn/dimeye/bimeye** **1.** havên girtin **2.** dawerivîn
**meymûn** qird *“**meymûn,** di çavê diya xwe de xezal e”
**meyrok** marlûlk
**meyter** kesê ku hespan hîn dike
**meyxane** **1.** firoşgeha eraqê **2.** cihê vexwerina eraqê
**meyxur** eyaş, sermest
**meyizandin/dimeyizîne/bimeyzîne** **1**. nihêrîn **2.** temaşe kirin **3.** dîtin
**mezad** sûqa kirîn û firotanê; bazar
**mezaxtin/dimezixîne/bimezixîne** **1.** bertelef kirin, îmha kirin **2.** dêrz kirin, xerc kirin
**mezaxtî** mal û milkê serfbûyî; înfaq
**mezel** merzel *“**mezel**ê keran, zikê gur e”
**-mezelê merivan jê dûr be!** Xwedê merivan jê biparêze
**mezin [I]** **1.** girs **2.** bilind *“astenga **mezin,** li derê mala mirovî ye”
**mezin [II]** **1.** rûspî **2.** serok **3.** pêşengên gelekî *“bi ya **mezin**an bike, wan cejnek berî te xwarine”
**mezinahî** **1.** girsî **2.** bilindahî *“aqil ne ji **mezinahi**yê ye, ne jî ji biçûkahiyê ye”
**mezin bûn** **1.** girs bûn **2.** bilind bûn **3.** gihiştin, stewîn
**mezintî** mezinahî *“biçûk biçûktî, mezin **mezintî**”
**mezlûm** kesê ku zilmek li sêrî hatiye kirin
**mezr** **1.** dûgel, dewlet **2.** welat **3.** sazî

-**Mezra Botan** Dûgela Botiyan **2.** welatê botiyan, Navçêmk
**mezran** afiran, sazkirin
**mezrandin/dimezrîne/bimezrîne** **1.** afirandin **2.** çêkirin
**mezrandî** **1.** afirandî **2.** çêkirî
**mezrîb** **1.** newala ava lêkendê **2.** şirotan
**mê** **1.** sewala ku avis dibe, dizê an jî hêkan dike **2.** navdêra ku wekî mêza hatiye pejirandin *“bila **mê** be, şîr qismet e**”**
**mêbaz** kesê ku bi namûsa jinan re dilîze
-**mê bûn** ji nêrtiyê ketin
**mêhîn** **1.** mêza **2.** tiştê ku mêzatiya wê li pêş e
-**mê kirin** **1.** ji mêraniyê xistin **2.** xesandin
**mêj** **1.** kevin **2.** rabihurtî
**mêjî** **1.** endamê ku di seriyan de ye û giyanewer bi wî karên xwe bi rê ve dibin **2.** hiş, aqil *“**mêji**yê sivik, barê giran e**”**
-**mêjî şêlî kirin** **1.** *(ji ber temenê dirêj)* hiş negerîn û bûyer bi bîr neaîn **2.** gêj bûn
**mêjîkok** **1.** mêjiyê biçûk **2.** parçeyê navendî yê ku kombersê dixebitîne
**mêjû** roj û dema ku bûyer qewimiye
**mêjûnas** kesê ku roj û demên rûdanan nas dike
**mêkew** kewa mê
**mêkut** mîrkut
**mêl** **1.** hesta ber bi tiştekî ve **2.** xwarbûna ber bi aliyekî ve
**mêldar** **1.** berwar **2.** heweskar
**mêlede** **1.** meşale, şemal **2.** çira
**mêlak** kezeb
**mêr** **1.** mirovê nêr **2.** wêrek *“axa jin û **mêr**an, ji hev e”
-**mêr ser re heram e** lehengê herî qenc e
-**mêrê kulê** ruhistînê stûbir; celad
-**bi mêr kirin** *(jin)* bi mêrekî re zewicîn, şû kirin
**mêrandin/dimêrîne/bimêrîne** **1.** nîşan dan **2.** pêşandin
**mêranî** **1**. egîdî **2.** nêrtî *“**mêranî,** ne karê her kesî ye**”**
**mêrg** erdê ku çêreya wê tê çinîn; çêregeh
-**mêrg û çîman** **1.** gulzar **2.** seyrangeh
**mêrgdirûn** giyaçinîn
**mêrik** mirov
**mêrkok** **1.** qelsemêr **2.** şindokê mêran
**mêrkuj** **1.** qatil **2.** kujer **3.** kuştox *“destê te, ne

destê **mêrkuj**an e”

**mêrxas** xasmêr, egîd, wêrek *“**mêrxas**, mêrxasan nas dikin”

**mêrxasî** egîdî, wêrekî *“**mêrxasî** deh e, yek jê zor e û yên din fen in”

**mêrxwaz** jina ku dilê wê bi guhneliyê heye

**mêş [I] 1.** cureyekî heşeratên firinde ye **2.** moza hingiv *“hespê piştkul, bîna **mêş**an ji dûr ve hildike”

**-mêş lê diterişe** ewqas şimşat e ku mirov nikare xwe li serê bigire

**-mêşan çav derxistiye** ewqas belengaz e ku nikare berde mêşan jî

**mêş [II]** arasteka çekan

**-mêşa tivingê 1.** nikilê ku bi serê lûleya wê ve ye **2.** çapa lêxistina tivingê

**mêşereşk** mêşa reş a nav malan

**mêşin** mih *“deriyê kozê vebe, berx ber bi **mêşin**ê û kar jî ber bi bizinê direve”

**mêşkuj** alav an jî dermanê ku qira mêşan tîne

**mêşlok 1.** bihuk **2.** malbata bihukan

**mêtin/dimêje/bimêje 1.** hilçinandin, veçinandin **2.** dalêstin *“berxê jîr, du makan **dimije**”

**mêtingeh** cihê ku terş û talanê wê tê kirin; zorxane

**mêtinker** kêse ku xêr û bera welatekî bi neheqiyê dixwe; zordar

**mêtûlke** rişk

**mêvan** kesê ku li maleke biyanî bixwe, vexwe û binive; misafir *“gava **mêvan** tên, rizqê xwe jî bi xwe re tînin”

**mêvanî** mêvandarî, misafirî *“here **mêvani**ya dijmin jî, lê çekên xwe ji bîr meke”

**mêvandarî** kar, rêz, berhevî û xizmeta ku ji bo mêvanan tê nîşandan; misafirperwerî

**mêvanperwer** kesê ku mêvanan baş mazûvanî dike; misafirperwer

**mêvanxane** cihê hewandina mêvanan; misafirxane

**mêw** dara tiriyê

**mêwe** berên daran; fêkî

**mêwij 1.** tiriyên hişkkirî **2.** qax

**mêxik** qurnefîl

**mêze 1.** awir, nêrîn **2.** çêj **3.** depekî rast ê ku li ser pêpikan qayîmkirî ye, li serê xwarin,

nivîsandin û hwd tê kirin; mase

**mêze kirin** meyzandin

**mêzer** pûşiya serê jinan

**mêzîn** alava giranîkêş

**micêrk 1.** murîdê şêxekî **2.** miçewr

**micik** di pêkanîna karekî de cidiyeta mirovî

**micwer** rengê hêşîn ê tarî

**miçandin/dimiçîne/bimiçîne 1.** *(çav)* damilandin **2.** *(çav)* qurçandin

**miçekçek** çîçik, xeml, arastek

**miçekçekî** çîçkirî, xemilandî, arastî

**miçewr** xizmetkarê saziyên dînî

**miçêj** mizêc, îştah

**miçilge 1.** mijar, babet **2.** angaşt **3.** merc

**-ketin miçilgeyê** ketin mercê

**miçiqandin/dimiçiqîne/bimiçiqîne 1**. *(herka tiştê avî)* asteng kirin **2.** *(tiştê avî)* ji binî ve ziwa kirin

**miçiqîn/dimiçiqe/bimiçiqe 1.** *(herka tiştê avî)* biriyan, asteng bûn **2.** *(tiştê avî)* ji binî ve ziwa bûn *"kanî jî bêxwedî bimînê, **dê bimiçiqe"**

**miçirandin/dimiçirîne/bimiçirîne 1.** ji merhebetiyê re dest dirêjî yekî kirin **2.** damilandin

**miç kirin** *(çav)* girtin, damilandin

**miço** zarokê biçûk

**midas** sol, pêlav

**mifa** sûd

**mifadar** kêrhatî

**mifte [I]** kilîl

**mifte [II]** herwe, bêdirav

**miftexur** herwexur

**mih** peza mê, hevsera berên *"ne ji fesadan be, gur û **mih** dê bi hev re biçêrin"

**mij 1.** moran, çem **2.** dûyê ku dadikeve der û dorê *"sal **mij** e, kodik tij e"

**mijandin/dimijîne/bimijîne** dan hilçinandin û vexwarin

**mijane** di makîneyan de baskê ku giraniyê dikêşe; baskêş

**mijang** bijang

**mijawî** rewşa hewayê ya ku mijê her der rapêçaye

**mijîn/dimije/bimije** hilçinandin û vexwarin

**mijar** babet

**mije** tam û bêkêmasî

**mijok** cureyekî çêreya zeliqok e

**mijûl** kesê ku bi karekî re dibile

**mijûl bûn 1.** pê bilîn **2.** pê re eleqedar bûn

**mijûlî** eleqedarî

**mikemik** dengdana bizinan

**mikemik kirin** *(bizin)* deng dan

**mikur** **1.** nas **2.** aşkera

**mikur hatin** kirina xwe eşkere kirin

**mil** **1.** endamê ji destan hetanî pîlan **2.** alî

**-mil dan ber** **1.** qebûl kirin **2.** bi cih anîn

**-mil kirin** rakirin û dan ser navmila xwe

**milç** dengê devşepilandin û maçkirinê

**-milç çûn destan** rahiştin destan û ramûsandin

**milçemilç** **1.** ji ber xwarinê û vexwarinê şelpeşelpa dêv **2.** ji ber ramûsanê şelpeşelpa lêvan û cihê ramûsandî

**milçemilç kirin** *(dev)* şepilandin

**milet** gel, xelq *"here nav **milet**an, bigire jê adetan"

**milk** **1.** rastmala ji erd û avahiyan pêkhatî **2.** hukimdarî *"ji **milk**an aş, ji hacetan simtiraş, ji mêran mêrê ku dike hesabê pêş û paş"

**milkiyet** **1.** hemû heyiyên kesekî **2.** malê ku bi binecihî aîdî kesekî ye

**milpêç** kinca gerdenparêz; kefî

**min** awayê tewandî ê cînavka /ez/ê

-**min sîr nexwariye ku bêhn ji min bê** min kirêtiyek nekiriye ku bê pêşiya min

**mindal** zarok

**minet** **1.** sehm **2.** tirs û xof *"hestiyê bê **minet**, çêtir e ji goştê bi minet"

**-mineta te li kaşê han!** fermo çi di dilê te de derbas dibe bîne zimên!

**minho** **1.** riwayet **2.** salix

**minminîk** perperok, kerkene

**minminok** kesê ku di kiryar û bizavên xwe de hêdî ye

**miqate** **1.** serwext **2.** baldar

**miqate bûn** **1.** lê xwedî derketin **2.** parastin

**miqawe** cureyekî kaxeza stûr e

**miqilk** **1.** tawe **2.** boçesêlîn

**mir** qureyê mirûztirş

**-xwe mir kirin** bi mirûztirşî xwe qure kirin

**mirar** **1.** sewala ku negihiştiye ber kêrê **2.** miriyên ji sewalên ku goştên wan nayê xwarin

**miraz** xwezî *"dilê bi xezeb, nagihêje tu **miraz**an"

**-miraz di çavan de man**

xweziya dilî bi ser tu armancê ve nebûn
**mirc** kerane
**mirç** milç
**mirçemirç** milçemilç
**mirçemirç kirin** milçemilç kirin
**mirdar** **1.** heram **2.** qirêj û kirêt
**mirdal** **1.** mirdar **2.** kesê bêqedr û çepel *“gotin ji **mirdal**an, sipî ji qerpalan”
**miremir** dengê ku gotin jê nayê fehmkirin
**miremir kirin** **1.** *(bi awayekî ku tê nayê gihiştin)* axaftin **2.** ginegin kirin **3.** *(seg)* girê xwe anîn
**mirêk** awêne
**mirês** îhtişam
**mirin [I]** **1.** candan **2.** fewt **3.** riya çûnehatê *“rê riya **mirin**ê be jî, tu her li pêş be”
**mirin/dimire/bimire [II]** **1.** çûn ser dilovaniya xwe **2.** ji giyaneweriyê veqetîn
**mirisandin/dimirisîne /bimirisîne** **1.** perç lê daxistin **2.** fors lê şikandin **3.** çivî lê sist kirin
**-guh lê mirisandin** pir kutan
**mirisîn/dimirise/bimirise** **1.** bêmirês bûn **2.** qirik lê miçiqîn û zibilîn
**mirî** **1.** candayî **2.** bêgiyan *“**miri**yê di gorê de, jê nayê şermkirin”
**-mirî kenandin** pir qerf û qeşmerî kirin
**mirîçok** kesê sist, xav û lawaz
**mirîd/murîd** tobedarê li ber destê şêx, xwedênas û çakan ê ku li ser riya wan herdem di xilwe û nizayan de ne
**mirîşk** heywaneke bibask a kedîkirî ye *“beza **mirîşk**ê, heta ber kadînê ye”
**-mirîşka kesî ji xewê ranekirin** tu kes ji xwe nexeyidandin
**-keçêça mirîşkê** kurika mirîşkê
**mirok** her tiştê ku dawiya wî mirin e
**mirov** însan *“çiyayê bêgul, wek **mirov**ê bêdil e”
**mirovahî** însanetî
**mirovatî** mirovahî *“**mirovatî** germegerm, dijminatî nermenerm”
**mirovdost** bihîstyarê erkên însanî
**mirovperwer** însanperwer
**mirovxur** kes û sewalê ku xwarina goştê mirovan rewa dibîne
**mirûç** moçik
**mirûz** **1.** sikûm, sîma **2.**

gêwil
**mirûztirş 1.** rûpirçî **2.** bêgêwil *“hevalê xwarinê, her tim **mirûztirş** e”
**mis** mîs
**misab** alava ku solpêkirinê hêsan dike
**misas** rim
**miselet** qiraskê sêrî
**-miseletî serê yekî bûn** bûn qîra reş û pê ve zeliqîn
**misêwa 1.** daîmî **2.** bi berdewamî; hemasa
**mishef** navekî din î Qurana Pîroz e
**misîn** derdana avê ya bilûlik
**misk** bêhneke xweş e û ji qirguliya askê tê derxistin *“kûsî, **misk**ê naxwe”
**-misk û enber** du bêhnên xweşik in
**miskan** kaniya ava madenî ya tahmsarkî
**misoger 1.** bîmekirî **2.** pêwist **3.** îcbarî **4.** kar an jî kiryara ku guman tê de tunebe; teqez
**misogerî** pêwistî
**misoger bûn** *(gotin an jî kiryar)* guman tê de neman û sed der sed hatin cihê baweriyê
**misoger kirin** piştrast kirin, dabîn kirin
**mist 1.** kulma mirovî ya miçandî **2.** kefedest, felqedest
**-mist dan** miz dan
**mistek** gezo
**mişag [I]** xortê çeleng î bikêrhatî
**mişag [I]** kesê ku bi destheqekê dixebite
**mişar** alava birînê; birek
**mişe [I]** heqdest
**-mişeya kêmtirîn** heqdesta hera hindik
**mişe [II]** zêde, gelek
**-mişe bûn** zêde bûn
**mişefil** hendef
**mişepere** riba
**mişexur** kedxur
**mişext 1.** firar **2.** penaber **3.** revok
**mişexte** tarawgeh
**mişextî** penaberî
**mişext kirin 1.** koçber kirin **2.** şandin tarawgehê
**mişeyî** hebûn û lawanî
**mişk** cureyekî ajalên ziyandar e *“**mişk** çiqasî axê bikole, bi serê xwe de dike”
**-derê ku mişkan jî mala wî terikandine** êdî tût û rût maye û kes pê nasitire
**mişkane** barimte, gerew
**mişmiş** arûng, zerdelî
**mişmişî** rengê arûngê
**mişt** tijî *“ji yê kor re gotine: tu çi dixwazî?; goti-

ye dinyayeke **mişt** ronî**”**
**-mişt û dagirtî** tijî û qûç
**-mişt kirin** heta dêv dagirtin, heta dêv tijî û qûç kirin
**miştax** tiştê di heman rêzê de
**miştaxe** bêndera hişkirina tiriyan
**-bûn miştaxe** li her derê pir zêde bûn
**miştaxan** werza hişk-kirina tirihan
**miştin/dimişe/bimişe** maliştin
**mişûr** **1.** zehmet **2.** zûrî
**-mişûr xwarin** **1.** zehmet kêşan **2.** zûrî dîtin
**mit [I]** çiqilên biçûk
**mit [II]** **1.** bêpêjn **2.** bêdeng **3.** kesê ku nabihîze
**-mit man** mehtel man, bêpêjn man
**mitale kirin** *(li ser babetekê)* ponijîn
**mit bûn** bêtevger di cih de sekinîn
**-mitbûna zivistanê** tevza ku dikeve cendekê hin ajalan û zivistanê di xewê de dimînin
**mitêl** lihêf
**mitî** bêdengî
**mit kirin** xwe ker kirin *(dengê xwe nekirin)*
**mitmayî** mehtel, bêpêjn
**mitrib** **1.** stranbêjê dawetan **2.** qereçî *“**mitrib**an gotiye: ‘ji ufara bênderan nebûya, me dê jî cotkarî bikira’**”**
**mitribî** **1.** stranbêjiya dawetan **2.** qereçîtî *“hebe erebî ye, tunebe **mitribî** ye**”**
**mix** bizmar
**-mix kirin** bizmar kirin
**mixabin** cihê daxê ye ku
**mixmaz** qemçik
**mixrik** hevrik, reqîb
**miyaw** dengê pisîkan
**miz [I]** mişe
**miz [II]** tahmxweş *(tahma tirş û şirîn têkilhev)*
**miz dan** dest ser gerandin û tev li hev dan
**mize** xwarinên sivik ên meyxuran ên ku digel meyê dixwin
**mizemiz** devgerî
**mizemiz kirin** **1.** gotin di devê xwe de birin û anîn **2.** rastî veşartin
**mizgetf** **1.** camî **2.** mescîd *“heke xêr li malê here, ne hewceyî **mizgeft**ê ye**”**
**mizgîn** xeber û bûyera kêfxweşî û dilgeşiyê
**mizgîndan** agahdarkirina bi xeber û rûdaneke kêfxweşiyê
**mizûr** karmendê gumrikê
**mî** mih *“**mi**ya xerîb, li rexê keriyî mexel tê**”**

**mîheng** eyer
**-mîheng dan** eyer kirin
**mîhrîcan** **1.** cejna havînê **2.** bernameya pêşangeh û civînên komelî **3.** *(di kurdiya kevn de)* roja ku mirî ji nû ve candar dibin, roja qiyametê
**mîhrîgan** payîz
**mîhrîvan** bexşende
**mîl** mendirêjahiya cîhanî ya ku pê maweya di navbera du xalên erdnîgarî de tê pîvan
**mîjo** têjika ku çi guhan têkeve ber dimije
**mîmar** endazyar
**mîmarî** endazyarî
**mîna [I]** wekî, notla, fena *"bixwe **mîna** mêran, rabe mîna şêran"
**mîna [II]** xuya
**-mîna bûn** xuya bûn
**mînak** **1.** nimûne **2.** wekok
**-wekî mînak** ji bo nimûnetiyê
**mînandin/dimînîne/bimînîne** çend tişt anîn astekê û hemû wekî hev kirin
**mîntan** **1.** kiras **2.** qutik
**mîr** **1.** kesê rêveberiya deverekê dike û li payetextî rûdine; emîr **2.** serokê êlekê **3.** key *"**mîr** jî dimire, evdal jî dimire"
**mîrala** **1.** serheng **2.** fermandarê herêmekê
**Mîran** Bircê Mêzînê
**mîrate** kelepor, mîras
**mîrav** berdestî û pêgirtiyên mîrekî
**mîrek** serek
**mîrekî** pergala rêvebiriyê ya ku di destê mîrekî de ye
**mîrgeh** dever an jî welatê ku rêvebiriya wê mîrnişînî ye
**mîrî** dezgeh, kar, mal, erd û hwd yên ku girêdayî mîrgehê ne
**mîrkut** mêkut, çakutê mezin î darînî *"li deriyê kesî mexe bi tiliyan, bila kes li deriyê te nexe bi **mîrkut**an"
**mîrlîwa** mîrala
**mîrnişîn** mîrek
**mîrnişînî** **1.** emîrtî **2.** serokatiya êlekê **3.** keyanî
**mîro** mûrî, gêrik *"ecelê **mîro**yî tê, çeng pê ve hêşîn dibin"
**mîrza** **1.** kurê mîr **2.** esîlza, torin
**mîs** madenê ku jimareya wî ya atomî 29, giraniya atoma wî 8.95, kurteya wî ya latînî *Cu* ye û di 1084 dereceyan de jî dihele
**mîsger** pîşekarê alavên mîsîn

**mîsgerî** pîşekariya alavên mîsîn
**mîsîn** alav û amanên ku ji mîsê hatine çêkirin
**mîstanik** cureyekî nexweşiya çêrmî e
**mîstanikî** endamê şeliqî
**mîstin/dimîze/bimîze** mîz kirin *"adarê kêrguh sibehan xwîn **dimîze,** nîvro xwe davêje ber siya darê"
**Mîweganan** Kelûya Şêrî *(21'ê Tîrmehê-20'ê Gelawêjê)*
**mîz** aviya ku ji mîzildankê derdikeve *"**mîz**a mişkî, ji êş re kar e"
**-mîza wan ne zelal e** hin xiniziyên wan ên veşartî hene û lewre teletel/tirsetirs digerin
**mîzdank** mîzildank
**mîzildank** di lêş de endamê ku aviyên bêkêr dicivîne hev û bi riya endamê zayendî valayî derve dike
**mîzkêş** lûleya ku mîzê veder dike
**mîz kirin** aviya mîzildankê berdan derve
**mîzok** kesê ku nikare mîza xwe bigire û di bin xwe de berdide; kelemîzokî
**mîztin/dimîze/bimîze** mîz kirin
**moçe** hêstira mê; meya
**modine** çapa lûleya tifingê
**mohr** alavake biçûk a ku nav û navnîşana mirovî an jî cihê karê mirovî tê de kolayî ye û li şûna şanenavan li kaxezan tê xistin û wekî nîşaneya fermîtiyê tê pejirandin *"zor dizane û zêr dizane, devê tivinga bi **mohr** dizane"
**mohr kirin 1.** nîşaneya fermîtiyê lê dan **2.** çespandin **3.** karê qedexe betilandin
**mole** bûjena ku pê tê seyandin
**mon** mirûztirş, pirçî
**mor** mohr
**moran** ewrê tîr ê ku dadikeve rûyê erdê û bînayî tê de kêm dibe; mij
**morî** xemla hebhebî ya ku ji şûşeyê hatiye çêkirin, jin di stû, zend û laçikên xwe ve dikin *"**mori**ya biqul, di xurcikê etaran de namîne"
**-morî winda kirin** li tiştekî pir biçûk gerîn
**mostik** derdanka ku tê de av, şîr û hwd didine zarokên viringî
**moşek** cureyekî teqemeniyên giran e
**movik** herewera ku hesti-

yan bi hev ve dizeliqîne; mefsel, mok
**mox** mêjî
**moxil** cureyekî bêjingên ku hûr lê dike
**moz [I]** cureyekî mêşan e
**moz [II]** golika dusalî
**mozbeş** kermêş, zerqîtik
**mozik** **1.** moza biçûk **2.** golika dusalî *"heke ga bike û bi tenê bixwe, lê **mozik**ê tolik dê çi bixwe?"
**moz kirin/dan mozan** **1.** ji ber mêşan lotik dan **2.** engirîn û silikîn
**mozqirtik** mozbeş
**mozrîk** çîkên ku ji êgir difirin
**mucahid** kesê ku di riya Xwedê de derketiye cengê
**muflan** pezkovî
**muflis** malketî, îflaskirî
**muhacir** koçber
**muhacirî** koçberî *"pêncî salî **mihacirî**, ne bi salekê neyarî"
**mujikî** **1.** teral **2.** qirêj
**mukur hatin** **1.** rik hatin **2.** nepejirandin *"dizên bîstanan, **mukur tên** zivistanan"
**munasib** **1.** guncan **2.** layîq **3.** hevaheng **4.** lihevhatî *"Xwedê sêrî dibîne, kumê **munasib** lê datîne"
**murîd** pêgirtiyê şêxekî *"**murîd**ê ku bi sirekê were û tirekê here, ew tu ne murîd e"
**musteqbel** ayende, pêşeroj, dahatû
**mustesna** tiştê derî mijarekê; awarte
**mux** zanayê zerduştiyan
**muxalif** dijber
**muxbêd** mux
**muxtar** keya
**mû** pirç *"keda helal dibe **mû** lê naqete, keda heram bibe weris jî diqete"
**-mû jê şaş nekiriye** her du jî di lisfê hev de ne
**-mûyê xwe bi ciwanan re qusandin** li salên temenê xwe nenihêrîn û bi ber bayê xortan ketin
**mûç** guhvîtkirina sewalan
**-mûç kirin** *(sewal)* guhê xwe vît kirin
**mûçe** meaş, mehanî
**mûçilk** alava ku pirça bêkêr pê tê rûçikandin
**mûçing** mûçilk
**mûd** kîn
**mûdî** **1.** ezaker **2.** kîndar
**mûle** herî
**mûm** keresteyeke ronîkirinê ya ku ji şima û bezî tê çêkirin û pilteyek di navê de ye; find
**mûmdank** derdana ku mûmê tê de datînin; findank

**mûmar** kurmê doranan
**mûnandin/dimûnîne/bimûnîne** hûnandin
**mûnîn/dimûne/bimûne** hûnîn
**mûr** bêdengê rûtirş
**mûrî** mûstang, gêrik
**mûrîstan** hêlîna gêrikan
**mûsîqa** newanasî
**mûsîqanas** newanas
**mûsîqajen** pisporê newayan
**mûşek** mêvanê ku bêyî vexwendina xwediyan tê
**mûtaw** bend û werisê mûyîn
**mûyîn [I]** **1**. bipirç, bipûrt **2.** ji pirç û pûrtê *"bila dil bi dil be, bila kirasê **mûyîn** li mil be"
**mûyîn/dimûne/bimûne [II]** mûnîn
**mûz** fêkiyeke qalikzer û dûvedirêjkî ya ku li erdên germ şîn dibe
**mûzî** endamê zayendî yê nêrzayan; kîr

# N

**n/N** tîpa hevdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê diranî ye û awayê belavbûna wê girtî û difinî ye
**na 1.** bersiva neyiniyê, dijbera erêniyê **2.** carinan wekî pêşgirekê tê û wateya neyîniyê dide *"giliyê mêran yek e, ya erê ya **'na'** "
**nabe ku** *(di zagonsaziya leşkerî de)* qedexe *(wek: nabe ku çekên agirber bêsedem bên teqandin!)*
**nabînk** cureyekî kerdenekan e
**naçar** neçar
**naçarî** neçarî
**nadan** nemerd
**nadir** tiştê ku kêm caran tê dîtin; degme
**nag** hêştira mê
**Nahid** gerestêrkek e
**nakok 1.** zid **2.** muxalif, dij
**nakokî 1.** tezad **2.** muxalefet, dijayetî
**nal** hesinê ku li binê simê ker û hespan dixin
**-nal kirin 1.** nal bi simên sewalan ve mix kirin **2.** nal ji binê simê vexistin *"hêştir **nal dikirin**, rovî çû û got: 'pe pe"
**nalan** zarîn
**nalandin/dinalîne/binalîne 1.** zarezar pê xistin **2.** êşandin û wêlewêl pê xistin
**nalbend** pîşekarê nalkirinê; simtiraş *"**nalbendê** baş, mîroyan jî nal dike"
**nalbir** firoşkarê alavên avasaziyê
**nalbirxane** firoşgeha alavên avasaziyê
**nalebar 1.** dij **2.** berhember
**nalenal 1.** zarezar, zûrezûr **2.** wêlewêl, kûzekûz, nûzenûz
**nalenal kirin 1.** zarezar kirin **2.** nûzenûz kirin
**nalik** şimikên ku binê wan darîn e
**nalîk** nîvîna stûr a ku li serê tê razan; bincî, binrex
**nalîn/dinale/binale 1.** zarîn, zûrîn **2.** axîn, kû-

zîn, kûrîn, nûzîn
**name [I]** peyama nivîskî ya ku ji yekî re tê şandin; reşbelek
**-name [II]** paşgireke ku di navdêre ve dizeliqe û wateya kaxeza niviskî didê
**namedor** biryara ku piştî civînekê hatiye wergirtin; giştîname
**namerd** nemerd
**namilke** **1.** daxuyanî **2.** danezan
**namûs** **1.** ifet **2.** tiştê herî pîroz ê li cem mirovî wek welat, ax, jin, zarok û hwd; rûmet *“**namûs** avêtine ber kû çikî, wî jî nexwariye”
**-namûs peymal kirin** bi zorê ifet û rûmeta yekî şikandin
**namzed** navzed
**nan** **1.** xwarineke sereke ya ku ji hevîrê arê genimî û li ser sêla sincirî an jî di tenûrê de tê birajtin, gelek cureyê wî hene **2.** îkram *“av, şûna **nên** nagire”
**-nanê tisî bi dêst neketin** pir xizan bûn
**nan dan** **1.** xwarin dan **2.** aş dan
**nandar** **1.** mazûvan **2.** mêvanperwer *“meriv bi nanekî **nandar**, bi çoyekî mêrxas nabe”
**nandank** teşt an jî derdanka ku nên dikine navê *“nankor nên dixwe, **nandank**ê jî didirîne”
**nandayî** **1.** comerd **2.** mêvanperwer *“**nandayî,** birçî namînin”
**nanfiroş** xwediyê firinê an jî firoşkarê nên
**nangir** erdê bi xêr û ber
**nangiranî** xela
**nanik** cureyekî bîşiyan e
**nankor** **1.** xayîn **2.** kesê ku qencî û çakiyê zû ji bîr dike; neşêkirandî
**nankorî** **1.** xayîntî **2.** bêspasî
**nankorî kirin** **1.** xayîntî kirin **2.** neşêkirandin
**nano** kesê ku tatêla wî her xwarin û vexwarin e
**nanoziko** **1**. ne têr ne birçî **2.** xebata ku tenê bi kêrî ziktêriyê tê
**nanpêj** **1.** kesê ku nên dipêje **2.** aşpêj
**naqos** **1.** zengil **2.** zengilê dêrê yî ku wextê ayîna filehan diyar dike
**-barûya naqosê** birca ku zengilê dêrê tê de tê daliqandin
**nargîle** kokos
**narinc** malbata mêweyên wekî leymûn, porteqal û hwd

**narincî** rengê porteqalê
**narincok** cureyekî teqemeniyên ku bi dest tê avêtin
**narîn** **1.** nazik û tenik **2.** nerm
**narvîn** qeder, çarenûs
**nas** heval û hogirên ku ji dûr û nêzîk ve bi hev re têkiliyên wan hene *"mirov, bi **nas**an digihê xasan"
**nasandin/dinasîne/binasîne** agehî dan, xeberdar kirin
**nasirge** ereboka destan a ku pê barên biçûk dikêşin cihekî
**nasîn/dinase/binase** **1.** zanîn **2.** hay jê hebûn **3.** pê hesîn
**nas kirin** **1.** zanîn **2.** pê beled bûn **3.** aşina bûn *"hesp, siwarê xwe **nas dike"**
**nasname** kaxeza ku daneyên di heqê yekî/yekê de dide
**nasyar** **1.** dost, hogir **2.** hevalbend
**nasyarî** **1.** dostanî, hogirî **2.** hevalbendî
**naşor** parçeyek ji rîsê zirav; nex
**naşte** **1.** birçîtî **2.** xela
**-naşteya li ser naşteyê** birsa pey birsê
**naştin/dinêje/binêje** **1.** çal kirin **2.** veşartin **3.** mirî kirin gorê
**nator** nobedarê bêx; zêrevan
**natorî** çavdêrî, zêrevanî
**nav [I]** **1.** mawe **2.** ferqiyet
**-di vê navê de** di vê maweyê de
**nav [II]** hundir *"di **nava** salekê de du havîn nabin**"**
**-di nav xêrê de bî** xêra Xwedê li ser te be
**-di nav xwîna sor de gewixîn** birîneke xedar girtin û pir xwîn jê çûn
**nav [III]** agehiya ku tiştek pê tê nasîn û zanîn *"**nav**ê wê Edlan e, ji mêrê xwe re nezan e, ji xelqê re kebaniya bîst û heft malan e**"**
**-nav hildan** **1.** bi bîr anîn **2.** bi dengekî bilind gazî yekî kirin **3.** navê kesê mirî li yekî kirin
**-nav lê kirin** pênasek lê danîn da ku pê bê nasîn
**-nan nivîsandin** ji bo egereke rêvebiriyê navê xwe qeyd kirin
**-nav tê dan** **1.** teşwîq kirin **2.** niçandin
**nav [IV] û nûçik** **1.** pênasên ku nirxê yekî/tiştekî dadixîne **2.** leqebên soxkirinê

**-nav û nûçik lê kirin** jê re navên soxkirinê peyde kirin

**nav [V] û nîşan** salix û wesfên kes an jî tiştekî; dilq

**-nav û nîşan dan** **1.** zanîn û agahiyên der heqê yekî de eşkere kirin **2.** îxbar kirin

**navbend** navber

**navbendî** dûrî an jî dirêjiya di navbera cihan de

**navber** **1.** mawe, mesafe **2.** ferqiyet *"di **navber**a şûrkişandin û lêxistinê de pir zeman heye"

**navberkar** **1.** navbeynkar, kesê ku du kes an jî du koman bi hev tîne **2.** kesê ku nahêle du kes an jî du kom tûşî hev bên

**navberkarî** **1.** navbeynkarî, lihevanîna du kes an jî du koman **2.** astengkirina aloziya di navbera du kes an jî du koman de

**navbernav** sernava ku di navbeyna du mijarên cihê de tê danîn

**navbir** **1.** tixûbê di navberê de **2.** bêhinvedana kurt a di nava dema karî de

**navborî** **1.** navê ku bihuriye; navhatî **2.** agahiya ku xulekek berê çêlî wê hatiye kirin

**navçav** **1.** navbera her du çavan **2.** enî

**navçe** bajarokê bi ser bajarekî mezin ve

**navçeng** binçeng

**Navçêmk** Mezra Botan

**navdank** **1.** navê ku pê hatiye nasîn; kunye **2.** paşnavê ku pê hatiye nasîn; leqeb

**navdar** bi nav û deng; meşhûr

**navdest** kesê ji rêzê

**navdêr** *(r)* navê heyberan

**navend** cihê ku kar û çalakiyên ramyarî, civakî, çandî û hunerî lê tên birêxistin; merkez

**-navenda nûçeyan** merkeza xeberan

**navendî** merkezî

**naverast** ne li çepê ne jî li rastê tam di çatê de

**naverok** muhtewa, têxistî

**navêş** zikêş, hinavêş

**navgir** qertafa ku dikeve navbera du peyvan *wek: reş**e**ba, ser**an**ser, dan**û**standin...*

**navgîn** **1.** amûr, alav **2.** alavên raguhastinê ên bejî, avî û hewayî; wasite

**-navgina siyasî** melzemeyê siyasetê

**-navgînên ragihandinê** alavên agehdariya girseyî

**navik** doraneke ku di derveyê zikê zarok û hinek têjikan ve ye, di pizdankê de bi riya wê xwarinê werdigirin û piştî bûyînê tê qutkirin, lê dewsa wê wekî kortikekê dimîne
**navîn** tiştê ku di navberê de ye
**-rojhilata navîn** erdnîgariya ku Quds û doraliyên wê nîşan dide
**navkêlk** newq
**navko** navenda malê
**navlêk 1.** şayeseya kirûyekî **2.** navdank
**navmal** nava malê; navko
**navmalî 1.** jina ku di kar û barên malê de alîkariyê dide xwediyan **2.** kelûpel û pêdivîyên nav malê *(yên wekî: nivîn, aman, text û hwd)*
**navmil** cihê ku *(ji aliyê pişta mirovî ve)* dikeve navbera her du milan; serpîl
**navneteweyî** tiştê ku di nava hemû gelan de tê naskirin; navmiletî, beynemilel
**navnêrî** di çêreyê de beşa ku bejn davêje û tov digire
**navnîşan** agahiya ku cih û warê tiştekî nîşan dide
**navno** bi çêyî an jî neçêyî derketina navê kesekî *"navê gur, **navno** derketiye, roviyî dinya qelandiye"
**navpişt** ji serpîlan hetanî kovika qûnê
**navok** navik *"nav hebe, **navok** tuneye"
**navran 1.** şeqa kincan **2.** navbera her du ranan/lingan
**navrêz** di nivîsanê de maweya di navbera rêzan de
**navroj 1.** nîvro **2.** xwarina danê nîvro, firavîn
**navsale** kesê ku di temenê navîn de ye/40-50 salî ye
**navser** ger û rastahiya li serê bilindahiyekê; serger
**navsere** navsale
**navteng 1.** newq **2.** qûşa zînê hespan
**navşalik** navran
**navxweyî** hundirîn
**navzed** berbijar, berendam
**navzik** *(ji aliyê hundir ve)* cihê ku endamên hundirîn ên wekî hûr, doran û hwd tê de ne
**nawis 1.** binanî **2.** mexzena kel û melan
**naxêr 1.** na **2.** wisa nabe
**naxir** keriyê dewêr
**nayîn/dine/bine 1.** ga-

yîn **2.** tecawuz kirin, hiltirandin *"ne **bine** dînan, ne jî qûna xwe bide wan"

**naz** cilwe, delalî *"**naz,** taca jinan e"

**nazdar** cilwedar, delalik

**nazik** **1.** kibar, kaw **2.** tenik

**nazik bûn** **1.** kibar bûn **2.** diltenik bûn

**naziktî** **1.** zerafet, kawî, kibarî **2.** diltenikî

**naznazok** cureyekî gulên ku li ber tavê diçilmisin û di hênikahiyê jî de geş dibin

**ne** qertafa neyîniyê

**ne ... ne** qertafa neyîniyê ya dualî *"**ne** bi bezê **ne** bi lezê kes nagihêje mirazê"

**neasayî** **1.** awarte **2.** derezê **3.** derehiş

**nebaş** **1.** neçê, nerind **2.** qûnek

**nebaşî** **1.** nerindî **2.** qûndetî *"ne dijminê nebaşan be, dijminê **nebaşi**yê be"

**neban** **1.** sewala ku nahêle berxa wê bimije **2.** tor, hîn-nebûyî **3.** axozî **4.** havî

**nebanî** **1.** torî û ecemîtî **2.** axozîtî **3.** havîtî

**nebat** hêşinahiya ku li ser rûyê erdê ye; xerat

**nebez** azad

**nebîna** kor, nedîtî *"mêr mêr e çi kulek, çi **nebîna**, çi ker e"

**nebîrbir** koreçemk

**nebû** îftira

**necar** kesê ku daran dadiroje û jê alavên malê çêdike; xerat

**necirandin/dinecirîne/binecirîne** darotin

**neçar** **1.** bêgav **2.** bêderman

**neçarî** **1.** bêdermanî, bêgumanî **2.** belengazî, bêgavî

**neçê** nebaş, neqenc

**nediyar** **1.** mechûl, nekifş **2.** neaşkera

**nedîtek/nedîtî** **1.** laylac **2.** çavbirçî *"**nedîti**yan dîtin, di xwe de rîtin"

**nedîtbar** razber

**nefel** sêbelg, keta mêrgan

**nefer** kes

**-jûra yekneferî** odeya ji bo kesekî tenê

**neferma** medenî

**-saziyên civaka neferma** mueseseyên civaka medenî *(ên serbixwe)*

**nefilandin/dinefilîne/binefilîne** **1.** avêtin **2.** ji ser hişê xwe avêtin

**nefî** koçberî, qewar, tarawgeh

**nefî bûn** **1.** koçber bûn **2.** hatin qewirandin **3.** çûn

tarawgehê
**nefî kirin** **1.** koçber kirin **2.** qewirandin **3.** şandin tarawgehê
**nefret** heznekirina tiştekî
**-jê nefret kirin** ji tiştekî hez nekirin
**nefs** **1.** kesayet **2.** silektî, çilektî *“ji bo **nefs**ê, kete hebsê”
**nefsbiçûk** **1.** dilnizm, mutewazî **2.** awirşikestî
**nefsek** silek, çilek
**neft** aviya ku ji binê erdê tê derxistin, jê ardûyên navgînan û alavên cure-cureyî tên çekirin; zêrê reş
**-nefta xam** nefta ku hê jî nehatiye veqetandin
**neftî** şînê tarî
**nege** îftira
**negotî** **1.** dernebirî **2.** neaxiftî
**neguhêzbar** tiştê ku ji cihê wî nayê neqilkirin; dorpêçkirî
**neh** **1.** hejmara beriya dehan û piştî heştan **2.** jimareya 9’an *“**neh** qencî, tuxtek tirs”
**nehberk** lîstikeke ku bi neh keviran tê lîstin
**nehek** **1.** ji neh paran parek **2.** neh rojên beriya eyda qurbanê **3.** rojiya di van rojan de
**nehem*(-în)*** di rêza nehan de
**neheng [I]** **1.** egîd **2.** dêw, ûc
**neheng [II]** cureyekî masiyên girs û biguhan e
**neheq** **1.** bêheq **2.** ji rastiyê der **3.** bêdad *“**neheq,** lê dikeve tîra Heq”
**neheqî** **1.** zilm **2.** derî rastiyê **2.** bêdadî *“**neheqi**ya vî destî, ji ya vî destî re namîne”
**neheqî lê kirin** **1.** mafê wî desteser kirin **2.** heqê wî pêpest kirin
**nehên** **1.** nepen **2.** derzagon
**nehênî** **1.** nepenî, nediyarî **2.** derzagonî, derî qanûnan
**nehişî** **1.** jixweveçûyî **2.** benckirî **3.** dîn
**nehişî bûn** **1.** ji xwe ve çûn **2.** tevizîn **3.** dîn bûn
**nehmandin/dinehmîne /binehmîne** li pêşberî yekî tiştek xwarin û jê nedan wî
**nehs** **1.** kone **2.** şûm **3.** qeşmer
**nehs bûn** **1.** kone bûn **2.** şûm bûn **3.** qeşmer bûn
**nehsî** **1.** konetî **2.** şûmtî **3.** qeşmerî
**nehs kirin** **1.** rû dan **2.** şûm hîn kirin
**nehşem** roja ku dê tu carî neyê

**-îro here û nehşemê were** niha here û hêviya xwe ji vî karî yekcar bibire

**nehwirandin/dinehwirîne/binehwirîne** **1.** miremir kirin **2.** bildebild kirin

**nekelî** nepijî

**neker/nekir** **1.** kesê ku ji xwe re tu karî nake; noker **2.** teral *"nekero/nekiro dilkesero, kerewo/kiriyo xwerewo/xweriyo"

**nekes** bêkesayet

**neks** **1.** hilm û nefes **2.** parxan

**-neks çikîn** bêhn çikîn

**nelê** **1.** netêw, netê, hew **2.** lênehatî

**nema** **1.** qet, qe **2.** ji wir bi şun de, êdî

**-nema dikare** ji vir şun de nikare, hew dikare

**nemam** **1.** çiqilên daran ên ku ji bo çandinê hatine amadekirin **2.** şivikên darîn ku dê bibine dar; şitil

**neman** **1.** helak bûn **2.** têk çûn **3.** çûn hatenehatê

**nemaze** bi taybetî, xasma

**nemerd** **1.** bêbext **2.** necamêr

**nemêr** **1.** şindokê mêran **2.** mêrê ku endamê wî yê zayendî bi karê xwe ranabe; tirxes *"ê ku got û kir mêr e, ê ku got û nekir **nemêr** e, ê ku negot û kir şêr e"

**nemir** **1.** mirovê ku xizmeteke mezin dike, navdar dibe û her çiqas dimire jî navê wî her sax li ser zimanê xelqê dimîne **2.** hetahetayê, ebedî **3.** bêpayan

**nemrût** kirêt

**nemrûtî** kirêtî

**nenas** **1.** nezan, nebeled **2.** kes yan tiştê ku mirovî berî niha nedîtiye; mechûl, biyan *"her cihê **nenas**, payê xwe bide xas xas"

**nenîk** hestiyê nermik ê ku bi serê pêçiyan ve hêşîn dibe û piştî ku dirêj dibe tê birîn

**nenîkbir** alava ku pê nenîk tên qutkirin

**nenok** jina ku zarokan nayine

**nepak** **1.** neçê **2.** qirêjok

**nepax** tifika hesinkeran

**nepayîdarî** neberdewamî

**nepen** **1.** veşartî **2.** nehên **3.** nexuya

**nepenî** **1.** xwedî-raz **2.** nehênî *"berf di **nepeni**yan de, pere ba pintiyan dimîne"

**nepêt** **1.** bêsinc û bêtaqet **2.** bêçîn û gawestî

**nepijî** xav, kal
**nepixandin/dinepixîne/binepixîne** **1.** perçifandin **2.** pif lê kirin **3.** ba dan ber
**nepixîn/dinepixe/binepixe** **1.** ba hatin ber **2.** perçifîn
**nepox** **1.** tiştê ku pif dane ber û perçifiye **2.** pêlîstoka zarokan a ku ba dane ber
**neqandin/dineqîne/bineqîne** **1.** hilbijartin **2.** ji nav re girtin
**neqeb** **1.** navbera du tiştan **2.** qul, kun
**neql** **1.** raguhastin **2.** car, teql
**neqliyat** karê raguhastina baran *(bejî, deryayî, hewayî)*
**neql kirin** derbasî cihekî din kirin; raguhastin
**neqş** **1.** raçandin **2.** moçik *"gotinên pêşiyan, wek **neqş**ên li ser keviran e"
**-neqş û nîgar** moçik û resm
**neran** dara tizbiyan
**nerasterê** neyeksere
**nerd** cureyekî lîstikên qimarê ye
**nerde** astengên hesinî yên li dora pêlekan û şanişînan
**nerdigan** pêlekan
**nerît** tetbîq
**nerîtandin/dineritîne/bineritîne** tetbîq kirin
**nerîtî** tetbîqî
**nerm** **1.** nehişk, ter **2.** nezivir *"bitirse ji germa germ û mirovê **nerm**"
**nermahî** **1.** nehişkî, terîtî **2.** nezivirî, xavî
**nerme** tiştê ku bûjenên sext û zivir tê de tune ne
**nermegoşt** goştê bêhestî
**nermehur** hevrazê ku lê kevir û kuçik tunene
**nermekuxik** kuxika asayî ya ku mirov jê aziyê nake
**nermenerm** **1.** wexta ku hîn nerm e **2.** bi awayekî ku kes nebîne û nebihîze *"hêsin dikutin germegerm, mêran dikutin **nermenerm**"
**nermijandin/dinermijîne/binermijîne** bi mizdanê nerm kirin
**nermijîn/dinermije/binermije** *(tiştek)* bi mizdanê nerm bûn
**nermik** **1.** nezivir û bêgirnoz **2.** rehet û aramdar
**-nermika guh** goştê nerme yê li guçê jêrîn î guhî
**nermî** **1.** nermahî **2.** musamehe **3.** vehelîn *"bi **nermî**, mar ji qulê tê der"
**nermînka** hêdîka

**nerm kirin** **1.** rehn kirin **2.** hişkî jê birin **3.** aliyê zivir jê birin *“peyva xweş, keviran **nerm dike**”
**nermofis** nermok
**nermok** **1.** bêkêr **2.** bêxêr *“ji pêl û pêlekan metirse, ji nerm û **nermok**an bitirse”
**nesax** nexweş
**neseb** silale û esl
**nesîb** qismet *“**nesîb** çi be, ew e”
**nesrîn** gula biyanî
**nestêle** **1.** zarok **2.** xort **3.** kesê girîng
**neşmî** kesê ku pûte bi her karî dide; bihîstyar
**neşmîtî** bihîstyariya hemberî her tiştî
**neşter** kêrika bijîjkiyê ya tenik û pir tûj
**neşterger** bijîjkê ku pisporiya wî derz, şkestek û endamê leqiyayî ye
**neştergerî** karê ku neşterger pê radibe
**neşterxane** di nexweşxaneyan de jûra ku neşterger tê de emeliyatan dike dikin
**neşûştî** gorgorê gorgor; melûn
**net** **1.** çune, sifir, *(0)* **2.** betalbûyî, derehesab
**-net kirin** **1.** sifir kirin, fît kirin **2.** betal hesiban-din, ji hesaban derxistin
**netê** **1.** hêç **2.** netêw
**netêw** **1.** nelê, tuneyî **2.** betalbûyî
**netewe** **1.** gel, milet **2.** xelq
**neteweyî** têkildarî neteweyekî; miletî
**neteweperest** kesê ku harê neteweya xwe û hovîtiya dijî neteweyên din rewa dibîne
**neteweperwer** gelperwer
**netîce** **1.** akam, encam **2.** dawî, aqibet
**-netîce dan** **1.** encam dan **2.** bi dawî bûn
**netrik** xemla zîvîn a eniya jinan
**netû** **1.** yax **2.** eware
**neve** keça zarokê mirovî
**neveçirk** neveya neve û neviyî
**nevisî** zarokê ji kesekî/keseka din *(ji bo jinê zarokên hêwiya wê, ji bo mêrî zarokê mêrê jina wî yî berê)*
**nevî** kurê zarokê mirovekî
**nevîçirk** neviyê neve û neviyî
**newa** **1.** dengên ahengdar **2.** dengên mûsîqayî
**newal** cihokên kûr *“av ji çiyan diherike, li **newal**an belav dibe”
**newêd** **1.** hejmara piştî

heştê û nehan **2.** jimareya 90'î
**newêrek** tirsonek, ziravqetî
**newêrîn** tirsîn
**newq** di lêş de her du kêlekên bêhestî û vala
**-newq kiyan/kutan** hilkehilk kirin
**nex** şaxên tayekî
**nexasim** nemaze
**nexifîn/dinexife/binexife** **1.** bersojkî bûn **2.** hinav xera bûn
**nexş** hunera kêşan û çêkirina nîgar û resman li ser kevir, kaxez, pîne û hwd
**nexşe** agehiyên erdnîgarî ên xêzkirî; xerîte
**nexşesazî** pisporiya xêzkirina xerîteyan
**nexşenîgarî** pîşekariya xêzkirina xerîteyan; nexşesazî
**next** **1.** neqd **2.** qelend
**nexuya** nediyar, nedîtbar
**nexwe** wisa ye
**nexwende** nezanê xwendinê *"kesê **nexwende,** weke dara bê ber e"
**nexweş** **1.** kesê ku rewşa wî ya tenduristî xera bûye, nesax **2.** neçê **3.** kirêt *"bextê reş, mirovan dike **nexweş**"
**nexweş bûn** nesax bûn, azî kirin, bi êşekê ketin
**nexweşî** **1.** nesaxî **2.** nebaşî **3.** kirêtî
**-nexweşiya dirmdar** êşa ku ji kesekî bêtendurist belavî dorê dibe
**nexweşxane** saziya tîmarkirina nexweşan
**ney** amûreke mûsîqayî ya pifkirinê ye; bilûr
**neyeksan** newekhev
**neyjen** bilûrjen
**neyar** **1.** dijmin **2.** reqîb *"ji **neyar**an re, zarê şirîn û pişta hişk"
**neyarî** **1.** dijminî **2.** hevrikî
**neyînî** **1.** tiştê ku bersiva wê na ye û ne erê ye; menfî **2.** ramana ku aliyê nebûna tiştekî diangêje
**neynik** şûşeya ku mînaka mirovî berevajî dike û mirov xwe tê de dibîne; awêne *"xelq, **neynik**a meriyan e"
**neynûk** nenîk *"filan kes **neynûk** tune xwe pê bixwirîne"
**nezan** **1.** cahil **2.** nebeled *"ar, ji kesê **nezan** re bar e"
**nezanî** **1.** cahiltî **2.** nebeledî
**nezer** **1.** çavînî **2.** çavlêgerandin *"**nezer,** keviran jî diteqîne"
**nezer kirin** **1.** lê nêrîn **2.** bi niyêta xera lê nihêrîn
**nezêk** stewr

**nezir** boraq
**-nezir kirin** boraq bexişandin
**nezok** nezêk
**nêçîr 1.** karê lêgerîn û kuştina giyandarên kovî; seyd, rav **2.** ajala ku seydvan li pey dikeve *"bi tajiyê xelqê, **nêçîr** nabe"
**nêçîrgeh** qada nêçîrê; ravgeh
**nêçîrvan** kesê ku li pey kuştin û girtina ajalên beriyê û firindeyan diçe; seydvan/ravker ***"nêçîrvan,** nêçîra xwe nas dike"
**nêçîrvanî** seydvanî
**nêk** nîk
**nêm** kêm û îltihab
**-nêm girtin** kêm û îltihab girtin
**nêr 1.** mêr **2.** sewalê bi mûzî **3.** hêşînahiya qamir a ku nayê xwarin *"berxê **nêr,** li ber du makan e"
**nêrek** navnêrî
**nêremê** xunsa, jinemêr
**nêreng** cadûbaz, sîhirbaz
**nêrevan** pandî, panêr
**nêrg 1.** hêzdar **2.** tund
**nêrgiz** cureyekî kulîlkan e *"bi **nêrgiz**ekê bihar nayê"
**nêrik** qed an jî bistiya ter a giyayên ku tên xwarin
**nêrit** rewişt û tîtal
**-nêrîta civakî** rewişt û tîtalên ku civak ji xwe re datîne û dijberê wan tê şermezarkirin; rayîşa civakê
**-nêrîta giştî** rayîşa ku di nav hemû civakê de tê pejirandin û dijberê wê tê sezakirin
**-nêrîta ramyarî** rewişt û tîtalên ku rêvebiran pejirandine û dijberê wan ji çavê gelê xwe dikeve
**nêrî** hevserê bizinê *"karê sêwî, nabe **nêrî**"
**nêrîn [I]** mêrtî
**nêrîn/dinêre/binêre [II] 1.** nihêrtin **2.** mêze kirin **3.** dîtin
**nêrîz** cureyekî xenceran e
**nêving 1.** li gor her kes û tiştî cih û warê ku lê ye **2.** rayîşa civakê
**nêxin** mêwij
**nêz [I]** birçî
**-ji nêz de mirin** ji birçînan mirin
**nêzdemirî** kesê ku ji birçînan miriye
**nêz/nêzîk [II] 1.** ne li dûrê **2.** berdest
**nêzîk bûn 1.** hatin hindê **2.** li kêlekê rawestin
**nicimîn/dinicime/binicime** lingîrî bi rê ve çûn; kulîn
**niçandin/diniçîne/bi-**

**niçîne** **1.** nav tê dan **2.** temas kirin **3.** bi dest hişyar kirin
**niç** dengê nepejirandinê
**niçeniç** dengê domdar ê nepejirandinê
**niçeniç kirin** bi peyveke nediyar nerazîtî xuya kirin
**niçik** **1.** di raçandinê de çaviyên ku davêjên firêta tevnê **2.** nik, nikil
**niçîn/dinîçe/biniçe** **1.** temas lê bûn **2.** kirkirîn
**nifaq** munafiqtî, durutî *"**nifaq** û îtifaq, li ba hev nabin"
**nifir** tikaya ji bo ku kesek /tiştek tûşî karesatekê bê *"ez bi duayên te çênebûme ku bi **nifir**ên te jî bimirim"
**nifir kirin** bedua li yekî kirin
**nifrîn** nizaya xirabiyê; nifir
**nifsî** qutikê giranbiha yê ku di bin de tê lixwekirin
**nifş** nesil, zuriyet, dûm
**nifşparêz** kesê ku cudahiyê dixe navbera irq, dîn û deveran, xwe ji xelqê berztir û pîroztir dizane
**nifşnas** pisporê nesla rehek û giyaneweran
**niftik** kibrît, pîçke
**nigran** dudil
**nigranî** dudilî
**niha** **1.** ne berê ne jî paşê, ev dema ku em tê de ne **2.** *(r)* dema têdeyî
**nihan** **1.** nehên, nepen **2.** veşartî
**nihanî** **1.** *(di dema baran û berfê de)* cihê ku mirov bikaribe xwe bi de ber; berqef **2.** avayî *"ewrê sor ê spêdeyan, gazî dike karwaniyan, xwe bidine **nihani**yan"
**nihêl** erdê ku tê de çal, kort û kêrt hene
**nijad** **1.** irq, regez **2.** zayend **3**. netewe
**nijadkujî** qirkirina neteweyekê
**nijadperest** **1.** regezperest **2.** neteweperest
**nijde** **1.** êriş **2.** talan **3.** cerde
**nijdevan** **1.** rêgir û xelqşêlandî **2.** talanker **3.** cerdevan
**nijdevanî** **1.** rêgirî **2.** cerdevanî **3.** talankerî
**nijinandin/dinijinîne/binijinîne** bi awayek endazeyî ava kirin; jenandin
**nijinîn/dinijine/binijine** **1.** ava bûn **2.** hênijîn, pokinîn
**nijtin/dinije/binije** **1**. qewirandin **2.** bera yekî dan

**nik** hind, rex, kêlek
**nikil 1.** bêfila firindeyan **2.** lûtke
**nikilreş** nexweşiyeke firindeyan e
**nikilreşî** firindeya ku bi nikilreşê ketiye
**nimandin/dinimîne/binimîne 1**. nîşan dan **2.** sêwirandin **3.** hewandin
**nimêj 1.** perestişa misilamanan a rojê penc danan û di hin warên din de **2.** dirozge
**-nimêja nafileyê 1.** ne nimêja ferzbûyî, nimêja xêrê **2.** di îslamê de nimêja hin danên bixêr
**-nimêja qezayê** nimêja ku di wextê wê yê diyar de nehatiye kirin
**-nimêj kirin** îbadeta misilmanan bi cih anîn
**-nimêj derbas kirin** di wextê wê yê diyar de nimêj nekirin
**-nimêj qeza kirin 1.** nimêja xwe ya derbasbûyî bi cih anîn **2.** ber kesekî ku nimêj derbas kirine ve nimêj kirin
**nimêjkar** kesê ku bi berdewamî ji Xwedê re îbadetê dike *"heke **nimêjkar**ek tunebe, pêxasekî bigire û bîne"
**nimînandin/dinimînîne/binimînîne** temsil kirin
**nimînende 1.** nûner, temsîlkar **2.** qasidê saziyekê
**nimûne 1.** mînak **2.** ibret
**niqik** derince, pîle
**niqir** kêrtik, girtik
**niqirandin/diniqirîne/biniqirîne 1.** kêrtik-kêrtikî kirin, girtikgirtikî kirin **2.** tê de cerx vekirin
**niqêm** cureyekî kevirên giranbiha ye
**niqîn/dinique/biniqe** axînî kirin, ofînî kirin
**niqniqandin/diniqniqîne/biniqniqîne 1.** devjenî kirin **2.** belapêşkarî hev bûn
**niqre** sîtila tehtevêlkî
**niqrosk** dema ku xew dikeve çavan û serê mirovî xwar dibe
**-niqrosk hatin** hênijîn û stû di aliyekî de xwar bûn
**niquçandin/diniquçîne/biniquçîne 1.** niçandin **2.** quncirandin
**niqut** dilop, çilk
**niqutandin/diniqutîne/biniqutîne** dilopandin, çilkandin
**niqutîn/diniqute/biniqute** dilopîn, çilkîn
**nirên** dengê miremirê yî dirindeyan
**nirîn/dinire/binire** *(dirindeyên mînanî şêr, pi-*

*ling û hwd)* miremir kirin

**nirx 1.** biha **2.** qedr

**-nirxên mirovahiyê yên gerdûnî** her tiştê ku her kes giramiyê jê re digire

**nirxandin/dinirxîne/binirxîne 1.** bihanameya kel û pelan danîn ser **2.** erênî û neyîniya mijarekê destnîşan kirin; dahûrandin **3.** ferisandin

**nişdar** bijîşkê şkestekan; cerah

**nişdarî** bijîşkiya şkestekan; cerahî

**nişêt** nîşane, elamet

**nişirîn/dinişire/binişire 1.** bişkuvîn **2.** pizirîn

**nişîn/dinişe/binişe** niştin

**nişîngeh** niştingeh

**nişîv 1.** xwar **2.** nizm **3.** jêr

**nişmî** neşmî

**niştecih** akincî, şênî, dêman

**niştiman 1.** memleket **2.** welat *"**niştiman** bi çekan tê vegirtin û bi çekan tê standin"

**niştimanperwer** hezkiriyê welatê xwe

**niştin/dinişe/binişe 1.** rûniştin **2.** bi cih bûn **3.** lê danîn *"ji hespê daket, li kerê **nişt**"

**niştingeh** cihê ku mirov lê îqamet dike

**nitirandin/dinitirîne/binitirîne [I] 1.** kesek lê dan telandin **2.** payandin, dan raçav kirin

**nitirandin/dinitirîne/binitirîne [II]** *bi tiştekî tûj)* dar neqişandin û li serê tiştin nivîsandin

**nitirandin/dinitirîne/binitirîne [III] 1.** xemilandin **2.** arastin

**nivan 1.** mêvan, misafir **2.** rêwî

**nivandin/dinivîne/binivîne 1.** bi xew re kirin **2.** awilandin

**nivistin/dinive/binive 1.** nivîn, pal dan, razan **2.** telexewî bûn

**nivişt** kaxeza ku dua lê tên nivîsandin û di cihekî de tê daliqandin; hemayîl, bazbend

**niviz** nizm *"cihê bilind, ji mirovê **niviz** çêtir e"

**nivîn [I]** cihê ku li ser tê razan

**nivîn/dinive/binive [II]** nivistin

**nivîs 1.** xet, mextût **2.** di mijarekê de derbirina nivîskî

**nivîsandin/dinivîsine/binivisîne 1.** xet kirin **2.** bi tîpan xêz kirin

**nivîsgeh 1.** cihê ku kar û

bar lê tên gerandin **2.** kargeha ku kar û barên nivîsan lê tên gerandin

**nivîsîn/dinivîse/binivîse** nivîsandin

**nivîskar 1.** kesê ku berhemeke nivîskî çêkiriye **2.** kesê ku bi tîpan tiştin xez kirine

**nivîskî** kitêbî, ne devkî

**nivîşk** rûnê nû yê mastê kiyandî

**nivîşkan** kesê ku hin endamên wî bi nîvî nîvî dixebitin; nîvco, kêmlebat

**nixamtin/dinixême/binixême** nixumandin

**nixav** kûrik, pifik

**nixav kirin** kûrik tev dan û geş kirin

**nixumandin/dinixumîne/binixumîne 1.** veşartin **2.** çal kirin, bincil kirin **3.** serpeçûm kirin

**nixurî** zaroyê yekem ê dê û bavan

**nixwê** tiştê ne şor; bêxwê

**niwênt** fîlm

**niwêntgeh** cihê ku fîlm lê tên pêşandan

**niyan/dinê/binê 1.** gayîn **2.** hiltirandin, tûş bûn **3.** tewişîn

**niyar 1.** dik **2.** lîstikvan **3.** karê ku lîstikvan li ser dikê pêk tîne

**niyarî/niyarvan** lîstikvan

**niyaz** daxwaz

**niyêt 1.** mebest **2.** daxwaz *"**niyêt**a dilan, qeda sêrî"

**-niyêt kirin 1.** dil hebûn **2.** daxwazek di zêhna xwe de gerandin **3.** *(ji bo îbadetekê)* meqsed diyar kirin

**niza** daxwaza ji Xwedê; dua

**niza kirin** ji Xwedê daxwazek kirin; dua kirin

**nizar 1.** cihê ku tav lê nagire; qûze **2.** jar

**nizeniz** dengê domdar ê daxwaza tevî girî û naziyan

**nizeniz kirin** *(bi nazî û girî)* daxwaz kirin

**nizilandin/dinizilîne/binizilîne 1.** dawerivandin **2.** raparzandin

**nizilîn/dinizile/binizile 1.** dawerivîn **2.** raparzîn

**nizilok** parzûn

**nizm** nebilind û daketî *"av, cihê **nizm** de dikişe"

**nizmahî** nebilindî û daketîtî

**nizm bûn** daketin û bilind nebûn

**niznizok** zarokê ku bi girî û naziyan tiştan dixwaze

**nîçik** gilik

**nîç kirin 1.** *(heta ku dilopek jê nemîne)* vexwarin, noşîn **2.** bi ser xwe ve

kirin û bi temamî daqurtandin
**nîgar** resim
**nîgare 1.** wêneyê ku bi dest hatiye xêzkirin **2.** moçik
**nîgar kirin 1.** xêz kirin **2.** şayese kirin **3.** sêwirandin
**nîgarkêş** kesê ku nîgareyan dikêşe
**nîgaş** xeyal
**nîgaşî** xeyalî, aşopî
**nîk 1.** tîxe **2.** hesinê kevankirî yê serê doxteşiyê **3.** derziya kevan a masîgiriyê
**nîma 1.** nîvê heyvê **2.** hîva çardeşevî
**nîn 1.** net **2.** tune
**nîr [I]** dar an jî hesinê ku didine ser stûyê ga û gamêşan da ku erebeyê an jî cotî bikêşin *"gayê qelb, **nîr** dişkîne"
**nîr [II]** dem
**nîsan** meha avrêlê *"**nîsan** e, dew li kîsan e"
**nîsk** cureyekî zêd e û piranî jê şorbe tê çêkirin *"**nîsk**ê mevêjin dewsa kizinê, berxê mevêjin berê bizinê, malê nebin cem malbavana jinê"
**nîske** alavake ku ji şûşeyê tê bidestxistin û bi kêrî mezinkirina tiştên pir biçûk tê
**-nîskeya bijîjkiyê** cureyekî nîskeyên ku di zanistên bijîjkiyê de tê bikaranîn
**-nîskeya çêv** di çavan de beşa ku bînahiyê zelal dike
**nîsko** zûxeydok
**nîskok** di fîzyayê de navenda tevgerê
**nîşan 1.** elamet **2.** şop **3.** xelata serkeftinê *"**nîşan**a mirinê, xwederîtin e"
**-nîşan dan 1.** nimandin **2.** pêşandin, rapêşandin *"ji tunebûna şêran, rovî xwe **nîşan didin** wek guran"
**nîşane** nîşan
**nîşangeh** nikilê ku bi serê çekan ve ye û bi kêrî rastlêxistinê tê; mêşa tifingê
**nîşanî** xelatên bûkê yên ku elameta zewaca şûkirina wê ye
**nîşanî kirin** *(da ku şûkirina wê eşkere bibe)* xelatek dan bûkê
**nîşank** elametên leşkerî
**nîşe** têbinî, kurterave
**nîşgeh 1.** li balafirgehê qada daketina balafiran **2.** qada daketina firokeyan
**nîtik** nîçika quzan
**nîv 1.** ji du parçeyan parçeyek **2.** ji du paran pa-

rek *"rev, **nîv**ê mêraniyê ye"

**-bi nîvî bûn** bi qasî ji du paran parekê rê hildan

**-di nîva xwe de qurifîn** **1.** di navendê de qut bûn **2.** di ciwaniya xwe de mirin

**nîvek** ji du paran parek

**nîvekarî** hevpariya bi nîvenîvî

**nîvenîv** bi qasî ji du paran parek

**nîvî** nîvek

**nîvkad** nîvçember

**-nîvkada parzemînî/erdîn** beşa dinyayê ya ku bejahî ye û piraniya wê li nîvkada bakur e

**-nîvkada deryayî** beşa cîhanê ya ku ji sedî heftêyê wê derya ye

**nîvro** danê ku tav di nava esmên de xuya dibe û siha heyberan bi qasî cîsman dibe

**no** **1.** tûj **2.** xeşîm û bi tund **3.** dirinde *"hirçê **no,** nayê rê"

**nobe** dor

**nobedar** nêrevan

**nod** newêd

**nodem*(-în)*** di rêza newêdî /nodî de

**nogin** çêleka sêsalî

**nok** cureyekî zêd e û xwarinên curecureyî jê tên çêkirin *"**nok** heye diran tuneye, diran heye nok tuneye?"

**noker** **1.** hevpişkê karên neçê **2.** xulamokê berjewendiyên xelqê

**nokik** rêjeya hejmarî ya ku di azmûnê de tê hildan

**nola/nolî** **1.** mîna/mînî, mînanî **2.** weke/wekî

**noq** binavbûn, gutbûn

**noqandin/dinoqîne/binoqîne** binav kirin, di avê de gut kirin

**noqar** navgîna zeryayî ya ku di binê avê de diçe

**noqav bûn** binav bûn, di avê de gut bûn

**noş** **1.** afiyet **2.** tenduristî

**-noşî can be** afiyet be, loşî can be!

**noşav** hemû cureyên vexwarinê, meşrûbat

**noşîgiyan** pîrozkirina yekî ji ber kinca wî ya nû an jî xebata wî ya baş

**noşîgiyan kirin** *(kesek ji ber tiştekî baş ve)* pîroz kirin

**noşîn/dinoşe/binoşe** bi xweşî û dilaramî vexwarin *"dew tune **binoşe**, li çarsî û bazaran rûn difiroşe"

**notirvan** nobedar

**nozde** **1.** hejmara beriya bîstî û piştî hejdehan **2.** jimareya 19'î

**nuhtin/dinuje/binuje** **1.** îsabet kirin **2.** hingaftin **3.** sotin
**numayîş** xwepêşandan
**numayîşgeh** qada xwepêşandanê
**nuqte** xal
**nuqteşanî** xalbendî
**nuqurçandin/dinuqurçîne/binuqurçîne** niquçandin
**nuwaze** pir bedew, pir delal
**nû** teze, ne kevn *"**nû** hatin, kevn hilatin"
**nûbar [I]** berê nû û teze
**nûbar [II]** cureyekî kevanên ku pê çend tîr bi hev re tên avêtin
**nûbar [III]** doran
**nû bûn** teze bûn
**nûciwan** xortê nûgihiştî
**nûçe** **1.** xeber **2.** agehiya di heqê bûyerekê de
**nûçegihan** kesê rûdanan digihîne çapemeniyê; salixdayî
**nûjen** hevdem
**nûjenî** hevdemîtî
**nûma** heyvik, hilal
**nûn** pênasa hera asan a heyberên fîzyayî û kîmyayî
**nûner** **1.** temsîlkar, nimînende **2.** qasidê saziyê
**nûrandin/dinûrîne/binûrîne** **1.** qat kirin **2.** jenîn, dan ser hev **3.** bi keys kirin
**nûser** nivîskar
**nûz** tahmxweş
**nûza** têjika ku nû ji maka xwe bûye
**nûzenûz** kûzekûz, kûrekûr
**nûzenûz kirin** kûzekûz kirin, kûrekûr kirin

# O

**o/O** tîpa hejdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke dirêj e, cîderka wê paşderkî ye, di belavbûna wê de dev gilover e û asta belavbûna wê nizm e

**-o! [I]** baneşana gazîkirinê ya nêrzayan e *mînak: Heseno tu li ku yî!/welato tu xweş welatî!*

**-o {II]** **1.** paşgireke rengdêrsaz e *mînak: kuşo, fîto, gildo, gêjo* **2.** paşgireke kurtkiriniyê a serenavan e *mînak: Cindo, Misto*

**ober** çarşeva mezin

**oberik** çarşeva biçûk

**ode** jûr

**of!** baneşana bêhntengiyê

**ofeof kirin** **1.** ji ber xem an jî êşekê gotin: ‘of!’ **2.** ber tiştekî ketin

**ohr** tewl bi tewl çêrandina sewalan

**ohr bûn** *(da ku sewal biçêre)* di kêp de tewilîn

**ohr kirin** *(da ku sewal biçêre)* kap kirin û tewilandin

**ol** **1.** mezheb, terîqet **2.** dîn

**olam** **1.** xizmet **2.** paletiya xelqê *“axa bi xulam, bi **olam** û bi tentene ye”

**-olama dewletê** xizmeta mecbûrî

**olamkar** **1.** xizmetkar **2.** paleyê xelqê

**olamkarî** **1.** xizmetkarî **2.** paletiya xelqê

**olan** halan

**olan dan** **1.** deng vedan, bang vedan **2.** halan dan

**olaq** hespê ku ne esîlza ye

**olçim** devbelaş, devçepel

**oleder** tevgera dijî dîn û terîqetê

**olederî** dijberiya dîn û terîqetê

**oldar** dîndar

**olintî** bêkar û xemsar

**olî** dînî

**olk** ohr

**olperest** dîndarê nezan

**omet** umet

**omit** mefer, hêvî

**omitî** dilovan

**-omitî li yekî kirin** li cihekî xerîb li yekî xwedî derketin

**-omit kirin** hêvîdar bûn
**omitwar** hêvîdar
**onc** kemax
**onî** darên ku li gor hin pîvanan qutkirî, kereste
**oqe** cureyekî mengiraniya îslamî ye
**or** zik
**ormeşk** ziktêrdek
**orqelêş** dirindeyê ku zikê nêçîra xwe diqelêşe
**oran** bistikê tiştê çandî; qesel
**oreor** dengê dewêr; bore-bor
**-oreor kirin** *(dewar)* qare-qar kirin
**orisp** fuhûş, qûndetî
**orispî** fahişe, qûnek
**orîn/diore/biore** qarîn *(dewar)*
**orînî** oreor
**-orînî pê ketin** ji nişkê ve oreor kirin
**oro!** lo!
**ote** ode
**ox!** baneşana kêfxweşiyê
**oxilme** **1.** lêgerin û tese-lîkirin **2.** ceng û çop
**-roja oxilmeyê** heyama ceng û çopê
**oxilme kirin** **1.** teselî ki-rin **2.** lê gerîn
**oxir** yom, qudûş
**-oxir be** riya te vekirî û bê teşqele be
**oxweş!** baneşana şabûnê
**-oxweş bûn** **1.** *(di zimanê zarokan de)* pir xweşik bûn **2.** bi rewşa heyî şabûn
**-oxweş kirin** bi rewşa pêkhatî kêfa xwe anîn

# P

**p/P** tîpa nozdehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê lêvkî ye û awayê belavbûna wê girtî û hişk e

**pa** pê

**pace** di avahiyan de her kuna ku li derve dinêre

**pacerê** di dîwarên avahiyan de valahiyên ku ji bo ronahiyê tên hiştin û çarçiveyeke camkirî tê de tê bicihkirin

**pac** nîşaneya serketinan a ku didine kesê serketî

**paç [I]** careke ramûsanê *“kîr bi **paç**an mezin nabe”

**-paç kirin** ramûsandin

**paç [II]** pirtiyê qumêş

**-paç li sêrî girêdan** keça xama zewicandin

**paçal** zengo

**paçe** **1.** devling, pance **2.** ser û piyên sewalên ku goştê wan tê xwarin **3.** şorbeya ser û piyan

**paçik** **1.** piyên biçûk **2.** tiştê ku hatiye pêçan **3.** bûjenên pêçayî yên ji karistanê **3.** parçeyeke qûmêş *“kum hebin, **paçik** zehf in”

**paçik kirin** **1.** tiştek lê alandin **2.** bûjeneke ku hatiye hilberandin tiştek lê alandin *(kirin qutî, sindoq û derdankên din)*

**paçinî** **1.** sergincir **2.** qirêjok

**paçî** *(di zimanê zarokan de)* maç, ramûsan

**paçî kirin** *(di zimanê zarokan de)* maç kirin, ramûsandin

**padaş** **1.** diyarî **2.** qencî **3.** şabaş **4.** xelat

**padaş kirin** xelat kirin

**padîşah** paşe

**pag** **1.** xirbe, kelefe **2.** erdê ku lê avahî tên çêkirin; erse

**pageh** qatê binî; jêrzemîn

**pager** gera hêzên ewlekariyê ya di nav taxan bi awayekî dorvegerî

**pahn** pehn

**pahnik** pehnik

**pahnî** panî

**pahtin** pehtin

**paj** pişk, par

**pajne** paniya solê

**pak 1.** paqij **2.** çê **3.** qenc
**pak bûn 1.** çêbûn **2.** paqij bûn *“bav ku **pak bûya**, ev zuriyet bi dû nediket”
**pakdil** dilpaqij
**pakî 1.** çêyî **2.** paqijî *“cihê ku **pakî** dest dide, xerabî çi ye?”
**pakîze 1.** paqij **2.** duşîze
**pak kirin 1.** qencî kirin **2.** paqij kirin **3.** bijûn kirin
**paknivîs** nivîsa ku baş tê xwendin
**pakrewan** şehîd
**pakrewanî** şehadet
**pal 1.** qûntara çiyê **2.** pişt **3.** zevî
**palan** kurtanê ku davêjin ser pişta keran *“şohreta kerî, **palan**ê wî ye”
**-palan qelibandin** dest bi zexeliyê kirin û fizirîn
**palas** berika ji mûyê bizinan *“heft hevling, li ser **palas**ekê di avê de diçin”
**palav** kîsê xavik û tenik ê ku ser zarok û têjikên nûbûyî di dundirê wî de tên dinyayê
**-palav dalêstin** *(maka têjikê)* bi dalistinê têjik ji kîsê xavik û tenik rizgar kirin
**palavtin/dipalêve/bipalêve** paravtin
**palavgeh** cih û îzgeha dawerivandina bûjenan
**palavte 1.** parzûn **2.** tiştê raparzandî
**palax 1.** cureyekî çêreyê ye **2.** çêreya dirêj û himbiz
**pal dan 1.** spartin **2.** velezîn **3.** razan
**paldank 1.** kursî, sendelî **2.** piştek, balîf **3.** sparte
**pale** karker, îşkar, kirêkar *“dasa **pale**yî, nayê dizîn”
**palem** pêşa dirêj a ku digihêje erdê
**paletî** xebata li kargeh, zevî, bax û rezan a bi destheqekê
**palewan 1.** gemşo, zoranker **2.** mêrxas
**palewanî 1.** gemşoyî, zorankerî **2.** mêrxasî
**palgeh 1.** balîf **2.** kursî
**palik 1.** barê biçûk **2.** cilika ku di bin kurtên de davêjin ser pişta keran
**palir** erdê ku dora wê hatiye sûrkirin
**palpişt** piştek
**palpiştî 1.** destek **2.** hevpişkî
**palûke** karistan
**palûte** xebata bi karbeşî
**paldûm** qûş
**pan [I]** payîn
**pan [II]** pehn
**panaz** mucewherên qulebî/sexte

**pance/pancik** devdeling
**-pance hilçinîn** devdeling hildan jorê
**pançilokî 1.** qermîçokî **2.** daliqî
**pançilokî bûn 1.** qermîçokî bûn **2.** daliqîn
**pandirûs** nîvco, nivîşkan
**pandî** çavdêr
**pandîgeh** çavdêrxane
**panêr** pandî
**pangeh** gom
**panik** pehnik
**panî 1.** paşiya pê **2.** dawiya solê *“ê ku jinê berde, li **pani**yê nanêre**”**
**panjehr** dermanê jehrkuj
**panos 1.** çira **2.** şemal
**-panosa deryayî** çiraya zeryayî
**papûç** pêlavên zarokan
**papûr [I]** riya erebeyan, riya şoşê
**papûr [II]** alava ku li serê xurek tê pehtin û bi neftê dixebite
**papûr [III]** keştiya rêwiyan
**paqij 1.** pak, neqirêj **2.** xwîşirîn **3.** şûştî
**paqijî 1.** pakî, neqirêjî **2.** xwîşirînî **3.** şûştîtî
**-paqijiya regezî** şer û qirêna dijî irqekê ku hebûna wî li herêmekê nayê xwestin
**paqij kirin 1.** pak kirin **2.** şûştin
**par [I]** sala borî *“feqîr û jar, wek **par** û pêrar**”**
**par [II] 1.** behre **2.** beş **3.** hise **4.** bir *“du **par**ên xizaniyê, nezanî ne”
**par [III] 1.** paş, dû, pişt **2.** pişt ve
**-ji paran ve** ji aliyê piştê ve; paş ve
**parak** cureyekî xwarinê ye û ji êrd tê çêkirin
**parastin/diparêze/biparêze 1.** berevanî kirin **2.** hemete kirin *“gund, bê se nayê **parastin”**
**parav [I] 1.** kesê ku her dem galte, henek û pêkenînan dike û ji tixûban dertê **2.** bizava beredayî û bêbingeh
**-paravek dan xwe** *(her çiqas ziravqetî be jî)* xwe gijgijandin û rahiştin karekî
**parav [II]** galte, henek
**parav [III] 1.** teze, nû **2.** ter, şil
**paravî [II]** baravî, dawerivî
**paravî bûn** baravî bûn, dawerivîn
**paravî kirin** baravî kirin, dawerivandin
**paravtin/diparêve/biparêve 1.** dakirin **2.** parzûnandin **3.** dawerivandin
**parçe 1.** jê hinek **2.** par

3. tîke **4.** beş

**parçe bûn 1.** jê hinek veqetîn **2.** parve bûn **3.** tîke bûn **4.** beş bûn

**parçe kirin 1.** jê hinek veqetandin **2.** parve kirin **3.** tîke kirin **4.** beş kirin

**parçeparçeyî 1.** parparî **2.** tîketîkeyî **3.** qisimqere **4.** hûrhûrî

**parçeparçeyî bûn 1.** parparî bûn **2.** tîketîkeyî bûn **3.** qisimqere bûn **4.** hûrhûrî bûn

**parçeparçeyî kirin 1.** parparî kirin **2.** tîketîkeyî kirin **3.** qisimqere kirin **4.** hûrhûrî kirin

**pardar 1.** şirîk **2.** hevpar

**pardarî 1.** şirîkatî **2.** hevparî

**pardem** xebata yekdanî/nîvrojî

**parêz 1**. li gorî pîvaneke tenduristî mîhengkirina xwarin, vexwarin û têkiliya zayendî **2.** bîstan

**-parêza devê xwe nekirin** persenga devê xwe û endazeya gava xwe nezanîn

**parêzer 1.** kesê ku ber yekî din ve berevaniyê dike **2.** wekîlê qanûnî

**parêzgar 1.** walî **2.** serdar

**parêzgarî 1.** wilayet **2.** eyalet

**parêzgeh 1.** bingehê parastinê **2.** cihê karê serokê bajêr; baregeha bajarvaniyê **3.** bajarê mezin ê ku bi destê parêzgarekî tê rêvebirin

**parêzkar 1.** muhafezekar **2.** mertalê ji bo xweparastinê

**parêzkarî** muhafezekarî

**parêzname** nameya beravanîkirinê ya li dadgehê

**pargon/pargûn** cihoka biçûk a li dora konan

**parî** xwarina bi qasî daqurtandinekê; cûmeke xwarinê *"giliyekî wisa bibêje ku **pari**yekî nên bipêje**"**

**parjimare** jimareyên dabeşkirinê; jimareyên şikestî yên *wekî 1.5, 3.6 û hwd*

**parjinandin/diparjinîne/biparjinîne** *(r)* hevokek ji aliyê rêzimanî ve dahûrandin û ferisandin

**parî [I]** xwarina bi qasî cûmekî

**-parî di dêv de werimîn** qotê devê xwe cûtin û qurt nekirin

**parî [II]** cureyekî çêreya ku dişibihe xilorkê

**par kirin** beş kirin, teqsîm kirin

**parleşker** di herêmekê de milekî artêşê

**parmend 1.** hevpar **2.** xwedîpar, şirîk
**parmendî 1.** di karekî de hevparî **2.** di qezencekê dexwediyê pareke kifşkirî; şirîkatî
**paronek** golikê yeksale
**pars** destê xwe dirêjî xelqê kirin da ku sedeqeyekê bidinê; rewcî, gedandin *"bila dil bi dil be, tûrikê **pars**ê li mil be"
**parsek** rewcîger, geda *"du **parsek**, li deriyekî nabin"
**parseng** perseng
**parsiw** parsû
**parsî** parsû *"**parsi**yê jinê xwar e"
**pars kirin** rewcî xwastin, gedandin
**parsû** hestiyên parxanê
**part 1.** 30 gurzên giyayî **2.** lûsên zadê çinandî
**partî** rêxistina bipergal
**partîzan 1.** alîgir **2.** hewandiyê rêxistineke bipergal
**part kirin 1.** 30 gurz giya dan ser hev **2.** zadê dirûtî lûslûsî dan ser hev
**partpartî 1.** komkomî **2.** lûslûsî
**partpartî kirin 1.** komkomî kirin **2.** lûslûsî kirin
**parxan** hestiyên ku di her du kêlekên lêş de ne
**parxêl** ereboka hespan
**parzemîn** ji şeş parçeyan her parçeyekî nîgaşî yê cîhanê yî ***wek:*** *asya, ewropa, amerîka, awistralya, afrîqa, antarktikayê*
**parzûn** alava dawerivandinê
**parzûnandin/diparzûnîne/biparzûnîne 1.** raparzîn **2.** dawerivandin
**pas 1.** tiştê servekirî **2.** rût û tazî
**pasar 1.** parçeyê ku di serbanê de dirêj dibe **2.** rêşiyên ku bi serê xalîçeyan ve dirêj tên hiştin
**pasawe** hincet, behane
**pasevan 1.** nobedar **2.** parastvan
**pasik 1.** rastahiya vala **2.** qad, meydan
**paspaye** bêkesayet
**pastîn** paşstû, berstûk
**paş 1.** pişt **2.** dawî
**-paşê** piştî vê û ne niha
**-bi paş ve avêtin 1.** egle kirin, taloq kirin **2.** bi derengiyê xistin
**-bi paş ve dayîn** cardin lê vegerandin
**-paş baranê ga cil kirin** piştî bûyerê lez dan xwe
**paşbend 1.** ji dawiyê ber bi destpêkê; çep **2.** paşgir *"kitêba meri-

yan, **paşbend**î tê xwendin”

**paşberek** di şeran de eniya ku li paşiyê disekine

**paşbêj** kesê ku kurtepistan digerîne

**paşbêjî** kurtepist

**paşdeman** pêşdeneçûn

**paşdir** segê har

**paşe** **1.** torin **2.** desthilat *“kereng tên ji kaşan, xwarina ker û cehşan çi dike li mala **paşe**yan”

**paşepêl** dijî aliyê rast

**-paşepêl siwar bûn** berê xwe dan boçika sewalê û pişta xwe dan sêrê wê

***-(kincek)*** **paşepêl li xwe kirin** aliyê piştê dan pêşiyê, ê pêşiyê jî dan piştê û wisa li xwe kirin

**paşgir** *(r)* qertafa ku tê dawiya peyvan wek: mêr***anî***, raz***dar***, cenga***wer***...; paşpirtik, paşbend

**paşgo** pêvek, îlawe

**paşgotin** **1.** gotina dawiyê **2.** kurtepist

**paşil** **1.** paxil **2.** hembêz **3.** cêba paşilê *“destê dizan naçe **paşil**ê”

**-di paşila xwe de xwedî kirin** jê hez kirin û bi her awayî parastin

**paşil bûn** **1.** hamile bûn, ducanî bûn **2.** xwe spartin yekî û di bin mineta wî de man

**paşî** dawî

**paşîn** **1.** a/ê hera/herî dawiyê **2.** axirî

**-cara paşîn** sefera dawiye, qola axiriyê

**paşîv** **1.** di sahûra rojiyê de danê xwarinê **2.** xwarina danê nîvê şevê

**paşling** **1.** feşk, pêxem **2.** pêavêtinber

**paşmîr** kizîr

**paşpenî** dema ku kesek ne li cihê xwe be

**-biryara di paşpeniyê de** di dadgehê de darizandina kesekî bêyî ku ew li wir be

**paşpê** dijî îstiqameta asayî

**paşpêkî** dijayetiya aliyê asayî

**-paşpêkî meşîn** pişta xwe dan îstiqameta aliyê çûnê û wisa meşîn

**-paşpêkî siwar bûn** berê xwe nedan aliyê çûyînê û wisa siwar bûn

**paşnav** **1.** navê malbatê ê ku pê tê nasîn **2.** leqeb

**paşstû** katara stûyî

**paşteng** qûşa ku davêjin dawiya palanê keran da ku di serejêran de bi ser re neşimite

**paşveçûn** **1.** şundeman **2.** vegerîn

**paşverû** xêrnexwaz

**paşvexistin** eglekirin
**paşwer** **1.** kesê ku li pey tê **2.** serokê ku cihê serokê berê digire
**paşwerî** serokatiya çend kesan a li pey hev
**pata** **1.** wekhev **2.** fît
**pata bûn** **1**. wekhev bûn **2.** fît bûn
**patal** xirdik, qamkinik
**patalî** xirdiktî, qamkiniktî
**pate [I]** silav
**-pate lê xistin** silav dan
**pate [II]** pîne
**-pate kirin** pîne kirin
**patexur** **1.** xwefiroş **2.** darê destê neyaran
**patêk** paçik, deste
**-patêkek pere** tomarek dirav
**-patêk bi patêk keys kirin** deste bi deste dan ser hev
**patik** paşstû, şatik
**patile** cureyekî nên e
**patîle** çavdêrî
**patox** mêweya xerabûyî
**patpatik** tiving û demançeyên zarokan a ku pê dilîzin, teqteqok
**patrome** lûl, fetrûm
**patrome kirin** lûl kirin, fetrûm kirin
**paverîng** mêweyên ku bi emadê xwe ji darê rijiyane erdê
**pawan [I]** **1.** panêr **2.** bendewar
**pawan [II]** çêregeha taybet
**pawan [III]** gerandina kar û baran bi awayekî navendî; rejî
**pawankar** kesê ku gerandina kar û baran ji bilî xwe nade kesî; rejîkar
**pawankarî** rejîkarî, karê ku ji aliyê komekê tenê ve tê gerandin
**-pawankariya bazirganî** kar û barên ticarî yên ji aliyê komikeke berjewendîparêz ve
**pax** hesta tirsê a domdar
**paxav [I]** metirsî, fikar
**paxav [II]** qîm û qedrdanî
**-paxav *(pê)* kirin** qîm pê anîn, pê qayîl bûn
**paxil** **1.** paşil **2.** hembêz *"destê wî, rast naçe **paxil**a wî"
**paye** **1.** rutbe, raye **2.** rûmet **3.** pile
**payeberz/payebilind** rayedarê bilind
**payeberz/payebilind bûn** rutbeyeke ji a berê zêdetir wergirtin
**payedar** **1.** rayedar **2.** mandî, nemir
**payetext** bajarê sereke yê rêvebiriya welêt; serbajar
**payîn/dipê/bipê** **1.** çav li rê bûn **2.** li bendê man **3.** raçav kirin

**payîz** demsala beriya zivistanê *“bihar hate rakirin, **payiz** hate dakirin”
**payîze** cureyekî genimê ku tovê wî payîzê tê reşandin
**paymal** talan
**paymal kirin** talan kirin
**paytext** payetext
**pazdeh 1.** hejmara beriya şazdehan û piştî çardehan **2.** jimareya 15’an *“ji gotinê heta kirinê**, pazdeh** sal hene”
**pazdehem*(-în)*** di rêza pazdehan de
**pazen** pîneyê pemboyîn
**pazne** heyveron
**peder** bav
**pederşahî** baviksalarî
**pegr** dûrd
**pegrandin/dipegrîne/bipegrîne** di tiştên avî de unsurên giran daxistin jêrê
**pehîn** lêdana bi piyan
**-pehîn avêtin** bi piyan lê xistin
**pehn 1.** rast **2.** meht **3.** tehtevêlkî
**pehnî/pehnayî 1.** rastayî **2.** mehtî
**pehn bûn 1.** meht bûn **2.** pelçiqîn
**pehn kirin 1.** meht kirin **2.** pelçiqandin
**pehtin/dipêje/bipêje 1.** ji xwarinê re amade kirin **2.** pijandin **3.** stewandin *“temûz **dipêje**, tebax dirêje”
**pejirandin/dibejirîne/bipejirîne 1.** qebûl kirin **2.** çespandin
**pejirîn/dipejire/bipejire 1.** qebûl bûn **2.** çespîn
**pejk** çilka bijiyayî
**pejilandin/dipejilîne/bipejilîne 1.** hilweşandin **2.** wêran kirin
**pejilîn/dipejile/bipejile 1.** hilweşîn **2.** wêran bûn
**pejinandin/dipejinîne/bipejinîne** kesaxtin
**pejmûrde 1.** jihevdeketî **2.** perîşan, şerpeze
**pejn** pêjn
**pekandin/dipekîne/bipekîne 1.** pengizandin **2.** firandin **3.** derew kirin
**-jê pekandin 1.** dexesî lê kirin **2.** jê behicîn
**pekîn/dipeke/bipeke 1.** pengizîn **2.** baz dan **3.** firîn
**pekîner 1.** zirzop **2.** jiberavêj
**pel [I] 1.** per **2.** rûpel **3.** belçik *“**pel**ên darê, darê dixemilînin”
**pel [II]** car, teql, qol
**-pel xwarin** gon xwarin
**pelandin/dipelîne/bipelîne 1.** teselî kirin **2.** temasî lê kirin **3.** miz

dan
**pelaş 1.** giyayê bêkêr; pûş **2.** kewaşe
**-pelaş kirin** kewaşe kirin
**pelate 1.** belav **2.** belawela
**pelax** çêreya hişkbûyî
**pelaxtin/dipelixîne/bipelixîne 1.** bi ser hev de tewandin û pelçiqandin **2.** dewixandin û hûrî ser hev kirin
**pelçim** belçik
**peldank 1.** rûpeldank **2.** diravdank
**pele** lez
**pele kirin** lez kirin
**pelemar 1.** firsenda demdemî ya ku her carê bi dest nakeve **2.** êrîş
**pelemar dan** êriş kirin
**pelendar 1.** çoyê darînî an jî ji lekê yê ku hêzên ewlehiyê bi kar tînin û bi kêrî lêdanê tê **2.** fîşenga ronîker a ku ji bo kifşkirina hedefê tê teqandin
**pelg** cureyekî daran e *"sîbera pelgê, ne ji bo xwe ne ji bo xelqê**"**
**pelije** qismet, nesîb
**pelijîn/dipelije/bipelije 1.** bizivîn **2.** xebitîn
**pelisandin/dipelisîne/bipelisîne 1.** hûr kirin **2.** çînîn
**pelişandin/dipelişîne/bipelişîne** hilweşandin, rûxandin
**pelişîn/dipelişe/bipelişe 1.** tev dan, tev li hev kirin **2.** hilweşîn, rûxîn
**-pelişîn hev** hilperikîn hev û li hev xistin
**pelişqe 1.** pûç **2.** kevin û peritî
**pelişqe bûn 1.** pûç bûn **2.** kevin bûn û peritîn
**pelixandin/dipelixîne/bipelixîne** pelaxtin
**pelixîn/dipelixe/bipelixe 1.** bi ser hev de tewîn û pelçiqîn **2.** dewixîn û hûrî ser hev bûn
**pelîd 1.** nebaş **2.** îblîs, şeytan
**pelîdî** şeytanî
**pelîka** behane, hincet
**pelîn** tiştê ji pelan çêbûye
**pelîse** pelije, qismet
**pelp** pelîka
**pelpût kirin 1.** eyb bi derewan veşartin **2.** derew pîne kirin
**pelû** kanikên çavan
**pelûl** pelûrê ku bi doşavê hatiye çêkirin
**pelûr** xwarinên ku zêde pijiyane û êdî şibihîne hêvîr
**pembo** çêreyeke cihên avî ye û jê qumaş û pîne tên bidestxistin
**pemboyîn** pînê û pirtiyê ku ji pemboyî çebûye
**pena 1.** hawar **2.** daxwaz

**3.** hêvî
**penaber** kesê ku hawara xwe digihîne welat, alî an jî kesekî da ku jiyana wî ji belayê bê parastin; koçberê bêwar, multecî
**penaberî** îltica, koçberî
**penah** îltica, koçberî
**penahgeh 1.** cih an jî welatê ku penaberan dihewînin **2.** wargeha penaberan
**penaxwaz** kesê ku hewandinê ji aliyekî dixwaze
**penc** lepê dirindeyan
**-penc kirin** bi pencikan lê xistin
**penceşêr** şêrpence
**pencik** neynûkên ajalên *wekî se, gur, pisîk û hwd*
**pencirûk** erîşa bi neynûkan
**-bi pencirûkan li qûna xwe ba ketin** ji kirina xwe poşman bûn û beriya xelqê nefsa xwe ceza kirin
**pend 1.** nesîhet, şîret **2.** gilok *"**pend** pendên cenabê Mûsa ne, fêl fêlên gorgorê firewin in"**
**-pend dan** şîret kirin
**pendî** xuya, diyar
**peng** sekinî û neherikbar
**pengav 1.** lîtav, avherî, herîrêtik **2.** cihê ku av lê hildipengire
**pengirîn/dipengire/bipengire 1.** *(av)* gol bûn û fûrîn **2.** *(endamê êşiyayî, şkiyayî û hwd)* xwîn tê de reş bûn û werimîn
**pengivandin/dipengivîne/bipengivîne** *(av)* dan sekinandin û kişana wê dan astengkirin
**pengivî** ava sekinî û nekişiyayî
**pengivîn/dipengive/bipengive** *(av)* sekinîn û nekişîn
**pengizandin/dipengizîne/bipengizîne 1.** hilfirandin **2.** hilpekandin
**pengizîn/dipengize/bipengize 1.** hilfirîn **2.** hilpekîn
**pengîn/dipenge/bipenge** *(tiştê avî)* kom bûn
**penî 1.** pişt **2.** xuya **3.** bêdeng
**penîr** adaneke şîrê nekelandî yê havênkirî ye
**pep/pepik 1.** *(di zimanê zarokan de)* pê **2.** *(di zimanê zarokan de)* sol an jî gore
**pepûk 1.** cureyekî çivîkan e û dike qebeqeb **2.** bêkes û belengaz
**-pepûkê!** belengazê, bêkesê!
**-pepûko!** belengazo, bêkeso!
**peqandin/dipeqîne/bipeqîne** tiştên nepixî te-

qandin

**peqijîn/dipeqije/bipeqije** xwe bi xwe peqîn

**peqijok** peqpeqokên sirûştî

**peqîn/dipeqe/bipeqe** **1.** bişkuvîn **2.** bişku vebûn *"gul li gulê dinêre û **dipeqe"**

**peqpeq** cihê werimî yê bi kêm û amas

**peqpeqok** **1.** gogikên ku bi ser ava pir kelyayî û kefa sabûnê dikevin **2.** peqpeq

**per** **1.** rûpel **2.** bask **3.** pel û pot **4.** belg *"ecelê gêrikê tê, **per** û baskên wê hêşîn dibin"

**-per û bask pê ve hatin** pir şa û kêfxweş bûn

**perandin/diperîne/biperîne** **1.** derbas kirin **2.** bi dest xistin

**perasî** parsî

**peraş** **1.** giya û dara ku şax û belçikên wan pir in **2.** elokê ku xwe digijgijîne *"dara **peraş**, siya wê jî fireh e"

**-peraş dan** **1.** şax û guçil dan **2.** gijgijandin

**-peraş kirin** **1.** şax vedan **2.** gijgijandin **3.** veperimandin

**perat** sermaya hişk; hişkî

**perav** **1.** bejahiya li kêleka aviyekê **2.** pêlên avê

**Percîs** gerestêrkek e

**perç/perçaf** werm

**perçem** **1.** nîşaneye serxwebûna gelekî; ala **2.** navçavik **3.** tûncik

**perçifandin/diperçifîne/biperçifîne** **1.** werimandin **2.** xwe qure kirin û rikê xwe anîn

**perçifîn/diperçife/biperçife** **1.** werimîn **2.** qure û hêrshatî bûn

**perçiqandin/diperçiqîne/biperçiqîne** pelixandin û vîrçoqî kirin

**perçiqîn/diperçiqe/biperçiqe** pelixîn û vîrçoqî bûn

**perçîn** **1.** alava ku kaxezan bi derziyên xwe yên taybet ve hev ve dike **2.** parçeyê xurtkirina tiştê lawaz

**-perçîn kirin** **1.** bi derziyên perçînê kaxez û hwd bi hev ve kirin **2.** bi parçeyekî tiştek xurt û qayîm kirin

**perdax [I]** îskana avê û çayê

**perdax [II]** çirûsandin

**-perdax kirin** çirûsandin

**perde** **1.** pîneyê tenik ê ku di malan de li ber paceyan ve dadiliqînin **2.** di şanoyê de birên lîstikê

**-perdeya parastinê** di alavên dîtbarî de pergala

berevaniyê
**pere** dirav *"ji pereyan şirîntir, dîsa **pere** ye"
**perehiz** keyso
**pereng** kuzotî û bizot
**-perest** paşgirek e û wateya jêhezkirin, îbadetkirin û parastinê dide peyvê
**perestgeh** cihê îbadetê; mabed
**perestin/diperêse/biperêse** **1.** îbadet kirin **2.** jê hez kirin **3.** nokerî kirin
**perg** **1.** dûrd **2.** bendesol
**pergal** **1.** nîzam **2.** alav, amûr
**-pergala cîhanê ya nû** nîzama teze a dinyayê
**-pergal rakirin** mal talan kirin û şop li dewsa xwe nehiştin
**pergar** **1.** nexşeya avakirinê **2.** alavên pêwist ên çêkirin, tûjkirin, girêdan û hwd
**pergeh** iroşgeha pergalên nivîsînê *wek kaxez, pênûs, lênûsk, jêbir û hwd*
**perger** alaveke pîvandina nîvçemberê ye
**pergihandin/dipergihîne/bipergihîne** **1.** pêçan **2.** destedesteyî dan ser hev **3.** bi keys kirin
**perginde** **1.** belavbûyî **2.** peritî **3.** derbider
**perginde bûn** **1.** belav bûn **2.** peritîn **3.** derbider bûn
**perginde kirin** **1.** belav kirin **2.** peritandin **3.** derbider kirin
**pergî** xavik û postikekê şefaf ê ku li ser nebat û endamên hesas û tenik tê dîtin
**perik** **1.** rûpelên biçûk **2.** baskên firindeyên biçûk **3.** kaxezên pêçana baçikan
**perisandin/diperisîne/biperisîne** **1.** pêş ve birin **2.** kemilandin
**perisîn/diperise/biperise** **1**. pêş ve çûn **2.** kemilîn
**perişt** ezperest
**periştin/diperişîne/biperişîne** teselî kirin û temtêl dahûrandin
**peritandin/diperitîne/biperitîne** **1.** kevn kirin **2.** rûçikandin **3.** kelekût kirin, pir lê dan
**peritîn/diperite/biperite** **1.** kevn bûn **2.** ji ber kevniyê qetîn **3.** qefilîn **4.** rûçikîn
**perixandin/diperixîne/biperixîne** miz dan
**perî [I]** cihê taybet ê ku ji bo bûka teze hatiye perdekirin û xemilandin
**perî [II]** perwane

**perî [III]** tîroj
**perî [IV]** jina şox û ciwan; zerî *"ji weliyan **perî**, ji periyan xwelî"
**perî [V]** cina hera bedew
**perî [VI]** belavbûn
**-perî dan** silikîn
**perandin/diperîne/biperîne** **1.** *(mirov)* sewalê nêr berdan ser sewala mê **2.** *(qebrax)* mêr berdan ser qûnekan
**perîn/dipere/bipere** **1.** *(sewalê nêr)* baz dan ser *(sewala mê)* **2.** wekî sewalan tûşî jinan bûn
**perîşan** **1.** kesê ku di halekî ne tu hal de ye; pejmûrde **2.** belengaz **3.** kepaze
**perîşan bûn** **1.** pejmûrde bûn **2.** belengaz bûn **3.** kepaze bûn
**perîşanî** **1.** pejmûrdetî **2.** belengazî **3.** kepazetî
**perîşan kirin** **1.** pejmûrde kirin **2.** belengaz kirin **3.** kepaze kirin
**perîzade** **1.**jina nazdar a ji nifşê periyan **2.** cureyekî nexweşiya ku gerdenê diwerimîne
**perjan** perjîn
**perjîn** dîwarê darînî yê ku didine nava avahiyekî
**perjîn kirin** *(ji bo parastina ji ziyanan) li* dora bîstan, bax û hwd sûr jenîn
**permalî** sewalên bibask ên malê
**permêw** belgê dara mêweyê
**pero** **1.** pîne **2.** pirtî
**perok** **1.** pero **2.** nexweşiya dirmdar
**perokî** kes, tiştê an jî cihê ku nexweşiya dirmdar bijiniyê
**perokî bûn** tûşî nexweşiyeke dirmdar hatin
**perokî kirin** nexweşiyeke dirmdar bijinandin ke, tişt an jî cihekî
**peroşî** heyecan, coşî
**peroşmend** kesê bi heyecan û kelegerm
**perperok** cureyekî bihukên firinde ye; kerkene, belbelîtank
**perpût** **1.** bizdiyayî **2.** peritî
**perpût kirin** **1.** bizdandin û aciz kirin **2.** lê dan û peritandin
**perpitîn/diperpite/biperpite** **1.** qirqilîn **2.** vegevizîn
**perseng** **1.** pîvan **2.** pîvana bi qasî 15 kîlometroyî
**-persenga devê xwe zanîn** endazeya tixûbê xwe zanîn û li gorî wê tev gerîn
**persîv** nezle, çilmas
**pert** **1.** tiştê nas û li pir de-

ran heyî; bêserûber **2.** tewş

**pertaf** salixên bifort û nepixandî

**pertaf kirin** salixên bi fort û nepixandî vegotin

**pertal** têkberên kevnekotik

**pertav [I]** tîj, tîroj

**pertav [II]** taqet, qeram

**-pertav tê de neman** qudûm tê de neman

**pertav [III]** pa û pesn, fort

**-pertavek dan xwe** fortê xwe kirin

**perû 1.** xelat **2.** xişir û rêşiyên şûşeyî yên ku di dora çirayê de dadiliqînin

**-perû kirin** xelat kirin

**perûk 1.** kevnare **2.** rûpûş **3.** pîne, pero

**perûkxane 1.** saziya ku alavên dîrokî di pêşangeha xwe de radixe **2.** karistana rûpûşan, firoşgeha rûpûşan

**perwa** tirs û sehm

**perwane 1.** perikên ku bi hêza ba, agir û gêrebayê dizivirin û hewayeke sar didine hundir an jî hewaya hundir a germ davêjin derve; bajen, baweşînk **2.** perperok

**-bûn perwane 1.** li hev çûn û hatin **2.** li dora hev zivirîn

**perwaz 1.** firîn **2.** çarçive

**perwazname 1.** destûrname **2.** destûra firînê ya balafirekê **3.** di malperê de rêbaza bikaranînê

**perwer** hezkirî û parastî

**perwerî** dilsojî

**perwerde 1.** fêr **2.** hînbûn

**perwerdehî 1.** amojkarî **2.** fêrkarî

**perwerdekar 1.** amojkar **2.** fêrkar

**perwerde kirin 1.** amojandin **2.** hîn kirin

**perwerdenas** fêrnas

**Perwîn** gerestêrkek e

**perzîn 1.** çemedankê kaxez û nameyan **2.** poste **3.** name

**pes** pez

**pesar 1.** dibûr, beroj **2.** kaş û kerîş

**pesartin/dipesêre/bipesêre 1.** spartin **2.** bi tiştekî xurt tiştekî lawaz destek kirin

**pesdeng** dengê nizm

**pesdengî** rewşa nizmiya dêng

**pesend 1.** çesp **2.** pejr

**pesend kirin 1.** çespandin **2.** dan qebûlkirin

**pesibîn/dipesibe/bipesibe 1.** ber bi rûxîne ve çûn **2.** li ser henceyekê bûn

**pesinandin/dipesinîne/bipesinîne** xwe qure kirin *"aş digere, qeraş xwe **dipesinîne**"

**pesn 1.** nîşandana kar, xebat û kesayetiya mirovî; pa **2.** fort, fors *"derew li biyaniyê, **pesn** li pîriyê"

**-pesna xwe dan** fortê xwe avêtin

**-pesn dan 1.** pa dan, medh kirin **2.** fors kirin *"mala bavê min dûr bûya, min dê têr **pesna wan bida"**

**pest 1.** pêkutî, zextî **2.** tundî **2.** giranî **3.** givaştin

**pestandin/dipestîne/bipestîne** giraniyek danîn ser û pê givaştin

**peste** stranên sivik û bilez

**pestek** qutik, kiras

**pestîl 1.** bastêq **2.** her tiştê ku wekî hêvîr hatiye strandin; helîse

**-kirin pestîl** pelçiqandin

**pest kirin** giranî dan ser

**peşar** ramyarî, siyaset

**peşarî** ramyar, siyasî

**peşarvan** siyasetmedar, ramyar

**peşk [I]** par, beş

**-peşk avêtin** dabeş kirin, qurhe kişandin

**-peşk li gû ketin** siûda bêxêr parê ketin

**peşk [II]** çirûsk, holepît

**peşk [III]** eynî, pişk

**peşkek 1.** hinek **2.** piçek

**peşkilîn/dipeşkile/bipeşkile** *(civîn, şahî û hwd)* belav bûn

**peşm** hirî

**peşmîn** her tiştê ku ji hiriyê çêbûye

**peşûş 1.** xilûxe **2.** genijî û kirêt

**petixîn/dipetixe/bipetixe** îflas kirin, malwêran bûn

**petî** zelal û vawêrtî

**petî kirin 1.** zelal kirin û vawêrtin **2.** *(ziman)* peyvên biyanî jê avêtin

**petîx** cureyekî berên bîstanan e, havînan dertê û nepijî tê xwarin

**petrome** çikandina çiqilekî ter di dareke din a qelaştî an jî cerx kirî de

**petrome kirin** çiqilê dareka ter di dareka din de bi cih kirin

**pev** bi hev

**pevçûn** şer û lihevxistin

**pevhatin** lihevhatin, aştî

**pevketin** belapêşkarî

**pevzeliqandin** zeliqandina bi hev ve

**pexş** weşan

**pexşan** nivîsa asayî ya bi awayekî lihevhatî hatiye nivîsandin

**pexş kirin** weşandin

**pey** pişt
**-dan pey** **1.** li pişt çûn **2.** lê gerîn **3.** *(da ku xwe bigihînê)* hewl dan
**-ketin pey** **1.** şop gerandin **2.** *(da ku xwe bigihînê)* hewl dan
**peya [I]** mêr, zilam
**-peyayê çargurçik** mêrê mêrxas
**peya [II]** peyar
**peya bûn** **1.** daketin jêrê **2.** nîştin
**peyak** **1.** peyar **2.** di kişikê de leşkerên pêşmerge
**peya kirin** **1.** daxistin jêrê **2.** anîn xwarê
**peyam** **1.** agehî, xeber, salix **2.** pêxem
**peyamber** **1.** pêxember **2.** qasid, sefîr
**peyamnêr** kesê ku peyamên buyerekê ji navendeke çapemeniyê re dişîne; nûçegihan
**peyamnêrî** nûçegihanî
**peyandin/dipeyîne/bipeyîne** **1.** yek bi yekî/dîmenguhêzekî dan payîn; lê telandin **2.** ji bo karekî hewl dan
**peyar** **1.** peya **2.** bê hesp *"her kî li hespê hevalan siwar e, herî **peyar** e"
**peyarê** **1.** riya taybet a peyaran **2.** di kêlekên kolanan de riya ku tenê peyar tê re diçin û tên
**peyatî** meşa bi piyan
**peyde** li ber çavan, xuya
**peyde bûn** **1.** çar bûn, pêk hatin, çêbûn **2.** berdest bûn
**peyde kirin** **1.** çar kirin, pêk anîn, çêkirin **2.** bi dest xistin
**peyderpey** li dû hev
**peyivdar** **1.** gotarbêj **2.** berdevk
**peyitandin/dipeyitîne/bipeyitîne** **1.** îsbat kirin **2.** pesend kirin
**peyivîn/dipeyive/bipeyive** **1.** xeber dan **2.** axaftin **3.** qise kirin *"bi qasî bejna xwe **bipeyive**"
**peyk** **1.** qasid **2.** alava ku ji heyvê weşanê dike
**peyker** mînakê mirov, ajal û hwd ên ji kevir, gêç, hesin, dar û hwd hatiye çêkirin; heykel
**peykersaz** kesê ku ji bûjenan heykelan dadiroje; heykeltiraş
**peyman** îtifaq, muahede
**-peymana civakî** makezagon
**-peymana tomerî** îtifaqa bikomasî
**-peyman girêdan** îtifaq kirin, li hev kirin
**peyn** **1.** talaza gemara ajalan **2.** *(da ku berên wan baştir bin)* gemara ajalan

an jî bûjena kîmyayî ya ku li zeviyan direşînin *“heçî deyn e, ew **peyn** e”

**pey re** **1.** pişt re **2.** paşê

**peyrew** **1.** xelef, paşwer **2.** murîd

**peyrewî** **1.** xeleftî, paşwerî **2.** murîdî

**peyt** îsbat û delîl

**peyv** hemû gotinên watedar ên zimanekî; bêje, kelîme *“**peyv**a xweş, bihara dilan e”

**-peyv darêjtin** bêje saz kirin

**-peyv li peyvê sekinîn** gotin hatin ser gotinê

**peyvdar** berdevkê fermî yê dexgeheke mîrî an jî saziyekê

**peyvnasî** *(r)* zanista ku cureyên bêjeyan diferisîne û jê re rêbazan datîne

**peywendî** têkilî, eleqe

**peywir** vatinî, wezîfe

**peywirdar** **1.** wezîfedar **2.** karmend

**peywirdar kirin** wezîfedar kirin

**peywendî** têkilî

**peyxam** îlham

**pez** mih û beran *“**pez**ê nêr, ji kêrê re ye”

**-pez hate baniyan û xwir kete kebaniyan** kar nêzîk bû û karker liviyan

**pezare** derd, jan

**pezkovî** bizina kovî

**pezîzank** qurtik

**pezûdan** spêdeya zû, elind, berbang

**pezvan** kesê ku pêz xwedî dike

**pezvanî** karê sexbêrkirina pêz

**pê [I]** endamê ku li serê tê meşîn; pî

**-pê dan erdê** heter kirin

**-pê li boça seyî kirin** ket ber bextê bênamûsan

**pê [II]** cînavka lihevxistî ya ku ji /bi wê-wî/ hatiye

**-pê de pê de** **1.** hêdî hêdî **2.** vir de û wê de

**-pê de ketin** **1.** pê re mijûl bûn **2.** tê alîn

**-pê re** **1.** bi wî/wê re **2.** di gel wî/wê

**pêbaz** pireya peyaran

**pê bilîn** **1.** pê alîn **2.** pê re egle bûn

**pêç** pîneyê ku li endamê şkestî û birîndar tê alandin

**pêçan/dipêçe/bipêçe** **1.** paçik kirin **2.** lê alandin

**pêçandin/dipêçîne/bipêçîne** **1.** paçik kirin **2.** lê alandin

**pêçayî** **1.** paçik-kirî **2.** alandî, dorpêçkirî

**pêçe** çarçefa ku jinên misilman li xwe dipêçin

**pêçek** qumaşê ku li zaro-

kê nûbûyî tê alandin
**pêçik** kaxeza paçik-kirinê
**pêçî** tilî *"**pêçi**ya ku neçe qulê, tişt pê venadin"
**pêçîn/dipêçe/bipêçe** lê alîn
**pêçk** tiştê ku li ser lûleyeke kinik hatiye alandin
**pêçke 1.** taye, çerxe **2.** toterîk
**pêçûlk** erebokeke biçûk a ku zarokên viringî dikinê û bi dest dajon
**pêdanî** alîkariya diravî
**pêderî** çarçiveya dêrî
**pêdivî 1.** pêwistî **2.** lazimî
**pêdizkî** meşa nermînga û teletel
**-pêdizkî çûn** nermînga û teletel bi rê ve çûn
**pê ewle bûn** pê ve emîn bûn
**pêgeh [I]** meqam
**pêgeh [II] 1.** qad **2.** war **3.** herêm
**pêgeh [III]** daşir, destşok
**pêger 1.** qad **2.** piyase
**-pêgera nêçîrvanan** herêma nêçirê
**pêgermok** çûn û hatina di qadekî de; gergemok
**-pêgermok gerandin** ji serê qadekî heta serê din çûn û hatin
**pêgiran** teral, selexane
**-pê girtin 1.** bi alikariya tiştekî tiştekî din girtin **2.** lê peyde bûn
**pêgirtî 1.** beng **2.** peyrew
**pê hesandin 1.** hişyar kirin **2.** agahdar kirin **3.** hîn kirin
**pê hesîn 1.** hîs kirin **2.** zanîn **3.** hîn bûn *"agir pê keve jî **pê nahese**"
**pêhêl** bihêl
**pêhin** pehîn
**pêjandin/dipêjîne/bipêjîne** pijandin
**pêjimêr** alava ku pê hesab tên kirin; çortik
**pêjinkar** bihîstiyar
**pêjn** seda, deng, awaz
**-pêjna te nayê** deng û awaz ji te dernayê
**-pêjna tiştekî kirin** beriya bûyînê bi tiştekî hesîn
**pêkan** mumkin
**pêk anîn 1.** bal pê anîn **2.** şiyan, karîn
**pêkenî 1.** elewat **2.** rêşkeniyê alemê *"gur pîr dibe, dibe **pêkeni**yê kûçikan"
**pê kenîn 1.** bi yekî tiraneyê xwe kirin **2.** ber bi yekî ve besimîn
**pêkenok** laqirdî, tirane
**pêk hatin 1.** bal pê hatin **2.** çêbûn, saz bûn
**pêkol 1.** erdkolana sewalan a bi piyan **2.** xwestin
**pêkol kirin 1.** *(sewal)* bi piyan erd vekolan **2.** *(mirov)* xwestin û heter ki-

rin

**pêkutî** **1.** zext û tundî **2.** îsrar, heter

**pêk ve** bi hev re

**pêkvejiyan** heyata bi tevayî

**pêl [I]** dem, qas

**pêl [II]** lemperên zeryayê

**-pêl dan** *(zerya)* lemper dan

**pêl [III]** hilma bayî

**pêl [IV]** rêjeya gihiştinê ya alavên ragihandinê

**pêlav** sol *"kurmanc têr dixwe û li **pêlav**a xwe digere"

**pêlawaz** **1.** di helbesta kevn de ristên arûzê **2.** teql û kirpa gotinê

**pêlawazdar** helbesta ku li gorî arûze hatiye ristin

**pêlawer** kesê ku keştiyê dajo

**pêlekan** silim, pêpelûk *"dinya **pêlekan** e, rabûn jî heye, peyabûn jî heye"

**pêlepaş** paşepêl, paşpê

**pê lê kirin** pêpest kirin

**pêlîstik/pêlîstok** tişt û miştên ku zarok pê baziyê dikin; tîtik

**pêlşikên** dîwarê ku li ber lemperan dijenin da ku tundiya wan daxîne

**pêlweş** **1.** alava ku herka gêrebayê têkûz dike **2.** alava ku weşana ji peykê têkûz dike **3.** îzgeh

**pênas*(-e)*** tarîf, unwan

**-pênasa neteweyî** çarçiveya ku gelekî dinimîne

**pênc** **1.** hejmara piştî çaran û beriya şeşan **2.** jimareya 5'an

**pêncek** **1.** ji pênc paran parek **2.** ji pênc paran pareke xenîmetê ya ku aîdî Ehlibeytê ye

**pêncem*(-în)*** di rêza pêncan de

**pêncî** **1.** deh heb pênc **2.** jimareya 50'î

**pêncgoşe** şeklê ku pênc guçê wî hene

**pêncsed** **1.** pênc heb sed li ser hev **2.** jimareya 500'î

**pêncşem** roja şeşan a hefteyê

**pêndav** cureyekî şimaya ku mêşhingiv pê derê kunên xwe digirin û teng dikin da ku hingivên xwe ji germê, sermayê û bihukên dujmin biparêzin

**pêngav [I]** navbera tu lingên vekirî; gav

**pêngav [II]** pêşveçûna erênî

**pênivîs** pênûs

**pênûs** alava ku pê tê nivîsandin û xêzkirin; qelem

**pênûsdank** dewsa qele-

man; qelemdank
**pêpal** yom, qudûş
**pêpalxêr** biyom, biqudûş
**pêpehn** kesê ku binê endamê wî yê meşînê riprast e
**pêpelûçka** meşa li ser dest û çongan; çarlepîka
**pêpetî** pêxas
**pêr** roja beriya îro
**-bêhtir pêr** bi qasî sê rojan beriya niha
**pêrar** du sal berî niha
**-bêhtir pêrar** sê sal berî niha
**pê rayî bûn** ecibandin
**pêrbest** gihanek
**pergîn 1.** rasthatin **2.** pêşeroj
**pêrginandin/diperginîne/biperginîne** mazûvanî kirin
**pêrgî hev hatin** rastî hev hatin, liqayî hev hatin
**pêrgîngeh** hêwana rawestinê
**pêrgînî 1.** pêşwazî **2.** bixêrhatinî
**pêrgînî kirin 1.** pêşwazî kirin **2.** bixêrhatina yekî kirin
**pêrist** agahiya ku naveroka berhemê bi riya sernavan nîşan dide û di destpêk an jî dawiya pirtûkan de tê bicihkirin
**pêsî** kûtî
**pêsîr** sîng *"dinya **pêsîr**a diyan e, her xwe dixwe"
**pêsîrbend** berdank
**pêsotk** cureyekî nexweşiya harbûnê ye
**pêsotkî** kesê ku bi nexweşiya harbûnê ketiye û xwe vediçirikîne
**pêstirk** qutaf
**pêstirk girtin** qutifîn
**pêş [I] 1.** ber û ne li paş **2.** hember, dij *“bi darê zorê, tu tişt nayê **pêş**”
**pêş [II] 1.** daw **2.** qûntar
**pêşan** nîşandan
**-pêşan dan** nîşan dan
**pêşangeh** cihê ku ji bo bîneran nimûne lê tên raxistin
**pêşanî** yekemî, ewilî
**pêşbazî** pêşbirk, reqabet
**pêşber 1.** hember **2.** pêşpal
**-anîn pêşberî hev** hevrû kirin
**pêşberek** di şeran de eniya ku li pêş şer dike
**pêşbirk** ji bo qezenckirina tiştekî reqabeta bi hinekan re; pêşbazî
**pêşbîn** zanayê ku pêşerojê li gorî daneyên heyî texmîn dike; dûrebîn
**pêşbînî** dûrebînî
**pêşbînî kirin** bi riya daneyên berdest pêşeroj texmîn kirin û xwe li gorî vê yekê amade kirin
**pêşcênîk** enî, pêşnehtik

**pêşçav** berçav
**pêşçav kirin** berçav kirin
**pêşdank** pêşgir
**pêşdaraz** -bêyî ku rastiya karekî binase- kesê ku hê di sêrî de qerara xwe dide
**pêşdarazî** di pêş de biryardan
**pêşdem** karê ku berî dema texmînkirî an jî diyarkirî pêk tê; berwext
**pêşdîtin** derpêşkirin
**pêşdîtinî** feraset
**pêşek** pêşeng
**pêşeng** **1.** pêşewa **2.** serwer **3.** serpêşsen
**pêşgir [I]** *(r)* qertafên ku tên pêşiya bêjeyan
**pêşgir [II]** mendîla ziwakirina ser û çavan
**pêşgotin** sergotar
**pêşiya** nanê tenûrê
**pêşî [I]** mêş, spêle *"hêlîna **pêşi**yan, çênabe"
**pêşî [II]** bav û kal, ecdad
**pêşî [III]** aliyê xuyayî
**-pêşî mişt û paşî di gû de hişt** aliyê xuyayî maliştin û aliyê veşartî di nav gemarê de hiştin
**pêşîn** **1.** yekemîn, ewil **2.** dest bi dest *"bextê **pêşîn**, warê hêşîn"
**pêşînî** diravê ku beriya wergirtina asûkekê tê dayîn an jî standin
**pêşkarî hev bûn** ketin pêsîra hev û şer kirin
**pêşkeftin** **1.** geşedan **2.** serkeftin
**pêşkêş kirin** **1.** teqdîm kirin, pêşandan **2.** araste kirin, rapeşan
**pêşkêşkar** **1.** arastekar **2.** pêşandêr
**pêşmal** werisên ku konî bi singên pêşiyê ve girêdidin
**pêşmalk** **1.** bervank **2.** pêşmal
**pêşmerge** **1.** cangorî, fedayî **2.** şervan
**pêşniyar** pêşkêşkirina ramanekê beriya destpêkirina karî; teklîf
**-pêşniyara aştiyane** teklîfa ku ji bo mebestên aştiyê tê pêşkêşkirin
**pêşniyar kirin** teklîf kirin
**pêşniyarname** teklîfa nivîskî
**pêşniyaz** pêşniyar, teklîf
**pêşnûma** bernameya sêwirandî
**-pêşnûma kirin** bername saz kirin; sêwirandin
**pêşpirtik** pêşgir
**pêşrew** **1.** kesê ku ne peyrew e **2.** bihûrî û çûyî
**pêşûle** cureyekî çivîkên mêşxur e
**pêşûş** genî û kêrnehatî
**pêşverû** kesê ku rû û ber ê wî ber bi pêşerojeke

geş e û ne paşverû ye
**pêşwazî** mazûvanî, pêrgîn
**pêşwazî kirin 1.** mazûvanî kirin, pêrginandin **2.** mêvan kirin
**pêşwext** pêşdem
**pêt 1.** rengzer **2.** alafa êgir; rivîn **3.** pihêt, qayîm
**pêtazî** pêxwas
**pêto** quzfiroş, deyûs
**pê vedan** *(mêş, mar û hwd)* lê dan *"hin hingiv dixwin û mêş **bi hinekên din vedidin**"
**pêvek** îlawe
**pêvajo** dema bûyerê a ku tê de diqewime; domana demê
**pêwan** pasevanê bendîxaneyê; zêravan
**pêwendî** têkilî, eleqe
**-pêwendiyên civakî** têkiliyên di navbera civakê de
**-pêwendiyên navneteweyî** têkiliyên di navbera neteweyên cîhanê de
**pêwendîdar** têkildar, eleqedar
**pêwendî saz kirin** têkilî danîn, eleqedar bûn
**Pêwir [I]** gerestêrkek e
**pêwir [II]** nexweşiya kêmdengiyê
**pêwist** lazim, hewce
**pêwistî** pêdivî, hewcetî
**pêxas 1.** bêsol û bêgore **2.** xizan **3.** *(sewal)* bênal
**pêxas bûn 1.** bêsol û bêgore bûn **2.** xizan bûn **3.** *(sewal)* bênal bûn *"hespê çê, bila **pêxas be**"
**pêxas kirin 1.** bêsol û bêgore kirin **2.** xizan kirin **3.** *(sewal)* bênal kirin
**pêxem** feşk û astengî
**-pêxem lê xistin** feşk lê xistin û astengîdan ber
**pêxember** hilgirê nameya pîroz û hinartiyê Xwedê ji bo çaksaziya mirovahiyê
**pêxembertî** karê ku pêxemberên Xwedê pê radibin
**pê xistin** agir dadan/hilkirin
**pêxistî** dadayî *"çiraya her kesî, **pêxistî** namîne heta sibehê"
**pêxwarin** ji bilî nanê tisî her tiştê ku bi nên tê xwarin
**pêzan** zana û pisporê wî îşî
**piç 1.** pir hindik **2.** parçeyeke biçûk *"**piç** bi piç xwe gihand guç"
**-piçek** hindikek
**piçêx** para biçûçik
**piçikandin/dipiçikîne/bipiçikîne 1.** li hev alandin **2.** nexweşiyê *(endamên cendêk)* şileke kirin

**piçikîn/dipiçike/bipiçike** **1.** li hev alîn **2.** *(endamên cendêk)* şileke bûn
**piçpiçî** parçeyên pir hûrik
**piçpiçî kirin** pir hûrik parçe kirin
**piçudank** di zikê jinan/mêzayan de dewsa zarokê/têjikê; malzarok
**pidû** goşte ku diran tê de çikandî ne; pirî
**pif** ba û dengê berdana henaseyê
**-pifî guhan kirin** **1.** dizîka jê re gotin **2.** nav tê dan
**pif kirin** **1.** nepixandin, perçifandin, werimandin **2.** damirandin **3.** sar kirin
**pifdank** nepox
**-pifdanka mîzê** mîzildank
**pifo** *(di zimanê zarokan de)* xurek
**pihêt** muhkem û şidiyayî
**pijandin/dipijîne/bipijîne** **1.** pehtin **2.** stewandin
**pijiqandin/dipijiqîne/bipijiqîne** fişkandin
**pijiqîn/dipijiqe/bipijiqe** fişkîn
**pijîn/dipije/bipije** **1.** stewîn **2.** gihiştin
**pijme** bêhnijk
**pil** sist
**-pil bûn** sist bûn
**-pil kirin** sist kirin
**pilav** birincê di avê de kelandî
**pile** **1.** ast, rade **2.** derece
**piling** cureyekî sewalên dirinde ye û ji bilî sêrî dişibihe şêran
**pilor** pelûr, malêz, çolik, hewdel
**pilox** **1.** bizota êgir **2.** tiştê ku xwarina wî ji bo didan û pidûyan nerm e
**pilte** di find û fanosan de bendê ku agir pê digire
**-pilteya dil qetîn** di heqê tiştekî an jî kesekî de bi fikar bûn
**pilûr** cureyekî sewalên çarpê ye
**pilûsk** **1.** qulik **2.** zenbele
**pimpar** çêreya ku nayê xwarin
**pin** raza taybet a ku her kes ji xwe re vedişêre
**pinc** tasik, legan
**pincar** çêreyên ku tên xwarin *“kalo memire bihar tê, pîrê memire **pincar** tê”
**pind** qûn, zûtik
**pindam** qirş û qeselên ku herka avê asteng dikin
**pindandin/dipindîne/bipindîne** axozî kirin
**pinde** axozî
**pindepîr** pîrhevok
**pindiloşk** **1.** kurt û qelewok **2.** tombiz

**pindik 1.** movik **2.** kulîlk, xonçe
**pingil** bizot
**pingav** ava ku li cihekî col bûye
**pingirîn/dipingire/bipingire 1.** col bûn, bi ser hev de kom bûn **2.** fûrîn
**pinî** xasûk û çikûs
**pinîtî** xasûktî û çikûsî
**pir 1.** zêde **2.** zehf **3.** dengê ku paqijkirina difinî tê *"ez dengekî **pir** tehl dibihîzim, gelo tu dizanî ew çi deng e?"
**-pir û hindik** kêm û zêde
**-pir kirin 1.** zêde kirin **2.** bêfil paqij kirin
**piranî 1.** zêdehî **2.** bi gelemperî
**piralî** pirşaxî, pircelebî
**pirbêj** kesê ku zêde diaxive; çelçelok *"derdowî **pirbêj** dibin, evîndar dengbêj dibin"
**pirç** mû, pûrt
**-pirça xwe gij kirin** mirûzê xwe tirş kirin
**pirçand** xwediyê her cureyê çandê
**pirçandî** rewşa sexbêriya her cureyê çandê
**pirçî** bêmehde û rûtirş
**-xwe pirçî kirin** xwe bêmehde û rûtirş kirin
**pird/pire** navgîna du aliyên çem, newal û rûbaran *"hukimdar bibe **pire** jî, di ser re derbas mebe"
**pireh** nûzayê ji dê bavên ku irqa wan ne wekhev e
**pirendazî** di tevgerê de bihîstyariya derî tixûban; zêdegavî
**pirêze 1.** qeselên zeviyê **2.** xozan *"me hêştir nedîtine li rêzê, qey me pişkul jî nedîtine li **pirêze**yê"
**pirî [I]** zêdehî
**pirî [II]** goştê ku diran tê de çikandî ne; pidû
**pirîsk 1.** misqal **2.** zere, parçeyê biçûktirîn ê bûjenê
**pirkam** nexweşê xwestekên nefsa xwe
**pirkamî** nexweşiya daxwazên bêdawî
**pirole [I]** teral
**pirole [II] 1.** salixên lêzêdebûyî **2.** pertaf
**pirole kirin** pertaf kirin
**pirpar** pimpar
**pirpirok** firfirok
**pirs 1.** sual **2.** arîşe **3.** peyv *"mirov bi **pirs**ê, diçe Xursê"
**-pirsên axretê li dinyayê pirsîn** bersiva tiştên nedîtî û nebînayî xwestin
**pirsgeh** di dezgeh û saziyan de nivîsgeha da-

nasîn û ragihandinê
**pirsgirêk** **1.** arîşe **2.** gelş
**-pirsgrêkên aborî** arîşeyên têkildarî debara jiyanê
**-pirsgirêkên tenduristî** arîşeyên têkildarî sihet û afiyetê
**pirsiyar** **1.** suwal **2.** tehqîq
**pirsiyar kirin** **1.** sual kirin **2.** tehqîq kirin
**pirsîn/dipirse/bipirse** **1**. suwal kirin **2.** jê bersiv xwestin *"**bipirse** ji kalê zemanan û xortê geriyayî"
**pirs kirin** pirsîn
**pirsnîşan** *(r)* di xalbendiyê de nîşaneya pirsê; *(?)*
**pirşeng** çîk, pêt
**pirt** parçe
**pirtepirt** **1.** dengê pêketin û damirîna êgir **2.** dengê rajena dilî
**pirtepirt** **1.** *(agir)* geh pê ketin geh damirîn **2.** *(dil)* geh bi tundî geh bi nizmî avêtin
**pirtik** **1.** parçeyê hûrik **2.** pir kêm û hindik
**pirtikpirtikî** parçeparçeyî, hûrhûrî
**pirtikpirtikî kirin** parçeparçeyî kirin
**pirtî** pîne û qumaş
**-pirtî û palaz** cil û nivîn
**pirtû** karê pîneçêkirin û dirûtinê
**pirtûk** kitêb
**pirtûkfiroş** kitêbfiroş
**pirtûkxane** kitêbxane
**pirûsk** hestiyê piştê
**pirxepirx/pirxînî** kenê ji nişkê ve û bi dengî
**pirxepirx/pirxînî kirin** ji nişkê ve û bi dengî kenîn
**pis** kur *"neke bi kesan, dê bê serê te, ku neyê serê te, dê bê serê **pis**ê pisan"
**pisepis** dengê domdar ê baberçûnê
**pisepis kirin** ba ji ber tiştekî nepixî çûn
**pisîk** cureyekî ajalên malê ye û piranî ji bo ku mişkan bigire tê xwedîkirin
**pisîng** pisîk *"devê **pisîng**ê negihişt goştî, got: 'min xêra dê û bavê xwe hişt"
**pismam** kurap, kurmam
**pismet** kurmet
**pispisandin/dipispisîne /bipispisîne** xwe egle kirin û fizirîn
**pispor** **1.** zanayê pîşeyekî **2.** xwendeyê di babeteke zanistî de *"ji xelqê re **pispor** e, ji xwe re kor e"
**pisporî** zanyariya pîşeyî/zanistî
**pist** çêrmê mirovan

**pistepist** pirkepirk, kurtepist
**pisxal** kurxal
**pisxalet** kurxaltî
**pisxaltî** pisxalet
**pişaftin/dipişêve/bipişêve** **1.** tehrîf kirin û dirûv guherandin **2.** di nav xwe de helandin û deng jê birandin
**pişartin/dipişêre/bipişêre** pişirandin
**pişemasî** cureyekî sewalên zeryayî ye
**pişêw** tiştê servekirî û argo; mustehcen
**pişik** kezeba spî; cerg
**pişikreş** cureyekî nexweşiyan e
**pişikxerakirî** kesê ku bi nexweşiya pişikreşê ketiye
**pişirandin/dipişirîne/bipişirîne** **1.** *(tiştê hişk)* hûrik hûrik qut kirin **2.** tiştek hûrî tev tiştekî din kirin
**pişirîn/dipişire/bipişire** **1.** *(tiştê hişk)* hûrhûrî bûn **2.** *(giyayê hişk)* çilmisîn û hûrî erdê bûn **3.** hişk bûn daweşîn
**pişk [I]** eynî, heman tişt, wekî wî *"destê dê, **pişk** ê qîzê ye"
**pişk [II]** **1.** beş **2.** par
**-pişk kirin** pareve kirin
**pişk [III]** şilimziwa, qurhe, çîtik
**-pişk avêtin** şilimziwa avêtin, qurhe kişandin
**pişkandin/dipişkîne/bipişkîne** bêhnijandin
**pişkdar** **1.** beşdar **2.** hevalê parê, şirîk **3.** hisedar
**pişkepişk** dengê ku ji dev û bêvila kesê bahorî der tê
**pişkepişk kirin** bêhnijîn
**pişkîn/dipişke/bipişke** bêhnijîn
**pişko** **1.** cemre, arzeba **2.** bişku
**pişkul** gemara pêz; bişkul
**pişo** awayê bangkirina pisîkê
**pişopişo kirin** **1.** bangî pisîkê kirin **2.** *(karek)* bi tika û lavayî dan kirin
**pişpişîn/dipişpişe/bipişpişe** **1.** *(mirov)* mirûzê xwe tirş kirin **2.** *(hevîr)* hilpesirîn û tirş bûn
**pirûk** cureyekî xwarina ku ji ardê savarî tê çêkirin
**pişt [I]** **1.** dawî **2.** dûv **3.** aliyê navmilê; qorik *"bavê mirovî, **pişt**a mirovî ye"
**pişt [II]** **1.** aliyê ku di nêrîna pêşîn de xuya nabe; aliyê dûr **2.** şala navê
**-pişt jê standin** dorpêç kirin û eman nedan
**-li pişt dîwêr** li aliyê

dîwêr î din
**piştbend 1.** bendê navê **2.** şala navê
**piştek** spartek
**piştepiştî** yekitî û komelayetî
**piştevan 1.** destekar **2.** tagir, alîgir
**piştevanî kirin 1.** destek kirin **2.** tagirî jê re kirin
**piştên** şala navê
**piştgerm** arxweyîn, bêminet
**piştgerm bûn** arxweyîn û bêminet bûn
**piştgermî** bêminetî
**piştgir 1.** destekar **2.** tagir **3.** hevpişt
**piştgirî 1.** destekarî **2.** hevalpiştî
**piştgirî kirin 1.** destek kirin **2.** alîkarî kirin
**pişt girtin 1.** destek kirin, yarmetî kirin **2.** alî kirin, tagirî jê re kirin
**pişthotik** kesê ku pişta wî weke hotikekî xwar bûye
**piştik** bêrewişt û bêsinc
**piştî [I]** barê li ser milan; barpişt, kolepiştî, şele, şixre
**piştî [II]** jê şundetir
**-piştî nîvro** ji nîvro şundetir
**piştkov** pişthotik
**piştmêr** mêrê alîkar ê di roja teng de
**piştperde** rûyê nixumandî yê her tiştî
**-piştperdeya çalakiyê** rûyê nixumandî yê karê birêxistinkirî
**piştrast** kesê ku bawerî pê tê anîn; ewle
**piştrast bûn 1.** ewle bûn, pê ve emîn bûn **2.** dilniya bûn
**piştrast kirin 1.** peyitandin **2.** dilniya kirin
**pişt re 1.** pey re **2.** paşê **3.** paran ve
**pit** pitik
**pitepit** axaftina nediyar
**pitepit kirin** di guhên hev de tiştên nepen gotin
**pitê!** baneşana ji bo keçan
**pitik** zaroka qîzînî ya viringî *"hevalê kevn bibe neyarê nû, mirin di tûrikê **pit**ê de ye"
**pitî** biçûk û xweşik
**pitpitok** mizmizok
**piv 1.** dengê bayê ku ji cihekî teng derdikeve **2.** (*di zimanê zarokan de)* tir
**piv kirin** *(di zimanê zarokan de)* tir kirin
**pix** dengê paqijkirina bêfilê
**pix kirin 1.** *(di zimanê zarokan de)* bevil paqij kirin **2.** tirsandin
**pixtik** xirdik
**pixtî** xwîna ku bûye ker-

seng û wekî belxemê hev girtiye
**-bûn pixtî** *(xwîn)* cemidîn
**pixtok** cureyekî kevirê nerm û sivik e
**piyade** peyar
**piyale** lîwan, îskan, qedeh
**piyan** **1.** sinî, berkeşok **2.** şerbikê avê
**piyar** kesê bi merhemet
**piyarî** merhemet
**piyase** gera ser piyan a hêdî hêdî
**piyase kirin** hêdî hêdî li ser piyan gerîn
**piz** avika giyaneweran a ku di pizdankê de ruh hatiye ber; cenîn
**pizdank** **1.** di zik de cihê ku zarok an jî têjik tê de çêdibe **2.** hevaloka ku piştî zayînê ji makê dikeve
**pizik** pijikên ku di dema gêraniyê de derdikevin
**pizî** di kincan de cihê ku doxînê tê re dikin
**pizînk** zirmemikê ku didine devê zarokan da ku bitebitin
**pizîşk** bijîşk
**pizrik** pizik
**pizûr** doran
**pî** **1.** endamê ji gûzekê berjertir **2.** *(di hin devokan de)* mil, pîl
**-li ser piyan** ne rûniştî û şipê; çik
**pîceme** kiras û derpiyê ku şevînî tên lixwekirin
**pîç** **1.** pûç **2.** bîj
**pîçalk** cureyekî çêreyê ye û pijandî tê xwarin
**pîj [I]** **1.** strî **2.** dasî
**pîj [I]** bîj
**pîjpîjî** pir bi strî
**pîkol kirin** *(pez, dewar, ker û hesp)* erd bi piyan kolan
**pîl [I]** fîl
**pîl [II]** ji enîşkê hetanî sermilê; sermil
**pîl [III]** pola
**pîl [IV]** parçeyeke kaxezî ya çargoşe û biçûk e, li ser aliyekî wê wêne û nivîs neqişandî ne, wekî giroveyeke fermî li belgenameyan û zerfên nameyan didin; pûl
**pîle** pile
**pîlik** **1.** kesê ku di navbera malên bûk û zavayî de diçe û tê da ku karê şahiyê têkûz bike **2.** posteger **3.** şûşeya ku ji bo zarokan şîr dikinê
**pîltan** pir mezin; geltegan
**pîn/pînik [I]** êwirgeha dîk, mirîşk û sewalên bibask ên din ên malê
**pîn [II]** pehîn
**-pîn li tasa ber xwe xistin** qîma xwe bi kar û rizqê hazir neanîn
**pînc** **1.** darikê sertûjkirî **2.**

sirkeya tewilandina sewalan **3.** darikê kêp î sertûjkirî

**-pîncê heram** avika heram; zarokê zinayê

**-pînc lê xistin** pêxem lê xistin, xilçik lê xistin, feşilandin

**pîne 1.** qumaş, pirtî **2.** parçeye qumêş ê ku pê cihê diriyayî û peritî tê tehmîrkirin *"kinca ku kete ber **pîne**yan, serê ku kete ber şîretan bi kêrî tiştekî nayên"

**-pîne kirin 1.** pîneyek bi cihê diriyayî ve dirûtin **2.** eyb û derew veşartin

**pîp** derdaneke mezin a devgirtî ye û ji bo bûjenên avî ji lajwerdê tê çêkirin û

**pîpik** cureyekî zirneyan e û ji levenê tê çêkirin

**pîqask** cureyekî çêreyê ye û nepijî tê xwarin

**pîr [I] 1.** temendirêj **2.** extiyar **3.** kal *"kevn e û **pîr** e, ji gotinan re bîr e"

**pîr [II] 1.** pispor **2.** serwext **3.** sergihayî

**pîr bûn 1.** temendirej bûn **2.** pîr bûn **3.** *(giya)* gihiştin û qamir bûn *"dilê fireh, **pîr nabe**"

**pîraye** arastek, çîçik

**pîrejin** jina temendirêj

**pîrek 1.** jin **2.** jina mêrkirî *"zilam bi mû ye, **pîrek** bi rû ye"

**pîrelk** cin

**pîrepizk 1.** pîrejina temenbihurî ya ku êdî hal tê de nemaye **2.** pîrejina xurifî **3.** pîrejina cadûbaz

**pîrhevok** cureyekî bihukên ku bi hûnandina tevnan ve navdar e; tevnepîrk

**pîrhevî 1.** di çîrokan de pîrejinên cadûbaz, kirêt, qîldirêj ên ku li gêziyan siwar dibin, dengê kenîneke kirêt ji xwe tînin, zarokan didizin û ji xwe re dikin xizmetkar **2.** pîrhevok

**pîrik 1.** diyên dê û bavên mirovî **2**. jina ku jinên ducanî diwelidîne **3.** pîrhevok

**pîrî/pîrtî** temendirêjî

**pîrmend** şêwirmendê temendirêj û pispor

**pîrot** kesê ku amanên ji kaxetîtan çêdike

**pîrotankî 1.** *(çêrm)* biqerçûmek û virçiqî **2.** *(pidû)* herişî û amasgirtî

**pîrotankî bûn 1.** *(çêrm)* biqerçûmek û virçiqî bûn **2.** *(pidû)* herişîn û amas girtin

**pîroz 1.** muqedes **2.** bimbarek

**pîrozbahî 1.** muqedestî **2.** bimbarektî
**pîroze** cureyekî gewherên giranbiha ye
**pîroz kirin** bimbarek kirin
**pîrozname** tebrîka nivîskî; tebrîkname
**pîrozwer 1.** muqedes **2.** bimbarek
**pîs** kirêt
**pîsî** gemara kûçik, beraz, gur û hwd
**pîso 1.** şewat **2.** bêhna şewatê **3.** ariya pîneyê şewitî; bîso *"agir pê keve, bêhna **pîso** jê nayê"
**pîst [I]** pêsîr, berstûk
**-pîst jê daweşandin 1.** pêsîr jê daweşandin **2.** xwe jê parastin
**pîst [II]** çerm, eyar
**pîşat** berwext
**-bi pîşatî** bi pêşdemî
**pîşe 1.** meslek **2.** huner, sinaet
**pîşesaz 1**. sinaetkar **2.** meslekdar
**pîşesazî** sinaetkarî
**pîşo 1.** hevirheste **2.** barût *"agir û **pîşo** li cem hev nabin"
**pît [I]** tîp, herf
**pît [II]** çîk
**pît [III]** jîr û serbixwe
**pît [IV]** zibilî û çilmisî
**pît [V]** adan, bereket
**pît [VI]** pihêt
**pît [V]** di benderan de singê ku werisê keştiyê pê ve girêdidin
**pîtol** fîlozof
**pîtros** lîstika çavgirtonekê
**pîv 1.** qiyas **2.** kêş **3.** radeya kêşa tiştekî
**pîvan [I] 1.** terazî **2.** kêş **3.** rayîş
**pîvan/dipîve/bipîve [II] 1.** ji aliyên giranî, dirêjahî hwd ve qeys û miqdara tiştekî hildan **2.** ceribandin *"aqil bi diravî nayê **pîvan**"
**-pîvan û ro kirin** dan ber hev û biryar dan
**pîvandin/dipîvîne/bipîvîne 1.** ji aliyên giranî, dirêjahî hwd ve qeys û miqdara tiştekî dan hildan **2.** dan ceribandin
**pîvek** kod
**pîvok** sosin, gangilok
**pîvaz** cureyekî çêreya bêhnkirêt e lê tê xwarin *"merî **pîvaz**ê nexwin, bîn ji devê wan nayê"
**pîvazok 1.** pîvaza ter **2.** serikê hin gulan
**pîzang** moza guhdirêjan; kermêş
**pîzpîzik** fîq, dûdik
**PK** kurteya /piştî koçê/, piştî hicreta Cn. Pêxember eleyhiselamî
**pok** pidû, pirî
**pol [I] 1.** di dibistanan de

her saleke perwerdehiyê; sinif **2.** di dibistanan de her jûreke ku şakird tê de perwerdehiyê dibînin; fêrgeh
**pol [II]** bizot
**pol [III]** dendikên mêweyan
**pol [IV]** pola
**pola** hesinê avdayî yê pir xurt
**Polan** Birca Satilê *“**Polan** hişk û sar, kadîn tar û mar”
**polandin/dipolîne/bipolîne** tesnîf kirin, bi keys kirin
**polayî** tiştê ji polayê *“ji nanê gênim re, zikê **polayî** divê”
**polik 1.** bişkojk **2.** diravê zîvîn û zêrîn **3.** cureyekî sewzeyan e û pijandî tê xwarin
**polke** cureyekî sewziyan e û libên wan bi qasî nokan e
**ponijîn/diponije/biponije 1.** kûr û têr ramîn; fikirîn **2.** bêdeng man *“her kes, ji bo karê xwe **diponije**”
**por** pirça bi sêrî ve hêşîn dibe, gijik *“destê bi don pêşiyê di **por**ê xwe bide”
**-por li ber tavê spî kirin** temenekî dirêj di nezaniyê de bihurandin
**porçe 1.** porê çêkirî; zirpor **2.** alaveke ku bi sêrî ve porikekî sext heye û pê diran tên paqijkirin **3.** hemû alavên maliştinê yên ku ji destikekî û serikekî biporik pêk tên
**porik 1.** porê ziravik û kurt **2.** qumaşê ku bi rûyê wî ve rîşiyine hûrik hene **3.** rîşî
**porşikên** nexweşiya pordaweşînê
**porg** kîsik
**porişk 1.** kesê ku rişk ketine serê wî **2.** keç
**porpare** bi qasî mûyekî zirav
**porteqal** cureyekî mêweyan e
**porxan** kincên ji postên giranbiha
**posat** amûrên pêwist
**posîde** kesê bêgêwil
**posîde bûn** bêgêwil bûn
**posîde kirin** bêgêwil kirin
**post 1.** çêrm **2.** çermê gurandî *“dostê min, dijminê **post**ê min”
**-ji post kirin** gurandin
**postal** sapokên çermîn
**poste** ferman an jî nameya ku li ser çêrman hatiye nivîsandin
**posteger** kesê ku fermanên dûgelê û nameyên

hemwelatiyan digihînin cihên têkildar; pîlik
**postexane** saziya ku ferman û nameyan digihîne cihên têkildar
**-post kirin** gurandin
**-post tijî pere kirin** ji qîmetê zêdetir lê dirav mezaxtin
**postnişîn** şêxê terîqetê, serekê sofiyan
**poş** lêxistina bi qiloçan; tel
**poşe 1.** *(simbêl)* palik, stûr **2.** jina şerkar
**poşî** şaşika mêranî; egal
**poşîn/dipoşe/bipoşe 1.** pûşî giredan 2. xêlî kirin
**poşman 1.** berxweketî **2.** vegeriyayî **3.** towbekar *"aşvan, tu car nabe **poşman**"
**poşman bûn 1.** li ber xwe ketin **2.** vegerîn **3.** towbe kirin
**poşmanî 1.** berxweketin **2.** vegerîn **3.** towbekarî *"dara **poşmani**yê, ber nagire"
**pot [I]** kinceke stûr a zivistanî ye û bi ser de tê lixwekirin
**pot [II]** pût
**potik** qerpal *"sal bi serma ye, **potik** bav û bira ye"
**potîn** sola çêrmîn a ku nalçeya wê darîn e
**poto** bejnbihust, xirdik
**poxîn** cureyekî helewa ku ji ardî tê çêkirin
**poz 1.** bêfil, kepû **2.** nikil, nik
**-pozê xwe daliqandin** mirûzê xwe tirş kirin, xwe pirçî kirin
**pozbilind 1.** qure **2.** kaw
**pozberî 1.** reqabet **2.** hilkeftin û dakeftin **3.** keft û left
**pozheçî** bêfildirêj, bêfilxortim
**pozmik** devgema ku davêjin devê golik, berx û karan da ku nemêjin
**pozxane** girtîgeh
**PŞ** kurteya /piştî zayînê/; piştî mîlada Cn. Îsa eleyhiselamî
**pun/pung** koxikê mirîşk, qaz û hwd
**puwaz** bûjena ku pê cerxa dirên tijî dikin
**puxte 1.** esl û unsurê esasî **2.** gewher **3.** naverok
**pûç 1.** xerab **2.** netêw **3.** genî û afnikî
**-pûçên hev dan der** pêşkarî hev bûn û bîsên hev eşkere kirin
**pûç bûn 1.** xera bûn **2.** betal bûn **3.** genijîn
**pûç kirin 1.** xera kirin **2.** netêw hesibandin, betal kirin **3.** genijandin
**-pûç derxistin 1.** berevajî

kirin **2.** nerastiya tiştekî nîşan dan; derewandin
**pûg 1.** berfa nû **2.** firtoneka berfê
**pûjan** pûng
**pûl** pîl
**pûnik** êwirgeha sewalên bibask ên malê yên mînanî dîk, mirîşk û werdekan
**pûng** cureyekî çêreya ku tê xwarin *"mar ji pûngê aciz bû, **pûng** jî çû û ber devê qula mêr hêşîn bû"
**pûngal 1.** pûnik **2.** hêlîn *"hêka genî, di **pûngal**ê de dimîne"
**pûr kirin** qalik spî kirin, qeşartin
**pûrt 1.** pirç **2.** pirça çivîkan
**pûrtik 1.** pirça firindeyan **2.** gulikên daran
**pûş 1.** qurcûm **2.** qirş û qesel **3.** giyayê bêkêr
**-pûş kutan** keda yekî bi ro de çûn
**-pûş şîşî qûnê kirin** bi zorê karek bi teral an jî newêrekekî dan kirin
**pûşil** edeb, terbiye, heya
**pûşî [I] 1.** şara seriyan **2.** kefiya stûyî
**pûşî [II]** pêşî, spêle
**Pûşper** meha şeşan a zayînî, Hezîran
**pût** tiştê ku ji bilî Xwedê jê re tê perestin
**pûte** baldarî
**-pûte pê dan 1.** giringî pê dan, bal dan **2.** lê miqate bûn
**pûtparêz** kesê ku ji pûtan re perestişê dike

# Q

**q/Q** tîpa bîstemîn a alfabebeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê ezmandevî û qirikîye, awayê belavbûna wê girtî û hişk e
**qabiliyet 1.** hêza pêkanînê **2.** huner û pîşe
**qabqab** şimikên ku binê wan darînî ye
**qabûr** parçeyên şikestî ên tas û qasikan
**qaçanî** *ta*sika ji porselenê
**qaçil [I]** qaşil, qalik
**qaçil [II]** bişku
**qaçil kirin 1.** spî kirin **2.** dapîtin ❋"li pişt baranê **qaçil dike"**
**qaçî kirin** *(jin)* por kurtisandin
**qad 1.** meydan **2.** war, dews **3.** delîve
**qadî** dozger ❋"dinya **qadî** ye, her kes ji xwe razî ye"
**qadûk** beroşa biçûk; qasik
**qaf 1.** tiştê req û vala **2.** tasa seriyî
**qaf bûn** parçe bûn
**qafik 1.** kaxetîta ku pê serê banan tê avakirin **2.** guldanka dûvedirêjkî ya ji kaxetîtê
**qafilqeda** qezaya nedîtî û nebînayî
**qaf kirin** parçe kirin
**qafok** gildîna ku lêkend bi xwe re tîne
**qafqafî** parçeparçeyî
**qafqafî bûn** parçeparçeyî bûn
**qafqafî kirin** parçeparçeyî kirin
**qafqiloz** derdanên ji xweliyê; kaxetît
**qaj 1.** cureyekî daran e **2.** qaş
**-fisteqa qajê** berên dara qajê
**qajeqaj** qîjeqîj
**qajên** qîjên, qîjînî
**qajik** benîştê ku ji dara bênîşt tê bidestxistin
**qal [I]** behs
**-qala yekî kirin** behsa yekî kirin
**qal [I]** tişt req, pehn û tenik
**qalbox** dermanê ku birînên ajalan didin da ku kurmî nebin
**qalebal** axaftina beletewş

**qalib** amûra ku tiştan tê de ro dikin; bilûl

**qalik 1.** qaşil **2.** amana valakirî **3.** qaşilê fîşenga teqandî *"bila zikê mirovî têr be, bila bi **qalik**ê dêr be"

**qalind** stûr *"**qalind** hetanî zirav dibe, zirav diqete"

**qalind bûn** stûr bûn

**qalind kirin** stûr kirin

**qal kirin [I] 1.** behs kirin **2.** qise kirin *"aşiq birçî dibin, **qal**a nanê dawetan **dikin**"

**qal kirin [II]** *(zîv ji madenên din)* dawerivandin

**qalo** kevirê tehtevêlkî yê ku nan li ser tê pijandin; qafika nanpehtinê

**qalonçe** bihukeke ku zirarê dide gênim

**qam** bejn *"**qam** qama kermêşê, deng dengê gamêşê"

**qamçûr** kamçûr

**qame 1.** cureyekî xenceran e **2.** sator an jî kêrikeke ku bi serê tivingan ve dikin û di şerên ku du eniyên dijmin dikevin nav hev de tê bikaranîn

**qamik 1.** movik **2.** tiliya beranekê

**qamir 1.** giyayê qert **2.** qamîş

**qamir bûn** *(giya)* qert bûn

**qamîş/qamûş** leven

**qamk** tiliya mezin

**qamkinik 1.** bejnkinik **2.** xirdik

**qang** paqijkirina bi hilm û gilmê

**qang kirin** bi hilm û gilmê paqij kirin

**qanik [I]** kefkanî

**qanik [II]** cureyekî çêreyê ye û jê benîşt tê bidestxistin

**qanî** razî

**qanî bûn** razî bûn

**qanî kirin** razî kirin

**qantir** sewala ku ji têkiliya di navbera hesp û keran de çêdibe; hêstir *"**qantir** nazê, xwê şîn nabe"

**qanûn** zagon

**qanûnî** zagonî

**qap 1.** gotina ji qewarê xwe mezintir **2.** axaftina gir û qelew

**-qap berdan** ji xwe mezin axaftin

**qapût** kinceke stûr a zivistanî ye; sako, qemsele

**qaq [I]** vizvizîk

**-qaqa ser cemedê** aqilsivik, selemtî

**qaq [II] 1.** hêk **2.** *(di zimanê zarokan de)* tiştê şikestokî

**-qaqa reş** hêka reş a ku nîşaneya karesata herî mezin e

**-li qaqa reş asê kirin** tûşî felakete pir mezin anîn *"li ser me bû roja reş, em asê kirin **qaq**a reş"
**qaq [III]** qeşa
**-qaq girtin** qeşa girtin
**qaqê** **1.** hêk **2.** *(di zimanê zarokan de)* tiştê şikestokî *"biçûkayî dibêje hêk, mezin dibe û dibêje: **'qaqê'** "
**qaqil** cureyekî çêreyê ye
**qaqlîbaz** cureyekî çivîkên zeryayî e
**qaqreş** kundirê qemer
**qarandin/diqarîne/biqarîne** **1.** qîjandin **2.** zêrandin
**qarç [I]** cureyekî daran e
**qarç [II]** hestiyê qorikê
**qarçik** hêt *"berû da bizinê, dest avête **qarçik**e"
**qarçikî** kesê ku hestiyê qorika wî şileke bûye; xawûşe
**qareqar** qajeqaj
**qareqar kirin** qajeqaj kirin
**qarên** qîjên
**qarik** kesê bêçare
**qarix** di nav bîstanekî de kerdiyên sewzeyan
**qarîn/diqare/biqare** **1.** qîjîn, qîrîn **2.** bang kirin *"mirîşk **biqare**, hêkê dike"
**qarînî** qarên
**qarot** bistikê giyayî
**qartik** bizmarê darînî
**qarûşe** siqayîla çilpiyan
**qas** **1.** miqdar **2.** heyam
**-vê qasê** vê gavê
**qasid** peyamber, berdevk
**-qasidê qolfelekê** melkemot, ruhstîn
**qasik** **1.** feraqên ku tê de xwarin tê pijandin **2.** derdan *"**qasik**an malêse, bi alastinê zik têr nabe"
**qaş** kevirên giranbiha yên ku di gustîl, gerdenî û tiştên din de tên çikandin
**-qaşa çavî** şûna ku çav tê de ye
**qaşil** **1.** qalik **2.** hûrik û mûrikên bermayî *"kara necaran, **qaşil**ên daran"
**qaşo** xwedîgiravî
**qat** **1.** tetqal **2.** her parçeyekê du tiştên ku li ser hev in; taq, ta
**qat bûn** **1.** duta bûn **2.** tewîn
**qat kirin** **1.** duta kirin **2.** tewandin **3.** keys kirin
**qatqatî** **1.** her parçeyekê pir tiştên ku li ser hev in; taqtaqî, tatayî **2.** keyskirî
**qatqatî kirin** ber bi jor li ser hev keys kirin
**qawêr** gergere

**qawit** cirî, erzaq
**qawûş** **1.** kember, qûş **2.** bûjenên ku ji zaxkirina niftê çêdibin
**qax** mêweyên hişk-kirî yên ku dendikên wan jê hatine avêtin
**qax kirin** *(mêweyên ku dendikên wan hatine avêtin)* ber tavê hişk kirin
**qayde** rêbaz
**qayil** razî
**qayil bûn** razî bûn
**qayîm** muhkem û şidiyayî
**qayîm bûn** şidîn û xurt bûn
**qayîm kirin** şidandin û xurt kirin
**qaz** cureyekî sewalên bibask a malê ye *"**qaz** bi qazan re, baz bi bazan re û mirîşka kor bi dîkê kulek re**"**
**qazim** bendê ji hiriya hêştiran
**qazî** hakimê dadwer *"heke qazî nebe, kumê xwe ji xwe re bike **qazî"**
**qe/qet** **1.** tu/çu, hîç **2.** ma, ma qey *"**qe** berkêş, bi mêvanan geş?"
**-qe na** qet nebe, hîç nebe
**-qet nebe** hîç nebe
**qeb** binavêlîstin, zorankirin
**qebale** kirîn û firotina bi giştî
**qebalek** dolaba ku di qefa dîwêr de tê çêkirin
**qebare** qeware
**qebeqeb** dengê domdar ê xwendina kewan
**qebeqeb kirin** *(kew)* bi awayekî domdar xwendin
**qebrax** **1.** deyûs **2.** jinfiroş
**qebraxî** **1.** deyûsî **2.** jinfiroşî
**qebûl bûn** **1.** pejirîn **2.** peyitîn **3.** çespîn
**qebûl kirin** **1.** pejirandin **2.** peyitandin **3.** çespandin
**qebz** rewşa bêtenduristiyê ya ku doran gemara hundirî navêjin derve
**qebz bûn** gemar di doranan de hişk bûn û derneketin derve
**qed** bejn
**qeda** bela, felaket, karesat
**qedandin/diqedîne/biqedîne** kuta kirin
**qedeh** **1.** piyan **2.** îskan *"**qedeh**eke jehrê vexwe, lê qurteke qehrê vemexwe**"**
**qedemgeh** destşok, daşir
**qedexe** **1.** fermana nekirinê **2.** heram
**qedexe kirin** **1.** fermana nekirinê dan **2.** herimandin **3.** heram hesi-

bandin

**qedîm** tiştên berê û kevn

**qedîn/diqede/biqede** **1.** xelas bûn, kuta bûn, red bûn **2.** biriyan

**qedr** **1.** giramî, rêzdarî **2.** nirx, biha *"**qedr**ê mêvanan, qedrê Xwedê"

**qed û qamet** bejn û bal

**qef** **1.** cihê vala yê wekî sîwanekî di ber kevir û newalan de **2.** cihê talde û qûze **3.** hawirdor, çember

**qefaltin/diqefêle/biqefêle** **1.** girtin **2.** bi dest xistin **3.** zirze kirin

**qefare** kilîleke mezin a darînî ye

**qefare kirin** bi qefareyê kilîl kirin

**qefçil** kirêt

**qefes** **1.** sersîng **2.** paçika dorgirtî û tenik a ku tiştê li hundir ji derve ve tê dîtin

**qefilandin/diqefilîne/biqefilîne** li ber sermayê qerisandin

**qefilîn/diqefile/biqefile** ji ber sermayê qerisîn

**qefle** **1.** ref **2.** kerî

**qefş** **1.** baqek giya **2.** por

**qehirandin/diqehirîne/biqehirîne** **1.** rik anîn, hêrs anîn **2.** behicandin **3.** ji kerban teqandin

**qehirîn/diqehire/biqehire** **1.** rik hatin, hêrs hatin **2.** behicîn **3.** ji kerban teqîn

**qehitîn/diqehite/biqehite** xela û tunetî lê peyde bûn

**qehr** **1.** zulm û pêkutî **2.** xem û keser *"mirov ji ber **qehr**an, xwe davê behran"

**-ji qehran tetirxanî bûn** ji kerban mirin

**qehreman** mêrxas, egîd

**qehremanî** mêrxasî, egîdî

**qehwe** rehekeke ku dendikên wê tên hêran, di avê de tê kelandin û ev av digel şêkir di pingaNan de tê vexwarin

**qehweyî** di rengê qehweyê de; qemerê tarî

**qel** elok

**qela** cureyekî maden ê ku wekî hêsin tê bikaranîn

**qela kirin** alav an jî aman bi qelayê rûpûşkirin

**qelafet** temtêla lixwekirina yekî; ser û sîçê

**qelandin/diqelîne/biqelîne** **1.** qijirandin **2.** ji nav birin **3.** qetliyam kirin *"an em bixemi-lînin, an **biqelînin**"

**-binçirk qelandin** bi reh û rîçalan ve hilqetandin û şewitandin

**qelareşk** cureyekî reşêlekan e

**qelaştin/diqelêşe/biqelêşe** **1.** dirandin **2.** qul kirin
**qelax** **1.** qûçê kermeyên jenandî **2.** sarcîn
**qelb [I]** dil
**qelb [II]** qulebî, teqlîd, sexte *"gayê **qelb**, barê giran hilnade"
**qelem** amûra nivîsandinê; pênûs
**qelembir/qelemtiraş** amûra tûjkirina serê pênûsên darînî
**qelemdank** aman an jî tûrikê ku pênûsan dikinê; pênûsdank
**qelemon** dîkê elokan
**qelemzirêç** cureyekî pênûsên darînî ye û bûjena zirîçdar a di nava wê de dinivîse
**qelend** şert û heqên jinê ên ku ji bo zewacê dide pêşiya kesê xwestî *"keça mîran, bi **qelend**ê gavanan nayê"
**qelend birîn** şert û heqên jina ku hatiye xwestin diyar kirin
**qelender** jîr û jêhatî
**qelenderî** jîrtî û jêhatîtî
**qeleş** minexet û xayîn
**qeleşî** minexetî û xayîntî
**qelew** **1.** stûr **2.** kok
**qelew bûn** **1.** stûr bûn **2.** kok bûn *"beq çiqas kok dibe, qûn ewqas lê **qelew dibe**"
**qelew kirin** **1.** stûr kirin **2.** kok kirin
**qelibîn/dielibe/biqelibe** **1.** dan ber xwe û çûn **2.** noqî tev bûn **3.** wergerîn
**-tê qelibîn** **1.** lê asê bûn **2.** noqî tev bûn
**qeliqandin/diqeliqîne/biqeliqîne** **1.** gêjomêjo kirin **2.** nav tê dan **3.** tehrîk kirin
**qeliqîn/diqelique/biqelique** **1.** şaşopaşo bûn **2.** niçîn
**qelişandin/diqelişîne/biqelişîne** **1.** derizandin **2.** dirandin **3.** kirin çend biran
**qelişîn/diqelişe/biqelişe** **1.** derizîn **2.** dirîn **3.** bûn çend biran
**qelizandin/diqelizîne/biqelizîne** xwe vedizîn, fizirîn
**qelizîn/diqelize/biqelize** **1.** lê telandin, pêdizkî bi rê ve çûn **2.** li benda firsendekê man
**qelî** goştê qelandî *"ji serê qijikan, **qelî** çênabe"
**qelîn/diqele/biqele** **1.** bi tîna germê req bûn **2.** li ser agirî pijîn **3.** ji ber bêaviyê çilmisîn **4.** ji navê çûn, binevat bûn
**qelîsêl** goştê di sêlê de qe-

landî; sêleqelî
**qelîştek** **1.** derz **2.** cerx **3.** qul
**qelqeloşk** nanê ku li ser sêlê qelyaye û dema xwarinê kirekir jê tê
**qels** **1.** zeîf **2.** lawaz **3.** jor **4.** hejar **5.** yax
**qelsemêr** **1.** mêrê ku tenê bi navê xwe mêr e **2.** nemerdê ku di lisfê mêrxasan de xuya dike **3.** şindokê mêran *"bila mêr bi destê mêran bêne kuştin, ne bi destê **qelsemêr**an"
**qelsî** zeîftî, lawazî, jarîtî
**qelş** **1.** derz **2.** cerx **3.** qul
**qelûn** darcixare
**qemalax** di rojên berfî de nêçîra kewan a bê çek
**qemandin/diqemîne/biqemîne** qemirandin
**qematik** pêçeka zarokê
**qemb** cewiyên zeliqî
**qemç** boçik, dûv, dêl
**qemçik** cureyekî baskê ku ji çerm û têla zirav dihûnin da ku pê ajalan bibezînin; şelaq
**qemer** rengê qehweyî yê girtî
**qemerdîn** pestîlê arûngan
**qemirandin/diqemirîne/biqemirîne** **1.** *(bi tîna germê)* reng lê tarî kirin **2.** kizirandin
**qemirîn/diqemire/biqemire** **1.** *(bi tîna germê)* reng lê tarî bûn **2.** kizirîn
**qemsî** paşbêj
**qemtik** destmala hevrêşîmî ya biçûk
**qemûşk** qalikên birînê
**qenc** **1.** baş **2.** rind **3.** delal
**qencî** **1.** başî **2.** rindahî **3.** delalî *"**qencî**, qenciyê nas dike"
**qend** şekir
**qendav** ava kelandî û xalî ya ku şekir berdane tev
**qendîl** çira
**qenter** amûra ku barên giran dikêşe
**qentere** stûna wekî lûleyeke dirêj
**qepûşk** şeytanok
**qer** rengê reş ê birqonek
**qeram [I]** taqet, mecal
**-ji qeramê ketin** ji qudûm ketin
**qeram [II]** dervank
**qeramûşk** quncirok
**qerandin/diqerîne/biqerîne** **1.** veterisandin **2.** vepesirandin **3.** jan jê birandin
**qerar** biryar *"dinya soz û **qerar** e, ne behs û bazar e"
**qerar dan** biryar dan
**qerase** **1.** telhîn û dirêj, tot û dirêj **2.** malêle
**qeraş** aşvan *"derdê qe-

rêş, av her ser êş”
**qerax 1.** kêlek **2.** kêleka çem û zeryayê
**qerd** qerz
**qereçî 1.** cingene **2.** qelaçêker *“keçika **qereçî** nabe xatûn”
**qeresî** gêlas
**qerem** leven, qamîş
**qerf 1.** henek **2.** tinaze, tirane
**qerfî** mizahî
**qerfok** henekbaz
**qerimandin/diqerimîne /biqerimîne 1.** westandin û ji qudûm xistin **2.** tevizandin
**qerimîn/diqerime/biqerime 1.** westîn û ji qudûm ketin **2.** tevizîn
**qerisandin/diqerisîne/ biqerisîne 1.** tepisandin **2.** cemidandin
**qerisîn/diqerise/biqerise 1.** tepisîn **2.** cemidîn
**qerîn/diqere/biqere** dev jê berdan
**qerîngan** korîgan
**qermiçandin/diqermiçîne/biqermiçîne** bi ser hev de quvaştin
**qermiçîn/diqermiçe/biqermiçe 1.** xaromaro bûn **2.** xiltomilto bûn
**qermîçok 1.** xilimxaro **2.** xiltomilto
**qernebît** kelem
**qeroş** evîna hunerê
**qerome** darekî devçeqel î ku bi kêrî çemandina destikê gopalan tê
**qerpal 1.** pîne û potik **2.** zîvalzîvalî **3.** bi ser hev de rizîn
**qerqaş** çîlspî
**qerqef** avdank, badîn
**qerqeşûn 1.** pola **2.** tiştê pir hişk
**qerqîlk** qaxê xerûzeyan
**qerqûde 1.** skêlet **2.** kelax
**qerqere** qerqûde
**qersîl** cehê ter
**qersûn** dîzika devfireh
**qert 1.** giyayê qamir **2.** mirov û sewalê pîr
**qert bûn 1.** *(giya)* qamir bûn **2.** *(mirov û sewal)* pîr bûn
**qertaf [I]** *(r)* îlaweyên ku wateyeke nû didin peyvan
**qertaf [II]** hingivê herî nû yê mêşa hingivî
**qerwaş** berdestiya jin; cêrî
**qerz** tiştên ku heta maweyeke diyarkirî hatiye hildan; deyn
**qerzdar** deyndar
**qesab 1.** goştfiroş **2.** kesê ku serê sewalên ku goştê wan tê xwarin jê dike, digure û kelepîçe dike **3.** kujerê bêrehm
**qesd 1.** arman **2.** niyêt
**qesel** bistê giyayê çinandî

yê ku li erdê maye; qirşik
**qesem** sond
**qesik** bûjeneke ku dişibihe tevna tevnepîrkê û hin kurmikên bihukan asteke jiyanê di nav de dimînin
**qesîl** şanişîna li pêşiya malê
**qesîs** **1.** xesîs **2.** çiriz **3.** bexîl
**qesp [I]** xurme *"diyarî **qesp** in, şûndiyarî hesp in"
**qesp [II]** biçêxeke ji zêrî
**qespik** firindeyek e
**qesr** koçk û sera
**qesrawî** wekî koçk û serayan
**qest [I]** meqsed, mebest
-**bi qesta yekî/tiştekî** bi mebesta yekî/tiştekî
**qest [II]** derew
-**ji qestan** qestîka
**qestbane** qestîka
**qestîka** bi derewînî
**qeşa** cemed
-**qeşa girtin** cemidîn
**qeşadank** amana ku cemedê dikinê
**qeşartin/diqeşêre/biqeşêre** qaşil spî kirin, qalik jê xistin
**qeşeng** **1.** bedew **2.** rind
**qeşmer** **1.** olintî, selemtî **2.** bêkesayet *"gur pîr dibe, dibe **qeşmer**ê roviyî"
**qet [I]** qe
**qet [II]** werisê kinik; qetik
-**qet û bend** şirît û kindir
**qetab** pêvek
**qetandin/diqetîne/biqetîne** **1.** qut kirin **2.** qurçimandin **3.** quraftin **4.** dirandin
**qetik** werisê kinik ê ku pê bar û piştî tên girêdan
**qetîn/diqete/biqete** **1.** qut bûn **2.** peritîn **3.** qurçimîn **4.** qurifîn **5.** dirîn *"av di cihê gelş de **diqete**"
**qetl** kuştina bi neheqî *"**qetl**a mêran, li erdê namîne"
**qetl kirin** bi neheqî kuştin
**qetmer** tetqal
**qetran** **1.** qîr **2.** rengê reş
**qetran kirin** qîr kirin
**qetûf** selika tiriyan
**qevd [I]** baq, destî
**qevd [II]** destika kêr, şûr û hwd
**qevdik** dûvçik
**qewad** qebrax, deyûs
**qewal** serokê êzdiyan
**qewan** alava ku newayan tomar dike
**qeware** **1.** qalib **2.** teşe, dirûv **3.** qeys **4.** birîna kûr
**qewarok** erdê kifşkirî
**qewartin/diqewêre/bi-**

**qewêre** qewirandin
**qewaztin/diqewêze/biqewêze** **1.** bi ser re gav kirin **2.** bi ser re bazdan
**qewimîn/diqewime/biqewime** **1.** bûn **2.** pêk hatin **3.** rûdan
**qewirandin/diqewirîne /biqewirîne** **1.** cehimandin, deherandin **2.** dehfandin, veder kirin
**qewitî** **1.** tembîh **2.** şîret **3.** hêvotin
**qewitî lê kirin** **1.** tembîh kirin **2.** şîret kirin **3.** hêvotin
**qewîn** **1.** qayîm **2.** şidiyayî **3.** muhkem
**qewl** **1.** gotin **2.** peyv **3.** salix *“**qewl**ê Nebî, sê caran e”
-**bi qewlê mezinan** bi gotina pêşiyan
**qewm** milet, gel *“**qewm**a kewê, kurmê hev e”
**qewnik** kundirê avê
**qey** **1.** tu dibejî hema wisa ye **2.** dibe ku wisa be jî
**qeyar** bûjena zeliqandina amanên ji kaxetîtê
**qeyd** amûra girêdana piyên hêsîr û girtiyan
**qeydik [I]** bazinê ku davêjin stû an jî piyan û pê girêdidin
**qeydik [II]** **1.** movika ku destan bi milan ve girêdide **2.** movika ku piyan bi lingan ve girêdide
**qeyd kirin** **1.** zincîr kirin **2.** tomar kirin **3.** nivîsîn
**qeyran** **1.** buhran **2.** alozî
-**qeyrana aborî** **1.** lawaziya îqtisadî **2.** kêmdebarî
**qeyre** **1.** kesê navsere **2.** maldemayî; nezewicî
-**qeyre bûn** di mal de man û şû nekirin
**qeyrejin/qeyremêr** jin û mêrên ku heta temenê navsaletiyê şû nekirine
**qeys** pîvan
**qeysik** darikên ku kêmlebat didin bin milên xwe da ku pê bimeşin
**qeysî** arûng
**qeytan** cureyekî qumaşê birqonek î kêmber e û pê dora pirtiyan tê neqişandin
**qez** hevrîşim
**qeza** **1.** biryara Xwedê ya di heqê yekî de **2.** bobelat **3.** xeletiyeke ji ber xemsariyê *“roj diçe, **qeza** naçe”
**qezaz** **1.** hevrîşimfiroş **2.** kincdirû
**qezî kirin** axaftin
**qêxane** hêkerûn
**qêrqaş** bi berahî
**qible** li her dera cîhanê îstiqameta Kebeyê
-**qibleya xwe şaş kirin** xurifîn û ji rastiyê averê bûn

**qiblename** rûgehnas
**qiç/qiçik [I]** **1.** hindik **2.** biçûk
**qiç [II]** ling
**qiçî** cureyekî çereya ku nepijî tê xwarin
**qiçrût** lingtazî
**qidîk/qidqidîk** rewşa ku ji ber temasa destekî biyanî li hin cihên hesas dikeve û kenê mirovî tê
**qidûm [I]** awa, tehr, celeb
**qidûm [II]** taqet, hêz
**-qidûm şikestin** **1.** bêhêz man **2.** ser û sîçe xera bûn
**qijik** **1.** cureyekî firindeyan e **2.** reben *"ji serê **qijik**ê, qelî çê nabe"
**qijilandin/diqijilîne/biqijilîne** qijirandin
**qijilîn/diqijile/biqijile** qijirîn
**qijirandin/diqijirîne/biqijirîne** **1.** di rûn de sor kirin **2.** tîna germê zêde kirin **3.** pir derew kirin
**qijirîn/diqirile/biqirile** **1.** di rûn de sor pijîn **2.** tîna germê zêde bûn **3.** şer giran bûn
**qijnik** qirnî
**qilalî** panêr û notirvan
**qilalî kirin** payîn û notirvanî kirin
**qilamcik** çivîkek e
**qilç** **1.** di lîstikê de serkeftin **2.** xwar **3.** cihoka avê
**-qilç kirin** **1.** di lîstikê de jê birin **2.** xwar kirin
**-qilç qut kirin** xwar birîn
**qilêr** qirej, nepaqij
**qilêwî** feraq
**qilik** kilîla darînî ya deriyan
**qilinc kirin** *(ji ber serma an jî nexweşiyê)* xwe guvaştin hev
**qilî bûn** xidikîn
**qilîç** tiliya herî biçûk a dest û piyên mirovan
**qiloç** stroyên heywanan *"gayê ku **qiloç**ê xwe li dîwaran bixe, rojekî dê qiloçê wî bişkê"
**qilozan** qulopanî
**qilpik** îskînîkirina ji ber têrbûnê
**qilqilik** cureyekî kilîlên darînî ye
**qilqilîç** qilîç
**qilûmik** goc, qop, kop
**qimar** **1.** lîstina ser tiştan **2.** merca bi berdêl
**qimarbaz** kesê ku qimar dilîze *"kesî negotiye: 'ev mala dizan û **qimarbaz**an e"
**qimil** cureyekî kêzikan e
**qinare** debaxane, mezbehe
**qinc** bi dirêjahî
**qincok** xêza bi dirêjahî; hêlîlar
**qinik** cihê ku mirîşk, qaz û werdek lê tên êwiran-

din, pin/pinik
**qinût** çikûs, bexîl
**qinyat/qinaet** **1.** bawerî **2.** qîmpêanîn *"ji axê pirtir tuneye, mar bi **qinaet** jê dixwe"
**qir** **1.** mirin **2.** kuştin
**qiraç** çapa navbera du xêzên ku hev dibirin
**qirak** qijika reş
**qirar** qerar *"hesp bi hefsaran, mêr bi **qirar**an"
**qirask** **1.** ziyandar **2.** bela bêpere ya ku bi pêsîra xelqê ve digire **3.** letemeya rûyan 4. kesê ku miseletî serê xelqê dibe *"xwedî kir bi destê xwe, kir **qirask**ê serê xwe"
**qir bûn** **1.** mirin û tune bûn **2.** binçirk lê qelîn
**qirç** dengê şikestina dar, lek, hestî û tiştên req
**qirçandin/diqirçîne/biqirçîne** dengê qirçîniyê pê xistin
**qirçeqirç** dengê domdar ê sotina daran, teqîna guleyan an jî hûrbûn û şkestinê
**qirçên** **1.** dengê ku ji ber egera rakêşan an jî vekirina movikên laşî tê **2.** dengê şikestinê
**qirçînî** qirçên
**-qîrçînî pê ketin** şîrqînî pê ketin û şikestin an jî ji hev derketin
**qird** cureyekî heywanan e û ji bilî peyivîne hemû bizavên mirovan dubare dike
**qirdik** **1.** sersar **2.** rêşkenî **3.** jina ku navê wê bi nebaşiyê derketiye
**qireqir** dengê mirîşka berhêk
**qireqir kirin** *(mirîşk)* berî hêk-kirinê qîjeqîj kirin
**qirêj** **1.** qilêr, nepajij **2.** lewitî
**qirej bûn** **1.** qilêr bûn **2.** lewitîn
**qirêj kirin** **1.** qilêr kirin **2.** lewitandin
**qirêjok** kesê ku ji gemar û gemariyê aciz nabe
**qirên** şer û pevçûn
**qirik** qewrî, stûqulk
**-qirika dirêjî kêrê kirin** ji mirinê netirsîn
**-qirik ziwa bûn** **1.** pir tî bûn **2.** gewrî qirqiçîn **3.** ji tirsan qutifîn
**qirnî** geneyên hûrik; qijnî
**Qirjal** Bircê Duvpişkî
**qir kirin** **1.** kuştin û tune kirin **2.** kuta kirin **3.** kok lê qelandin
**qirneqos** qirneqot
**qirneqot** texterewan
**qirp** dengê şikestinê; xirt
**-qirp bûn** şikestin
**-qirp kirin** şikandin
**-qirp şikestin** ji nişkê ve xirt şikestin

**qirpik** qilpik
**-qirpik jê hatin** ji ber têrbûnê iskînî pê ketin
**qirqiçandin/diqirqiçîne /biqirqiçîne 1.** dev û ziman lê ziwa kirin **2.** tî kirin
**qirqiçîn/diqirqiçe/biqirqiçe 1.** dev û ziman lê ziwa bûn **2.** tî bûn
**qirş** têlên giyayê ziravik
**-qirş û qal** gildîn û arekê binê giyayî
**qirşik** qirşên hûrik
**qirt 1.** parçe, piç **2.** bertîl **3.** hîlebaz
**-qirt xwarin** bertîl xwarin
**qirtik** qalikên ku bi ser birînan ve çêdibin
**-qirtikên porî** pirtikên ku ji çermê seran dadiweşe nav porî
**-qirtik dan** qalik dan
**qirtî** hîlebazî, qulebazî
**-qirtî li serê yekî kirin** qulebazî li serê yekî kirin
**qise kirin 1.** behs kirin **2.** qal kirin *"bav ji bajêr tê, law jê re **qise dike**"
**qisim 1.** beş **2.** par **3.** bir
**qisimqere kirin 1.** parparî kirin **2.** belawela kirin
**qismet** nesîb *"kes nikare **qismet**ê kesî bixwe"
**qitî** ecûr
**qiyame** hevraz
**qiyamet** jîndarbûna piştî mirinê *"ez he me û **qiyamet** im"
**-roja qiyametê** *(ji bo hemû mexlûqetan)* roja jîndarbûna piştî mirinê
**qîç [I]** çavê korevîçkî
**-qîç bûn** çavkortik bûn
**-qîç kirin** çavê xwe nêzîkî girtinê kirin
**qîç [II] 1.** bilind **2.** bel **3.** derkeftî
**-qîç bûn 1.** bilind bûn **2.** bel bûn **3.** diyar bûn
**-qîç kirin** xuya kirin
**qîçik** zerê vekirî; rengê kayê
**qîçilokî 1.** zerotankî **2.** kesê ku ji ber nexweşiyekê rûyê wî zer bûye
**qîjandin/diqîjîne/biqîjîne 1.** qîrandin, awazeke bilin jê derxistin **2.** zêrandin **3.** giriyandin
**qîjîn/diqîje/biqîje 1.** bi awazeke bilind bang dan; qîrîn **2.** zûrîn **3.** girîn
**qîl** di tûşa dawiya lêvan de du diranên jorîn û duyên jêrîn ên ku tûjtirên diranan e
**-qîlê xwe di yekî de çikandin** kesek kirin ber lepê xwe û pê karîn
**qîm 1.** têrî **2.** razîtî
**-qîma xwe pê anîn 1.** jê çavtêr bûn **2.** jê razî bûn

**-qîm kirin** têrê kirin
**qîmet 1.** qedr **2.** biha **3.** giramî
**qîq [I] 1.** çik **2.** ziq **3.** şek
**-qîq rabû şipê 1.** çik rabû ser piyan **2.** rabû şekan **3.** li ser piyan ziq bû û sekinî
**qîq [II] 1.** mok û hestî; kelax **2.** lawaz **3.** kesê bejndirêj
**qîq bûn** bûn mok û hestî; bûn kelax
**qîqeqîq** dengê dîkan
**qîr [I]** bûjeneke ji niftê ya ku dirijînin ser xîçên riyan da ku ji hev belav nebin
**-qîr û qetran** reş û tarî
**-qîr û sîr** bela û şetele
**-qîr kirin** xîç û xîştorê rê bi qetranê tepisandin hev
**qîr [II]** qîj *"hevalê **qîr**ê, nikilbigû ye"
**qîrandin/diqîrîne/biqîrîne** qîjandin
**qîrîn/diqîre/biqîre** qîjîn
**qît 1.** çiqil **2.** bel û ber çavan; qîç
**qîtik 1.** çiqilk **2.** gilê
**qîz** keç *"**qîz**ê bixwaze bi dilê kalan, hespê bikire bi dilê xortan"
**qîzap** keça apî
**qîzmet** keça metê
**qîzxal** keça xalî
**qîztî 1.** keçinî **2.** keça birayê bûkê
**qoç [I] 1.** qiloç **2.** careke lêxistina ajalên biqiloç; tel
**-dan ber qoçan** bi qiloçan dehf dan
**qoç [II]** kemîna ku ji bo nêçîra ajalên kovî tê danîn; dafika dirindeyan
**qol [I] 1.** dûvkinik, boçkinik **2.** huçikqol
**qol [II] 1.** car, teql **2.** bir
**-vî qolî** vê carê
**qolinc 1.** kulang **2.** êşa ku dikeve kulangan
**-qolincê yekî şikandin** *(da ku êşa sermilan bê birîn)* kesek di kulangan de guvaştin
**qopçe** cureyekî bişkojkên dubeşî ye û beşa biserî bi beşa biqul ve dizeliqe
**qopik** binikên baçikan
**qoqiz 1.** qirtik **2.** girtik
**qor [I]** kalê hophopo/hizhizî; keftor
**qor [II] 1.** şîştir, rêz, dor **2.** ref
**qorç** qoç *"**qorç,** ji beran re ne bar in"
**qorede** heywanê jar; yax
**qoreqor** oreor
**qorên** orên
**qorik** hêt, qarçik
**qorî** çaydank
**qorzî** gihaneka du xêzên ku rastî hev tên; çivange,

goşe *“kevrê giran, kevirê **qorzi**yê ye”
**qose** darcixare, qelûn
**qoş** *(giyanewer)* derxistina tiştê hundir
**qoş dan xwe** **1.** *(sewala ku dizê)* zor dan têjikê da ku derkeve **2.** *(jina ku diwelide)* zor dan zarokê da ku derkeve **3.** *(gîre)* zor dan gemarê da ku derkeve
**qot [I]** **1.** hop, balûle **2.** parî *“gur, bi du **qot**an namire”
**qot [II]** gupika çiyê; lûtke
**qotik [I]** nexweşiyeke xedar e; xeneqûtik *“qehr û **qotik**a dinyayê naqede”
**qotik [II]** **1.** kêrt, gir **2.** serî
**qotik [III]** binika baçikê
**qotik [IV]** **1.** derd, kul **2.** gotina tûj *“xerab ji kul û **qotik**an, baş jî ji dost û yaran xalî nabin”
**qotik [V]** **1.** şeşar **2.** kevnegêzî
**qotik [VI]** kurmekî doranan e
**qotik [VII]** goc
**qube** avahiyê ku li ser banê mizgeftan di şêweyê nîvê hêkekî de tê çêkirin
**Quds** bajarê pêxemberan ê li Filistînê *“mirov bi pirsê, diçe **Quds**ê”
**qul** **1.** kun **2.** derz **3.** qelş **4.** cerx **5.** tîş *“**qul** fireh bibe, pîne nagire”
**qulac** maweya ji sermilekî hetanî sertiliyên milê din
**qulbik** lenger, xepar
**qul bûn** **1.** kun tê de çêbûn **2.** derizîn **3.** qelişîn **4.** cerx pê ketin **5.** tîştîşî bûn
**qule** ker û hespê ku rengê wan belekiyeke ji reş û zer pêk tê
**qulebaz** kesê ku karên têvel dike û hîleyan tîne serê xelqê
**qulebazî** fêlbazî, sextekarî
**qulefîskî rûniştin** li ser simûçkan rûniştin
**qulibandin/diqulibîne/biqulibîne** **1.** wergerandin **2.** vegerandin **3.** çilmisandin
**qulibîn/diqulibe/biqulibe** **1.** wergerîn **2.** vegerîn **3.** çilmisîn
**quling** balindeyeke lingdirêj e *“çi tê serê **quling**ê, ji qajîna qulingê ye”
**qulik** kunên biçûk *“gûmişk, di **qulik**ên dîwaran de pir in”
**qulîzên** **1.** gazî û hewariya komelî ya di demên ku bûyereke bi tirs an jî

nexweş rû dide; hêwirze **2.** di rewşên awarte de dengê dûdika hişyariyê

**qul kirin 1.** kun tê de çêkirin **2.** derizandin **3.** qelişandin **4.** cerx pê xistin **5.** tîştîşî kirin *“baranê erd şil kir, zîpike erd **qul kir**”

**qulopanî** destdanîna erdê û qewaztina çep an jî rast; teqle

**qulopanî kirin** dest danîn erdê û bi ser an jî bin xwe re qewaztin

**qulopilo** sixtopixto

**quloz 1.** bilind **2.** hevraz *“gotin: ‘dîno heştirme çi ye?’; got: ‘serberjêra qûn-**quloz**’ ”

**qulozan** qulopanî

**quloz bûn 1.** bilind bûn **2.** hevraz bûn *“nifirên ku **quloz bûne** ezmanan, bi şun de vedigerin xwedanan”

**quloz kirin 1.** bilind kirin **2.** hevraz kirin

**qulp 1.** destikê girtinê yî çemberkî; çembil **2.** kuna bişkojkan *“belaya xelqê ji dûrê tê, ya me ji ber **qulp**a tûrî tê”

**-qulpa çavan** kortika çavan

**-qulpa derziyê** kunika ku şûna bendtêrekirinê ye

**-qulp pê ve kirin** bi îftirayekê soxî kirin

**qulqule** rizde

**qulqulî 1.** tîştîşî **2.** kunkunî

**qumaş** pîneyê ku jê kinc û hwd tên çêkirin; pirtî

**-ma qumaşê alê ye?** çira ewqas bibiha ye?

**Qunbere** stêrkeke ku di nîveka havînê de dertê û pir bi şemal e; Qurix

**qunc** kunc

**-quncê jorîn** di civatan de cihê payebilind

**quncal** qulac

**quncik** kuncik

**quncirandin/diquncirîne/biquncirîne** bi tiliya beranekê û şehadetê berk guvaştin

**quncirûk** careke quncirandinê

**quraf** tirs û xof

**quraftin/diqurêfe/biqurêfe [I] 1.** badan **2.** tewandin **3.** guvaştin **4.** tirî çinîn

**quraftin/diqurêfe/biqurêfe [II] 1.** bêhavil man **2.** ji ber tirs û dehşetê bêqidûm bûn **3.** jan kêşan

**Quran** pirtûka pîroz a ola îslamê

**qurban 1.** sewala ku ji bo Xwedê hatiye serjêkirin **2.** cangorî *“ker nabe

qurban, bihayê kerê dibe **qurban"**

**-qurbana vî kurî, teşt firot legan kirî** zarokê bêxêr, tiştê giranbiha di riya tiştê erzan de dimezêxe

**-qurban dan 1.** *(ji bo Xwedê sewaleke ku bi kêrî qurbanan tê)* ser jê kirin **2.** gorî kirin

**-qurban kirin** gorî kirin

**qurcûm** giyayê ku ber ajalan dimîne û ji bo şewateyê tê bikaranîn

**qure** pozbilind

**-qure bûn** pozbilind bûn

**-*(xwe)* qure kirin** xwe kizeve kirin

**qureder** nifrîneke di wateya *"jehrê bixwe!" a*n jî *"hiş be!"* de ye

**qurequr** dengê beq û zikê vala

**qurequr kirin** beqê û zikê vala deng derxistin

**qurf** qamîşê ku terîterî tê çinîn; levenê zirav

**qurfik** selik

**qurifandin/diqurifîne/biqurifîne** *(tiştê hişk)* bi tewandinê qut kirin

**qurifîn/diqurife/biqurife** *(tiştê hişk)* bi tewînê qut bûn

**Qurix** Qunbere

**qurm 1.** zikê darê yî qelew **2.** gewdeyê darê *"agirê gur, di **qurm**an de ye"

**qurmiçandin/diqurmiçîne/biqurmiçîne** guvaştin û pelixandin hev

**qurmiçîn/diqurmiçe/biqurmiçe** ji ber guvaştinê civîn û pelixîn hev

**qurnaz** kone

**qurnazî** konetî

**qurom bûn** bêpêjn û bêtevger bûn; lev piçikîn

**-(xwe) qurom kirin** bêpejn û bêtevger bûn; xwe gilê kirin

**qurqurbeg 1.** seg **2.** kûçik *(mêr)* **2.** lotê *(jin)* *"ji heft salan salek, aîdî **qurqurbeg**ê ye"

**-kurê qurqurbegê** kûçikê kurê kûçikan; segbav

**qurt** gum, fir

**qurtandin/diqurtîne/biqurtîne 1.** di gewriyê de berjêr kirin **2.** fir kirin

**qurtik** berkurk

**qurût 1.** di lîstikê de jêbirin; fît **2.** peyveke ku ji sewalan re tê gotin ku avê vexwin

**qurût bûn 1.** di lîstikê de jê çûn; fît bûn **2.** *(sewal)* hucûmî avê kirin

**qurût kirin 1.** di lîstikê de jê birin; fît kirin **2.** *(mirov)* sewal bi fîtefîtê vexwendin avê

**qusan** pîrotan

**qusandin/diqusîne/biqusîne [I] 1.** kurtisandin **2.** birîn
**qusandin/diqusîne/biqusîne [II]** xwîn an jî şîr wekî kersengan kirin
**qusîn/diquse/biquse 1.** xwîn an jî şîr kerseng-kersengî bûn **2.** kurtisîn
**qut 1.** birî **2.** qetiyayî
**qutb 1.** serok **2.** ji hemûyan mezintir **3.** cemser
**qut bûn 1.** qetîn **2.** jê bûn
**qutifandin/diqutifîne/biqutifîne** bi tirs û xofê bêtevger hiştin
**qutifî** kesê ku ji ber tirs û dehşetê nikare xwe tev bide
**qutifîn/diqutife/biqutife** ji ber tirs û dehşetê di cih de rawestîn û neleqîn
**qutik** cureyekî kincan ê bimil e; mîntan
**qutim** qurmê darê
**qut kirin 1.** birîn **2.** qetandin **3.** jê kirin *"darê, di bin xwe ve **qut meke**"
**quwet** hêz, şiyan
**quz** endamê mêzatiyê; şilepor *(mirov)*, za *(ajal)*
**quzfiroş** qewad, qebrax
**qû** cureyekî teyran e
**qûç 1.** tiştên li ser hev jenandî; gutle **2.** komeke keviran **3.** tijî û dagirtî *"mala zêran pûç e, mala mêran **qûç** e"
**qûç bûn 1.** bi ser hev de kom bûn **2.** tijî bûn
**qûç kirin 1.** li ser hev jenîn; bi keys kirin **2.** tijî kirin
**qûn 1.** qul **2.** kun **3.** tilora ku gemara hundir davêje derve *"**qûn**, bi qûnkaşkê ji kîrî xelas nabe"
**-qûn pan kirin 1.** qelew bûn **2.** niyêta rabûnê nekirin
**-qûnê bi min re neyê, bîna genî ji te tê** quretiya bi malbatê qebûl nekirin
**qûndare** pêlavên çêrmîn ên ku nalçeyên wan darînî ne
**qûnde/qûnek 1.** mêrê ku qûna xwe dide gadan; lûtî **2.** jina ku mêran berdide ser xwe; qehbik, fahişe
**qûndetî/qûnektî 1.** lûtîtî **2.** fahişetî, qehbiktî *"dizî bi nanekî, **qûndetî** bi ramûsanekî"
**qûnek** qûnde
**qûnfireh 1.** qûnfireh **2.** bêxîret
**qûngiran** qelewê teral
**qûntar** bintar
**qûş** bendê ku zînê hespê li binzikê girêdide *"heke nanê şil ket zikê meriyan, **qûş** xwe ranagirin"

**-qûş li yekî teng kirin** xeneq lê şidandin

**qûşxane** beroşa bêçembil

**qût** **1.** xwarin **2.** xurek **3.** alifê mirîşkan

**-qût xwarin û ji qûnê bûn** faydeya bênamûsiyê dîtin

**qûze** cihê ku tav jê nagire; talde

# R

**r/R** tîpa bîst û yekemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê diranî ye, awayê belavbûna wê herikî û lerzokî ye

**ra[I]** reh

**ra [II]** **1.** fikr, hizr **2.** çare

**-raya giştî** fikra her kesî; ramana gelemper

**-ra jê bûn** çareser bûn

**raber** pêşber

**raber kirin** **1.** rave kirin **2.** araste kirin **3.** pêşandan

**rabezîn/radibeze/rabeze** **1.** êrîş kirin **2.** pev çûn, lêk dan

**rabihartin/radibihêre/rabihêre** **1.** bi yekî re heta cihekî çûn **2.** bi yekî re baş derbas kirin

**rabihîstin/radibîze/rabihîze** **1.** hîs kirin **2.** tê derxistin **3.** pê zanîn

**rabirdû** raborî

**raborî** **1.** dema borî û çûyî **2.** serpêhatî

**rabûn/radibe/rabe** **1.** bilind bûn **2.** hilqetîn *"li mala dînan, **rabûn** hev bi pehînan"

**-rabûn şek** **1.** *(sewal)* rabûn ser lingên paşîn û çik sekinîn **2.** *(sewal)* li hev xistin

**raçandin/radiçîne/raçîne** **1.** tov reşandin **2.** tevn çêkirin

**raçav** bendeman

**raçav kirin** payîn

**radan/radide/rade** **1.** pê vedan **2.** lê dan **3.** gayîn

**rade** **1.** ast, pile **2.** derece, merhele

**rader** *(r)* mesderê lêkerê

**radest** di destan de; teslîm

**radest bûn** ketin destan; teslîm bûn

**radest kirin** dan destan; teslîm kirin

**rageş** kesê ku bi rageşiyê ketiye

**rageşî** nexweşiyeke vekişîna rehên laşî ye û pêketiyê wê zû bi hêrs dibe

**ragihandin/radigihîne/ragihîne** **1.** şandin **2.** salix dan **3.** dan zanîn

**ragihiştin/radigihêje/**

**ragihêje** xwe gihandin tiştekî
**ragirtin 1.** vekişandin **2.** bêhnfireh bûn
**-xwe ragirtin** tehemul kirin
**raguhastin/radiguhêze /raguhêze** ji cihekî hildan û danîn cihekî din; neql kirin
**rahatin/ratê/rabê** hînî tiştekî nû bûn
**rahejandin/radihejîne/ rahejîne** tiştek bi tundî leqandin û hejandin
**rahêl 1.** cihê rajorîn **2.** devera jorîn
**rahêlan/radihêle/rahêle** li pey tiştekî ketin
**rahiştin/radihêje/rahêje 1.** xwarî tiştekî bûn û hildan **2.** wergirtin
**-rahiştin darê û dar bi dest ve hatin** pir xurt bûn
**rajêr** aliyê jêrê
**rajor** aliyê jorê
**raketin/radikeve/rakeve 1.** razan **2.** paldan **3.** ramedîn **4.** nivistin *"gava Xwedê bide ha rakeve, ha **rakeve**, gava nede ha li ba keve, ha li ba keve"
**rakêşan/radikêşe/rakêşe** ragirtin, vekişandin
**-rakêşana zevînî** hêza erdê ya ku tiştan ber bi xwe ve dikêşe
**rakirin/radike/rake 1.** bilind kirin **2.** hilkirin **3.** hilqetandin
**rakişîn/radikişe/rakişe** vekişîn
**raman 1.** têgihiştina kar, kiryar, gotin û hwd; fikr, hizr **2.** pokinîn
**-raman û beyan** dîtinî û şîrove
**ramedandin/radimedîne/ramedîne 1.** velezandin **2.** razandin
**ramedîn/radimede/ramede 1.** velezîn **2.** razan
**ramîn/dirame/birame 1.** hizr kirin, fikirîn **2.** pokinîn
**ramûsan** paç *"jina xelqê **ramûsanek** e, hespê xelqê meydanek e, kinca xelqê roj û danek e"
**ramûsandin/radimûsîne/ramûsîne** paç kirin
**ramyar** siyasetvan
**ramyarî** siyaset
**ran** endamê ji çokê hetanî kemaxê *"berfa hûr, xwe avête **ran**ê stûr"
**ranan/radine/rane 1.** dîwar bilind kirin **2.** serê banê avahiyekê bi kerestеyê pêwist ava kirin
**ranik** rana biçûk
**rapêçan/radipêçe/rapêçe 1.** tiştek li tiştekî din

alandin **2.** paçik kirin
**raperişandin/radiperişîne/raperişîne** darijtin, darotin
**raperîn/radipere/rapere 1.** ser hildan **2.** pêngav avêtin
**rapêç** bapêç
**rapêçan/radipêçe/rapêçe** li dorê alandin
**rapêçîn/radipêçe/rapêçe** li dorê alîn
**rapêlk** cureyekî haletên çandiniyê ye û pê giyayê dirûtî komî ser hev dikin
**rapêş kirin 1.** nîşan dan **2.** pêşkêş kirin
**raqetandin/radiqetîne/raqetîne 1.** jê dûr xistin **2.** jê veqetandin
**raqetîn/radiqete/raqete 1.** jê dûr ketin **2.** jê veqetîn
**rarûyî yekî ketin 1.** nav tê dan **2.** ji rê derxistin
**raser** aliyê fêzê
**rasernav** sernavê mijarê yî ku datînin jora nivîsê
**rasine** weris
**raspartin/radispêre/raspêre 1.** emanet kirin **2.** pala xwe dan
**rast 1.** neçewt **2.** durist **3.** heqîqet **4.** meydan **5.** pêşber *"mirin tê **rast**ê, çavê tevan li revê**"**
**-bi rastî** di heqîqetê de
**-rastî hev hatin 1.** pêrgî hev hatin, hev dîtin **2.** hevrû bûn 3. çav pê ketin *"goşt, **rastî kesê bi diran tê"**
**rastbîn** kesê ku heqîqetê nas dike
**rastek** amûreke pîvandinê ya ku ji dar an jî lekê tê çêkirin û pê dirêjahiya xêzan tê pîvan; rastkêş
**rasteqîn** heqîqî
**rasterast 1.** yekser **2.** derbest
**rasterê** riya ku xulpî tê de tune ye û li ser ramaneke baş ava bûye
**rasterê bûn 1.** ketin riya rast **2.** averêyî ramaneke baş bûn
**rasterê kirin 1.** danîn ser riya rast **2.** averêyî ramaneke baş kirin
**rastexêz** xeta ku rasterast hatiye kişandin
**rastênhev** xêzikên ku bi berayî dirêj dibin û bê payan in
**rastgir** muhafezekar
**rastgo** sadiq, rastbêj *"kumê **rastgo**yan, tim qetiyayî ye"
**rasthatin** tesaduf
**rasthatinî** tesadufî
**rastî 1.** heqîqet **2.** neçewtî **3.** duristî *"**rastî,** tehl e**"**
**rastker** kesê ku nivîsan ji aliyê rêziman, xalbendî û rastnivîsê ve sererast

dike
**rastkêş** cedwel, xêzkêş
**rast kirin 1.** têkûz kirin **2.** sererast kirin *“heke mar xwe **rast neke**, di kunê de naçe”
**rastmane 1.** rasterast û yeksere **2.** bê derew û ne qestbane
**rastnivîs** *(r)* îmla, vekît
**rateqandin/raditeqîne/rateqîne** bi darê zorê qewirandin
**rateqîn/raditeqe/rateqe** xwe ber darê zorê ranegirtin û revîn
**rav 1.** werzîşa girtin an jî kuştina sewalên kovî; nêçîr **2.** nîşaneya ducaniya jinan a ku wekî belekiyekê di rûyê wan de xuya dibe
**rava** nîşan
**-ravayî yekî kirin** nîşanî yekî kirin
**rave** şîrove
**ravekar** şîrovekar
**ravekew** nêçîra kewan
**rave kirin** şîrove kirin, îzah kirin
**ravgeh** nêçîrgeh
**ravker** nêçîrvan
**rawe** *(r)* teşeya lêkerê
**-raweyên pêşkerî** di hevokê de teşeya deman nîşan dide
**-raweyên daxwazî** di hevokê de karê ku tê nîgaşkirin nîşan dide
**rawest 1.** navber **2.** careke bêhnvedanê
**rawestan** sekn
**rawestandin/radiwestîne/rawestîne** sekinandin
**rawestgeh** cihê sekinînê
**-rawestgeha dagirtina sotemeniyê** cihê ku navgînên raguhastinê lê sotemeniyê hildigirin
**rawestîn/radiweste/raweste** sekinîn
**raweşandin/radiweşîne/raweşîne 1.** şek lê dan, lê xistin **2.** belav kirin
**raweşîn/radiweşe/raweşe 1.** lê ketin **2.** belav bûn
**rawêj [I] 1.** texmîn **2.** zen **3.** bîrbirin **4.** şikbirin
**rawêj [II] 1.** şêwr **2.** hêvotin
**rawêjer 1.** şêwirmend **2.** hêvojkar
**-rawêjerê leşkerî** şêwirmendê eskerî
**rawêjerî 1.** şêwirmendê **2.** hêvojkarî
**-rawêjeriya bazirganiyê** saziya şêwirmendiyên têkildarî ticareta navxweyî, neteweyî û navneteweyî
**rawêjgeh 1.** saziya şêwr û hêvotinê **2.** civata

şêwr û hêvotinê
**rawêj kirin 1.** pê şêwirîn **2.** ji dêv axifteyeke berdar hildan
**rawêjî 1.** têkildarî şêwr û hêvotinê **2.** texmînî
**raxistin/radixîne/raxîne 1.** danîn erdê **2.** rapêşandin
**raxît** bihuk
**raye 1.** hêzdarî **2.** desthilatî
**rayedar** peywirdar
**rayedarî** peywirdarî
**-rayedariya zagonsaziyê** peywirdariya qanûndanînê
**rayêl** xeta gêreba, telefon û hwd; têl
**-rayêl kirin** bi dirêjahî raxistin erdê
**rayêx** ferşik û raxistinên nava malê
**rayîş** kar û barên ku her kes pê qayîl e
**-rayîşa bazarê** rêbaza danûstanê
**raz** sir, bîs
**razan/radize/razê 1.** paldan, nivîn **2.** veketin, ramedîn **3.** welidîn *"av û agir radizên, dijmin **ranaze"**
**razandin/radizîne/razîne 1.** nivandin, telexewî kirin **2.** ji bo karekî dirav mezaxtin
**razanxane** jûra nivistinê
**razber** tiştê ku ne berbiçav e
**razepeyv** peyv û nîşaneyên ragihandinê yên ku tenê ji aliyê xwediyên bikarhêner ve tên zanîn
**-razepeyv avêtin ber** *(da ku tu kes pê nehese)* jê re şifreyek çêkirin
**razgir** kesê ku ragihandinên rêvebirekî bi rê ve dibe
**razî 1.** pejirandî **2.** qebûlkirî **3.** sertewandî *"her qazî, ji xwe **razî"**
**razyane** cureyekî çêreya ku di dermansaziyê de tê bikaranîn
**reben 1.** belengaz **2.** xizan, feqîr **3**. bêsiûd
**rebenî 1.** belengazî **2.** xizanî **3**. bêsiûdî
**rebeq** bi hev re, li ser hev, pêk ve
**-ev deh salê rebeq in ku** ev deh salên li ser hev in ku
**ref 1.** komeke çivîkan **2.** dor **3.** rêz **4.** depeke ku bi dîwarî ve tê qayîm kirin û tişt li serê tên rêzkirin *"her teyr bi **ref**a xwe re ye"**
**refandin/direfîne/birefîne** xalîçeya qulbuyî hêvîs kirin
**refank** refa dîwarî
**refes** çirtikavêtina sewa-

lên çarpê bi lingên paşîn; lotik
**refes kirin** çirtik avêtin, lotik avêtin
**reftar 1.** helwest **2.** tevger
**reg** rehên dar û çêreyê
**regez 1.** nijad, irq **2.** nifş
**regezperest** neteweperest
**reh 1.** kok **2.** rêşî **3.** rêç
**-reh û rêşiyên xîretê tê de nebûn** ji sehek û hestên rêzdariyê bêpar bûn
**-reh lê ranebûn** hêmanên mêraniyê tê de nebûn
**reha** tiştê ku bêguman dê biqewime
**rehek** nebat
**reheknasî** zanistên ku pisporiya wan hêşinahiyên li ser rûyê zevînê ne
**rehet 1.** aram **2.** mezbût **3.** bihuzûr **4.** xweş
**rehetî 1.** aramî **2.** mezbûtî **3.** bihuzûrî **4.** xweşî *"nizanim, **reheti**ya can im"
**rehidandin/direhidîne/birehidîne 1.** êşandin **2.** azirandin
**rehidîn/direhide/birehide 1.** êşîn **2.** azirîn
**rehilandin/direhilîne/birehilîne** lerizandin
**rehilîn/direhile/birehile** lerizîn
**rehik** di lêş de riyên xwînê yên ziravik
**rehjen** avêtina dilê sax; nebiz
**rehjenî** avêtina dilê giyaneweran
**rehn 1.** nerm **2.** şil **3.** ava wê zêde *"girara **rehn**, ji kêmdanî ye"
**rehnayî 1.** nermî **2.** şilayî **3.** avî
**rehn bûn 1.** nerm bûn **2.** şil bûn **3.** ava wê zêde bûn
**rehn kirin 1.** nerm kirin **2.** şil kirin **3.** av lê zêde kirin
**rejî** gerandina karekî ji aliyê kesekî an jî komekî ve
**remezan** di îslamê de meha rojîgirtinê
**remil 1**. xîz, teqn **2.** fal
**remildar** falavêj
**remz** nîşane
**renc 1.** azar, eziyet **2.** ked **3.** şkênc
**rencber 1.** kedkar, zehmetkêş **2.** sexbêrê sewalan û çandiyar *"**rencber** û maldar, nabin hemwar"
**rencîde** azardîtî
**rencîde kirin** azar lê kirin
**rencûr** xembar
**rende** kartîk
**rendol** kinca ku bi pûş tê tijî kirin û di ber bîsta-

nan de tê çikilandin da ku mirov bê hesibandin û jê bê tirsîn

**reng 1.** boyax, gûn **2.** celeb, cure, awa *"destê dê, **reng** û rûyê qîzê ye"

**rengandin/direngîne/birengîne** boyax kirin

**rengavêtî 1.** gewrotankî **2.** verêtî **3.** zibilî

**rengdêr** *(r)* peyvên ku rewşa heyberan dinmînin; hevalnav

**rengîn** boyaxkirî

**rengkorî** şevekorî

**rengpîşe** hoker

**rengrêj 1.** kesê ku bi rengan tiştan direngîne **2.** boyaxa qumaşî

**renî** sêlava berfa heliyayî

**renîn/direne/birene** alaveke zivir bi ser tiştekî re xişandin û girnozên wî jê birin

**renok** alaveke mitbexê ya ku pê penîr sewze û hwd tên hûrkirin

**rep 1.** req **2.** çik, vît **3.** zoq

**repandin/direpîne/birepîne 1.** lê xistin **2.** vepelîn ber

**rep bûn 1.** req bûn **2.** çik rast bûn

**reperep 1.** dengê domdar ê mêşîna giyanewereke girs **2.** dengê domdar ê lêdana tund

**reperep kirin 1.** dengê meşîna giyanewereke girs hatin **2.** li ser hev û bi tundî li tiştekî xistin

**repisandin/direpisîne/birepisîne** tepisandin

**repisîn/direpise/birepise** tepisîn

**req [I]** kûsiyê avê

**req [II]** sext, hiphişk

**req bûn** hişk û rakişandî bûn

**-reqbûna rehçikan** hişkbûn û rakişîna rehên xwînê

**req kirin** hişk û rakişandî kirin

**reqas 1.** semajen **2.** lotikavêj *"kesê ku ne di govendê de be, fît **reqas e**"

**reqele 1.** hejar **2.** yax

**reqem** jimare

**reqisandin/direqisîne/bireqisîne 1.** rakirin cergebezê **2.** lotik dan avêtin *"heke xwedanê malê li defê bide, dê biçûkan **bireqisîne**"

**reqisîn/direqise/bireqise 1.** lîstin **2.** lotik avêtin *"ew ber defa bêdeng jî **direqise**"

**reqitîn/direqite/bireqite 1.** *(erd)* av hilçinandin xwe **2.** ziwa û hişk bûn

**reqs 1.** cergebez **2.** lîstik û şahî **3.** lotik

**resen 1.** eslî **2.** xwerû, xwemalî
**reş** rengê qîr û qetranê *“bextê **reş,** tim ê xwedî ye**”**
**-reş û peş kirin** çav tirsandin
**-reş girêdan 1.** *(ji bo mirinekê)* giramî nîşan dan **2.** kincên reş *(ên ku elameta şînê ne)* li xwe kirin
**reşahî 1.** temtêla rengê qîr û qetranê **2.** reşî
**reşandin/direşîne/bireşîne 1.** belav kirin **2.** rijandin
**reşbelek** name, mektûb
**reşbîn** kesê ku bûyerê bi neyînî dinirxîne
**reş bûn 1.** rengê reş lê xuya bûn **2.** qemirîn
**reşe 1.** elametên nenas ên ku ji ber tirs û xeyalan li ber çavên mirovî dikevin **2.** rendol
**reşeba** bayê jêrîn
**reşedar** di zivistanan de temtêla bêbelgbûna darên daristanan
**reşekurmancî 1.** ji çanda kurdan hûnandî **2.** ji sedî sed kurdî
**Reşemî** meha duyem a salnameya zayînî
**reşenivîs** nivîsa ku di asta amadehiyê de ye nehatiye têkûzkirin; muswede
**reşêle** cureyekî çivîkên ku dişibihin qijikan lê ji wan biçûktir in
**reşik [I] 1.** zencî **2.** reşe *“filan keso **reşik**ê şevê ye”
**reşik [II]** bîbika çavî
**reşik [III]** cureyekî çêreya ku tevî toraqê dikin
**reşî** erdê ku lê berf nebariye an jî berfa wê ya heyî heliyaye
**reş kirin 1.** bi rengê reş rengandin **2.** xêzeke reş kişandin ser nivîsekê
**reşnivîs** reşenivîs
**reşokî** cureyekî tifingên kevn e
**reşpoşî** kesê ku di şînekê de kincên reş li xwe dike û xemgîniya xwe diyar dike
**reşreşk 1.** bîbika çavî **2.** bihareteke dendikreş û hûrik e
**rev 1.** firar **2.** bez **3.** mişextîkarî *“cih heye, **rev** ji mêraniyê çêtir e**”**
**revandin/direvîne/birevîne 1.** bezandin **2.** jê standin **3.** bi lezgînî hildan û birin
**revaştin/direvêşe/birevêşe** kotin
**revde** keriyê gur û kûçikan
**revend 1.** kesê ku ji welatê xwe bi dûr ketiye **2.**

civat **3.** komel
**-revenda kurd** kurdên ku li derveyî welêt dijîn
**revêtin/direvêje/birevêje** *(ji bo teşedanê)* dar darijtin
**revî** kerî, revde
**revîn/direve/bireve** bezîn *“agir berda malê, **revî** xwe da palê”
**revîrevî** bi lez û bez
**-bi revîrevî çûn** di navbera meş û bezê de bi rê ve çûn
**revok 1.** firarî **2.** mişextî
**revrevk** sîtavk û elametên ku li ber çavan peyde dibin; serab, leylan
**rewa 1.** bi serbestî bikaranîna mafekî **2.** tişt, gotin û kiryar ên qanûnî yên ku mafê mirovî heye pê rabe; meşrû, cayîz
**rewa bûn 1.** serbest bûn **2.** meşrû bûn, cayîz bûn
**rewal** nûciwanê ku hîna simbêlên wî derneketine
**rewan 1.** şareza **2.** tiştê ku diherike; herk **3.** jiyana domdar
**rewanbêj** kesê ku di hûnandina peyv û hevokan de şareza ye û li gorî rêzimana wî zimanî nakeve çewtiyan; fesîh
**rewanbêjî** fesahet
**rewan bûn** hîn bûn
**rewanî** şarezatî
**rewan kirin** hîn kirin
**rewatî/rewayî** qanûnî, meşrûtî
**rewd** komasiya hesabekî
**rewend** koçer, çolger
**rewendî** koçerî, çolgerî
**rewêl** ajala jakaw
**rewiqandin/direwiqîne/birewiqîne** hesp bezandin
**rewisandin/direwisîne/birewisîne 1.** kizirandin **2.** çilmisandin
**rewisî 1.** kizirî **2.** çilmisî
**rewisîn/direwise/birewise 1.** por û pirç şewitîn, kizirîn **2.** çilmisîn, zibilîn *“quzê ku par **rewisiye**, îsal jî bêhn dikevê”
**rewişt 1.** sinc **2.** xwî û xislet **3.** dab û nêrît **4.** exlaq
**-rewişta kurd** xwî û xisletên kesayeta kurdan
**rewneq 1.** îhtişam **2.** kawîtî **3.** şemal û ronahî
**rewneqdar 1.** muhteşem **2.** kaw **3.** bişemal û ronîdar
**rewş 1.** temtêl **2.** werz **3.** hal *“neyar bi **rewş**a neyêr nizane”
**-rewşa awarte** temtêla ku ne asayî ye
**rewşen** ronak
**rewşenî** ronahî *“kincên baş, **rewşeni**ya dinyayê ne”

**rewşenbîr** ronakbîr
**rewt** şiva dirêj
**rex** **1.** kêlek, alî, ta **2.** tûş
**-rex û çan** derûdor
**-li rex û çanên xwe nihêrtin** li der û dora xwe mêze kirin
**rexne** destnîşankirina şaşiyan û dîyarkirina riya çareserkirinê; tenqîd
**-rexneya avaker** rexneya ku ji bo başkirina temtêlê tê kirin
**-rexneya kavilker** rexneya ku bi mebesta ajaweyê tê kirin
**rexnegir** şarezayê rexneyê
**rexnegirî** şarezatiya rexneyê
**rexne lê kirin/lê girtin** tenqîd kirin
**rext** fîşengdank
**reyîn/direye/bireye** **1.** ewtîn **2.** çeleçel kirin *"kûçik ji kî aliyî bitirse, wir de **direye**"
**rez** **1.** bax **2.** baxê tiriyan *"bihar û havînê **rez**, zivistanê jî pez"
**rezalet** rezîltî
**Rezber** meha nehemîn a salnameya zayînî
**rezîl** kesê ku karekî nebaş kiriye û rûmeta wî zede girtiye
**rezîl bûn** li pêşberî xelqê bêrûmet û bêqedr bûn
**rezîl kirin** li pêşberî xelqê bêrûmet û bêqedr kirin
**rezîltî** rewşa ku kesê rezîl ketiyê; riswatî
**rezvan** baxvan
**rezvanî** baxvanî
**rê** **1.** cihê ku tê de karê çûn û hatinê pêk tê **2.** azîne **3.** fesal **4.** huner *"çiyayê bilind, bê berf û **rê** nabin"
**-rê dan** destûr dan
**-bi rê ketin** dest bi meşê kirin; derketin seferê
**-bi rê ve birin** îdare kirin
**-bi rê ve çûn** meşîn
**rêbaz** **1**. qayde **2.** fesal **3.** azîne
**Rêbendan** meha yekemîn a salnameya zayînî
**rêber** serokê rêvebir; serkêş *"aqil, **rêber**ê merivan e"
**rêberî** rêzanî, serkêşî
**rêberî kirin** serkêşî kirin, rê nîşan dan
**rêbir [I]** rêber, rênîşandêr *"texmîn **rêbir** e, aqil hakim e"
**rêbir [II]** eşqiyayê ku riya xelqê dibire û wan dişêlîne
**rêbirî** **1.** serkêşî **2.** eşqiyatî
**rê birîn** li ser cihê çûn hatinê astengî çê kirin
**rêbiwar** rêwî
**rêbiwarî** rêwîtî

**rêç 1.** şop **2.** dewsa piyan
**-rêç gerandin** şop gerandin
**-rêç kirin** li pey hev rêz kirin
**rêçal** jajî
**rêçalî** xwarinên wek mast, penîr, jajî û hwd; spîtahî
**rêder 1.** kesê ku destûra kirina kar û çalakiyekê dide **2.** cih an jî riya derketinê
**rêgeh [I]** bihurgeh
**rêgeh [II]** guzergeha gerestêrkan
**rêgez 1.** qayde **2.** fesal
**rêgir** rêbir
**rêhesin** riya şemendefiran a ji zamokan pêkhatî
**rêje 1.** nisbeta hejmarî **2.** jê parçeyek
**rêjgeh 1.** cih, ger an jî çala ku av dirijê **2.** şîp, şelale
**rêjing 1.** çeka ku fîşengan li pey hev davêje **2.** qulik
**rêjî kirin** maliştin
**rêjkar** kesê ku tiştan di qaliban de ro dike
**rêjkarî** karê di qaliban de rokirina tiştan
**rêjne** taviya baranê
**rêjnebaran** barana gur û boş
**rêjîk** çeka agirber a ku dikare li ser hev çendek guleyan biteqîne
**rêkeft** peyman
**rêkeftname** metnê peymanê
**rêk û pêk 1.** bipergal **2.** têkûz
**rêl** daristan *"agir bigire **rêl**ê, ter û hişk dê pêk ve bişewitin"
**rênc** jana masûlkeyan; xamî
**rêncî** rewşa jandana masûlkeyan a ji ber westanê; xam
**rêncî bûn** *(masûlke)* ji ber westanê ajinîn; xam bûn
**rêncî kirin** masûlke bi westanê êşandin; xam kirin
**rênîşandêr** rêber
**rêpî** xerc û mesrefa rê
**rêpîvan 1.** qayde **2.** meş
**rêsî** xuroma girêdayî; balî
**rêstin/dirêse/birêse 1.** ta û bend hûnan **2.** ta bi teşiyê çêkirin *"gava dewlet **birêse**, ga golikê dadilêse"
**rêşî** bendên ku ji ber firêta tevnê mane û bi tiştê hûnandî ve daliqî mane *"konê bê **rêşî,** ji konan der e"
**rêş kirin** darotin
**rêşte** nifş
**rêtin/dirêje/birêje 1.** tiştê avî belavî erdê kirin **2.** her çi hebe belavî erdê kirin *"ava miriyan,

**merêje** nava deriyan**”**
**rê û rêçik** usûl û qayde
-**rê û rêçikên ayînî** usûl û qaydeyên pêkanîna î-badetan
**rêv** pirça berzikê
-**di çata rê de rêv rûçikandin** **1.** di eşkeretiyê de karên şermê pêk anîn **2.** bêminet tevgerîn
**rêvaz** ribês
**rêveber** **1.** desthilat **2.** rêberê saziyekê
-**rêveberê pêwendiyan** kesê ku di sazî an jî dezgekî de têkiliyan bi rê ve dibe
**rêveberî** **1.** desthilatdarî **2.** rêberî
-**rêveberiya herêmî** desthilatdariya di destê devereke welêt de
**rêvin** gemar
**rêvin bûn** gemar bûn
**rêvin kirin** gemar kirin
**rêwişt** **1.** mîzac, xeyset, xislet **2.** serinc, taybetmendî
**rêwing** rêwî
**rêwingî** rêwîtî
**rêwî** **1.** misafir **2.** mêvanê rê *“bi şevê **rêwi**yê serê riyan, qeda li ber piyan**”**
**rêwîtî** misafirtî
**rêx** gemara heywanan *“golik diçin, **rêx**a xwe li cem gayê mezin dikin**”**
**rêxistin** **1.** tevger **2.** sazî
**rêxok** **1.** qûngemar **2.** qûngincî
**rêxokî** rewşa îshalê ya ku bergiriya wê dijwar e *“çêlekeke **rêxokî**, garanê dilewitîne”
**rêxole** rodiya qalind
**rêxazî** rêxokî *“çêleka rêxazî, navê garanekî garanê xera dike**”**
**rêz [I]** **1.** dor **2.** şîştir **3.** setra nivîsekê **4.** çarîna helbestê
-**rêz bûn** ketin dû an jî kêleka hev
-**rêz kirin** dan pey an jî kêleka hev
**rêz [II]** **1.** giramî, hurmet **2.** qedrdanî
-**rêz girtin** **1.** giramî nîşan dan, hurmet kirin **2.** qedr dayîn
-**rawestana rêzgirtinê** temtêla giramînîşandanê
**rêzan** **1.** murşid, rêber **2.** rênîşandêr
**Rêzanan** Rezber
**rêzbendî** keyskirina mijaran li gorî rêbazekê; tesnîf
**rêzbend kirin** senifandin, ji hev deranîn, vawêr kirin
**rêzdar** birêz, muhterem
**rêzepirtûk** **1.** çend pirtûkên di mijarekî de **2.** çend pirtûkên heman

nivîskarî
**rêzgir** kesê ku giramiyê digire
**rêzik 1.** setra nivîsê **2.** qanûn
**rêzikşikên** derveyî rayîşa asayî
**rêzil** zincîr
**rêziman** *(r)* hemû rê û rêçikên rastaxaftin û rastnivîsandina zimanekî
**rêzimanî** nivîsar û gotara ku li gorî rêçikên zimên hatiye derbirin
**rêzikname** zagon-name
**rêziman** navê giştî yê hemû rê û rêçikên zimanekî ye
**rêzîn 1.** di rêzê de **2.** cureyekî solên erzan ên ku pale û rencber pê dikin
**rêz kirin 1.** li pey hev danîn **2.** rêç kirin **3.** kirin şîştirê
**rêzname** nivîsara fermî ya ku karê rewa yê endam û bernameyên her rêxistinekê tê de hatiye çespandin
**ribês** cureyekî çêreya çêjtirş a ku terîterî tê xwarin
**ricifandin/diricifîne/biricifîne 1.** lerizandin **2.** hejandin
**ricifîn/diricife/biricife 1.** lerizîn **2.** hejîn
**ricimandin/diricimîne/biricimîne 1.** *(zinakar)* bi kevirkirinê kuştin; kevir kirin **2.** şermezar kirin
**ricricîn/diricrice/biricrice** soromoro bûn
**riçilandin/diriçilîne/biriçilîne** xurekekî rehnevîçkî çêkirin
**riçilîn/diriçile/biriçile** xurekekî rehnevîçkî çêbûn
**rifse** erdê avî yê ku ne dêm e
**rih** pirça rû ***"**aqil di seriyan de ye, ne di **rih**an de ye**"**
**-rih berdan** pirça rûyî dirêj kirin û kur nekirin
**-rih kur kirin** pirça rûyî tiraş kirin
**riha 1.** rizgarî **2.** felat **3.** serfirazî
**riha bûn 1.** rizgar bûn **2.** filitîn **3.** serfiraz bûn
**riha kirin 1.** rizgar kirin **2.** filitandin **3.** serfiraz kirin
**rihan** cureyekî çêreya bêhnxweş a ku tevî toraq, penîr û xurekan dikin
**rihet** aramdar
**rihet bûn** arimîn
**rihetî** aramdarî
**rihet kirin 1.** arimandin **2.** jan birîn **3.** bi dilê xwe

lê dan
**rijandin/dirijîne/birijîne 1.** rêtin **2.** *(tiştên avî)* herikandin, ro kirin
**rijd** îsrar
**rijd bûn** bi îsrar bûn
**rijde** rişte
**rijdî** rewşa îsrarkirinê
**rijîn/dirije/birije** *(tiştên avî)* herikîn, ro bûn
**rijî [I]** ariya tiştên şewitî
**rijî [II]** gerandina karekî ji aliyê kesekî an jî saziyekî ve; rejî
**rijî [III] 1.** bêrûn **2.** tisî
**rik 1.** înad, engir **2.** înk **3.** hêrs *"merivê aqilsivik, tu cara li neke **rik"**
**-ji rikan** ji ber înad û hêrsê
**rikane** bi înadî
**rikdar 1.** înkdar **2**. engirî **3.** hêrshatî
**rikeber 1.** hevrik **2.** rijdbûyî
**rikeberî 1.** hevrikî **2.** înkdarî
**rikeh** qefesa ku kewan dikinê
**rikêb** zengiya zînê hespan
**-rikêbî hev kirin** êrîşî hev kirin
**riko 1.** înadkar, engirok **2.** înkdar **3.** hêrshatî
**rikrikîn/dirikrike/birikrike 1.** ricifîn **2.** lerizîn
**rim** cureyekî lomê cengî yê berê ye; mizreq
**rimandin/dirimîne/birimîne** herifandin
**rimbaz** şervanê ku lomê cengî bi kar tîne; mizreqbaz
**rimj** ewr
**rind 1.** bedew **2.** delal
**rindî 1.** bedewî **2.** delalî
**rinek** amûreke paqijkirinê ya ku bi serê wê ve porçeyek heye û ji bo pir mebestan tê bikaranîn
**ringering** dengê lêxistin û qirçîniyê
**ringering kirin** qîrçeqîrç kirin
**ripin 1.** qevd, baq **2.** gurz
**ripinîn/diripine/biripine** *(giya û dar)* rehên wî/wê pir û bi xurtî di erdê de çûn *"giya, li ser binê xwe **diripine"**
**riprût 1.** bêkinc **2.** bêdirav **3.** bêgiya **4.** bêgoşt
**risas** cureyekî madenan e
**risasî** rengê gewr ê birqonek
**risil** îsil
**rist 1.** peywir **2.** setra nivîsê **3.** werisê ku kincên şûştî li serê tên raxistin
**riste 1.** hevok **2.** pexşana birêkûpêk
**ristin/dirêse/birêse** rêstin
**risti 1.** stûvank, gerdenî

**2.** helbest
**rist kirin** li gorî rêgezekê keys kirin
**riswa** **1.** rezîl **2.** şermezar **3.** bêxîret *"ew kesê ku di bin xwe re li kesan binêre, ew tim rezîl û **riswa** ye"
**riswa bûn** **1.** rezîl bûn **2.** şermezar bûn **3.** bêxîret bûn
**riswa kirin** **1.** rezîl kirin **2.** şermezar kirin **3.** bêxîret kirin
**riswatî** **1.** rezîltî **2.** şermezarî **3.** bêxîretî
**rişk** hêkên spiyan
**rişkîn** kesê ku spî û hêkên spiyan ketine nav porê wî
**rişk kirin** spiyê hêk kirin
**rişte** cureyekî xwarina ku ji hevîrê wekî bendan qutkirî tê çêkirin; rijde
**rişwet** bertîl
**ritam** lîl
**ritil** mengiraniyeke bi qasî heşt kîloyan e
**ritl** her du gunên nêrzayan
**ritlo** kesê ku gunên wî werimîne
**ritlo bûn** gunikî bûn
**ritloyî** gunikî
**ritimandin/diritimîne/biritimîne** **1.** xitimandin **2.** tepisandin hev
**ritimîn/diritime/biritime** **1.** xitimîn **2.** tepisîn hev
**rivişt** netewe, nifş
**rivîn** **1.** alaf **2.** holepîtik
**riwange** **1.** çepera nêrînê **2.** tûşa mêşa çekekê
**rizandin/dirizîne/birizîne** **1.** peritandin **2.** kevn kirin **3.** terkî mirinê kirin
**rizbe** toqeya kemberê
**rizde** menteşeya deriyan; qulabe
**rizgar** **1.** filitî **2.** serfiraz
**rizgar bûn** **1.** filitîn **2.** serfiraz bûn
**rizgarî** **1.** felat **2.** serfirazî
**rizgar kirin** **1.** serfiraz kirin **2.** riha kirin
**rizinde** rizde
**riziyayî** **1.** peritî **2.** kevn *"dermanê diranê **rizyayî,** kişandin e"
**rizîn/dirize/birize** **1.** peritîn **2.** kevn bûn
**rîçal** rehçikên dar û çêreyê yên di bin erdê de
**rîp** **1.** fêl, gilor **2.** dek û dolab
**rîs** tayê ji liva û hiriyê
**-rîs rêstin** *(bi teşiyê ji liva û hiriyê)* ta çêkirin
**rîş** kînor, kunêr
**-rîşê mirovxur** şêrpence/penceşêr
**rîtil** pîne û potik; kincik
**rîtin/dirî/birî** **1.** *(mirov)* gemar kirin, gû kirin **2.**

*(dewar)* silepor kirin, rêx kirin **3.** *(çivîk)* zîrç kirin **4.** ***(****pez)* bişkul kirin **5.** *(ker û hesp)* ters kirin, terskul kirin **6.** *(se, gur, rovî û hwd)* pîsî kirin *"aqile kurî, se tê de **bi-rî**"

**-dûrî xwe rîtin** bi quretî tev gerîn, xwe kizeve kirin

**rîvele** çermikê pir ziravik û tenik

**ro** roj *"kinca hevalan **ro** û danek, hespa hevalan bez û meydanek"

**robar** çem, rûbar

**rodî** doran, nûbar *"kula sê, di **rodi**yê gur de ye"

**roj** **1.** 24 saetên demê **2.** demên ku tav tê de xuya dibe *"filan keso, çav li **roj**a reş e"

**-bi roj** wexta ku tav heye û neçûye ava

**-bi şev û roj** bi sibeh û êvarê

**-roj dîtin** **1.** halxweş bûn **2.** dewlemend bûn

**rojane** **1.** heroj, hero **2.** destheqa ku ji bo keda rojeke karkerekî tê dayîn **3.** karê ku her roj pêk tê

**rojanî** destheqa keda rojekê

**rojava** tûşa ku tav tê de diçe ava; xerb

**rojavayî** **1.** kesê ku ji parzemîna ewropa û emerîkayê ye; xerbî

**rojbaş!** beyanîbaş

**rojbend** çerxa ku gerestêrk û cismên esmanî ên din tê de digerin; rojgar

**rojcebîn** enîroj

**rojev** bernameya wê rojê

**rojgar** çerxa demê

**rojgeran** gerestêrk

**rojgîn** kesê ku tenê roja ku tê de ye hesab dike

**rojhilat** tûşa ku tav tê de hiltê; şerq

**-rojhilata navîn** der û dorên Mek, Medîne û Qudsê

**rojhilatî** kesê ku ji parzemîna asyayê ye; şerqî

**rojimêr** salname

**rojing** bixêrî

**rojik** edese

**rojî** ji berbangê hetanî êvarê dûrketina ji xwarin, vexwarin û têkiliya zayendî; mang

**-rojî girtin** *(ji berbangê heta mexrebê ji xwarin, vexwarin û têkilîdanîna zayendî)* dest berdan

**rojname** weşana rojane ya bûyeran

**rojnameger** kesê ku pîşeya wî rojnamegerî ye; rojnamevan

**rojnamegerî** pisporiya weşanên demdiyar

**rojnivîsk** nivîsarên ku li

gorî mêjûyên pêkhatina wan hatine hûnandin
**role** zarok
**Rom 1.** kesê romayî **2.** şeşerûtên niha li ser axa romayiyên berê rûdinin *“hukumdarê **Rom**ê, hevalê segan e”
**Roma** dûgeleke dîrokî ye û navenda wê li Ewropayê bû
**ron 1.** birqonek **2.** vekirî **3.** şil û avî 4. aşkera
**ronahî** şewq û şemala ku tarîtiyê winda dike *“av **ronahî** ye, ji avê metirse”
**ronak 1.** birqonek **2.** zelal **3.** rewşen
**ronakbîr** rewşenbîr
**rondik** hêstir
**ronî 1.** beraq **2.** rewşen **3.** cêreyan/gêreba
**ronîdar** rewşen
**ronyas** cureyekî çêreya ku jê boyax tê bidestxistin
**rop** dewleta romê
**ropo** romayî
**roqroqe** lingdirêj
**roro 1.** heroj **2.** roj bi roj
**rovî [I]** cureyekî heywanên çolê ye û bi konetiya xwe ve navdar e *“navê gurgî derketiye, **rovi**yî dinya xera kiriye”
**rovî [II]** rodî, doran
**rox** xweliya hişk
**rozî** rizq
**rubad** nêrekew
**ruh** pifa ku li ber hemû giyaneweran e û pê dijîn; giyan
**ruhistîn** melkemot *(melekê mewtê ango mirinê);* Ezraîl eleyhiselam
**ruhvegerîn** jîndarbûna piştî mirinê
**rux** ser û çav
**ruxsar** rûsar, xemsar
**rû 1.** ser û çav **2.** ser û sîçe **3.** sikûm **4.** dêm *“bila **rû**yê mirovî bêşê, lê zikê mirovî neêşê”
**-rû jê badan** jê çerixîn
**-rû spî bûn** beraet kirin, bêrî bûn
**rûbar** ava ku di çeman de dikişe; robar
**-rûbarên seholîn** çemên qeşayî
**rûbalgeh** pîneyê ku dikêşin ser balgehî
**rûber** endazeya dirêjahî û berahiya cihan
**rûbirtin/rûdibire/rûbibire 1.** hûrhûrî kirin **2.** girnoz jê birin
**rûçik** sikûm, sîma *“nan, bi **rûçik**an tê xwarin”
**rûçikandin/dirûçikîne/birûçikîne 1.** pûrt jê kirin **2.** verûtin **3.** destverû kirin **4.** şêlandin
**rûçikîn/dirûçike/birûçike 1.** pûrt jê daweşîn

**2.** herişîn
**rûdan [I]** bûyer
**rû dan [II] 1.** qewimîn **2.** şûm kirin, nehs kirin
**rûdemî** rojane
**rûgeh** qible
**rûgehnas** amûra ku di seynika wê de tîrkeyeke miqnatisî heye û herdayîm cemsera bakurî nîşan dide û pê îstiqamet tên naskirin; qiblename
**rûgerm** xwîngerm, sergerm
**rûgeş** devbiken
**rûgêr** nehs, şûm
**rûken 1.** dilgeş **2.** xweşik **3.** devbiken
**rûmet 1.** şeref **2.** giramî **3.** hêjatî **4.** rêz *"keça malê bi **rûmet** e, karê wê bê minet e"
**rûmetdar 1.** bişeref **2.** biheysiyet **3.** hêja **4.** birêz
**rûn** zêt, bizir, don
**-rûnê genî li ser nanê xwe dîtin** bi qezenceke kirêt ve şa bûn û fortê xwe kirin
**rûnas** kesê ku pir caran hatiye dîtin û her kes qelafetê wî nas dike
**rûnbirêjk 1**. tawe **2.** boçesêlîn
**rûndank** amana ku rûn dikinê
**rûnerm** bêhnfireh
**rûniştin/rûdine/rûne 1.** danişîn, nîştin **2.** niştecih bûn
**rûn kirin** zêt kirin, bizir kirin
**rûnpêj** tawe, rûnbirêjk
**rûpel** aliyekî kaxezê; sahîfe, per
**-pergala rûpelan** di malperê de awayê ku berg hatine amadekirin
**rûpûş** her tiştê ku rû vedişêre
**rûreş 1.** şermezar **2.** bêheya **3.** riyakar, durû **4.** qelbezan
**rûreş bûn** şermezar bûn
**rûreşî** şermezarî
**rûreş kirin** şermezar kirin
**rûro** ruyê ku wekî kilora rojê ye
**rûs** rût û repal
**rûsar 1.** rûtirş **2.** bêmizêc, bêmehde
**rûspî [I] 1.** serek **2.** zana **3.** kemilî
**rûspî [II] 1.** bêtawan **2.** xwedanrûmet
**rûspîtayî** rûspîtî
**rûspîtî [I] 1.** serwerî **2.** zanatî **3.** kamilî
**rûspîtî [II] 1.** bêtawanî **2.** birûmetî *"keça baş, **rûspîti**ya bavê xwe ye"
**rût 1.** repal, uryan **2.** erdê vikvala **3.** malketî
**rût bûn 1.** repal bûn **2.**

*(erd)* bêçêre bûn **3.** îflas kirin

**rûtirş** bêmirûz, pirçî

**rûtî** hejarî

**rût kirin 1.** kinc jê xistin **2.** qalik jê qeşartin **3.** şêlandin **4.** di qimarê de her tişt jê birin

**rûv 1.** rêv **2.** navran, berzik

**rûvî** endamê ku gemara di aşikê de dikêşe derveyî cendêk; rodî, doran

**-rûviyê barik** dorana ziravik

**rov** pirça berzikê; rêv

**rûxandin/dirûxîne/birûxîne 1.** hilweşandin **2.** texrîb kirin

**rûxîn/dirûxe/birûxe 1.** hilweşîn **2**. xera bûn

# S

**s/S** tîpa bîst û duyemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê diranî ye û awayê belavbûna wê fîzek û hişk e

**sa** sîber

**sabit 1.** di cih de sekinî **2.** neguherbar

**sabit bûn 1.** neleqîn **2.** neguherîn

**sabit kirin 1.** şidandin **2.** qayîm kirin

**sabûn** bûjena kefdar a ku pê tişt tên şûştin

**-sabûna yekî kef nedan** bi kêrî têkilîdanînê nehatin

**sabûn kirin** bi sabûnê şûştin

**sabûnpêj** hilberînerê sabûnê ***"**lep qirêj, gep qirêj, nav danînê: **sabûnpêj"**

**sabûnpêjî** karê hilberandina sabûnan

**sabûnsaz** sabûnpêj

**sade 1.** tiştê yekreng û yekcure; xwerû **2.** mutewazî

**sadetî 1.** xwerûtî **2.** mutewazîtî

**sadiq 1.** rastgo **2.** wefadar

**sadiq bûn 1.** rast gotin **2.** bi wefa bûn

**saet** demjimêr, katjimêr

**-saet li ser yekî nehatin girêdan** zû biryara xwe guherandin

**safî 1.** zelal **2.** paqij ***"**tu dilê **safî** bavêjî êgir, agir pê nakeve**"**

**sakar** sade

**sakarî** sadetî

**sako** kinceke zivistanî ya stûr e û hetanî ser lingan dadikeve

**sal** 12 meh an jî 365 roj ***"**arvanê **sal**ê, bi salê re diçe**"**

**-sal heye duwazdeh meh e ew di wî halî de ye** *(erênî û neyînî)* ew kes salewext li ser heman temtêlê ye

**salane 1.** her sal **2.** serpêhatiya 365 rojên borî **3.** derameta ku di salekî de tê bidestxistin

**salar** serfermandar

**salewext** pêvajoya 365 rojan

**salix dan 1.** ragihandin **2.**

agehî dan
**salixgerî** **1.** îstixbarat **2.** sîxurî, casûstî
**salname** teqwîm
**salos** kesê ku bi nebaşan re radibe û rûdine
**salroj** salveger
**salveger** **1.** fetla 365 rojan **2.** di roja qewimî de bibîranîna bûyerê
**salyad** salveger
**saman** **1.** milk **2.** serwet **3.** sermiyan **4.** rastmal
**sana** hêsan
**sanahî** hêsanî
**sanahî bûn** hêsan bûn
**sanahî kirin** hêsan kirin
**sapok** pêlavên saqdirêj
**saq** di gore û solan de beşa ku li ser gêzikê dikeve
**saqdirêj** gore û solên ku hetanî bin çongan tên kişandin
**sar** **1.** nizmbûna rêjeya germê; serma, seqem **2.** sur *“adar e serê sibehan **sar** e, berê êvarê kûçik xwe didin ber qefa dîwêr e”
**sar bûn** **1.** *(hewa)* rêjeya germê daketin **2.** *(giyanewer)* ji tiştekî vekişîn
**sar kirin** **1.** rêjeya germê daxistin **2.** sil kirin
**sarinc** saring
**saring** **1.** bîrên di xilxileyên kiran de **2.** cemedank
**sarîc** sarinc
**sarûgerm** **1.** hênik **2.** tînşikestî, sêncdaketî
**satandin/disatîne/bisatîne** birinc ji qaşilê wî vejartin
**satil** **1.** derdana avê ya dev-vekirî; vêdrok **2.** kod *“bîr bi **satil**an tijî nabin”
**satîre** satore
**sator** **1.** kêra mezin **2.** birê goştî
**satore** **1.** selemtî, olintî **2.** bêkêr û bêkar
**sava** zarok
**savar** genimê ku gir hatiye hêrandin
**savaxane** dezgehê amojandin û sexbêriya zarokan
**savêr** çal an jî tasika ku av û dewê kûçikan berdidinê
**-du segên ser savêrekî** du nebaşên ku di heman kirêtiyê de karbeşiyê dikin
**saw [I]** **1.** tirs, xof **2.** dehşet **3.** qutaf
**-saw bi ser ketin** bayê tirsê ketin zikan
**saw [II]** **1.** texmîn **2.** nîgaş, xeyal
**sawîr** **1.** tirs, xof **2.** dehşet **3.** qutaf
**sawêr** giyanewerê nîgaşî
**sawtehrî** **1.** sersar, xem-

sar **2.** bêkesayet
**sax 1.** giyanewer **2.** jîndar **3.** bitendurist *“çiqas **sax** bimînî, ewqas ecêban dibînî”
**-sax bûn 1.** pak bûn **2.** bi tendurist bûn *“**sax dibin** şûna xenceran, pak nabe dewsa xeberan”
**-sax man 1.** li ser qeyda jiyanê man **2.** ber xwe dan *“heta serî **sax dimîne**, qûn ecêban dibîne”
**saxî** tenduristî
**-saxiya te** siheta te dixwazim
**sax kirin** jîndar kirin
**saxte** zir, sexte
**saye 1.** xirabiya ji kirêtiya yekî **2.** qenciya ji kerema yekî **3.** sîber
**-di sayeya serê wî de 1.** bi sedema wî *(neyînî)* **2.** ji kerema wî *(erênî)*
**sayî** rewşa bêewriyê ya esmên
**sayîhişk** hişkesayî
**saz [I] 1.** pergal **2.** aheng
**saz [II]** karê amade
**saz [III]** jajelan, levenistan
**saz [IV]** cureyekî amûrên mûsîqayî ye
**saz bûn 1.** çêbûn **2.** bipergal bûn **3.** sererast bûn
**sazdêran** civata stranbêjan
**sazgar 1.** tiştê xweşik **2.** ava ku vexwarina wê xweş e
**sazî** muesese
**-saziya karnişîniyê** dezgehê mîrî yê ku kar û barê karnişînan bi rê ve dibe
**-saziyên mîrî** saziyên cemawerî, mueseseyên gelemperî
**-saziyên fermî** mueseseyên resmî
**saz kirin 1.** çêkirin **2.** bipergal kirin **3.** sererast kirin
**sazûman** muesese, pergal
**se** kûçik, seg *“here mêvaniya guran, lê bê **se** meçe”
**seb** bûjeneke tozkî û qayîm a ku bi avê tê rehnkirin û li şûna heriyê di avahiyan de tê bikaranîn
**-seb kirin** bi sebê seyandin an jî seb rijandin serê
**seba 1.** ji bo **2.** sebaret bo *“ferman **seba** hêştiran hat, rovî reviyan”
**-seba kêçekê lihêfek şewitandin** da ku hêrs lê sar be ziyanên mezin bi malê xwe xistin
**-seba qurişekî deh teqle avêtin** ji bo berjewendiyên erzan rûmeta xwe şikandin
**sebaret** seba
**sebaz** cureyekî kûçikan e

**sebî** zarok
**sebîl [I]** avadaniyên gelêrî ên ku hinekan ji bo xêrê çêkirine; xeyrat
**sebîl [II]** darçixare, qelûn
**sebr 1.** tebat **2.** dilaramî *"kesê ku jinekê bîne, divê an tûrek zêrê wî an jî barek **sebr**a wî hebe"
**sebûn** cureyekî bayê sehrawî ye; semûn
**secîh** jîr û xwedanferaset
**secîhî** jîrtî û fehmatî
**sed 1.** jimareya 100'î **2.** deh heb deh *"ne yek e, ne didu ne, hezarê bi **sed** hezaran e"
**-ji sedê sed** sedased
**-sedesed jimartin** wekî 100-200-300 jimartin
**sedased** bêkêmasî temamê wê/wî
**sede** sedsal, serdem, qirn
**sedem** sebeb
**sedrenc** lîstikeke ku bi 16 keviran *(şahek, şalyarek, heşt leşker, du keleh, du hesp û du fîl)* û li ser zevîneke çargoşe tê lîstin; kişik
**sedsal** sede, qirn, serdem
**sedta 1.** sedqat **2.** jimartina sedesedî
**sefandin/disefîne/bisefîne 1.** raparzandin, parzûn kirin **2.** dawerivandin
**sefêk 1.** gêjik, xêvik **2.** dînik
**sefêktî 1.** xêviktî **2.** dîniktî
**sefêktî kirin** wekî xêvik û dînikan tev gerîn
**sefîn/disefe/bisefe 1.** raparzîn, parzûn bûn **2.** dawerivîn
**seg** sewalê kedîkirî yê ji bo parastina mal û milkî; se, kûçik *"her **seg**, bi dû merivan de nayê"
**seganî** kûçiktayî *"salê here siltanî, mehê here mêvanî, rojê here li cihê **seganî** "
**segavî** cureyekî sewalên ku li qeraxên avan dijî
**segbaz** hînkerê segan
**seglawî** hespê ader, kihêl
**segman** nîşangirê ku mêşa xwe baş îsabet dike
**segmasî** masiyê herî mezin ê biguhan
**sehek** di giyaneweran de şiyana naskirina tîn, çêj, bêhn, deng û rengan
**seh kirin** tê gihiştin, serwext bûn
**sehm** tirs û xof, saw *"**sehm** hebe, erd giran dibe"
**sehol** di bin bandora sermayê de rewşa ava hişkbûyî
**-sehol bestin** qeşa girtin
**Seholbendan** Kelûya Karikê *(21'ê Berfanbarê-*

*20'ê Rêbendanê)*

**sehra** çola fireh û xewle ya ku xweliya wê xîz e

**sehrawî** tiştê têkildarî sehrayê

**sekerat** rewşa beriya mirinê

**-ketin ber sekeratê** nefesên xwe yên dawî dan

**sekihandin/disekihîne/bisekihîne** *(diran)* xidikandin/çirikandin

**sekihîn/disekihe/bisekihe** *(diran)* xidikîn/çirikîn

**sekinandin/disekinîne/bisekinîne 1.** rawestandin **2.** aşt kirin

**sekinîn/disekine/bisekine 1.** rawestîn **2.** aşt bûn *"kevirên mezin, bi yên biçûk **disekinin**"

**sekitandin/disekitîne/bisekitîne** mirar kirin

**sekitîn/disekite/bisekite** *(seg, beraz û hwd)* mirar bûn

**sekre** tasa dêw

**sekû 1.** rûniştek **2.** dik

**-sekûyê benderê** qeraxa avê ya ku keştî dikarin lê biêwirin

**sel [I]** zinar

**sel [II]** selik

**selef** deyn *"ê xwarî telef e, ê **dayî** selef e"

**selemêşk** selika ku mêşên hingivî tê de hingivên xwe dihêlin

**selemtî** bêkar û xemsar

**selexane 1.** cihê ku ajal lê tên serjêkirin û kelepîçe kirin **2.** teral

**selêfk** qulên ku di bin dîwaran de vedidin da ku ava baranê di hewşê de gol nebe

**selik 1.** amana ku ji cîl, leven û guliyan tê hûnan; zembîl **2.** çapûk *"berx, heta hetayî di bin **selik**ê de namîne"

**selixandin/diselixîne/biselixîne** gurandin

**selmandin/diselmîne/biselmîne** îsbat kirin

**sema 1.** govend, aheng **2.** reqs

**semajen** kes a ku pispora hunerên reqsê ye

**semanek** sewaleke bibask û boçdirêj a ku dişibihe mirîşkê û goştê wê giranbiha ye

**semax** qalkirina hesinî bi tîn û şilahiyê

**seme** ebter, xêvik

**seme bûn** gêjovêjo bûn

**seme kirin** serî lê dewixandin

**semer** keriyek pezê ku ji sed hebî pêk tê

**semêş** cureyekî mêşên ku havînan bi kûçikan de dikevin

**semt** îhtiyat

**-bisemt** biîhtiyat
**-bêsemt** bêîhtiyat
**semûn** sebûn
**semyan** xwedan, sexbêr
**senc** striyên dara sincikê
**sendirîk** darbest
**sendox** standî, kiriyar
**seng** **1.** giranî **2.** kevir
**sengandin/disengîne/bisengîne** giraniya tiştekî pîvan
**senger** dîwarê parastinê; kozik, qelaçe
**-sengera cengî** di şeran de çalên ku ji bo parastinê tên kolan
**sengergeh** cihê ku senger lê hatine kolan
**sengîn** giran
**senîmenî** tiştê seyr û degme *"**senîmenî**, mastê tirş û dewê genî, tu bi xwe lêbok î, hêjta bi xelqê dikenî"
**senît** bûjeneke zer a ku mêşên hingivî ji nav xeleqên zikên xwe derdixin û pê kewareyên xwe ava dikin
**sepandin/disepîne/bisepîne** **1.** pê dan kirin **2.** lê dan tetbîq kirin
**sepêşî** semêş, mêşese
**sepîtk** arîk, asraq
**seqa [I]** **1.** çawaniya rêjeya germ û sermayê **2.** feza
**seqa [II]** karê xarkirin û tûjkirinê *"**seqa,** li gorî heqan"
**seqa kirin** **1**. xar kirin **2**. tûj kirin
**seqem** **1.** sermaya dijwar **2.** perat
**seqet** kêmlebat
**seqet bûn** kêmlebat bûn
**seqetî** rewşa kêmlebatiyê
**seqet kirin** kêmlebat kirin
**ser [I]** jor, aliyê jorê, fêz *"li **ser** berekê pan im, ne ji wan im, ne li wan im"
**-ser û binê bûyerê** hemû gir û hûrên rûdanekê
**-bi ser de çûn** **1.** dan pey **2.** pê de çûn **3.** lê hilatin
**-bi ser de girtin** êrîş kirin
**-bi ser de hatin** rastî hatin
**-li ser boça xwe şîn bûyîn** di temenekî bihurî de wekî ciwanan tev gerîn
**-li ser boçika xwe rûniştin** di karê kirêt de bi ser neketin û wekî kûçikekî pîr bi ser dêla xwe de ketin
**ser [II]** **1.** di lêş de kuloxê ku çav, guh, dev û mêjî tê de bicihkirî ne *"**seri**yî gote ezmanî, heta tu li min xudan î, xweşî nagêhêje giyanî" **2.** ji stûyî heta lûtkeya bejnê

*"**ser**ê keçelan, dikevin paxilên gerdenzeran"
**-ser û pê** endamên ku jê kelepaçe çedibe; seqetat
**-ser berdan** azad kirin
**ser [III]** cihê bilind, lûtke
**ser [IV]** mezin, serwer *"**ser**ê ku were birîn, nayê kirîn"
**ser [V]** destpêk
**-serê sibehê** destpêka rojê
**sera** avahiyên bi debdebe yên ku mîr û serok tê de dijîn
**serad** bêjinga ku gir lê dike; karmax
**serane** di rêvebiriya îslamî de diravê ku ji ehlikitabê tê standin; cizye
**seranser** ji vî serî bigire heta serê din
**-seranserî welêt** li her dera niştimanê
**seraşpêj** xurekpêjê sereke
**serata 1.** serê pêşîn **2.** bermaya diravên gir
**seratayî** pêşîn, yekemîn
**serbajar** payetext
**serban** serê xênî *"**serban** qul e, binban şil e"
**serbar 1.** barikekî biçûk ê ku datînin ser pişta heywana barkirî **2.** di malê da ji hemûyan hêjatir û rêzdartir *"bar merivan nakuje, **serbar** merivan dikuje"
**serbarî 1.** giraniya ser giraniyê **2.** xeyd
**-serbarî vê yekê** ji vê hindê wêdetir
**serbarî lê kirin 1.** bûn giraniya ser giraniyê **2.** bûn xeyd û ketin stûyê yekî
**serbask 1.** riya ku li ser gir an jî çiyan re derbas dibe **2.** serê qelûnê
**serbaz** leşkerê payedar
**serbazî** endamtiya payedar a artêşa bipergal
**serberedayî 1.** bêxwedî **2.** sewala bêgem û bêkap
**serberz** birûmet û serbilind
**serbest 1.** rizgarbûyî **2.** azad
**-serbest berdan 1.** azad kirin **2.** ji qedexeyan rizgar kirin
**serbestî 1.** rizgarî **2.** azadî
**serbêrî** berpirsa bêrîvanan
**serbijîşk 1.** tebîbê sere **2.** serokê hekîman
**serbilind** birûmet, bişeref
**serbilindî** serfirazî
**serbir 1.** stûbir, celad **2.** mêrkuj
**ser birîn** ser jê kirin
**serbixwe** xwemuxtar, xwebijartî

**serborî** serpêhatî
**sercem** **1.** gujim, hemû, gişt **2.** yekpare **3.** tev
**ser çemandin** ser tewandin
**serçemk** serê rêza govendê
**-serçemk girtin** sergovendî kirin
**serçimk** serê tiliyên piyan
**-bi serçimkan bi rê ve çûn** nermînka û bi serê tiliyan meşîn
**serçok/serçong** movika ku hestiyê hêt û çîpê digihêjîne hev
**serdab** neqeb, qul, kun
**serdan** ziyaret
**serdanpê** ji sêrî heta piyan; seranser
**serdar** serok
**serdarî** seroktî
**serde** pêlekan
**serdem** heyam, çax
**-serdema kevirîn** di şaristaniyekê de heyamên ku alav û amanên kevirîn dihatin bikaranîn
**-serdema raperînê** di şaristaniyekê de heyamên ku şoreşên dijî zordestiyê mohra xwe lê xistine
**-serdema ronahiyê** di şaristaniyekê de heya-mên destpêka rewşen-bîriyê
**-serdemên zêrîn** di şaristaniyekê de heyamên ku pêşketin tê de gihiştiye asta hera bilind
**serdest** **1.** desthilat **2.** bibandor *"bindest û **serdest,** nabin yek dest"
**serdest bûn** desthilat bûn
**serdeste** di artêşê de fermandarê desteyeke ji 12 kesan pêkhatî
**serdestî** desthilatî
**serdilk** delaliyê malê; ezîz
**serdozger** serekê qaziyan
**sere** **1.** xeraca bi gef û gurê; fidye **2.** navsale
**serederî** pêkanîn û qedandin
**-serederî pê re derxistin** **1.** pêk anîn û qedandin **2.** pê bûn
**serek** **1.** serwer, serok **2.** rêber
**sereke** tiştê ku girîngiya wî di asta yekemîn de ye
**serenav** navê taybet ê ku tenê ji bo kesekî an jî tiştekî tê hildan
**serencam** **1.** dawî **2.** aqibet **3.** kutahî
**-serencama berhevxistinê** yekûna hejmarên ku hatine derbdanê
**-serencama dabeşkirinê** yekûna hejmarên ku li hev hatine parvekirin
**-serencama derxistinê** yekûna hejmarên ku ji hev hatine derxistin

**-serencama komasiyê** yekûna hesabekî
**sererast 1.** bipergal **2.** wekî ku pêwist e
**sererast bûn 1.** rast gerîn **2.** çêbûn **3.** durist bûn
**sererast kirin 1.** tehqîq kirin **2.** durist kirin **3.** rast gerandin
**serêş** êş û jana ku di serî de pêk tê
**serêşî 1.** nexweşiya êşa seriyan **2.** arîşe
**serfermandar** di artêşê de fermandarê herî payedar
**serfiraz 1.** rizgar **2.** serberz, serbilind
**serfirazî 1.** rizgarî **2.** serbilindî **3.** serkeftin
**sergamêş** dijûna ji bo kesê sermezin
**serger** rastahiya li serê bilindahiyekê *"mêrê çê **serger** e, mêrê nebaş binger e"
**sergerdan 1.** serek, serpêşsen **2.** betevala, bêhemal **3.** şepirze
**sergerdan kirin** bêsexbêr kirin, beredayî berdan
**sergerm 1.** bicoş **2.** rûgeş
**sergermî 1.** coşî **2.** rûgeşî
**sergevez** kesê ku baweriya xwe bi xwe tîne û ji ber kiryarên xwe şanaz e
**sergêj 1.** sersar, xêvik **2.** sefêk
**sergihayî 1.** bidawîbûyî **2.** *(ji aliyê hişmendiyê ve)* stewî
**sergihayî bûn 1.** bi dawî bûn **2.** fêm kirin
**sergihayî kirin 1.** bi dawî kirin **2.** dan fêmkirin
**sergîfk** sergo
**sergîn 1.** kerme **2.** peyn *"dilê şivên kete kete **sergîn**ekî, heft salan ew di tûrikê xwe de gerand"
**sergo** cihê ku zibilê davêjinê; kaj *"gund, ne bê **sergo** ye"
**sergotar** navnîşanên pêşîn ên destpêka gotarekê
**sergovend** govendkêşê ku dîlanê digerîne *"di govenda cahilan de, **sergovend** xuya nabin"
**serhed** tixûb
**serhejhejok 1.** kesê ku serê li wî aliyî û li vî aliyî dileqe **2.** kesê temenbihurî *"zivistanê, **serhejhejok** çêtir e ji dûvhejhejokî"
**serheng** di artêşê de payeya fermandarê hengeke leşkerî
**serhevde 1.** teral **2.** eyba kesekî ya ku hinek dikarin bidin rûyê merivekî wî; pozdaxî
**serhevraz** ber bi jor *"a-

va xurtan, **serhevraz** e”
**serhewa** meqameke kilaman a direj û bi şewat e, dûrik
**serhildan** îsyan
**serhildêr** kesê ku li ber pergalekî radibe; îsyankar
**serhişk** **1.** înkdar, engirî **2.** serkevir
**serhişkî** heter
**seridîn/diseride/biseride** behîn, stewîn, zer bûn, gihiştin
**serik** **1.** serê biçûk **2.** serê çêreyên wekî pîvaz, sîr û sêva binerdî **3.** dervank
**serinc** **1.** bal **2.** taybetmendî
**-serinc rakêşan** bal kişandin
**serincrakêş** balkêş
**serişte** **1.** berate **2.** elamet
**serî** **1.** nik, nikil **2.** qaf *“jin dimire, **serî** li mêr digere”
**-serî lê dan** daxwaz kirin, muracaet kirin
**-serî lê gerandin** **1.** gêjomêjo kirin **2.** bilandin
**ser jê kirin** **1.** serî qut kirin **2.** kuştin
**serjimar** gelhe, nifûs
**serjimara giştî** gelheya seranserî welatekî
**serjinik** kesê ku bi karên jinan radibe an jî xebera jinan dike; serpîrek
**serkan** di artêşê de serbazê ku perwerdehiya leşkerî ya bilind kuta kiriye
**serkanî** navenda ku av jê dizê, çavkanî
**serkantî** di artêşê de desteya serbazên payebilind
**-serkantiya giştî** saziya ku serfermandariya artêşê digerîne
**serkar** rêvebirê dezgeh, kargeh, sazî hwd
**serkarî** **1.** desteya rêvebiran **2.** avahiya rêvebiriyê
**serkeftin** **1.** jêhati **2.** jîrî **3.** zîrekî
**serkeftî** **1.** jêhatî **2.** jîr **3.** zîrek
**serkêş** rêber, pêşeng
**serkêşî** rêberî, pêşengî
**serkêşî** **1.** pêşî kişandin **2.** rêberî kirin **3.** serwerî kirin
**serkol** serqot
**serkolî** serqotî
**serkut** tiştê ko û netûj
**serkut bûn** **1.** winda û nepen bûn **2.** tepeser bûn, çewsîn
**serkut kirin** **1.** tepeser kirin, çewsandin **2.** veşartin
**serleşker** fermandarê desteyeke leşkerî
**serliq** di artêşê de payeya

fermandarê liqeke leşkerî
**serma** hewaya sar; seqem *“**sar** û serma ye, potik bav û bira ye”
-**serma girtin/xwarin** zekemî bûn, bi çilmasiyê ketin
**sermal** pêçeya ku li sêrî tê pêçan
**sermaye** mal û milkê ku di destê mirovî de heye
**sermayedar** xwedî-rastmal
**sermayedarî** pergala ku xwedan-rastmal tê de desthilat in
**sermedî 1.** ebedî **2.** hetahetayê
**sermest 1.** serxweş **2.** eyaş, meyxur **3.** gêj
**sermest bûn 1.** serxweş bûn **2.** hay ji xwe neman **3.** gêjovêjo bûn
**sermestî 1.** serxweşî **2.** meyxurî **3.** gêjtî
**sermeşq** nimûne, mînak
**sermil 1.** serkulang **2.** di kincan de beşa ku dikeve ser milan û di hinan de hinekî stûr e
**sermiyan 1.** dewlemendî **2.** rastmal *“aqil pir **sermiyan** e, ne karê merivan gişkan e”
**sermiyandar** dewlemendê xwedî-rastmal
**sername** sernav
**sernav** peyv an jî hevokên ku mijara nivîsekê diniminîn
**sernerm 1.** awirşikestî **2.** bêhnfireh
**sernewq 1.** rezîl **2.** rûreş
**sernişîv** serberjêr
**sernivîsar** nîvîsara sereke ya ku sernivîskar dinvîse
**sernivîskar** serokê nivîskarên kovar û rojnameyan
**sernixûn** sernişîv
**sernûçe** xebera sereke
**sernûser** sernivîskar
**serobino 1.** tevlihevî **2.** aloz
**serok** kesê ku bi rêvebiriya deste, dezgeh, partî, welat û hwd radibe; rêber, serkêş
**serokatî 1.** serwerî, desthilatî **2.** rêberî
**serokomar** reîsê cumhûriyetê
**serokwezîr** reîsê wezaretan
**serpel** di artêşê de payeya fermandarê peleke leşkerî
**serpene** keteber, bêpergal
**serpene kirin 1.** keteber û bê pergal tevgerîn **2.** *(kar)* birêkûpêkî nekirin
**serperişt** peywirdarê ku rêvebiran teftîş dike; mifetiş

**serperî 1.** seroka cinan **2.** periya zeryayî
**serpêhatî** macera, serborî
**serpiyan** kar û barên ku bêyî dezgehekî rûniştî tê pêkanîn
**-bazirganiya li ser piyan** danûstandinên ku derveyî firoşgehan û li serê kolanan tê pêkanîn
**-xwarinên serpiyan** xwarinên ku zû dipijin
**serpî/serpîl** sermil, kulang
**serpîrek** serjinik
**serpopil** serê her tiştê ku wekî derzîreqê ye
**serpûş** hemû cureyên kum an jî mêzerên seriyan
**serqot** kesê ku tiştek nedaye serê xwe;servekirî
**sersabûn kirin** xapandin
**sersal 1.** vegera serê salê, yekê meha yekemîn a salnameyê **2.** nûroj
**sersar** kêmbihîstyar
**sersarî** kêmbihîstyarî
**sersarî kirin** li şîretan guhdarî nekirin
**sersax** kesê bê arîşe û kêmasî
**sersaxî** ji xizmên miriyan re hedar û ji miriyan re jî rehmet xwestin; serxweşî
**sersaxî jê re xwastin** ji malbata miriyan re gotin: “serê we sax be”
**serşok** cihê ku lê serî tê şûştin
**sertar** gupika çiyê; qot
**sertaser** seranser
**sertilî** serê tiliyan
**sertiraş** kesê ku pîşeyê wî kurtisandina poran e
**sertiraşî** karê kurtisandina poran
**sertiraşxane** cihê ku mirov lê porê xwe dide kurtisandin
**sertîr** serê guhên
**sertît** di artêşê de fermandarê ku payeya wî di navbera serhengî û serlîwatiyê de ye
**serwer 1.** desthilat **2.** serok **3.** rêvebir
**serwerî 1.** desthilatî **2.** serokatiya wezaretan **3.** rêvebiriya karekî *“bê **serwerî**, girara piran nakele”
**serwext 1.** zana **2.** hişyar **3.** hişmend
**serwext bûn 1.** sergihayî bûn **2.** hişyar bûn
**serwext kirin 1.** sergihayî kirin, îqna kirin **2.** hişyar kirin
**serxur** bêyom, bêpêpal
**serxwe** xweş û gihan, jîr û li ser piyan
**serxwebûn [I] 1.** xoybûn, xwebixwetî **2.** felat **3.** rizgarî
**ser xwe bûn [II]** xweş û

gihan bûn, jîr û li ser piyan bûn
**serxweş 1.** sermest **2.** eyaş **3.** meyxur **4.** eraqxur *"axa xurt be, xulam **serxweş** digerin"
**sersil** rêzehestiyên piştê yên ku ser û lingan bi hev ve girêdidin
**serxweş bûn 1.** sermest bûn *"beq, bi avê **serxweş dibe**"
**serxweşî [I]** sermestî
**serxweşî [II]** sersaxî
**serzelût** qafkeçel
**setimîn/disetime/bisetime** pê li tiştekî alîn û lli erdê ketin; tehisîn
**sevî** selikeke mezin û kûr a ku mêweyan dikinê û didine ser pişta sewalan
**sewa** seba
**sewal** heywan, ajal
**sewda** evîn
**sewdal** aqil, hiş
**sewdaser** evîndar
**sewgirandin/disewgirîne/bisewgirîne 1.** mîsoger kirin **2.** bîme kirin
**sewl [I]** kulîlkek e
**sewl [II]** bêrika kelekvanan
**-sewl dan** *(bi bêrikên kelekvaniyê)* hewl dan
**sews** sehm
**sewt** deng
**-sewtek li erdê yek li esmên bûn** ji ber êş û tajanan qareqar kirin
**-ji sewt ketin 1.** lap westîn **2.** ji ber qîrînê êdî deng jê derneketin
**sewtsewtok** çelçelok
**sewz** kesk
**sewzî 1.** keskahî **2.** *(çi pijandî çi nepijî)* hemû berên bîstanan, çêre û pimparên ku tên xwarin
**sexbêr** xwedî *"her canek, di dilê **sexbêr**ê xwe de siltanek e"
**sexbêrî 1.** xwedîtî **2.** xwemalî, hemalî
**sexbêrî kirin 1.** xwedîtî lê kirin **2.** bêhemal nehiştin
**sexbêrvan** kesê ku çavdêriya zarok, mal an jî sewalan dike
**sext 1.** dijwar, tund **2.** şidiyayî, muhkem
**sexte** karê nerewa û tiştê nedurist; beqem, qulebî
**sextiyan** çermê stûr
**sexele** berx û karên viringî
**sewad** hunera xwendin û nivîsandinê
**-xwedî-sewad bûn** bi hunera xwendin û nivîsandinê beled bûn
**sewal** heywan, ajal
**sewalvan** ajalvan
**sewalvanî** ajalvanî
**sewt** deng, awaz
**sewnês** çilmasa kûçikan

**sewnêsî** kûçikê bahorî
**seya** rûkişandina dîwaran
**seyandin/diseyîne/biseyîne** rûyê dîwer bi herî an ji kilsê û hwd betankirin
**seyd** nêçîr *"ling li qeydê, çav li **seyd**ê"
**seyda** **1.** zana **2.** alim **3.** mela
**seydvan** nêçîrvan
**seylav** **1.** lehiyên ava gur **2.** ava gumrah a piştî baraneke boş
**seylax** di qeraxên avan de erdê bi xîz
**seynik** di saet û qiblenameyan de çembera ku hejmar û nîşanên dem û aliyan nîşan dide
**seyr** ecêb, xerîb
**seyran** geşt û ger
**seyrangeh** cihê ku ji bo geşt û gerê munasib e
**seyranî** kesên ku diçine geşt û gerê; geştiyar
**seyrek/seyrnîşan** pirsnîşan, /?/
**seza [I]** **1.** şerm, eyb **2.** nebaşî
**seza [II]** layîq
**-sezayî pesndanê** layîqî padanê
**seza [III]** tola qanûnî ya li hemberî her gunehek an karekî nerewa û nedurist; ceza
**-sezaya laşî** cezayê bedenî
**seza kirin** ceza kirin
**sê** **1.** hejmara beriya çaran û piştî diduyan **2.** jimareya 3'yan *"**sê** teres hene li gund: kalê jinrind, feqîrê bêvilbilind, mêvanê mal di gund"
**-sê kevirê wê dan ber sêrî** jin bêveger berdan
**sêbare** sê caran
**sêbare bûn** sê caran rûdan
**sêbare kirin** sê caran gotin an jî kirin
**sêdar** **1.** sê darên ku serên wan bi hev ve girêdidin û meşkê tê de dikên **2.** sê darên ku serên wan bi hev ve girêdidin û tawanbaran tê de bi dar ve dikin
**sêdîmenî** tiştê ku berahî, dirêjahî û kûrahiya wî heye
**sêgoşe** şeklê ku li ser sê çiman ava bûye
**sêguh** sêtilî, şene
**sêk** ava tirş
**sêl** alava hesinî û gilover a ku nan li serê tê pehtin *"hem nanê ser **sêl**ê ye, hem jî teniya binê beroşê"
**sêlik** **1.** sêla biçûk **2.** bûjeneke lek a gilover e; deng, reng û bername li ser tên tomarkirin

**sêlav** seylav *"**sêlav** her tim bi xwe re qurman nayne"
**sênc 1.** tîn **2.** heraret **3.** şkênc û jan
**sênex** bendê ku ji sê bendên zirav hatiye ristin
**sênî** berkeş
**sêpî** sêdar
**sêr kirin 1.** temaşe kirin **2.** mêze kirin
**sêsibeh** piştî sê rojan
**Sêşem** roja çaremîn a hefteyî
**sêta 1.** ji sê bendan pêkhatî **2.** ji sê taqan pêkhatî
**sêtîr** cureyekî tifingên kevn e
**sêv** cureyekî mêweyan e *"heta ku **sêv** bi darê ve be, dê her kes keviran bavêjê"
**sêvaxîn** cureyekî sewziyên ku wekî kartolan di bin erdê de hêşîn dibe
**sêvik** movika ku hestiyê lingan bi sersilê ve girêdide
**sêwak 1.** sersar **2.** betal **3.** revo
**sêwirandin/disêwirîne/bisêwirîne 1.** xeyal kirin **2.** şayese kirin **3.** aşt kirin
**sêwirîn/disêwire/bisêre 1.** şayese bûn **2.** aşt bûn **3.** qiriyan
**sêwî** bêdê, dêmirî *"berxê **sêwî**, beran jê dernayê"
**-sêwiyê binçengşewitî** xizan û jarê eks û nehs
**-sêwî man** bêdê man, dê lê mirin
**sêwîxane** saziya ku sexbêriya zarokên dêmirî û bêxwedî dike
**sêyek** ji sê paran parek, 1/3
**sêzdeh 1.** hejmara beriya çardehan û piştî duwazdehan **2.** jimareya 13'an
**sêzdehem*(-în)*** di rêza sêzdehan de
**Sibat** meha reşemiyê *"**sibat** tiro-viro, adar ma bîst û du ro"
**sibe** sibeh *"sibe tê, **xêr** jî pê re"
**sibeh 1.** destpêka rojê **2.** dîtira rojê *"keça bê bav û dê, êvarê diçe û **sibehê** tê"
**-sibeh lê pag bûn** gihiştin sibehê
**sibetir** dusibe
**sicade** tiştê paqij ê ku nimêj li serê durist e
**-sicadeya xwe li dojehê raxistin** îmana xwe avêtin
**sicûr** şewateya ku pê êgir dadidin; ardef *"beriya **sicûr**ê xwe davê tenûrê"
**sifir [I]** kanzayê mîsê
**sifir [II] 1.** net, netêw, nîn,

(0) **2.** hîç, ne tu tişt
**sifirne** sîvander
**sifre** mase, pîne û tiştên din ên ku ji bo xwarinê tên raxistin *"dil ne **sifre** ye ku li ber her kesî vekî"
**-sifre danîn** xwarin danîn
**sift** tiştê tîr û hasilbuyî an jî vepesirî
**siftî** rewşa tîrbûn, hasilbûn û vepesirîna bûjenan
**sih [I]** cihê ku tav jê nagire *"ma kes nikare bibêje ku **sih**a te xwar e?"
**sih [II] 1.** sê heb deh **2.** jimareya 30'î
**sihik** ava tiriyan a hilatî û bi emadê xwe tirşbûyî; sirke
**sihin** rewşa şaşopaşobûnê; heys û beys
**sihirandin/disihirîne/bisihirîne 1.** gayîn **2.** hiltirandin, tecawuz kirin
**sihirîn/disihire/bisihire 1.** hatin gayîn **2.** tûşî tecawuzkirinê hatin
**sik** kirêt û menfûr
**sikil** xweliya argonî ya ku tê de parçeyên êgir mane
**sikir** benda avê *"av, ji serê **sikir**ê de ziwa dibe"
**sikûm** rû, çehre, sîma
**sikûmreş** bêyom, bêpêpal
**sil [I]** çilek
**sil [II]** gemara dewêr a ron
**-sil kirin** *(dewar)* rîtin
**sil [III] 1.** zûxeydok **2.** kesê ku ji tiştinan aciz dibe
**-sil bûn 1.** zû bi zû xeyidîn **2.** ji tiştinan aciz bûn
**-sil kirin 1.** rarûyî yekî ketin **2.** tiştê ku jê aciz dibe lê nîşan dan *"jinê dil kir, mêrê xwe **sil kir**"
**silal** serban
**silamet 1.** bêzede **2.** bêbela
**silav** selam, pate *"**silav** li miyan e, ne li rûyan e"
**-silav dayîn** selam dayîn, pate lê dayîn
**-silav kirin** selam kirin, pate lê dayîn
**-silav lê kirin** selam jê re şandin
**silavî** îhtiram û xweşhatinî
**-çûn silaviyê** çûn serdana yekî û giramî jê re girtin
**sildank** berkurk
**silek** çilek
**silekî** çilekî
**silekî kirin** çilekî kirin
**silepor** komek gemara dewêr a rehn
**silikandin/disilikîne/bisilikîne 1.** rarûyî yekî ketin **2.** tiştê ku jê aciz dibe lê nîşan dan û ew

dan revandin **3.** heywan tirsandin û dan revandin
**silikîn/disilike/bisilike** **1.** bertek nîşan dan **2.** zû xeyidîn **3.** *(sewal)* tirsîn û revîn
**silim** pêlekan, pêpelûk
**silîng** amûra ku barên giran ji cihekî neqlî cihekî din dike
**silq** cureyekî sewziyên ku jê şekir tê bidestxistin û pijandî jî tê xwarin
**silqî** saye
**-silqiyî serê te** (*neyînî û erênî)* bi sayeya te de
**silsilok** kesê ku zû bi zû dixeyide û tengezar dibe
**siltan 1.** desthilat, hukimdar **2.** serwext û jêhatî *“siltik hatin bûn û **siltan,** pêlik danîn û çûn esmanan**”**
**silûk 1.** înziwa **2.** *( ji bo ku rewanpakiyê pêk bî-nin)* tenêtiya sofiyan
**-ketin silûkê 1.** derketin înziwayê **2.** *(ji bo paqijiya derûnî)* xwe tenê hiştin
**sim** piyên ajalan *“çavê nalbendan li **sim**ên hespan e**”**
**simandin/disimîne/bisimîne** qul kirin, simitandin
**simarte** bûjeneke girtikgirtî ya ku pê girnoz tên jêbirin
**simbêl** pirça ku li ser lêvan û bin bêfila mêran û hin sewalên nêr hêşîn dibe *“dilî bide ber dilan, gulê bide ber **simbêlan”**
**-simbêl tê de badan** di xwarina xweş de kêf kirin
**simbêlboq** simbêlpoşe
**simbêlçixt** kesê ku simbêlên wî badayî û sertûj in
**simbêlpoşe** kesê ku pirça simbêlên wî boş û dirêj e
**simbil** di zêd de seriyê ku dan tê de ne
**sime** çatkêş
**simil** simbil
**simitandin/disimitîne/bisimitîne** qul kirin, simandin
**simitîn/disimite/bisimite** qul bûn, simîn
**simîn/disime/bisime** qul bûn, simitîn
**simkot** tasika vexwarinê ya biçembil; şerbik
**simok** alava qulkirinê; miqar, metqeb
**simtiraş** nalbend
**simolek** sewaleke boçdirêj û biçûk a ku bi lez hildikişe daran û ji bindeqan pir hez dike
**simsik** çilek, silek

**simt** lûtke, zîrwe
**simûçk** serê tiliyên piyan
**-bi serê simûçkan meşîn 1.** pir bi baldarî meşîn **2.** li ser hêkan meşîn
**sinaet** pîşe *“**sinaet** çek e, di berîka xwe ke, te hewce dît dêrî veke”
**sinarîn/disinêre/bisinêre** rexne kirin
**sinc [I] 1.** exlaq, xislet **2.** taybetmendî
**sinc [II] 1.** germahî, tîn **2.** jana birînê **3.** herareta bûyerê
**sincan** xwedanrewişt
**sincaq 1.** derziyeke badayî ya ku pê devê berîkan û bestina du pîneyan tê bikaranîn; şewk **2.** hilçoyê çeqelkî **3.** şewka masîgiran
**sincirandin/disincirîne/bisincirîne 1.** agir geş kirin, sor kirin **2.** coşî û peroşiya bûyerê zêde kirin
**sincirîn/disincire/bisincire 1.** agir geş bûn, sor bûn **2.** coşî û peroşiya bûyerê zêde bûn
**sincîd 1.** cureyekî daran e **2.** berên dara sincîdê
**sindan** amûreke hesinî ya ku tiştên hesinî li serê tên kutan
**sindif** pozmika devê heywanan
**sindirîk** sindoqeke taybet a ku miriyan dikinê
**sindî** cureyekî mêweyên ku dişibihine porteqalan û çêja wan tehlovanckî ye
**sindoq** qutiya ku kel û mel tê de tên parastin
**sinet 1.** kirinên Cn. Pêxember ‘eleyhiselam **2.** *(li cem cihû û misilmanan)* qutkirina çêrmikê li ser endamê zayendî yê mêran *“**şêwr,** sinet e”
**sinet kirin** *(li cem cihû û misilmanan)* çêrmikê li ser endamê zayendî yê mêran qut kirin *”gava dîn **sinet bikin**, ji binçirkê ve qut dikin”
**sinêde 1.** bi ser re **2.** karê sixtopixto **3.** tenîsk
**-gule bi sinêde lê ketin** gule spîldaxkî bi ser re derbas bûn
**sinêle 1.** temenê di navbera zaroktî û mezinbûnê de **2.** nîvmêr, jinkok
**sing 1.** çoyê stûr û dirêj **2.** endamê zayendî yê nêrzayan *“derziya di çavê xelqê de dibînê, lê **sing**ê di çavê xwe de nabîne”
**-sing di ber de kutan 1.** zina kirin **2.** tecawuz kirin **3.** gayîn *“tar tara wê

bû, heta ku bêbavekî **sing**ek **di ber de kuta**”

**singîr** qamûş an jî darikekî zirav ê ku pê qirtik û pûrtên zêde ji rîsê nûristî tê veqetandin

**singîr kirin** rîsê nûristî ji qirtik û pûrtên zêde paqij kirin

**singo** di cenga rû bi rû de kêra ku bi ser lûleya tifingê ve dikin

**sinik** cureyekî bihukên ku ziyanê dide zadî

**sinix** riswa

**sinix bûn** riswa bûn

**siparte/sipartek 1.** peywira taybet **2.** emanet

**sipartin/dispêre/bispêre 1.** emanet kirin **2.** teslîm kirin

**sipsax** li ser xwe û ne mirî

**siqa** hesan

**siqa kirin** bi hesanê tûj kirin

**sir** raz, bîs *”dixwazî **sir**a xwe ji dujminê xwe veşêrî, ji dostên xwe re nebêje**”**

**sirêş** bûjena ku tiştan bi hev ve dizeliqîne

**sirişk** rondik

**sirke [I]** sing û hesinê ku kapên sewalan davêjinê

**sirke [II]** ava tiriyên guvaştî

**-sirke kirin** ava tiriyên guvaşti bi ser de rijandin

**sirnî** parçeyê ku davêjin navbera du tayeyan

**sirsûm** alaveke darînî an jî ji hesinekî tenik e û li şûna kilmeşkê bi kar tînin

**siruşt 1.** xweza **2.** fitret

**siruştî 1.** xwezayî **2.** fitrî

**sirûd** neşîd, marş

**-sirûda neteweyî** neşîda/marşa dewletekî

**-sirûdên leşkerî** marşên ku lehengiyên artêşê dinimînin

**sisê** sê *“gava serî bûn **sisê**, wan bavêje ber sê; ji ber ku sisê, li hev asê ye**”**

**sisî** tovê kengîran

**sist 1.** neşidiyayî **2.** nerm

**sist bûn 1.** tiştê şidiyayî vebûn **2.** nerm bûn

**sistî** nermî

**sist kirin 1.** nerm kirin **2.** tiştê şidiyayî vekirin

**sitam 1.** berevan **2.** parêzvan

**sitamî 1.** himaye **2.** berevanî

**-sitamî lê kirin 1.** himaye kirin **2.** parastin

**sitar** hêza serxwemanê; qudûm

**-sitar tê de neman 1.** pir kevn bûn **2.** pir lawaz bûn

**sitare/sitargeh** êwirgeh

**sitem 1.** zulm **2.** pêkutî

**3.** zext
**sitembar** **1.** zalim **2.** zordest
**sitembarî** zalimtî, zordestî
**sitemkar** sitembar
**sitêl** qiraca çik
**sitirandin/disitirîne/bisitirîne** **1.** parastin **2.** êwirandin **3.** hewandin **4.** aşt kirin **5.** bilandin
**sitirîn/disitire/bisitire** **1.** êwirîn **2.** aşt bûn **3.** bilîn *“kes-nekirî û jina kes-nebirî, bi hev **sitirîn**”
**sitî** stî
**sitvan** serpel
**siûd** bext, talih *“bila **siûd**a mirovî lêhatî be, aliyekî mirovî jî tunebe”
**sivder** **1.** hêwana malê **2.** derazînka *(pêderiyê)* derê malê
**sivik** negiran *“aqilê **sivik**, barê giran e”
**sivikahî** negiranî
**sivik bûn** giran nebûn
**sivik kirin** giranî jê daxistin
**siving** qeşayên ku ji banan dadiliqin; lîla banan
**sivnik** **1.** gêzî **2.** siqayîl
**sivorî** simolek
**sixêf** dijûn, çêr *“**sixêf,** karê jinan e”
**sixêf kirin** dijûn kirin, çêr kirin
**sixtopixto** serpene
**sixtopixto kirin** serpene kirin, serpeçûm kirin
**siwar** kesê ku hilkişiyaye ser sewal an jî navgîneke raguheztinê *“çi bibêjî jî, li bejna **siwar**ê min tê”
**siwar bûn** **1.** hilkişîn ser **2.** bazdan ser *“helkhelka gavanan, ji **siwarbûn**a keran e”
**siwar kirin** **1.** bar kirin **2.** avêtin ser piştê
**siwar peya kirin** pergala karê xelqê betal kirin
**siwat** riba, faîz
**siwax** seya
**siyaset** zanistên rêvebiriyê; ramyarî
**siyasetmedar** pisporê rêvebiriyê; ramyar
**siyasî** ramyarî
**siyele** çêreyeke ku belçikên wê weke sewziyan tên bikaranîn û pijandî tê xwarin
**sî** sih *“adarê, agir xweştir e ji **si**ya darê”
**sîber** zag
**sîdar** xwedî-sih
**sîgeh** sîwan
**sîhir** cadû
**sîhirbaz** cadûbaz
**sîkard** bivirê goştî; sator
**sîkene** di hundirê makîneyê de pergala ku xebata wê têkûz dike

**sîl** nexweşiya xefirxanê
**sîle [I]** lêxistina bi kefa destî, şeqam
**-kod bi dêv re sîle kirin** kod mişt tijî kirin û zêdehî bi kefa destî rijandin
**sîle [II]** kevirê ku goşeyên dîwaran digihîne hev
**sîm** zîv
**sîma** ser û çav; rû
**sîme** perjanê hesinî yê dir û bikelem ê ku *(ji bo parastinê)* dora zevî û erdan pê tê rapêçan
**sîme kirin** dor bi sîmeyê rapêçan
**sîmerx** di çîrokan de balindeyê efsûnî yê ku mirov lê siwar dibûn û bi kêrî raguhastinê dihat
**sîmsar** bazirganê ku ji firoşkar û kiriyar re navberkariyê dike û para xwe ji her dû seriyan jî distîne
**sînahî** bînahiya tiştan a ne li gorî rastiya wan lêbelê wekî sîber û pêjnan
**sîndir** cûnî
**sîng 1.** gerden **2.** qefes **3.** ber *"çavê tirsonek **sîngê** spî nabîne"
**sînor/sindor** tixûb, hudûd *"**sînor**ê xurtan tune ye"
**sînorbir** derveyî tixûbên heyî
**-rojnamevanên sînorbir** endamên çapemeniyê yên ku tixûbên rûmetşikên napejirînin
**sîpel 1.** şelale, şîp **2.** pifdankeke di nav zikê masiyan de ye
**sîqal [I] 1.** cîle, mesqel **2.** bêkêrtik, meht **3.** rewneqdar
**sîqal [II]** lûlikên qeşayê yên ku di zivistanan de bi kevir û banan ve dadiliqin; siving
**sîr** hêşinahiyeke ku pijandî û nepijandî tê xwarin û bêhna wê mirovî aciz dike *"ne pîvaz e, ne **sîr** e, tê digere weke qîr e ?"
**-sîrek li heft civatan gerandin** li pir cihan behsa heman tiştê bêbine kirin
**sîrfisk** cureyekî sîrên kûvî yên bêhnkirêt e
**sîrik** sîrim
**sîrim** sîra biyanî
**sîrkut** cûnî an jî derdana ku tê de sîr tê kutan *"**sîrkut** hilat, mîrkut dahat"
**sîs 1.** tiştê ku tavê lê nedaye û rengê wê spîtale ye **2.** rengê spî
**sîsark** cureyekî balindeyên ku ser û stûyê wan rût in û goştê miraran

dixwin; teyrê berateyan
**sîs bûn** di cihê tarî de man û reng lê spîtale bûn
**sîsele 1.** lawaz **2.** yax
**sîsirk** bihukeke biyanî ya ku bi şevê dengekî çirçirok derdixe
**sîtar** tixûb *"her kes di **sîtar**a xwe de şêr e"
**sîte** tora masîgirtinê
**sîtil** amanake mîsîn û mezin a ku tê de xurek tê pijandin
**sîvan** amûreke guhêzbar a ku mirovî ji baran û tavê diparêze
**sîvander** qeşaya ku di banan de dadiliqe; lîl
**sîvok** cihê êvitî an jî belbûyî yê ku ji ber lêdaneke tund di laşî de çêdibe; gilê
**sîwanok** kulîlkek e
**sîwak** darikê devpaqijiyê; miswak
**sîx 1.** pîjên daran ên girs **2.** şîşikên hûnanê
**sîxme 1.** darikên sertûj **2.** kelem
**sîxur [I]** cureyekî heywanên pîjpîjî ye
**sîxur [II]** hevkarê nepenî yê neyêr; casûs
**sobe** alava germkirina avahiyan a ku dûyê wê bi riya boriyan derdikeve derve
**sobevan** pîşekarê çêkirina sobe û lazimiyên sobeyan
**sober** avjen, melevan
**soberî** avjenî, melevanî *"heft **soberi**yên kerê hene, dikeve avê giştan ji bîr dike"
**soberî kirin** avjenî kirin, melevanî kirin
**sofik** telaşê tayî, kelefe
**sofî** dîndarê ku girîngiyê dide îbadetan; xwedênas *"**sofi**yê remezanê, wek kerê dû garanê"
**sohe** sobe
**sojer** sotîner
**sol** pêlav *"lingê xwe meke **sola** teng"
**-sol dan destan** hatin qewirandin
**solbend 1.** pêlavfiroş **2.** tehmîrkarê pêlavan
**soldank 1.** derdan û paçika solê **2.** di ber deriyan de cihê ku pêlav lê tên danîn
**soldirû** solbend *"**soldirû** pêxwas in, cildirû bêkiras in"
**sole** bistikên garisan
**solîn [I]** coya avê ya ku di bin axê re hatiye çêkirin û di bin kolan, mal û cadeyan re diçe
**solîn/solîne [II] 1.** zeviya kulîlkan **2.** cihê çandin û firotina gulan; gulistan

**sond** ehd, yêmîn, qesem *“derewîn, pir **sond**a dixwin”
**-sond xwarin** ehd û qesem kirin *“carekê rêwiyek di ber ziyaretekê re derbas dibû, lê vegeriya û got: ‘Xwedê dizanê min çend caran derewînî bi serê te **sond xwariye’**; ziyaretê jî got: ‘min jî gelek caran mala te xera kiriye lê tu bi xwe nehesiyayî’ ”
**sone** werdek
**sor** rengê xwînê *“gayê **sor,** sortiya xwe bernade”
**-sor û gizêrî bûn** qelew bûn û xwîn hatin dêman
**soravk** boyaxeke sor a ku hin jin li lêv û nenîkên xwe didin
**sor bûn 1.** wekî rengê xwînê bûn **2.** *(mêwe)* stewîn **3.** mehcûb bûn *“gul, li gulê dinêre û **sor dibe”**
**sorcîn** rengê qehweyî
**sordîn** kevirên meht ên ku ji bo sewalan xwêyê li serê direşînin
**sorewêl/sorewilk** teyrekê avî yê gerok û rengsor e
**sorgevez** sorê tîr û tarî
**sorik 1.** pijikên sorsorî **2.** cureyekî nexweşiyê ye **3.** giyayekê qamîşî ye
**soring 1.** nexweşiyek e **2.** boyaxeke giyayî ya sor e
**sorîçk** endamê ku xwarina daqultandî tê re derbasî aşikê dibe
**soromoro bûn** *(ji ber serma, şerm û hêrsê)* reng avêtin û çilmisîn
**sorsorik 1.** sorîçk **2.** cureyekî darên biyanî ye **3.** berên dara sorsorikê
**sosik** cureyekî bihukan e
**sosin** cureyekî kulîlkan e
**sosret** ecêb, xerîb, seyr
**sotin/disoje/bisoje** şewitandin
**sotîner** bişewat, agirîn
**sox 1.** rezîl û riswa **2.** mehcûb
**-sox û sinix** rezîl û riswa
**sox bûn 1.** bi nebaşiyê navdar bûn **2.** rezîl û riswa bûn **3.** mehcûb û şermezar bûn
**soxe 1.** mîrate **2.** kambax û merez
**-soxe man 1.** ji mîratxuran re mîrate man **2.** li xwediyan merez bûn
**sox kirin 1.** nav û nûçikên nebaşiyê li ser xistin **2.** mehcûb û şermezar kirin **3.** rezîl û riswa kirin
**soy** namûs û şeref
**soz 1.** peyman, ehd **2.** gotin û biryar *“ma **soz** bûne toz?”

**-sozê mêrên berê** sozê bê hîle û xurde

**sozdar** kesê ku biryarek li ser xwe vebiriye; peymandar

**soz dan** peyman vebirîn

**sparte 1.** emanet **2.** peywira taybet

**spartin/dispêre/bispêre 1.** radest kirin, teslîm kirin **2.** emanet kirin *"kerê xwe rind girêde, paşê **bispêre** Xwedê"

**-spartin axê** mirî di gorê de danîn û serê gorê nixamtin

**spas** teşekur

**spas kirin** teşekur kirin

**spehî 1.** xweşik **2.** bedew **3.** delal **4.** boş *"dar bi berê xwe ve **spehî** ye"

**spehîtî** ciwanî, rindî

**spêde** destpêka rojê; elind, berbang

**spêle** tiştên ku di şevereşan de bi ber çavê mirovan dikevin lê di rastiyê de ew tunene

**spî [I]** rengê berfê

**spî [II]** cureyekî heşeratên ku wekî kêçan dikevin nava por û cilan

**-spiya xwe bi peretî firotin** ji kirêtiyên xwe re di bazara qencan de cih veqetandin

**-spiyên xwe kuştin** di halê xwe yî xirab de ketin

**spîçolkî** çilmisî

**spî kirin** qeşartin, qalik jê kirin

**spîldax** herş

**spîldax bûn** herişîn

**spîldax kirin** herişandin

**spîlk** spîtk

**spîndar** dara spingê

**spîtale** tişt an jî mirovê rengspî

**spîtayî 1.**rewşa rengê berfê **2.** şîr û adanên şîrî

**spîtk 1.** di çavan de beşa spî ya ku bîbik di nav de ye **2.** di hêkan de aviya zelal a ku li dora zerdikê ye

**spîxur 1.** çiriz **2.** çikûs **3.** kirêt *"axayê **sipîxur**, bê xulam dimîne"

**standin/distîne/bistîne 1.** wergirtin **2.** kirîn

**stewandin/distewîne/bistewîne 1.** kemilandin **2.** gihiştandin **3.** pijandin **4.** terixandin

**stewîn/distewe/bistewe 1.** kemilîn **2.** gihiştin **3.** pijîn **4.** terixîn

**stewl** tewleya dewar, ker û hespan

**stewr** heywana ku berê xwe negirtiye û avis nebûye *"çêleka **stewr**, be şîr e jî"

**stewr bûn** *(sewal)* ber negirtin

**stêle** beredayî

**stêng** giyanewereke jehrdar, û rengsor e; kunên xwe di ax û keviran da çêdike mêşhingivan dixwe û ziyanê dide

**stêr** cismên ku bi şev li esmên dibiriqin

**-stêr xuricîn** stêr rijîn

**stêrk [I]** stêr

**-stêrka xwe bi roj dîtin** tê gihiştin ku çi sosretî dê bên sêrî

**-stêrk ji esmên anîn xwarê** tu kar ji destan nefilitîn

**stêrk [II]** nikilê ku bi serê lûleya tifingan ve ye û bi kêrî nîşangirtinê tê

**-stêrk girtin** nîşan girtin

**stêrk [III]** kepirkeke ku di ber dîwarê malê de çêdikin da ku xwarin û pertalan li ser daynin

**stêrnasî** zanistên ku pisporiya wan nasîn û danasîna gera stêran e

**stî** xatûn, xanim, banû

**stran [I]** *(hevîr û hwd)* hasilkirin

**stran [II**] kilam, goranî

**stranbêj** dengbêj

**stran/distrê/bistrê 1.** kilam gotin **2.** *(hevîr û hwd)* hasil kirin *"hevîr çiqasî **bê stran,** nanê wî ewqas tahmê dide"

**strî** di çêre û daran de cihê tûj ê ku dest ê mirovan re diçe; kelem, pîj, dasî *"cîranê nebaş **stri**yê ber çavê mirov e"

**strîzerk** çêreyek e

**stro** şaxên bi serê hin ajalan ve; qiloç *"malê dinê, **stro**yê mêran e"

**strû** stro *"bizina ku kok bû, dê **strû**yê xwe di kendalan hilde"

**stû** endamê ku sêrî bi cendêk ve girêdide, qirik

**-stû di rû de hatin** bê hemdî xwe xewre çûn an jî ji ser hişê xwe çûn

**-stû bi binî ve bûn** neheqî kirin û rastî sezayê neheqiya xwe hatin

**-stû hingaftin** serî lê xistin/ser jê kirin

**stûbend** du bendikên ku ji dêla kemberan çeperast tên girêdan *(du serên aliyekî li qûna şalî ve tên girêdan û ên din jî di ser milan re bi pêşiya şêl ve tên girêdan)*

**stûbir 1.** bivirê celadan; serbir **2.** mêrkujê bêminet

**stûdirêj** cureyekî sewalên kûvî ye û stûyê wê wisa dirêj e ku devê wê digihêje belgê daran

**stûkur** katara stûyî

**stûqulk** stuyê dirêj û zirav

**stûn 1.** pêsimtek, kêran

2. singên dirêj ên ku pê konan vedigirin *"**stûn**a zilmê çiqasî qalind be, ewqasî zû dişkê"
**stûr 1.** nezirav **2.** qelew *"stûyê **stûr,** ji gayê cot re namîne"
**stûr bûn 1.** zirav nebûn **2.** qelew bûn
**stûr kirin 1.** zirav nekirin **2.** qelew kirin
**stûrî 1.** neziravî **2.** qelewî *"her tişt ji ziraviyê dişkê, mirov ji **stûri**yê"
**stûvank** gerdenî
**stûxwar 1.** belengaz **2.** reben
**su hatin** xeyidîn
**suhbet** hevpeyvîn
**sukûnet 1.** aramî **2.** jiyana bêteqereq
**-sukûneta derûnî** aramiya giyanî
**sulh** aştî
**sur 1.** ba **2.** serma
**surandin/disurîne/bisurîne 1.** mist dan **2.** tev dan **3.** ziyîn
**Sureya** gerestêrkek e
**surperî** bedewtira cinan
**surşirîn** dilrevîn
**suxre 1.** xebata nanoziko **2.** olam
**suxte** şagirdê zanistên dînî; feqîh
**sûc** tawan *"**sûc** sê wî ye, kes lê xwedî dernakeve"
**sûcdar** tawanbar
**sûçe** goşeya derve; çivange
**sûçeber** kevirê çivangeya dîwêr
**sûd 1.** menfiet, berjewendî **2.** fayde, behre
**-sûd wergirtin** kelk jê wergirtin
**sûdperest 1.** kêmfirsend **2.** keysperest
**sûk/sûq 1.** çarsî **2.** erase *"ne ji fesadan be, rovî dê here **sûk**ê"
**sûlav** şelale, şîp, sîpel
**sûr** dîwarê kelehê; beden
**sûre** ji 114 beşên Quranê beşek
**sûret 1.** dêm **2.** gep
**sûs** rehên nebateke tahmxweş e û berê dewsa şêkir dihate bikaranîn
**sûse 1.** sîxurê ku kozikên neyêr teselî dike **2.** *(ji bo lêgerînekê)* êrîşa berfireh **3.** sîxuriya bi darê zorê
**sûsik** cureyekî çivîkan e û hêkên wan pir biha ne
**sûsmar** tîmsah
**sût** rengê hêşîn ê ku dişibihe keskê çêreya ter lêbelê birqonek e; kesber
**sûtal 1.** satore **2.** şeşerût **3.** bêkêr, bêbine **4.** eware, ewan
**-sût û sûtal** betalên ku li kuçeyan beredayî digerin
**sûtar 1.** wêrek **2.** şêrdil

**sûtan/disû/bisû** **1.** xar kirin **2.** tûj kirin **3.** zot kirin
**swîr** tama xwêyê, şor
**swîr bûn** şor bûn
**sûxar** bistikên birincê ter
**sûyîn/disû/bisû** sûtan
**sûzenek** nexweşiya piştêşê
**sûzenî** pineyê ku di dema kirasan de jin didine ber xwe

# Ş

**ş/Ş** tîpa bîst û sêyemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke pêşezmandevî ye û di belavbûna wê de ziman li ser diranan dişide û awayê belavbûna wê fîzek û hişk e
**şa [I] 1.** bextewar **2.** kêfxweş **3.** dilrehet
**şa [II] 1.** şah **2.** bijarte
**şabad** bajar an jî cihê rûniştina şahekî
**şabal** şaper
**şaban** şara ku davêjin ser serê bûke û zava vedike
**şabaş 1.** bexşîş **2.** xelata daholvên **3.** qenciya mezin *“gava ku ba bê **şabaş**an bidêr, ba neyê guhê xwe bidêr”
**-şabaş ji Xwedê re** şikir ji Xwedê re ku ev rewşa ku ez tê de me bexişandiye min
**şa bûn** kêfxweş bûn
**şaciwan** keç an jî jina ku ji hemûyan bedewtir tê hilbijartin
**şad** şa *“bi mirinê, dil **şad** nabe”
**şad bûn** şa bûn
**şadiman** dilfireh
**şadirvan** hewz, lîç, gol, rûbar an jî zeryaya ku bi kêrî soberiya melevanan tê
**şadî 1.** kêfxweşî **2.** dilrihetî
**şad kirin** şa kirin
**şafir 1.** çola dêm, bêdar û vala **2.** cureyekî çêreyê ye
**şag 1.** şak **2.** newal
**şagenim** genimê bijare
**şagirt 1.** telebe, xwendekar **2.** feqîh **3.** kesê li ber destê hostayekî karekî dike; pîşekarê nû
**şagul** gula hera bedew
**şah** key
**şahane 1.** bijarte **2.** tiştê layiqî mîran
**şahbanû** keybanû
**şahbaz** teyrê baz
**şahbender** nûnêrê dûgelê yê li derveyî welêt, sefîr
**şahbenderî** sefîrtî
**şahbenderxane** sefaret
**şaheng** serok û mîrê komeke mêşhingivan
**şaheser** pir bedew
**şahid** kesê ku bûyerek dî-

tiye; guwah *"**şahid**ê roviyî, boçika wî ye"
**şahidî** guwahî
**şahî** çalakiya kêfxweşiyê *"kesîb ne li şînan e, ne jî li **şahi**yan e"
**şahîk 1.** rewşen, ronak **2.** meht, şimşimot
**şahmar** marê herî girs
**şahmerdan** egîdê egîdan
**şahreg** reha ku xwînê ji dilî belavî cendêk dike
**şahrê 1.** riya sereke **2.** riya şoşê
**şahsiwar** sersiwar
**şahtî** keytî, mîrtî
**şahyar** wezîr, kizîr
**şahzade** zarokên şahan
**şair** helbestvan
**şajin** seroka jin; keybanû
**-şajina bedeweiyê** di nav hinkufan de jina hera bedew
**şak** şaxên daran ên ku bi alîkariya dareke din bilind dibin
**şa kirin** kêfxweş kirin
**şakûl** amûreke ku pê mîhenga karên avasaziyê tê dayîn
**şal** kinca ku ji navikê berjêrtir tê lixwekirin û piranî aîdî mêran e
**şalgerdan** kefî
**şalok** kêlindî
**şalûfe** nanê lewaşe yê ku toraq, penîr û xwarinên din dikine navê û piştî rûnkirinê li ser sêlê dipijînin
**şalûl** çivîkeke dengxweş e; bilbil
**şalûz** melaq, laloş
**şalûzî** melaqtî, laloşî
**şalwar** cureyekî kincên derveyî yê ku bi ser derpêyî de tê lixwekirin
**şalyar 1.** walî, parêzgar **2.** wezîr
**şalyarî 1.** walîtî, parêzgarî **2.** wezîrtî
**şambelot 1.** cureyekî daran e **2.** berên vê darê yên ku qelandî tên xwarin
**şamik** elok, elelok
**şamirîşk** elok
**şamû** şehê ku pê hirî tê şikinandin
**şan [I]** mil
**şan [II] 1.** şohret, navdarî **2.** karê ku baş pê tê zanîn; pisporî *"dizî ne **şan**ê mêran e, para segan e"
**-şanê xwe derxistin** xwiyê xwe yî nebaş nîşan dan
**şanaz 1.** dilşa **2.** serbilind
**şanaz bûn 1.** dilşa bûn **2.** pê serbilind bûn
**şanazî 1.** îftixar, xawên **2.** serbilindî
**-cihê şanaziyê ye** layiqî îftixarê ye
**şancûl** bazin an jî pîjê

stûyê kûçikan
**şande** heyet
**şandin/dişîne/bişîne** bi rê kirin, hinartin
**şandî 1.** qasid **2.** peyamber
**şane [I] 1.** elamet **2.** cazibiyet *"bila lawik **şane** be, bila miaş qet tune be"
**şane [II]** cihê ku ji hin xaneyên biçûk pêk hatiye û mêşa hingivî hingivê xwe lê datîne; keware
**şane [III]** di laşê giyandaran de xaneyên biçûk; hucre
**-şaneya xwînê** hucreya xwînê
**şane [IV]** koxikê notirvanan
**şaner** çavdêr
**şanenas** pisporê di warê şaneyên giyaneweran de de
**şanenasî** zanistên ku lêkolînan li ser şaneyên giyaneweran dike
**şanenav** îmze
**şanese** kûçikê notirvanan
**şaneşîn** şanişîn
**şanik 1.** xal, deq, nîşan **2.** elamet, berate
**şanişîn 1.** cihê bêhnvedan û rûniştina şahî **2.** eywana li ser banî
**şanî 1.** nîşan **2.** rawêjer
**şanî dan 1.** nîşan dan **2.** pêşan dan **3.** araste kirin
**şano** berhema wêjeyî ya ku li ser dikê tê pêşandan
**şanogeh** cihê ku berhemên şanoyê lê tên pêşandan
**şanoger** lîstikvanê şanoyê
**şanogerî** hunera pêşkêşkirin û derhêneriya şanoyan
**şanşanok** lîstikeke zarokan e
**şapanosî kirin** karê xwe baş neanîn cih
**şapat 1.** karesat, bobelat **2.** ezab, xezeb
**şape** şepe, aşît
**şaper** per û baskên firindeyan
**şapik** cureyekî potikan ê ku mildirêj, bê pêsîr û bê bişkojk e
**şar [I]** bajar, şeher
**şar [II]** laçik, destmal *"serê min bi **şar** e, çi bikim dilê min bi jehr e"
**şarandin/dişarîne/bişarîne 1.** germ kirin **2.** dijwar kirin **3.** azirandin **4.** arandin
**şarax** ecûr
**şaredar** serokê belediyeya bajarekî
**şaredarî** belediyeya bajêr
**şarestûn** kêran
**şarestûn kirin** kêran avêtin ber

**şareza 1.** kesê ku li bajaran mezin bûye û hay ji çerxa felekê heye **2.** pispor **3.** zana **4.** beled
**şarezahî 1.** pisporî **2.** zanatî **3.** beledî **4.** pîşekarî
**-şarezahiya hunerî** pisporiya di qadekî an jî pîşeyekî de
**şarêz** nexweşiyeke pidûyên diranan e
**şaristan 1.** medeniyet **2.** avadanî
**şaristanî** têkildarî medeniyet û avadaniyê
**şarîn/dişare/bişare 1.** kel bûn, germ bûn **2.** arîn
**şaş [I]** kesê ku reşahiya çavên wî ne di cihên asayî de ne *"ji milkan aş, ji jinan jînên **şaş,** ji mêran mêrên ne bide pêş ne bide paş"
**şaş [II] 1.** çewt **2**. xulp **3.** kesê ku xwe ji ber tirsê an jî şermê ji bîr dike; şepirze
**şaş bûn 1.** xeletî kirin **2.** mat man **3.** şepirze bûn
**şaşik** egal
**-şaşik girêdan 1.** egal dan serê xwe **2.** pîneyekî tenik li dora serê xwe alandin
**şaşî [I] 1.** çewtî **2.** xulpî **3.** şepirzetî
**şaşî [II]** rewşa nebûna reşahiya çavan di cihên wan ên asayî de
**şaşî kirin 1.** çewtî kirin **2.** xulpî kirin **3.** şepirzetî kirin
**şaş kirin 1.** gêj kirin **2.** mat kirin
**şaş man** mat man
**şaşwaz** matmayî
**şaşwaz bûn** mat û mehtel mayîn
**şaşwaz kirin** mat û mehtel kirin
**şatik** katara stûyî
**şatir 1.** kesê ku kelûpel, nîşaniyên bûkan û nameyan digihîne xwediyên wan; pîlik **2.** hevalbend
**şato bato** tewş
**şato bato xeber dan** bi awayekî tewş axaftin
**şavêr** parav, çivêl
**şavêrî [I]** paravî, çivêlî
**şavêrî [II]** kêmîştahî, bêmehdetî
**şax 1**. çiya **2.** çiqilê darê **3.** bir **4.** malbend **5.** liq **6.** qiloç **7.** zîlê çêreyê
**-şax vedan 1.** zîl vedan **2.** bişku dan
**şaxur** zinar
**şayen** layiq, seza, hêja
**-şayenî pesnê** sezayî medhê, hêjayî pesnê
**şayese 1.** karê sêwirandî; teswîr **2.** xêz
**şayese kirin 1.** sêwiran-

din **2.** xêz kirin

**şayeste 1.** birûmet **2.** rêzdar

**şayid** bijîşk

**şayiş 1.** tatêl, keser **2.** tirtûl

**şayiş kişandin 1.** ketin tatêlê **2.** tirtûlê kulê pê girtin **3.** keser kişandin

**şazde 1.** hejmara beriya hevdehan û piştî pazdehan **2.** jimareya 16'an

**şazdehem*(-în)*** di rêza şazdehan de

**şe/şeh** alava şikinandina por û hiriyê

**-şeyê piyî** ji qeydika piyî hetanî serê tiliyan koma hestî û movikên ku di piyên mirovan de ye

**şeb** şew

**şebeng 1.** rengên ku ji rengên sereke hatine darijtin **2.** xeyala gerok a ku kesê di xewê de dibîne; qeretû

**-şebenga rojê** rengên keskesorê

**şebikîn/dişebike/bişebike** li hev alîn

**şefeq** aso, ufuq

**şefran** zehferan *"ker, çi dizane **şefran** çi ye"

**şeftalî** xox

**şeftûl 1.** xwar **2.** çewt

**şeher/şehir** bajar

**şehitandin/dişehitîne/bişehitîne** tiştê negotin û nekirinê gotin û kirin

**şehitîn/dişehite/bişehite** tiştê negotin û nekirinê qewimîn

**şehîd 1.** cangoriyê di riya Xwedê de **2.** pakrewan

**-şehîd ketin** di riya Xwedê de giyanê xwe dan *"riya azadiyê, bi xwîna **şehîd**an ronak dibe"

**şehîn** terazû

**şeh kirin** şikinandin

**şehmar** çilpê

**şehriyar** şaredar

**şehriyarî** şaredarî

**Şehrîwar** Kelûya Simbilê

**şeht** kêmlebatê ku nikare xwe li ser lingan bigire

**-şil û şeht** şileke û kêmlebat

**şehte** qiravî

**şehwet 1.** xwestek **2.** xwesteka zayendî

**şek 1.** lêdana sivik **2.** kîteyeke ku gava çend caran li ser hev tê gotin nêrî radibin ser lingên xwe yên paşîn **3.** beranê ji du salan mezintir

**-şek lê dan 1.** qorç lê dan **2.** du tişt hêdîka li hev xistin

**şekal 1.** cureyekî solên berê ye **2.** sola ku dawiya wê di bin lingan de hatiye şikandin û wisa hatiye pêkirin

**-şekal bi lingan ve kirin**

xort û xama zewicandin
**şekerok** kesê ku bi jinekî re direqise
**şekêrt** şikarte
**şekir** şirîniya ku ji silq û leveneke taybet tê bidestxistin *"Şam **şekir** e, lê welat şirîntir e"
**-şekirê hûr** şekirê hêrandî yê ku dişibihe êrd *"hevalê te bibe **şekirê hûr** jî, xelas meke"
**-şekirê kabik** şekirê ku çargoşe hatiye birîn
**-şekirê kaç** şekirê ku çargoşeye lê direj hatiye birîn
**-şekirê qend** şekirê ku weke kerpîçan hatiye birîn
**-şekirê heqîde** şekirê şûşekî
**şekirdank** amana ku şêkir dikinê
**şe kirin 1.** pê karîn, qedandin, şiyan **2.** şeh kirin
**şekirmiz** nexweşiyek e
**şekirnok** cureyekî şekirên ku nokeke qelandî dikine navê
**şekok** cureyekî fêkiyên çolê ye; hirmiya biyanî
**şel [I]** ronahiya nîvî
**şel [II]** parçeyê ku mezin hatiye qutkirin
**şelaf 1.** melaq **2.** laloş
**şelafî 1.** melaqî **2.** laloşî
**şelafî kirin 1.** melaqî kirin **2.** laloşî kirin
**şelal** giya û darên ji hev dûr mane
**şelal bûn** bi dûrî hev ketin
**şelal kirin** ji hev bi dûr xistin
**şelaq** qemçik
**şelaq kirin** bi qemçikan lê xistin
**şele/şeleg** barê piştan; piştî
**şelegan** her tiştê girs û mezin; geltegan
**şelik** parzûnê şîrdotinê yî ku didine ser devê qûşxaneyê û paşê didoşin
**şelipîn/dişelipe/bişelipe 1.** tehisîn, şiqitîn **2.** şehitîn
**şeliq** şilop
**şeliqîn/dişeliqe/bişeliqe 1.** *(çav)* êşîn û xerêf girtin **2.** *(şeq û binçeng)* kul bûn û pîrotankî bûn *"çavê **şeliqî,** ji ê kor çêtir e"
**şelîn/dişele/bişele 1.** *(mar)* bi ser zikê xwe kişîn û çûn **2.** wekî maran kişîn
**şelşelî** parçeparçeyî
**şelûf** cûcika nêr
**şemal 1.** rewneq **2.** rewşen **3.** çira
**-şemal dan 1.** rewneq dan **2.** rewşen bûn

**şemalk** find
**şemate** qalebalî û têkilhev-bûna dengan; dengûdor
**şembûz** sewala barkêş a nehs û eks
**şembûz bûn** *(sewala barkêş)* veciniqîn û nehs bûn
**şemendefir** navgîneke raguhastinê ya ku ji makîneyeke serkêş û çend selikên siwaran û baran pêk tê
**şemitandin/dişemitîne/bişemitîne 1.** şiqitandin, hilisandin **2.** gindirandin **3.** tîlê xistin
**şemitî 1.** şiqitî **2.** gindirî *"hevalê lingê **şemitî,** hey Xwedan e"
**şemitîn/dişemite/bişemite 1.** şiqitîn, hilisîn **2.** gindirîn *"hesp li ser çar lingan diçe, dîsa jî lingên wî **dişemitin** û dikeve"
**şemixîn/dişemixe/bişemixe** *(xurek)* afnikî bûn
**Şemî** roja piştî înê, roja yekemîna a hefteyê
**şemîtok 1.** şimşat, şimşimot **2.** qeşa û berfa ku li serê tê şiqitîn; tîl
**şemkur** pezkovî
**şemûk 1.** pêderî, bermal **2.** hevşî
**şemûz** şembûz
**şene** alaveke çandiniyê ya ku çend heb tiliyên wê hene û pê giya û zad tê berhevkirin; çartil
**-şene kirin** bi çartilê qirş û qeselê zevî û mêrgan berhev kirin
**şeng 1.** şên **2.** peroşmend **3.** kêfxweş
**şengal** kezwan
**şengebî** cureyekî daran e
**şengebûk** bûka bedew, şox û şeng
**şengist 1.** unsur **2.** hêman
**şengiste** cihokên ji bo xîmê avahiyekê kolandî; binetar
**şep** dengê lêdana bi kefa destî; tep
**şepal 1.** şêra mê **2.** bejna lihevhatî û xwînşirîn; bedew **3.** ferxê şêrî
**şepane** bizmar
**şepane dan** bizmar kirin
**şepe** aşît, renî
**şepêl 1.** pêl **2.** her pêleke rêzepêlan
**şepilandin/dişepilîne/bişepilîne 1.** ji devê xwe şehitandin **2.** xwe şepirze kirin
**şepilîn/dişepile/bişepile 1.** tengav bûn **2.** şepirze bûn
**şepirze 1.** pejmûrde, belawela **2.** perîşan, sefîl **3.** teqoze **4.** geveze

**şepirze bûn 1.** pejmûrde bûn **2.** perîşan bûn **3.** teqoze bûn **4.** geveze bûn

**şepirze kirin 1.** pejmûrde kirin **2.** perîşan kirin **3.** teqoze kirin **4.** geveze kirin

**şepîlk** çengên mirîşk û balindeyan

**şepop** kesê ku her çi karî bike kêmasiyekî tê de dihêle/dest û piyên wî li hev dialin

**şepol** şepêl

**şeq 1.** navbera her du lingên mirovan û sewalên dupêyî **2.** *(sewalên çarpê)* navbera her du lingên paşîn **3.** navrana kincên wekî şal, derpê, fanorî û hwd **4.** parçe **5.** derz, qelîştek **6.** dengê ji lêdana bi kefa destî tê

**-şeq lê vedan 1.** lê siwar bûn û her lingek di aliyekî de daliqandin **2.** *(sewalê nêr)* daketin *(a mê)* **3.** ling lê dan hev

**şeqam** lêxistina bi kefa destî; sîle

**şeq bûn** di navê de qelişîn

**şeq kirin** di navê de qelişandin

**şeqe** kergît

**şeqên** dengê levketina du tiştên req

**şeqil** mohr, demxe

**şeqitandin/dişeqitîne/bişeqitîne 1.** fizirandin **2.** dan aliyekî

**şeqitîn/dişeqite/bişeqite 1.** fizirîn **2.** xwe dan aliyekî

**şeqizîn/dişeqize/bişeqize 1.** şerm kirin, fedî kirin **2.** şaşwaz bûn **3.** neçar bûn

**şeqle** darên ku ji bo şewitandinê hatine şeqşeqîkirin; êzing

**şeqopîlo 1.** şeqşeqî **2.** derzderzî **3.** qelşqelşî

**şeqopîlo bûn 1.** di navranê de şeqşeqî bûn **2.** derzderzî bûn **3.** qelşqelşî bûn

**şeqopîlo kirin 1.** di navranê de şeqşeqî kirin **2.** derzderzî kirin **3.** qelşqelşî kirin

**şeqşeqî 1.** şelşelî, parçeparçeyî **2.** şeqopîlo

**şeqşewêl** jina nelirê; qehbik

**şer 1.** ceng **2.** pevçûn ***"şer,** bi tifinga vala nabe**"**

**-şerê bejî** şerê li ser rûyê erdê

**-şerê bigirbikujiyê** şerê xwînxuran ê li dijî reben û repalan

**-şerê eniyê** di bereyekî de cenga du artêşan

**-şerê fezayî** şerê li seqayê

**-şerê germ** şerê rû bi rû;

şerê eniyê
**-şerê piştzeryayî** şerê ku di parzemîneke cihê de tê meşandin
**-şerê sar** şerê navtêdan, berîdan û tevdanê; şerê dek û dolaban
**-şerê zeryayî** şerê di nav behran de
**şeranî** lîstikeke govendan e û bi pêgiranî tê lîstin *"bûye marê nîvkuştî, hê jî **şeranî** dilîze"
**şerbet** vexwarina ku ji ava mêweyên guvaştî, şekir û avê tê çêkirin
**şerbik** tasa avê ya biçembil *"**şerbik** nû ye, av şirîn e"
**şer derxistin** bûn sedema pevçûnan
**şeredev** devjenî
**şeref 1.** heysiyet **2.** rûmet **3.** rêzdariya li nav civakê *"**şeref,** ji heyatê hêjatir e"
**şerenîx** şeredev
**şerfiroş** kesê ku her dem li şer û têkdanê digere
**şergeh** qada ceng û pevçûnê
**şerîet 1.** hiqûqa îslamî **2.** ola bi zagon û pergal *"**şerîet,** şermê naxwaze"
**şerkar** pîşekarê cengê
**şer kirin 1.** bi yekî re li hev xistin; cengîn **2.** lê bezîn
**şerm** eyb, fedî *"di dinyayê de **şerm** tunebe, hurmet jî tuneye"
**şermezar 1.** kesê ku karekî neyînî kiriye **2.** riswa
**şermezar bûn 1.** *(ji ber karekî neyînî ve)* li ber xwe ketin **2.** riswa bûn
**şermezarî** rewşa kesê ku karekî neyînî kiriye an jî ji ber karekî neyînî riswa bûye
**şermezar kirin 1.** *(ji ber neyîniyekê)* bertek nîşan dan **2.** derew derxistin **3.** riswa kirin
**şermgeh 1.** ewret **2.** navran
**şermîn** şermoke *"jina **şermîn** bi şarekî, mêrê şermîn bi karekî"
**şermînî** di mirovan de rewişt an jî nexweşiya şermê
**şerm kirin 1.** fedî kirin **2.** mehcûb bûn *"bide metirse, bixwaze û bistîne lê **şerm meke"**
**şermoke** fediyok, şeqizok
**şeroke 1.** kesê ku pir şer û pevçûnan dike **2.** kesê ku ji şer û pevçûnan pir hez dike
**şerpeze** şepirze
**şerpilîn/dişerpile/bişerpile** feşkilîn

**şerpîn** barişa boş
**şert** merc
**-şert danîn** bi hev re ketin mercê
**şerûd** kesê ku bi her kesî re li hev dixe; şeroke
**şervan** çekdarê ku karê wî berevaniya welat û rastiyê ye; şerkar
**şerxwaz** kesê ku cengê ser aşitiyê re digire
**şeş 1.** hejmara piştî pêncan û beriya heftan **2.** jimareya 6'an *“meha **şeş**an, kuran bibe hewşan, keçan dayne ser merşan”
**şeşalî** şeşgoşe
**şeşbêj** kesê ku gelekî diaxive û mijaran têkel dike; pirbêj
**şeşek 1.** ji şeş paran parek **2.** şeş rojiyên piştî cejna remazanê
**-şeşek girtin** di şeş rojên pêşîn ên meha şewalê de rojiya nafile girtin
**şeşem*(-în)*** di rêza şeşan de
**şeşerût 1.** pêgirtî, xulamok **2.** têjikên nebaşiyê
**şeşgoşe** şêweyekî endazeyî yê ku ji şeş rexan pêk hatiye; şeşalî
**şeşik 1.** kevirên bi qasî bindeq û gûzan **2.** cureyekî lîstikên zarokan a ku bi şeş şeşikan *(kevirên biçûk)* tê lîstin
**-li ser îmana xwe şeşik lîstin** di baweriya xwe de pir sist bûn
**şeşkujî** şeşgoşe
**şeşper [I]** cureyekî şalên mêran ê fireh e
**şeşper [II]** cureyekî gurzên cengê ye û ji şeş parçeyan pêk tê
**şeşxane** cureyekî tifingên ku şeş fîşeng dikevin ber
**şet** xwar
**şetele 1.** şepe, renî, aşît **2.** teşqele, karesat
**-şeteleyek jê re hatin** tûşî karesatekê hatin
**şetrenc** sedrenc
**şev 1.** ji avabûna rojê hetanî elindê duwazde saetên ku cîhan tê de tarî dibe; êvar **2.** tarîban *“**şev**a reş, keleha mêran e”
**-bi şev 1.** êvarê **2.** di tariyê de, piştî tarîbanan
**-şev bi ser de hatin 1.** heta tarîbanan kudandin **2.** hetanî êvarê axaftina xwe dirêj kirin
**şevane 1.** karê ku bi şev tê kirin **2.** mûçeya ku ji bo keda şevekî tê dayîn **3.** tiştê ku her şev pêk tê
**şevbihurk** sohbeta êvaran a ku heta nîvê şevê didome
**şeveder** kesê ku şeva xwe

dûrî malê dibuhirîne
**şevekor** kesê ku di şevereşê de baş nabîne an jî bi roj rengan ji hev venaqetîne
**şevereş 1.** êvara zîz a ku heyv tê de xuya nabe **2.** tarîtî *"heke diz hebin, **şevereş** gelek in"
**şevger** kesê ku di xewê de ji nivîna xwe radibe û digere
**şevî** şevek bi ser re derbasbûyî
**şevîn 1.** çêrandina şevê **2.** têkildarî şevê
**şevnimêj 1.** tehecud **2.** nafile
**şevşevok** barçêmk
**şexte** zîpikên girs; teyrok
**şevtirsk** nexweşiya ji şevereşê
**şevyar** nêçîra bi şevê
**şew** dermanekê şîn î gelêrî ye û ji bo pir mebestan tê bikaranîn *"**şew** û şekir, li ba şivanan yek in"
**-şew û şekir ji hev nas nekirin** başî û nebaşî ji hev veneqetandin
**şewat 1.** sotin **2.** agirpêketin **3.** jan *"**şewat** bi erdê keve, ter û hişk tev dişewitin"
**-şewat berdan dilan** pir êşandin
**şewate 1.** ardû **2.** agirê ku pê êgir pê dixin

**şewb** nexweşiyeke sewalan e
**-şewba çivîkan** qira sewalên bibaskên malê û firindeyên çolê; dimşînk, nikilreş
**şewişandin/dişewişîne/bişewişîne** çelqandin
**şewişîn/dişewişe/bişewişe 1.** tehisîn **2.** milmilîn, weşweşîn
**şewitandin/dişewitîne/bişewitîne 1.** pê xistin **2.** sotandin **3.** êşandin
**şewitîn/dişewite/bişewite 1.** pê ketin **2.** sotin *"divê mirov di agirê mezin de **bişewite**"
**şewk** çengala ku pê masî tên girtin; sincaq
**şewl** şemal, rewneq
**şewl dan** rewneq dan
**şewlok** amûreke gêrebayî ya ku piştî çûna gêrebayê tê pêxistin
**şewlpîv** amûra ku leza rewneqa heyî dipîve
**şewq 1.** şemal **2.** ronahî **3.** çirûska boş *"dilê fireh, **şewq** û çira ye"
**-şewq vedan** çirûsk vedan
**-şewqê dan newqê** tu dibêjî qey pir pak e lê di rastiyê de ne wisa ye
**şeyda** sewdaser
**şeydatî** sewdaserî
**şeyîn/dişeye/bişeye**

*(hesp)* hîrîn, şêyeşê kirin
**şeyt 1.** toterîk **2.** taye
**şeytan** cinê ku ji Cn. Adem eleyhiselamî re sicde nebiriye, Iblîs *"**şeytan**ê merivan, bi merivan re ye"
**-şeytan dibêje...** heke li dû nefsa xwe herim ez dê...
**-şeytan pê kenîn** cinabet bûn
**-şeytên zor dayê** nefsê zor lê kir ku ji rê derxe
**şeytanî** fesadî û xirabî
**şeytanî kirin** fesadiya hinekan li ba hinekên din kirin
**şeytanok** cureyekî bihukên ku di qalikekî helezonî de ye û pir dereng dimeşe
**şê** dengê hîrehîra hespan
**şêl 1.** kêla dirûnê **2.** dirûnên girs
**şêlandin/dişêlîne/bişêlîne [I]** hêk meyandin
**şêlandin/dişêlîne/bişêlîne [II] 1.** xesp û kosp kirin **2.** talan kirin **3.** dizîn
**şêlav 1.** lehî, lêkend **2.** coşî û peroşî
**şêlavk 1.** ava kils an jî boyaxê ya ku pê dîwar tên rengandin **2.** ava şêlo
**şêlik** cureyekî zêd e û dişibihe nîskên kesk
**şêlim** cureyekî sewziyên ji malbata tiviran e
**şêlimtirşk** tirşiya şêliman
**şêlî** nezelal
**şêlî bûn 1.** zelaliya tiştê avî winda bûn **2.** zelaliya bînahiya çavan winda bûn *"av, di serekaniyê de **şêlî dibe**"
**şêlî kirin 1.** zelaliya tiştê avî winda kirin **2.** zelaliya bînahiya çavan winda kirin
**şêlîn/dişêle/bişêle** *(hêk)* meyîn
**şêl kirin 1.** kêl kirin **2**. girs dirûn
**-şêl li şintira xwe nexistin** gincirên xwe nedirûn û pê de daliqîn
**şêlo** şêlî
**şêlşêlî kirin 1.** kêlkêlî kirin **2.** bi kêlên girs û serobero dirûn
**şêmûg** pêderî
**şên** dilveker, şeng û şox
**şênahî 1.** şengî û şoxî **2.** rengînî *"herin **şênahi**yan, pirs bikin ji zarokan"
**şênber 1.** tiştê berbiçav **2.** dîtî û bînayî
**şênî 1.** niştecih, akincih **2.** dêman, ehalî
**şên kirin** bûn sedema kêfxweşiyê
**şêr 1.** cureyekî heywanên çolê ye û dişibihe pilin-

gan lê serconcix e **2.** egîd *“cihê **şêr**an, rovî lê dikin gêran”
**şêrane 1.** wekî şêran **2.** kesê çavnetirs
**şêranî 1.** şêrkî **2.** wêrekî **3.** egîdî
**şêrdil** mêrxas
**şêrejin** jina wekî şêran
**şêrgeh** warê şêran
**şêrpence** penceşêr, cureyekî nexweşiyê ye
**şêrza** têjikê şêran
**şêst** hejmara 60'î, deh heb şeş
**şêstem*(-în)*** di rêza şêstan de
**şêt [I] 1.** dînik **2.** totikvala
**-şêt bûn** dîn bûn
**-şêt kirin** dîn kirin
**şêt [II] 1.** kêzim **2.** şiva mezin
**şêtî 1.** dîntî **2.** totikvalatî
**şêtxane** nexweşxaneya dînan
**şêwaz 1.** uslûb, fesal **2.** awa, tehr
**şêwe** çawaniya pêkhatina tiştan
**-şêwe û naverok** dîtbariya hundirîn û derveyî
**-bi vî şêweyî** bi vî awayî
**şêwekar** kesê ku ji têlên zîvîn xemlan çêdike
**şêwekarî** hunera zîvhûnanê
**şêwenasî** zanistên ku pisporiya wan li ser naskirina şekl, dirûv û awayê wan e
**şêwirgeh** cihê danûstana agehiyan
**şêwirîn/dişêwire/bişêwire 1.** ramana yekî wergirtin **2.** danûstan *“berê **bişêwire,** pişt re bikire”
**şêwirmend** hêvojkarê agehiyên durist; rawêjer
**şêwr** di babetekî de wergirtina ramana pisporekî; rawêj *“**şêwr,** bi dînan re nabe”
**-şêwr gerandin** li hev civîn û babetek nîqaş kirin
**şêx** serokê terîqetê *“**şêx** ne batil in, bi serê wan de hatine”
**şêxanî** cureyekî lîstika govendê ye
**şêyeşê** dengê hîrehîra hespan
**şêyeşê kirin** *(hesp)* hîrehîr kirin
**şêz 1.** cureyekî geneyên bizinan e **2.** mêşa hespan
**şibake** pace
**şibihandin/dişibîne/bişibihîne** tiştek *(di taybetmendiyan de)* wekî tiştekî din dîtin
**şibihîn/dişibihe/bişibihe** tiştek *(di taybetmendiyan de)* wekî tiştekî din bûn

**şidandin/dişidîne/bişidîne 1.** guvaştin **2.** quraftin **3.** pêçan **4.** muhkem girêdan **5.** paçik kirin
**şidîn/dişide/bişide 1.** muhkem bûn **2.** lê hatin hev **3.** xurt bûn
**şifa** pakbûna ji nexweşiyekê
**-şifa dîtin** ji nexweşiyê rizgar bûn
**şifre** razepeyv
**-şifre avêtin ber** razepeyvek jê re çêkirin
**şiftî** zebeş
**şik** guman, şubhe
**şikandin/dişkîne/bişkîne** şikandin
**şikarte 1.** kel û melên aîdî jinê **2.** çandiniya kesê ku cot û cobarê wî bi xwe tuneye
**şikbir 1.** pêhesiyayî **2.** navtêdayî
**şik birin 1.** pê hesîn **2.** guman kirin
**şikdar** waswasok
**şikev 1.** teşta nanî **2.** cureyekî navgînên ser avê; kelek
**şikevik 1.** xweliya ku pê kûzik tên çêkirin **2.** cêrik
**şikêr** li çiyan qelîştek û çalên kûr û asê
**şikinandin/dişkine/bişkine 1.** por şeh kirin **2.** hirî, liva û mû bi şehî zax kirin
**şikîn/dişkê/bişkê** şkîn
**şikra** bi mebesta..., bi niyêta...
**-şikra sibehê ve** bi niyêta sibehê ve
**şil [I] 1.** tiştê ku aviyek tê geriyaye; neziwa **2.** avî **3.** bi têhn *"ban qul be, binban **şil e"**
**-şil bûn 1.** av bi ser de rijîn **2.** baran bi ser de rijîn
**-şil û pil bûn** ser û kinc giş bûne weke avê
**-şil kirin 1.** av bi ser de rijandin **2.** li ber av an jî baranê dan sekinandin *"barana havînê, **şil kir** binê kulînê**"**
**şil [II] 1.** şileke **2.** kêmendam
**-şil bûn** seqet man
**şilahî 1.** rewşa têgerîna aviyekê; neziwatî **2.** rewşa seqetmanê
**şile 1.** cureyekî gulan e **2.** ava mêweyên guvaştî
**şilegewr** rengê ku bêteşe ye û baş diyar nabe
**şileke 1.** kesê ku endameke wî felc bûye; goc **2.** nivîşkan, kêmlebat
**şilemenî 1**. şilahî, têhnahî **2.** tiştên avî
**şilepor** endamê zayendî yê jinan

**şilêl** giloka hewirmişî
**şilf** **1.** kêrik **2.** rût
**-şilf û tazî** rût û repal
**şilfik** **1.** di alavên qutkirinê de beşa hesinî **2.** rût û uryan
**şilik** nermahiya di serê zarokên viringî de
**şilî** **1.** baran, bariş **2.** têhnahî
**-şilî û şoyî** baran û lêkend
**şilop** kinîşt
**şilope** barana ku berf jî pê re dibare
**şilopilo** tiştê ku riwînek bi ser de rijiyaye
**şilopilo bûn** tiştê avî bi ser de rijîn
**şilove** berfa ku dihele
**şiloxe** bendikên solan
**şilp** dengê şeqamê û şepilandina dêv
**şilpeşilp** **1.** dengê birêveçûna di nava avê de **2.** dengê şepilandina dêv
**şilpeşilp kirin** **1.** xwişexwiş kirin **2.** milçemilç kirin
**şilûr** tiriyên negihiştî
**şilxe** refeke mêşhingivan
**şim** sola werzişê ya sivik
**şima** finda ku ji kewara mêşhingivan hatiye bidestxistin
**şimareng** cîleya biriqandinê
**şimaşe** keşe
**şimik** pêlavên dorvekirî û qulqulî, galik, pêpûçk
**-ji şimikê heta kumikê** ji kincên seran hetanî kincên lingan
**şimşal** **1.** bilûr **2.** pîpik
**şimşat** şemîtok
**şimşimot** şemîtok
**şimşîr** **1.** şûr **2.** cureyekî darên ku belçikên wê tim şîn in
**şindok** **1.** nemêr **2.** bêkêr
**-şindokê mêran** kesê ku di dilqê mêran de ye lê tu mêranî jê nayê
**şing** **1.** dengê şikestina şûşeyan **2.** dengê bilind ê herikîna avê; xwiş, xwişexwiş
**şingandin/dişingîne/bişingîne** **1.** çingandin **2.** şeqeşeq kirin **3.** xwişexwiş kirin
**şingîn/dişinge/bişinge** **1.** dengê şikestina şûşeyan jê hatin **2.** dengê bilind ê herikîna avê jê hatin; xwişîn *"gulan e, **şingîn**a dasan e"
**şingînî** dengê şingînê
**şingeşing** şingîniya domdar
**-şingeşinga nalan û hîrehîra hespan** dengên têvel ên şer û talanê
**şintir** gincir
**şintirandin/dişintirîne/bişintirîne** **1.** şandin hatenehatê **2.** têk bi-

rin

**şintirîn/dişintire/bişintire 1.** çûn helakê, çûn hatenehatê **2.** têk çûn

**şip-** pêşgireke ku wateya heyî xurtir dike

**-şipşidiyayî** baş-şidiyayî

**-şipşîn** şînê esmanê çiksayî

**şipne** şene, xermaşe

**şiqitîn/dişiqite/bişiqite 1.** şimitîn **2.** xijikîn *"bi dest **bişiqitî** dikari xwe bigirî, bi ling bişiqitî dikarî xwe bigirî, lê bi zimên bişiqitî tu dê herî û herî"

**şir 1.** tembel **2.** westiyayî **3.** dengê xurt ê barana boş

**şiratî** teralî

**şir bûn 1.** xav bûn **2.** bêzar bûn

**şirb** cureyekî daran e

**şirdan** gerdenî *"**şirdan**a zêran winda kir, pey moriya hecîyekî sêsed gaz rê da ber xwe"

**şirebaran** barana boş a bi deng

**şireşir** xwişexwiş

**şireşir kirin** xwişexwiş kirin

**şirên** xwişexwiş

**şirik 1.** qulik **2.** rêşî **3.** gulik *"**şirîk** şirîkan jîr dikin, hêwî hêwiyan pîr dikin"

**şirikşirikî** gulikgulikî

**şiringe** amûra ku pê dermanên avkî li nexweşan tê xistin

**şirîk 1.** hevkar, hevpişk **2.** hevpar *"simbil bû firîk, mele bû **şirîk**"

**şirîn [I] 1.** şekirîn **2.** tahmxweş

**şirînahî** çêja tiştên şekirîn

**şirîn bûn 1.** tahma şêkir tê de hebûn **2.** tahmxweş bûn *"bi gotina helawê, dev **şîrîn nabe**"

**-şirîn kirin 1.** tahma şêkir tê de pêk anîn **2**. tahmxweş kirin

**şirîn [II] 1.** bedew **2.** qeşeng *"kezeb çiqasî **şirîn** be, şîret jê re ewqas şirîntir e"

**şirînmeh** meha pêşîn a bûk û zavê

**şirît** weris

**şirjaw** layiq, seza

**şirjaw bûn** layiq bûn

**şirjaw dîtin** layiq dîtin

**şir kirin** sistî kirin û xwe ranegirtin

**şirp 1.** tavilê **2.** ji nişkê ve **3.** bê navber û pê re

**şirtik** zirîçka çavan; şirav

**şitil** darên viringî an jî çiqilê daran ê ku ji nû ve tên çikandin

**şitilgeh 1.** zeviya şitilan **2.** firoşgeha şitilan

**şitî** şimşat

**şitî bûn** şimşat bûn
**şitî kirin 1.** şimşat kirin **2.** rihê xwe baş kur kirin
**şito** kesê ku rihê xwe kurkiriye û fortê bedewbûna xwe dike
**şiv** çiqekî darê yî nîvreq e û şivan pê pêz diajon; ço
**şivan** kesê ku diçe ber pêz û wan diçêrîne; çovan *“**şivan**ê jêhatî, pêz nade guran”
**şiverê** riya teng a ku tenê bi piyan tê de tê meşîn
**şivir** cureyekî sewalên çarpê yên çolê ye; ask
**şivî** xêza çikeçik
**şivîşiviyî** tiştê ku tê de xêzên çikeçik hene
**şiwîn** berhem, karpêk
**şiwît** cureyekî çêreya ku nepijî tê xwarin; qiçî
**şixab** behreme
**şixate** qutiya kibrîtan
**şixir 1.** dara bêber **2.** palanê darînî
**şixre** neqlkirina çandiniyê ji zeviyê li bal bênderê ve
**şixul 1.** kar **2.** xebat **3.** îş *“aş **şixul**ê xwe dike, çeqçeqok diranê xwe dişkîne”
**şixulandin/dişixulîne/bişixulîne** xebitandin
**şixulîn/dişixule/bişixule 1.** xebitîn **2.** *(pêketina êgir)* domdar bûn
**şiyan/dişê/bişê 1.** pê karîn **2.** pêk anîn
**şîfon** qedîfe
**şîlan** cureyekî mêweyan e *“demek a gulê ye, yek a şîlanê ye”
**şîlaq** parçeyê biyanî yê ku dikeve çavan û pê diêşin
**şîlav** xweşav
**şîlavk** endamekî ku pişt aşikê ve ye û xwe digihîne rûviya duwazdegirê
**şîmk** pêderî
**şîn [I] 1.** reşgirêdan; matem **2.** taziye *“**şîn**a tev êlê şahî ye”
**-şîn girêdan** reş girêdan
**şîn [I]** rengê esmên; hêşîn
**şîndar** kesê ku kesekî wî miriye; xembar
**şîne** rengê dişibihe şîn
**şînboz** rengekî di navbera şîn û kesk de ye
**şînok** cureyekî daran e; kezwan
**şîqeşîq** dengê domdar ê cûtina benîştî an jî rêveçûna sewalên naldar
**şîp** ava herikbar a ku ji cihekî bilind dirije
**şîpik** şîpê biçûk
**şîr** adana ku di her guhanî de heye *“**şîr**ê kerê, ji cehşa kerê re ye”
**-şîrê helal mêtin** di malekê qenc de hatin dinyayê û wisa jî mezin bûn

-**şîrê zikmakî ji dêv û pozî re anîn** pir tengezar kirin

**şîranî** xwarinên ku şekir dikeve tev

**şîrbirak** du kesên ku şîrê diyekê mêtine

**şîrbirinc** cureyekî xwarina ku ji şîr, şekir û birincî tê çêkirin; birinceşîr

**şîrder** sewalên bi şîrê guhanên xwe têjikên xwe dimêjînin

**şîre 1.** ava rehekan **2.** keresteyekê çir ê ku pê pirç tên rûçikandin

**şîregermî 1.** saregermî **2.** ava hênik *"ava biharê çiqasî **şîregermî** bibe jî, nikare birincî bipijîne"

**şîret 1.** nesihet **2.** tembîh **3.** hêvojkarî *"heta **şîret**an li xelqê dikî, qûna xwe bişo"

-**şîret lê kirin** tembîh kirin, hêvotin

**şîreve kirin 1.** zarok/sexele ji şîr veqetandin **2.** zarok hînî xwarinê/sexele hînî çêrînê kirin

**şîrêz 1.** çêreyeke ku jê zeliqok/çesp tê bi destxistin **2.** zemq *"helaw, ji **şîrêz**ê çênabe"

**şîrêz kirin** bi hev ve zeliqandin

**şîrfiroş** firoşkarê adana ku ji guhanên sewalan hatiye dotin

**şîrhe** dîwar

**şîrhe kirin** dîwar kirin

**şîrheram 1.** bêar **2.** nebaş

**şîrheramî 1.** bêarî **2.** nebaşî

**şîrî** di rengê şîr de

**şîrmaq** şeqam, sîle *"**şîrmaq,** li gorî rû ye"

**şîrove kirin 1.** rave kirin **2.** îzah kirin

**şîroveker** raveker

**şîrqandin/dişîrqîne/bişîrqîne** dengê birûskê yî tîz ji tiştekî derxistin

**şîrqîn/dişîrqe/bişîrqe** dengê birûskê yî tîz jê hatin

**şîrqînî** dengê birûskê yî tîz

**şîrşêrk** cureyekî şirînahiya ku ji şîr, şekir û ardê birincî tê çêkirin

**şîş** hesinekî dirêj î zirav ê ku ji bo pir armancan tê bikaranîn

-***(tiştek)* şîşî cihekî kirin** tê re kirin

**şîşik** tîrikên hesinî yên ku pê fayke, gore û hwd tên hûnan

**şîş kirin 1.** bi şîşan jê re sîperek kirin **2.** tê re kirin

**şît [I]** şimşat, tîl

**şît [II]** aşît, şepe

**şît [III]** zêrevan *“mirovê **şît,** bi dilê pît?”

**şîv** xwarina danê êvarê *“axayê me Pilo, **şîv**a kerê me bû çilo”

**-şîva miriyan** sedeqeya serê miriyan a ku xizmên wan ên sax didine xizanan

**şîvik** xwêdana ku bi laşê mirovî ve dizeliqe

**şkandin/dişkîne/bişkîne** **1.** şkestandin, parçe kirin **2.** derizandin **3.** derb lê xistin

**şkeft** kunên mezinên di çiya û erdê de; mixare

**şkestek** **1.** derz, cerx, qelş **2.** derb

**şkestin/dişkê/bişkê** **1.** derizîn **2.** derbe xwarin **3.** hûr bûn *“bextê feqîran hebûya, gîsnê wan di axa nerm de **nedişkiya**”

**şkestî** **1.** derizî **2.** derbexur *“jin darê **şkestî** ye”

**şkev** nanê ku ji hevîrê bêhevîrtirş hatiye pehtin; lewaş

**şkevik** çaviyên terazûyê

**şkêr** **1.** zinarên mezin **2.** hendef **3.** qûçê keviran

**şkêvlatok** kûsî

**şkinandin/dişkine/bişkine** şeh kirin

**şkîn/dişkê/bişkê** *“cêr di riya avê de **dişkê**”

**şofar** sîxur

**şofarî** sîxurî

**şohret** navdarî *“**şohret**a çeman dar û bî, şohreta bûkan şar û temezî”

**şom** bêpêpal, bêyom

**şonik** darikê ku pê kinc û hiriyê dişon

**şop** **1.** dews **2.** rêç **3.** delav *“hirç dîtiye, li dû **şop**ê diçe”

**şopger** **1.** rêçajo **2.** delavdayî

**şop gerandin** rêç ajotin

**şopik** **1.** zirzeya deriyê darînî **2.** endamê zayendî yê nêrzayan

**şop vekirin** **1**. delav dan **2.** rê vekirin

**şor [I]** bixwê, tirş *“şirîn û **şor,** keçel û kor, li cem hev nabin”

**şor [II]** xeberdan, gotin *“**şor**a xirab, zû digihêje şûna xwe”

**-şorê berê** gotinên pêşiyan

**şor [III]** nizmkirî, daxistî

**-şor bûn** çemîn

**-şor kirin** çemandin

**-lêva xwe şor kirin** lêva xwe çemandin/daxistin

**şoravk** **1.** ava bixwê ya ku penîrê teze dikinê **2.** ava

tirşînê
**şorax** erdê şorge
**şorbe** cureyekî xurekê avkî ye *“**şorbe,** zik dike torbe”
**şorbehûr** xurekê ku ji hûr û pizûran tê çêkirin
**şorbenîsk** xurekê ku bi nîskan tê çêkirin
**şorbeşîr** xurekê ku ji şîr û pirinc tê çêkirin; şîrbirinc
**şorebî** cureyekî daran e
**şoreş** xebata çekdarî ya ji bo standina mafekê rewa
**şoreşger/şoreşvan** endamê xebata çekdarî ya ji bo standina mafekê rewa
**şoreşgerî** doza mafekî rewa bi riya muxalefeteke çekdar
**şorge** erdê ku di xweliya wê de şorahî heye û çêre lê hêşîn nabe
**şoristan** şorge
**şorxweş** zimanşîrîn
**şoşban** birazava *“kî **şoşban** e, ew poşman e”
**şov** zeviya cotkirî ya neçandî
**-şov hiştin** erd cot kirin û di wê salê de neçandin
**-şov kirin** erd cot kirin lê neçandin û sala dîtir çandin
**şox û şeng** **1.** çîç û vîç **2.** cazibedar **3.** jina qûnek *“**şox û şeng** e, bi nav û deng e”
**şulux** kesê ku dike qîjevîj; qîjqîjok
**şuluxî** qîjevîj
**şuluxî kirin** qîjevîj kirin
**şun** paş
**-şun de çûn** paş ve çûn
**-şun de xistin** paş ve xistin
**-şun de man** paş de man
**şutî** şitî
**şû** hevser
**şûbira** birayê mêrê bûkê; tiyê bûkê
**şûjin** derziyeke stûr e û pê devê bardan û têrikan tê dirûtin; bijûn *“bi derziyê neçe ser **şûjin**ê”
**şûkil** hevserê nazenîn
**şû kirin** **1.** mêr kirin **2.** zewicîn
**şûl [I]** hevûrî
**şûl [II]** şêl
**-şûl kirin** şêl kirin
**şûm** nehs
**şûm bûn** nehs bûn
**şûmirî** **1.** jinebî **2.** mêrebî
**şûmî** nehsî
**şûm kirin** nehs kirin
**şûn** **1.** dews **2.** war **3.** cih *“kevirê giran, di **şûn**a xwe de birûmet e”
**-şûna yekî girtin** **1.** cînişîniya yekî kirin **2.**

dewsa yekî vala nehiştin
**-şûna bav/dê/xwîşk/birayê min de ye** ez bi çavê nebaşiyê lê nanihêrim
**-şûna zarokî guherandin** binê wî paqij kirin û bi pîneyên paqij girêdan
**şûndiyarî** xelata ku berdêla xelateke dayî ye *“diyarî qesp e, **şûndiyarî** hesp e”
**şûnewar 1.** mekan **2.** welat
**-şûnewarên kevn** kevnewarên dîrokî
**şûnguhêztin** cihguherandin, levguherandin
**şûnkar** kesê ku li şûna berpirsekî kar dike; cîgir
**şûnpê/şûnpêk 1.** dewsa piyan a ku li ser axê, heriyê û berfê diyar dibe
**şûntilk** dewsa tiliyan a ku li ser berf, herî û hwd diyar dibe
**şûr** çeka hesinî a ku berê şervanan pê ceng dikir *“**şûr**ê tazî, xwînê dixwaze”
**şûrbaz** kesê ku şûran baş bi kar tîne
**şûre 1.** barût **2.** pîşo
**şûrkêş** kesê ku jidil û bi awayekî pisporane beravaniyê dike
**şûrmasî** cureyekî masiyên zeryayî ye û nikilê wî dirêj e
**şûş** leclecok
**şûşe** bûjeneke şkestok û zebloq a ku jê camên paceyan û hwd tê çêkirin; abegîne *“dil weke **şûşe**yê ye û zû dişkê, lê dereng dicebire”
**şûşî kirin** *(di zimanê zarokan de)* şûştin
**şûştin/dişo/bişo** bi avê paqij kirin *“mêran mêr kuşt, Senemê hûrî **şûşt**”
**-bi heft ava hatiye şûştin 1.** pir paqij e û hatiye tehfîrkirin **2.** pir baş e **3.** zelal e
**-şûşt ji heriyê avête ser dara diriyê** ji dêla ku kil bike çav derxistin
**şût [I]** şeklekî ku binê wê biber û girover e lê serê wê kêmber û tûj e
**şût [II] 1.** kone, xasûk **2.** bênamûs
**şûtik** kembera navê
**şûv** şov *“bila şêrê **şûv**ê be, bila ne qopqopê bênderê be”
**şûv hiştîn** şov hiştn

# T

**t/T** tîpa bîst û çaremîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê diranî ye, awayê belavbûna wê girtî û hişk e

**ta [I] 1.** bend **2.** têla porî *"**ta** bi ta dibe rih"

**-tayê li dû şûjinê** kesê ku hevsarê kar û barên wî di destê hinekan de ye

**-ew tayê tenê ye** piştmêrên wî tunene

**-tayekî jê bikşînî sed pîne dê jê bikevin 1.** tu dibêjî qerpal êdî riziyane **2.** pîneyên kincan bi tayekî bi hev ve sekinîne

**ta [II]** teref, alî

**-tayî hev kirin 1**. danîn ber hev **2.** rû bi rûyî hev kirin **3.** qiyas kirin **4.** hevrû kirin *"jin dirêse, belê nizane **tayî hev bike"**

**-ta girtin** alî girtin

**ta [III]** qat, taq

**ta [IV]** cureyekî nexweşiyê ye *"**ta,** ji mirinê çêtir e"

**-ta lê rabûn** heraret lê rabûn

**-lerza tayê** *(ji ber hrarета nexweşiyê)* awayekî ricafa xeternak e

**ta [V]** hinkuf, deng

**-tayê terazûyê** tasikeke te-razûyê

**-tayî wî kes tune** dengî wî kes nîn e

**ta [VI]** heta

**-ta roja îroyîn** hetanî vê rojê

**ta [VII]** çiqê darê

**tab** roniya rojê

**tabir** dermanên dijî nexweşiya tayê

**tabût 1.** darbesta miriyan **2.** qûn, tilor

**tac** pûşiya serê mîran a ku elameta serweriyê ye *"aqil **tac**a zêrîn e, li serê her kesî nîn e"

**taf 1.** bela **2.** nexweşî

**tafîl/tafîr** tehfîr

**taet** ibadet, bendetî *"xewa aliman, çêtir e ji **taet**ên sofiyan"

**tagir** terefgir, alîgir

**tagirî** alîgirî

**tagirî kirin** alîgirî kirin

**tahde 1.** zulm, sitem **2.** azar

**-tahde lê kirin 1.** bi nehe-

qî lê dan **2.** azar lê kirin
**tahm 1.** seheka ku ziman tê derdixe **2.** çêj *"her kes, **tahm**a devê xwe dizane"
**tahmijîn/ditahmije/bitahmije** bi çêja tiştekî re kêfxweş bûn
**tahmik** xwarina ku di dafikê de tê danîn
**tahm kirin 1.** bi zimên tê derxistin **2.** çêja tiştekî nihêrîn
**tahmsar** bêtahm, bêçêj
**tahmtîtik** biçêj, bilezet
**tahmûsk** qelş û qalikdana ku di lêvan de çêdibin
**tahmzêr** avzêr
**tajî** cureyekî heywanên nêçîrê yî sivik û zirav e; dişibihe kûçikan lê pir beza ye *"me girt **tajî,** derket toltajî"
**takekes** kesayet, ferd, şexs
**takekesî** ferdî, şexsî
**tal [I]** tehl
**tal [II]** vala
**-tal kirin** vala kirin
**talan** standina malê xelqê bi darê zorê *"**talan**a mûstangê, livek ceh e"
**talan kirin** çopandin *"zanîn, nayê **talankirin"**
**-talan û tiraş kirin** her tiştê heyî ji binî ve birin
**talaz** toz û xubar
**talde 1.** cihê ku bîner nabîne, cihê ku tav lê nakeve; qûze **2.** berqef *"**talde**yê şêran, ji sitara rûviyan çêtir e"
**talih** siûd, bext *"**talih**ê rindan xirab e"
**-talih çê hatin** kar li hev hatin
**talî** dawî
**tal kirin** vala kirin
**tam [I]** tehm
**tam [II] 1.** bêqusûr **2.** bêkêmasî
**taman** fetrûma rehekan
**taman kirin** fetrûm kirin
**tamjimare** jimareyên *wekî 1,2,3 û hwd* ên ku *wekî 1.3, 0.5 û hwd* ne şikestî ne
**tan** dîwarê ji qêmîş; kotanî, çît
**tana** hawarî
**-tana hatin** hawarî hatin
**tanc** desthilatî
**tang 1.** tûş **2.** alî *"her kes, royê di **tang**a xwe de dibîne"
**tanût** tinaze, qerf
**tapan** darê meht ê ku li ser kersengên erdê cotkirî tê gerandin da ku bipelixin û hûr bibin
**tapik [I]** dafik, tele
**tapik [II]** lûtke
**tapir** tivinga nêçîrê
**tapî** penageh
**taq 1.** dîwar **2.** qat

**taqiçk** dîwarekê nizm ê ku li serê tê rûniştin
**taqet** hêza şiyanê; qudûm, mecal *“dil heye, **taqet** tuneye”
**taqî** azmûneke ku ji her pirsekê re çend vebijêrk hene û lêbelê ji wan yek tenê bersiva rast e
**taqîgeh** cihê ceribandinên zanistî
**taqî kirin** azmûn kirin
**tar [I]** xîm, hîm, bingeh
**tar [II] 1.** xeleq, xeleqa dorê **2.** qawêr, gergere **3.** amûreke çinînê ye *“palê xerab, das û **tar**ê diguhêre”
**-tara bêjingê** gergereya seradê
**tar [III]** tax
**-tara guhê bajêr** taxa ku ji navenda bajêr dûr e
**tar [IV]** lîs
**tar [V]** şaşik
**tar [VI]** katara stûyî
**tar [VII]** kit
**-tartarî** kitkitî, belawela
**-tar û mar** belawela
**tar [VIII]** kêf
**taraw 1.** nefy, tehcîr **2.** penaberiya mecbûrî
**tarawgeh 1.** cihe sirgûnê; menfa **2.** penageha bêgaviyê
**tarî 1.** tîr û girtî, nezelal **2.** tarîban û neronak *“di **tari**yê de, çira ro ye”
**tarîban** rewşa bêronahiyê
**tarî bûn 1.** êvar bûn **2.** reng girtîtir û tîrtir bûn **3.** rewşa bînahiya çavan xera bûn
**tarîgewrk** şevereşa pêşîn û paşîn a şevê
**tarîgan** cureyekî zêd e û dişibihe gênim
**tarî kirin 1.** êvar bi ser de anîn **2.** reng girtîtir û tîrtir kirin **3.** rewşa bînahiya çavan xera kirin
**tarîparêz** dijberê pêşketinê; tedhîşkar
**tarîparêzî** dijberiya pêşketinê; tedhîşkarî
**tarîstan** şevereşa ku hemû deverê radipêçe
**tarîtî** rewşa bêronahiyê û nezelaliyê
**tar kirin** par ve kirin
**tarmilandin/ditarmilîne/bitarmilîne** qemîçokî/qerçûmekî kirin
**tarmilîn/ditarmile/bitarmile** qermîçokî/qerçûmekî bûn
**tarovaro** belawela
**tarovaro bûn** ji hev belav bûn
**tarovaro kirin** belawela kirin
**tart** parçeyê ku bi dirêja-

hî hatiye qutkirin
**tartale** pirtevekirin û standina malê xelqê; oxilme
**tas/tasik** amaneke avê ya hera biçûk e *"**tas** çingiya, ha rast ha derew"
**-tasa sêrî** tepika seriyî
**-tasek ava sar bi ser de vexwarin 1.** hêvî jê birîn **2.** dest jê veşûştin **3.** ji kîs çûyîn û êdî venegerîn
**taswas** şaşopaşo
**taştê** xwarina danê sibehê *"**taştê** di hênikahiyê de, şîv di ronahiyê de"
**tat [I]** kesê ku di axaftina xwe de dianiqe; lal
**tat [II]** kesê ne ji êlê; pêgirtiyê dereke
**tatêl/tatûl** xema ku ji ber nediyariyê pêk tê; meraq
**tatêl ketin dil û hinavan** ji ber bilaniya karesatekê xemgîn bûn
**tav 1.** gerestêrka rojê **2.** roniya rojê *"**tav** bavê, av diya zeviyan e"
**-bi tavê re hatin û bi teyrokê re çûn** bi derengî bi dest ketin û bi lez ji dest çûn
**tavehîv** heyva çardeşevî; heyveron, nîma
**tavgeh** di bihar û havînan de cihê bêhnvedan û dembihurandinê yî ku tav lê dide û av lê heye
**tavgestî** birîna ku ber tîrêjên tavê maye û hilpingiriye
**tavgestî bûn** *(birîn)* ber tavê man û werimîn
**tavilê 1.** talîkê **2.** wê gavê û bênavber **3.** pê re û nişkê ve
**tavistan** havîn
**tavî** barana kêm a ku ne domdar e
**tawan 1.** guneh **2.** sûc
**-tawanê abûrşikên** sûc û gunehên ku ji anora mirovî digirin
**tawanbar 1.** kesê ku gunehek lê tê barkirin **2.** kesê ku sûcek lê tê barkirin
**tawanbar kirin 1.** guneh lê bar kirin **2.** sûc lê bar kirin
**tawankar 1.** gunehkar **2.** sûcdar
**tawan-nasî** pisporiya awayê pêkhatina sûc û gunehan
**tawe** amaneke malê ya ku tehtevêlkî ye û tê de xurekên zûpij tên pehtin; boçesêlîn, miqilk
**tawis 1.** li cem kurdên berê navê pûtekê tavê ye **2.** cureyekî teyrên

dîmenxweş û rengîn e *"heçî dîtina **tawis**î bivê, divê germa Hindistanê jî qebûl bike"
**tawî** kesê ku bi nexweşiya tayê ketiye
**tawî bûn** tûşî nexweşiya tayê hatin
**tawûg** taxûk
**tax 1.** birek malên gund an jî bajarekî; mehele **2.** desteya ji heman malbatê
**taxim** desteyeke têkûz
**-taximê sîng û beran** ber û pêsîrên jinan
**taxurk** nasirge, girgirok
**taxûk** alava barkêşiyê ya ku li ser berfê tê şemitandin
**taybet** wesfên ku aîdî yekî tenê ne
**taybetî 1.** xusûsiyet **2.** rewişt
**-bi taybetî** nemaze
**taybetmend** xwedanrewişt
**taybetmendî** rewşa kes an jî tiştê ku xwediyê hin wesf û rewiştan e
**taye 1.** toterîk **2.** şeyt
**taytore 1.** sersar û bêkêr **2.** olintî û yax
**taze** teze
**tazî 1.** rût, uryan **2.** xizan *"qûna **tazî,** tembûrê dixwaze"
**tazûg** taxûk
**te** awayê tewandî yê cînavka /tu/yê
**-te dît kanî li ser danî** warê ku te ecibandiye ne tu war e
**teba 1.** kes an jî tiştê nediyar **2.** cinawir *"teyr bi per û baskên xwe, **teba** bi qîl û diranên xwe, mirov bi hiş û fehmên xwe, digihêjin meqseda xwe"
**tebane** derpiyê kurt
**tebat** sebr û sebat
**tebatî** *(r)* hevoka ku kirdeyê wê ne diyar e
**tebat kirin** sebr kirin
**Tebax** Gelawêj *"**tebax** e, tiriyan raxe"
**tebek 1.** zag **2.** cureyekî nexweşiya dev û lingên sewalan e
**tebeq** cureyekî nexweşiyê ye
**tebeqe 1.** qat **2.** tetqal
**tebitandin/ditebitîne/bitebitîne 1.** aşt kirin, arimandin **2.** veterisandin
**teber** tevir
**tebitîn/ditebite/bitebite 1.** aşt bûn, arimîn **2.** veterisîn
**tebo** cureyekî kêzikên ku bi xwîna giyaneweran dijî
**tebûr** şene
**Tecal** Decal
**-palanê kerê Tecêl** karê

ku naçe sêrî û tim difeşkile

**tecrîd 1.** rûtkirin **2.** tenêhiştin

**tedhîş** tirsandin û tehdîdkirin

**tedhîşkar** eşqiya, rêbir

**tedhîşkarî** eşqiyatî, rêbirî

**tefandin/ditefîne/bitefîne** vemirandin, vekuştin

**tefîn/ditefe/bitefe** vemirîn, vemirîn

**tefş** parçeyê ku di carekî de hatiye birîn

**tefşik** tiştê ku tê de qabiliyeta qutkirinê heye

**-diranên tefşik** diranên ku bi kêrî gestkirin û qutkirinê tên

**tefşî** tefşo

**tefşo** amûreke xeratiyê ya ku bi kêrî birîn û darotina darikan tê

**teftî** şorbeya gênim

**tef û tal** pel û pot

**tegel** şêl

**tegel kirin** şêl kirin

**tegere** egletî, asteng

**tehisandin/ditehisîne/bitehisîne 1.** dehfandin **2.** hilisandin

**tehisîn/ditehise/bitehise 1.** xwe li ser piyan negirtin **2.** hilisîn

**tehîn** doşava kunciyan

**tehjî** tajî

**tehl 1.** neşirîn **2.** tûj **3.** biazar *"giyayê hewşê, **tehl e**"

**tehl bûn 1.** şirîn nebûn **2.** *(tahm)* tûj bûn **3.** ji azarekê êşîn *"gayê baş, bi serbaran tehl dibe, mêrê baş bi xereban **tehl dibe**"

**tehlî 1.** neşirînî, tûjî **2.** azar û rexne **3.** cureyekî çêreya ku binçirka wê tehl e û di dermansaziyê de tê bikaranîn

**-tehlî û niç** gilî, qazinc û rexne

**tehl kirin 1.** şirînahî jê birin **2.** tahm tûj kirin **3.** bi azarekê êşandin

**tehn** gotina tûj

**-tehn lê dan 1.** berî dan **2.** gotina tûj jê re kirin

**tehr** awa, celeb

**tehre** kelegerma havînê ya dema nîvroyan

**teht** kevirê meht

**tehtevêlkî** rast û tenîsk

**-legana tehtevêlkî** amana xwarinê ya ku zêde ne kûr e

**tej [I] 1.** berik **2.** *(beriya bi hev ve dirûnê)* her parçeyekî kon

**tej [II]** bazar

**-tej kirin** bazar kirin

**tejane 1.** erdê ku her çar aliyên wî bi çiyan ve rapêçandî ne û ava he-

mû aliyan dikişe navendê **2.** kana madenan
**tek** bê awarte yek tenê
**-tek û tûk** kêm caran
**tekandin/ditekîne/bitekîne 1.** çelqandin **2.** hejandin
**tekane** yekane
**tekbîr** gotina “Allahu Ekber!”ê
**-tekbîr anîn** “Allahu Ekber!” gotin
**teketek** yek bi yek, yekoyeko
**tel [I]** xwar
**-tel kirin** xwar kirin
**-kumê xwe tel bigire!** kêfxweş be!
**tel [II]** careke lêxistina bi qiloçan
**-bi telan hatin hev** *(sewal)* bi qiloçan êrîşî hev kirin
**tel [III]** careke lêxistina bi şiva holetelê
**-telê xwe xwarin 1.** dora lêxistina xwe temam kirin **2.** pel xwarin, gon xwarin
**telan** parçeyek erd
**telandin/ditelîne/bitelîne 1.** aşt kirin **2.** xew re kirin
**-xwe lê telandin 1.** dizîka li yekî payîn **2.** dizîka ji yekî re kemîn danîn
**telar 1.** koçk **2.** balexane
**telaş 1.** kelefeyê tayî **2.** arekê ku ber darên qutkirî dimîne; talaz
**telaşe** coşiya ku bi xwe re şaşwaziyê tîne
**tele 1.** rastahiya ku di nav xilxileyê keviran de ye û li cihekê asê ye **2.** dafik, kemîn
**-ketin teleyê** ketin kemînê
**telebkar** deynxwaz
**telef bûn** dêrz bûn
**telef kirin** dêrz kirin
**telemişk** dafika mişkan
**teletel** dizîka û veşartî
**-teletel payîn** dizîka û veşartî raçav kirin
**telew** dêlese, dêlegur û mahû û ajalên din ên ku dema gonxwarina wan hatiye
**telew bûn** ketin dema gonxwarinê û lê sor bûn
**telêz** yom, pêpal
**telikîn/ditelike/bitelike** terikîn, *(heywanên wekî dêlese, dêlegur û mahûyê)* têjik anîn
**teliqîn/diteliqe/biteliqe** telikîn
**telîs** derdaneke ku ji bardanî biçûktir e
**telp [I] 1.** komeke ewran **2.** refeke çivîkan
**telp [II]** xwî
**-telpinan baş e** hin xwiyên wî yên baş jî hene

**telptelpî** xwediyê kesayeta guherbar
**telwe** dûrda ku di binê pingana qehweyê de dimîne
**tem [I]** mij
**tem [II]** mija ku di nav stêrkan de xuya dibe
**tem [III]** niyêt
**-tem kirin** niyêt kirin
**temam** kemilî
**temam bûn** kemilîn
**temam kiri** kemilandin
**temar 1.** giraniya xewê **2.** xewa giran
**temartin/ditemêre/bitemêre 1.** çal kirin, binax kirin **2.** bincil kirin, serpeçûm kirin **3.** agir vemirandin
**temartî 1.** veşartî **2.** vemirî
**temaşe 1.** raçavî **2.** nihêrîn *"**temaşe,** ji mêwijan xweştir e"
**-temaşe li paş e** ev hê lolo ye û lêlê li pey re tê
**-lê temaşe kirin** lê mêyzenandin, lê nihêrîn
**temaşekar** bîner
**temaşevan** bîner
**temawî** mijawî
**tembekî** titûna kokosê
**temberî** tûncik, çûncik
**tembûr** cureyekî amûrên mûsîqayî ye
**tembûrvan** pisporê jenîna alava tembûrê
**teme 1.** tenbîh, hişyarî **2.** şîret
**-temeya min li te** bila şîreta min di guhên te be
**-temiya bavan** şîretên ku pêşiyan li me kirine
**teme kirin** daxwaz kirin
**temel** mal û milk
**temen** salên jiyan an jî hebûnê
**temendirêj** kes an jî tiştê ku gelek salan jiyaye
**temendirêj bûn** gelekî jiyan
**temendirêjî** rewşa kes an jî tiştê ku gelek salan jiyaye
**temenkurt** kes an jî tiştê ku hindik salan jiyaye
**temenkurt bûn** hindikekî jiyan
**temenkurtî** rewşa kes an jî tiştê ku hindik salan jiyaye
**temerî** porê ku dadikeve ser eniyê; tûncik
**temezî** mêzereke rengrengî ya ku li dora kofiyan tê alandin
**temirandin/ditemirîne/bitemirîne** tefandin
**temirîn/ditemire/bitemire** tefîn, vemirîn
**temz** karê pevekirina hesinên şikestî; lehîm, kewandin
**temizandin/ditemizîne/bitemizîne** *(hesinên şi-*

*kestî bi hev ve)* lehîm kirin, kewandin

**ten** tiştê ku cihekî digire û giraniyeke wî heye; laş

**tena 1.** rehet û aram **2.** hêmin **3.** aşt û negiriyayî

**tenaf** şirît, weris

**tenafbaz** kesê ku li ser şirît û werisan dilîze

**tenahî 1.** aramî **2.** hêminî **2.** aştî

**tenbel** teral

**tenbel bûn** teral bûn

**tenbelî** teralî

**tenbû** cureyekî heşeratan e; gen

**tendurist** kes an jî tiştê ku tu nexweşiyeke wî tune ye; bisihet, bijûn

**tenduristî** temtêla bênexweşiyê û xurtiya bedenî; jûn, sihet

**tenduristînasî** zanistên ku pisporiya wan têkildarî jûnê ye

**tendûr 1.** cihê ku tê de nan tê pehtin **2.** sîtila ku di navgînên raguhastinê ên kevn de ardû diavêtinê *“zavayê li ser xezûran, seyê li ber **tendûr**an“

**teneke 1.** hesinê qelakirî **2.** debe, kod **3.** navê giştî yê hemû amanên ji tenekeyî

**tenê 1.** bi serê xwe **2.** livek/hebek

**teng [I] 1.** nefireh **2.** şidiyayî **3.** kêmber *“mêrê çê di roja **teng** de tê fêmkirin”

**teng [II] 1.** qûşa zînê hespan **2.** werisê ku pê bar tên şidandin

**tengal** parxan, newq

**tengasî 1.** destengî **2.** xizanî **3.** sergêjî

**tengav 1.** bêzar **2.** bêhnçikiyayî *"zivistan, **tengav**a mirinê ye”

**tengav bûn 1**. bêzar bûn **2.** bizdîn **3.** aciz bûn

**tengav kirin 1.** bêzar kirin **2.** bizdandin **3.** aciz kirin

**tengayî 1.** nefirehî **2.** xizanî **3.** xela **4.** canbêzarî **5.** tengasî *“piştî **tengayi**yê, firehî tê”

**tengbîn** kesê ku tiştan di qadeke kêmber de difikire û dinirxîne; bedbîn

**teng bûn 1.** ji firehiyê çendek daketin **2.** kêmber bûn **3.** şidîn

**tengerê 1.** şiverê **2.** riya berteng

**tengezar** bêhal, bêmecal

**tengezar bûn 1.** betilîn **2.** hetikîn

**tengezarî 1.** bêhalî, bêmecalî **2.** tengasî

**tengezar kirin 1.** betilandin **2.** hetikandin

**tengijandin/ditengijîne**

**/bitengijîne 1.** dev lê tehl kirin **2.** bihêrs kirin

**tengijîn/ditengije/bitengije 1.** di navê de man **2.** rik hatin, bihêrs bûn

**teng kirin 1.** ji firehiyê çendek daxistin **2.** şidandin **3.** kêmber kirin

**tenik** zirav û nazik

**tenik bûn** zirav û nazik bûn

**tenikî** ziravî û naziktî

**-tenikiya rêvebiriyê** gerandina kar û barên îdarî bi awayekî dûrî nepenî û derzagoniyê

**tenik kirin** zirav û nazik kirin

**tenişder** çarçiveya dêrî; rûderî

**tenişt** kêlek, tehêl

**tenî** reşahiya ku ji ber dû û duxanê li binê feraqan ve çêdibe *"filan kes zaca Helebê ye, **teni**ya bi don e**"**

**-tenî girtin** *(ji ber dû)* hîsê pê ve girtin

**-tenî kirin** riswa kirin

**tenîper** rûpeleke rengîn a ku dikine nava du kaxezan da ku heman nivîsê derbasî ya li binî jî bike

**tenûr** tendûr *"**tenûr,** nesincire, nên napêje**"**

**tenza kirin** leva kirin, belav kirin

**tep [I]** dek û dolab

**tep [II]** şeqam, sîle

**-tepek û du tep lê xistin** çend şeqam avêtin yekî

**tep [III]** kêrt, gir

**-tepê li pêşberî gundî** girê/kêrtê li pêşpala gundî

**tep [IV]** rûxan

**-tep bûn** rûxîn

**-tep kirin** rûxandin

**-bi ser de tep kirin** bi ser de hilweşandin

**teparik** parçeyê ku pê tiştên devteng tên girtin

**tepedor** dervankê darîn ê ku pê devê amanên devteng tê girtin

**tepeserî** zulm, sitem, zordestî

**tepeser kirin** tahde lê kirin

**tepik 1.** gilfika herî û rêxê **2.** kermeyên ku bi dest tên çêkirin

**tepil** cureyekî amûrên mûsîqayî ye

**tepink** teqemeniya ku di bin erdê de tê bi cih kirin û gava giranî têkeve serê diteqe

**tepisandin/ditepisîne/bitepisîne 1.** *(bi awayekî kîp)* dagirtin **2.** tahde lê kirin **3.** ritimandin

**tepisîn/ditepise/bitepise 1.** *(bi awayekî kîp)* tijî bûn **2.** tûşî tahdeyê hatin **3.** ritimîn

**tepiş** qabiliyet
**teplû** nexweşiyek e
**tepres** dekbaz, fendbaz
**teqal** girover, tehtevêlkî
**teqandin/diteqîne/biteqîne** **1.** gule berdan **2.** behicandin **3.** bi teqemeniyê belawela kirin
**teqel** di xalbendiyê de nîşaneya bendikê
**teqemenî** bûjenên wekî gule û barûtê yên ku diteqin
**teqereq** **1.** dengê teqîna teqemeniyê **2.** teperep *"**teqereq**a feraqan, şeqeşeqa pereyan, fîqefîqa jinan, fireh dike dilan"
**-teqereqa ji bo dinyayê** kudandina ji bo domana jiyanê
**teqez** **1.** miheqeq, mitleq **2.** lezgînî
**teqil** giranî
**teqilandin/diteqilîne/biteqilîne** **1.** giraniya tiştekî pîvan **2.** hejandin
**teqin** herî
**teqinandin/diteqinîne/biteqinîne** di heriyê de gut kirin û çikilandin
**teqinîn/diteqine/biteqine** di heriyê de gut bûn û çikilîn
**teqizandin/diteqizîne/biteqizîne** pengizandin
**teqizîn/diteqize/biteqize** pengizîn
**teqîn/diteqe/biteqe** **1.** bandora teqemeniyê xuya bûn **2.** dengê teqemeniyê hatin, gurmîn
**teqle** qulopanî
**-teqle avêtin** **1.** qulopanî kirin **2.** xwe gêr kirin
**teqlîd** cure
**teqlîde** sexte
**teqoze** **1.** xerabe **2.** geveze **3.** feramûşbûyî *"aşê **teqoze,** arvên nahêre"
**teqteqoşk** **1.** demançe **2.** demançeyên zarokan
**ter** **1.** çêre û dara şil a ku hişk nebûye **2.** neceribandî **3.** nûgihiştî *"bi qîzan re neçin, qîz **ter** in; bi jinebiyan re neçin, zehf digerin"
**-ter kirin** giya û darik bi avê nerm kirin
**-ter û can** ciwan
**-ter û hişk tev şewitîn** heq û neheq gişt tûşî bobelatekê hatin
**tera bûn** ji jorê ber bi jêrê ketin
**terad** pêşbirk
**teraf** elametên beriya xwêdanê
**-terafên xwêdanê** germahî û şilahiya ku beriya xwêdanê di lêş de pêk tên
**teraf kirin** rûçikandin
**terahî** rewşa hêşînbûna

çêre û daran

**teral** **1.** selexane, lexer **2.** kêmxebat **3.** fizirok *"bibêjin lal e, mebêjin **teral e**"

**teralî** **1.** selexanetî, lexerî **2.** kêmxebatî **3.** fiziroktî

**terandin/diterîne/biterîne** qewirandin

**terane** **1**. tinaze, qerf **2.** henek

**teraqî** aviyeke şirîn a ku mêş ji kulîlkên curecureyî tînin û pê hingivî çêdikin

**teraş kirin** **1.** darijtin **2.** kurtisandin

**teratin** çûn û hatin

**-riya teratinê** riya çûn û hatinê

**terawil** dirinde

**teraz** hevseng

**terazîn** **1.** hevraz **2.** berpal

**terazû** amûreke pîvandinê ya ku ji du çaviyan pêk tê û di çaviyekî de mengiranî û a din de jî giranî tê danîn; mêzîn

**terazûn** **1.** hêza dûgelê ya aborî **2.** pêşniyara ku derhat û mezaxtinê bi awayekî hûrgilî û ji bo demeke kifşkirî nîşan dide

**ter bûn** *(dar û giya)* di avê de nerm bûn

**ter kirin** *(dar û giya)* di avê de nerm kirin

**tere û tûre** axaftina beletewş û berevajî

**teremast** mastê ku di parzûnekî de hatiye dawerivandin û ji bo zivistanê hatiye parastin

**tereng** rengê tarî

**tereqe** dûvçika fîşenga teqiyayî

**tereqî** cureyekî xoxan e

**teres** qewad, qebrax *"**teres**ê dinyayê, mal bar kir û bir ba mala bavê jinê"

**teresî** qewadî, qebraxî *" **teresî,** ne karê mêran e"

**terez** zîpik

**terg** gijloka gir

**terk** valahiya di navbera pîneyê pêçandî; qelş

**-terka zikê kengerê** bêrîka ku bi zikê kengerê ve ye û têjika xwe dikê

**-pere kirin terka şaşikê** dirav di nav qatên şaşikê de veşartin

**terifandin/diterifîne/biterifîne** **1.** *(çav)* êşandin **2.** dariştin, teraş kirin

**terik** **1.** êzingê ter **2.** şiva mezin **3.** mûzî

**terikandin/diterikîne/biterikîne** **1.** hiştin **2.** jê vegerîn **3.** dest jê şûştin, dev jê berdan

**terikîn/diterike/biterike** **[I]** telikîn

**terikîn [I] 1.** pir girs **2.** pir fireh **3.** pir giran

**terixandin/diterixîne/biterixîne** *(mêwe)* bi emadê wan stewandin

**terixîn/diterixe/biterixe** *(mêwe)* bi emadê xwe stewîn

**terî** boç, dêl, dûv

**-terî lê badan** bêhn lê çikandin

**-teriya xwe kirin nav şeqa xwe** ji tirsan dengê xwe nekirin û bêxîretî qebûl kirin

**terîj** pîneyê kêmber û dirêj

**terîjk** pîneyê kêmber û dirêj ê ku pê birînan girêdidin

**terk [I]** destvekişandina ji tiştekî û li ser halê wî hiştin

**-terk kirin** terikandin

**terk [II]** derz, cerx, qelş

**-terk lê ketin** derz lê ketin

**terke** çiqilê ziravik

**terkî 1.** siwarbûna li pişt yekî **2.** maweya di navbera zîn û hêtên lêsiwariyê

**-avêtin terkiya xwe 1.** kesek li pişt xwe siwar kirin **2.** tiştek li pişt zîn ve girêdan **3.** selikek bi keleyê erebeyê ve girêdan

**terkedinya 1.** munzewî **2.** ji bayê dinyayê bêhay

**terkeser** beredayî, bêwar

**terkîb** peyvebend

**terlan** xortê bedew î çeleng

**term 1.** cesed, laş **2.** kelax **3.** komeke stêrkan e

**-Termê Merxê** komstêra ku bi heft stêrên xwe ve weke çoçikê ye

-**Termê Adem** komstêra ku Termê Merxê biçûktir e

**terme** di bihar û havînan de cihê rûniştinê yî ber derê malê; hewş

**terpeterp** dengê meşîna giyaneweran û avêtina dilî

**terpilandin/diterpilîne/biterpilîne** şewişandin

**terpilîn/diterpile/biterpile 1.** tehisîn, şimitîn **2.** milmilîn, weşweşîn

**terpîn/diterpe/biterpe** dilê zindî bi terpeterp avêtin

**terpûş 1.** şara serê jinan; mêzer **2.** kes an jî tiştê ku spehî xuya dike

**terq** tiştên sertûj ên wekî hesin, dar, ber û hwd

**terqandin/diterqîne/biterqîne 1.** ji hev belawela kirin **2.** tarovaro kirin **3.** behicandin û çewisandin

**terqîn/diterqe/biterqe** **1.** ji hev belawela bûn **2.** tarovaro bûn **3.** behicîn û çewisîn
**ters [I]** **1.** çewt **2.** berevajî **3.** peşk, pêxem
**ters [II]** gemara ker û hespan
**tersî** **1.** çewtî **2.** berevajîtî **3.** pêxemî
**terskul** ters
**terş [I]** cendek, mirar
**terş [II]** **1.** hemû sewalên kedîkirî **2.** nexweşiyeke sewalan e **3.** sewalên talankirî
**terş [III]** dêw, tewa, ûc
**tertepêl** gotegot, pizepiz
**tertilîn/ditertile/bitertile** **1.** ji hev veqetîn **2.** pelate bûn **3.** tarovaro bûn
**terwende** tiştê ku her car pêk nayê; degme
**terx** bêqusûr, bêeyb
**terxan kirin** **1.** veqetandin **2.** jê re mezaxtin **3.** diyarî kirin
**-terazûna terxankirî** budceya ku ji karekî taybet re hatiye veqetandin
**terxîs** ruxset, destûr
**-terxîs bûn** *(leşkerê bêpaye yê ku perwerdeya cengê dîtiye)* vegerîn malê
**-terxîs dan** destûr dan
**-terxîs kirin** *(leşkerê bêpaye yê ku perwerdeya cengê dîtiye)* şandin malê
**terye** heramî, diz
**terz** awa, usûl
**terzî** kincdirû
**teselî** **1.** pirsîna li rewşa yekî/tiştekî **2.** qilalî
**teselî kirin** **1.** li rewşa yekî/tiştekî pirsîn **2.** kesek/tiştek payîn û ji rewşa wî agehdar bûn
**tesîr** bandor, eser
**tesk [I]** kêmber
**tesk [II]** hemaset, xwîngermî
**teslîm** radest
**teslîm kirin** radest kirin
**-teslîmî Xwedê kirin** **1.** emanetî Xwedê kirin **2.** neheqiya ku lê hatiye kirin erzehalî ba Xwedê kirin
**teşe** awa, tehr, dirûv
**-teşe girtin** **1.** dirûv girtin **2.** di qalibekî de ro bûn
**teşim** di bajêr de riya binerdî ya ku ji bo vederkirina ava gemar hatiye vekolan
**teşî** alava ku pê rîs tê ristin *"keç **teşî**ya diya xwe radike, law tîra bavê"
**teşk** ji aliyê piştê ve geha lingan
**teşq** bandora sermayê
**teşqele** **1.** xiroşî **2.** pêxemî **3.** bela

**-ketin teşqeleyê 1.** ketin bela û heyteholê **2.** ketin heys û beysê

**-teşqele derxistin 1.** arîşe derxistin **2.** bûn sedema lecê û devjeniyê

**teşt 1.** amana ku kinc an jî feraqên malê tê de têne şûştin **2.** amana ku hevîr tê de tê stran

**teşwîq 1.** niç û navtêdan **2.** piştgirî

**teşwîq kirin 1.** niçandin yekî û nav tê dan **2.** piştgirî dan yekî/karekî

**tet/tetik** *(di zimanê zarokan de)* dest/destik

**teter** pîlik

**tetirxan** nexweşiya ji ber xwarineke jehrîn, afnikî an jî xirabûyî

**tetirxanî** kesê ku xwarinekê jê girtiye

**-tetirxanî kirin** ji qehran behicandin

**tev** gişt, hemû *"axa riyan **tev** dizane, lê riya qenciyên gel nizane"

**-bi tevayî 1.** bi giştî **2.** hemû tê de

**-tevî tiştekî** pê re, ligel *"hespê çê, **tevî** qeyd û merbenda xwe diçe şerî"

**tevayî** bi hevre

**tev dan 1.** bi hev dan **2.** tev li hev kirin **3.** bi ser hev xistin

**tevdêr** alava ku pê mêwe tên guvaştin û ava wan tê derxistin

**tevdîr 1.** tedbîr **2.** semt **3.** hişmendî *"ava bîran bi **tevdîr**an"

**tevdêr** amûra ku pê tişt tên tevdan

**tevger 1.** bizav, hereket **2.** temtêl *"ava golan bê **tevger** e"

**tev gerîn** livîn û hereket kirin

**tevir** alava erdkolanê; koling *"însanê bêesas, ne dibe **tevir** ne dibe das"

**tevir kirin 1.** pêmer kirin, mer kirin **2.** vekolan

**tevizandin/ditevizîne/bitevizîne** *(laş)* bi derba sext an jî bi dermên bêtevger kirin

**tevizîn/ditevize/bitevize 1.** wekî bêruh bûn, wekî can jê kişîn **2.** ji ber bandora dermên we-kî bêruh bûn **3.** *(hin sewal di zivistanan de)* ketin xeweke giran

**tevkar** alîkar

**tevkarî 1.** hevparî **2.** hevalbendî **3.** beşdarî

**tevkujî** qetliyam

**tev lê bûn 1.** bi ser ve bûn **2.** pê ve bûn **3.** tê de bûn, beşdar bûn

**tev lê kirin 1.** bi ser ve kirin **2.** pê ve kirin **3.** tê de kirin

**tevlihev 1.** bi ser hev de **2.** têvel
**tev li hev bûn** ketin nava hev
**tev li hev kirin** berdan ser hev
**tevn** dezgehê raçandina berik, xalîçe, xurcik û hwd *"**tevn** ku li dar ket, êdî li erdê namîne"
**tevnepîr** tora ku pîrhevok radiçînin
**tevnî** her du darên ku firêta tevnê lê dialînin
**tevş** kevirê meht ê bi qasî destekî
**tevşo** tefşo
**tevtal** kel û mel
**tevtevîk** alaveke mûsîqayê ye
**tevz [I]** terane, laqirdî
**tevz [II]** rewşa wekî bêgiyanbûnê ya endamên giyaneweran
**-tevz dan xwe** xwe vepezinandin
**tevzî** di dema tirs an jî ricafê de jana ku di rehên cendêk de peyde dibin
**tew** qe, qet, hîç
**-tew tew!** peh peh!, hey lo lo!
**tewa** teba
**tewal** balinde
**tewan** tiwanî
**tewandin/ditewîne/bitewîne 1.** xwar kirin **2.** çemandin
**tewandî 1.** xwarkirî **2.** çemandî *"serê virekan, tim **tewandî** ye"
**tewang** *(r)* ji ber hin egerên rêzimanî guherbariya di peyvan de
**tewaş** rûn, zêt
**tewek** nexweşiya kulbûna dev û piyên sewalan
**tewekor** kesê ku dinêre lêbelê nabîne
**tewere** mihwer, guzargeh
**-tewereya cîhanê** mihwer û guzargeha dinyayê ya ku tê de dizivire
**tewişandin/ditewişîne/bitewişîne 1.** *(da ku bi serbestî têkiliya zayendî dayne)* sewalê nêr berdan nav sewalên mê **2.** weşweşandin, milmilandin
**tewişî** sewalê ku bûye mubtelayê têkiliya zayendî
**tewişîn/ditewişe/bitewişe 1.** *(heywanê nêr)* hînî têkiliya zayendî bûn **2.** weşweşîn, milmilîn
**tewiz** xeml
**tewizandin/ditewizîne/bitewizîne [I] 1.** xemilandin, çîç kirin **2.** araste kirin **3.** ser û sîçeyê xwe têkûz kirin
**tewizandin/ditewizîne/bitewizîne [II]** têk birin, teqoze kirin

**tewizîn/ditewize/bitewize [I] 1.** xemilîn, çîç bûn **2.** araste bûn **3.** *(ji aliyê ser û sîçeyê xwe ve)* têkûz bûn
**tewizîn/ditewize/bitewize [II]** têk çûn, teqoze bûn
**tewîn/ditewe/bitewe 1.** xwar bûn **2.** çemîn *"hesin, bi germî **ditewe**"
**tewl 1.** bend û zincîra ku davêjin stûyê sewalan **2.** sirkeya kêp
**tewle [I]** êwirgeha hesp û dewaran
**tewle [II]** mesafe
**tewle [III]** fizirîn
**tewlebaz** fizirok, zûbizdok
**Tewrat** pirtûka îlahî ya ku ji Cn. Mûsa eleyhiselamî re hatiye hinartin
**tews** lez
**tewsandin/ditewsîne/bitewsîne** lezandin
**tewsîn/ditewse/bitewse** lez kirin
**tewş [I] 1.** kesê bêhevseng **2.** sersar, ebter
**tewş [II] 1.** bêkêr **2.** bêfayde **3.** bêxêr *"reş bi reşî kenî, beş çû û li newala **tewş** kenî"
**-nîgaşa tewş** xeyala badilhewa
**tewşî** şaşî
**tewtew** zirpî
**tewz** tirane, qerf
**-tewz kirin** qerfê xwe pê kirin
**tewzim** ferz
**tewzî** kesê biaqil û balix
**texbî** ji naylonê çêbûyî
**texe 1.** deste **2.** çîn **3.** tax
**-texeyek kaxez** desteyek kaxez
**texmîn** pêzanîna tiştekî bi awayekî ku nêzikî rastiya wî tiştî ye
**texmîn kirin** nêzikî rastiyê sêwirandin
**text** rûniştека mîran a ku nîşaneya desthilatdariyê ye *"berê **text,** ê jinan bûye lê xwan ji ber wan rabûye"
**-text û pa** milk û fort
**texte** tiştê ji darikê meht hatiye çêkirin
**textebend** cureyekî rûniştekên ku çend kes dikarin li serê rûnin
**texterewan** texteyekê ku nava wê datînin ser tiştekî û ji du aliyan ve lê siwar dibin; qirneqos
**textik** darikê ku ji bo alavçêkirinê hatiye birîn
**textirme** çinîna pêşwext
**textîn** ji textikan çêbûyî
**teyar 1.** keyskirî **2.** mîhengkirî
**teyarî 1.** amadetî **2.** têkûztî
**teyfik** tas, şerbik

**teyfî** tiriyên ku rengê wan sorekî vekirî ye

**teyisandin/diteyisîne/biteyisîne** biriqandin

**teyisîn/diteyise/biteyise** biriqîn

**teylesan** şaşika dora kumê meleyî

**teyr** çivîkên dirinde yên girs; balinde *"aqilê kurî, bi **teyr**an re firî"

**-teyrê berateyan** nefsekê ku li dûv malê belaş digere

**-teyr û tilûrên çolê** çivîkên hûr û gir ên biyanî

**teyrok** zîpikên girs; şexte

**teyrik** teyrok *"zevî tuneye, **teyrik** mehne ye"

**tezandin/ditezîne/bitezîne 1.** sar kirin, qerisandin **2.** rawestandin **3.** kuştin

**teze 1.** nû **2.** ciwan **3.** ter *"**teze** hatin, kevn hilatin"

**-sala teze** sala nû

**tezepêkhatî** dinyanedîtî, nû bidestxistî *"bila mirov deyndarê dewlemendan be, ne yê **tezepêkhatiyan** be"

**tezinga 1.** xulekek berê **2.** niha

**tezî 1.** ava pir sar **2.** janên kurtedemî

**tezînk 1.** qerma ku ji ber tirs, serma, şerm û hwd dikeve laşê mirovî û nikare tev bigere; qutaf **2.** herka gêreba, av û hewayê ya ber bi aliyekî

**-tezînka avê** herka avê

**-tezînka gêrebayî** herka cêryanê

**-tezînka hewayî** herka bayî

**tezkere** bawernameya ku saziyên artêşe didin leşkerê bêpaye yê ku perwerdeya cengê dîtiye

**tê 1.** awayê lihevxistî yê daçeka /di/ û cînavka /wê/yê **2.** dema niha ya lêkera /hatin/ê, awayê kurt ê /dihê/yê

**têbar** dolaba ku tê de gewher, zêr û dirav tên parastin

**têbînî 1.** şerh **2.** rave, nîşe **3.** haşiye

**têdan 1.** têgerandin **2.** bijinandin

**têger** bijinok

**tê gerîn 1.** tê dan **2.** bijinîn

**têgih** mefhûm

**tê gihiştin** fêm kirin, sergihayî bûn

**têhn 1.** tîn, germayî **2.** hêraret **3.** tîbûn **4.** hênik

**têhn bûn 1.** hênik bûn **2.** tî bûn

**têhnî** tîbûn

**têhn kirin 1.** hênik kirin **2.** tî kirin

**têhnşîrî** şîregerm, hênik
**têjik** sewala nûzayî *"**têjik**ên maran jî, bijahr in"
--**têjika sala xelayê** pir birçî û çavçil
-**têjik anîn/derxistin/kirin 1.** *(sewala çarpê)* zayîn **2.** *(balinde)* cûcik derxistin
**têkber 1.** raxistekên nava malê **2.** kel û mel, pilî û pirtî
-**têkberên malê** raxistek, rûniştek û arastekên malê
**têk birin 1**. bi bin xistin **2.** mexlûb kirin **3.** bêbandor kirin
**têk çûn 1.** bi bin ketin **2.** tarovaro bûn **3.** hilweşîn
**têk dan 1**. nav tê dan **2.** teşwîq kirin **3.** niçandin
**têkel 1.** tevlihevî **2.** serhevde **3.** têvel û rengrengî
**têkel kirin** tev li hev kirin
**têketin [I]** cihê ketin û derbasbûnê yî li hundir; dergeh
-**mişeya têketinê** diravê ku ji bo temaşekirina şanoyekê, gera di nav perûkxaneyekê û hwd tê dayin
**têketin [II]** di malperê de bişkoka derbazî naveroka malperê dike
**têkilî** eleqe
-**tekilî danîn** eleqedar bûn
**têkildar** eleqedar
**têkoşer 1.** şervan **2.** berxwedêr
**têkoşîn/têdikoşe/têbikoşe 1.** lê banîn **2.** pê re mucadele kirin, ber xwe dan
**têkûz** bêkêmasî û berkemal
**têl** bendê ku ji madenên wekî hesin, mîs û hwd tê çêkirin û piranî di amanên nûjen de wekî raguhêza gêrebayî tê biakaranîn
**têlbend** tiştê ku bi têlê hatiye girêdan
**têldirk** têlên ku pê ve strî û dirik hene û pê dora cihên qedexe tê rapêçan; sîme
-**têldirk kirin** sîme kirin
**têlmaş/têrmaş** kes/tiştê ku hatiye terikandin
**têneper** negerguhêz
**têper** gerguhêz
**têr [I]** *(da ku bavêjin ser pişta sewalên barkêş)* du telîsên ku aliyekî wan bi hev ve hatiye dirûtin
**têr [II]** giyanewerê ku pêdiviya wî bi xwarinê tuneye; nebirçî, ziktijî
-**têr û tesel** mişt tijî
-**têra tiştekî/yekî** bi qasî ku pêwist dike *"ez he

me û **têra te me"**

**têrawis** çinîna dereng

**têr bûn** ziktijî bûn *"kesê ku ji teşta xwe têr nebe, li mala xelqê qet **têr nabe"**

**tê re kirin 1.** tê de çikilandin **2.** tê de gut kirin **3.** tê re derbas kirin

**têrê kirin 1.** bi qasî pêdiviyê tev gerîn **2.** besî tiştekî kirin *"hezar dost kêm in, dijminek **têrê dike"**

**têrik** têra biçûk

**têr kirin 1.** *(zik)* tijî kirin **2.** dagirtin *"biharê xwe **têr meke**, payizê xwe bi derengiyê mexe"

**têrmal** dewlemend, sermiyandar

**têrnexur** hûrtirş, çavbirçî

**têr xwarin 1.** *(zik)* tijî kirin **2.** bi emade xwe xwarin *"**têrxwarin** tune ye, lê belê danîn adet e"

**têvel** curecureyî

**tê werdan 1.** kilîn, kiyan **2.** bi avê şûştin

**tê xistin 1.** tê de danîn **2.** bi cih kirin

**têz** barûd

**tibab** miqdar

**tif** şileya devê giyanewer-an; tûk

**tifal 1.** zarok **2.** ecemî, nûgihiştî

**tifaq** yekîtî *"**tifaqa** mûstangan, çiyan jî qulqulî dike"

**tifik 1.** kuleka bixêriyê; kufik **2.** nepaxa hesingeran

**tifing** çeka lûledirêj a bi dûvçik *"gotine: 'dîno **tifing** çi ye? gotiye: 'dev dirêj e, qûn qirêj e, dest davêjêyî ber davêje"

**tifingendazî** meşqa guleberdanê

**tif kirin** tûka devê xwe reşandin

**tifre** paye, rade

**tift** çêjeke ku di navbera şirînî û tirşiyê de ye; meyxweş

**tihok** cureyekî daran e

**tihtavik** pûng

**tijî 1.** ne vala **2.** bi dêv rê qûç

**-mişt tijî 1.** bi dêv re qûç **2.** heta dêv dagirtî

**tijî bûn** *(heta dêv)* dagirtî bûn

**tijî kirin** *(heta dêv)* dagirtin

**tik** cihê dirûnê; kêl

**tika 1.** lavayî **2.** rica

**tika kirin 1.** lavayî kirin **2.** rica kirin

**til** navik

**-tilî alastin** hin sudên biçûk bi dest xistin

**tilik 1.** girik **2.** kome

**tiling** dêl

**tilî** pêçî *"avan da serî, çi

bihustek çi çar **tilî**”
**tilîlî** bangdaneke jinan a di şahiyan de ye
**-tilîlî avêtin** *(jin)* di şahiyan de bang dan
**tilm** mengiraniyeke pîvandina zêd e û bi qasî 23 kîloyan e
**tilor** qûn, tabût
**tilove** mişt tijî
**-gotina te ji çewtiyan tilove ye** axaftina tijî şaşî ye
**tilp** torte/dûrd, xilt
**tilpekî bûn** piyên lingan ketin ber hev û nêzîkî ketinê bûn
**tilûr** cureyekî çivîkan e
**tilx** xilt, malêz
**tilyak** bûjenên wekî esrar û şîrê xaşxaşikan ên ku serxweşiyê pêk tînin û lêş ditevizînin
**tilyak-kêş** esrarkêş, xaşxaşî
**tilyakfiroş** esrarfiroş
**tim** her wisa, daîmî
**tima/timakar** bexîl, çiriz, çikûs *“merivê **tima**, malê xwe naxwe”
**timahî/timakarî** bexîlî, çirizî, çikûsî *“**timahî**, tim kêmahî ye”
**tinaze** qerf, terane
**-tinaze pê kirin** terane pê kirin, qerf lê kirin, henekê xwe pê kirin
**tinazwer** qerfok, henekbaz
**tingîn/ditinge/bitinge** ringîn, ringering kirin
**tingînî** dengê ringeringê
**tiptenê** bi serê xwe û kesek ne li hindê
**-tir [I]** paşgireke ku di hevalnavan de payeya hevrûkirinê diyar dike; mînak: *mezin+tir*
**tir [II]** bayekê bidengê ku ji tilora giyaneweran dertê *“çû ber **tir**a golikan”
**-tir kirin 1.** bayê bi deng ber çûn **2.** feşilîn *“derpiyê min li xwe ke, lê tê de **tir û fisan meke**”
**tirad [I] 1.** pêşbirk **2.** merc
**tirad [II]** pergîhatina du aliyên gogbaz
**tiraf** ariya ku hîna agir tê de heye
**tirampe** teqes û tûqes, pevguherandin
**tirampe kirin** teqes û tûqes kirin, bi hev guherandin
**tiran** tasika avê ya mîsîn
**tirb 1.** gor, mezel **2.** ziyaret
**tirbistan** goristan
**tirec** pêlekan
**tirek 1.** kesê ku deng li ber qûnê dikeve **2.** bêkêr *“tirek û du tir, li cem **tirek**an weke hev

in”
**tirimbêl** erebe, seyare
**tirî** cureyekî mêweyan e *“heke mirov ji rezekî **tiri**yek xwaribe, nabe ku mirov pişta xwe bidê”
**-tirîn** paşgireke ku di hevalnavan de payeya berztirîn diyar dike; mînak:*xweş+tirîn=herî/tewrî xweş*
**tirîş** sedem, bone
**tirs** xof, saw, sehm *“diya dizan du tiran dike, yekê ji kêfan yekê ji **tirs**an”
**tirsandin/ditirsîne/bitirsîne 1.** sehm lê firandin **2.** diran jê re çirikandin
**tirsîn/ditirse/bitirse 1.** jê saw girtin, jê sehm girtin **2.** newêrîn *“kerê mirî, ji gur **natirse**”
**tirsnak** bixetere, bitalûke
**tirsonek 1.** newêrek **2.** bizdonek *“dilê **tirsonek**, sînga gewr nabîne”
**tirş 1.** şor, tahmşor **2.** helîseya bacanên sor *“kesek nabêjê: ‘dewê min **tirş** e’ ”
**tirş bûn 1.** şor bûn **2.** *(hevîr)* xirab bûn û nehatin pehtin **3.** *(mast)* ji bo kiyanê çêtir bûn
**tirşî** şorî
**tirşik** xurekê ku ji sewzeyên curecureyî tê çêkirin
**tirşîn** xwarina ku ji sewzeyên şoravkirî pêk tê
**tirş kirin** şor kirin
**tirtire** geltegan, şelegan
**tirtûl** cureyekî kurmikan e
**-tirtûl ketin ber/tirtûlê kulê pê girtin** ji bo xwarinekê can avêtin, kumişîn ser û pirteve kirin
**tirnefesî** *(ji ber bêhna tir û fisan)* neksçikîn
**tirnefesî bûn** *(ji ber bêhna tir û fisan)* neks çikîn û bêhnteng bûn
**tirnefesî kirin** *(ji ber bêhna tir û fisan)* neks lê çikandin
**tirxes** kesê ku wekî xesandiyan nikare tûşî jina xwe bibe
**tirxesî bûn** *(di têkilîdanîna zayendî de)* nivîşkan bûn
**tisî 1.** xalî **2.** bêîlawe
**tişt** heyber *“**tişt**ê ku çû, mede dû”
**tiştîr** bizina dusale ya beravis
**tiştonek** pirsa biraz
**titqal 1.** qalik **2.** qalikên qat bi qat ser hev
**-titqal girtin** li serê tebeqeyeke ji qalikan çêbûn
**titqaltitqalî** tiştê ku qat bi qat qalik girtiye
**titûn** cureyekî çêreya ku ji pelên wê baçik tên çêki-

rin
**tivir** cureyekî hêşinahiyê ye û nepijî tê xwarin
**tivanc** jan û êşa ku endamê zedegirtî diqurêfe; tezî
**-êş û tivanc kişandin** qolinc ketin endamekî û ew der quraftin
**tivancî** jandan û êşîn endamê zedegirtî
**tivil** **1.** qaşil **2.** kirasê maran
**tiving** tifing
**tivîlk** cureyekî kevokan e
**tiwanî** **1.** hêz û qudûm **2.** şiyan û kanîn
**tiwanîn/ditwane/bitwane** karîn, şiyan
**tixa** di dab û nêrîtên filehan de lawikê negihiştî
**tixavk** qalikê ku li ser şîrê kelandî digire
**tixis** kok û qelew
**tixûb** **1.** kevir, qûç an jî nîşaneya ku du cihan ji hev cihê dike **2.** hidûd, sîtar *“ji dijminahiyê re **tixûb** tuneye”
**-tixûbê xwe zanîn** **1.** persenga devê xwe zanîn **2.** şûna piyê xwe nas kirin
**tiyan** siniya firinê
**tiyen** qeware/qebare
**tiz** vîz
**tiz kirin** vîz kirin
**tizbî** şirdana 33 an jî 99 moriyên ku pê zikr û tesbîhat tên kişandin *“**tizbî,** bê serkêş nabe”
**tizik** tilor, tabût, qûn
**tizrûg** zirî
**tî [I]** birayê mêrê jinê
**tî [II]** **1.** kesê ku bêav maye **2.** kese ku av lê lazim e *“ew dikare mirovî tî bibe ser avê, cardin **tî** bîne”
**tî bûn** **1.** bêav man **2.** av lê lazim bûn
**tîj** dengê zîz
**tîjmar** kurm
**tîk** tiştê ku vît disekine, çikilandî
**-tîk sekinîn** çik li piyan sekinîn
**tîkayî** rewşa tiştê ku dirêjayî hatiye çikilandin
**tîk bûn** vît bûn
**tîke** **1.** parçe **2.** nermegoştê parçekirî
**tîke kirin** **1.** parçe kirin **2.** kîte kirin
**tîk kirin** vît kirin
**tîl** **1.** cihê ku qeşa girtiye û şimşat e **2.** cihê ku mirov xwe lê dişiqitîne
**-xwe tîlê xistin** xwe li ser qeşayê şiqitandin
**tîla** bez
**-tîlayên çavan** di aliyê derveyê çavan de bezê ku reşik di navendê de bi cih bûye
**tîlik** **1.** kevirê meht ê biçûk **2.** kevirê tixûbî

**tîlolik** cureyekî şîraniya ku ji şîr, şekir û ardê birincî tê çêkirin; şîrşêrk
**tîmanc** pirtiyê ku pê cihê qulbûyî tê pînekirin
**tîmar 1**. tedawî **2.** lênêrîn **3.** *(hesp)* paqijî **4.** perwerde
**tîmar bûn 1.** tedawî bûn **2.** perwerde bûn
**tîmar kirin 1**. tedawî kirin **2.** perwerde kirin
**tîn 1.** germahî, sênc, heraret **2.** dûkel, kel
**tînbir** dermanê ku herareta cendêk dadixe asteke asayî
**tîn dan 1.** germahî dan, sincirîn **2.** kelîn, dûkel bi ser ketin
**tînpîv** amûra ku rêjeya germa heyî dipîve
**tîp [I]** herf
**tîp [II]** desteyeke leşkeran, desteyeke siwaran
**tîp [III] 1.** di hêzên bejayî de desteya ku ji du hengên pêwist pêk tê **2.** di hêzên hewayî de desteyeke ji balafir û navgînên destekar pêk tê
**tîprêz** kesê ku nivîsekê derbasî kombersê dike
**tîprêzî** karê tomarkirina nivîsan di kombersê de
**tîq** dengê kenê
**tîtetîq/tîqînî** hîrehîr
**-tîqînî pê ketin** ji nişkê ve bi awazeke bilind kenîn
**Tîr [I]** gerestêrkek e
**tîr [II] 1.** kesîf **2.** nezelal **3.** rengê girtî *"**tîr** çêkim dan diçe, rehn çêkim nan diçe"
**tîr [III]** çeka berê ya ku bi kevanê dihate avêtin
**-tîr ji kevanê filitî/pekiya** tiştê ku qewimî êdî jêveger ne pêkan e
**-tîr lê rabûn** tivancî û qolincî bûyîn
**tîravêj/tîrkêş** kesê ku bi kevanê tîran diavêje
**tîre 1.** hoz **2.** tax
**tîredar** kesê ku ji binemaleyeke nas e; xwedanhoz
**tîremar** marê biçûk, têjikê marî
**tîrendaz** kesê ku meşqa tîrkêşiyê dîtiye
**tîrendazî** perwerdeya li ser tîrkêşiyê
**tîrêj** baqek şewla ku ji kana şewlê derdikeve û li her aliyî belav dibe
**tîrêjke** şemala ji nişkê ve
**tîrêjpîv** amûra ku tewsa şewla heyî dipîve
**tîrik** kerdenek, kirdan
**tîrk** derziya saetê
**tîrke** derziya alavên pîvandinê
**tîr kirin 1.** *(reng)* girtî û tarî kirin **2.** *(tiştê rehn)* hindekî hişk kirin
**Tîrmeh** meha heftemîn a

salnameya zayînî
**tîş** qelş
**-tîş lê ketin** derizîn
**-tîş û qertîş pê ketin** qelişîn û qalik dan
**tîştîşî** qelşqelşî
**tîtik 1.** pêlîstok **2.** amanên avê yên biçûk **3.** elbik
**tîz [I]** terane, tinaze
**-tîz pê kirin** tinaze pê kirin
**tîz [II]** naziyên ji bo fizirîna ji karekî
**-xwe dan tîzan** ji peywirê fizirîn *“**xwe bidî tîzan** nedî tîzan, tu dê bidî heqê gêzan”
**tîz [III]** refesa sewalên çarpê
**-tîz dan xwe** refes avêtin
**tîz [IV]** lezgîn
**tîzik** refes, lotik
**tîzî** lezgînî
**to** tixafka li ser mastî
**tobe** poşmaniya ji tawan û gunehan
**tobe kirin** ji ber xeletiyên berê ve poşman bûn û ji wan vegerîn
**tof** birek mirov/tişt; kome
**tofan 1.** barana pir giran **2.** karesata xwezayî ya ku ji ber barana gur pêk tê
**tog** bêheya
**tohmet 1.** qebahet **2.** tawanbarkirina kesekî ji ber sûcekî ku nekirî ve
**tol [I] 1.** bêheya **2.** qûnek, qûndiryayî
**tol [II]** bersivdana sitemê û parastina mafê rewa; evez, întiqam
**-tol hilanîn** evez standin, întiqam jê standin
**tol [III]** nijad, pişt û zuriyet
**tola** şîraniyeke ku ji penîr û gezoyê tê çêkirin
**tolajo** kesê ku întiqama xwe hildigire
**tolaz** sersar û doxînsist
**toleke** cureyekî gulan e
**tolgîn** cureyekî gulan e
**tolhildan 1.** întiqam **2.** heyfhilanîn *“çûye **tolhildan**ê, li seyda hestiyan digere”
**tolhildêr** ewezstandî
**tolik [I]** cureyekî gulan e
**tolik [II]** porê ku bi ser eniyê ve xwar dibe; tûncik
**toloz** malêz, xilt, gildîn
**tomar** qeyda nivîsar û wêneyan
**tomargeh** cihê taybet ê ji bo qeydkirina deng, reng û nivîsan
**-tomar kirin** nivîs qeyd kirin
**tomav** avik an jî tovê nêrzatiyê
**tomerî** giş li ser hev û bi komasî
**tombiz 1.** çekeke cengê

ya kevn e; gurzê hesinî **2.** qelew *"hat ji der de, **tombiz** di ber de"

**top** çekeke leşkerî ya mezin û giran e

**topal** kulek

**topalî** kulekî

**topavêj** navgîneke leşkerî ya ku guleyên mezin diavêje

**topebaran** cihek dan ber topan

**topebaran kirin** top lê girêdan

**toq** qeyda stûyî *"ji şeytên zanetir, **toq** û nalet di stûyan de ye"

**-toqa şeytên ketin stûyê yekî** engirîn û cardin venegerîn rastiyê

**toqandin/ditoqîne/bitoqîne 1.** gef û gur li dorê firandin **2.** tirs û saw xistin dilan

**toqe 1.** avzûma hesinî ya ku her du aliyên kemberê digihîne hev **2.** alava ku jin li porê xwe dixin da ku ji hev belav nebe

**toqîn/ditoqe/bitoqe 1.** ji tirsan bizdîn **2.** qutifîn

**tor [I] 1.** nûgihayî **2.** xav

**tor [II]** tayên raçandî yên ji bo masîgiriyê; şebeke *"her car kewa gozel nakeve **tor**ê"

**-tora agahiyan** şebekeya mehlûmatan

**-tora masiyan** şebekeya masiyan

**-tora sîxûran** şebekeya casûsan

**-tor avêtin** *(ji bo masîgirtinê)* şebeke avêtin nava avê

**-tor û tey** tim û tim

**tor [III]** janên beriya bûyîna zarokî

**torandin/ditorîne/bitorîne** xeyidandin

**toranî** kesê ku ji xebatê aciz dibe û selemtî-selemtî digere

**toraq** adaneke şîr e û ji dewê kelandî tê bidestxistin *"**toraq**a îro, ji dewê sibehê çêtir e"

**-toraqa yekî danîn ser nanê wî 1.** para yekî dayîn û ji şirîkatiyê derxistin **2.** xeyidandin û şandin

**torbe** telîs

**tore [I]** sil, bihêrs

**-tore bûn** sil bûn, bihêrs bûn

**tore 1.** huner û rewişt **2.** wêje û tîtal

**-toreyên giştî** dab û nêrîtên civakê yên ku rayîşa danûstandinê diyar dikin

**torevan** şarezayê helbest, çîrok, pexşan û hwd; wêjenas

**torgî** doxîna şalwaran
**torim** têjika hêştirê, kudik
**torin** **1.** ader, esîlza **2.** kaw û kibar
**torinî** **1.** aderî, esîlzatî **2.** kawî û kibarî
**torîk** keftar
**torîn/ditore/bitore** xeyidîn, su hatin
**torm** têjika hêştirê
**tortore** qure û olintî
**toşbî** endamekî ku aviyeke zeliqokî davêje derve û ji şaneyên çêrmî pêk tê
**total bûn** gindirîn
**tot bûn** total bûn *“hêk li ser sêrî nasekine û **tot dibe”**
**totik/toto** **[I]** *(di zimanê zarokan de)* xwarin
**totik** **[II]** aqil
**totikvala** kêmaqil, serkundir *“bike kalan bixwe malan, tu dê çi bikî bi xortên **totikvala”**
**totirne** **1.** tîtal, telhîn û dirêj **2.** bi dest û pê
**tov** **1.** avika ku giyaneweran çêdike; tomav, menî **2.** kakilê ku çêre û dar jê çêdibin; navnêrî *“**tov**ê xweziyan, şîn nabe**”**
**-tov reşandin** bizre/toxim reşandin
**toz** parçeyên pir biçûk
**tozî** parçe, bir
**tozî kirin** birbirî kirin
**tozik** daşik, caş
**tu [II]** *(r)* cînavka yekjimar a ji bo kesê duyemîn
**tu** **[II]** **1.** hîç **2.** qe, qet *“aşvan **tu** car nabe poşman”
**tund** **1.** zexm **2.** sext **3.** pêkutî
**tundî** **1.** zexmî **2.** sextî **3.** pêkutî
**tundraw** **1.** alîgirê rêmanên toqandinê **2.** serveçûyî
**tune** **1.** netêw, nîn **2.** net, sifir
**tune bûn** **1.** netêw bûn, ji holê rabûn **2.** net bûn
**tune kirin** **1.** ji holê rakirin **2.** net kirin
**tunetî** **1.** nebûn **2.** xizanî *“**tunetî,** nîrê hesinî ye**”**
**turindî** cin
**turt** hişk, sext
**tut** lîstikvanê ku ji lîstikê hatiye avêtin
**tut bûn** ji lîstikê hatin avêtin
**tut kirin** ji lîstikê avêtin
**tuvandin/dituvîne/bituvîne** betal kirin
**tuvanîn/dituvane/bituvane** betal bûn
**tuwanc** gotina sergirtî
**tuxt** mengiraniyeke ku bi qasî 325 gramî ye
**tuxyan** harî û isyankarî
**tû** **[I]** **1.** cureyekî daran e **2.** mêweyên vê darê *“dar bi**tû** ye, lê xwedî

tûle ye?”

**tû [II]** tûk

**-tûyî devê hev kirin** bi yekdevî axaftin û heman tişt dubare kirin

**tûfirengî** mêweyek e

**tûj 1.** neko, xarkirî **2.** tehl

**tûjandin/ditûjîne/bitûjîne** der heqê yekî de lêpirsîn dan destpêkirin

**tûj bûn 1**. amadeyî qutkirinê bûn, zot bûn **2.** tehl bûn *“şûrê kê **tûj be,** dinyayê ew dixwe”

**tûj kirin 1.** xar kirin, amadeyî qutkirinê kirin **2.** tehl kirin

**tûk [I]** şilahiya ku ji qirika merivî derdive, tif

**-tûk kirin** şilahiya di qirikê de avêtin derve

**-tûka xwe/xweziya xwe daqurtandin** ji gotina xwe poşman bûn

**tûk [II]** cureyekî çivîkan e

**tûk [III]** pirç, pûrt

**tûkme** berk, metîn, xurt

**tûl [I] 1.** şefaf û tenik **2.** pirtiyê tenik û şefaf

**tûl [I]** vehundirîn, veciniqîn

**-tûl dan** veciniqîn, vehundirîn

**-tul dan ser xwe** baz dan ser xwe, vehundirîn ser xwe

**tûle** têjikên seg û guran *“bextê çil rojên çileyî, tajiyê **tûle**yî û hespê quleyî tuneye”

**tûlemar** cureyekî marên girs e

**tûlik 1.** *(ji bo tiştên lûlekî û devteng)* teng **2.** tûle

**tûlincî rûniştin** wekî kûçikan rûniştin

**tûm 1.** baq **2.** kêrt

**tûman [I]** qerfok

**tûman [II] 1.** şalwar **2.** nîvê dêreyê jinan ê ji navikê berjêrtir e

**tûmik 1.** baqekî biçûk **2.** girik

**tûmtûmî** baqek li vir û baqek li dera han

**tûnc** cureyekî madenan e

**tûncik** porê li eniyê

**tûng** lûleya ji kaxetîta qalind

**tûqesp** tûyên reş

**tûr 1.** kîs, derdan **2.**heban **3.** çembera dorê *“**tûr**ê parsekan, tu carî tijî nabe”

**-tûra stûyî** katara stûyî

**tûrqul** derewîn

**tûrqulî** derewînî

**tûre** navê giştî yê rehçikên spî yên ku hişyariyên sehek û hereketan ji mejiyî dişînin endamên din

**-sazûmana tûreyê** di cendêk de pergala tûreyan

**tûrenasî** beşa pisporiyê ya ku li ser tûreyê lêkolî-

nan dike
**tûrik** kîsê biçûk
**tûş 1.** dûş, îstiqamet **2.** alî
**-tûşî hev bûn 1.** pergî hev hatin **2.** li hev xistin **3.** bi hev re têkiliya zayendî danîn
**-tûşî hev kirin 1.** pergî hev anîn **2.** berdan hev **3.** *(da ku bi hev re têkiliya zayendî daynin)* derfet amade kirin
**tût [I]** kund
**tût [II]** dengê tûtika erebeyan
**tût [III]** uryan, repal
**-tût û rût 1.** repal û tazî **2.** destevala û bêçek **3.** bêmal û deyndar **4.** bêçêre û bêdar **5.** vikvala û bêeşya
**-tût û rût bûn** repal û tazî bûn
**-tût û rût kirin** repal û tazî kirin
**tûtak** tûtî
**tûtevîn** cureyekî çivîkan e
**tûtik [I]** fîq
**tûtik [II]** lawikê viringî; kûto
**tûtî** çivîkeke ku axaftina mirovan dubare dike
**tûtya [I]** şîrê çivîkan; ango tiştê nedîtî û nebînayî
**tûtya [II]** madenê çingoyê
**tûx [I]** kirdan, kerdenek
**tûx [II]** qalik û qertîşa li ser tiştên sirûştî; titqal
**tûxavk** tixavk
**tûzik [I]** cureyekî daran e
**tûzik [II]** cureyekî çêreyê ye û tereter tê xwarin

# U

**u/U** tîpa bîst û pêncemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke kurt e, cîderka wê navderkî ye, di belavbûna wê de dev gilover e û asta belav-bûna wê bilind e
**ufuq** aso
**uh!** baneşana tirsandinê
**-uhî yekî kirin** tirsandin û qewirandin
**umet 1.** bawermendên ku peyrewiya Cn. Pêxember eleyhiselamî dikin **2.** peyrewên pêxemberên din *(silava Xwedê ser hemûyan be)*
**umîd** hêvî, bendeman, omit, mefer
**umîdwar** hêvîdar, bendewar, omitwar, meferdar
**umr 1.** emr **2.** temen *"heta Heleb bû Heleb, **umr**ê pîrika te çû"**
**umre** ji bilî rojên hecê yên diyarkirî tewafa Beytê
**urf** dab û nêrît
**-urfa deverê** dab û nêrîtên herêmê
**urûsî** pace
**uryan** rût, tazî, şilf û tazî
**uskere** tas
**utifk** gûşiyekî tiriyan ê biçûk

# Û

**û/Û** tîpa bîst û şeşemîn a alfabeya kurdî ye; dengdêreke dirêj e, cîderka wê paşderkî ye, di belavbûna wê de dev gilover e û asta belavbûna wê bilind e
**û** gihaneka navîna du peyv an jî hevokan
**ûc 1.** dêw, tewa **2.** ziha
**ûd** cureyekî alavên mûsîqayî ye
**ûdjen** kesê ku li ûdê dixe
**ûf** hûf, pûf
**ûf kirin** bi carekê de hûf kirin û daqurtandin
**ûfeûf** hûfehûf, pûfepûf
**ûfeûf kirin** hûfehûf kirin, pûfepûf kirin
**ûş** birîn
**-êş û ûş lê rabûn** derd û kul lê peyde bûn
**-êş û ûş lê rakirin** derd û kul lê peyde kirin
**ûşt** sedem, sebeb
**ûşteûşt** sergêjî û bela
**-anîn ûşteûştê** pir sergêjî û bela jê re çêkirin

# V

**v/V** tîpa bist û heftemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê diranlêvkî ye, awayê belavbûna wê fîzek û nerm e

**va 1.** evê han **2.** lê binêre *"**va** nîna ye, tirnîna li paş tê"

**-va ye tê** lê binêre ev kes/tişt tê

**vac** aqil û sirafet, feraset

**vajî 1.** serobino **2.** derxistina tiştê hundir li derve **3.** kelevajî

**vajî bûn 1.** serobino bûn **2.** hundir derketin derve **3.** kelevajî bûn

**vajî kirin 1.** serobino kirin **2.** hundir derxistin derve **3.** kelevajî kirin

**vala** xalî, ne tijî *"bi aqilê **vala,** tu nagihêjî hevalan"

**vala bûn** di hundir de tiştek neman

**valahî 1.** xalîtî **2.** feza

**van** awayê tewandî yê /ev/a pirjimar

**varik** mirîşka berhêk *"**varik**ên nû rabûne, hêkên sor dikin"

**varû** paşrû, aliyê piştê

**varyoz** mîrkut

**vatinî 1.** peywir **2.** wezîfe **3.** erk

**vawartin/divawêre/bivawêre** tiştê qenc ji yê xerab cihê kirin

**vawêr 1.** keyskirî **2.** cihê

**vawêr kirin** keys kirin

**ve** ecêb, veh

**veanî/vediiîne*(vetîne)*/vebîne** tewandin

**vebanîn/vedibane/vebane** hînî kesekî/rewşekî nebûn û lê zor hatin

**veberhênan** razemeniya aborî

**-veberhênana wizeya gêrebayî** karê hilberandina ceryanê

**veberhêner** kesê ku di qadekê de razemeniyan dike

**vebestin/vedibeste/vebeste** dubare girêdan

**vebijartin/vedibijêre/vebijêre 1.** çê û neçê ji hev veqetandin **2.** kêrhatî û bêkêr ji hev cihê kirin

**vebijêrk** **1.** xala hilbijartinê **2.** şiq

**vebijîn/vedibije/vebije** ji awayê cemidî derketin; helîn

**vebir** **1.** heyameke kurt **2.** delîve

**vebirî** **1.** teqez **2.** keyskirî

**vebirîn/vedibire/vebire** **1.** qerar dan **2.** bi kurtî çareser kirin

**vebûn/vedibe/vebe** negirtî bûn, *(tiştê devgirtî ji wê rewşê)* xilas bûn

**veciniqandin/vediciniqîne/veciniqîne** **1.** silikandin **2.** tirsandin **3.** bi awayekî tirsandî ji xewê rakirin

**veciniqîn/vedicinqe** **1.** silikîn **2.** tirsîn **3.** bi awayekî tirsiyayî ji xewê rabûn

**vecinoq** waswasok û tirsonek

**veçinîn/vediçine/veçine** **1.** vexwarin **2.** xwe jê girtin **3.** *(tiştê hûnandî)* çavî bi çavî tehmîr kirin

**veçirandin/vediçirîne veçirîne** *(tiştê hûnandî)* vereşandin

**veçirikandin/vediçirikîne/veçirikîne** **1.** xwe hilkutan, xwe hildan û li erdê xistin **2.** xwe vepincirandin

**veçirîn/vediçire/veçire** *(tiştê hûnandî)* jixweber vereşîn

**vedan/vedide/vede** kolan

**-ser vedan** tiştê veşartî eşkere kirin

**veder** **1.** tecrîdbûyî **2.** qewirandî

**veder kirin** **1.** qewirandin **2.** tecrîd kirin

**vedirûn/vedidirû/vedirû** cihê diriyayî an jî bişkuvî dubare û baş dirûn

**vedîtin/vedibîne/vebîne** **1.** kişf kirin **2.** pê hesîn

**vedizîn/vedidize/vedize** **1.** xwe veşartin **2.** xwe bilandin **3.** fizirîn

**vedor** ast, merhele

**vedorî** bi dorvegerî

**vefirîn/vedifire/vefire** li tiştekî asê bûn û şunde pekîn

**vegemirandin/vedigemirîne/vegemirîne** **1.** dabêlandin **2.** kumişîn ser *“li ber siya şêrî be, bila te **vegemirîne**”*

**veger** **1.** zivirîn **2**. fetl

**vegerandin/vedigerîne /vegerîne** **1.** zivirandin **2.** fetilandin

**vegerîn/vedigere/vegere** **1.** zivirîn **2.** fetilîn

**vegirtin/vedigire/vegire** **1.** fetih kirin **2.** îşxal kirin **3.** şunde wergirtin

**4.** rakişandin
**vegotin/vedibêje/vebêje 1.** qise kirin **2.** behs kirin **3.** salix dan
**veguhartin/vediguhêre/veguhêre 1.** tiştek li bal tiştekî din ve dagerandin **2.** teşe dan
**veguherîn/vediguhere/veguhere** teşe girtin
**veguhêztin/vediguhêze/veguhêze 1.** neqil kirin **2.** ferehte kirin, tayîn kirin
**vehanîn/vetîne/vebîne 1.** şunde vegerandin **2.** tewandin, badan
**vehatin/vetê/vebê** şunde vegerîn, dagerîn
**vehejandin/vedihejîne/vehejîne 1.** ziqinandin **2.** bi hejandinê ji xewê rakirin
**vehesîn/vedihese/vehese** westa xwe wergirtin
**vehewandin/vedihewîne/vehewîne** êwirandin
**vehiştin/vedihêle/vehêle 1.** para ve danîn **2.** radest kirin, îade kirin
**vejandin/vedijîne/vejîne 1.** jîndar kirin, ruh dan ber **2.** domdar kirin
**vejartin/vedijêre/vejêre 1.** ji hev veqetandin **2.** bi keys û pergal kirin
**vejen 1.** hêza bizavê, taqet **2.** çirûsk **3.** hejek
**vejîn/vedije/veje 1.** jîndar bûn, giyanewer bûn **2.** ruh lê teze bûn
**veketin/vedikeve/vekeve 1.** velezîn **2.** razan
**vekêşîn/vedikişe/vekişe 1.** para ve zivirîn **2.** şunde fetilîn **3.** *(bêyî ku bifetile)* şunde şunde çûn *“ger gotin ji gotinê bikişe, gotin ji eslê xwe **vedikişe**”
**vekirin/vedike/veke** ji rewşa girtîbûnê rizgar kirin *“huner çek e, di bin çengê xwe ke, roja ku hewce bû **veke**”
**vekirî** negirtî
**vekît** *(r)* îmla, rastnivîs
**vekîtandin/vedikîtîne/vekîtîne** awaz li gorî kîteyê par ve kirin
**vekolîn/vedikole/vekole 1.** lêkolîn kirin **2.** mitale kirin
**vekuştin/vedikuje/vekuje** vemirandin, tefandin
**velerizîn/vedilerize/velerize** dev û diran şeqeşeq kirin; ricifîn
**velîstin/vedilîze/velîze 1.** veciniqîn **2.** şaşwaz bûn **3.** firikîn **4.** leqîn
**velo kirin** wergerandin û

hilweşandin

**vemaliştin/vedimale/vemale** devmilên xwe hildan *"hem **vedimale**, hem jî dinale"

**vemayîn/vedimîne/vemîne 1.** egle bûn **2.** dereng man

**vemirandin/vedimirîne/vemirîne 1.** damirandin, tefandin **2.** nizm kirin **3.** aşt kirin *"agir bi êgir nayê **vemirandin**"

**vemirîn/vedimire/vemire 1.** damirîn, tefîn **2.** nizim bûn **3.** aşt bûn

**venan/vedine/vene 1**. danişîn, niştin **2.** gestin *"mêşa gûyî, li gûyî **vedine**"

**-li yekî venan 1.** gest kirin, pê ve dan **2.** lê dan

**venandin/vedinîne/venîne 1.** dirûtin, kêl kirin **2.** dan temaskirin **3.** mîheng kirin

**venasîn/vedinase/venase 1.** îtiraf kirin **2.** pê beled bûn

**venêrîn/vedinêre/venêre 1.** teselî kirin **2.** payîn

**veniştin/vedinişe/venişe 1.** venan **2.** rûniştin **3.** melisîn, lîs bûn

**vepelişandin/vedipelişîne/vepelişîne 1.** jirûxandin erdê **2.** deverû avêtin erdê

**vepelişîn/vedipelişe/vepelişe 1.** rûxîn erdê **2.** deverû ketin erdê

**veperimandin/vediperimîne/veperimîne** xwe gijgijandin û peraş kirin *"şêrê ku xwe **vediperimîne,** werîsî qetqetî dike"

**veperimîn/vediperime/veperime** gijgijîn û peraş bûn

**vepesirandin/vedipesirîne/vepesirîne 1.** aşt kirin **2.** rawestandin û arimandin

**vepesirî 1.** aştbûyî **2.** tebitî û arimî

**vepesirîn/vedipesire/vepesire 1.** aşt bûn **2.** rawestin û arimîn

**vepezandin/vedipezîne/vepezîne 1.** pezav dan xwe, xwe rakişandin **2.** fortê xwe avêtin

**vepijiqîn/vedipijiqe/vepijiqe** ji hev belav bûn

**vepirsîn/vedipirse/vepirse** li pey hev pirsîn, pirsîn û cardin pirsîn

**veqetandek** *(r)* qertafên ku mêjer û zayendê dinimînin

**veqetandin/vediqetîne/veqetîne 1.** cihê kirin **2.** mezaxtin **3.** ji hev jibartin

**veqetîn/vediqete/veqe-**

**te 1.** cihê bûn **2.** tenêman, terikandin

**verestin/vedirese/verese** xwe ji girêdan û qeydkirinê rizgarkirin û bazdan; xwe ji destan derxistin

**vereşandin/vedireşîne/vereşîne 1.** *(tiştê ku hatiye xwarin)* verijandin **2.** vala kirin **3.** *(tiştê hûnandî an jî jenandî)* xera kirin **4.** *(nivîsên kevnare li gor rêbazeke zanistî)* xwendin

**vereşîn/vedireşe/vereşe 1.** *(xwarin û vexwerina ku çûye hundir)* cardin veder bûn **2.** *(tiştê hûnandî an jî jenandî)* xera bûn **3.** *(nivîsên kevnare li gor rêbazeke zanistî)* hatin xwendin

**verê kirin** şun de vegerandin

**verês** rastnivîs

**verêstin/vedirêse/verêse** li gorî rêzanekê kişandina peyvan

**-şaşiyên verêstinê** şaşiyên rastnivîsê

**verêtin/vedirêje/verêje 1.** *(kinc)* reng lê çilmisîn **2.** vala kirin

**verij 1.** derhata salane ya giştî **2.** bermayî, puxte

**verijandin/vedirijîne/verijîne 1.** vala kirin **2.** vereşandin

**verik** pêlava ji mûyê hûnandî

**verotin/vediroje/veroje 1.** darotin **2.** kolan

**verûtin/vedirû/verû 1.** bi dest rûçikandin, destverû kirin **2.** hêncirandin, vegijgijandin

**veser** pêvek, îlawe

**veso** qehr û xeyd

**veşargeh 1.** kulîn **2.** mexzen

**veşarî** veşartî

**veşartî** nepen, nehênî

**veşartin/vedişêre/veşêre 1.** ser nixumandin **2.** li ber çavan wêde kirin *"rastiyê **vemeşêr*(-e)*** û mebêj*(-e):* 'ez im şêr' "

**veşartok** lîstikeke zarokan e; çavgirtonek

**veşewitîn/vedişewite/veşewite** *(ji ber berf, qeşa an tiştên kîmyewî)* çêrm şewitîn

**veşûştin/vedişo/veşo 1.** dawerivandin **2.** baravî kirin

**veterisandin/vediterisîne/veterisîne 1.** aşt kirin, arimandin **2.** êşa yekî birîn

**veterisîne/vediterise/veterise 1.** aşt bûn, arimîn **2.** ji êşekê xelas bûn

**vetewşandin/veditewşî-**

ne/vetewşînê** sersehmî kirin, sergêjî kirin
**vetewşîn/veditewşe/vetewşe** sersehmî bûn, serî lê gêj bûn
**vewestîn/vediweste/veweste** **1.** vehesîn **2.** rawestin
**vexistin/vedixe/vexe** **1.** danîn erdê **2.** li erdê xistin
**vexuyan** **1.** elamet **2.** berate **3.** şop
**vexwarin [I]** aviya vexwarinê; noşav, meşrûbat
**vexwarin/vedixwe/vexwe [II]** **1.** veçinîn **2.** noşîn, fir kirin **3.** nîç kirin, hilçinandin *"kaniya ku tu avê jê **vedixwî,** keviran mavêjê"
**vexwende** kesê ku gazî dêlindizekê an civînekê dike
**vexwendî** kesê ku hatiye gazîkirin
**vexwendin/vedixwîne/vexwîne** **1.** gazî kirin, bang lê kirin **2.** hatina kesekî xwestin
**vexwendname** dawetiye
**vexwînî hev bûn** *(afirandiyên jîndar)* li hev banîn û hînî hev bûn
**vezandin/vedizîne/vezîne** velezandin
**vezel** fayke
**vezelîn/vedizele/vezele** wekî ku vekeve rûniştin
**vezen** tiştê velezok
**vezîn/vedize/veze** **1.** peraş rûniştin **2.** palûşk pê ketin **3.** gilok bi paş ve ziyîn
**vezinîn/vedizine/vezine** gilok bi paş ve ziyîn
**vêca** îcar, vê carê
**vêketin** **1.** agir pê ketin, **2.** çira çirûsîn
**vêl/vêlik** amanên meht û nekûr, tehtevêlkî
**vêrik** bendê ku pê xarûkan didirûn
**vêsan** **1.** bêhnvedan **2.** palvedan **3.** xwejibîr-vekirin
**vêsandin/vêdisîne/vêsîne** **1.** tefandin, vemirandin **2.** rawestandin
**vêsiyayî** **1.** tefiyayî, vemirî **2.** rawestî *"westiyayiyan kir, **vêsiyayi**yan xwar"
**vêsîn/divêse/bivêse** **1.** tefîn, vemirîn **2.** rawestin
**vêxistin/vêdixe/vêxe** pê xistin
**vij** sewalê ku qiloçên wî bi ser eniyê de tewiyane
**vijag** peşk
**-vijag avêtin** peşk avêtin
**vikvala** xipxalî
**vin** kesê ku di bêfila xwe de diaxive; gino, gingi-

nok
**vingîn/divinge/bivinge** dengê vingîniyê pê ketin
**vingînî** dengê firîna mêşan, guleyên fîşengan û hwd
**vir [I]** ev cih
**-li vir** li vî cihî
**-vir de wê de kirin 1.** hok û çiv dan xwe **2.** li behaneyan gerîn
**vir [II] 1.** derew **2.** devbelaşî **3.** pertaf *"heke ne **vir** bin, li mala me jî pir in"
**virçiqî 1.** helisî **2.** pelixî
**virçiqîn/divirçiqe/bivirçiqe 1.** helisîn **2.** pelixîn *"got: 'heke tu çûyî bajarekî koran, tu jî çavekî xwe bigire; ne hêjîr **divirçiqe** ne jî hingiv genî dibe"
**virçevirç** dengê domdar ê tiştên rehn ên ku tên pêpestkirin
**-virçevirça heriyê** dengê meşa di nav heriya rehn de
**virçoqî 1.** pelîse **2.** pelixandî û şilavî
**virek 1.** derewker **2.** devçepel *"**virek,** çala xwe dikolin"
**virik** jêçûna hundirî; vîjik, îshal
**-virik bi ser avê xistin** pûçên yekî raxistin rastahiyê
**virikî bûn** vîjikî bûn, hundir jê çûn
**viringî/virnî 1.** zarokê nûbûyî **2.** sewala nûzayî ya ku hîna mezin nebûye û ne hilikî ye
**viritandin/diviritîne/biviritîne 1.** derbas kirin **2.** bi encam kirin
**viritîn/divirite/bivirite 1.** derbas bûn **2.** dawî lê hatin
**vir kirin 1.** derew kirin **2.** pertaf kirin
**virtoqî** kesê ku tevgerên wî neçê ne
**virûvî** goştê pijandî yê bidon
**virvirandin/divirvirîne/bivirvirîne** virvirkî avêtin
**virvirk** perwane
**virvirkî avêtin** tê werkirin
**virvirok** pêçke, toterîk
**viyan** vîn
**viyan/divê/bivê 1.** xwestin **2.** wisa mirad kirin *"ji dijmin re zarê xweş û pişta hişk **divê**"
**viz bûn 1.** fizirîn **2.** xwe xapandin
**vizek** kesê ku xwe ji kar û baran vedidize
**vizeviz** dengê firîna mêşan û xebata makîneyan
**vizeviz kirin 1.** *(mêş)*

firîn û deng derxistin **2.** *(makîne)* xebîtîn û deng jê hatin **3.** *(aferîndeyê jîndar)* pir lez çûn û hatin, bi lez xebitîn
**vizik** cureyekî mêşên havînê yên biçûçik in û bi vedana xwe ve navdar in; mixik
**vizîn/divize/bivize** bi dengekî bilind vingîn
**vizînî** vingîniya xurt
**vizvizîk** pêlîstokeke darînî ya ku bendekî lê dialînin û wisa dizivirînin
**-vizvizîk ketin qûnê** di şûna xwe de netebitîn
**vîn 1.** îrade **2.** xwestek *"**vîn**a dilan, di dayîna destan re diyar e"
**-vîna azad** îradeya serbixwe
**-vîna siyasî** îradeya ramyarî
**vîr** çavên ku di kort de çûne
**vîr bûn** çav di kort de çûn
**vît** *(guh)* fît/bel
**vît kirin** *(guh)* fît kirin/bel kirin
**vîzên** dengê bayî
**vîzevîz** dengê domdar ê bayî
**vîzevîz kirin** bi dengekî xurt ba hatin
**vîz kirin 1.** *(bi xidikandina pişta wan)* ker rakirin çargaviyan **2.** nav tê dan, niçandin

# W

**w/W** tîpa bîst û heştemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê lêvkî ye û awayê belavbûna wê nîvdengdêr e

**wa 1.** ewê han **2.** lê binêre *“**wa ye** goştê berxan e û li ber çavan e**”**

**-wa ye tê** lê binêre ew kes/tişt tê

**wajav** benda navendî ya ku avê digihîne her derê

**wan** awayê tewandî yê cînavka /ew/ê, cînavka pirjimariyê ya ji bo kesê sêyemîn

**wane** ders

**-wane dan** ders dan

**wanegeh 1.** fêrgeh **2.** pol

**waqên** dengê qaz, werdek û hwd

**waqewaq** dengê domdar ê qaz, werdek û hwd

**waqewaq kirin** *(qaz, werdek û hwd)* bi awayekî domdar deng derxistin

**war 1.** qad **2.** cih **3.** şûnewar

**-warê bav û kalan** niştingeha ku ji mêj ve malbatek lê akincî bûye

**-di vî warî de** di vê mijarê de

**-ji waran man** ji pêşketinê şunde man *“pesin daye, ji waran **maye”**

**wargeh 1.** êwirgeh, stargeh **2.** biryargeh **3.** welat

**warhêl** kesê ku ji warê xwe bi dûr ketiye

**warîn** kesê ku evîndar û girêdayiyê welatê xwe ye

**warkor 1.** wareş **2.** kordûnde

**warkoz** germiyan

**warnişîn** îqametgeh, êwirgeh

**warxan** xan û man

**wase/waşok** baz, başok

**wasite** hemû alavên siwarbûn û barkêşiyê **2.** navberkar

**navgîn**

**wate [I]** yanî, ango

**wate [II]** mehne

**watedar** mehnedar

**watenasî** di zimanzaniyê de mehnenasî

**watewarî** lêkolînên li ser mehneyan

**wawik** cureyekî sewalên

ku dişibihine guran; torîk, keftar
**waynefsî** rewşa ku her kes ketiye tatêla nefsa xwe
**we** awayê tewandî yê cînavka /hûn/ê
**webal** guneh
**-webal ketin stûyê yekî** guneh ketin para yekî
**weç 1.** hewcetî **2.** çilpiyê ziravik
**-li ser weçekî man 1.** girêdayî mûyekî man **2.** nêzîkî felaketê bûn
**weçe** nesl, nifş
**-çak-kirina weçeyê** helwestên başkirin û zêdekirina neslên jîndar
**-diyarkirina weçeyê** helwestên daxistina rêjeya neslan
**wefa** berdewamiya di dostî û evîndariyê de
**wefakar** kesê ku di dostî û evîndariya xwe de domdar e
**weg** sedsal, qirn
**wehşî** jakaw, hov
**wek** mîn, notl, fen
**-wek avê pê de çûyîn 1.** bê xeletî berdewam kirin **2.** ji ber xwe de zanîn
**-wek baranê ser de barî 1.** Xwedê pir mal dayê **2.** gule an jî kevir reşiyan ser
**wekat 1.** diyar **2.** kifş û servekirî
**wekat kirin 1.** diyar kirin **2.** kifş û ser vekirin
**weke** mîna, notla, fena
**wekhev** yeksan
**wekhevî** yeksanî
**wekî** mîna, notla, mînanî, fenanî, fena *“şûşeya dilan, **wekî** ku dişkê cebar nabe”
**wekok 1.** nimûne **2.** mînak
**welam** bersiv
**welaq 1.** hespê ku ne ader e **2.** sewalên sere yên malê; terîş
**welat 1.** memleket **2.** niştiman *“**welat**ê neyaran, bi buhistan e”
**-welatê xerîbiyê 1.** penaberî **2.** qurbetî
**welatî 1.** hemwelatî **2.** hembajarî **3.** memleketî *“welat xweş e, bi **welatî**yan”
**-welatiyê qaşo** xwedîgiravî ew jî ji wî welatî ye
**welatparêz** niştimanperwer
**weled** ewlad, zarok
**-dê weledê xwe avêtiye** hewirzeyeke giran heye û kes li kesî xwedî dernakeve
**welê** wisa *“ba çawa tê bênderê, **welê** bide ber bê”
**welî** qencê Xwedê *“ji we-

liyan dikeve xwelî, ji xweliyan dikeve **welî”**
**wen** dara bênîşt
**wenaq** cureyekî nexweşiya bêvil û qirikê ya ku dibijine der û dorê jî
**wend 1.** wêrek **2.** pêsivik
**weqf** saziya ku mal û milkê wê ji bo xêran hatiye veqetandin
**weqî** mengiraniyeke bi qasî kîloyek û 300 qramî ye *“**weqî,** li her derê çar tuxt e**”**
**weranîn/wertîne/werîne 1.** anîn **2.** hilanîn *“diyê bibîne, dotê **werîne”**
**werar 1.** tekamul, guherîn û stewîn **2.** geşbûn, pêşketin
**werar kirin** bi pêş xistin
**-bernameya werarkirina avadaniyê** pêşniyarên pêşxistina rewşa welêt
**werbadan/werbadide/werbade** li hev alandin
**werbûn/werdibe/werbe 1.** bi deverûkî pelişîn erdê **2.** qulopanîkî gindirîn
**werdek** cureyekî heywanên bibask ên malê ye, cureyekî wan ê çolê jî heye, ji qazan biçûktir e û pir ji avê hez dike; sone
**werê** wisa, wilo
**werger** tercume
**wergerandin/werdigerîne/wergerîne 1.** tercume kirin **2.** qulibandin **3.** hilweşandin
**wergerîn/werdigere/wergere 1.** ji zimanekî derbasî zimanekî din bûn **2.** ji temtêlekî derbasî yeke dîtir bûn **3.** qulibîn **4.** hilweşîn
**wergêr** tercuman
**wergêrî** tercumanî
**wergirtin/werdigire/wergire 1.** hildan **2.** standin **3**. li xwe kirin
**werhatin/wertê/werbê** gevizîn
**werimandin/diwerimîne/biwerimîne 1.** nepixandin **2.** perçifandin
**werimîn/diwerime/biwerime 1.** nepixîn **2.** perçifîn
**weris 1.** bendê stûr ê hûnandî **2.** mîratxur *“mar pê veda, ji siya **wêris** tirsiya**”**
**weritandin/diweritîne/biweritîne 1.** şaşwaz kirin **2.** xalifandin **3.** xurifandin
**weritîn/diwerite/biwerite 1.** şaşwaz bûn **2.** xalifîn **3.** xurifîn
**werixîn/diwerixe/biwerixe** terixîn
**werm** temtêla tiştê ku nepixiye û hilpingiriye;

perç
**werqilandin/diwerqilîne/biwerqilîne** sekinandin, rawestandin
**werqilîn/diwerqile/biwerqile** sekinîn, rawestin
**werqîl** barê girêdayî; balî
**wert** **1.** zuriyet **2.** nifşên nûhatî
**werwere** demançe, şeşar
**werz** **1.** demsal **2.** bîstan **3.** rewş û temtêl
**werze** **1.** zanistên hesabî **2.** ziraet, çandinî
**werzeba** cureyekî bayên bakura rojhilat e
**werzek** **1.** zanayê zanistên hesabî **2.** karkerê çandiniyê
**-wezareta werzeyê** saziya karên çandiniyê
**werzêr** werzek
**werzî** demsalî
**werzişt** **1.** perwerdeya bedenî **2.** riyazet
**werziştkar** kesê ku bedena xwe perwerde kiriye
**wesan** **1.** hişyarî **2.** îxtar
**wesandin/diwesîne/biwesîne** **1.** hişyar kirin **2.** îxtar kirin **3.** şandin pey
**wesem** sorav
**wesle** **1.** parçe **2.** gihaneka navbera tu tiştan
**wesp** başbûna cureyê tiştekî
**west** **1.** betl **2.** bizdîn
**-west girtin** **1.** vehesîn **2.** rawestin
**westan** **1.** muhlet **2.** navbir **3.** rawestan
**westandin/diwestîne/biwestîne** **1.** betilandin **2.** bizdandin
**westîn/diweste/biweste** **1.** betilîn **2.** bizdîn
**weş** **1.** qilqilîn û milmilîna tiştan **2.** hej, leq
**weşan** neşriyat, çapkirin
**-weşana yekser** ragihandina zindî
**weşandin/diweşîne/biweşîne** **1.** çap kirin û belav kirin **2.** hejandin, leqandin **3.** rijandin
**weşanger** kesê ku kovar, pirtûk û tiştên din çap dike û difroşe
**weşanxane** firoşgeha ku pirtûkan çap dike û difiroşe
**weşîn/diweşe/biweşe** **1.** çap bûn û hatin belavkirin **2.** hejîn **3.** rijîn
**weşk** **1.** arek **2.** kevn û kot
**weşweşîn/diweşweşe/biweşweşe** **1.** milmilîn **2.** çelexwarî meşîn **3.** wekî sermestan tev gerîn
**wexer** **1.** koç **2.** mirin
**wexer kirin** **1.** koç kirin

mal bar kirin **2.** mirin
**wexêr!** oxir be!
**wexîm** elametên aloziyê yên berî qeyranê
**wext** dem, heyam *"her tişt di **wext**ê xwe de xweş e"
**-wext teng bûyîn** dema kirin û çêkirina tiştekî neman
**wextî** demdemî
**wexm** darbesta miriyan
**wey!** baneşaneke şaşwaziyê ye
**wey li min!** delîl li halê min!
**weyn 1.** di kar an jî bernameyekê de peywira her lîstikvanî **2.** hîle
**weyner** hîlebaz
**weynê** di kar an jî bernameyekê de lîstikvana jin
**weyno** di kar an jî bernameyekê de lîstikvanê mêr
**wezaret 1.** saziya dûgelê ya ku bi beşeke rêvebiriyê radibe; kizîrî **2.** giregirî
**wezîr 1.** kizîr, rêvebirê beşeke desthilatiyê **2.** giregir *"her kes, **wezîr**ê mala xwe ye"
**wezn 1.** kêş, pîvan **2.** azîne
**wezne** di saziyan de cihê ku diravan werdigire û dide
**weznedar** peywirdarê li ber wezneyê
**wê** awayê tewandî yê cînavka /ew/ê, cînavka yekjimarî ya ji bo kesa duyemîn
**wêje 1.** edebiyat **2.** tore
**-wêjeya devkî** edebiyata tomarnekirî ya di nava axafgeran de
**-wêjeya nivîskî** edebiyeta axafgerî, dîtbarî û nîgaşî ya ku hatiye tomarkirin
**wêjeyî 1.** edebî **2.** toreyî
**wêjemend 1.** edîb **2.** torevan
**wêjenas 1.** pisporê edebiyatê **2.** pisporê toreyê
**wêl 1.** ajala ku ji keriyê xwe veqetiyaye **2.** beredayî
**wêne 1.** resm û şikilên ku tiştên heyî li ser kaxezê dinimînin; nîgar **2.** cure, awa *"sê **wêne** dost hene: nano, gano, cano"
**-wêne girtin** şikil kêşan
**wêneçîrok** çîrokên ku bi wêneyan hatine şîrovekirin
**wêneguhêz/wênegir** amûra ku dîmenan wekî wêneyan vediguhêze ser kaxezan
**wênekêş** kesê ku bi wêneguhêzê wêneyan dikêşe
**wêra** egîd, wêrek

**wêran** kavilbûyî û xopan
**-navekî giran li ser gundekî wêran** navdariya bêbingeh
**wêran bûn** kavil bûn, kevir li ser kêvir neman
**wêrane** cihê kavilbûyî
**wêran kirin** kavil kirin, kevir li ser kêvir nehiştin
**wêrandin/diwêrîne/biwêrîne 1.** han dan **2.** cesaret dan yekî
**wêrek** bêtirs û egîd
**wêrîn/diwêre/biwêre 1.** cesaret kirin **2.** netirsîn *"tu bihusta wî zêr daynî **newêre**"
**wiha** bi vî awayî
**wijdan** seheka berpirsiyariyê *"dilê hişk, **wijdan** tê de nasitire"
**wilayet** parêzgeh
**wilo** wiha, wisa
**winda 1.** berze **2.** binevat **3.** têkçûyî **4.** heliyayî
**winda bûn 1.** berze bûn, ji dest çûn **2.** têk çûn **3**. binevat bûn **4.** helîn
**winda kirin 1.** berze kirin, ji dest kirin **2.** têk birin **3**. binevat kirin **4.** helandin
**wir** awayê tewandî yê cînavka /vir/ê
**wiş!** baneşaneke di wateya /pî!/yê de
**wird** duaya domdar
**wirêne kirin** *(ji ber nexweşiyeke giran an jî di xewê de)* gotinên beletewş kirin, ji bestan peyivîn
**wisa** wilo, bi wî awayî
**wize 1.** taqet, hêz **2.** şiyan **3.** vejen
**-wizeya gêrebayî** hêza cereyanî
**-wizeya kakilî** hêza atomî
**-wizeya mirovîn** hêza însanî
**wî [I]** awayê tewandî yê cînavka /ew/ê, cînavka yekjimarî ya ji bo kesê duyemîn
**wî [II]** wiş!, pî!
**wîç** vebijêrka pêkan û guherbar
**wîçewîç** dengê çivîkan
**wîlayet** eyalet, parêzgeh
**wîste** daçek
**wîşt! [I]** baneşana gazîkirin û hişyarkirinê
**wîşt [II]** silav, pate
**wîştandin/diwîştîne/biwîştîne 1.** gazî kirin **2.** fîtandin yekî **3.** uhî yekî kirin **4.** meçêtir miseletî serê yekî bûn **5.** bi fîqê hişyar kirin
**-ma hinekan wîştandiye te? 1.** ma tu dîn bûyî? **2.** hinekan nav te daye/niçandiye te?
**wîştînî** fîtînî
**wîştewîşt** dengê fîqê yî domdar

**wîtewît** dengê teyr û çivîkan î domdar

**wuçan** **1.** navber **2.** sekn, rawest

**-wuçana asayî** betlaneya salane ya karmend û karkeran

**-wuçana nexweşiyê** betlaneya ku karmend û karker di dema nexweşiyan de bi kar tînin

**-wuçan dan** navber dan

**-wuçan girtin** bi wêneguhêz an jî dîmenguhêzê rawesta tiştekî ecibandin û wêne/dîmen kişandin

**wuşe** peyv, kelîme, bêje

**wuze** vejen, taqet

**wutû** hesinê ku di avasaziyê de tê bikaranîn

# X

**x/X** tîpa bîst û nehemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê ezmandevî û qirikî ye, awayê belavbûna wê nîvdengdêr e
**xaç** nîşaneya filehan a wekî zêdekê ye; (+), selîb
**-xaç di paşilê de bûn 1.** kesek bi bîsa xwe nehesandin **2.** dilhişkiya xwe nîşan nedan
**Xaça Sor** rêxistineke filehan a tenduristiyê ye
**xaçepirs 1.** kevala ku bersivên pirsan rast û berjêrkî têde têne bicihkirin **2.** pişkanê, pişkbazî
**xaçerê** şahrê
**xaçerêz** xaçepirs
**xaçirgan** kuçikên datînin bin sêl û beroşê
**xaçparêz** fileh
**xag** xav
**xak 1.** xwelî, ax **2.** welat
**xakenas** bêra kolan; pêmer
**xakî** rengê axê
**xal [I]** birayê diya mirovî *"bûka **xal**ê, delaliya malê"
**xal [II] 1.** deq, niqte **2.** şanik
**xalbendî** *(r)* di hevokê de awayê bikaranîna hin nîşaneyan; niqteşanî
**xale** cureyekî bê ye
**xalebêhnok** *(r)* di xalbendiyê de nîşaneya /;/ê
**xalî 1.** vala **2.** tenê **3.** xewle
**xalî bûn 1.** vala bûn **2.** tenê bûn **3**. xewle bûn
**xalîçe** bêrkun, berik, merş
**xalojin** jina xalê mirovî; jinxal
**xaltî** xwişka diya mirovî *"bêhna diyan, tê ji **xaltî**yan"
**xalxalî** deqdeqî
**xalxalok** bihukek e
**xam** tiştê destpêneketî an jî negihiştî
**-xam bûn** *(ji ber ku demeke dirêj nexebitiye an jî nereviyaye)* her dera cendekê wî êşîn
**-xamiya sewalê şikandin** derxistin derve û meşandin, xebitandin an jî bezandin
**-xam kirin** *(mirov an jî se-*

*walê ku nexebitiye an jî nebeziyaye)* bi xebat an jî bezandinê pir westandin û cendek lê giran kirin

**xama 1.** berzewac û negihiştî **2.** duşîze

**xame** qelem, pênûs

**xamek 1.** dareke ku rengê kulîlkên wê binefşî ye û bêhnxweş e **2.** rengê binefşî

**xamoş** kesê ku ramanên xwe ji kesî re venake û wan bi kesî re parve nake

**xamoşan** kesê terkeser

**xamox** ava peşîn a ku didine ser zeviya çandî

**xan [I] 1.** mal û hal **2.** êwirgeha rêwiyan *"dinya xan e, **xan** nabe bê mêvan e û însanê lê jî bazirgan e**"**

**-xan û sera** koçk û qesr

**xan [II] 1.** sifre, xwan **2.** xwarin, xurek

**xan [III] 1.** ast **2.** temtêl

**xandar** xwediyê êwirgeha rêwiyan

**xane** mal, malik

**xanedan** malbata ku ji nifşa kesayeteke dirokî ye

**xaneper** malper

**xanenişîn** karmendê ku piştî temambûna salên peywira wî ji xebatê hatiye veqetandin; karnişîn

**xangar** rehekên ku li ser rûyê erdê şîn dibin û zêde ne bilind in

**xanik** texteyê nanpehtinê

**xanim** jina birûmet, stî

**xanî 1.** avahiya ku mirov lê diêwirin; mal **2.** xan û man; warxan *"**xanî,** li ser cemedê çênabe**"**

**xanûman** xaniyê ku ji qatekî têkûz an jî ji çend qatan pêk tê

**xanût** tevn

**xanxanik** nivîsên ku bi alîkariya xêzan hatine destnîşankirin

**xap 1.** fêl û gilor **2.** dek û dolab

**xapandin/dixapîne/bixapîne 1.** hîle li sêrî kirin **2.** weritandin **3.** bilandin **4.** xirandin

**xapîn/dixape/bixape 1.** tûşî dek û dolaba yekî hatin **2.** weritîn **3.** pê bilîn

**xapînok** hîlebaz, dekbaz

**xapxapik** şimikên ku binên wan darîn e

**xapxapok** çivîkek e

**xapûr** wêrane û kavilbûyî

**xar [I]** kevirê ku alavên qutkirinê pê tên tûjkirin; hesan

**-xar kirin** bi hesên tûj kirin

**xar [II]** beza hespê

**-xar kirin** hesp bezandin
**xar [III]** parçeyên gilover ên di çîva tayeyan de
**xara [I]** hespê beza
**xara [II]** kevirê mermer
**xaraw** kesê ceribandî û dinyadîtî
**xarik 1.** hesanê biçûk **2.** qada nava gund
**xarim** xurom
**xarîz** cureyekî xwarina ku ji arvan û rûnî tê çêkirin
**xarmût** bazinê ku davêjin stûyê hespan û erebeyê pê ve girêdidin
**xarûk** solên çêrmîn ên heyamên berê; çarix
**xarûz** dendikên gûzan û hwd ên gelwazkirî
**xas 1.** tiştê ku ji der ve de tiştek tev nebûyê, saf **2.** piyê tazî
**xasma** bi taybetî
**xasmêr** mêrxas
**xasûk** kone
**xaşe [I]** xavika li ser hin endaman; pizdan
**xaşe [II]** her tiştê ku hûrhûrî bûye
**xaşî** telîsê mezin; bardan
**xatir 1**. qedr û qîmet **2.** destûr *“**xatir**ê kûçikan tuneye, xatirê xwediyan heye”
**-xatir xwestin** destûra veqetînê xwestin
**xatirnas** kesê ku qedr û qîmetê kes û tiştan dizane
**xatûn 1.** jin **2.** jina esîlza **3.** keybanû *“kar ê karkeran, namûs a **xatûn**an e”
**xav 1.** nepijî **2.** nestewî **3.** negihiştî *“di navbera dînîtî û biaqiltiyê de mûyekî **xav** heye“
**-bûjenên xav** têkberên xam
**xav bûn** *(rîs bi singîrê)* nermik û sist bûn
**xav kirin** *(rîs bi singîrê)* nermik û sist kirin
**xavik [I] 1.** laçik **2.** tulbend
**xavik [II] 1.** pizdan **2.** tebeqeya ku li ser tiştê kelandî pêk tê **3.** to
**xavî 1.** nepijîtî **2.** nestewîtî **3.** negihiştîtî
**xawên 1.** rûmet **2.** şeref
**xawênî** endamê rûmetê
**-serokê xawênî** rêberê fexrî
**xawênşikû** rêvebirê rêzdar
**xawêr** rojhilat
**xawûşe** kesê ku cendekê wî ji hêtan berjêrtir şileke bûye
**xawûşe bûn** di hêtan de nivîşkan bûn
**xawûşe kirin** di hêtan de nivîşkan kirin
**xax** rezîl û riswa
**xaxî** rezîltî û riswatî

**-xaxiyên nemayî kirin** rezîltiyên nedîtî û nebînayî pêk anîn
**xayîn** **1.** qeleş **2.** xax *“bi mirovê **xayîn** re megere”
**xayîntî/xaynetî** **1.** qeleşî **2.** xaxî
**xayîz** **1.** jixweveçûyî **2.** neheşî
**xayîz bûn** **1.** dil jê çûn **2.** ji xwe ve çûn
**xebat** **1.** kar **2.** çalakî *“ketî, bi **xebat**ê radibe”
**xebat kirin** kar kirin
**xebatkar** karker *“dara **xebatkar**an, tim bi ber e”
**xeber** **1.** nûçe **2.** dijûn **3.** agehî *“bê dev, **xeber** nayên tev”
**-xebera sar** nûçeya diltezîn
**-xeber dan** **1.** axivîn **2.** ragihandin *“**xeberdan,** bê dor tê ser nezanan”
**-dan xeberan** sixêf û çêr gotin
**xeberoşk** çîrok
**xebitandin/dixebitîne/bixebitîne** **1.** karek bi kesekî dan kirin **2.** amûrek dan şixulandin **3.** bi kar anîn
**xebitîn/dixebite/bixebite** **1.** kar kirin **2.** şixulîn **3.** hewl dan *“**bixebite,** heta ku xwîn di ber neynûkên te re bavêje”
**xebxeb** *(di devê giyanewweran de)* lama binî ya ku didan li ser rêzbûne; binê erzenê
**xedar** **1.** bêrehm û bêwijdan **2.** bêgav û bêderman *“gîskî gote sibatê: ‘çirt û çirt sibatokê, ez giham diya xwe adarokê’; sibatê gote adarê: ‘bide min sê rojên **xedar**, ez dê gîskî ji latî bînim xwar’ ”
**xedeng** tîra ku ji dara gêzê ye
**xef** raz, bîs
**-di xef de girtin** dizîka û ji nêşkê ve girtin û firsenda bizavê nedan
**-xef kirin** veşartin
**xefe** cihê teng, bêhewa û fetisok
**xefeng** dervank
**xefik** tele, dafik, bûse *“rovî, du caran nakeve **xefik**ê”
**xefirxan** nexweşiya pişikxerabûnê ya ku nexweşan pir dikuxîne
**xefirxanî** kesê ku bi nexweşiya xefirxanê ketiye
**xeft** konê piçûk ê şînan, çartaqa şînê
**xel [I]** tirşbûna aşikê
**xel [II]** niqteya ewlehiyê ya li derveyî tixûbên neteweyî

**xela** kêmbûna debara jiyanê; tunetî *“mal an ji **xela**yê re, an ji belayê re”
**-xela rabûn** tunetî pêk hatin
**-xelaya mêran rabûn** di civakê de xîretkêş neman
**xelan 1.** lihevalîn **2.** tewîn
**xelandin/dixelîne/bixelîne 1.** badan **2.** tewandin
**xelas bûn 1.** kuta bûn **2.** qedîn **3.** rizgar bûn *“bi mineminê, mirov **xelas nabe** ji jinê”
**xelas kirin 1.** kuta kirin **2.** qedandin **3.** rizgar kirin *“kes ji neyarê xwe re nabêje: ‘bila Xwedê te **xelas bike**’ ”
**xelat 1.** diyarî, bexş **2.** bexşîş
**-xelata şanaziyê** nîşane an jî diyariya fexrî ya ku didine kesayetên girîng
**-xelat û celat** şabaş û seza
**xelatgir** kesê ku diyarî û bexşîşê hildide
**xelat kirin 1.** diyarî kirin, lê bexşandin **2.** bexşîş dan
**xeleng** giyayê ku jê gêziyan çêdikin; hewşan
**xeleq 1.** çembil **2.** gustikên porî
**-xeleq kirin pozê yekî** wekî hirça pozxeleqkirî li dû xwe gerandin û xwestekên xwe pê dan kirin
**xelet 1.** çewt û ne rast **2.** xulp
**xeletî 1.** çewtî û nerastî **2.** xulpî
**xeletî kirin 1.** çewtî û nerastî kirin **2.** xulpî kirin
**xelexopî** kelexwarî
**xelî** pir, zehf
**xelîc** avteng
**xelîfe** serokê hemû misilmanan
**xelîn/dixele/bixele** *(mîde)* li hev ketin, tirş bûn
**xelq 1.** milet **2.** ehalî **3.** gel *“**ji xelq**ê re masîgir e, ji xwe re kûsîgir e”
**xelûz** kevirê reş ê ku dibe şewate û ardû; rijî
**xelwet 1.** tenêtî **2.** înziwa
**-ketin xelwetê** ketin silûkê
**xem 1.** kul **2.** keser **3.** derd **4.** tatêl *“karê gavekî, **xem**ên salekî ne”
**-xem kişandin** ketin fikar û tatêlê
**-xem revandin** dil rehet kirin
**xemgîn 1.** dilbikul, keserkêş **2.** derdomerdo, dilbirîn, cegerxwîn
**xemilandin/dixemilîne/bixemilîne** çîç kirin, bedew kirin

**xemilîn/dixemile/bixemile** **1.** çîç bûn **2.** bedew bûn *"heta Xidir **xemilî,** dawet betilî"

**xemirîn/dixemire/bixemire** *(mêwe)* gihiştin û reng guherandin

**xeml** alavên bedewî û delaliyê *"zarok **xeml**a mala ne"

**xemr** mey, şerab

**xemrevîn** kesê ku bi axaftinên xweş û şirîn xeman ji bîr dibe; aramdêr

**xemrî** di rengê meyê de;

**xemsar** **1.** îhmalkar, bêhemal **2.** sersar

**xemsarî** **1.** îhmalkarî, bêhemalî **2.** sersarî

**xemxur** dilsoz, muxlis

**xemxurî** dilsozî, îxlas

**xenas** fesad, ewan

**xenasî** fesadî, ewanî

**xencer** cureyekî kêrên cengî yên ku nikê wan xwar û tûj e *"**xencer** bira ye, tifing pismam e"

**xendeq** **1.** cihoka biber û kûr **2.** çala kûr û fireh

**xengel** cureyekî xwarina ku lewaşeyê hûr ê qutkirî bi goştê hêrandî dadigirin û dipêjin

**xeniqandin/dixeniqîne/bixeniqîne** **1.** fetisandin **2.** şeniqandin **3.** bêhn lê çikandin *"kesîb ji tunebûnê diçe ku xwe **bixeniqîne,** dibîne ku dewlemend kêp li stûyê xwe dialîne; vedigere û dibêje: 'dîsa jî şikir ji halê me re' "

**xeniqîn/dixeniqe/bixeniqe** **1.** fetisîn **2.** şeniqîn **3.** behn lê çikîn

**xenî** **1.** dewlemend **2.** destbelaş, comerd, sexî

**xenîmî çavan bûn** *(ji ber nankoriyê)* tûşî karesatekê hatin

**xenûqe** **1.** xemlên li ber xeneqê; gerdenî **2.** şirdan

**xenzirandin/dixenzirîne/bixenzirîne** kizirandin

**xepar** kax, aşêf

**xepartin/dixepêre/bixepêre** kax kirin, aşêf kirin

**xepe** dîn û cinî

**xepik** dafik, tele

**xepse** **1.** deng û dor **2.** şuloxî

**xepse kirin** **1.** bi dengê bilind qîjevîj kirin **2.** şuloxî kirin

**xera** **1.** teqoze **2.** feramûşî **3.** kavilbûyî **4.** genîbûyî

**-xera bûn** **1.** teqoze bûn **2.** feramûş bûn **3.** kavil bûn, hilweşîn, wêran bûn **4.** genî bûn

**-xera kirin** **1.** teqoze kirin **2.** feramûş kirin **3.** kavil

kirin, hilweşandin, wêran kirin **4.** genî kirin *"çi kir, bi destê xwe mala xwe **xera kir**"
**xerac** xûgî, bac, kamçûr
**xeraf** tora masiyan
**xerat** dartiraş, necar *"ji xelqê re **xerat** e, ji xwe re malmîrat e"
**xerbazî** laqirdiyên bi destan
**xerbend 1.** dîl, hêsîr **2.** girêdayî
**xerbende** teqoze
**xerc** mesref
**-ev îş xercê te ye** ev kar sezayî/minasibî te ye
**-xerc û merc** heys û beys
**xerc bûn** lê mesref bûn
**xerc kirin** mezaxtin
**Xerçeng** Kelûya Kevjalê; Xermanan *(21'ê Pûşperê-20'ê Tîrmehê)*
**xerdel** tovê rehekeke ku tê de bûjeneke şirîn, sext û sotîner heye
**xerêf** spîtahiya ku piştî xewê di kortikên çavan de dimîne; zirîçka çêv
**xeriqandin/dixeriqîne/bixeriqîne 1.** çilmisandin **2.** *(reng)* xera kirin **3.** tê de gut kirin **4.** neheşî kirin
**xeriqîn/dixeriqe/bixeriqe 1.** çilmisîn **2.** *(reng)* xera bûn **3.** tê de gut bûn **4.** ji xwe ve çûn
**xeritandin/dixeritîne/bixeritîne 1.** spîldax derbas kirin **2.** ji ser ve parçeyek qut kirin
**xeritîn/dixerite/bixerite 1.** spîldax derbas bûn **2.** ji ser ve parçeyek qut bûn
**xerîb 1.** biyanî **2.** bêgane
**xerîdar** bikir, muşterî
**xerîte** nexşe
**xerîtok** hûr û mûrê ku ji ber darê qutkirî an jî darotî dimîne
**Xermanan** Kelûya Kevjalê; Xerçeng
**xermaşe** alaveke pênctilî ya ku pê giya zad tê berhevkirin
**xermişandin/dixermişîne/bixermişîne** pencirûk kirin
**xerpişt** pişteka alîkar a ku didine ber tiştekî ku zor lê hatiye
**xerte** çandiniya ku bêyî şovhiştinê hatiye reşandin
**xerxere 1.** dengê ku ji qirika kesê di ber sekeratê de tê **2.** avwerdana li qirikê
**xerz 1.** şitla ku êdî bûye dar **2.** hêkên hûrik ên hin ajalan
**xerz kirin** hêkên biçûçik kirin
**xes** cureyekî çêreya pelpe-

raş e û nepijî tê xwarin; kaho

**xesandin/dixesîne/bixesîne** **1.** ji rewşa nêrtiyê derxistin, bêkêr û bêkîr kirin **2.** ji mêraniyê xistin

**xesar** ziyan û zirar

**xesifîn/dixesife/bixesife** ji temtêlekî ber bi yeke jê kambaxtir ve daketin

**xesî/xesû** xwesû

**xesîl** raxistina nava malên gundan a ku ji cîl û cegên çedikin

**xesok** kesê ku karê wî xesandina sewalan e

**xeşîl** cureyekî çêreyê ye

**xeşîm** xedar

**xeşîme** **1.** riya nepen **2.** kulek, kunik

**xeşûm** ecemî û tor

**xet** **1.** xêz **2.** nivîs **3.** riya ku tiştek tê re derbas dibe; guzergeh *"**xet**a xwar, di gayê pîr de ye"

**xeta** karê çewt, xeletî

**xetakar** kesê ku karên çewt didomîne

**xetat** pîşekarê destnivîsên bedew

**xeter** tehlûke

**xetere** tirsa ziyandîtinê

**xeternak** **1.** bitehlûke **2.** tirsnak

**xew** paldan, razan *"**xew** û mirin, yek e"

**-xewê zor lê kirin** ji ber bêxewiyê li ser xwe nesekinîn

**-xew lê herimîn** ji ber xemekê ranezan

**xewar** kesê ku xewa wî giran e, xilmaş

**xewas** giregirekên civakê

**xewge** textikê ku nivînên razanê li serê tên raxistin

**xewirîn/dixewire/bixewire** **1.** ji binî ve şewitîn **2.** tê de gut bûn

**xewle** **1.** cihê ku kesek lê tuneye **2.** tenê **3.** bixeter

**-xewle bûn** **1.** li cihekî tenê bi tena serê xwe man **2.** ketin silûkê

**-xewle kirin** **1.** hevpeyvîneke taybet kirin **2.** *(ji bo ku qeleşiyekê bîne sêrî)* ji civakê bi dûr xistin

**xewlexane** dêra silûkê

**xewn** **1.** ruya **2.** nîgaş, xeyal *"ne li goristanan radikevim, ne jî **xewn**ên xerab dibînim"

**-xewn dîtin** di xewê de bûyerin dîtin

**xewneroşk** xewnên di rewşa hişyariyê de

**xewtêş** nexweşiya pirxewariyê

**-bi xewtêşê ketin** bi nexweşiya pirxewariyê ketin

**xeyal** nîgaş *"**xeyal**a birçi-

yan, nan e”
**xeyalî** nîgaşî
**xeyal kirin** nîgaş kirin
**xeybet** paşgotinî *“**xeybet,** li ba zarokan nabe”
**xeyd** minet
-**xeyd ketin stûyan** bûn berpirsiyarê pirsgirêkan
**xeydok** suhatî
**xeyidandin/dixeyidîne/bixeyidîne** sil kirin, bûn sedemkarê suhatina kesekî
**xeyidîn/dixeyide/bixeyide** sil bûn, su hatin *“kêvroşk jî carinan ji çiyan **dixeyidin**”
**xeynî** xeyrî, bilî
**xeyrî** jê awarte ye
-**ji xeyrî te** tu jê awarte yî
**xeyset** xwî, xislet *“**xeysetê** nebaş, xezeba Xwedê ye”
**xezal** bizina kovî; ask *“ji **xezal**ê bezatir tune, ji risqê xwe pê ve naxwe”
**xezeb 1.** rik **2.** hêrs *“dilê bi**xezeb**, mirovî nagihijîne mexsed û miradan”
-**lê hatin xezebê** jê re rik û hêrsa xwe anîn
**xezne** gencîne
**xeznik/xeznok** qutiya biçûk a ku diravên hûr tê de tên civandin
**xezûr 1.** *(ji zavê re)* bavê bûke **2.** *(ji bûkê re)* bavê zavê *“**xezûr,** di şûna bavan de ne”
**xêl [I]** xulek, kêlî
-**xêlek berê** berî çend xulekan/kêliyan
**xêl [II]** govend
**xêlî** mêzera ku davêjin ser serê bûkê û zava roja dawetê wê vedike *”dizê malê ji malê be, ga bi **xêli**yê dertê”
**xêr [I]** na, nexêr
**xêr [II] 1.** qencî û başî **2.** sedeqe *“bi **xêr**a seriyan, dixwe keriyek nan”
-**xêr kirin 1.** bazar kirin **2.** qencî kirin **3.** sedeqe dan
**xêr [III]** teral, selexane
**xêrat** sedeqe
**xêratxane 1.** aşxaneya xêrxwazan a ku xwarinê li xizanan belav dike **2.** êwirgeha kal û pîrên bêkes
**xêrîtî** teralî, selexanetî
**xêrnexwaz 1.** nebaş **2.** xerabîxwaz
**xêv 1.** hafize, bîr **2.** hiş
**xêve** mêwe û sewziyên ku di di serê demsalê de an jî derveyî demsalê hatine gihandin
**xêvet** konikê biçûk î yekstûn
**xêvik 1.** bîroke **2.** kerose
**xêvzan** kesê ku agehiyên pêşerojê ji xelqê re ve-

dibêje; falzan, remlavêj

**xêz 1.** şopa zirav û dirêj; xet **2.** şeklê ku ji meşandina xalekê pêk tê

**-xêza asoyî** xeta ku bi berahî tê kişandin

**-xêza çemberî** xeta nîgaşî ya ku bi berahî cîhanê di nîvî de dibire

**-xêza nedîtbar** xeta ku bi çavan nayê dîtin an jî bi awayekî nîgaşî tê hesibandin

**-xêza stûnî** xeta ku bi dirêjahî tê kişandin

**xêzefîlm** fîlmên ku naveroka wan destxetî hatiye amadekirin

**xêzepehn** xêza asoyî

**xêzerast** xeta ku bê çiv û rasterast tê kişandin

**xêzexwar** xeta berwar û qilç, hêlelar

**Xêzên Asimanî yên Kurdistanê (XAK)** dezgehê raguhastina hewayî ya Kurdistanê

**xêzkar** xetat, xetkêş

**xêz kirin** xet kêşan

**xicîl kirin 1.** mehcûb kirin **2.** dan şermê

**xiçviçandin/dixiçviçîne /bixiçviçîne** karekî serobero pêk anîn, sixtopixto kirin

**xifş** têjika karxezalê

**xiftan** kinceke dirêj û sivik a ku berê di ser de dihate lixwekirin

**xij** dengê tiştên ku bitews pêk tê; xiz

**-xij ajote ber** erebe bilez/bixiz kişande ber

**-xij derbas bûn** qîj bihurîn

**xijik** xizak, taxûk

**xijexij** dengê kelîna avê

**xijexij kirin** dengê kelînê ji ava li ser êgir hatin

**xijînî** xijexij

**xijîjank 1.** cihê xwedaxwişandina zarokan **2.** pêpelûkên livok

**xij kirin** *(di zimanê zarokan de)* şimitandin

**xil 1**. girse **2.** komeke tiştan

**xilindor** şîrê pêşîn ê pez û dewarê zayî

**xilmaş** xewar

**xilmet** tiştê ku ne nû ye û berê jî hatiye bikaranîn

**xilole** valahî

**xilole bûn** di cihekî de valahiyek çêkirin

**xilole kirin** di cihekî de valahiyek çêkirin

**xilopilo** qulopilo

**xilorîk** gijlok

**xilq** kilîl

**xilqandin/dixilqîne/bixilqîne** kilîl kirin

**xilqîn/dixilqe/bixilqe** kilîl bûn

**xilt [I] 1.** cureyekî heywanan e **2.** xiniz ***"xilt** çi-

qasî xweliyê dikole, ewqasî di ser serê xwe de dike**”**
**xilt [II] 1.** binemaya bêkêr **2.** binemaya gemarî **3.** gildîn **4.** tiştê bêbine
**xilt [III]** cureyekî nexweşiyên çêrm e
**xilte** torte, dûrd
**xiltopilto** sixtopixto
**xilxal** bazinê ku jin davêjine qeydikên piyên xwe
**xilxile 1.** cihê pir bi kevir û zinar **2.** tiştên li ser hev kombûyî
**-xilxileyek pez û dewar** çend kerî pez û dewarên giran
**-xilxileyek leşker** komeke leşkeran tevî çek û posatên wan
**ximav** boyaxa nivîsanê; rengav, hibr
**ximavdank** amana ku rengavê dikinê
**ximbil 1.** pêlîstoka ku di dilqê mirov û heywanan de tê çêkirin û bi bendikan tê hereketkirin **2.** kesê ku di bin bandora hinekan de dimîne
**ximxim** kunên bêfilan
**ximximbeş** kesê ku kunên bêvila wî vekirî ne
**xinav** ximav
**xinamî** kesên ku zewac di nava wan de çêbûne ***“**çav, **xinami**yê xwe nas dike**”**
**xingilîn/dixingile/bixingile 1.** *(endamê şkestî an jî jicihderketî)* pê de daliqîn **2.** lingirî bi rê ve çûn **3.** kulîn **4.** xawûşe bûn
**xiniz 1.** xayîn **2.** qeleş
**xinzîr** beraz ***”**çermê **xinzîr**an nabe post, dijminê bavan nabe dost**”**
**xir** endamê zayendî yê nêrzayan; kîr, terik
**xirecir 1.** hêwirze, sûresat **2.** pevçûn **3.** devjenî, pêşkarî
**xirek 1.** sistbûyî **2.** bêkêr **3.** teqozebûyî
**xirexir** dengê gewriya kesê razayî
**xirexir kirin 1.** *(kesê razayî)* di xewê de deng ji gewriyê hatin **2.** *(kesê di ber sekeratê de û sewala serjêkirî)* êdî nefesên dawiyê dan
**xirêf** torteya hingiv, doşav û hwd
**xirikîn/dixirike/bixirike 1.** *(pî)* şimitîn **2.** tehisîn
**xirindol** şîrê pêşîn ê pez û dewarê zayî; xilindor
**xirink** jina bedew a cazibedar
**xirî** bûjeneke zeliqok a ku axlêveyan di çiqilên darên mêweyan de derdi-

keve û hem tê xwarin hem jî jê çesp tê çêkirin
**xirîn/xirînî** xirexir
**xirmal** kesê ku xwediyê jiyaneke têkûz e
**xirmişandin/dixirmişîne/bixirmişîne** pencirûk kirin, bi nenîkan lê ba ketin
**xirmûşek** quncirûk
**xirneq** têjika kêvroşkê
**xirosk** dîkil
**xiroş 1.** coşî **2.** şaşwazî
**xirpik** di cendêk de raçînga vezen a ku bi karê hestiyî radibe
**xirp** ji nişkê ve
**xirpe** êrîşa komekê dijî kesekî tenê
**xirpo** qûngiran, teral
**xirqe** kinca pêşîvekîrî ya ku ji rîs an jî qumêş tê çêkirin û di ser de tê lixwekirin
**xirş** giyanewera ku ji ber egerekê nikare avis bibe an jî ê ku nikare avis bike
**xirşî** di giyaneweran de stewriya domdar
**xirtik** cureyekî îsota ku hundirê wê bi goştê hêrandî, birinc an jî savarî tê tijîkirin û pehtin
**xirtol 1.** hêwirze, sûresat **2.** komek
**xirxal 1.** bazinên qeydikên piyan **2.** tayeyên erebeyan
**xistin/dixîne/bixîne 1.** avêtin erdê **2.** ji xwe kirin **3.** winda kirin
**xişexiş** dengê domdar ê kişîna tiştekî bi erdê re
**xişir 1.** kevirê gewher, xeml **2.** kevirên hûrik
**xişok** ajala bêpê ya ku xwe bi erdê re dikişîne û wisa pêş ve diçe
**xişronek 1.** pijikên ku di rûyê ciwanan de derdive **2.** pijikên ku di laşê soringî de derdikeve
**xişt [I]** kaxetîta dîwarjenîn û banavakirinê; kerpîçê acûrî
**xişt [II]** ji nişkê ve xuyabûna tiştekî
**-xişt derkete pêşiya me** ji nişkê ve xuyayî me bû
**xiştek** rastkêş
**-xişteka demê** xanxanika ku demê nîşan dide
**xiştexişt** dengê têvel û domdar ê şingeşingê
**xiştexişt kirin** şingeşing kirin *"vê derê **kire xiştexişt,** çû dera han û kulê ew kuşt: gêzî *(tiştonek)*"
**xiştik 1.** cureyekî nexweşiya pêz e **2.** xiştxiştok **3.** amûra ku çimên tiştan bi hev ve dike; goşebend
**xiştxiştok** pêlîstoka zaro-

kan a ku şingeşing dike
**xiştzeng** şîşa ku serê wê tûj e
**xişûş** şik û şubhe, înç
**xitêre** meşaleya ku ji şiveke serqelaştî tê çêkirin û serê tê pêxistin
**xitimandin/dixitimîne/bixitimîne** **1.** ser nixumandin **2.** dev girtin **3.** pêşî lê girtin, asteng kirin
**xitimîn/dixitime/bixitime** **1.** ser nixumîn **2.** fetisîn
**xiyanet** xaynetî
**xiyar** cureyekî sewziyan e û nepijî tê xwarin
**xiz [I]** kaya girs
**xiz [II]** tews, lezgînî
**-xiz girtin** lezgin bûn
**-xiz dan** lezgîn kirin
**xizak** navgîneke bêtaye ya ku bi şimatandinê tê ajotin
**xizan** **1.** feqîr **2.** belengaz ***"xizan** e, riya xwe nizane**"**
**xizane** dolaba kincan
**xizanî** **1.** feqîrtî **2.** belengazî ***"xizanî,** zingara mêran e**"**
**xizêm** xemla jinan a ku di bêfilên xwe de dadiliqînin
**xizêmok** **1.** cureyekî kulîlkan e **2.** tiştê herî tehl î ku tê bîra mirovî
**xizinde** xişok
**xizm** eqreba
**xîç** **1.** kevirên hûrkanêk; xişir **2.** xêz
**xîçkêş** rastkêş
**xîge** hebana avê ya rêwîtiyê
**xîlaf** dijber
**-xîlafî rastiyê ye** dijberî rastiyê ye
**xîj** dengê şimitîn û rûxînê yî bilez
**-xîj rûxîn** pir zû hilweşîn
**xîjexîj** dengê domdar ê şimitînê
**-xîjexîja xizakan guhê me bir** dengê şiqitîna taxûkan em aciz kirin
**-xîjexîj kirin** vij derbas bûn
**xîjik** taxûk, tazûg
**xîlok** kevirên biçûk; hoçik
**xîret** **1.** namûs **2.** rûmet **3.** xebat ***"xîret**a kê tunebe, îmana wî jî tuneye**"**
**xîretkêş** xwedanrûmet
**xîz** kevirên hûrik ên wekî xweliyê; sîlik, sêlax, rîk
**xîzek** cihê ku xweliya wê ji sêlaxê pêk tê
**xîzexîz** dengê ku ji ber zedegirtina pişikê tê pê
**xîzexîz kirin** deng ji qefesê hatin
**xîzîn** xîzek
**xîzînî** xîzexîz
**xîzok** cureyekî nexweşiya

tengenefesiyê ye; fetsonek

**xîzokî** kesê ku bi nexweşiya tengenefesiyê ketiye; fetsonekî

**xîzar** cureyekî makîneya birînê ye

**xîzistan** çol, sehra

**xoce 1.** mamoste **2.** seyda

**xof 1.** tirs **2.** saw, sehm

**xonçe 1.** bişkov **2.** textikê nanpehtinê yî wekî sifreyê jî tê bikaranîn **3.** bexşîşa dawetkirin û sinetbûnê

**xone** pisîkê nêr

**xongîn** barişa baranê ya dêjnijkî

**xopan 1.** wêran **2.** xerabe, kavilbûyî

**xorav** bastêqê mêweyan î ku bi şêkir hatiye şirînkirin

**xore** giyanewereke yekşaneyî ya ku dibe sedema nexweşiyan û bi çavan nayê dîtin

**xorînî** dengê domdar ê kesê razayî; xirexir

**xort** temenê mêran ê ji sebîtiyê heta navsaletiyê *(16-35)* *“**xort** heta ku bi xwe nehesin, wekî varikan dimeşin**”**

**xortanî** ji bo mêran temenê ku di navbeyna 16-35’an de ye

**xortik** têjika kîvroşkê

**xortim** lûleya nermik a ku ji hilberînên niftê hatiye çekirin

**xox** cureyekî mêweyan e *“**xox** ne dar e, qîz ne war e**”**

**xozan** zeviya ku salek berê hatiye çandin û îsal jî nehatiye şovkirin

**xubar** xumama xwelî û xîzê

**xudmuxtarî** rêvebiriya nîvserbixwe ya ku di karên derve de li gor rêvebiriya navendî tev digere

**xulam 1.** bende **2.** berdestiyê mêr *“axa bi **xulam** e, xulam bi olam e**”**

**xulamî kirin 1.** bendetî kirin **2.** berdestîtî kirin *“Emerê çelengdar, **xulamî kir** ji hakimî re sî û sê salan, lê tu carî ji mêrê hakim nekir bawer û îhtîbar**”**

**xulav** arî

**xulavî** di rengê ariyê de

**xulp 1.** çewt **2.** nerasterast **3.** dererê **4.** xwar

**xulpî 1.** xwarî **2**. çewtî **3.** biziqzaq **4.** nelirêtî

**xultexult** dengê ava ku binerd dibe an jî di lûleyekî de serejêrî erdê dibe

**xultexult kirin** *(av)* di dema rijînê de deng dan

**xumal** kesê ku karên mala xwe bi xwe bi cih tîne; xwediyê malê, malxwe

**xumalî** **1.** kinca ku li gor xwestina bikirî tê dirûtin **2.** rastmala giranbiha ya ku binirxtirbûna wê pêkan e

**xumam** **1.** hilm û gilm **2.** talaz

**xumirîn/dixumire/bixumire** *(mêwe)* sor bûn û stewîn

**xumrî** rengê di navbeyna sor û reş de

**xunav [I]** çilikên baranê; dêjnij

**xunav [II]** aviya ku sibehan li ser belçikan peyde dibe

**xundor** xirindol

**xunivîn/dixunive/bixunive** dêjnijên baranê avêtin

**xur [I] 1.** xurek, xwarin **2.** par, behre *"kerê pir-bibez, bû **xur**ê guran"

**-xur [II]** paşgireke ku xwarinê dinimîne

**xura** cemser

**xurc** têrika ku wekî xalîçeyan hatiye raçandin

**xurcezîn** têrika ku davêjin terkiya zînê hespan

**xurcik** têrika biçûk

**xurek** **1.** tiştên xwarinê yên ku hatine pijandin **2.** xiza

**xurekpêj** aşpêş

**xurekxane** xwarinxane

**xurifî** kesê ku ji ser hişê xwe çûye

**xurifîn/dixurife/bixurife** hiş tev li hev kirin

**xurimîn/dixurime/bixurime** **1.** peritîn **2.** rizîn

**xurî** pijikeke girs a ku bi qasî nokekî mezin dibe, piştî peqînê pûç dibe û şopa wê di çêrmî de dimîne

**xurîn** kesê ku ji sibehê de tiştek nexwariye

**xurînî** danê xwarinê yî beriya taştê

**xurme** mêweyeke erdên germ e; qesp

**xurnûk** cureyekî çêreya ku striyên wê pir in

**-xurnûk ketin qûnê** pir aciz bûn û di cihê xwe de netebitîn

**xurom** gurzê girênedayî

**xurom kirin** negirêdayî gurz kirin

**xuroş** fûriyayî

**xuroş bûn** fûrîn

**xurt** **1.** bihêz **2.** bitaqet **3.** şidiyayî **4.** muhkem *"ava **xurt**, serevraz jî diçe"

**xurt bûn** **1.** bi hêz bûn **2.** şidîn û muhkem bûn

**xurt kirin** **1.** bi hêz kirin **2.** şidandin û muhkem kirin

**xusar** xunaveke ku dişibi-

he xwêyê û piştî ku rûyê erdê spî dike dihele

**xuşkî** bişkulên hişk ên binê guheran

**xuştire 1.** amana aşpêjan a ku pê sewziyên wekî xiyar, tivir, gizêr û hwd hûr hûr dikin **2.** alava xeratan a ku pê daran dadirojin û meht dikin

**xuya 1.** diyar **2.** kifş **3.** eşkere *"ava zelal, tê de **xuya** ye xem û xeyal"

**xuya bûn 1.** diyar bûn **2.** kifş bûn **3.** eşkere bûn

**xuya kirin 1.** diyar kirin **2.** kifş kirin **3.** eşkere kirin

**xûde** serdankeke cengî ya ku ji derbên fîşengan diparêze

**xûk** bac û cezayê mîrî

**xûgî** baca bi zorê; xerac

**xûj** dengê rûxînê

**xûjexûj** dengê hilweşînê yî domdar

**xûjî ser bûn 1.** zû xwarî ser bûn **2.** êrîş birin ser

**xûjal 1.** jîr, jêhatî **2.** bextewar

**xûrexûr** dengê ava lehiyê

**xûsik** qiravî

**xûz** pişthotik

**xûz bûn 1.** *(pişt)* hotik bûn **2.** *(serî)* nizm bûn

**xûz kirin 1.** *(pişt)* hotik kirin **2.** *(serî)* nizm kirin

**xwan [I]** serwer, hukimdar

**xwan [II]** sifre *"dil ne **xwan** e ku mirov li ber hemî kesî veke"

**xwan [III]** xuya, diyar *"quzê gewr di derpê re **xwan**êye"

**xwar 1.** ne rast û durist **2.** teqoze **3.** çewt **4.** jêr **5.** xulp *"aqilê kêm riya **xwar** ber bi hevalê xwe dixe"

**xwarin [I] 1.** xurek **2.** xiza *"li şeran xal û xwar-zî, li **xwarin**an mam û birazî"

**-xwarinên parastî** xwarinên ku bi dermanên têkildar temenê bikaranîna wan tê dirêjkirin

**xwarin/dixwe/bixwe [II]** qurt kirin, daqurtandin *"peza bi tenê, guran **xwariye**"

**xwaringeh** cihê ku xurek lê tê çêkirin û firotin

**xwarî 1.** xulpî **2.** çewtî **3.** neduristî *"ew mala ku te nanê wê xwariye, bi **xwarî** lê menêre"

**xwarzê** keça xweha mirovî

**xwarzî** kurê xwişka mirovî *"ap bi biraziyan, xal bi **xwarzi**yan re dikin"

**xwazgîn** kesê ku daxwaza zewaca mêrekî digihîne malbata jinekê

**xwazgînî** navberkariya malbatên keç û xortên berzewac

**xwe [I]** zat, şexs, kesayet *"**xwe** tevî kar nekî, kar nameşe"
**xwe [II]** cînavka vegerok
**xwe [III]** pêşgir, navgir û paşgira ku wateya xweseriyê dide peyva hevedudanî *mînak: xwebar, jixweber, malxwe...*
**xweajo** paldêra hundirîn
**xwe badan** xwe dan aliyekî
**xwebar** makîneya ku xwe bi xwe dixebite; xweger
**xwebawer** arxweyîn
**xwe bi xwe** bêyî niçandin û alîkariya kesekî din
**xwecihî 1.** herêmî **2.** deverî
**Xwedan [I]** Xwedê, Yezdan *"bêyî emrê **Xwedan**, pel ji darê naweşe"
**xwedan [II]** xwedî, sexbêr, hemal
**-xwedanmaliya arizî** milkiyeta aîdî kesan
**-xwedansoz** kesê ku biryarek li ser nefsa xwe biriye û heta dawiyê jî li serê dimîne
**xwe dan ber** biryara kirina karekî dan
**xwedawend** yezdanoka mê ya ku pûtparêz jê re perestişê dikin
**Xwedê** çêkiroxê hemû afirandiyan; Yezdan *"mêvan, mêvanê **Xwedê** ye"
**-Xwedê dan** hatin cîhanê
**xwedênenas 1.** bêxwedê **2.** bêîman
**xwedî 1.** sahib, sexbêr **2.** hemalê aîdiyetê *"bêndera derengmayî, nabe xurê **xwedî**"
**xwedî kirin 1.** mezin kirin **2**. dermal kirin **3.** sexbêr kirin *"berxa ku Xwedê ew **xwedî kir**, guran jî nekuşt"
**xwedîtî 1.** sahibtî, sexbêrî **2.** hemalî
**xwefiroş 1.** xayîn **2.** sîxur
**xwedîgiramî 1.** xwedanqedr **2.** xwedanrûmet
**xwedîgiravî 1.** qaşo **2.** bêbine
**xweger** xwebar
**xwe girêdan 1.** kinc li xwe kirin **2.** rext avêtin navmila xwe **3.** amadeyî karekî bûn
**xweh** xwişk
**xwe hilkutan** xwe gijgijandin
**xwekujî** întihar
**xwelî** ax, xak *"agir xweş e, lê **xwelî** jî jê çêdibe"
**xwelîdank** kasika cixarekêşan a ku ariya cixareyên xwe dirijîninê
**xwende 1.** kesê ku pisporê nivîsan e û fêrî zanînan bûye **2.** rewşenbîr
**xwendegeh 1.** dibistan **2.** saziyên perwerdehiyê

**xwendekar** şagirt
**xwendevan** kesê ku nivîsan dişopîne
**xwendin/dixwîne/bixwîne 1.** ji nivîsê fêm kirin û şopandin **2.** di dibistanekî de perwerde bûn *"bila bixwenda, paşê bigota"
**-xwendin û nivîsandin** sewad
**xwendingeh** dibistan
**xweng** xwişk
**xweperest 1.** nefsperest, nefsanî **2.** ezperest, ezezok
**xwe pesartin** xwe spartin
**xwe pêçan** tiştek li xwe alandin
**xwe pêşandan** bertek nîşandan
**xwepêşandêr** kesê ku ji ber rewşeke baş an jî nebaş berteka xwe nîşan dide
**xwe pê ve berdan 1.** mubtela bûn **2.** tê alîn **3.** pê bilîn
**xwe pê xweş kirin** laloşî û melaqî kirin
**xwe rast/rasteve kirin 1.** piştî xwarbûnê pişta xwe rast kirin **2.** piştî mijûlahiyê karê xwe gihandin hev **3.** piştî tengasiyê derketin serfiraziyê
**xwerenedîtî** teralê Bexdayê
**xwerexneyî** rewşa mirov bi xwe tenqîda nefsa xwe bike
**xwerist** xweza, sirûşt
**xwermend** rêvebirî
**xwerû** saf, sade
**xweser** ne bi ser tiştekî ve ne jî bi kesekî ve girêdayî, serbixwe.
**-xweserî wî ye** taybetiyeke wî ya aîdî wî tenê ye
**xweserîtî 1.** xudmuxtarî **2.** serbixwetî
**xwesî 1.** pêxas, pêrût **2.** çeqrût
**xwe spartin 1.** penaber bûn **2.** teslîm bûn, xwe radestî yekî kirin
**xwestek 1.** daxwaz **2.** mirad
**xwestin/dixwaze/bixwaze 1.** daxwaz kirin **2.** mirad kirin **3.** teteb kirin *"ka kî **dixwaze** ku xelqê li xwe ar û mar bike?"
**xwestî 1.** keça ku ji malabavana wê hatiye xwestin **2.** xwedîdildar *"ava **xwestî,** naçe hêstî"
**xwesû 1.** ji bûkê re diya zavê **2.** ji zavê re diya bûkê
**xweş [I] 1.** baş **2.** çê **3.** qenc **4.** rind
**xweş [II] 1.** biçêj **2.** bitahm *"kerê reş, dixwe tiştê **xweş"**

**xweşa** kesê ku xwe nas dike û ji temtêla xwe jî razî ye
**xweşav** ava qax û mêwijên kelandî û şirînkirî
**xweşawaz** dengxweş
**xweşbîn** çakbîn
**xweşbînî** çakbînî
**xweş bûn 1.** biçêj bûn **2.** bitahm bûn **3.** qenc bûn **4.** rind bûn **5**. baş bûn *"heta nava destan reş nebe, tahma devan jî **xweş nabe"**
**xweşendam** kesê ku xwediyê bejn û baleke xweşik e
**xweşewîst 1.** delal **2.** birêz
**xweşhal** ji rewşa xwe razî
**xweşhalî** rewşa razîbûnê
**xweşik** rindik, delalik
**xweşî 1.** naziktî **2.** silametî
**xweş kirin 1.** biçêj kirin **2.** bitahm kirin **3.** qenc kirin **4.** rind kirin **5**. baş kirin *"kes dilê xwe li miriyan **xweş nake"**
**xweşmêr** camêr
**xweşnûd** razî
**xweşnûdî** razîtî
**xweşok** serşok
**xweşrû** rûpak û bedew
**xweştivî** yar, dildar
**xweşxwaz** ristên pa û pesndanê yên ji bo kesekî hêja
**xwe vedizîn 1.** xwe veşartin **2.** fizirîn
**xweyî** xwedî *"ji bo xatirê **xweyî,** mirov kevir navêje seyî"
**xweza 1.** sirûşt, tebîet **2.** xeyset, xislet
**xwezayî 1.** sirûştî **2.** jixweber
**xwezan** hozan
**xwezik** daxwazên ku pêkhatina wan pir dûr e
**xwezî [I] 1.** xwezil **2.** daxwaza nîgaşî *"sal bi sal, **xwezî** bi par"
**xwezî [II]** şilahiya qirikê; tif
**xwê 1.** kevirê şor ê hêrandî yê ku tevî xurek dikin û şorahiyê didê **2.** şilahiya ku piştî westîn û hwd ji lêş der tê *"dema ku heywan bê **xwê** bimînin, keviran dialêsin"
**xwê dan** *(Ji ber herareta lêş)* term şil bûn
**xwêdank** derdana ku xwê dikinê
**xwêdîn** sel û kevirên ku xwê li ser direşînin da ku pez û dewar bên û bialêsin; sûrdîn
**xwêlîn** kana xwêyê
**xwir** girê ku di canê giyaneweran de peyde dibe
**xwirandin/dixwirîne/bixwirîne 1.** gir şkestandin **2.** niçandin û nav tê

dan *"birîna xwe bi xwe **nexwirînî,** rehet nabî"

**xwişexwiş** dengê bilind ê daherikîna avê

**xwişîn/dixwişe/bixwişe** deng ji herka avê hatin

**xwişk** keça bavê mirovî; xweng, xweh

**xwî 1.** serinc **2.** xislet **3.** tevger

**xwîn 1.** aviya sor a ku di rehan de diçe û tê **2.** ava jiyanê ya giyaneweran *"**xwîn**, bi xwînê nayê şûştin"

**-xwîn jê hatin** *(ava sor a rehan)* derhatin *"**ji** paniyê **xwîn nayê** ku dil lê bişewite"

**xwînbir** dermanê ku nahêle xwîna birînê zêde bikişe

**xwînda**r mêrkuj *"deyndaran, xwe avêtin pişt **xwîndar**an"

**xwîngerm 1.** şirîn **2.** xwoşewîst

**xwînsar 1.** rûsar **2.** dilkevir

**xwînxwar 1.** zalim **2.** sitemkar **3.** xwînmij *"beg timî **xwînxwar** in"

# Y

**y/Y** tîpa sihemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê pêşezmandevî ye, di belavbûna wê de ziman li ser diranan dişide û nîvdengdêr e
**ya** baneşana gazîkirinê; î
**-ya Xwedawo** î Xwedawo
**yabo/ yadê** bavo!/dayê!
**yadîgar 1.** diyarî **2.** bîrewerî
**yad kirin** bi bîr anîn
**yaho** î filankeso
**yan** cureyekî sendeliyên fireh e û vedigere nivîneke razanê jî
**yane** cihê aîdî komeke taybet; bingeh, navend
**-yaneya torevanan** navenda edebiyatzanan
**yanzdeh** yazdeh
**yar 1.** dost **2.** hevalbend **3.** hezkirî *"Xwedê **yar** be, bila şûr dar be"
**yarî 1.** dostî **2.** laqirdî
**yarîgeh** qada lîstik û şahiyê
**yarîker 1.** nemûşkar **2.** lîstikvan **3.** tinazekar
**yarî kirin 1.** lîstin **2.** henek kirin
**yarkok** gizêr
**yarmasî** cureyekî masiyan e
**yarmetî 1.** alîkarî **2.** destek
**yawe** gotara beletewş
**yax 1.** eware **2.** jar û lawaz **3**. bêbine
**-yax hesibandin** qîma xwe pê neanîn
**yaxir 1.** hendef **2.** kendal
**yazdeh 1**. hejmara piştî dehan û beriya duwazdehan **2.** jimareya 11'an *"**yazdeh**ê hezîranê, berî bide zivistanê"
**yek 1.** jimareya 1'ê **2.** hejmara yekemîn a jimartinê **2.** kes *"mêvanê **yekî**, mêvanê gundekî"
**yek bûn 1.** pevre bûn **2.** tenê bûn
**yekcar 1.** bi carekî tenê **2.** bi giştî, bi komasî
**yekcure** ji heman celebî
**yekçav** xwediyê çavekî tenê
**yekdemî** di heman demê de
**-êrîşa yekdemî** êrîşa di

heman demê de û li çend cihan
**yekdeng** dengê ku di carekê de ji dêv belav dibe
**yekdengî** axaftina bi awayekî ku tu dibêjî qey kesek tenê diaxive
**yekdengîtî** axaftina komekî bi heman peyv an naverokê
**yekdevî** biryardana li ser axaftinekê
**yeke** pîvan û qeysa tiştan
**yekedeng** awayê belavbûna peyvê
**yekem*(-în)*** di rêza pêşin de; pêşîn
**yekemî/yekemîntî** di rêzê de pêşîntî; ewiltî
**yekgirtî** bi awayekî ku ji hev ne cihê
**yekjimar** ne bi komekî û pirjimar
**yekitî 1.** wehdet **2.** tenêtî *"kuderê **yekitî,** wê derê rizq"
**yekîne** desteyeke leşkerî
**yek kirin 1.** gihandin hev **2.** kom kirin
**yekneseq** tevgera ku tu carî dirûvê xwe naguhere
**yekpare** gişt, hemû
**yekreng** yekcure
**yeksan** du an jî çend tiştên mînanî hev; wekhev
**yeksanî** şibihîna tiştekî bi tiştekî din; wekhevî
**yekser 1.** pê re **2.** hema niha; rasterast
**yekşem** roja duyemîn a hefteyê
**yekta 1.** bêhevta **2.** bêmînak
**Yelda** roja herî dirêj a salê; 21'ê Berfanbarê
**yendo** qasika biçembil
**yeqîn 1.** bawerî **2.** qinaet
**yeqîn kirin 1.** bawerî pê anîn **2.** qinaeta xwe pê anîn
**yewmiye** heqdesta rojekê
**yexsîr** hêsîr, dîl
**yexte** exte
**yextirme** extirme
**Yezdan** Xwedê
**yezdanok 1.** sefêkê ku wekî ku Xwedê ye tevdigere **2.** pût
**yêz** sewalê bêkêr û lawaz
**yêzî** bêkêrtî û lawaziya sewalan
**yom** qudûş

# Z

**z/Z** tîpa sih û yekemîn a alfabeya kurdî ye; dengdareke ku cîderka wê diranî ye û awayê belavbûna wê fîzek û nerm e
**zaboq 1.** zibilgeh **2.** mezbele
**zad 1.** dexl **2.** mehsûl
**-zad hilanîn** dexl û mehsûlê salê berhev kirin
**zadegan** koma torinan
**zadeganî** aderî, torinî
**zag** di çiyan de rêzezinarên asê
**zagon** qanûn
**-zagona bingehîn** qanûna esasî
**-zagonên xwezayê** qanûnên xweristê
**zagonsazî** danêriya qanûnan
**zal ve kirin** tiştê teqlîde û sexte kirin
**zamok 1.** rêhesin **2.** mirovê ku hem xurt û zexm e hem jî bi dest û pê ye
**zan** zayîn
**zana 1.** arif, pispor **2.** hişmend
**zanav** pênasa neteweyî, olî û hwd
**zanist** îlm *“**zanist,** nayê talankirin”
**zanistî** îlmî
**zanîn/dizane/bizane 1.** pê beled bûn **2.** têgihiştin **3.** pê derxistin **4.** nasîn *“av **dizane** di bin wê de çi heye”
**zanîngeh** saziya perwerdehiyê ya piştî dibistana amadehiyê
**zanko** zanîngeh
**zanyar 1.** alim **2.** pisporê têgihiştî
**zanyarî 1.** alimtî **2.** pisportî
**-bingeha zanyariyê** di malperê de cihê ku agehî tê de ne
**zar** ziman *“berû, **zar**ê bizinê ye”
**-zar û zêç** zarok û kulfet
**-zar û ziman** axaftin û derbirin *“bi bûkê re nîn e **zar û ziman**, bi xesûyê re nîn e dîn û îman”
**zarava** devokên heman zimanî; lehce
**zarbêj** axivgerê li pêşberî komeke mirovan
**zarezar** lavayî

**zarezar kirin** lavayî kirin
**zargotin** gelêr
**zarî kirin** teqlîd kirin
**zarîn/dizare/bizare 1.** nalîn **2.** lavayî kirin
**zarok** kur û keçên ku ji têkiliya zayendî ya du mirovan tên dinyayê *"**zarok,** bi ketin û rabûnê mezin dibin"
**-zarokan dor lê girtin** bûn xwediyê gelek zar û zêçan
**zarokatî** temenê însên ê heta duwazdeh saliniyê
**zarokxane** cihê ku lê keç û kurên 4-6 salî tên perwerdekirin
**zarxweş** zimanşirîn, zarşirîn
**zat** kesayet
**zav** mezheb
**zava** hevserê bûkê *"bûk bi dilê **zavê** ye, çi kul bi dilê xelqê ye"
**zavare** xebata bi karbeşiyê
**Zawe** gerestêrkek e
**zax [I]** madenek e
**-zax kirin** bi madenê zaxê şil kirin
**zax [II]** xêz, xet
**-zax kirin** xêz kirin
**zaxe** pirçî
**zaxor** hevrazê bi kevir û kuçik
**zaxorî** hêratiya hevrişimî
**zayend 1.** cinsiyeta heyberan **2.** mêzatî, nêrzatî û bêhêliya peyvan **3.** nifş
**zayendî** cinsî
**zayendîtî** cinsîtî
**zayîn/dizê/bizê 1.** *(sewalê)* têjik anîn **2.** *(tiştê avî)* kişîn û li hev zêde bûn *"bila **bizê,** nêr û mê ferq nake"
**zeb 1.** hişk **2.** sext **3.** zexm
**zebanî** peywirdarê dojehê
**zeber** xwendina tîpeke erebî bi/î/yê
**zebeş** cureyekî berên bîstên e û nepijî tê xwarin; petêx *"**zebeş** ji xwarinê re, dendik ji danînê re"
**-zebeşek diçe dêv** ji kêfan zikopişto dikene û devê wî nayê ser hev
**zebloq** meht û tenik
**zeblot** rûdiyê stûr
**zebûn 1.** jar, hejar **2.** belengaz
**Zebûr** pirtûka îlahî ya ku ji Cn. Dawid eleyhiselam re hatiye hinartin
**zecr** azar û renc
**zecirandin/dizecirîne/bizecirîne** azirandin û rencandin
**zede 1.** herş **2.** ziyan
**-zede girtin 1.** herişîn **2.** ziyan dîtin
**-zede lê xistin 1.** herişandin **2.** ziyan û xesar dan

**zeft** şiyan, pêkarîn
**-di zefta min de ye** ez pê dikarim û ev tişt bi qasî hêza min e
**zeftî** di artêşê de hêza leşkerî ya ku ewlehiya civakî û bicihanîna fermanên rêvebiriyê dipê
**zeft kirin 1.** bi dest xistin **2.** girtin **3.** ba lê anîn *“du zebeş, bi destekî nayên **zeftkirin”**
**zehar** elewat
**zehf 1.** pir, zêde **2.** xelî *“dara ku **zehf** mewij anî, serê xwe berjêr dike**”**
**zehf bûn 1.** pir bûn, zêde bûn **2.** xelî bûn
**zehmet** zorî *“xerakirin rehet e, avakirin **zehmet** e**”**
**-zehmet kişandin** zûrî û zecr dîtin
**zekem** çilmasî, bahor
**zekemî** kesê ku bi çilmasiyê ketiye; bahorî
**zelal 1.** tenik **2.** şefaf **3.** saf **4.** ne şêlî *“ava zêlal, jina delal**”**
**zelal bûn 1.** şefaf bûn **2.** şêlîtî tê de neman *“av heta girav nebe **zelal nabe**”
**zeliqandin/dizeliqîne/bizeliqîne 1.** pê ve bestin **2.** pêve kirin **3.** zemq kirin
**zeliqîn/dizeliqe/bizeliqe 1.** bestin **2.** pêve bûn **3.** pê ve zemq bûn *"gûyê hişk, bi merivan ve **nazeliqe”**
**zeliqok** çesp, zemq
**zelîl 1.** hureme, heqîr **2.** bêkêr
**zelûl** bêkesayet û bêkêr
**zelût** keçel, qafrût, serût
**zem** rexne
**zeman** dem *"**zeman,** wek kela şîr e**"**
**zemawend** dawet, dîlan
**zembelîk** qeşaya ku bi kêlekên banan ve ber bi jêr dadilqe; lîlik, sivink, sîvander
**zembîl** sebet, selik *“kar, di bin **zembîl**ê de namînin**”**
**zembûr** cehterî/catir
**zem kirin 1.** bi awayekî neyînî rexne kirin **2.** sox kirin
**zemîn** zevîn
**zenbele** pergala ku kêş û miçiqandina ava lûleyan mîheng dike; pilûsk
**zend** ji enîşkê heta qeydika dêst; milê jêrîn
**-zend hilkirin** xwe ji şer an jî karekî re amade kirin
**zendik** xemlên ji bo qeydika destî
**zeng** rengê qehweyî ê ku xwe davêje hêsin; her ku

tîr dibe werdigere reşahiyeke stûr û hêsin dirizîne; jeng *"**zêr,** zengê nagire"
**-zenga dilê xwe rêtin** hêrs û tola dilê avêtin der ve
**-zenga mirinê lê ketin** zer bûn û zibilîn
**zengarî** jengarî
**zengar girtin** jengar girtin
**zengelok** zengilor
**zengil** amûreke lajwerdî ya ku di hundirê wê de parçeyek lajwerdê daliqandî heye û gava li ba dibe dengekî derdixe; naqos, çangoçk
**-zengila gêrebayî** naqosa biçûk a ku bi gêrebayê dixebite û bi kêrî hişyarkirinê tê
**zengilor** xirtxirtûk, qirik, gewrî
**zengî/zengo 1.** di zînan de şûna pê **2.** reşik, zencî *"hespê çê, **zengi**yan nagihêjîne hev"
**zenî** erzên
**zeqnepûr** dareke dojehê ya jehrdar e; ziqûm
**zer 1.** qîçik **2.** rengê zêrî *"ê ku dixwe gebola **zer**î, ew diçe devê derî"
**zeraq** tîrojên tavê; zerekî
**zerav** kêma amasê; nêm
**zerbaf** qumaş an pîneyê ku tayên zêrîn jî tev de hene
**zerd 1.** gir **2.** kêrt
**zerdik** parçeyê zer ê di nava spîtka hêkê de
**zerdalû** arûng
**zerekî** tîrojên tavê
**zerengî** qabiliyet
**zerf** namedank
**zerg** nikê riman ê tûj
**zerhimandin/dizerhimîne/bizerhimîne 1.** reng lê zer û qîçik kirin **2.** çilmisandin û bizdandin
**zerhimîn/dizerhime/bizerhime 1.** zer bûn û çilmisîn **2.** gewrotankî bûn û bizdîn
**zerik** cureyekî nexweşiyê ye
**zerî 1.** kej **2.** çûr a bedew
**zerîle** cureyekî çivîkên xweşawaz e
**zerîpoş** navgîna bi mertal
**zerk kirin** zerq kirin
**zernik** cureyekî çêreyê ye
**zernîx** pirçhildana bi bendekî pir badayî
**zerpiçîn/dizerpiçe/bizerpiçe** spîçolkî bûn
**zerq** bi şiringeyê valakirina dermanê avkî li bin çêrmî
**zerq kirin** bi şiringeyê derman valayî bin çêrmî kirin
**zerya** behr, derya

**zerzaniq** qirneqos, texterewan
**zerzewat** sewzî
**zerzewatfiroş** kesê ku sewziyan difroşe
**zever 1.** vejen **2.** wize
**zevî** cihê ku çandinî lê tê kirin *“baran dibare ji xwediyê **zevi**yê re kar e”
**zevîn** rûyê erdê
**zevîn-nasî** zanistên têkildarî qalikê rûyê erdê
**zewac** mehrkirin, nikah *“**zewac**a bêdil, ezabê vê dinê ye”
**zewade .** erzaq **2.** debar **3.** êwran, hevran
**zewandin/dizewîne/bizewîne** *(di dema zayîna sewalê de)* têjik jê kaş kirin û dan mêtin
**zewd** karê nanoziko yê ku kesên bêgav dikin
**zewicandin/dizewicîne/bizewicîne** *(jinek li mêrekî)* nikah kirin
**zewicî** xwediyê mal û eyalekê
**zewicîn/dizewice/bizewice** bi jinekî re kebîn kirin *“bi dilê mezinan **bizewice**, bi dilê biçûkan hez bike”
**zewq** feraseta bijartina delalî û kirêtiyê
**zexel 1.** teral **2.** sersar **3.** xayîn *“gayê **zexel** e, timî li mexel e”
**zexîre** êwran, debar, zewade
**zexm 1.** muhkem, berk **2.** xurt *"**cot**ê zexm, bi xeta pêşîn ve kifş e”
**zexm bûn 1.** muhkem bûn, berk bûn **2.** xurt bûn
**zexmî 1.** muhkemtî **2.** xurtî *“gur hay ji **zexmi**ya xwe hebûya, dê bi carekê de hûfî dinyayê bikira”
**zexm kirin 1.** muhkem kirin, berk kirin **2.** xurt kirin
**zexmtir 1.** muhkemtir **2.** xurtir **3.** qayîmtir *“dema ker bikeve heriyê, ji xwediyî **zexmtir** kes tuneye”
**zexnepûrt** nifrînek e; ziqûm û zeherman
**zext** pêkutî û dijwarî
**zeyî 1.** keça ku piştî mêrkirinê tê serdana malbavana xwe **2.** diyariyên ku di serdana pêşîn de didine keça mêrkirî *“keç di mala bavê de zeynet in, ava cêrên wan şerbet in, dayik dimirin **zeyî** tên jinbira bêrûmet in”
**zeyt** rûnê zeytûnê
**zeytûn 1.** cureyekî darên ku belçikên wê di rengê zîv de ne **2.** berên dara zeytûnê yên ku piranî di

taştêyan de tê xwarin û jê rûn jî tê bidestxistin
**zeytûnî** di rengê zeytûnê de; reşê tarî
**zêç** şevereşa ku çav tê de çavan nabîne
**zêde 1.** pir, gelek **2.** mişt *"hevalên şahiyê **zêde** ne, ên şînê kêm in"
**zêdehî 1.** pirî **2.** miştî
**zêdebarî** serata
**zêde bûn** pir bûn, gelek bûn
**zêdegavî 1.** destdirêjî **2.** neheqî
,**zêdegavî kirin 1.** neheqî kirin **2.** destdirêjî kirin
**zêdek** nîşaneya danserhavê, *(+)*
**zêde kirin** pir kirin, gelek kirin
**zêdemayî 1.** serata **2.** bermayî
**zêdetir 1.** pirtir **2.** bêhtir *"aqil, ji êqil **zêdetir** e"
**zêhn** qabiliyeta têgihiştinê
**zêl** tîke
**zêl kirin** *(goşt)* tîketîkeyî kirin
**zêmar 1.** helbestên li ser karesatan; mersiye **2.** stranên bi şewat ên li ser karesatan
**zêmarbêj 1.** mersiyebêj **2.** nifirbêj
**zêr** madenê giranbiha yê ku jimara wî ya atomî 79, giraniya wî ya atomî 196.9, kurteya wî ya latînî *Au* ye û di 1064 dereceyan de jî dihele *"aqil, bi **zêr**an jî nayê firotin"
**zêrandin/dizêrîne/bizêrîne 1.** nalandin **2.** lê dan
**zêrçe** çêreya biharê
**zêrevan** mifetiş, çavdêr
**zêrezêr 1.** nalenal **2.** kalekal, mikemik
**zêrezêr kirin 1.** nalenal kirin **2.** lavayî kirin
**zêrîn/dizêre/bizêre** nalîn, azar kêşan
**zêyezê** zimezim, kalekal
**zêyezê kirin** kalekal kirin, zimezim kirin
**zibare** karbeşî
**zibil 1.** gemara heywanan **2.** gildîn, gilêş
**zibilgeh** cihê ku gildîn û gemarê davêjinê; kaj
**zicêf** binê solê; pençe
**zicêf kirin** binê solê çêkirin an jî pençe kirin
**zift** qîra rehn
**ziha** marê girs, ejdeha
**zik 1.** ji sîngê heta fêza navranê **2.** cihê ku hûr û rûvî tê de ne **3.** gewde *"hûrik, **zik** dike tûrik"
**-zik çêrandin** ji bo nanê xweş û belaş li ber sêlan gerîn
**-zik gihiştin ber dêv** *(ji-*

*na ducanî)* ji nêzik ve hemla xwe danîn

**-zik lê bûn def** bê teşe xwarin

**-zik lê qurequr kirin** ji birçînan deng ji rûviyan hatin

**zikat** di îslamê de şertê her sal dayîna miqdareke malî ya diyar ji bo heşt komên diyarkirî *"**zikat**a mirîşkê, hêk e"

**-zikat lê çûyîn** pir belengaz bûyîn

**zikberçûyî** kokê zikmezin

**zikir** bîranîna Xwedê û qenciyên Wî *"axa li kêfê ye, xulam di zikrê de ye"

**zikir kirin** Xwedê û qenciyên Wî bi bîr anîn

**zikmakî** taybetiyên ku hê di zikê diyên giyaneweran de ji wan re çêbûne

**ziko** çilek, silek

**zikqelêş** hov û devbixwîn

**zikreşî** çavnebarî, çavreşî

**ziktêrdek** kesê ku zikê wî weke têrdeka penîrê nû ji ber hev çûye

**ziktilêr** ziktêrdek, zikberçûyî

**zil [I]** saz, qamîş; leven

**zil [II]** sil, su

**-ji yekî/tiştekî zil çûn** jê aciz bûn û dûrî wî sekinîn; nefret kirin

**zil [III]** tev dan û vîz kirin

**-zil kirin 1.** *(birîn)* tev dan û destê xwe lê birin û anîn **2.** rarûyî yekî/tiştekî ketin

**zilam** mêr *"**teyr** bi refê xwe, birûsk bi zeriya xwe, **zilam** bi camêriya xwe"

**zilan** bayê zexm

**zilm 1.** sitem **2.** neheqî

**zilmat** şevereş

**zilq** zîrç

**zilûk** cureyekî raxistina ji cîl û cegenî ye

**zimag** aliyê bakurî yê çiyayekî

**ziman** endamê axaftin û çêjhildanê; lîsan *"**ziman**ê xwe birî, cihê xwe kirî"

**-zimanê zikmakî** zimanê bav û kalan

**-ziman di dêv ketana** heke bikaribûna biaxivîna

**-zimanê yekî li ser xwe dirêj kirin** ketin bin mineta yekî û firsenda tinazeyan çar kirin

**zimandirêj** devbelaş

**zimanfis** kesê ku nikare peyvan wekî pêdiviyê bi lêv bike û lewre jî tîpan diguherîne

**zimanfisek** zimanfis

**zimanxweş** zarşirîn

**ziman-nas 1.** pisporê ku perwerdehiya zimanekî dîtiye û ji her aliyî ve li

wî zimanî dikole **2.** pisporê ku di zanîngehekî de li ser zimanekî waneyan dide
**ziman-nasî 1.** zanistên têkildarî zimanekî û zaravayên wî **2.** di zanîngehan de beşa ku li tevgera zimên dikole
**zimanzan** zanayê zimên
**zimanzanî** zanatiya zimên
**zimanzêrîn** kesê ku razan venaşêre
**zimet 1.** hemû deynên saziyeke bazirganiyê **2.** mal û milkê ku ji aliyê kes an jî saziyekî ve tê parastin
**-xistin bin zimeta xwe** parastina wî/wê aîdî xwe kirin
**zimezim 1.** kalekala pêz **2.** zingezing
**zimezim kirin 1.** *(pez)* kalekal kirin **2.** zingezing kirin
**zimhêr** dexl û derhat
**zimîn/dizime/bizime** gumîn, gurmîn
**zimpere** kaxeza ku bûjeneke girnozî pê ve hatiye zeliqandin û bi kêrî şimşatkirina rûyê tiştan tê; simarte
**zimrûd** cureyekî gewherên ku şefaf û kesk e
**zinar** kevirê mezin, sel
**zincî** kalikê kalikî
**zincîr** pêgirêdana ku ji xeleqên derbasîhevkirî pêk tê
**zincîrbend** qeyda ji zincîran
**zincîrbendî** kes û tiştê bi zincîran girêdayî *"**zincîrbendî**bûn ji şêran re ne ar e"
**zindan** girtîgeh *"mala bavê meydan e, mala xezûr **zindan** e"
**zindî** jîndar *"malê miriya yê **zindi**yan e, bi saxan dimîne"
**zindîq** oleder
**-zindîqê zindîq** olederê heram
**zingezing** dengê ku ji pevketina tiştên hesinî tê
**zingilîn/dizingile/bizingile** cehimîn, dehirîn
**zingîn/dizinge/bizinge** zingezing jê hatin
**zingînî** zingezing
**-zingînî jê anîn** bi şeqamê şîrqînî pê xistin
**zinîn/dizine/bizine** ziyîn, ta li hev gizîn
**zintod** nivîsa girs
**zintol** mirovê girs
**zipitandin/dizipitîne/bizipitîne 1.** tepisandin **2.** heta dêv tijî kirin
**zipitîn/dizipite/bizipite 1.** tepisîn **2.** heta dêv tijî

bûn
**ziq 1.** rep û req **2**. çik, çi-kandî û li piyan **3.** leq
**-ziq bûn** req bûn, bêtev-ger sekinîn
**-ziq dan** leqandin
**-ziq kirin** req kirin, bêtev-ger sekinandin
**ziqeziq** dengê keran; zire-zir
**ziqinandin/diziqinîne/biziqinîne 1.** leqandin **2.** hejijandin
**ziqinîn/diziqine/biziqi-ne 1.** leqîn **2.** hejijîn
**ziqitandin/diziqitîne/biziqitîne** jan dan ke-zebê, pir êşandin
**ziqitîn/diziqite/biziqite** êşîn û jan pê ketin
**ziqûm** cureyekî daran ê ku kulîlkên wê sor an jî spî ne û di dermansa-ziyê de ji bo tîmarkirina nexweşiya penceşêrê tê bikaranîn
**-ziqûm û zeherman** nifi-reke bi du pimparên jeh-rîn e
**zir 1.** qulebî, teqlîd **2.** ne-rast **3**. ne ji heman dê û bavî
**zirandin/dizirîne/bizi-rîne** ker dan qîrandin
**zirar** ziyan, xesar *"gotin **zirar** e, kirin kar e"
**zirar kirin 1.** ziyan dîtin **2.** kar nekirin
**zirav 1.** tenik **2.** şefaf
**zirav bûn 1.** tenik bûn **2.** şefaf bûn *"heta ku stûr **zirav bibe,** dê zirav jî biqete"
**ziravî 1.** teniktî **2.** şefaftî
**ziravk** riwîneke zer û kes-k a ku ji pişikê çêdibe
**-ziravk qetîn** ji tirsan qu-tifîn
**zirav kirin 1.** tenik kirin **2.** şefaf kirin
**zirbav** mêrê jinê yî ku hin zarokên jinikê ne ji wî ne
**zirbe** kilîla deriyan a da-rînî
**zirçêre** çêreya ku di pa-yîzan de ji nû ve zîl dide
**zirçik** zûtik
**zirçikî** kesê ku nikare li ser qûna xwe rûne
**zirçikî bûn** xwe li ser pi-yan negirtin
**zirçikî kirin** pir westan-din
**zirçî** zirçêre
**zirehpûş** qutikê polayî ku fîşeng jê derbas nabin
**zirezir 1.** dengê keran ê domdar **2.** axaftina kerkî û nelirê
**zirezir kirin** *(ker)* deng dan
**zirênc** madenê ku jimara wî ya atomî 82, giraniya wî ya atomî 207.21, teq-la wî 11.3, kurteya wî ya

latînî *Pb* ye û di 327.4 dereceyan de jî dihele
**ziringe** dengê zengilî
**ziringîn/diziringe/biziringe** zingezing kirin, dingeding kirin
**zirî** cureyekî kurmên xwînmij e
**zirîç** berikên çekan; fîşeng
**zirîkî** wekî ziriyan
**-zirîkî pê ve girtin** di pêsîran de girtin û bernedan
**zirîn/dizire/bizire 1.** *(ker)* bang kirin **2.** ziqîn
**zirnazîq** darê ku datînin ser bilindahiyekê û lê siwar dibin, gava aliyeke wê dadikeve aliyê din jî hildikişe; qirneqos
**zirney** cureyekî alavên mûsîqayî ye û bi pifkirinê tê lêxistin
**-zirney pelixandin** forsa yekî şikandin
**zirneyjen** kesê ku bi pisporî li zirneyê dixe
**zirnix** kevirê kibrîtê; kurkût
**zirp** yekîneya leşkerî
**zirpî** her endamekî yekîneya leşkerî
**zirpêt** gonxwarina keran
**zirpêt kirin** kerê nêr berdan ser mankerê
**zirqetik** bihukek e
**zirt 1**. derewên bêbinî **2.** pertafên bêpîne
**-zirt dan xwe** xwe gijgijandin
**zirteboz** tund û hov
**zirtek** derewkerê derewên bêbinî
**zirtezirt** pizepiz
**zirtezirt kirin 1.** bi devçepelî axaftin **2.** axaftinên acizker gotin
**zirto** zirtek
**zirx** kinca ku ji têlên hesinî hatiye çêkirin û ji bo berevaniyê tê bikaranîn
**zirxdar** xwedîzirx
**zirviçandin/dizirviçîne/bizirviçîne** *(mêwe û sewze)* perçiqandin
**ziryan** cureyekî bayê ku ji aliyê bakura rojhilatî ve tê
**zirz** serhişk û hêrsokî
**zirz bûn** bihêrs bûn
**zirze/zirzile** kilîl
**zirze/zirzile kirin** kilîl kirin
**zişt** kirêt
**zivêr** zîver
**zivêr bûn** zîver bûn
**zivêr kirin** zîver kirin
**ziving** şkeft
**zivir 1.** nenerm û girtikgirtikî **2.** veger
**-kinca zivir** cilên ku di dema lixwekirinê de laşê mirovî aciz dikin
**-zivir zivir dîsa li vir** tu cihî naêwire û cardin vedigere warê xwe

yî kevn

**zivirandin/dizivirîne/bizivirîne** **1.** wergerandin **2.** fetilandin **3.** dagerandin **4.** hilgerandin *“dema kêr *(karî)* rû dizivirîne, dema şîvê **kêvçî** tîne”

**zivirîn/dizivire/bizivire** **1.** vegerîn **2.** fetilîn **3.** dagerîn

**zivistan** demsala berf û seqemê *“biharê pez, payizê rez, **zivistan**ê ez”

-**zivistanê serî girtin** sir û seqemê ji nişkê ve dest pê kirin

**zivronek** çivange

**zix** şilegemara heywanan a ku tepisiye hev

-**bêhna zixê jê hatin** bêhna heywanan û gemara wan jê hatin

**ziwa** neşil

**ziwahî** neşiltî

**ziwa bûn** ji şilahiyê xilas bûn, şilahî jê dawerivîn

**ziwa kirin** ji şilahiyê rizgar kirin, şilahî jê dawerivandin

**ziyan [I]** zevî

-**ziyanê xelqê çêrandin** sewal berdan nav zeviya xelqê

**ziyan [II]** **1.** xisar, zirar **2.** zede *“devê tirş, **ziyan**ê dide xwe”

-**ziyan gihandin** xesar dayîn, zirar lê xistin, zede lêxistin

**ziyandar** xesardar, zirardayî

**ziyanî** dayîna miqdarek malî ji ber xesara ku pêk hatiye

**ziyankar** zirardar

**ziyîn/dizî/bizî** ta li toterîkê alandin, ta gilok kirin

**zîbeq** madenê ku jimara wî ya atomî 80, giraniya wî ya atomî 200.5, siftiya wî 13.59, kurteya wî ya latînî *Hg,* di 327.4 dereceyan de jî dihele û piranî di germjimêran de tê bikaranîn

**zîh** pizdanka sewalan

**zîk** bendê şimakirî

**zîl** **1.** şax, peraş **2.** aj, ajero

-**zîl dan/vedan** **1.** şax vedan, peraş dan **2.** aj dan, ajero dan

**zîlan [I]** kunên ku ji bo mifteyê di deriyekî de vedikin

**zîlan [II]** bayê sext û ziwa

**zîlan [III]** serê boçika ajalan

**zîlik** çêreya biharê, zêrçe *“**zîlik**a biharê, debara malê”

**zîlo** zirî, tizrûg, zêlû

**zîn** alava ku datînin ser

hespan û li serê siwar dibin *"merivê dîn, naçe ser **zîn**"
**-zîn li bizinê kirin** bi lez û bez tevdîra çûyînê kirin
**zîn kirin** zîn danîn ser pişta hespê û girêdan
**zînkirî 1.** hespê ku zîn danîne ser piştê û tengê wî şidandine **2.** amade *"dostê kevn, hespa **zînkirî** ye"
**zînet** xeml, arayişt
**zînî 1.** gir **2.** kêrt
**zîp** rojên ji 26'ê Reşemiyê hetanî 5'ê Adarê yên ku bi awayekî gelêrî biyom tên hesibandin
**zîper 1.** katara stûyî, patika stûyî **2.** keziyên mil; edale
**zîpermasî** cureyekî masiyên zeryayî ye
**zîpik 1.** barija qeşayên girover; şexte, teyrok **2.** kelexwêdan **3.** peqpeqokên ku li ser ava keliyayî dikevin *"ber baranê revî, **zîpik** lê qelibî"
**zîranî** meraq
**zîranewa** kesê meraqdar
**zîrç 1.** gemara heywanên bibask **2.** zirênc
**zîre** cureyekî reheka ku tovê wê wekî biharatan tê bikaranîn
**zîrek 1.** jîr **2.** jêhatî **3.** egîd
**zîrekî 1.** jîrtî **2.** jêhatîtî **3.** egîdî
**zîrevan 1.** jêhatî **2.** aqilmend
**zîrfon** cureyekî daran ê ku belçikên wê wekî çayê tên bikaranîn
**zîtik** pehîna heywanan *"tu bidî zîtikan nedî **zîtik**an, tu dê bidî heqê dîzikan"
**zîv** madenê giranbiha yê ku jimara wî ya atomî 47, giraniya wî ya atomî 107.88, siftiya wî 10.5, kurteya wî ya latînî *Ag* ye û di 960 dereceyî de jî dihele *"axaftinan bi **zîvî** bikire û bi zîvî bifroşe"
**zîvan** deq û xalên di lêş de
**zîvêr 1.** acizbûyî, nerehet **2.** bêzar
**zîvêr bûn 1.** je aciz bûn, nerehet bûn **2.** bêzar bûn
**zîvêr kirin 1.** aciz kirin **2.** bêzar kirin
**zîvîn** tiştê ji zîvî çêbûyî
**zîwan** çêreyên biyanî yên ku di nav zevî û bîstanan de hêşîn dibin
**zîx 1.** serikên çereyê yên ku teze derdikevin **2.** serên rihan ên ku teze derdikevin
**zîx dan** *(serên çereyê an jî*

*rihan)* pê de pê de derketin
**zîz 1.** hestiyar **2.** bihîstyar, hesas
**-dengê zîz** newaya dawûdî
**zîzok** vizvizîk
**zo** du heb kit; cot
**zome 1.** herêm, dever **2.** koma konên li warekî bicihbûyî
**zonp** mîrkut
**zoq** çavên çikvekirî
**zoq bûn** bi awayekî ku kanikên çêv nelivin li tiştekî nihêrtin; ziq bûn û nihêrtin
**zor [I] 1.** pir, zêde **2.** xelî **3.** lap
**zor [II] 1.** hêz **2.** neheqî *“**zor,** fendan betal dike”
**zorekî** bi darê zorê
**zoran 1.** desthilat **2.** qeb, gulaş
**-zoran girtin** gulaş girtin
**zoranî 1.** desthilatî **2.** gulaş
**zorbe** zordar
**zorbetî** zordarî *“bi darê **zorbeti**yê muhbet nabe û darê zorbetiyê zû dişkê”
**zordar** sitembar, zalim
**zordarî** sitembarî, zilm
**zordest** zordar
**zordestî** zordarî
**zot [I]** nifir
**zot [II]** tûjkirina devê kêrê û hesinê gîsnê cotan
**zot kirin** tûj kirin
**zov** cureyekî bihukan e; çilpê
**zozan** havîngeh, sermiyan *“**zozan,** bêzirar nabe”
**zozanî** kesê ku havînan koçî cihên hênik dike; sermiyanî
**zuhd** dîndarî
**zuhdî** dîndar, zahid
**zuhim** rûnê bêz; zon
**zurbe** keriyê guran
**zurg** di qûntara çiyan de cihê xişirge, kêrt û kort
**zurxax** di aşên avî de cihê ku av tê re derdikeve
**zû 1.** biecele, bi lez û bez **2.** ne di wextê xwe de *“çavê tirsiyayî, **zû** xwelî dikevê”
**zûr** kesê ku her li cihekî tenê dinêre
**zûr bûn** li pey hev li heman cihî nihêrîn
**zûrîn/dizûre/bizûre 1.** *(gur)* kastekast kirin **2.** *(mirov)* lavayî kirin *“ez çûm serê çiyan û **zûriyam** wekî guran, birazî nabin bira tu caran”
**zûro 1**. çavzoq **2.** kesê ku çavên wî her tim tiştê li destê xelqê ye
**zûka** bi lez û bez
**zûkayî** lezgînî
**zû kirin 1.** ecele kirin **2.**

lezandin **3.** bezîn
**zûr bûn** **1.** bi baldarî nihêrîn **2.** çav kutan tiştekî
**zûrezûr** **1.** dengê seg û guran **2.** zêrezêr **3.** nalenal *"axîna kûr, ji dilê bi **zûrezûr** tê"
**zûrîn/dizûre/bizûre** *(gurg û seg)* nalîn, zêrîn, azar kêşan, kûstekûst kirin
**zûtik** qûn, tabût, tilor
**-zûtik derketin** **1.** ji ber karê giran piştşkestî bûn **2.** pir lawaz bûn
**zûtir** bi leztir
**zûtirîn** bi awayê herî ecele
**-di zûtirîn katê de** di heyameke herî bi ecele de, bi leza bê
**zûtirka sibehê** beriya ku zerekiyên tavê bidin rûyê erdê
**zûxal** şewate, ardû
**zûxav** kêma birînê
**zwî** kurmê doranan

## ÇAVKANIYÊN DÎTBARÎ

### Ji bo rêzimana kurdî û hin babetên din ên têkildar:


1. *Kovara Nûbiharê* (1-100); www.nubihar.com
2. *Dersên Zmanê Kurdî, Kemal Burkay;* ji weşanên Roja Nû, çapa dîjîtal, 2000. (www.rojanu.org)
3. *Koka Zimanê Kurdî, D. N. Mac Kenzie,* wergera kurdî: Newzad Hirorî, www.nefel.com
4. *Kurds Between Warring Nations Again, By Nizameddin Rzayev;* http://www[.]kurdmedia[.]com/news[.]asp?id=12962
5. *Ferhenga Kurdî Ya 'wikipedia'yê: wikiferheng.*
6. *Bingehên Gotinê (I-IX), Keça Kurd,* www.efrin.net/penus (ferhengeke hin peyvên kurdî ye)
7. *Elfabêya Kurdî & Bingehên Gramera Kurdmancî, Celadet Alî Bedirxan,* www.nefel.com, çapa dîjîtal: 2002.
8. *Rêbaza Zimanê Kurdî, Mîral Mîrhac Zîlanî;* http://www.geocities.com/bahoz_k/
9. *Di Kurdî De Şopên Bingeha Destpêkî Ya Zimanên Hindewropî, Ezîzê Cawo,* www.pen-kurd.org
10. *Rastî û Rastnivîsa Hejmaran, Zana Farqînî;* www.amidakurd.com
11. *Zimanê Akademîk, Zana Farqînî;* www.amidakurd.com
12. *Tîpa Dubare, Zana Farqînî;* www.amidakurd.com
13. *Lêkerên Kurdî Yên Ku Ji Hev Dibin, (I-II) Zana Farqînî;* www.amidakurd.com
14. *Zayend û Tewanga Jimarnavan, Zana Farqînî;* www.amidakurd.com'ê.
15. *Mêjera Navdêrên xwerû, Samî Berbang;* www.amidakurd.com
16. *Di Kurdî De Cotepeyv, Samî Berbang*; www.amidakurd.com
17. *Zimanê Kurdî*, www.dibistanakurdi.com
18. *Babeteke Fonetîkê, Fonolojî, Yaşar Eroglu;* www.amidakurd.com
19. *Grammaire Kurde, Paul Beidar,* Parîs, 1926, ji dana-

sina Mahmûd Lewendî, www.amidakurd.com
20. *Di Zaravayê Kurmancî De Babeteke Balkêş: Ergatîv, S. Unus,* unus@telering.at.
21. *Ergatîvî Mohra Kurmanciyê Ye, Newzad Hirorî;* www.nefel.com
22. *Kurmancîya Standard: Tewang û Ergatîvî Wek Nimûne, Newzad Hirorî,* www.nefel.com
23. *Kurtenêrînek Li Hin Beşên Rêzimana Kurdî, Husein Muhammed;* http: //www.mehname.cjb.net
24. *Kurtenêrînek Li Hevoksaziya Kurdî, Husein Muhammed;* http: //www. mehname.cjb.net
25. *Kurtenêrînek Li Tevgera Daçekên Kurdî, Husein Muhammed;* http: //www.mehname.cjb.net
26. *Rêziman û Pirsgirêkên Rêzimanî, Huseyîn Kartal;* axaftineke wî a ji bo konferansa zimanê Kurdî 2000.
27. *Komara Kurdistan ya Demokratî Ji Kûr Heta Kûderê, Kakşar Xurşîdî;* http://www.amude.de/amude/kurdi/nivis/nivis12/mehabad.html
28. *Another Sad Story - Red Kurdistan , By Nizameddin Rzayev;* http://www.kurdmedia.com/articles.asp?id=12553
29. *Li Turkiyeyê Rewşa Zimanê Kurdî;* www.enstituyakurdi.org.
30. *Şerefname -Pencereya Kurdan A Ber Li mêjûyê, Mûrad Ciwan;* http://web.telia.com/~u63802125/Xaneper/Hemsida/Nivisar/Kurdimak.html
31. *Sîstema Navnetewî Ya Nuh û Pirsa Kurdî, Mûrad Ciwan;* http://web.telia.com/~u63802125/Xaneper/Hemsida/Nivisar/Kurdimak.html
32. *Civaka IT û Pirsa Kurdî, Mûrad Ciwan;* http://web.telia.com/~u63802125/Xaneper/Hemsida/Nivisar/Kurdimak.html
33. *Li Ba Ahmedê Xanî Peywendiyên Jin û Mêran, Evîn û Erotizm, Mûrad Ci*wan; http://web.telia.com/~u63802 125/ Xaneper/Hemsida/Nivisar/Kurdimak.html
34 *Çend Pirsên Rêzimana Kurdî, Mûrad Ciwan;* http://web.telia.com/~u63802125/Xaneper/Hemsida/Nivisar/Kurdimak/reziman.html

35. *Çend Agahî Li Ser Ziman û Wêjeya Kurdî, Rodî Diyar;* http://www.amigra.org/nivis.asp?id=544
36. *Di Tewrat û Încîlê De Behsa Kurdan, Lokman Polat;* http://www.geocities.com/mehname2002/mehname/26/nirxandin5.html
37. *Nav Di Zmanê Kurdî De (Kurmanciya Jorîn), Deham Ebdulfettah;* http://www.spirez.org/2006.htm#160
38. *Kurd Neviyên Medan in, V. F. Minorsky,* wergêr: Elî Cehfer; http://www.efrin.net/penus/index/old/penus 11/naverok/eli_cafar.htm
39. *Geşedan û Rewşa Hilberîna Bi Zimanê Kurdî, Serhad B.Rênas;* http://www.hawardengubas.com/serhadbrenas-gesedanuhilberinabizimanekurdi.htm
40. *Destpêka Peydebûna Zimên, Îkram Balekanî;* www.ezdixane.com
41. *Zimanê Kurdî, Mûrad Ciwan;* www.ezdixane.com
42. *Plandanîna Zimên, Hesen Qazî;* www.ezdixane.com
43. *Divê Azadiya Her Lehçeyê Hebe;* Amir Hassanpour, www.ezdixane.com
44. *Kurtlerîn 5000 yıllık tarihi,* http://www.armedforcesjournal.com/forums/showthread.php?t=38374992
45. *Lêkolîneke Nû Li Ser Dîroka Kurdan: Cemîlpaşazadeyên Dîyarbekirî û Neteweperestiya Kurdî, Ekrem Onen;* http://www.nefel.com/articles/article_detail.asp?RubricNr=31&ArticleNr=303
46. *Mêjûya Kurdistanê;* http://www.geocities.com/bahoz_k/
47. *Alfebêta Erebî û Zimanê Kurdî, Zerdeşt Haco;* http://www.geocities.com/bahoz_k/
48. *Êzdiyatî, Xanna Omerxalî;* www.ezdixane.com
49. *Celadet Bedirxan û Zimanê Kurdî, Amed Tîgrîs*; www.amidakurd.com
50. *Di Kurmancî De Qertafên Bêjesaz, Samî Berbang;* www.amidakurd.com
51. *Dîrok û Ziman, Amed Tîgrîs;* www.amidakurd.com
**52.** *Rûpelek Ji Dengnasiya Dîrokî Ya Zimanê Kurdî, Michael L. Chyet;* www.amidakurd.com

53. *Zimanê Standard û Zimanê Akademîk, Amed Tîgrîs;* www.amidakurd.com
54. *Bi Riya Tewangê Pêkanîna Xwedîtiyê, Samî Berbang;* www.amidakurd.com
55. *Peyvên Ku Zayenda Wan Nêr Lê Wekî Mê Tên Tewandin, Zana Farqînî;* www.amidakurd.com
56. *Bibliografiya Nivîsarên Li ser Zimanê Kurdî, Newzad Hirorî;* www.nefel.com
57. *Ziman, Nirx û Dejenerasyon (1), Felat Arda;* www.amidakurd.com
58. *Turco-Iranian Language Contact: The case of Kurmanji, Christiane Bulut;* http://www.cogsci.ed.ac.uk/%7Esiamakr/Kurdish/KURDICA/1999/JUN/iran-turk-contact.html
59. *Hawrami/Dimili as Middle Kurdish; Siamak R. Durroei,* http://www.cogsci.ed.ac.uk/%7Esiamakr/Kurdish/Stand/Hawrami/Hawrami.html
60. *Etymology of Barzan, Siamak R. Durroei;* http://www.cogsci.ed.ac.uk/%7Esiamakr/Kurdish/KURDICA/1999/DEC/barzan.html
61. *Gelo Kêşeya Neaxaftina Kurdî Ya Li Bakur Çi Ye? Mihemed Elî;* http://www.avestakurd.net
62. *Ol û Neteweya Kurd Di Şûna Îslamê De, Muhemed Sadiq;* wergêr: Îsmet Kiliçarslan, kovara Nûbûn, hejmar: 71, rûpel: 18, (www.eduhok.com)
63. *Ziman û Nivîsara Kurdî, Nezîr Silo;* www.penkurd.org
64. *Derbarê Pêrkîtên /bi/ û /bê/yê De, Zana Farqînî;* www.amidakurd.com
65. *Di Kurdî De Cure û Avaniya Lêkeran, Zana Farqînî;* www.amidakurd.com
66. *Peyv û Hişmendî, Cîhan Roj;* http: //www. mehname.cjb.net
67. *Qanatê Kurdo : Alhilgirê Kurdnasiya Sovyetê, Tosinê Reşîd;* www.micagitk.com
68. *Di Zimên De Rola Zarava û Devikan, Zana Farqînî;* www.rojev.com

69. *Zeyî (I-II), Zana Farqînî;* http://www.rojev.com/news.asp?id=1361
70. *Kurd, Kird, Kirdasî, Zana Farqînî;* http://www.rojev.com/news.asp?id=1361
71. *Dengbêj û Dengbêjî, Zana Farqînî,;* http://www.rojev.com/news.asp?id=1361
72. *Zimanê Bav û Kalan, Zana Farqînî;* http://www.rojev.com/news.asp?id=1361
73. *Berhemeke Balkêş, Zana Farqînî;* http://www.rojev.com/news.asp?id=1361
74. *Ziman û Raborî, Zana Farqînî;* http://www.rojev.com/news.asp?id=1361
75. *Vekît, Zana Farqînî;* http://www.rojev.com/news.asp?id=1361
76. *Psikolojî û Ziman-Bandora Psikolojiya Zimên Li Ser Civakê, Dr. Îlhan Kizilirmak;* kovara Pêl, h: 2 http://www.rojava.net/DrilhanKizilhan18.05.2005.htm
77. *The Impact of Kurdish on Baby Talk Vocabulary of Jewish Neo-Armaic, Yona Sabar;* http://www.cogsci.ed.ac.uk/%7Esiamakr/Kurdish/KURDICA/2000/MAY/saber.html
78. *Qurana Wergerandî, An Guherandî, Jan Dost*; www.tirej.com
79. *Zaza, Soran, Kurmanc û Dîalektên Zimên, Serdar Roşan;* www.nefel.com
80. *Ferqa Di Navbera /ko/, /ku/ û /kû/ de, Arif Zêrevan;* www.nefel.com
81. *Yê Ku Mirovî Dibîne û Pirsa Tewanga Bi /î/yê, Newzad Hirorî;* www.nefel.com
82. *Rastiya /dê/yê û Rastnivîsa Wê, Newzad Hirorî;* www.nefel.com
83. *Piranî û Piraliya Di Avakirina Kurmanciya Standard de (I), Newzad Hirorî;* www.nefel.com
84. *Kê Alfabeya Soranî Çêkiriye?, Newzad Hirorî;* www.nefel.com
85. *Behdînî Di Navbera Soranîkirin û Kurmancîbûnê De; Newzad Hirorî,* www.nefel.com
86. *Rewşa Zimanê Kurdî Li Îraqê, Newzad Hirorî;*

www.nefel.com
87. *Peyv û Nîjad, Xelat Baedrî,* Dengê Lalişê, hejmar: 29
88. *Ji Pirsgirêkên Rêzimanî Raweya Neyînî, Reşo Zîlan;* Kurmancî, hejmar: 5, 1989. (www.institekurde.org)
89. *Kurdish Language;* http://en.wikipedia.org/wiki/Kurdish_language#Grammar#Grammar
90. *Felsefe û Ola Êzidiyan, Pîr Memo Osman,* wergêr: Xelîl Duhokî; kovara Çirayê, hejmar: 13, 1988
91. *24'e Nîsanê û Çend Têbiniyên Kurt, Polat Can;* http://www.micagitk.com/kurdi/Gotar%20Nirxandin/24nisan.htm
92. *Rola Wêjeya Devkî Di Hebûna Kurdan De û Rewşa Îro (I-II), Nusret Kurt;* www.pen-kurd.org
93. *Edebiyata Kurdî Li Zimanê Xwe Digere, Yaqûb Şafak;* avasin@instituyakurdi.com
94. *Rastnivîsa Lêkera /bûn/ê;* Kurmancî, hejmar: 3, 1988.
95. *Ji Pirsên Gramera Kurdî, Mîr Celadet Bedirxan-Roger Lescot;* Kurmancî, hejmar: 4, 1989. (www.institekurde.org)
96. *Bêjeyên Ku Cihan Nîşan Didin, Musa Kaval;* Kurmancî, hejmar: 4, 1989. (www.institekurde.org)
97. *Lêkerên Hevedudanî, Rojen Barnas, Kurmancî;* hejmar: 5, 1989. (www.institekurde.org)
98. *Li Ser Rastnivîsa Çend Tiştan (I-II), Reşo Zîlan;* Kurmancî, hejmar: 7 û 9, 1990. (www.institekurde.org)
99. *Termên Rêzimanî (I-V), Rojen Barnas;* Kurmancî, hejmar: 9 û 10-13 1990 û 1992, 1993. (www.institekurde.org)
100. *Ferhengoka Pehlewî û Kurmancî (I-IV), Rojen Barnas;* Kurmancî, hejmar: 14-18, 1994-1996. (www.institekurde.org)
101. *Devoka Hekariyê, Rojan Hazim;* Kurmancî, hejmar: 14-15, 1994. (www.institekurde.org)
102. *Çend Pirsên Rastnivîsînê (I-III), Reşo Zîlan;* Kurmancî, hejmar: 16 û 19-20 1995-1996. (www.institekurde.org)
103. *Devoka Qerejdaxê (I-XI), Mehmûd Lewendî;* Kurmancî, hejmar: 16-28, 1995-2001. (www.institekur-

de.org)
104. *Çend Şaşiyên Rêzimanî, Michael L. Chyet;* Kurmancî, hejmar: 24, 1998. (www.institekurde.org)
105. *Peyvên Kurdî Di Zimanên Cîran de (I-V), Reşo Zîlan-Behroz Şucaî;* Kurmancî, hejmar: 26-30, 1999-2001. (www.institekurde.org)
106. *Zimanê Partî, Behroz Şucaî;* Kurmancî, hejmar: 28, 2001. (www.institekurde.org)
107. *Devoka Botî (I-III), Cemal Onursal;* Kurmancî, hejmar: 28-30, 2001. (www.institekurde.org)
108. *Devoka Kurdên Qefqasyayê, Têmûrê Xelîl;* Kurmancî, hejmar: 29, 2001. (www.institekurde.org)
109. *Ferhenga Partî-Kurdî (I-III), Behroz Şucaî;* Kurmancî, hejmar: 28-30, 2001. (www.institekurde.org)
110. *Ji Bo Reforma Alfabeya Latînî, Ramanên Li Ser Pêşeroja Zimanê Kurdî, I. Şerîf Wanly;* Lêkolîn, hejmar: 1, 1995.
111. *Guhertinên Ziman û Zaravan, Fêrgîn Melîk Aykoç;* Lêkolîn, hejmar: 1, 1995.
112. *Kurmanciya Jorîn û Kurmanciya Navîn, Kurdistan Mukriyanî;* Lêkolîn, hejmar: 1, 1995.
113. *Di Heqê Rewşa Zaravazaniya Kurdî De, Zerê Yosupova;* Lêkolîn, hejmar: 1, 1995.
114. *Zaraveyên Kurdî, L. Jandîl;* Lêkolîn, hejmar: 1, 1995.
115. *Bindestiya Çanda Kurdî û Encamên Guhertinên Wê, Selahattin Soro*; Lêkolîn, hejmar: 2, 1996.
116. *Di warê Zimanê Kurdî De, I. Nasso;* Lêkolîn, hejmar: 4, 1997.
117. *Hin Beşên ,Rêzimên, Huseyin Kartal;* Lêkolîn, hejmar: 5, 1997.
118. *Têgînên Rêzimên, Fêrgîn Melîk Aykoç;* Lêkolîn, hejmar: 5, 1997.
119. *Bingeha Leksîkolojîk û Morfolojîk a Pêşketinê, Yaqûp Karademîr;* http://www.netkurd.com/nivisar.asp?yazid=33&id=177
120. *Leksîk û Pêşketina Zimên, Yaqûp Karademîr;* http://www.netkurd.com/nivisar.asp?id=155&ya-

zid=33
121. *Zimanasî û Zimanzanî (I-II), Yaqûp Karademîr;* http://www.netkurd.com/nivisar.asp?id=107&yazid=33 û
http://www.netkurd.com/nivisar.asp?id=63&yazid=33
122. *Ziman û Civata Zimên (I-II), Yaqûp Karademîr;* www.netkurd.com
123. *Senkronî û Dîakronî, Yaqûp Karademîr;* www.netkurd.com
124. *Zimanê Avestayî;* www.wikipedia.org
125. *Di Danîna Rênivîsê De Pevekirin û Cûdakirin, Berzo Mehmûd;* kovara Pênûs, hejmar: 17, 2005, kovarapenus@hotmail.com
126. *Hetanî Kurd Nebin Xwedî û Serwerên Welatê Xwe, Zimanê Wan Jî Nabe Zimanekî Serdest, Zana Farqînî;* kovara Agirî, hejmar: 38, 2006.
127. *Hunera Gotinê, Lokman Polat;* kovara Pênûsê, hejmar: 15, 2003. www.efrin.net/penus
128. *Nexweşiya Zimanzaniya Kurdî û Herêmayî, Hesen Îrandost;* http://www.efrin.net/penus/index/old/penus12/hesen_irandost.htm
129. *Bingehên Gotinê (VII-IX), Keça Kurd;* www.efrin.net/penus
130. *Axaftina Amedê, 14 Reşemî 2005, Noam Chomsky;* www.znet.com
131. *Divê Pîvan Kurdayetî Be, Dr. Kamiran Bêkes;* Pênûs, hejmar: 15, www.efrin.net/penus
132. *Di Edebiyatê Forma "Ez", Lokman Polat;* www.efrin.net/penus
133. *Kurdistan Bingeha Şaristaniyê Ye, Bavê Barzan;* www.efrin.net/penus
134. *Hevokên Zimanê Me (I-IV) Nizamettin Akkurt;* www.pen-kurd.org
135. *Rewşa Wêjeya Kurdî Li Ewrûpayê, Mustefa Reşîd;* www.pen-kurd.org
136. *Rewşa Zimanê Kurdî Li Bakur, Hesen Kaya;* www.pen-kurd.org

137. *Taybetmendiyên Zaravayê Kurdaxê, Cankurd;* www.pen-kurd.org
138. *Çand û Wêjeya Kurdî û Sedemên Lipaşmayîna Wê; Îkram Balekanî,* www.pen-kurd.org
139. *Eyaleta Kurdistanê a Li Îranê, Îkram Balekanî;* www.pen-kurd.org
140. *Welatê Kurdan û Gelê Kurd Bi Çavên Helmuht von Moltke, Dr. Kemal Sîdo-Kurdaxî;* www.pen-kurd.org
141. *Ji Dîroka Cihûdên Kurdistanê, Dr. Zorab Aloian;* www.pen-kurd.org
142. *Mijara Tewangê (I-II), Mustefa Reşîd;* www.pen-kurd.org
143. *Mijara Daçekê (I-II), Mustefa Reşîd;* www.pen-kurd.org
144. *Mijara Veqetandekê, Mustefa Reşîd;* www.pen-kurd.org
145. *Tewandina Veqetandekê, Mustefa Reşîd;* www.pen-kurd.org
146. *Çend Gotin Li Ser Nîşana Ayendeyê, Mustefa Reşîd;* www.pen-kurd.org
147. *Raman û Ziman, Mustefa Reşîd,* www.pen-kurd.org
148. *Çend Gotin Li Ser Tîpa Dubare Di Zimanê Me, Mustefa Reşîd;* www.pen-kurd.org
149. *Çend Gotin Li Ser Tîpa Kelijandinê Di Zimanê Me De, Mustefa Reşîd;* www.pen-kurd.org
150. *Qeyda Kurtahiyê Di zimanê Me De; Mustefa Reşîd,* www.pen-kurd.org
151. *Mêjerê Lêkerê, Mustefa Reşîd;* www.pen-kurd.org
152. *Ziman û Netewe, Pîr Rustem;* www.pen-kurd.org
153. *Kurdish people;* http://www.answers.com/topic/kurdish-people
154. *Pêşkît û Parkît, Amed Tîgrîs;* ji weşanên Medyayê, çapa yekemîn, Stockholm, 2001, e-pirtûkeke www.amidakurd.com'ê ye
155. *Gramera Kurmanciyê, C. Bedirxan-Roger Lescot;* ji weşanên Enstîtuya Kurdî a Parîsê, çapa dijital, 2001 (www.institutkurde.org)
156. *Di Vegotina Zimanê Kurdî De Bend û Erka Bendan,*

*H. Huseyîn Deniz;* http://www.pen-kurd.org/
157. *Çend Têbînî Li Ser Zimanê Stranê, Rexne Li Ser Berhemê Dawiyê ê Stranbêj Diyar "Oxir Be Oğur", Kakşar Oremar;* http://www.pen-kurd.org/
157. *Di Danûstandina Zanyarî De Der Bareyê Zanistê, Rexnegiriyê û Hinekî Jî Toreyê; Ezîzê Cawo;* http://www.pen-kurd.org/
158. *Bersiveke Piştgiriyê Ji Bo Nivîsa Birêz Ezîzê Cawo, Hesen Huseyin Deniz;* http://www.pen-kurd.org/
159. *Zimanê Kurdî Xwediyê Taybetmendiyên Li Gorî Xwe Ye, H. Huseyîn Denîz;* http://www.pen-kurd.org/
160. *Bi Hêviya Yek-kirina Rêzikên Rêzimên û Awayê Rastnivîsandina Zimanê Kurdî; Hesen Huseyîn Denîz,* http://www.pen-kurd.org/
161. *Zimanê Wêjeyê, Arşeve Oskan;* http://www.pen-kurd.org/
162. *Bikaranîna Zimanê Zikmakî Erk û Rûmeta Neteweyî Ye, Hesen Huseyin Deniz;* http://www.pen-kurd.org/
162. *Zimanek û Dewletek, Konê Reş;* http://www.pen-kurd.org/
162. *Lêker Ji Aliyê Kişandinê Ve, Nizamettin Akkurt;* http://www.pen-kurd.org/
163. *Lêker Ji Aliyê Peywirê Ve, Nizamettin Akkurt;* http://www.pen-kurd.org/
164. *Lêker Ji Aliyê Avaniyê Ve, Nizamettin Akkurt;* http://www.pen-kurd.org/
165. *Ji Aliyê Sazbûnê Ve Lêker, Nizamettin Akkurt;* http://www.pen-kurd.org/
166. *Rastbikaranîna Lêkeran û Rêpîvanên Wan, Nizamettin Akkurt;* http://www.pen-kurd.org/
167. *Zimanê Kurdî û Avjeniya Serbest Di Nava Tîpên Latînî De, Dr. Zara Brahîm;* http://www.pen-kurd.org/
168. *Rola Wêjeya Devkî Di Hebûna Kurdan De û Rewşa Îro -II- , Nusret Kurt;* http://www.pen-kurd.org/
169. *Xwenavkirina Kurdan Di Hêla Êtnîk û Zimên Da, Prof. Zera Ûsiv;* kovara Roja Nû, hejmar: 103, http://www.rojanu.org/
170. *Zimanê Stranan, Mehmet Bayrak;*

, http://www.rojanu.org/
171. *Sê Şairên Kurd Ên Mezin Di Şiêra Dîwanê Da: Fuzûlî, Nefî, Nabî; Mehmet Bayrak;* http://www.rojanu.org/
172. *Kakilê Edebîyata Kurdî a Nivîskî, Prof. Zera Usiv;* http://www.rojanu.org/
173. *Hevpeyvînek Bi Kemal Burkay Ra Li Ser Zimanê Kurdî, Nuriye Akman;* http://www.rojanu.org/
174. *Gotara Newzad Hirorî Li Ser Behdînî û Kurmancî, Amedekar:AzAd;* http://www.rojanu.org/
175. *Rewş û Pêşeroja (Dahatûya) Zimanan û Kurdî, Silêman Demir ;* (Dersa KZK a duyem), http://www.rojanu.org/
176.*Alfabeya Erebî-Kurdî, Newzad Hirorî;* www.nefel.com
177. *Ji Bo Çi kurdî? Kurdî Ji Bo Çi Hewce ye? Çima Divê Em Bi Kurdî Bipeyivin, Bixwînin û Binivîsin? Em Bi Kurdî Çi Ne û Bê Kurdî Em Çi Ne?, Koçka Zimanê Kurdî;* http://www.rojanu.org/
178. *Kurdên Ku Bi Zimanên Din Dinivîsin Gelo Berhemên Wan Wêjeya Kurdî Ne?* (KZK-2006.05.17 ), http://www.rojanu.org/
179. *Bi Nivîskar Seyîdxan Kurij Re Hevpeyvînek Li Ser Edebiyata Kurdî, Hevpeyvin: Latif Epözdemir;* http://www.rojanu.org/
180. *Hevpeyvîn Bi Wezîrê Perwerdehiyê ê Komara Kurdistanê Nemir Menaf Kerîmî re,(31.07.2003 Mihabad), Kakşar Oremar;* http://www.rojanu.org/
181. *Civaka Sivîl û Rêxistinên Sivîl Yên Kurd, Remezan Pertew;* http://www.rojanu.org/
182. *Pêşkît û Parkît, Amed Tigrîs;* www.amidakurd.com (e-pirtuk)
183. *Kurdistan, Durûtiya Dezgehên Navnetewî, Memo Şahin;* http://www.navkurd.net/rojane/memo%20sahin/memo_sahin.htm
184. *Hawar Rexneya Kovarên Serdemî Dike!, Mihemed Hemo;* http://www.navkurd.net/rojane/hawar/hawar.htm

185. *Stranen Zarokan û Hêvî, Ozcan Kaplan;* www.navkurd.net
186. *Di Jîyana Gelan Da Girîngî û Perwerdîya Ziman, Kazım Özdemir;* www.navkurd.net
189. *Rewşa Zimanê Kurdî, Sîyasetmedar, Rêzan, Rewşenbîr û Pisporên Kurd, Kazim Ozdemir;* www.navkurd.net
190. *Serhildanên Gelê Kurd û Berdêla Azadîyê (I-VII), Kazim Ozdemir;* www.navkurd.net
191. *Newala Qesaban, Kazim Ozdemir;* www.navkurd.net
192. *Hunera Helbestê Careke Din (I-II), Heyder Omer;* http://www.efrin.net/cms/kurdi/index.php?option=com_content&task=view&id=98&Itemid=3
193. *Nerînek Di Hinin Tîpên Kurdî De, Dr. Xelîl Omer;* www.efrin.net
194. *Psikolojiya Rexnegiriyê, Dr. Cuwan Batû;* http://www.pdk-bakur.com/modules.php?name=News&file=article&sid=1016
195. *Projeya Destûra Herêma Kurdistanê û Mafê Neteweyên Din, Selah Bedredîn;* http://www.tirej.net/21.10.06.%20Kurdi.%20selah%20bedridin.destur.htm
196. *Ziman, Cîhan Polat;* http://www.micagitk.com/kurdi/ziman/ZIMAN.htm
197. *Kurmanji Kurdish Lexicography: a Survey and Discussion, Michael L. Chyet;* http://www.cogsci.ed.ac.uk/~siamakr/Kurdish/Papers/lexbib_e.html
198. *Kurdbûna Bê Ziman Jî Wekî Skêleta Bê Goşt e, Nedret Bilici;* www.rojname.com
199. *Gorani Influence on Central Kurdish: Substratum or Prestige Borrowing?(1) Michiel Leezenberg;* http://www.cogsci.ed.ac.uk/~siamakr/Kurdish/Papers/Leezenberg93/sec1.html http://www.cogsci.ed.ac.uk/~siamakr/Kurdish/Papers/Leezenberg93/sec2.html http://www.cogsci.ed.ac.uk/~siamakr/Kurdish/Pa-

pers/Leezenberg93/sec3.html
200. *Kovara Bîrnebûnê (1-31),* www.birnebun.com
201. *Wekîl Mûstafayev û Pirtûka Wî Li Ser Kurdistana Sor Dr Zorab;* http://www.pen-kurd.org/kurdi/zorabaloian/zorab-mustefayev.html
202. *Nêrîneke Kurt Li Ser Edebiyeta Kurdên Sovyêtê, Eskerê Boyîk;* http://www.demanu.com.tr/kovaradeng/arsiv/sayi63/yazi_06_Eskere_BOYIK.htm
203. *Çarenûsa Kurmancî Li Başûr, Tosinê Reşîd;* http://www.netkurd.com/nivisar.asp?yazid=58&id=976
204. *Şehîdên Şerê Qerebaxê, Eskerê Boyîk;* http://www.mozelan.com/sihiden_qerebaxe_eskere_boyik.htm
205. *Kurdistana Sor, Wekîl Mustafayev;* Kovara Hîwa, Çileye sala 2002. http://www.micagitk.com/kurdi/Gotar%20Nirxandin/azerbeycan.htm
205. *Stalîn Dijminê Kurdan Bû, Polat CanPolat;* http://www.micagitk.com/kurdi/Gotar%20Nirxandin/stalin.htm
206. *Kurtedîroka Kurdên Qefqasyayê, Polat Can;* http://www.micagitk.com/kurdi/Gotar%20Nirxandin/diroka%20ezidiyen%20qafqasya.htm

## Ji bo gotin û nifirên pêşiyan:

1. http://ku.wikiquote.org/wiki/Gotinên_pêşiyan_3
Berhevkar: H.Akyol: hakyol60_40@hotmail.com
2. http://www.kaniya-sipi.de/kurdish/gotine-peshiyan.htm
Berhevkarê ji kitêba I. I. Sukerman, "Xorasanskî Kurmancî", Moskova, 1986, r.227-230 www.xoybun.com
3. http://malakurda.com/modules.php?name=Gotine_PesiyanLîsteya
4. http://ku.wikipedia.org/wiki/Listeya_bajarên_Kurdistanê
5. http://nergiz.95mb.com/meselok9.htm1.

http://www.saradistribution.com/pendipesinan.htm
6. http://www.birnebun.com/candukultur.htm
7. *Çend nifir ji kaniya folklora kurdî (I-III), Hesen Kaya;* www.pen-kurd.org

**Ji bo ferhenga peyvên înternetê:**

*Ferhengî IT-Zkurd;* (Kurmanciya Jêrîn-Kurmanciya Jorîn-Inglîzî) http://www.zkurd.org/proje/ferheng-dev.pl?letter=A&dahatu=belle&tenha=0

**Ji bo ferhengên kurdî-bi zimanên biyanî:**

A *Ferhenga Kurdî-Îngilîzî, Husein Muhamed,* http://mehname. cjb.net
B. Amadekar: Erdal Ronahî, www.ferheng.org
*1. Ferhenga Tirkî-Kurdî 2. Ferhenga Swêdî-Kurdî*
*3. Ferhenga Erebî-Kurdî 4. Ferhenga Kirmanckî-Tirkî*
*5. Ferhenga Frensî-Kurdî 6. Ferhenga Îngilîzî-Kurdî*
*7. Ferhenga Soranî-Kurmancî*
C. *Ferhenga Kurdî-Tirkî, Sinan Alptekin,* www.alp-tekîn.de
D. *Ferhenga Kurdî-Frensî, Mîr Celadet Bedirxan,* www.vateonline.com (hejmar: 1-15)

**Ferhengên Spîrêzê:**

*English-Kurmanji/Kurmancî-Înglîzî,* http://www.spirez.org/2006.htm#153
*Ferhenga Kamêran, Kamêran Silêman Botî;* http://www.spirez.org/2006.htm#152
*Ferhenga Qazî Erebî-Kurdî/Kurdî-Erebî;* http://www.spirez.org/2007.htm#220
*Ferhenga Gotinên Pêşiyan;* http://www.spirez.org/2006.htm#180
*Ferhenga Gulî, Mesûd Xalid Gulî;* http://www.spirez.org/2002.htm#ferhengagul

**Ji bo mefhûmên îslamî:**


1. *Wateyên Qurana Pîroz, Husein Muhamed;* http: //mehname. cjb.net
2. *Wateyên Qurana Pîroz;* www.quran.al-shia.com (bi kurdiya jêrîn û jorîn)


**Ji bo Ferhenga Erdnîgariyê a Kurmancî:**


http://www.geocities.com/mamoste/Erdnigari/erdnigari0.htm


## ÇAVKANIYÊN ÇAPKIRÎ


1. *Nûbehara Biçûkan a Ehmedê Xanî, bi şîroveya Gulzara Biçûkan a Ehmedê Hilmî;* tê de 846 peyvên kurdî hene û piraniya wan xwerû kurdî ne, şîroveya wê jî bi kurdî ye; bi tîpên erebî ye, çap û cihê çapê ne diyar e; ew bi xwe jî ji destnivîsekê hatiye çap kirin.
2. *Mîzanuledeb, Mem û Zîn a Ehmedê Xanî;* ji çapeke destnivîsê a bi tîpên erebî, cih û dîroka wê ne diyar e.
3. *Destana Memê Alan, berhevkar: Roger Lescot;* ji weşanên Avestayê, Stenbol, 1997, çapa yekemîn.
4. *Dîwan, Ehmedê Xanî, destnivîseke min a taybet e û bi tîpên erebî ye; berhevkar: Mehemedê Îsayê Bazîdî*; 1977
5. *Gulzara Zarokên Kurdan, Îmadedîn Reşpojan ê Bidlîsî;* çapa bi tîpên erebî, 1965, cihê çapê ne diyar e û ew bi xwe jî ji destnivîsekê hatiye çap kirin.
6. *Îrşadulîbad, Xelîfe Ûsivê Bazîdî;* çapeke kevn e û me ji bo têgihên şerîetê bi kar anî.
7. *Kovara Hawarê (1-57);* ji weşanên Nûdemê, Stockholm, 1988.
8. *Kovara Kurmancî (1-30);* ji weşanên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, 1987-2001

9. *Kovara Lêkolîn (1-7);* ji weşanên Enstîtuya Kurdî ya Berlînê, 1995-...

10. *Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî, Samî Tan;* ji weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2005, çapa yekemîn.

11. *Gramera kurdî, Qanatê Kurdo;* ji weşanên Koralê, Stenbol, çapa yekemîn.

12. *Ferhenga Biwêjên Kurdî, Osman Toprak;* ji weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2005, çapa yekem.

13. *Ferhenga Gotinên Pêşiyan, Çiya Mazî,* ji weşanên Elmayê, Stenbol, 2005, çapa yekemîn.

14. *Ferhengoka Dîwana Yekem a Cigerxwîn, Kurdî-Kurdî, Xosro Ebdulahî;* kovara Kurmancî, weşanên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, hejmar: 5 havîn 1989

15. *Ferhenga Anatomiya Mirovan;* kovara Kurmancî, weşanên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, hejmar: 3 zivistan 1988 û hejmar: 5 havîn 1989.

16. *Termên Hiqûqî, Mûsa Kaval;* kovara Kurmancî, ji weşanên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, hejmar: 5 havîn 1989

17. *Ferhenga Kurdî-Tirkî, Zana Farqînî;* ji weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2004, çapa yekem.

18. *Ferheng, Kurdî-Tirkî/Tirkî-Kurdî, D. Îzolî;* ji weşanên Dengê, Stenbol, 2004, çapa çaremîn.

19. *Ferhengok, Kurdî-Tirkî/Tirkî-Kurdî, Azadiya Welat;* ji weşanên Welatê, Stenbol, 2003, çapa çaremîn.

20. *Ferheng, Kurdî-Tirkî/Tirkî-Kurdî, Torî;* ji weşanên Berfînê, Stenbol, 2004, çapa sêyemîn.

21. *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê, Arif Zêrevan;* ji weşanên Nefelê, Stockholm-Swêd, 1997, çapa yekemîn.

22. *Şopên Bingeha Destpêkî -Substrakt- ya Hindewropî di Kurdî de, Ezîz C. Mamoyan,* ji weşanên Aramê, Sten-

bol, 2005.

23. *Qetruneda, Îbn Hîşam;* Mektebetu Libnan, Beyrût, 1990, çapa yekemîn (ji bo rêzimana erebî).

24. *Elmucemulwasît, Saziya Zimanê Erebî;* Qahire, Misir (ferehenga erebî-erebî ye; me ji bo peyvên kurdî yên ku ketine erebî û yên erebî yên ku ketine kurdiyê bi kar aniye)

25. *Amûzeşê Zebanê Farisî, Yedulah Semere;* ji weşanên Bîrîmê, Stenbol, 1993, çapa yekemîn (ji bo rêzimana Farisî).

26. *Zimanî kurdî we rayeşkerdinî coxrafî î zarawekanî, Fuad Heme Xurşîd;* Bexda, 1983.

27. *A Short Grammar of Kurmanji, Baran Rizgar; Kurdish-English English-Kurdish dictionary,* London, 1993.

28. *Ferhanga Berîkê, Kurdî-Tirkî/Tirkî-Kurdî,* ji weşanên Dozê, çapa sêyemîn-2006, Stenbol.

29. *Ferheng, Kurmancî-Dimilî-Tirkî/Tirkî-Dimilî-Kurmancî, Seîd Veroj,* ji weşanên Warê, çapa yekemîn-2003, Stenbol

30. *Ferhenga Biwêjan, Şexmûs Aslan;* çapa yekemîn, 2005, Amed

31. *Ferhenga Gotinên Pêşiyan, Şexmûs Aslan;* çapa yekemîn, 2006, Amed

32. *Gramera Kirmanckî, Munzur Çem;* ji weşanên Dengê, çapa yekemîn, 2003, Stenbol.

33. *Folklorê Ma Ra Çend Numûney, Malmisanij;* çapa duyemîn, 2000, Stenbol

34.*Kurtler -Bir El Kitabi- Mahrdad R. Izady;* ji weşanên Dozê, çapa yekemîn, 2004, Stenbol.

35.*New Riverside Dictionary II,* Hughton Mifflin edition, 1985, New York, USA.

36. *Ferheng-Vajname,Kurmancî-Hewramanî-Dimilî-Senendajî, Seîd Verroj, Abdurrahman Uçaman,* ji weşanên Warê, çapa yekemîn, 2002, Stenbol

37. *Ferhengoka kurdî bi kurdî ya ku Cankurd ji Çîrokên Kurmancî yên Aleksander Jaba re amade*

*kiriye* ji weşanên Çanda Nûjen, çapa yekem, 2000, Stockholm.
38. *Anatomiya Bedena Mirovan, Bijîjkê Alîkar Huseyin Bektaş,* ji weşanên Dengê, 2004, Stenbol.